ABDULAH OCALAN

# KESAYETA MILÎTANÊN APO'YÎ

*Weşanên Komîteya Rêbertî*

**Werger:** Sozdar Serbilind

**Cihê Çapê:** Çapxana AZADÎ

**Dîroka Çapê:** Îlon 2019

## NAVEROK

**PÊŞKETINA RÊBERTÎ**
**EYNIKA HEMÛ PÊŞKETINA YE**
Milîtaniya Partî Ya Dikeve Rêya Serkeftinê
Dê Misoger Serkeftinê Bidest Bixe

**PARTÎBÛN BI KESAYETA**
**BIRYARDARIYA BILIND JIYÎNE**
Egîdiya Di Nava PKK'ê de
Saxlem Pêkanîna Nûnertiya Pîvana ne

**MILÎTANÊ ŞOREŞGER MIROVÊ HERÎ RASTEQÎNE**
Dilê Milîtan Bi Gel û Rêhevalên Xwe Ve Dagirtiye

**DI ÇAVKANIYA ŞEREF SERFIRAZÎ Û**
**HUQUQÊ DE SERKEFTIN HEYE**

**BI XWE BÛNA DÎROK**
**BI ZANEBÛNA DÎROKÎ TEVGERÎNE**
Cengaweriya Me Cengaweriya
Dilxwaziya Mezin û Tolhildana Mezine
Em Dixwazin We Ne Ber Bi Mirinê
Ber Bi Serkeftinê Ve Bibezînin

**MILÎTANÊ HEVGIRTÎ ÇARENÛSA GELÊ XWE**
**YA XIRAB ÇARESER DIKE**
Jiyîna Li Ser Bingeha
Azadî û Mirovatî Jêvenegere
Şerê Me Şerê Xwe Ji Nû Ve
Dîtina Jin û Zilame

**ŞOREŞA HERÎ MEZIN**
**ŞOREŞA FÊMKIRINÊ YE**
Polîtîka Helwestek Hostane Dixwaze

**TEVLÎBÛNA RAST A JI PKK'Ê RE**
**DI MILÎTANIYA VEJÎNER Û RIZGARVANIYÊ DE**
**BIRYARDARÎ YE**
Wêrekbûn û Şêwaza Rast Derxistina Holê
Xisleta Herî Bingehîn a Milîtane
Di Lehengiyên PKK'ê De
Pêwendiya Ku Xwe Dispêre Berjewendiyan Nîne

**ÇAVKANIYA JIYANA PAŞVERÛ**
**BÎRDOZIYÊN PAŞVERÛ NE**
Têkoşîna Bîrdozî
Cewhera Hemû Xebatane
Kesê Di Rastiya Serkeftinê De
Xwe Bidin Pejirandin PKK'yî Ne

**ŞOREŞ BÛYEREK DILXWAZIYEK MEZIN**
**Û HÊZA MEZIN DAYÎNA HEVDU YE**
Şoreş Bi Kesên Zorê Kar Dike Re Çênabe

**ŞOREŞ BERHEMA KESÊN**
**HETA DAWÎ DIKARIN BIMEŞIN**
**Û BIAFIRÎNINE**
Em Neçarin Xwedî Bawerî û
Hewldanek Bêdawî Bin
Refên Me Cihê Bi Dil û Mejiyê Xwe
Tevlîbûnê Esas Digirine

**SERKEFTIN HER DEM Û LI HER DERÊ**
**YA MILÎTANIYA PKK'Ê YE**
Şervanê Azadiyê Ji Bo Armancên Xwe
Kesê Ku Xwe Birêve Dibe Ye
Kesê Ku Di Rih û Hişê Xwe De Qiyametê Raneke
Nikare Ti Şerî Bimeşîne
Jiyana Nû Bê Armanc Bê Ked û Bê Şer Nabe
Kesayetên Xwe Fedayî Rastiyan Dikin
Dikarin Her Tiştî Ser Bixin

**ŞOREŞ DOZA BAWERÎ EZAMET Û VÎNA MEZINE**
Pêşengê Herî Baş Yê Têkneçûyî Ye
Şehîd Paşçavkirin Xwe Înkarkirine
Bi Şêwaza Têkoşîna PKK'ê Meşîn
Karê Milîtanê PKK'ê Ya Yekane Ye

**BÛNA XWEDÎ FERASETEK XURT**
**TÊ WATEYA DI JIYANÊ DE BIDESTXISTINA ÎDÎA YÊ**
Yên Mafê Wan Heyî Hêza Wan
Yên Hêza Wan Heyî Sipartekên Wan Hene
Ji Bo Me Jiyana Şoreşgerî Bi Qasî Zêr Hêjaye

**XEBATA HERÎ HÊJA YA BI NAVÊ MIROVAHÎ**
**BÊ KIRIN MEŞA AZADIYÊ YE**
Di Şerê Şoreşgeran De Dilxwaziya Mezin
û Dijwariya Vînê Esase

**KESAYETA QADRO**
**RÊXISTINBÛNA GEL A LÊHÛRBÛYÎ YE**
Kesayeta PKK'ê Kesayeta Ku Hemû Nakokiyên Gel
Di Dil Û Mejiyê Xwe De Bi Sentez Dike

**DI PKK'Ê DE ŞERTÊ YEKANE**
**BI DIJMIN RE SERÎ KÊŞANE**
Rêbertî Yekbûna Gel û Hemû Nirxane
Kesê Herî Bi Bandor Yê Tiştekê Dide Her Kesî Ye

**BI XIROŞEK MEZIN A AVAKIRINA**
**DERFETA AZADIYÊ VE BIMEŞIN**
Qutbûna Ji Rêxistinê Yekser Windakirine
Di PKK'ê De Berpirsyarî û Rastiyên Jiyanê Esase

**PRATÎKA ŞOREŞGERÎ PRATÎKA GIRÊDAYÎ**
**FELSEFEYA ŞOREŞGERÎ PÊŞ DIKEVÊ**
Bîrdoziya Sosyalîst
Bîrdoziya Berxwedaniya Herî Wesifdare
Dê Serkeftin Bi Kesayetên Vediguherê Bê Bidestxistin

## PÊŞKETINA RÊBERTÎ
## EYNIKA HEMÛ PÊŞKETINA YE

Dîroka partiya me vê pir baş şanî me dide ku, pirsgirêka herî bingehîn a PKK'yîbûnê jî, nezantiya xwe kirina hêzek rêveberiya her cure navend û di her astê de ye. Weke gel jî pirsgirêka me ya herî bingehîn, di mijara çarenûsa xwe de hêzek rêveberiyê ava nekirin û her tim li benda rêvebirinê mayîne. Lewra hêjî gelê me bandora xwe radestî dagirkerên hoveber dike û ev di nava partiya me de jî diyar dibe. Aliyê herî girîng a nepêşketina milîtanê PKK'ê, ji xwe rêvebirinê acize û vê jî bi şêweyek herî xirab a tasfiyegerî û tasfiyekariya rêveberiyê di nava hemû xebatên partiyê de diyar dike.

Bêguman rêveberî, beriya her tiştî xwe rêxistinkirî û venêrîn sazkirine. Rêveberî, bandorên dijmin ên yekser an jî neyeksere, li ser esasê berjewendiyên xwe beralîkirine, ew li gorî fikir û şêwaza xwe ya polîtîk birêxistinkirine û bi vî şêweyî dana karkirin astengkirine. Rêveberiya ku pêwîste hûn li dijî dijmin raber bikin jî, li dijî vê sekinandina we ye, xwe gihandina hêza fikrî ya berjewendiyên we rave dikin. Ev fikir jî veguhertina xeta polîtîk û ev bi hêzek rêxistinkirî di rêya xwe de rêvebirinê dixwaze. Milîtanê ku neçare pêşî vê bike, tenê bi astengkirina dijmin ve xwe têr nabîne, paşverûtiyên xwe yên navxweyî, bêhişiya di mijara rastiya xwe de, her cure korbûn, bêxîretî û bêberhemiyê derbas dike. Neçare ku hêza rêveberiya di vê mijarê de jê re hewce ye bidest bixe, di van mijaran tevan de bê eleqe dimîne. Heta dawî xwe bêkêr û bê tevger dihêle. Her wiha li gorî bayê tevdigere û qaşo ya hêsan dihilbijêre. Şêweya vê ya herî sosret ku gel jî dijî, bi qadroyên PKK'ê re diyar dibe.

Bi salane me şerek mezin meşand. Ji bo em ferdê xwe yê serbixwe û azad dihizire derbixin holê, em weke Rêbertî îdîa dikin ku bi hewldanên mezin ve me xwe gihandiye pêşketinên pir mezin. Lê mixabin, qadroyên PKK'ê naxwazin vê pêşketina Rêbertî bibînin. Dev ji dîtinê berdin, ew mijûlkirin, erzan li ser lîstin, ew anîna rewşek kêrnehatî, weke bûye peywira qadro ya bingehîn. Qadro û ya herî girîng jî navend, heta alîgirên min ên herî nêz jî, weke ku ti peywirek wan a din nîne, li şûna bi dijmin an jî paşverûtiya navxweyî re şer bikin, rastiya Rêbertiya ku me kotekî pêş xistî mijûl dikin. Berovajî dikin, derfetên ku derxistî holê

çarçûr dikin û hemû firsendên dîrokî yên afirandine bi pûçkirinê ve mijûl dibin. Dibe ku ev hemû neyên yeqînkirin, lê belê rastî ne.

Ev pêşketina Rêbertî, di dîroka vî gelî de bûyera yekemîn a cidî ye. Êdî dost jî, dijmin jî vê dibîne. Hûn milîtanên me yên pêşeng jî, hinekê vê bibînin û ji vê rewşê encamên girîng derbixin. Bi vî rengî jî bi namûs û serfiraziya xwe ve, xwe jî watedar bikin. Ya herî girîng jî, ev ji bo we hêzek jiyanê ya pir cidî ye. Pêwîste milîtanê PKK'ê jî hinekê bi xîret û durist be, bikare derfetên ku hatine afirandin jî rast binirxîne. Jixwe bi qasî bikeve ketiye, lewra pêwîste hinekê bi ser xwe ve bê, hinekê serbilind be û qet nebe piştî vê qonaxê hêsan winda neke. Salane vê dibêjim. Lê belê tiştên ku hûn jî li hemberî vê ferz dikin, her roja ku derbas dibe oportînîzmek tê kûrkirin rave dike. Hûn dibêjin; "Ez nikarim bibim navend, nikarim bibim qadro, nikarim birêve bibim, tenê dikarim kar xirab bikim." Vêca hûn çima wisa ne? Hûn çima şêwazek wisa çelexwarî didomînin? Dema em behsa şerê nav rêxistinê dikin, aliyê vî karî yê herî balkêş jî, li vir derdikeve pêşberî me. Navend û hêza me ya rêveber tasfiyekariyek pir xeter li ser pêşketina Rêbertî ferz dike. Ma hûn ji qestan vê dikin? Na. Hemû hişmendiya kesayeta we xwe li vir dide dest.

Pêşketina Rêbertî, eynika hemû pêşketina ye. Ev eyne pîvanê kesayeta her kesî diyar dike. Xwe negihandina hewcedariyên rastiya Rêbertiyê, jê re nebûna bersiv û li şûna vê ew mijûlkirin çi diselmîne? Ev hemû bêpîvaniya we, paşverûtiya asta azadiya we û hûn çiqasî kêm bi nirxên rasteqîn ve girêdayî ne diyar dike. Ez ji we re dibêjim, pêşketina Rêbertî eyne ye. Mixabin a ku hûn di wir de dibînin jî, dê çawa neyê kirin, dê çawa neyê rêvebirin, dê navendî çawa çênebe û şerek amade hatî bidestxistin jî çawa bê valederxistine.

Me li Başûr şerek dijwar meşand û di şer de jî ji hêla leşkeri ve em derbasî rewşek pêşveçûyî bûn. Li encamên vî şerî dinêrim: Tê gotin; "Filan derî ji bo me girtiye, em qet nikarin qût peyda bikin û dibe ku tengaviyên pir cidî çêbin." Elbet ev rewş fikaran bi min re çêdike. Li gorî min di vî şerî de hemû derî hatibûn vekirin. Li cihên ku me dixwest, dikariya bîrîmên pêwendiyan bihata sazkirin. Lê dema komek me tê, yekser tê gotin; "Di deriyên derbasbûnê de qereqol hatine çêkirin. Em bi zorê derbas bûn, pevçûn derket." Dîsa hawar dikim: Ma li vir bîrîmek me nîne? Berovajî hemû hêzê ku em pê re şer dikin hemû deriyên li wir girtine, mixabin behsa zar û zimanê yên me jî nayê kirin. Vaye em dîsa

bi rêveberiyek fêlbaziya gundîtî yan jî di derbarê encamên şerê wê de ti nêrîna xwe neyî re rûbirû ne. Rêyek Xabûrê heye, rêyek ku Şerê Başûr herî zêde bi ser wir ve pêş dikeve ye, rêyek teqez me eleqedar dike. Hêceta şer a bingehîn jî, venêrîna wê rêyê û tevgera dijmin a li ser wê rêyê astengkirin bû. Lê belê dîsa yek bîrîma me ya pêwendiyan jî li wir nîne. Ya rastî venêrîna li ser wê rêyê, yek ji armancên şer a bingehîn bû. Fikra vê jî nîne. Ger fikir hebûya, dikariya bê gotin ku; "Em hizirîn, lê belê astengî hebûn." Mixabin beriya astengiyan fikir nîne, nayê hişê wan. Qaşo ewqas qadro û rêberên me yên polîtîk û leşkeri hene. Lê belê vê nayînin bîra xwe jî.

Em van danin aliyekê, ew nirxên heyberî yên me bi hezar kedî kirin destê wan jî, bi dest gundiyên ji rêzê ve berdidin. Heta bêku aciz bibin dibêjin; "Ger em nebin, li vir bazirganî nameşe!" Gundî bazirganiya herî bi feyde bi me re dikin. Vêca bêfihêt tên vê li cem me dibêjin. Ango ti mantiqek serûber a bazirganiyê jî nîne. Hinek biryargehên PKK'ê yên gundiyan ew xapandin jî hene û gundiyan gelek alavên me jî dizîne. Vê ji we tevan dipirsim: Kanî serbilindî? Kanî rêveberiya partiyê ya cidî? Hûn çawa li hemberî xwe rêzdarin? Hûn bi hezaran qadro ne, ger hûn wisa derfetên hatîn bidestxistin jî ji nedîtî ve bên, hûnê çi ji xwe bikin? Ma ev paşverûtî, ev bê tevdîrî û bê hişî ne şerme?

Min yek-du mînak dan, yeqîn dikim hûn niha dikarin hezaran mînakan baştir bihizirin. Ji ber ku min hinekê rêya fikirandinê vekir. Li hember van şaşwaz dimînim û van jî pir seyr dibinim. Başe, bi salane hûn li wir çi dikin? Bazekê danin li ser zinarekê, dê baz hezar nêçîrên xwe raçav bike û çendekan bigire. Gurekê danin wir, dema birçî ma dê êrîş bike û dîsa bi qasî dixwaze nêçîrê bike. Gundiyekê, şivanekê danin wir, bila wisa hêzek jî li pey nebe, bila pênc camêr hebin, dê yekser wir bi bacê ve girê bide. Eşqiya Hemîdo bi pênc şervanên me yên fedaî re li van çiyan bihêlin, dê hezar derfetî derbixe holê. Vêca nav û şerefa van milîtanên me li kur ma? Kêmek maye em zêdahiya erazî venêrînin, lê di pêwendî û rêyan de venêrînek me ya cidî jî pêş nekeve. Berovajî, gundî dibêjin; "Cihê ku herî zêde pereyê bi feyde dide biryargehên PKK'ê ne, bazirganiya ku em bi wan re dikine."

Êdî divê hûn bi ser xwe ve werin. Pêwîste şoreşgeriya belengaz a xwe bi navend nake, PKK'yî nake û nabe hêza rêveberî, şoreşgeriya hedê xwe nizane bi dawî bibe. Kesayeta ku behsê dikim, fêm nake PKK'yîbûn û Rêbertî çiye, weke ku fêm dike dixwiye lê jiyana wan

cureyek dine û heta niha belaya serî ne, ev xale. Ev rewşên we xoşa we diçe. Li serê van çiyan evqasî li ber xwe bide, bila evqas xwîna şehîdan birêje, lê tevî vê jî bila yek fermandarek ku bikare pirsa li serê yek çiyayî pêwîste şêweya jiyanê çawa be ji xwe bike dernekeve! Ger rewş wisa be, tu çiqas dikarî li serê van çiyan bi bandor be? Fermandarek ku hesabê serkeftinê bike tine ye. Hemû jî sosretin.

Min ji bo karbidestiyê şer meşand. Me bi dijmin re tirs daye avakirin, lê beramberî vê jî tengaviyên ku em li ber xwe didin hene. Rasterast ji ber rêzdariya em li hember hewldanên xwe û hewce dikir em li vir xwedî pêşketinek polîtîk bûna. Salane dibêjim. Ger ev xwîn ji bo bostek ax jî hatibe rijandin, hûnê politikaya wê bikin. Kesek ku vê bipirsê jî nîne. Ji ber ku hesap kitêba wan nîne. Lê dijmin pir bi dîsîplîn bost bi bost qada xwe ya karbidestiyê birêxistin dike û diparêze. Mixabin hûn jî pirsgirêkên wisa giran dijîn. Bûyera ku ez dibêjim belaya serê mine ev xale. Nexweşiya zarokan ku ez behsê dikim jî eve û piştrastbûnên vê jî pir vekirine.

Polîtîka, hunera ku di nava derfetan de ya herî karbidest bidest xistin an jî ya herî zehmet serxistine. Lê belê ev di nava me de bûye hunera ya amade jî windakirinê. Hûnê di vê rewşê de çi bi xwe bikin? Tam jî di vê xalê de hûn dibêjin; "Em hewceyî fikirandinê nabînin." Lê belê, polîtîka şêweya fikir a lêhûrbûyî ye. Raveya herî hûrûkûr a asta pêşketina aborî, bazirganî, civakî, heta zanistî, ango şêweya herî pêşketî polîtîka ye. Ev jî fikir bi xwe ye. Wê tu di nava polîtîkayek netewî ya herî giran de bî, lê belê pêwîstiya hizirandinê nebînî. Ji bilî çend parçeya bînî-bibî xwe jî amade nekî. Paşê jî derbikevî serê çiyan! Di vê rewşê de heyfa we ye. Nexasim gundiyek ji rêzê jî dikare pariya di devê navenda me de bistîne û ji xwe distîne jî. Di destên wan de çeper û derfetên bêhempa hene, lê hûn wan ji destê wan jî derbixin nakevin ferqê. Ya rastî li vir nebûna navend, ango xwedî li vê nederketin heye. Wateya vê jî eve: "Tenê ev dikarin bên rêvebirin, biyaniyên ku me birêve dibin ji me re hewce ne!" Ango mantiqê koletiya kevnar, tê wateya; "Em nabin mirov, dê yan axa yan jî paşa li ser serê me hebe. Em nikarin xwe bi xwe birêve bibin. Berde begê min, ev kar ji me nayê." Vaye ev hem gundiyê paşketî, hem jî koleyeke. Fêrî her cure rêveberiyê bûye.

Hûn çima hizirandinê hewce nabînin? Dema tê gotin çima wisa dibe, yekser hûn dibêjin; "Nehat bîra me." Hevoka yekemîn hûn dibêjin eve. Di mijarên taktîk de jî gelek qadroyên berpirsyar hene. Ji wan dipirsim,

dîsa dibêjin; "Nehat bîra me." Vêca, çi ferqa kesayetek bê hiş ji pezekê, bizinekê, yan jî dînekê heye? Paşê jî digirîn û dixeyîdin. Wê demê serbilindiya wan tê bîra wan. Dema em dibêjin ger hizir nebe hûnê çawa şer bikin û encamên şer çawa binirxînin, yekser gotin di qirika wan de dimîne. Ma qet hûn li hember xwe ne rêzdarin? Li şûna ku hûnê wisa bêçare bimînin, hûn biçin li cihek din nokeriyê bikin baştire. Ma şervanên azadiyê qet wisa dibin? Dema dixwazin karekê bi navenda xwe jî bidin kirin, nikare pariya herî amade jî daqurtîne, dîsa dibêje; "Me nekarî binirxînin, pêşbîniya me nebû. Me dîtibe jî nekarî tevdîra wê bigirin. Ji bo qutkirina wê jî hewldana ku hewce dikir, me raber nekir." Bêhna wan teng bûye dibêjin; "Devjêberde, nebê jî dibe." Ma polîtîka mantiqê vale qet efû dike, mafê jiyanê ji axaftina wisa vale re dide? Ma hûnê qet hûnera bi navê polîtîkayê fêm nekin? Ma hûnê ji çanda cixare kêşanê û nêzîkbûna; "Em nabin mirov, devjêberde" rizgar nebin? Dema firsendê dibînin, hûnê wê cîhana xwe ya erzan ji axayê herî ji xwe razî jî xirabtir bidin axaftin û ji vê re jî bêjin; "Devjêberde, ez bûm mirov." Ew axayên herî pêkenok ên civaka me jî, axayên ji we hêjatirin. Vê jî pir vekirî ji we re bêjim. Helwestên ku hûn di bin navê rêveberiyê de raber dikin, tenê dikare bibe mijara filmên herî baş ên pêkenokî.

Hûn ditirsin, lewra her tim xwe vedişêrin. Ji ber hûn nikarin mafê hunera polîtîk bidin, lewra her tim wisa di xetên provakatîf de tên girtin. Ji ber hûn ji xwe ditirsin û fikaran dikin. Min jî bi salan ev tirs û fikar jiyan kir. Lê hizirîm ku ev ne çare ye û karê min ê destpêkê jî bi wêrekî polîtîka jidil fêmkirin bû. Min got qet nebe bi qasî bikarim xwe bidim jiyîn polîtîka hewce ye.

Salane di nava refê de ne, lê belê bi qasî girîngiya ku şivanek dide keriya xwe, ew nadin yekîneyên xwe. Bi salane em ji fermandariyên xwe yên jor re dibêjin; "Derdora xwe hinekê rêkûpêk û sazûman bike. Ger tu bikarî taximek hêz rast bicîh bikî, ji bo vê hinekê jî roj û mehan baş derbas bikî, pênc hezar kes jî bi ser te de be nikare li wan çiyan tiştekê bi te bike." Bes lê dinêrim, hêzên hevkar tên, bi qasî bikare Biryargeha Navendî desteser bike ji dizîve nêz dibe, yên me jî bi kotekî ji vê xilas dibin. An jî derdora biryargeha me ya herî baş jî, çend caran tê dorpêçkirin. Jixwe di cara yekê de radest bûn, cara din jî ketin rewşek îmhabûnê. Me bi hinek tevdîrên rêveberiyê ku girtîn ve, bi zorê tasfiyebûna wan asteng kir. Xeterî hatiye, ketiye nav çavên wan,

mixabin ew li ber bêvla xwe jî nabînin. Berovajî, heta kêliya dawî keyfa wan tê ku weke gundiyek ji rêzê bijîn.

Dijmin hat, dîsa gundên wan vale û talan kir. Bi hezaran çek û alav ji destê wan hat derxistin. Piştî wê jî bêfihêt, bêku lêpirsînek wijdanî jî bikin, bi xeyîdok, girî û kûrkirina provakasyonê ve xwestin xwe ji nav vê mijarê xilas bikin. Hinekan xwe siparte ferdperestiyê, hinekan jî got; “Bi ser min de newe, nexwe ezê hîn xirabtir bikim” û helwestên kesek sosret raber kirin. Liv û tevgerên wisa mirovbûn hesibandin. Hizirîn ku dê wisa di nava partiyê de bibandor bin, qurifîn û paş ketin. Niha ev hemû bivê-nevê li ser hunerek berz ferzkirina şêwaza herî xirabe, di nava karên herî berz de qirêjiyên xwe domandinê rave dikin û ev jî tiştekê bi kes nade bidestxistin.

Di bîra min de ye, Pêngava 15’ê Tebaxê pêk hatibû. Dawiya sala 1984 û destpêka sala 1985’an bû. Navendbûnê li aliyekê bihêlin, ji bo nepêşketina navendê û ti wateya wê nebe çi ji destê wan dihat dikirin. Wê demê min bi navê **Fermanên Biharê** hinek perspektîfên birêkûpêk pêş xistin. Min ev got: Mirov şerê kesayetî dide, lê ne weke we. Hûn çima di ferzkariyên ku têkçûn serkeftinên wê ji mêj ve derketine holê de, israr dikin? Ma egîdî û şanazî wisa tê raberkirin? Mirov hevalê xwe wisa tengav dike? Mirov li ser pêşketinek Rêberî ya wisa re dibe bela? Ezê ewqasî li hemberî te rêzdar bim, ji bo xweşiya te û serfiraziya te her tiştê xwe danim holê, wê tu jî bêjî; “Ez kesek bi bandorim, navendim” û rihê pêşketinan bistînî! Wê tu nezanî bi serûber baxive, yên amade jî belav bikî, nekarî tevdîrek ku xwe jî biparêze pêş bixî û ji bilî belavkirina mirovên li derdora xwe jî rol nelîzî. Ev bi yek gotinî, rewşek pir şerme û ne hêjayî we ye. Berî her tiştî evqas xwîna şehîdan di bin berpirsyariya te de çêbûye. Mirov beramberî vê lêpirsînek wijdanî dike.

Gundî jî, dema di malbatê de yek tê kuştin, bi salan li pey tola wan baz didin. Çanda malbatê eve. Li kêleka serê te, hem jî di bin berpirsyariya te de wisa bi sedan heval şehîd ketine. Beramber vê rewşê jî, tu qet berê xwe jî nediyê. Rûpêşa vê jî nehizirîn, dogmatizm, xwe nepixandin, xwe di nirxandinên giştî de veşartin, niyazên sûbjektîf û di nava hestan de fetisandine. Qaşo dê wisa ji rastiyan birevin! Ev rêya kesên ku qet rast nabin û sexte ye. Kesên serfiraziya wan a şoreşgerî heyî, ma dikevin ser vê rêyê? Ev nêzîkbûn bê wijdanî ye. Wisa bi şêwazek giştî ve, ma dibe ku bê gotin çêbû û qediya? Ti mirov dema rêhevalê xwe winda dike, wisa nêz nabe. Dixwazim ev sextekarî

derbikeve holê. Dixwazim kesayetê ku xwe li hember van nirxan berpirsyar nabîne û ji xwe re nake pirsgirêk derbikevin holê. Hûn nikarin xwe hîn zêdetir veşêrin. Xwe bi sipartina paşverûtiyê, bêfêhmatî ji xwe re kirina pêşnûme û fêrbûnek, nepolîtîkbûn jî kirina marifet ve, hûn nikarin hîn zêdetir xwe veşêrin û biparêzin. Pêwîste hûn dev ji vê hunerê berdin. Ji navenda me bigirin heta rêveberiya mangê, misoger kes nikare van helwestan weke serbilindî bibîne. Ev rexne ji bo we kêmin jî. Hûnê siberojê derbikevin pêşberî dadgehê, şoreş we efû nake. Mantiqek şoreşan a wisa heye. Bersiva ku ji paşverûtî û dogmatîzmê re bê dayîn pir hişke. Ji ber ku li vir bi serfiraziya netewekê û pîroziyên nirxên herî berz ve tê lîstin. Ev nayê efûkirin. Hûnê xwedî li van nirxan derbikevin.

Nabe hûn evqas xerîbî jiyanê bin. Di ti tevgerên gêrîla de evqas nirx nehatine çarçûrkirin. Nabe hûn evqasî xwe ber bi paşverûtiyê ve berdin. Ev giyan a we jî be, nikarin wisa hêsan winda bikin. Ji ber vê mafê we nîne, ji ber ku yê vî giyanî dide jiyîn jî partiye û Rêbertî ye. Kesê ku giyana xwe pir erzan peşkêş dikin jî, evqasî dev ji xwe bernadin. Giyan û jiyan pîrozin, çek pîroze, heta qûtên xwarinê jî binirxin. Ji ber gundiyan jî li ser kîsek ard şer meşandine. Ma emê çima bi hezaran kîsên ard di bin erdê de birizînin? Emê çima bi sedan fîşek û hezaran çekî ne xêra ti tiştî dest dijmin ve berdin? Kîjan fermandariya artêşa gêrîla vê dipejirîne? Hûn tev berpirsyarê vê ne.

Rêxistin bikar ne anîn, fikir pêşnexistin, şerê qural û rayeyan rast nedana meşandin van rastiyan derdixe holê û di vir de jî ya hewce nekirinê de rola herî sereke hûn dilîzin. Paşê jî weke koma kesayetên nexweş tên û xwe tavêjin ser serê Rêbertiyê. Ya rastî armancên me yên pîroz, berxwedaniyek me bi navûdeng û bi rastî jî dema nirx tê dayîn her tiştê me yê ku rê ji jiyana mezin re veke heye. Dibe ku ev bi hewldanên we yên cewherî ve nehatibin afirandin. Me ev nirx weke wesiyetên şehîdan radestî we kir. Me kedên xwe kirin xizmeta we. Ma dibe mirov qedir û qîmetê nede nirx? Dibêjin ku, nirxê qehweyekê jî çil salan heye. Em ne qehweyekê, hemû derfetên jiyana berz pêşkêşî we dikin. Hêjî hûn nikarin qedir û qîmet bidin vê. Paşê jî bi her cure lîstokên dînîtî û hestiyarî ve, bi nêzîkbûnên pir rakêşayî û kesayetên provakasyon ve, hewl didin xwe ji nav vî karî derbixin. Pêwîste hûn bizanin ev nirx, kesayetên bi vî rengî efû nake. Hewce dike hûn vê di hişê xwe de bikolin.

Bi vî gelî pir hat lîstin. Dijmin sedî salan her cure hejarî û kepazetî li ser vî gelî ferz kir. Heta pîsî bi vî gelî dan xwarin. Miletê me ji hêla dijmin ve anîne vê rewşê. Lê belê, em jî li dijî vê tevgerek berxwedaniyê ne. Dê me jî kiryarên dijmin ên kirine nepejirandiba. Kî dikare vê xisleta PKK’ê înkar bike? Li hemû qadên jiyanê berxwedêrî heye, berxwedêriyên mezin ên zindanan heye. Hûnê van nekin polîtîka, bêjin ji bo van fikir ne hewce ye, ji bo van pêşketinek bi navê edep û terbiye nejîn, paşê jî hûnê bêjin; “Ez dijîm, ez PKK’yî me, ez fermandarim!” Ma mirov dikare bêyî perda ar û rû van tiştan bêje? Jixwe sedemên van lêkolîn dikim. Di bin van helwestên we yên me dixin vê rewşê de şanaziya sexte û dînîtiya we ya desthilatiyê dibînim. Hûnê dev ji van berdin. Ne şanaziya sexte, ne jî nexweşiya desthilatiya pêşwext kesayet rizgar dike. Berovajî ev hîn zêdetir têk dibin.

Di polîtîkayê de bê fikrî û bê uslubî nabe. Bi vî rengî kes nabe axa jî. Vekirî bêjim: Axayên Kurd ne weke we ne, ya we tiştek dine. Ev nexweşiyek hemrengê xwe nîne. Di dîroka partiyên din ên cîhanê, di dîroka şerên siyasî de gelek nexweşî derketin holê, lê ya we mînakek nû ye, weke her roj hinek nexweşiyên nû derdikevin holê, rewşa nexweşiyek polîtîke. Beriya ev li mirovahiyê vegire, erka me ya ji holê rakirinê heye. Jixwe dê ev nexweşî me şeht bike û ti halê me ya zêde bikare li hember vê nexweşiyê li ber xwe bide nîne. Ev nexweşî, nexweşiya nefikirandin, nepolîtîkbûn û nerêvebirinê ye. Di encama nefikirandin, nerêvebirin û nepolîtîkbûnê de, di roja duyem de çar bi çar dikeve nav lepên dijmin. Ev jî oportonîzma herî zêde binî vale ye. Ev jî di nava PKK’ê de xwe çawa dide der? Weke hatî gotin tê wateya gotinên; “Ev tu yî me wisa ber bi karek berz ve radikî ser piyan, ev tu yî polîtîkayê fêrî me dikî, ev tu yî kesê ku me li bilindiyan bigerîne! Ha ji te re, emê jî van bi te bikin, ger tu dikarî li ber xwe bide.” Belê reftarên ku tên vê wateyê raber dikin. Ev helwest êrîşkariya kesayetên fesadiya gundîtî, tebeqeya navîn a têkil her cure ketîbûn û pîsîtiyê bûye, heta her cure fêrbûnên hevkariyê ne. Êrîşkariya kesên herî zêde bêterbiye, yan jî kesên belengaz û bêçare ne.

Li bilindiyan jiyîn, hûn pir aciz kirin û her cure encam derxist holê. Ya yekemîn, ji jor heta jêr ji nişkê ve ketine; ya duyem jî, xwe li bilindiyan windakirine. Lê hûn nikarin polîtîkayê wisa binirxînin û bi vî rengî jî bi min bidin pejirandin. Ezê xwe di parastina vê mijarê de bidomînim. Pir vekirî bêjim, ti halê min ê ji we bitirse nîne. Weke kesek

min di ber vî karî de evqas ked dayî, ezê li hember van ferzkariyên we li ber xwe bidim. Dibe ku ji cihên hûn hatîn li nav êl û binemalên eşîran wateyek êrîşkariya we hebe, lê belê di nava partiyê de ti wateya van êrîşan nîne. Wê di vê mijarê de ti firsend ji we re neyê dayîn. Navendbûn nezanîn, tê wateya serê li ser milê xwe înkarkirinê. Rêveberî nezanîn, tê wateya ji dest û ling qut jiyînê. Hûn çawa dikarin van tevan ferz bikin? Ev di nava sînorên herî paşketî de, di perpitîna henaseya dawî dayîne. Hûn çawa dikarin van bipejirînin? Vêca li hemû qonaxên dîrokê yên bêhempa binêrin: Li wir hêzên bi qudret birêve dibin hene. Dil û mejiyên mezin hene. Hêjî hûn bi heyrantiyek mezin li eserên hunerî yên wê demê dinêrin, ji ber ku li wir rihên pîroz hene, xweşikbûnên pir mezin mijarên gotinê ne. Dîrok her tim wisa vedibêje û dîrok eve. Dîroka me ne wisa ye. Ji ber ku dîroka me, dîroka ketiyane. Vaye rewşên hûn îro li ser me ferz dikin, dîroka hûn dijîne. Ya rastî ev bê dîrokî ye. Bêdîrokî jî, tê wateya qutbûna ji pêşketina mirovahiyê. Ger ev jî we nahejîne, misoger hûn qediyane. Ger bêdîrokî, êşek mezin bi we nade jiyîn, nirxên berz we bandor nakin, cihê we ne nêvenga PKK'ê ye. Bi vê kesayeta we ya hêsan ve bi şêweyek ji rêzê ve bûna şirîkê rih û serfiraziya PKK'ê qetiyen nayê pejirandin.

### Milîtaniya Partî Ya Dikeve Rêya Serkeftinê Dê Misoger Serkeftinê Bidest Bixe

Rastiya Rêbertiyê, hêjî di nava PKK'ê de diyarkeriya xwe ya mezin didomîne. Ez bi xwe nûnertiya vê dikim û we jî bi vî halê we ve qetiyen nakim şirîkê mezinbûna PKK'ê û qîmeta PKK'ê. Jixwe nakim jî. Ne tenê xwe, PKK'ê jî diparêzim. Hinek nirxên PKK'ê jî yên bên parastin hene. Ji ber vî halê we, ezê gel jî li hemberî we biparêzim. Ji ber ku êdî ev gel PKK'ê dişopîne, PKK ya gele. Mirovê ku têrê nake û mirovê ku nekare birêve bibe, mafê xwe nîne cihê xwe li ser vî gelî hebe. Ev mirov ne dikare girseya PKK'ê, ne gelê PKK'ê, ne jî netewa wê birêve bibe. Lewra hûnê hêza wê ya fikrî, hêza terbiya polîtîk û weke raveya wê ya şênber hêza wê ya rêvebirinê raber bikin. Di bin navê nêzîkbûnên pakbûn û dilnizmiyê de bi gotinên weke; "Binêrin çiqas helîm û selimim, çiqasî por spî me, çiqas binavûdengim. Di hinek karan de çiqasî bi bandorim" ve, kes nikare di nava PKK'ê de ne bibe navend, ne

jî bibe rêveber. Hostatiya rêveberiya PKK’ê, di PKK’ê de bûna navend, xwedî girîngiyek mezine. Berê behsa ewliya, êşa çil salî dikirin, vaye ev jî kedek wisa dixwaze. Hostatiya rêveberiya mezin a PKK’ê, nexasim şêwaza xebatê û xîtaba xwe ve, yên ne zindî jî dixe tevgerê. Dema we ev raber nekir, kes we di nava PKK’ê de ne rêveber, ne jî fermandar napejirîne.

Hişê xwe bînin serê xwe. We heta niha yek-du dînîtî kir, hinek ferzkariyên nayên pejirandin jî kirin. Bes dê siberojê hesabê vê jî bê pirsîn. Ger hişê we li serê we be, pêwîste hûn bizanin di nava PKK’ê de tiştek bê bersiv namîne. Jixwe, dê şoreş bi xwe jî hesabê bipirse. Ji ber di xwezaya şoreşê de şerê wê û pevçûnên pê re dijîn an ji aliye wê ve, yan jî dijberî wê bi encam dibe. Her şoreş wisa ye. Yên şaş tevlî şoreşekê dibin, zû-dereng bi dawiyek dijwar ve berdêla wê didin. Ev jî xwezaya şoreşê ye û ti eleqeya xwe bi hebûn û tinebûna min ve nîne. Mînak, em bêjin filan û bêvan şêwazî ji holê rabûm. Gelo dê wê demê bi van ferasetan ve tişta bê serê we çiye? Hinek aliyên we yên durist hene. Lê di heman demê de aliyên we yên hinekê fêlbaz, hinekê dizker, hinekê kariyerîst, hinekê jî belengaz hene. Ev hemû têkilhev bûne. Dema wisa jî dibe, pir zêde parçebûn çêdibe, peyre jî hinek lihev dikin, hinek jî li hev dikevin. Yên kariyerîst gelek derfetan desteser dikin, yên kole, reben jî, pir hêsan dervî refan dimîne. Jin weke jina berê, axa weke axayê berê, Kurd weke Kurdê berê tine dibe û di encamê de hemû jî winda dikin. Asta we ya rêveberiya navendî ya niha, vê neçar dike. Jixwe dijmin jî dibêje; “Ev şerê yek kesî ye, ger ew kes jî biçe yên din jî kewên di qefesê de ne.” Ji ber ku hûn zêde kêr nayên bibin navend û qadroyên rêveberiyê.

Şaşî û nebesiyên hûn dikin ên mejiyên me ranake, hêvî didin dijmin. Nanê we yê amade jî, ji destê we derdixin, gundiyek ji rêzê tê pereyê we yê amade dibe. Sedan mînakên wisa hene. Çima hûnê hinekê bi ser wijdana xwe de neçin û rastiyan nebînin? Vêca ger rewş wisa ye, ewlekariya jiyana we çiye? Hûnê niha yekser vê bêjin; “Me ji mêj ve dev ji jiyanê berdaye, tu çiqas dixwazî bêje, em hinekê jî ji bo xatirê te, bi te re dimeşîn û te erê dikin, lê ya rastî me dev ji her tiştî berdaye.” Ev jî aliyek rastiya we ye. Dizanim ku wisa îdîayên we yên mezin nînin. Her wiha di vê xirikbûna we ya dawî de jî li ser bingeha pirsa; “Gelo dibe ku hinek tişt bikevin destê me” de ye. Vaye nexweşiya desthilatiya pêşwext wisa ye.

Di nav PKK'ê de hinek kariyerîst hene. PKK hinekê ber bi dewletbûnê ve diçe. Hûn jî weke; "Gelo dibe hinek tişt bikevin destê me jî" dixirikin. Ango ne ku hûn wate didin cewhera şoreşê û wisa aresteyî xebatan dibin û dimeşin. Rewşa gelek ji we wisa ye. Hinek jî ji ber feraseta namûsa feodal dibêjin; "Ez nikarim veqetim, ji ber ku nasên min ên şehîd hene. Rêbertî heye, me soz daye wî." Ji ber vê jî dixirikin. Sozek daye, ev ji bo wî jî soza namûsek feodalî ye û heta dawî jî diçe. Jixwe hinek jî ne di ferqa kar de ne, rasterast weke birekê dixirikin. Ger şivan biçe, dê gur jî wan bigire. Ew jî li benda vê ne. Lê belê ev hemû şaşin û ne hêjayî milîtaniya PKK'ê ne.

Başe, dê çawa rê li van hemûyan bê girtin? Hêza fikrî ya bilind û xisleta vê, nexasim jî di hunera rêveberiyê de xurtbûnê dixwaze. Ji bilî vê rêyek din nîne û çareyek din jî nehatiye dîtin. Aliyê min ê herî çalek, bûna rêveberek başim. Hestiyariyên rêveberiyê bi min re pir pêşketî ne. Rêveberek pir çalakim. Tişta min bibandor dike, pêdiviya herî ji rêzê jî pêşwazî dikim û bi her karî ve mijûl dibim. Ez nikarim weke we çek bikar bînim û fermandariyê bikim. Rêvebirina karan, ji bo min di asta dildariyê de ye. Xwe gihandina pêwendî û mirovan, ew arestekirin û ew kirina ser rêya rast, ji bo min her tişte. Lê belê ji bo we pêwendî, karên rojane yên rêxistin û rêveberî, karên ku hûn zêde qîmet nadine. Lê di rastiyê de karê ku herî zêde hewce dike hûn hesas nêz bibin, karên rêveberiyê ne. Karên rêveberî, serweriya li ser kar û peywirên me, ew parastin û pêşxistin, hêsan newindakirin û dana şerkirine. Niha ya ku herî zêde ji bo me hewce evin.

Tam jî di vê xalê de dibêjin; "Em bi karên rêveberiyê re eleqedar nabin." Xwe didin quncikekê û cixareya xwe dikişînin. Lê belê ger bikarin hinekê jî baldar lê binêrin, dê bibînin ku karek weke zêrîn heye. Lê van nabînin û fêm nakin. Camêr fêrî cixareyekê bûye, dema tu nîv demjimêrî cixareyê ser qut dikî îsyan dike. Digotin; "Kesê ku di zindanê de bi salan li ber xwe dayî, li hember cixareyekê serî ditewîne." Tu bi salan ewqasî li ber xwe didî, çawa dibe radestî cixareyekî dibî? Vaye ev jî çavkaniya xwe ji çewtbûna mezin a di kesayetê de digire û li çiyan jî ev rewş tên jiyîn. Camêr bi salan li çiyan li ber xwe daye. Peywirek rêveberî ya hêsan heye, lê mixabin hûn bikujin dest navêjiyê. Mînak keyfa wî ji perwerdeyê re naye. Ma mirovek bê perwerde û şervanek bê perwerde dibe? Tişta ku pêwîste bê kirin civîne, plansaziye û li gorî hinek xalên taktîk ên bingehîn çalekîne. Mixabin kesayetên bi vî rengî

qet ber bi wir ve nayên. Tenê dema weke bînewerên di quncikekê de tengaviyê re rûbirû dimînin, dibin şerkerên dijwar.

Ev feraseta şer ne raste. Ev feraseta şerê îsyanên paşverû, heta şerên êl û binemalên paşketî ne. Şerên nûjen ên roja me yan jî şerên gel ên pêşketî vê napejirînin. Bi salane kes nabêje, ev şêwaz paşketî ye, encamê nade. Dîsa fikra wî nîne. Tam jî di vê xalê de dibêje; "Dev ji me berde, em bimirin jî bila bimirin." Dema em dibêjin nemirin, hinekê bijîn, derfetên jiyanê hene, dibêjin; "Na, berde, em dixwazin bimirin." Jixwe hemû mirin jî di encama wê feraseta dibêje; "Bihêlin weke me fêm kirî bijîn, şer bikin û bimirin" çavkaniya xwe digirin û pêş dikevin. Ez dibêjim, em wisa nekin. Ger hinek din jî li ber xwe nedim, dê hûn tev wisa bimirin, biçin. Ji nav we rewşa yên herî bi şeref û baş jî wisa ye.

Rêjeyek we ya mezin jî di rewşa ji rastiya xwe revê de dijî û bi xwe re nakoke. Ger hûn bi vî şêwazî berdewam bikin, hûnê winda bikin. Ji ber ku kêm-zêde we li ber xwe daye û hêjî li ber xwe didin. Di encama vê ya xwezayî de berxwedaniyê bi zanebûn û weke pêdiviya wê ya jêneveger bi hêza xwe ya rêveberiyê ve di şêwazek rast de têbigihin û bimeşînin. Xwe ji vê nedin paş. Ger we heta niha ev nekiribe jî, pêwîste ev we bê serfiraz neke. Em dîsa efû dikin. Ji vir û şûn de bikin. Ev ne şerme. Ez jî di vî temenê xwe de me, lê dîsa her roj weke zarokan fêr dibim. Pêwîste em di mijara karên xwe yên pîroz de dilnizm bin. Hewce dike mirov her roj tiştên nû fêr bibe. Em nebesiyên xwe yên rabirdo nekin mijara serbilindiyê. Hewce dike hûn hemû bibin şagirtên ku baş li pêşerojê dinêrin.

Hûn nû fêrî polîtîkayê dibin û bi vê serbilind bin. Hêza burjuvazî, ji ber karê xwe baş birêve dibe ye. Weke tê zanîn ew kar nakin, heta gelek ji wan kurtêlxwarin, lê hêza wan a rêveberî pir başe. Mînak niha saziyên xwe yên rêveberiya bîrdozî, leşkeri, aborî û civakî pêş xistine. Rêbazên kedxwariya hemû jêderên sererd û binerdên welat û hemû keda mirovan pêş dixin. Di rewşek bela serî de ne, lê dîsa jî birêve dibin. Ji ber ku hostatiya wan a rêvebirinê heye û otorîte jî hêjayî xwe dibînin. Dizanin hostatî û mejiyê rêveberiyê bi bîrdoziyên xwe dabigirin. Derew weke rastiya esasî bi we dane pejirandin. Berjewendiyên xwe, weke berjewendiyên we yên cewherî dane bawerkirin û serkêşên me ne.

Bal bidinê: Hezarî salane em kar dikin, helak dibin, di nava xwîn û xwêdanê de ne. Lê dîsa jî birçîne û di sir û seqemê de diqerisin. Ji ber ku em nikarin bibin hêza rêveberiyê. Dema xwe bigihînin asta çîn û netewa

xwe birêve dibe, dê bê dîtin ku her tişt pir cuda ye. Mezinbûna rêveberiyê jî di vir de ye. Çînek qet kar nake, kurtêlxware, lê belê her tişta ku tê hilberîn jî digire. Xwediyê hemû keda çînekê ye, lê bersiva keda wan jî ne tişteke. Ji ber dîsa nikare xwe birêve bibe. Lewra burjuvazî xwe pir baş perwerde dike. Dibistan, zanîngeh, akademî, îdeolog, feylesof û siyasetmedarên wan ên binavûdeng hene. Lê ya me tenê dibistana me heye, mixabin hûn li wir jî ji fêrbûnê direvin. Hûn nikarin rewşa heyî bi vî halê xwe rizgar bikin. Ya ku li benda we, rêveberiya dijmin a yekser an jî neyeksere. Hûn bê rêveberiyê yan jî di bin navê rêveberiyê de çewtbûnek wisa li ser xwe ferz dikin, min pratîka we tevan dît. Di rêveberiyê de dînîtî, di rêveberiyê de valederxistin û di rêveberyê de ne ti tiştbûn derketiye holê. Ev helwest ji dijmin re dibêje; "Were bibe serdest." Ev jî sîxurtiya dijmin a objektîfe.

Hûn çawa ji rewşên diqewimin bandor nabin? Şaşwaz dibim. Hûn çawa van rewşan nabînin? Hûn dibêjin ku em di nava rêxistinê de tên çewsandin. Ez bi salane şerê vê dimeşînim. Kî we çewsand? Kî di mijara nebûna rêveberî û nebûna navendbûnê de ferzkariyê dike? Ger kesek wisa heye, kî dibe bila be ew sîxure û pêwîste wî bi erde re bikin yek. Ma em her roj vê fermanê nadin? Lê hûn dibêjin; "Me lihev kir û hatim çewsandin." Çi ferqa vê ji pîremêrtiyê heye? Kanî milîtanî, kanî feraseta rêveberiya rast? Hûn dibêjin; "Hêza min têrê nekir, min serê xwe neşixuland." Nexwe çi karê te di nava rêxistinê de heye? Dema em dipirsin kanî qural, kanî maf, raye û peywir, hûn diyar dikin ku li ser van jî nehizirîne. Nexwe hûn çima weke belengazê gêrîla vale maye aware digerin? Hûn çawa vê hêjayî xwe dibînin?

Hûn dibêjin; "Min PKK wisa dinasiya, di kesayetan de nas dikir, wisa fêrî min kirin." Van ji kur derdixin? Ev hemû derewin û xwe bi xwe xapandine. Ma ez van wisa ji we re vedibêjim? Gelo weke we di nava PKK'ê de dijîm? Her tişt vekiriye, lê mixabin dîsa jî nabînin û naxwazin fêm bikin. Mirov xwe dispêre paşverûtiyê, lê ma evqasî xwe dispêre? Nexwe emê çi ji we bikin? Ger hûn nezanin di rêya rêgezên rêxistinê yên pîroz de şer bikin, hûn kêrî çi tên? Hûn nikarin xwe jî biparêzin. Ma keyfa we ji vê re tê? Ya rastî şerê rêgezan, peywira milîtan a herî bingehîne. Şerê ji bo raye û peywiran her tişte. Ger em nekarin heta dawî rêgezan biparêzin, dê bi zanebûn rêxistin ji nav destê we biçe, emê bibin qurbanê hinek şaşiyan û emê nekarin xwe jî bidin axaftin. Ev xwe terkî bêserfirazî, belengazî û bêçaretiyê kirine.

Berxwedaniya bêtebatî hûn raber dikin, di şêweya; "Çima ev tişta keyfa min jê re nayê li ser min ferz dikin? Ezê jî kar weke xwe bihêlim, li kur zirave bila ji wir biqete" de diyar dibe. Dê ev helwest zêdetir zerar û ziyanê bide me. Ji ber ku ev jî helwestek şaşe. Karên rêxistinê jixweber nayên hiştin. Her tim hewce dibîne ku hesab bipirse. Rêbertî jî eve. Pêwîste ev bê dîtin. Ma em li vir her roj şerê çi dimeşînin? Ger jiyana rêxistinê, rastiya rêxistinê û şerê vê nebe, rêxistin dikare li ser piyan bimîne? Şerê bîrdozî, ji hêlekê ve çîmentoya ku van bloka bi heve girê dide ye. Jixwe mirovê me, blokên rizî ne. Pêşiya wan du metreyan pifî bikinê, dê hemû hinge-ding birûxe. Yekîneyên we hinekê jî vê tîne bîra min. Ger çîmento nebe, ev dîwar dikare li ser piyan bimîne? Bê bîrdozî bûyîn, tê wateya nikare xwe li hember bayê herî tund bigire. Jixwe em bi êrîşên dijwar re rûbirû ne. Her wiha şerê nav rêxistinê jî wisa ye. Di nava rêxistinê de bê bîrdozî mayîn, weke ji blokên rizî dîwarek saxlem hêvîkirine. Bê polîtîka bûyîn jî, tê wateya korbûnê. Gelo aqilê we vê dipejirîne?

Polîtîka hunera dîtinê ye, polîtîka dîtina xeternakiyê ye. Polîtîka dîtina derfetên bi hêza rêxistinê tên afirandine. Nepolîtîkbûn, dijmin jî, derfet jî nedîtine. Ger korek li ser mar jî bigere tiştekê ferq dike? Ger korek, li ser zêr jî bigere tiştekê ferq dike? Vaye rewşa hûn dijîn jî wisa ye. Gelo çima hûn di rewşek kembax de tên kuştin? Çima demên dîrokî yên weke zêrîn ji dest we çûn? Ji ber çi ev koraniya siyasî heye? Ev rewşa hûn dibêjin nebûna siyasî çiye? Çima gelê me nebû hêzek polîtîk û dema nabe jî bi rewşek çawa re rûbirû ma? Miletê me, miletê cîhanê yê herî kole ye, tiştek di dest de nîne, navê wî jî qedexe ye. Ji ber bêpolîtîkbûnê, nikare xwedî li tiştek xwe derbikeve. Hûn hêjî dibêjin; "Ez di nava rêxistinê de polîtîk nebûm, min nekarî şerê polîtîk bimeşînim." Nexwe çi ferqa we ji rastiya miletê me yê kole heye?

Hinek axayên hevkar ên bê esil hene; hebûna wan a di nava gel de çibe, gelo rewşa fermandar an jî rêveberên me jî –yên ne wisa ne di nav de- vê nayîne bîra me? Gelo fermandar, rêveberî û navenda ku nikare bi bandor be û quralan bide pêkanîn kîne? Kiye refên me ji xeternakiyê re vekirî dihêle, heta neyekser hevkariyê dike yan jî direve? Elbet xayînê li nav civakê ye, axa ye û heta dijmin bi xwe ye. Di nava rêxistinê de nebûna polîtîk, bi bîrdozî nebûn yekser an jî neyekser pêwendiya xwe bi dijmin re wisa ye. Bi qasî dixwazin bêjin ku; "Min çavên xwe girt, zêde pêwîstiya hizirandinê nabînim." Lê belê rastî rastîne û rastî jî efû nakin.

Dixwazim vê bêjim: Hûnê ji pêşketina bîrdozî û polîtîk a di cureya bê wate, nexasim ji navendbûna şaş re bêjin raweste. Di mijara bûna qadroyek rêveberî û pêşiya vê vekirinê de dev ji berxwedaniya hûn raber dikin berdin. Qet nebe bi qasî bersivê bide politikaya partiya me, bizanin bibin hêza bîrdozî û hêza rêveberiyê. Ji bo vê jî lêhûr bibin û xwe bidin şerkirin. Ne şerme mirov paşketî be. Tişta ku şerim dibînim, xala xwe nepêşxistinê ye. Ez ji we tevan paşketîtir bûm. Lê belê şêwaza min a xwe pêşxistinê heye û bi rastî jî pir hesase.

Em ji we re nabêjin ji nişkê ve û di rojekê de bibin rêveberek mezin. Wextê xwe vale derbas nekin, ango bi wext û derfetan nelîzin. Ez hêjî her roj ji her kesî tiştekê fêr dibim. Nexasim dema bi hinek kesên siyasetmedarên bi ezmûn re rûbirû têm, teqez hinek tişt fêr dibim. Bal bidinê, di vê mijarê de şagirtek başim. Kesek wisa me, min zanî ku rêzdariya hemû mamosteyên xwe bidest bixim. Ew pir baş dizanin ku, şagirtek pir baş bûm. Ez bi vê tenê şagirtiya xwe ya dibistanê bibîr naxim. Di mijara têkoşîna polîtîk de jî şagirtek pir baş û hem jî awarte me. Ger di vê cîhanê de li hemberî min rêzdariyek heye, ev jî girêdana xwe bi şagirtbûna min a baş ve heye. Sedema ku bandor li ser wan dikim, fêm dikim ku dixwazin çi bêjine. Lê belê di heman demê de fêr dikim. Jixwe tê dîtin ku em çawa fêrî cîhanê dikin.

Fêrbûna van girînge, mirov tenê dikare bi van ser bixe. Ez ji fêrbûn û fêrkirinê bêzar nabim. Fêr dibim û fêr dikim. Gelek tiştên we jî hûn fêr bibin û fêr bikin hene. Hûnê çima xwe ji vê bidin paş? Ma hûn ne fermandarin? Hûn wisa pir ne li pey berjiwendiyane jî, ya rastî zêde ketîbûna we jî nîne. Lê belê nexasim di hinek mijarên hesas ên weke rêveberî û quralan de hûn nikarin xwe rast binirxînin, bikar bînin û bidin şerkirin. We di vê mijarê de xwe terkî nezantiyek mezin kiriye û hinek fêrbûnên we yên paşketî hene. Tenê ji bo hûn navbera xwe û ehpabên xwe xirab nekin, gelek rêgezên bingehîn ji çav derdixin. Ji bo xweşbêjiya we ya bi kesekê re xirab nebe, hema bêje hûn partiyê ji dest diberdin. Ev paşverûtiyên civakî yên kevnin û me jî ber bi ti derî ve nabin. Ya rastî hewce dikir me quwetek mezin şerê rêgez û şerê qural meşandiba. Ez hemû hêza xwe di nava rêxistinê de ji wêrekiya şerkirinê digirim. Ger min ev kar paşçav xistiba, dê ji mêj ve PKK jî weke rêxistinên din bûna yan jî di rewşek ji ya wan kembaxtir de bûya. Meşandina şerê rêxistinê, niha sedema herî bingehîn a hêzbûna me ye.

Ger hûn jî hinekê alîkar bûna, we jî hinekê şerê nav rêxistinê, şerê rêgezan û şerê quralan meşandiba, emê gihaban serkeftinê.

Esasên rêziknameyê hene, di rêziknameyan de herî zêde çar-pênc quralên bingehîn hene. Ya rastî pirsgirêk ne zanîna esasên rêziknameyê ne, pirsgirêk nebikaranîna wane. Ger we nîvê esasên rêziknameyê bikar baniya, dê niha kar pir cudabûna. Bernameya partiyê heye. Ger hûn baldarbûna têkoşînê hinekê li ser bingeha bernameyê bimeşînin, we bername ferz kiriba, dê kar cudabûna. Ji ber ku nêzîkbûnên we yên bernameyê jî serûbin dikin hene. Dîsa siyaseta partiyê heye, taktîkên partiyê yên bingehîn hene. Ger hûn di van mijaran de hesas bûna, dê rewşek pir cudabûna. Ev hemû bi xurtbûna bîrdozî û polîtîk, rast nûnertiya hêza Rêbertî pêkanînê ve girêdayî ne. Ev jî raveyek cewherî ya jiyana şoreşgerî ye. Rêya serkeftina jiyana şoreşgerî û xwezayî şerê wê ye.

Di mijara navendbûnek saxlem de, dema me behsa pêwîste hemû milîtanên partiyê çawa nêzî peywirên xwe bibin kir, ji bo di her astê de xwe gihandina rêveberiyek partiyê ya rast, nexasim di artêş û qadên jiyanê yên din de – di enî, çand, aboriyê de- bûna hêmanên rêveberiyek saxlem, pêwîste nêzîkbûnên rast bên pêşxistin. Kar pirin, lê dema li endamên partiyê dinêrim, weke ku zêde karên wan tine ye, xwe bi xwe tengav dikin, bi şervantiyek bê îdîa û jixweber ve dihizirin ku encamê bigirin û wisa dinêrin. Hûnê dev ji vê helwestê berdin. Heta ku em giraniyê nedin peywirên navendbûnê, em nikarin bibin PKK'yî. Ji jêr ve tengavkirinê ve –ji ber ji jor ve ez tengav dikim- dê navend bizanibe, bibe navend. Bi salan jî dirêj bike, heta ku ev pêk neye, bila ti kes serkeftinek PKK'ê ya saxlem hêvî neke. Dîsa dê qadroyên PKK'ê, bizanibin bibin hêza rêveberiyê. Her qadroyê PKK'ê, heta endamên wê, dema nezane li gorî xwe di nava peywirekê de bibe hêza rêveberiyê, dê bizane ku ev ne PKK'yîbûnek saxleme. PKK'yîbûnek saxlem bê pejirandin, peywira ku di her astê de hatî dayîn çiye, di wê mijarê de ya hewce hêjayî bicîhanînê ye, nûnertiya wê kirin û heta dawî bûna hêza rêveberiyê sazkirine. Pêwîste em PKK'yîbûnê hevgirtî bi temamî wisa fêm bikin. PKK ne ji hinek aliyan ve, her alî ve, ne bi nêzîkbûna ji hinek peywiran re, bi nêzîkbûna navendek bersivê dide hemû peywiran ve bigirin dest.

Navenda PKK'ê, saziyek ku ji pirsgirêkên şer heta pirsgirêkên aborî, ji pirsgirêkên çandî heta pirsgirêkên aştî wate dide her pirsgirêkê, xwedî

hêza nirxandinê ye, hêza biryarê û xwedî hêza venêrînê ye. Dîsa ji hemû pirsgirêkên tevlîheviya jiyanê –ji ber em netewekî ji nû ve ava dikin, ji jêr heta jor civakekê ji nû ve ava dikin- ku weke peywirekê daniye pêşiya we, pêwîstî bi astek qadroyên pir xurt, hêza xwe ya bîrdozî, siyasî û rêxistinî pêş xistî û lêhûrbûyî yên milîtanên ku pir bihêz bersivê bide heye. Heta ku ev ast neyê girtin, pêwîste kes di nava PKK'ê de behsa milîtaniyek saxlem neke.

Rêbertî jî bi temamî di vê rewşê de ye. Yekser vê jî lê zêde bikim, peywirên navend û rêveberiya qadro yên nayên pêkanîn, dihêle ku pir awarte bi ser rastiya rêbertiyê de biçim. Ango niha ez hem rasterast rêbertiya fermî ya PKK'ê dikim, hem jî peywira navendê dimeşînim. Dîsa peywira bi hezaran qadroyan ez bicîh tînim. Hûnê vê fêm bikin. Ango ya we fêlbaziyek gundîtî ya ji rêzê ye. Hûn bi mizmizê peywirê tavêjin ser milê Rêbertiyê. Navenda me her cure karên dîrokî datîne aliyekê, karê xwe jî tavêje ser milê min. Ev ne helwestên girêdayî rêhevaltiyê ne. Her wiha soza ku min dayî xwe heye. Elbet ez dikarim di vê dema dîrokî de li hember gel hem peywira navendê, hem jî hemû PKK'ê rabigirim. Jixwe ji destpêkê ve dimeşînim. Lê mirov dixwaze ristek we jî hebe. Bila kesayetek we ya wisa hêjayî mohra xwe li dîrokê dayî hebe. Pêwîste hûn bikarin bêjin; "Ez jî xwedî tevkariyekê me, ez jî dikarim karên bixêr bi berpirsyariyek mezin bikim." Hûn çima ji vê direvin?

Vêca em ji karên xweşik re bêjin xweşike, ji karên saxlem re bêjin saxleme. Dema karên wisa ji we tê xwestin çima zora we diçe û ji min dixeyîdin? Hûn mirovê peywirê ne û jixwe we jiyana xwe jî feda kiriye. Çima hûn rêya vê ya herî saxlem naceribînin? Çima hûn di vê mijarê de rê didin her cure jirêderketinê? Ma ev şerefê bi we dide bidestxistin? Heta gelo derfetê jiyanek rêzdar dide we? Na, berovajî mehkum dike û we tengav dike. Lewra hewce dike hûn vê bêwatebûnê û rewşa ne hêjayî we biterikînin. Hem jî bêku ti hêcetî diyar bikin, bêku bêjin ev an jî ew xisleta min an jî fêrbûna mine, biterikînin. Rewşa ku ne hêjayî we eve. Ji ber kêm-zêde rewşek we ya li ber xwe dayînê heye. Hêza we ya fedekarî û wêrekiyek pir bilind heye. Li hember vê rêzdar bin. Hewcedariyên vê jî, bi şerê nav partî yê rast û hêza wê ya rêveberiyê ve pêk bînin. Ya herî watedar jî, hewl bidin wê bi lez di nava refên artêşê de –pir erkên we hene, weke daxwazkarên van tevan- biselmînin. Hûnê di vir de mezinbûnê bidest bixin. Hûnê kesayeta xwe ya rasteqîn jî li ser

vî bingehî peyda bikin. Bi tîbûnek kûr ve, êrîşî vê bikin. Ji ber dibe ku zanebûna we ji vê re destdayî be. Bes di vê mijarê de, wê bêberpirsyariya nav rêxistinê we xwe bi xwe heta niha kirî, nebesiyên xwe yên di xalên qural û taktîk de, -em ji vê re jî nebêjin nebesî-bêwatedarî û çewtbûnan nejîn. Ger vê bikin, hûn dikarin bi hewldanên xwe ve bi şêweyek hîn xurtir xwe bigihînin rewşek berhemdar.

Hûn nizanin enerjiya xwe rast bikar bînin. Pêwîste ev bê sererastkirin. Xalên destnîşan dikim, ne ji bo hîn zêdetir barê we giran bikime, berovajî ji bo sivikirina barê we ye. Hewl didim jiyanê hîn zêdetir balkêş bikim û hewldanên we kirine bigihînim derfetek ku hûn bikarin zêdetir berhem bigirin. Di encama vê berxwedaniya we ya mezin de, ji bo serkeftinên we yên bilind pêş bikevin, ji ber ku mafê we nîne hûn evqasî xirabiyê li xwe bikin, van jidil vedibêjim. Pêwîste mirov bi xwe evqasî zerar nede xwe û xwe evqasî bê wate neke. Ji ber ku jiyana hûn dijîn û şerê dimeşînin pir girînge. Ger hûn wê evqasî bê armanc û bê berhemdar bikin, hûnê xirabiya herî mezin li xwe bikin.

Teqez hewce dike hûn van xalên diyar dikim fêm bikin. Ne tenê fêmkirin, berdêla wê çi dibe bila be, astengî ji kur tên bila be –ez jî di navê de-, hewce dike hûn pêdiviyên wê pêk bînin. Pêwîste hûn li hember van astengiyan a di xeta xwe de hatiye diyarkirin û rastiyên ku serkeftinên wan misoger bûne hemêz bikin. Em dikarin li ser vî bingehî vî şerî pêş bixin û xwe ji van bêwatebûnan rizgar bikin. Her ku em bikarin xwe rizgar bikin, emê ewqasî serkeftî bin. Milîtaniya partî ya dikeve rêya serkeftinê, dê misoger serkeftinê bidest bixe.

**23 Çile 1996**

## PARTÎBÛN BI KESAYETA BIRYARDARIYA BILIND JIYÎNE

Hewce dike di rastiya we ya jiyanê, xeyal û hizra we de, hêvî û pêşketinên nû xwe bidin der. Pêwîste xebatên berfireh ên em dimeşînin jî, herî kêm bi qasî rastiya şerê dijwar raveya xwe ya perwerdekar bidest bixe. Hewce dike hem xet, hem jî asta wê ya pêkanê bersivek xwe ya dewlemend bidest bixe. Ji aliye we ve hilweşandina vê kesayeta xwe nixumandî, ji gelek aliyan ve xapandî, hesabê wê dayîn û bi erdê re kirina yek û xwe gihandina kesayetek alternatîfa wan hewce dike. Pêwîste hûn wê jiyana pir bi êş û giran jiyan kirî, li ser vî bingehî bigihînin tendirustiyê. Di vê mijarê de bûna xwediyê raveyek wêrek, hêza xwe bi pîvanan dana jiyînê raberkirin, êdî xwe ji xapandin û hatina xapandinê rizgarkirin, qet nebe xwe bi qanekirinê domdar û watedarkirin, hêza bi wê ve girêdayî mayînê raberkirin, hewce dike di hemû jiyana we de xwe bi şêweyek balkêş bide hesandin.

Em ji bîr nekin, xirabiya herî xirab ku kesek li xwe bike yan jî weke gel xirabiya herî mezin me li xwe kirî, rewşa xisletek pir vekirî ya hatî xapandin, hatî şehitandin, nekarî xwe biparêze û pêş bixe nixumandine. Êdî divê hûn vê rewşa xwe ya nixumandinê hilweşînin û pir vekirî jî vê raber bikin. Hêza bi vê re şerkirinê nediyarkirin û ji bo jîndarkirina vê serî li hezar dek û derewî dayîn, ne jidilbûn, bi xwe re hesabxwestinek heqîqî nekirine. Ger hûnê behsa kesayetek partiyê bikin û bibin xwedî îdîayek partîbûnek rasteqîn, hûnê pêşî vê rewşa xwe çareser bikin. Ji ber ku weke hêza qadroyên pêşeng, pirsgirêkên ku hûn rê jê re vedikin pir berfirehin.

Ger hêjî hûn nikarin wêrekiya ku asta vê pirsgirêkê ji xwe bipirsin raber bikin, ev dibe rêya herî xeternak a reva ji partîbûnê. Şaşî avêtina ser hinek din, xwe di nava siviktî û cîhana xwe ya navxweyî de –jixwe cîhana hundurîn jî nîne, xweziya hebûya- veşartin, ango xwe di tarîtiyan de windakirin û nixumandin, şaşî û kêmasî dîtin lê lêpirsîna wê nekirin û bêku bi xwe re şer bike jiyîn hizirîn, tevî vê rewşê gotina ez hêjî dijîm kirin, ya rastî dibe windakirin, bêberpirsyariya vê, her cure bêwatedarî û durûtiya wê bi xwe. Li hember peywirên wisa bingehîn hêjî ji ya xwe nehatina xwarê, hêjî xwe wisa parastin, tê wateya bi israr jiyîna kesayeta bêare, bêpîvane, bêrêze û bi israr kesayeta serserî, bêserûber û

bêberpirsyar ferzkirine. Mirovê ku xwe li hember kêmasî û peywirên binkeftî yên pir vekirî nedahûrîne –nexasim li vir a mijara gotinê partiyek şoreşê ya pir cidî be, heta artêşa wê be- niyaz û hewldana wê çi dibe bila be, di karên esasî de nekêrhatî be, ew kesek pir xetere.

Hewce nake rastî li cihên dûr bê gerîn. Hewce dike hûn rastiyan di nava xwe de bigerin. Ger hûnê tiştekê bikin, dîsa vê bi xwe re ava bikin. Ger hûnê nekin, bi çep û rast tengavkirinê, rê ji rewşên xirab re vekirinê ve xwe û derdora xwe jî helak nekin. Êdî divê hûn bizanin dev ji vê bêrûtî û bêberpirsyariyê berdin. Dema we karî karekê rast bikin, wijdana wê bigirin û dîsa wê di pîvanên tên fêmkirin de raber bikin, pileyekê hêjayî xwe bibînin ku, bila wijdanê we rehet be. Nexwe dê hûnê li hember xirabûn û windabûna nirxên pir mezin xwe bispêrin çend hêcetên sexte û dê derbikeve holê ku hûn çiqas kesek bê şerefin. Pêwîste di vê mijarê de rê ji xisletên kesayetên nixumandî re neyê dayîn.

Niha xala ku em ji nan û avê jî zêdetir hewce dibînin, rastiya kesayeta wêrek û azad a xwe naxapînê ye. Ev, heta dawî xwe gihandina xisleta kesayeta karkirinek afirînere. Ger hûn vê xisletê bidest nexin, hûnê nekarin bi ti hêceta xwe saxlem binirxînin û nikarin zêde bibin xwedî îdîa jî. Tam jî di vê mijarê de xwe sipartina nirxên partî û hevbeş ve hûn nikarin xwe xilas bikin. Ev berê em ji her cure xwe sipartina darezên nirxên metafizik bigirin, heta kevneşopiyên paşketî, hestên xweperestî, helwestên baviksalarî û xwe veşartinê ve we dikir. Ev nêzîkbûn nabin nêzîkbûnên mirovên ku dixwaze xwe ava bike. Ev nêzîkbûn mirovê bindest, tê rêvebirin, ketî û ji azadiyê qut esas digire, elbet ev jî bi kesayeta azadiyê û kesayeta partiyê re bi nakoke.

Li gorî min hêjî we xwe qane nekiriye. Beriya qanekirin û pêşxistina miletek, partiyek û endamek partiyê, têr û tijî xwe qane bikin û di vê mijarê de bi xwe re hesabxwestina xwe durist bikin. Êdî em dawî li ketin û derketinên şaş ên di mijara kesayetên we de bînin. Piştî evqas rewşên qewimîn, hewce dike hûn xwe qane bikin û biryarbûna xwe pêk bînin. Êdî divê kêm-zêde hûn wate bidin hemû pîvanan. Pîvanên vê yên rêxistinê, pîvanên jiyanê, pîvanên şer û pîvanên uslup hene. Pîvanên vê yên stratejik, taktîk û siyasî hene. Êdî divê hûn wate bidin van. Êdî divê hûn rastiya sererast nabe û ji rê derdixe di siyasete de nedin jiyîn. Yeqîn dikim hûn gihane hêza xwe lêpirsînê yan jî pratîk û pêşketinên we yên ku vê hêzê bigire hene. Bêtirs lêpirsîna xwe bikin. Dema we ev kir, em dikarin yên tawanên giran jî kirine rast bikin. Tişta ku li cem me nayê

efûkirin, dema firsend dibîne kesayeta xwe bi israr perwerde nekirî û sererast nekerî cardin bi nexweşiyê neyênî berdewamkirine.

Di vê xalê de ji bo ya hewceye bêjiyîn bijîn, divê em bi quralê ku pêwîste ev neyên jiyîn ve girêdayî bimînin. Encama ku pêwîste em ji vê derbixin, aliyên xwe yên divê neyên jiyîn, em li gorî aliyên bên jiyîn binirxînin û hêza li pêş aliyên me yên pêwîste bên jiyîn astengbûnê derxistinê jî raberkirine. Gelo hûn di kes û xisletên ku nirxên jiyînê gengaz dike vale derdixin û van nirxan dirizînin, heta di hinek xislet û aliyên xwe de wêrekiya hilweşandinê, hêza hilweşandinê, vîna hilweşandinê û hewldanên hilweşandinê raber dikin? Ma hûn di vê derbarê de jidilin? Gelo hûn li ser vî bingehî rastbûnek nû heq dikin? Ger hûn pir vekirî dikarin vê bikin, divê em aliyên we yên pêwîstin bijîn hîn zêdetir veguherînin bihêz bikarin bijîn. Nexwe em nikarin we di vê rewşê de bigirin. Encama herî girîng ku pêwîste bê derxistin jî eve. Ger hûn nikarin jiyanê pêş bixin, xwe bigihînin danasînên wê yên pir vekirî û hêmanên wê, pêwîste ev qanûn bê bikaranîn. Ev qanûn, di rêya yên hewce dike bên jiyîn de, cezakirina yên pêwîste neyên jiyînin. Em vê çiqasî di ronahiya vî fikrî û nirxandinê de dikin û çiqas li ser dihizirin? Ya ku hewce ye bê jiyîn çiye, ya ku hewce ye neyê jiyîn çiye? Ev pir girînge. Bi we re jî ev xislet pir rûbirû ne. Hinde aliyên we jî yên pêwîste neyên jiyîn hene, bi salane hûn li ser nirxên me yên pêwîste bên jiyîn didin êrîşkirin. Vaye şerê ku hûn hinekê ferz dikin jî wisa ye.

Êdî dev ji vî şerê bê wate berdin. Bingehên vê pir kûrin. Di navê de ji zemîna ku dijmin pêşkêş dike, heta bêberpirsyar li ser vê mezinbûna we, xwedî bingehek pir kûre. Her wiha hûn qet nikarin hêza xwedî li nirxên xwe yên jiyanî derdikeve raber bikin, ji bo şerê bi vê re jî, di hinek fedekarî raberkirinê de rewşek binkeftinê mijara gotinê ye. Êdî hûnê di vê mijarê de fêhma bin.

Aliyên we yên pêwîste neyên jiyîn û li pêş jiyanê asteng hene. Heta hûn van xisletên xwe derbas nekin, em nikarin destûrê bidin hûn tevlî jiyanê bibin. Em ne dikarin milet, ne partî û ne jî misqalek nirxê xwe radestî we bikin. Heta em nikarin we jî ku me hûn bi navê partiyê bidest xistine, radestî we bikin. Qadrobûna rasteqîn wisa saz dibe. Êdî piştî vê qonaxê, hedar û sebra min ji we re nîne. Kesê xwe rast ava neke, jiyana xwe rast neke, ezê çi jê bikim? Ger ferdperestiyek we heye bila ew jî ya we be, bila cihê wê di nava partiya me de nebe.

Dema li pratîka we dinêrim, hestên min ên îsyanê bi şêweya çima wisa kirin mezin dibin. Kî bigirim dest, her tim dibêjim çima ev ewqas ne aqilmend bû, çima karê hewce dikir bê kirin nedît, çima xwe bi rêkûpêk ji bo kêrhatinê amade nekir. Pirsên ku niha herî zêde ji xwe dikim, pirsên divê çi ji van bê kirin, pêwîste çawa bên vesazkirine. Di vê mijarê de bi we re zêde pirsînek wijdanî tine ye. Lê belê bi min re lêpirsîna wijdanî pir dijware. Çavên min pir baş dibînin, pir baş hîs dikim, hem jî ji bo şaşiyên ku dibînim û hîs dikim derbas bikim, şerek baş û dînîtî dimeşînim. Niha li we dinêrim: Kanî çav, kanî hîs û kanî şer? Ger hûn hinek din dervî kontrolê bimînin, bêfihêt û acizî ti xirabiya ku hûn li xwe nekin nîne. Belengazî û bêçaretî jî xirabûne û ger wisa bidome, hûnê tevan raber bikin. Mirinên ne di cîh de, hemû şêwaza jiyanên ne di cîh de xirabî ne. Hûnê van tevan bijîn, lê dema dor tê jiyanek bêhempa û şerê wê, hûnê ji holê winda bibin. Egîdî ne eve. Ev reve û nemerdiye.

Kî xwedî soz û çalekiyek bibandore? Vê pir dipirsim. Kîye nûnertiya vê hîsa hêza mezin dike, sekna wê û dema hewce dike dibe şopdarê vê yê dijwar û fermanda wê dimeşîne? Vêca ji xwe bipirsin; hûn kengê wisa rawestiyan, we kengê wisa hîs kir û dît? Ma çewtbûn çêbû? Ma nemeşîn çêbû? Gelo we ferman pêk anîn? Ev ji bo milîtanekê esasin. Heta ku ev helwest û sekin neyên bidestxistin, nasnameya PKK’ê hêjayî xwe nebînin û êdî xwe nespêrin hêcetên vê. Ji ber ku hûn ne zarokin. Nexasim bi mizmizê tiştên we nekirine ji pîremêrekî kembaxtir di şêwazekî de neparêzin. Hûn rast nabin, mezin nabin, her wiha nikarin wate bidin dildariyekê jî. Nikarin gav ber bi peyvek xweşik û jiyanek xweşik ve bavêjin. De başe, hûn çawa xwe wisa rehet dipejirînin?

Ji kêliya xwe nas dikim heta niha peyvek min a bibandor, dîsa gavek ku davêjim heta ku encamên wê yên balkêş nebin, nabêjim ez jiyame. Ne carekê, ger hemû gavên min ne wisa bin, bêhedar û bêtebatim. Niha li we dinêrim. Kanî peyvek bibandor, kanî gavên bibandor li kur man? Berovajî, yê dikare dixapîne, yê dikare kirêt dike, yê dikare bêrêziyê dike. Çend kesî helwesta ku li xweşî çav, hîs û fikir diçe, bibandor raber kiriye yan jî di vê mijarê de çiqasî wate didin xwe? Li hemberî yên min destnîşan kirine hûn, weke kulma li çavek kor bixin helwestên weke; “Li min nenêre, ezê li te bidim” berdewamkirine. Ev reftar ne hêjayî rêhevalekê ne. Liv û tevgerên xwe bipîvin.

Belê, hûn pirsan jî ji xwe nakin. Ma ez neçarim we her cure kirêtiyên we ve bipejirînim? Wê tu gotina bikî, lê belê nediyare tê çi wateyê. Wê tu meşekê bikî, lê di navê de çi dihilweşe, çi dirûxe nediyar be! Vêca ma gengaze ez jî beramberî vê te di nava PKK'ê de weke qadroyek baş silav bikim? Yek xirabî û giliyek ku di derheqê we de nehatî bilêvkirin nîne. We qesta jiyanê kiriye, qesta xwe kiriye û vê jî asayî dibînin. Ya rastî ev rewşek ku, pêwîste pir bi xof bê dîtine.

Ez ji we re vedibêjim ku, şoreşgeriya min çawa destpê kiriye, lê ji ber ku keyfa we jê re naye, qet wate nadin vê. Şoreşgeriya min, li hember her tiştê ku min ne ecibandî, aresteyî helwestekê bû û wisa destpê kir. Her tişta ku jê aciz bûyîm, ji bo min gavek ber bi şoreşgeriyê ve ye. Her tişta min xweş, têr, watedar û serkeftî nedîtî, li cem min bersivekê dibîne û ez wisa dimeşim. Gelo xoy, fêrbûn û plansaziyek we ya wisa heye? Na. Çi tişta ne xweş a bi we re heyî, hûn vê bi israr weke zarokên netebitî, her ku diçe bi ziravkirî berdewamkirinê, bûye şêweya jiyanê.

Sedema ku ji nav vî gelî kesayetên eslî dernakevin eve: Ewladên vî gelî, hemû kirêtiyên xwe, binkeftinên xwe, nefêmkirina nirxên xwe yên pîroz, siyaseta xwe û negirtina nirxên xwe yên rizgarî, ji wan dûrbûnê ji xwe re merîfet dibînin. Dema rewş jî wisa dibe, elbet ew gel ji lenetbûnê rizgar nabe û hûn jî ji rastiya vî gelê bi lenet derdikevin tên. Wexta hûn vê paşçav dikin, tiştekê bidest naxin. Nexasim bi nêzîkbûna; "Partî, şerek û serfiraziye em ketin navê, lewra parve dikin" ve, tişta hûn bikin ancex xwe veşartine û ev jî ne partîbûnek rasteqîne. Çawa ku navê xwe kirina Muhamed ve kes nabe nebî, bi navê xwe kirina Egîd ve jî, tu nikarî bibî **Egîdek** PKK'ê. Ev, evqasî vekiriye. Êdî pêwîste di vê manê de kamilbûnek bê jiyîn. Pir vekirî dibêjim: Ger ezê êdî bi navê PKK'ê û bi navê hemû mezinbûnên PKK'ê vî karî bimeşînim, neçarim ku nêzîkbûnên we yên weke dizekî ketina nava derfetan, nirxên hevbeş desterserkirin yan jî bi wan xwe dana jiyankirina we bi dawî bikim.

Nabe ku nirxên hevbeş terkî însiyatîfa kesî ya yek ji me bê kirin. Hêjî hûn nikarin bûna mîradxwirek xirab wêdetir derbas bikin. Gelo keda hevbeş çiye? Bi rastî jî ev çiqasî keda mirov a lêhûrbûyî ye? Kesê ku van pirsan ji xwe bike nîne. Heta yê ku dikare xwe li ser vê bi nepixandî, bê maf û bê pîvan ferz bike dike û dixwaze ji cihek wê pariyek xwe jê bike yan jî yên ku qet wate nadinê gelek caran tên dîtin. Bi van nêzîkbûnan ve PKK'yîbûn çênabe û hûn pîvanên qadroyên

PKK’ê peyda nakin. Her wiha şerê vê hewce dike. Bûna qadroyek PKK’ê, şerê herî mezin ê nirxan û şerê pêşengan dana meşandine. Lê belê hûn kêleka vê re jî derbas nabin. Lewra ger rewşa we wisa berdewam bike, hûn deh salan jî bijîn, dawiya we karesate. Dê kî çi ji we bike? Ger we di mijara partiyê de hinek tişt fêm kiribin, nexwe divê êdî hûn di vê mijarê de xwe qane bikin.

Li van xisletên ku hûn dijîn dinêrim, hemû jî di cureyên mizmizê de ne. Ne kûranî, ne aso, ne jî biryarek teqez heye. We heta niha xwe xapandiye. Carek din jî hûn dixwazin wisa derbas bikin, lê êdî wextê wê hatiye ku ez misoger ji vê re bêjim rawestin. Wisa derbasî nava partiyê nebin. Heyfa we ye jî. Qet nebê ji vir û pê ve wate bidin cidiyeta partiyê. Ger hêza we têra vê nake, vekirî bêjin. Ji ber her kes nabe milîtanê partiyê. Dibêjin ku; “Pêwîste heqê egîdan bê dayîn.” Em jî yên di nava me de heqê wan heyî bidin û cîh bidinê. Lê ger hûn nikarin vê hêzê raber bikin, dikarin di çarçoveya sempatîzanên ji rêzê yên partiyê de bimînin. Na ger hûnê milîtaniyê û qadrobûnê esas bigirin, pîvanên wê yên pir dijwar hene. Pêncî milîtanên me yên wisa hebin, ji pênc hezar mirovên ji rêzê hêjatirin. Pêwîste em di peydakirina pêncî kesî de bi israr bin, daku bikarin zerara pêncî hezar mirov bidin asteng bikin. Ev peywirek pir girînge. Xweziya çend ji we bikariya vê feraseta peywirê binirxîne, kanî mixabin nîne. Niha pirsgirêka min a herî bingehîn eve: Çend milîtanên wisa aqilmend di nava partiyê de pêşxistin û avakirine.

Bi rastî ji vê durûtî, bêhêzî, rebenî, derewî û bêçaretiya salan bêzar bûm. Nikare karekê bike, xwedî li soza xwe dernakevin. Pir vekirî ji we tevan dipirsim: Çima hûn nikarin giraniyê bidin sozekê? Çima hûn evqasî li hember soza xwe durû ne? Elbet ev rewşa we çavkaniya xwe ji niyeta we ya xirab nagire. Hûn bêhêzin, lê sedemên bêhêziya xwe jî lêkolîn nakin. Çima hûn li ser rêyên bêhêziyên xwe ranawestin? Yan hûn xwe bi usulen eşîrtî davêjin nava partiyê yan jî xwe dispêrin hinek rayeyan û dibêjin ya Xweda hemû kirêtiyên xwe li naverastê belav dikin.

Hûn çawa ji vê rewşa xwe natirsin? Ji bîr nekin, we nekarî di nava partiyê de yek rastiyê bidin jiyîn. Nirxên partiyê yên pir girîng hene. Êdî kezeba me diqete, ji ber ku hûn dişewitin. Evqas nirx çûn, êdî ditirsim lêkolîn bikim ku çiqas nirx winda bûne. Çiqas nirx bi dest dijmin ve berdane û ji ber kêmasiyan çiqas şervanên hêja şehîd ketine? Di encama nepartîbûnê de, evqas nirx hatine xerckirin û windakirin. Kezeba min ji

van ditirse. Lê belê bê wijdanan dinêrim, hesab jî ji xwe napirsin. Elbet ezê li hember vê rewşa we hêrs bibim. Ji ber ku ez hêjî rojane bi neynokan jê dikim û digirim, şer dimeşînim. Kerba min jî di cîh de ye. Ezê çima li hember kesên ku şerê nirxan xurt nadin rêzdar bim? Ezê çawa kesê ku li hember xwe û keda xwe nerêzdar, bi rêzdarî pêşwazî bikim? Hûnê bi vî rengî çawa xwe bipejirînin? Li ber çavên we nirxên mezin winda bûne. Hûn nikarin van înkar bikin, heta dibe ku we bi xwe rê ji van re vekiribe. Hûn nikarin derdorên xwe tawanbar bikin û xwe ji nav xilas bikin.

Pirsgirêkek we pir cidî ya wijdanê heye. Gelo ezê we çawa bi wijdan bikim û çawa bînim asta ku hesabê bidin? Hûn neçarin zêdetirîn bikin. Ji ber ku şoreşger pêşî pêwîste bizane li hemberî wijdana xwe hesabê bide, daku ji pirsên li kur çawa bikim û ji ber çi hewce ye bikim re bersiv û duristbûna wî derbikeve holê. Zêde ti wateya xwe tine ye ku ev bi ferzkirinên min derbikevin holê. Jixwe hewce nake, em van li ber çavên we jî bikin. Ev karek mirovbûnê û bi rastî jî xwe xistina bi ser rêya raste. Vê ne tenê ji bo partî dixwaze, pêwîste ji bo hûn dixwazin bikin. Heta dibe ku partî nebîne, nexwaze, lê divê ev ji bo we îsyanek wijdanê be. Ma ez wisa nakim? Ma kes tiştekê li ser min ferz dike? Her ku xwe dinasim, kesî tiştek li ser min ferz nekiriye. Her tim min ji bo xwe ya rast xwestiye. Pêwîste dildarî û îsyanek we ya wisa pêş bikeve. Hewce dike hûn bikarin ji xwe bipirsin çima we nekir, çima we neparast û çima we pêş nexist. Niha dema gelek ji we dinêrim, rewşek we ya bi ferdperestiyê re di pêşbaziyê de û li ser nirxan bêmaf teseruf pêşxistinê de bi qasî sînoran nas nekin dibînim.

Pir vekirî bêjim: Ji ber vê min pevçûn û keftûlefta destpêkê jiyan kir. Ji bo dema kesek ne mafê wî be bigire, kesek pêwîste bike û neke, pir kirêt dibînim, min jî li hemberî wan seknek raber kir. Di bîra min de ye, hêj wê demê zarok bûm, min didît yên beramberî min bi xirabiyê çiqas pêşbaziyê dijîn, her ku diçû kirêt dibûn, lewra min xwe ji wan dûr dixist. Min jî xwe bi rêkûpêk kir. Piştî wê jî min heta roja îro ev helwesta xwe domand. Niha fêm dikim ku, hûn weke yên kevinin. Hûn dibin kesên ku min dema zaroktiya xwe de ji bo wan digot çima wisa dikin, çima neheqin, çima kirêtin û çima ne jidilin. Hûn dibin kesayetên wan ên mezin bûne, war guhertine yan jî di dem û warên cuda de dijîne.

Lê belê di rastiya Rêbertiya PKK'ê de rewşa heyî, berovajî vê ye. Niha hûnê bêjin; "Em zêde ne, bila Rêbertî li gorî me be. Divê ev jî bê

nîqaşkirin. Zêdebûna we û ew xisletên weke hestî hişk bûyîn domandina we, gelo têra rizgarkirina we dike? Niha şerê milîtanbûn û Rêberbûna di nava partiyê de, di navbera van herdu rastiyan de ye û ev şer hewce ye. Yeqîn dikim xoyên min başin. Bi pesindanî van nabêjim. Mînak, min ji hemû mamosteyan pileya deh girtibû. Dîsa di karên pratîkî de jî hema hema di her gavê de min pileya jorîn digirt. Ji ber ku li holê serkeftinek hebû. Niha devjêberdin hûn pileyek bilind bigirin, emê çima rê bidin reftar, gotin û karên we yên sifirê jî nagirin, nexasim di nava partiyek weke PKK’ê de ku pêwîste misoger nêzîkbûnek baldar jê re bê kirin? Nêvenga PKK’ê, qadek herî pêşveçûyî, herî bedew, herî rast û herî zêde nirxên jiyanî lê kom dibine. Ev pir vekiriye. Ma emê çima vê qadê bi dejberiya wê ve xirab bikin? Ger bi we re hinekê duristbûn, jidilbûn û girêdana bi nirxan ve hebe, nexwe ji xwe bipirsin we çiqas şerê nirxan meşandiye, heta di nêvenga partiyê de xwe ji hêmanek pir xirab dana diyarkirinê derxistiye. Heta ku hûn van pirsan ji xwe nekin, ji me ferasetekê hêvî nekin.

Niha hûnê bêjin; “Em cidî nagirin, em kesên hişk bûne, hevîrê me wisa ye.” Hûn bi van helwestên xwe ve pir zerarê didin me. Lê belê şerek min jî heye û hêj xilas nebûye. Hêj şerê Rêbertiyê beramberî we serî netewandiye. Rêbertî şerek bêhempa dimeşîne. Beşdarvanên me yên destpêkê, hevalên weke **Heqî, Kemal** û **Xeyrî** hebûn. Wê demê em zêde li ser pîvanên PKK’ê û derfetên şerê PKK’ê nerawestiyabûn. Dîsa jî nayê bîra min ku, wan zêde qusur jiyabin. Elbet di nava PKK’ê de bi hezaran nirxên wisa hene. Ji bo mînak vê destnîşan dikim. Nirxên me yên wisa bê qusur hene. Wan serkeftinên pir mezin bidest nexistin, lê zanîn ji bo partiyê bijîn. Ya rastî ev jî dibe nirxê herî mezin. Ji bo min, mirov bizane ji bo partiyê bijî bese. Bes em niha dinêrin, qaşo bi hezaran PKK’yî hene, ancex tevî partiyê û xêra partiyê, berovajî partiyê dijî û dide jiyîn. Niha emê vê çareser bikin. Ev kîne? Çima ev bi zanebûn, tevî partiyê, heta bi partiyê dana windakirinê ve çavsorî dijîn? Çima me çav ji vê re girt? Çima ev zêde girtin nava xwe? Qet nebe, ger li hember hinek nirxan rêzdariya we hebe, êdî divê hûn hesabê vê bikin. Di nava PKK’ê de, hûn cuda ji bo çi hene? Esasên PKK’ê, xisletên endamtiya PKK’ê cuda tên çi wateyê?

Ger hûnê vê nekin –jixwe we nekir, ji ber ku hûn hemû jî dinivîsin ku çawa pîvanên partiyê xirab kirine- dipirsim: We çima pîvanên partiyê evqas xirab kirin? Ma qet wijdan bi we re tine ye? Ma girêdan bi nirxên

bingehîn ve tine ye? Nexweşiya desthilatiya pêşwext û hinek zehmetî, ma astengin ku hûn xwedî li nirxên partiyê derbikevin? Berovajî, dema zehmetî zêde dibin, derfet zêde dibin, mane hewce dike hîn zêdetir pîvanên partiyê bên esasgirtin? Belê di vir de hewce dike mirov bipirse, çima bi we re lêpirsîna wijdanî nîne? Ma ev nirx, nirxên erzanin?

Evqas şehîd hene. Mînak bixwazim kîjanê bigirim dest, ji xwe dibêjim gelo tiştên ez dikim bersiva van şahadetan dide, em li hemberî wan peywira xwe pêk tînin? Niha şehîdên me deh hezaran derbas dikin, lê mixabin hûn yekê tenê jî ji xwe re nakin pirsgirêk. Nexwe PKK'yîbûna we li kur dimîne? Li şûna vê hûn çi li ser me ferz dikin? Hîn zêdetir raye, hîn zêdetir bi nirxan lîstin, hîn zêdetir ji çarçûrkirina nirxan re çavgirtin, hîn zêdetir hesab nexwestin, hîn zêdetir kariyerîzm, birokratîzm an jî axatî, bi her cure pîvanên dervî partiyê ve xwe xapandin an jî zêde gilî û gazinc kirin, peywirên xwe nedîtin, berovajî neyênî kûrkirin, çav ji neyêniyan re girtin, berpirsyarî nejiyîn, lihevkirin, serî tewandin an jî çewsandin mijara gotinê ye. Elbet li hember van karên hûn dikin ma dê ji we nepirsin; "Kanî evqas nirxên berz hebûn?"

Derket holê ku pîvanên partiyê hêsan dîtin, di rastiyê de xirabiya herî mezin hûn li xwe bikine. Hebûna zehmetiyan, dijwarbûna şer, nade diyarkirin ku pêwîste ji pîvanên partiyê dûrbûn û xirabkirina wan çêbe. Berovajî hewce dike hîn zêdetir pîvan serwer bibin. Şerê mezin ê pîvanan, dema zehmetî zêde dibin, heta ber bi pêvajoya desthilatiyê ve hîn zêdetir esas tên girtin. Dervî partî bûyîn, xirabûna di nava partiyê de, misoger yekser an jî neyekser xizmeta ji dijmin re ye. Hûn çima pir rehetî gotinên weke; "Min pîvanên partiyê xirab kirin, ji xirabûna wê re çavgirt û di nava gerîla de hemû pîvan bi erdê re bûn yek" bikar tînin? Ger hûn wisa bikin, gelo dê rêzdariya we li hemberî we bimîne? Rêzdarî eve: Evqas şehîd hene, evqas êşên me hene, ewqas daxwazên miletê me hene, ewqas ramanên me yên rast hene û xeta me ya siyasî heye. Dema em behsa xirabûnê dikin, ma ev nabe ku hûn van tevan di carekê de winda dikin û bi erdê re dikin yek? Dema hûn dibêjin; "Min serî tewand, me lihev kir", dîsa ma nabe hûn xirabiya herî mezin li van nirxan dikin? Vêca tu kiyî? Ew soza ku te bi egîdî dayî li kur ma? Kanî wê tu di bin her şert û mercî de girêdayî partiyê bima? Bersiva vê sonda te dayî li kur ma?

Dîsa çeka parastina we ya herî mezin gotinên weke; "Min ferdperestî kir, hatim çewsandin an jî min bi jorê xwe re lihev kir." Kanî dê soza we, soza partiyê bûya? Ma di nava sonda we dayî de serî tewandin, dana tewandin hebû? Hûn van tevan ji kur peyda dikin, çima wisa xwe dixapînin? Li wir bêdengiya we heye. Gelo milîtaniya partiyê bêdenge? Dema li ber çavên we evqas nirx tên çarçûrkirin, ma hûnê hinek pirsan ji xwe nekin? Gelo qet wijdana we tine?

Ez hêjî ji bo PKK'ê afirandina hinek nirxan ji bo xwe weke peywir dibînim. Rojane dixwazim hinek karan bikim. Lê dema van karan dikim, dibêjim min hinek nan heq kiriye. Niha hûn a amade jî ji dest diberdin. Mînak, li wan eniyan, li wan çiyan, tevî ku rewşên me yên destanan binivîsin hene, çiqas çek, çiqas şervanên hêja hene, hûn tevê ne di xêra ti tiştî de dest ji dijmin ve berdidin. Kanî wijdan? Kanî rêzdarî û kesê kamilbûyî? Berovajî, vêca xwe dispêrin min hîn zêdetir raye ferz dike, xwe dispêre raye, qaşo dê hêsan dev ji fermandariya xwe jî bernede, xwe hîn zêdetir bike kesek bibandor û rayedar! Ma di nava vê partiyê de qet wisa tê jiyîn? Lê mixabin niha yên herî zêde dijîn jî wisa ne.

Hûn di vê xalê de dibêjin; "Em nabin mirov." Jixwe gotina herî zêde ji devê we derdikeve jî eve. Hûn dibêjin ku, ne hêjayî ne. De başe, gelo hûn hêjayî çine, yên ne hêjayî vê jî çi karê wan di nava partiyê de heye? Li hevalên me yên herî kevin dinêrim, dibêjin; "Em hêjayî nirxan derneketin, me heqê wan neda." De başe, vêca hûn çima dev ji cixareyê bernadin, ma ev jî ne durûtî ye? Dê nirxên herî pîroz ji nedîtî ve bê, lê ji bo cixareyekê jî çil teqleyan bavêje. Ev jî xisleta kesayeta herî xirabe. Hûn dibêjin; "Min bi koranî xwe ferz kir, xwekujer nêz bûm." Ev hîn zêdetir xirabiya mezine. Wisa tevlîbûna rast ji nirxan re wisa nabe.

Vaye dema we bersivên rast dan van pirsan, dê kesayetek rasteqîn a PKK'ê derbikeve holê û ev jî tiştek xweşike. Ev kesayet wisa hêsan têk naçe. Di şahadeta wê de jî serkeftin heye. We jî ev bi zanebûn an jî nezantî, bi xwe yekser an jî ji hinek din bûna amûr ve xirab kir. Ev jî dibe xirabiya herî mezin hûn li xwe dikin. Êdî divê hûn biryar bidin ku, weke kesek partiyi bijîn. Ez ji bilî hûn hinek pîvanên partiyê yên bingehîn ve girêdayî bimînin, tiştek din naxwazim. Weke we heta niha kiriye, li şûna ku bêjin ji ber sedemên cur be cur pîvanên partiyê xirab kirine, xirabiya herî mezin li min bikin dîsa razî me, lê napejirînim ku hûn partiyê xirab bikin. Hûn tev dibêjin; "Pîvanên partiyê hatin

xirabkirin, partî bi temamî hat xirabkirin." Ez jî ji we re dibêjim ku, ev xirabiya herî mezine ku li me bê kirin. Bila her tişt ji destê we biçe, lê bila pîvan û nirxên partiyê ji destê we neçe.

Hûn nirxên herî mezin pir hêsan ji paşçav dikin. Lê belê helwestek hêsan a keyfî, îdîayek xwe ya herî biçûk jî, heta mirina xwe ferz dikin. Ev rewşa we ji bo min pir ecêbe. Ango îdîa, rik û netebitîn: Vaye serdestiya kirêtiyê! Min ev tolazî hêj di zarokatiya xwe de dîtibûn. Ev ne ti tişte, li wir tiştek bi navê civakbûn û netewbûnê nîne. Dijmin ji sedî salan ve çewsandiye, bê mejî hiştiye, ji bo xwe jêhatî kiriye û weke ne ti tiştî hiştiye. Rastiya we eve. Hûnê çima vê nebînin? Bi we re hestê welatek pîroz jî tine ye, hewce nabînin ku bi hinek mirovên hêja re pêwendiyê jî pêş bixin. Nêzîkbûnek we bi şêweya bila her kes çavên hev derbixe, kî dikare kî bixapîne bila bike, kî li dijî kî çi dike bila bike heye. Di kevnariyê de israr, di nirxên civakî yên kevin de israr, ji bilî vê nayên ti wateyê. Keyfa we jî ji van helwestan re tê.

Lê ji bîr nekin, hûn bi van helwestên xwe ve li hember dijmin, ne tiştekin. Li hember welatê xwe, ger hebin li hember nirxên berz, hûn ne tiştekin. Hûn nikarin bi serûber du peyvan bikin û hestek we ya berz jî tine ye. Gelo dikarim van helwestên we bipejirînim? Min gelek caran destnîşan kir ku, min ji ber vê şerê xwe yê yekem bi dayîk û birayê xwe re meşand. Hûnê di vê mijarê de fêm bikin ku, rastiyek Rêbertiyê heye. Bi gelemperî mirov nirx didin malbatên xwe, lê ez hêj deh-panzdeh saliya xwe de ji wan qut bûm. Ji ber keyfa min jê re nehat, baldar jî nêz nebûm. Vêca ezê çima ji evqas paşverûtî û kirêtiyên we re serî bitewînim? Hûn kîne û çine?

Hûnê bêjin; "Ev hemû şerê çînî ne." Di nava partiyê de meşandina şerê çînî, nabe li dijî partiyê be. Şerê çînî li dijî dijmin, li dijî kirêtiyên xwe bimeşînin. Ger ev hêz bi we re nîne, nexwe şerê wijdanê rast bikin û xwe jî perwerde bikin. Xwe perwerde nekirin, tê wateya gotinên weke; "Çiqas dixwaze bila li ser min ked bê dayîn, ez nabim mirove." Ez jî dibêjim, hûn bi vê nêzîkbûna xwe ve tawanê dikin, dîsa jî dixwazin pir bijîn, lê divê mirov vê giran ceza bike. Li aliyekê jiyanek azad a miletekê ku berze û pêwîste bê pêşxistin heye. Li aliyê din jî hûn xwe diqurifînin û dixapînin dixwazin bijîn, qaşo jiyanek heye. Vêca, kîjan ji van raste? Hewce dike mirov kîjan ji van tine bike, rê ji kîjanê re veke? Encamên pir dijwar pêwîste ji vê bên derxistin hene.

Ger hûn rast nebin, ya rastî dê ev sezaya giran ji bo we tevan bê pêkan. Bi vî şêweyî ji bilî vê rêya jiyanê nayê vekirin. Lê mixabin haya we jî ji vê nîne. Hema hema her roj xalên ku tên axaftin, mejiyê min bi îsyanê pêşwazî dike. Ango li gorî hestiyariyên min hemû jî şaşin. Karên ku hûn dikin, ne li gorî rêkûpêkiya karin. Lê dîsa jî we xwe winda kiriye û dimeşin. Hûn dixwazin xwe bispêrin min û wisa bijîn. Mixabin hûn nikarin bi vê şêwaza xwe ve, xwe bispêrin min û bijîn.

Niha berhevbûnek wisa heye. Bixwazim dest bavêjim kîjan bîrîmê û kîjan kesê ve mijûl bibim, şerek heye. Ez vê xwezayî pêşwazî dikim, îsyan jî nakim. Lê em rast bizanin ku, pêwîste em li kudera şer cîh bigirin. Hûn çiqas bi me re, çiqas li dijî me ne? Zelal bikin ku, hûn çiqas dixwazin bi me re li dijî dijmin şer bikin. Ger ez neheq bim, bila tundiya şer li dijî min be, lê ger mafdar bim bila şerê we bi min re li dijî neheqan be. Kesê ku şer nake, weke miye. Ezê çi ji kesê şer nake bikim? Rewşa gelek ji we wisa ye. Mala wî dişewite, dihilweşe, xeterî hatiye li ber serî ye, lê mixabin ne di ferqê de ye. Hewce nabîne li dijî vê şer jî bimeşîne. Vaye ji ber vê şerê nav partiyê evqasî girînge.

**Egîdiya Di Nava PKK'ê de**
**Saxlem Pêkanîna Nûnertiya Pîvana ne**

Partîbûn şerê herî mezine. Ger emê ser bixin, emê bi vê ser bixin. Xirabûna pîvanên partiyê, hêjî xalek em zehmetiyê dijîn ku rave bikin. Ji ber ku ev pîvanên bingehîn ên didin jiyîne. Ev pîvanên ku miletekê, heta we jî weke kes didin jiyîne. Ger min jî weke we dev ji partiyê berdaba, hinek pîvanên partiyê yên saxlem ferz nekiriban, gelo dê yek kesê we li ser piyan bima? Min jî heman bêberpirsyarî raber kiriba, gelek hevalên me yên pêşeng jî di navê de, gelo me dikariya behsa yekgirtinê kiriba? Gelo dê ti nirxa jiyana ku hûn niha li hember rêz digirin li ser piyan maba? Qet nebê bikarin van hîs bikin. Ya we dide jiyîn, nirxê partîbûnê ye. Gengaz be hezar carî ji vê re şikir bikin. Ji ber hûn van hestan bidest nexin, hûn nikarin zêde bi îdîa bin û dê her tim bi we re xirabî pêş bikeve. Divê hinek biryar û fikrên we yên rê nedin vê hebin. Kesayetek evqasî rê dide van û di mijara pîvanan de evqasî bêbiryare, li gorî min weke ku bi qasî quruşekê jî nirxa wî nîne, mirin û mayîna wî jî ewqasî negirînge. Nav, şan û rayeya wî çi dibe bila be,

kesayetek wisa tine bûye. Ew kes ne xwedî fikrek bihêze û asta wî ya biryarê nîne. Bêbiryarî û hejariya fikir ku hûn dijîn, berçav bigirin û xwe binirxînin. Divê danasîna fikir jî, danasîna hêzê jî hebe. Lê belê hûn her tim mizmizê dikin. Partîbûn, bi kesayeta biryarek mezin re jiyîne. Çi karê kesê ku ne fikir, ne xeyal, ne xiroş, ne ezamet, ne jî bi serûber bilêvkirina du peyvan heyî di nava me de heye?

Halê xwe yê zaroktî bibîr tînim: Wexta diketim nava qelebalixekê, derdiketim pêşberî mamosteyekê, nexasim pêşberî mirovên ku dixwestin min guhdar bikin, heta hemû şaneyên xwe pir baldar nêz dibûm û min hemû jêhatiyên xwe dixist tevgerê. Ev xalek pir baş tê fêmkirine. Ji bo min şerê herî mezin û jiyana herî zehmet, ev xwepêşandan bû. Ji ber ku min jiyana xwe wisa digirt dest, niha hemû gel di asta xiroşê de ye, hemû gel di rewşa xwepêşandanê de ye. Ji ber vê xisleta min ji dijberên min an jî hevalên min ên zaroktî bigirin heta we wisa ye. Tê bîra min, seknek û xwepêşandanek camêr a saxlem nîne, her tim mizmizê dike, her tim aliyek wî kêmasî ye, aliyek qetiyayî heye, bêçare ye, di her reftar û gotinên wî de hilweşîn heye. Lê tevî vê jî evîndarê xwe ye, xiftanekê li vê dike û qaşo hewl dide bijî. Rêbertî û PKK'yîbûn redkirina vê ye. Ango ger ew Rêbertiya hûn behsê dikin û PKK'yîtiya ku ez dixwazim hinekê pêk bînim fêm bikin, divê hûn bizanin ev kar ji roja destpêkê heta roja me bi meşek mezin ve hatiye sazkirin. Hûn nikarin PKK'ê li gorî keyf û fêrbûnên xwe fêm bikin, hûnê beramberî vê şaşwaz bimînin û zêde jî rû nebînin.

Vekirî bêjim, bi zehmetiyek mezin tehemûlî we dikim. Ango ne ku rewşa we nabînim û nizanim. Ji temenek pir biçûk ve ji bo min jiyan, xwepêşandana gotinek xweşik û reftarin, elbet fikra di bin wê de ye. Mixabin di rewşa heyî de, gelek kes bi her cure kirêtiyê, tolaziyê ve beşdarî nêvenga me dibe, xwe tevlî dike û ev jî xweşa we diçe. Çiqas kesên nexweş, jihevketî û xwedî reftarên xirab hebin, hemû tên nava PKK'ê. Ev nayê pejirandin. Biçin ji xwe re cihek din bibînin. Em di xisletên PKK'ê yên herî bingehîn de bi israrin û dev ji vê jî bernadin. Jixwe, di tevlîbûna PKK'ê de ya em dipejirînin û erê dikin xisletên ku me destnîşan kirine, ne xisletên berovajî wê ne. Hûnê jî tevlîbûnê wisa fêm bikin. Bila ti kes bi cureyek din tevlîbûna PKK'ê fêm neke. Bila kes nehizire ji dervî şêwaza me destnîşan kirî û hewl dayî zelal bikin, xwe ferz bike û avaniyê biçewsîne. Ev hemû şaşin. Qet nebê ji niha ve

hesabê xwe baş bikin, daku xisletek we ya baş hebe hûn bikarin pêşketinekê saz bikin.

Gotinên weke; "Min xwe negihandê, nekarî xwe perwerde bikim" qet napejirînim. Yek ji van ne gotinên jidilin. Hûn dikarin li vir xwe bigihînin asta perwerdeya ku dixwazin. Ma, dema zarok bûm, min xwe perwerde kiribû? Dema hewl tê dayîn nirxên wadetar bên bidestxistin, zêde perwerde jî hewce nake. Jixwe perwerde dema hewce dike tê dayîn. Mirov vê jî hîs dike û xwe perwerde dike. Dema hilkişiyayî ser çiyayekê te dît henaseya te têrê nake, wê tu perwerdeya henaseyê bibînî. Te dît di rêyekê re tu nagihî çiyayekê, wê tu şêweyek cuda ya xwe gihandinê biceribînî. Te dît gotinek te ne balkêşe, ji bo gotinên xwe balkêş bikî wê tu xîtaba xwe pêş bixî. Te dît fikra te encamê nade, wê tu biguherî fikrek din pêş bixî. Perwerde eve. Ango jiyan kêlî bi kêlî ji we re diyar dike ku, hûnê kîjan aliyê xwe perwerde bikin. Jixwe ez jî perwerdeyê wisa fêm dikim. Dibêjin ku, jiyan bi xwe dibistana perwerdeyê ya herî raste û me jî perwerde wisa girt dest.

Hûn ji jiyanê fêr nabin. Vêca, çi ji we hatiye? We heta niha çi kir? Jiyana partiyê ya em ji we bixwazin bi serê xwe, dibistana perwerdeyek mezine. Ger hûn ji wê jî fêr nabin, nexwe hûn qediyane. Tê wateya ku, belaya li nav civakê hatiye nava partiyê. Hûn ciwanin, wisa zêde helak nebûne û bi qasî nekarin partîbûnê saz bikin lewaz jî neketine. Tişta ji we tê xwestin, bûna xwediyê mercên endamtiyek partî ya ji rêzê ye. Ango rêziknameyek bi pênc-deh xalan, bernameyek bi pênc-deh xalan û bi qasî deryan dahûrîn hene. Gelo pir zehmete, partîbûn ji van pêşnûmeyan bê fêmkirin? Hûn dikarin van bi perwerdeya rojekê jî fêr bibin. Jixwe di nava me de jiyan, her kêlî perwerdeyek mezine.

We di serî de di xalên bingehîn de, şaşiyên bingehîn kirine û wisa jî didomînin. Lewra zehmete ku mirov rewşa we bi nebesiya perwerdeyê rave bike. Bi salane derfetên bêhempa yên perwerdeyê hebûn. Tevî vê kesê ku xwe perwerde nekirî, pêwîste rewşa xwe cuda rave bike. Weke min destnîşan kirî, hûn ji zaroktiya xwe ve heta roja îro berhemên teşeyek şaşin û lewra nikarin şer bimeşînin. Bi we re şerê bilindbûnê, asta dildarî û evîna wê nîne. Hûn kesayetên kevin ên mizmizê dikine. Hûn kesayetên civakê yên ji mêj ve têk çûyîn û tine bûyîn dijîn. Paşê jî weke belengazan ji bo vê mafê jiyanê dixwazin. Ez vê şaşiyê nakim. Kesê ku nekare hêza jiyînê raber bike, bi keda xwe rê ji jiyanê re veke, di tengaviyê de jî be, di nava êş û janê de binale jî, guncav nabînim ku

bi seferberkirina derfetên partiyê ve bidim jiyîn. Ger destûrê bidim şêwaza jiyanek wisa, dê ev jî bibe xirabiya herî mezin ku ez li nirxan dikim. Lê belê ya esasî jî hûn dixwazin eve. Hûn xirabiyê ji min hêvî dikin û dixwazin vê jî erê bikim. Hûn dixwazin gelek xisletên ku partîbûnê pêk nayîne û rê ji serkeftinê re venake bidomînin. Ger ez jî vê helwesta we nebînim û bipejirînim, ev tê çi wateyê? Nexasim ger qadroyek rayedar di vê mijarê de rê bide, dê xirabiya herî mezin erê bike. Qet nebê di vê mijarê de egîdiyê raber bikin. Pêwîste daxwazên we yên ne hêjayî partiyê, wate nade jiyanê, wê xirab dike û lewaz dixe nebin. Pêwîste di vê mijarê de terbiyek û dilnizmiyek we hebe, daku em jî zêde bi we re mijûl nebin û di nava partiyê de zêde bi we re şer nekin.

Hewce dike endamê partiyê serkeftinê esas bigire, di nava binkeftinê de hinek şaşî û nebesiyên xwe li ser partiyê ferz neke. Endamê partiyê, di vê mijarê de xwediyê pîvane. Lê mixabin niha pîvan wisa hatine xirabkirin, ez jî şaşwazim ku ji kîjan alî ve sererast bikim. Kesên ku hewce dikir pir rehetî bîrîmek partiyê kêrhatî bike, kar heta dawî terkî xirabûn û belavbûnê kirine. Lewra paşê jî hûn tev, bi tengavî derdikevin pêşberî me. Gelo di nava we de yê ku zehmetiyê najî heye? Lê belê sedema vê bi xwe jî hûne. Kesên evqasî bi pîvanan dilîzin, elbet dê bikevin vî halî. Li şûna hûn hesab ji xwe bipirsin, ji min dipirsin an jî bi gotinên weke; “Em di rewşek tengav de ne, divê tu alîkariya me bikî” tên cem me. Min ji bo we gelek tişt kirin. Lê belê yên pêwîstiyên kar pêk nayîne hûn bi xwe ne.

Em li ser peywira xwe ne. Jixwe, pirsgirêka me nederbaskirina neyêniyan, aliyên we yên partîbûnê pêk nayîne û partiyê nas nake dîtine. Peywira me, li ser bingeha erênî û afirînerî, bi we re hinek fikir, xeyal û jêhatiyên nû pêşxistine. Ango me dixwest her yek ji we bikare bêje her roj çiqas gihaye hêza fikrek xurt, hêviyên wî çiqas zêde bûne, xwe çawa bi xeyalên nû ve dixemilîne, her ku diçe xiroş û dildariyên xwe çawa pêş dixe, xwe çawa dipîve û di mijara serkeftinê de bi qasî bikare gavên saxlem bavêje xwe çiqas bihêz hîs dike. Ya hewce dike bê payîn, ev xisletên pêşketina erênî û bedewin. Di vê mijarê de hewce dikir, her roj pêşbaziyek hebûya.

Li rewşên we dinêrim: Gelo agahî ji hêviyên nû hene, fikrên nû hene, di asta baldarî de berzbûn heye û nêzbûna ji qonaxa serkeftinê re çiqas pêş dikeve? Di vê mijarê de kesek ji xwepêşandanê re amade nabînim. Pêwîste nêvenga partiya me, bi şêweya pêşbaziya xisletên erênî bê

nirxandin. Hûn çima ji vê direvin? Di civakbûnê, nexasim şoreşgeriyê de hizir şerte. Mirovê bê xeyal nabe. Dema hêvî nebe, jixwe meş jî çênabe. Di mijara serkeftinê de jî, heta ku mirov xwe neceribîne, nikare gav jî bavêje. Divê ev di şer de hîn zêdetir bê kirin.

Hewce dikir me ev xalên em dibêjin partîbûnin bi çoşek mezin nîqaş kiriba û encam girtiba. Wexta em komek biçûk jî bûn, di nîqaşên navbera me de, li hember nêrînên şaş ên şovenên civakî jî, ji bo em di pirtûkên cur be cur de fikrên nû û rast peyda bikin, em pir bi îdîa bûn. Dîsa **Haqî’**yan, **Mazlum’**an û **Kemal’**an di bîra min de ne. Xwepêşandana me ya herî mezin, li hember nêrînên şaş her roj, bi nêrînên nû, rast û girîng ve bersivdan bû. Dema em ber bi eywanekê, maseyekê ve diçûn, ji bo me digotin; “Dîsa hatin.” Me fikrek wisa pêş dixist, fikrên beramberî me serûbin dibûn, yek ji me pêncsed kes belav dikir. Hêj di dema koma destpêkê de em wisa bûn.

Niha li eniyên me yên pîroz, li herêmên rizgarkirî ti dane ji nîqaşên fikra partiyê nîne. Şaşî heta noqê ne, bêfikrî heta noqê ne, di derbarê çima fikir hewce ye de, yek nîqaş jî nîne. Hûn bi van helwestên xwe ve îxanetê li PKK’ê dikin, ji mêj ve berovajî rêberan û nirxên berz ketine. Çima hûn van nirxan paşçav dikin? Ma **Mazlum’**an mirovên ku di carekê de bên paşçavkirine? **Mazlum** kêlî bi kêlî propagande bû, axaftvan bû. **Kemal** her kêlî qêrînek bû. Niha hûnê çima bi van re nakok bin? Hûn kî ne? Ma hûn ji wan hêjatirin? Gelo we ji wan zêdetir jiyana xwe fedayî vê partiyê kir? Na, tenê hûn li ser mîrateya wan erzan dijîn. Nexwe ev jî tawanek pir mezine û bêberpirsyarî ye. Ev partî, partiya van nirxane.

**Kemal** û **Xeyrî** jî dikariyan nemirin, dibe ku ji we sed qatî zêdetir jî bihêz an jî li gorî dixwestin bijiyan. Lê nekarîn bijîn. Gotin; “Ger emê bijîn sonda me heta dawî ye, qêrîna me jî heta dawî ye” û li cihê hewce jî kir şehîd ketin. Ev nirx pîrozin. Her kesê ku dibêje ez PKK’yî me, pêwîste kêlî bi kêlî van nirxan berçav bigire û wisa bijî. Em nîqaş li ser van nakin jî. Lê haya we ji van nîne. Ez çi dibêjim, hûn çi esas digirin? Ger rêzdariyek we li hember van nirxan hebe, wê demê ezê ji we re bêjim we çi kir? We ji bo fikra partiyê çiqas şer meşand? Ew di zindanê de bûn. De vekin, li jiyana wan a wê demê binêrin. Çawa jiyane yan jî ji bo serbilindiya jiyanê çawa şer kirine? De vêca li xwe binêrin. Di nava we de yên qet berê xwe jî nadin wir nekêmin. Dikarim mîna vê hezaran mînak bidim. Ji bo fêmkirina we, hewce nake mirov pir mînakan bide, lê PKK wisa ye. Hêza min a propagandeya ku bikarim her roj ne kêmî panzdeh

demjimêrî bikim heye. Hêza perwerdekirinê, fikra nû û xeyalên nû jî aliyên kar yên dinin. Nexwe em teqez helwest û reftarên we yên bi partîbûnê re nabin yek, nexasim bi wê dilîzin dawî dikin.

Gelo çima wisa di nava helwestek şerê tund de me, çima nikarim çavên xwe jî vekim? Ji bo xwe ji dawiyek bi êş rizgar bikim, wisa nêz dibim. Bila ne dijmin min bi şêweyek ku min heq nekiriye bikuje, ne jî bila quralên partiyê min biçewsîne. Ji bo partiyekê, ji bo bendewariyên miletekê yên ji partiyekê, evqasî dildariya jiyanê raber dikim. Nexwe ez berê pir belengazek bûm, min nedikariya wisa kêleka hêza jiyanê re jî derbas bibim. Lê ji ber ku niha hewce dike ji bo miletekê mezin bijîm, mezin bihesim û mezin bihizirim, lewra min heta dawî xwe derbas kir. Ji ber bendewariya milet eve. Ji bo bin nekevim, heta dawî dihizirim. Ger di rastiyên şer de hevgirtî bim û li hember jiyanê rêzdar bim, bi qasî hemû pêngavên dijmin asteng bikim divê hêza min a nêzîkbûnê hebe. Endamek PKK’yî yê rasteqîn wisa dibe.

Niha vê jî bi xwe re pêk bînin. Gelo hûn çiqas nûnertiya partiyê dikin? Fikra amade jî tênegihiştin, pîvanên partiyê yên zelal jî nepêkanîn, ancex dê derbixe holê ku hûn tawanbarin. Ez van tiştên em dikin jî kêm dibînim. Ger bikarim weke we di nava mercên hîn rehetir de têbikoşim, nexasim li ser axên welat, li çiyan derfetên min ên meşandina şoreşê hebin, ger nekarim tiştên ku we demek dirêje nekirîn di wextek pir kin de pêk bînim, xwe weke kesek PKK’yî nabînim. Di vê mijarê de soza min, soze. Em lê dinêrin, hûn xêra partiyê xwe digihînin çeperekê, peyre jî çiqas neyênî hebin di vê çeperê de dibe daneyên we û derdikevin holê. Nabe ku çeperên partiyê wisa bên bikaranîn. Ez jî şervanê sala me û hemû çeper jî min bi xwe afirandin. Ma di van çeperan de dijbertiyek partiyê ya herî biçûk, pêşketinek ku zerarê bide partiyê heye? Bes hûn, çeperên amade jî tînin rewşek kêrî neyên, derfetên partiyê yên li wir kom bûne çarçûr dikin. Divê ev xalên em destnîşan dikin tev, we bîne ser hişê we. Divê hûn di mijara partîbûnê de biryara xwe rast bidin, ji bo vê jî dixwazim hinekê dîroka partiyê têbigihin.

Jixwe, me tika nekir hûn werin, ji bo vê jî me hûn tengav nekirin. Hûn bi dilê xwe hatin nav partiyê. Hêza mirovekê ya herî mezin, hêza wî ya xwe bi xwe re hevgirtî be, hêza girêdana bi xalên ku rast dizanê re ye. Ji bo endamek PKK’yî jî xisleta herî watedar û yekane, dizane girêdayî biryara dayî be û girêdayî wê jî bijî. Li ser van esasan heta ku şertê yekemîn pêk neye, di ti mijarê de hûn nikarin xwe qane bikin û bikarin

bibin xwedî meşek saxlem. Kesê xwe bi xwe bibiryar neke, xwe bi xwe dîsîplîn neke, biryarên herî berz bi xwe re nemeşîne, misoger nikare di milîtaniya partiyê de serkeftî be.

Binpênekirina biryara partiyê ya we dayî, biryara yekemîn û bingehîne. Lê belê heta niha ya ku we herî zêde binpê kirî û paşçav xistî jî, ev biryara sereke ye. Niha ger hûn bipirsin, başiya herî mezin em li dîrokê bikin çiye, ezê bêjim hêza vê biryarê raberkirine. Emê bi vê dijmin bin bixin û ber bi jiyana azad ve gav bavêjin. Çi tiştê ku ji me hatî girtin û em kirêt kirîn hebin, emê hemûyan bavêjin û ji wan dûr bikevin. Ma hûnê dîsa çima vê nexwazin û hevgirtina vê raber nekin? Ma dema civaka me û miletê me bi quralan lîst, karesata herî mezin nehat serê wan? Em îro ne miletê herî paşverû û hejarin? Heta gelo em ne yên herî kirêtin? Ev jî, ji ber ku ji xwe re hinek quralên bingehîn ava nekirin û her kes li çareya xwe geriya wisa bû. Ma hûn jî heman tiştî di nava partiyê de nakin? Ger bi zorê hinek hewldanên em didin nebin, gelo hûnê rewşek hîn kembaxtir û bi lenet nejîn? Hûn çima çavên xwe ji rastiyan re digirin? Wexta bi pîvanên partiyê tê lîstin, hêjî şaşwazim hûn çawa wisa bêdeng dimînin. Bi we re fikir lewaze, taktîk tine ye, serkeftin tine ye, windahî jî heta noqê ye. Gelo hûn çima li hember van narecifin? Çima wijdana we naheje? Çima wate nadin xwe? Ma ne heyfa we ye? Her tim weke berxê dayîkê ne. Dema dayîkên we dibînim, dilê min ranake. Qet nebe hûn li wan belengazan bihiziriyan, wisa nemaban!

Dema egîdek diçe şer, bi qasî dayîka xwe nede girîn, divê wêrek, yeman û bihêz be. Lê belê gelo di nava we de yek kesê ku dayîka xwe nedayî giriyandin heye? Dev ji tengavkirina min berdin, ma mirov rêhevalê xwe tengav dike? Gelo di nava we de kesê ku yek rêhevalê xwe tengav nekirî heye? Hinekê min berçav bigirin: Min ne dayîka xwe, ne jî hûn giriyandin, ne dayîka xwe û ne jî hûn tevgav kirin. Egîdî wisa ye, ji bilî vê dek û derewin. Çiqas dikarî baxive, lê biçe roja duyem jî bikeve! Ev rewş, dawiyek ku di milîtaniya me de zêde ti wateya xwe nîne. Di gelek şahadetên salên dawî de êş û jan hene –ew gihiştin şahadetê, em li hember wan rêzdarin û minetdarê hemûyane- û ya herî girîng jî her tim kirêtiyên kesên dijîn derket holê. Nêzîkbûna kîjan ji wan a hêja çêbû, kîjan ji wan xiroşa me zêde kir, em evqasî herikandin û dema em di zehmetiyê de, gihandin aramiyê? Gelo di nava we de milîtanek ku bibe mijara nirxandinek wisa heye? Her kesî dikariya bi

çalekiya xwe ve rê ji vê re veke. Bal bidinê, di nava PKK'ê de jî kes mafê kesî naxwe. Her tim li hember ên serkeftî rêzdarî heye û nirx tê dayîn. Lê mixabin hejmara van jî bi qasî bê gotin tine, kemin. Egîdî, ne ku zêde şûr hejandin û tifenk teqandine. Egîdî, di rastiya PKK'ê de nûnertiyek saxlem a pîvana ye. Mamoste jî vê dibêjin. Egîdî di proleterya şoreşgerî de jî, di rêxistinbûna partiyê de bihêzbûne. Ev xisletên rêxistinkirinê ne. Yê dikare birêxistin bike, weke egîdê herî mezin tê ravekirin. Ji ber ku ji bilî rêxistinkirinê ti çeka gelan û proleterya nîne.

Kurtasî vê rewşa xwe ya dervî partiyê û netevlîbûna jiyana rêxistinkirî ya partiyê ku bi ti hêcetên serûber ve neyê ravekirin ji xwe re bikin pirsgirêkek cidî û biryara xwe jî li ser bingeha tevlîbûnek rast ji partiyê re bidin. Ji bo qadrobûnek saxlem, xwe bigihînin pîvanên nirxandinek hewcedariyên wê ji her hêlê ve pêk bîne û hêza pêkana vê biryardariyê. Em jî li ser vî bingehî partiya xwe ji nû ve bigihînin merc û derfetên şerê pêşketî. Her çendî em zêde bal nadin aliyên wê yên teşeyî, em di cewher de tevlîbûnek rast û baş a ji partiyê re, her endamek xwe bixwazin. Nexasim em pîvanên qadro, di asta ku bikare ji her pirsgirêkên şer re bibe bersiv esas bigirin. Peywira me ya herî bingehîn eve.

Heta ku ev erka bingehîn neyê serxistin, em nikarin pirsgirêka şer jî bi serûber çareser bikin. Jixwe ceribandinên we yên gêrîla ku heta niha jî diyar dikin, weke hûn li ser bingeha serkeftinek mezin nêz nebûne. Ji vir û şûn de jî ger hûn di vê de israr bikin, dê ev rewş pratîka we bibe dervî partiyê pêş ketiye û we nêzî pîvanên ku wê esas nagire bike. Ev jî binkeftina dawî ye. Me heta niha bi tevdîrên ku pêş xistin ve, binkeftina dawî asteng kir. Lê ev nayê wê wateyê ku, dê ji vir û şûn de jî ev pêk neyê. Ger tevdîrên pêwîst neyên girtin, hûnê di carekê de bibînin ku, di nava bîst û çar demjimêrî de ev pêk hatiye. Ger hûn vê milîtaniya partiyê esas negirin, hewcedariyên vê weke peywira bingehîn pêk neyînin, xeterî her tim şênbere.

Weke heta niha bûyî xwe sipartina min ve, bi sipartina şerê PKK'ê ve nebêjin; "Êdî em têk naçin, serkeftin misogere" û xwe nexapînin. Jixwe ewleya herî bingehîn a serkeftinê, tevlîbûnek di milîtaniya partiyê û pîvanên qadro de tawîzan nade, afirîner û li gorî hewcedariyên şer xwedî jêhatiyên sazkirinê pêkanîne. Wexta ev saz bû, em dikarin bersivê bidin her cure şerî. Ger di vê manê de Rêbertiya partiyê li ser linga ye û

hinekê jî em dikarin behsa serkeftinê bikin, ji ber di vê astê de pêşengiyek partiyê esas digire ye. Ji bilî vê nabe ku tiştek weke nîşaneya serkeftinê bê destnîşankirin. Ger hûn jî serkeftinekê dixwazin, bi pîvanên partiyê yên kêm-zêde hatîn ceribandin û selmandin ve pêwîste hêza jiyanê û jêhatiya şerkirinê raber bikin. Ya pey wê re jî hewldane, ew jî bi we re heye. Ya dimîne wêrektiye, dîsa jixwe ew zêde jî bi we re heye. Vê jî pir eşkere diyar dikim û her tim jî dubare dikim. Ya ku bi we re neyî jî, ez hewl didim ronî bikim.

Bila ti kes ne rexneyan binepixîne, ne jî biçûk bike. Rexne pir cidî ne û teqez divê hewcedariyên wê pêk werin. Pêwîste hûn li gorî asta wêrekî û fedekariya xwe, pîvanên qadroyek partiyê êdî ser bixin. Ev ji bo we ya herî hewce ye. Vê peywirê ne bi tiştek din biguherin, ne jî paşçav bikin. Hûn nikarin vê peywirê bixin plana duyem jî, ev her tim peywira ku di plana yekem de ye. Wexta we di tevlîbûn û nava partiyê de bi vê re pêşketinek jiyan kir, dê astengiyên ku derbikevin jî bên derbaskirin û dikare peywirên herî giran jî serkeftî pêk werin. Dîroka partiyê, bi temamî vê destnîşan dike. Pîvanên Rêbertiyê, bi temamî vê diselmînin. Tevlîbûnek pir şaş a heta niha bi gelek hêcetan ve hatî xirabkirin, ji binkeftinê re vekirî û ferasetên qadro yên hewcedariyên xwe pêk nayînin biterikînin. Pêwîste di vê mijarê de biryara we misoger û domdar be. Ger hûnê tiştekê ji rexneyan fêm bikin, raveya wê ya şênber û dîsa mafê xwe sererastkirinê dixwazin, wateya wê jî, di kesayeta partiyê ya ku ji vir û şûn de hêsan xirab nabe, têk naçe, di her merc û nêvenga şer de, bi qasî li hember peywirên ji rêzê, li hember çalekiyên şer ên dijwar jî van pîvanan esas digire de israrkirine.

Hêvîdarim dê ji vir û şûn de israra we li ser vî bingehî be û dê ev israr wisa hêsan –jixwe ev heta henaseya dawî ye- bi ti hêcetî neyê astengkirin. Ne çep û ne jî rastê ve ji rê neyê derxistin. Ger hûn xwe wisa bibiryar bikin, hûnê hem a hêjayî xwe, hem jî we ber bi encamê ve bibe saz bikin. Ji bo vê jî çi hewce dike, ji xwe bixwazin. Ya partî bide we, alîkariyek serve ye. Yê bibe xwedî biryar, vê biryara esasî dixwaze û hêza wê ya rêvebirinê dê hûn bin. Partîbûnek wisa ji bo vê kêliyê û her demî weke peywira herî bingehîn li pêş me ye û peywirên pir girîng li benda we ne.

Em niha bi demek pir hesas a berpirsyariyên wê yên dîrokî bilind, li beramberî vê ger bê serxistin derfeta bidestxistina rewşên ku mirov jê re bêje serkeftina dawiye hene. Lê ger binkeftinek bê jiyîn jî, em ji

destdayîna hemû karên me kirine û windakirinê re jî rûbirû ne. Jixwe hûn weke berê ne zarok û ne jî xamin. We zêde ezmûn jî bidest xistin. Hûn di qonaxek jiyana pir kamil a bi bawerî de ne. Ger hûn bikarin bi rêzdarî mafê vê jî bidinê, hûnê bikarin pir yeman bi ser her cure têkoşîn û peywirên şer de bimeşin. Tişta ku dijmin jî jê ditirse eve. Ji bilî vê dijmin ji tiştekê natirse û dikare hemûyê jî bi erdê re bike yek. Yek şêwaza ku ew nekariyê, ji ezmûnê xwe jî dizanim bi rastî jî em xwe bispêrinê, eleqedar bin û esas digirin ev çeka têk naçê ye.

Pir vekirî bêjim: Pişgiriya ji derve de, evqas pişgiriya girse, heta derfetên heyberî û derfetên têkoşînên cuda zêde bala min nakişînin. An jî ger ez bêjim xwe ji min re weke pêdivî didin hîskirin, zêde ne raste. Ji destpêkê ve xala weke xebata herî bingehîn dibînim, li gorî van pîvanên partiyê domandina qadrobûn û ev pêşketina PKK'ê ye. Ya rastî heta niha di hemû pêşketinan de tevî ferzkariyên derve û hundur, helwesta me ya bibandor ev bûye û serkeftin jî aniye. Em dixwazin ku, ev bibe malê we tevan.

Me li qada xwe bi hezaran kes perwerde kir. Lê belê ji ber ku ev rast tevlî peywiran nebûn, me rewşên weke dijmin jî bêje; "Çawa şaşiyên wisa dikin?" Jiyan kir. Em dixwazin ev nêzîkbûnên demî yên PKK'ê heq nekirine, carek din neyên jiyîn. Jixwe hûn ketine nava şer, di wateya giştî de jixwe biryara we heye. Di nava we de pir kêm kesên ku birevin û çep û rast bikevin hene. Hûn tev dixwazin rast bimeşin. Lê dibe ku şêwaza meşê û xisletên wê yên serkeftina bingehîn kêm bin. Armanca vê xebatê jî ev sazkirin û di vê mijarê de teqez yek endamê wê jî kêm nehiştine. Xebatên partiyê yên perwerdeya dawî û asta me ya biryara navendî, didin diyarkirin ku emê pir pêşve biçin. Di vê dema pêşiya me ya kin de, em dixwazin dibe ku dijmin jî li bendê be, lê ti carî firsend nedayî pêkanîna şêwaza lêdana PKK'ê ya rasteqîne. Em dixwazin ber bi plansaziyek têkoşînê ya hîn watedar ve biçin. Emê hemû herêman û bîrîmên xebatan binirxînin. Lê ger em bikarin bingehê wisa saxlem bikin, emê ji niha ve radeyek serkeftinê saz bikin. Em carek din naxwazin bikevin nav ferasetên planên we yên kevin. Ji ber we hewldanên pir bêhempa jî raber kirin, lê me dît ku encam qet ne li gorî me hêvî dikir bû. Niha em carek din naxwazin vê bijîn. Ev ji we daxwazkirin, yeqîn dikim zora we naçe. Hêza vê diyarkirin, yeqîn dikim dîsa dê zêde rê ji tengezariyê re veneke. Berovajî, dê hêz bide hêza we, hêvî bide hêviya we, çoş bide çoşa we. Ma emê çima van peywirên xwe hemêz nekin?

Li ser vî bingehî hêrs û kerba me pir heye. Ma emê çima vê bi şêweyek watedar bi partîbûnekê ve bi serê dijmin de nehilweşînin û nedin gotin; "Milîtanê PKK'ê wisa şer dike?" Ger em vê nekin, emê bikevin rewşek pir tengav. Dibe ku mayîndebûna her tevgerê hebe, hêzek rizgarkirinê hebe, lê hem weke partî, hem jî gel ya me dê nebe. Min bi xwe ev ceriband û bi nîqaşê jî ji we re da diyarkirin ku mirov dikare wisa bijî. Ji we re ceribandinên jiyana xwe yên çil salî dubare dikim û digihim encama ku dikarim li ser piyan bimînim. Ev ji bo we destkeftiya min a herî mezine. Encama ku çi hûn hemû, çi jî yek ji we sed salî jî mijûl bibe nekare bidest bixe, didim we. Ji ber ku qet nebe, hûn hêjî dixwazin bi mêrxasî û çelengî bijîn. Ez jî derfeta vê pêşkêşî we dikim.

Ev ne hêsane. Li hemû silale û dîroka xwe binêrin. Hûnê bibînin ev jêhatiyên şer wisa hêsan nayên bidestxistin. Ti demî evqasî li hember dijmin li piyan mayîn çênebûye. Lê me saz kir. Divê li hember vê hem rêzdariya we ya mezin hebe, hem jî di radeyek hişk de girêdana we bi quralên têkoşînê ve pêş bikeve. Ger nirxek we û sondek we jî heye, bila di dîrokê de wateyekê rave bike. Ji bilî vê, her çendî em bixwazin we biparêzin jî, çiqas bixwazin we baş û mêrxasî binirxînin jî, ev negengaze. Emê çima xwe bixapînin? Ti nav û dengê kesê ser nexê nîne. Haya me ji zehmetî û ezabên we jiyane heye. Ev jî ne tiştekin. Em zehmetiyên jiyana we tevan dizanin. Ger ev hemû bi xeta serkeftinê ve neyên girêdan, dîsa hemû ne tiştekin. Êdî encama herî bingehîn hûn ji vê derbixin, ji we re diyar bikin ku hûn ne tiştekin. Ji bo danasîna vê jî, belavkirina pîvanên partiyê yên heta niha we kirin, hûnê pir cidî bi xwe re pêk bînin. Hûn hem sed qatî ji min zêdetir hewceyî vê ne, hem jî hêjayî vê ne. Hûnê çima vê binpê bikin?

Di partîbûnê de tevlîbûn, li ser bingeha dilxwaziyê dibe. Lê dîsîplîn jî wisa pêş dikeve. Em para xwe pêk tînin. Bêguman biryar jî, pêkana wê ya hevgirtî jî ya we ye.

**27 Çile 1996**

## MILÎTANÊ ŞOREŞGER MIROVÊ HERÎ RASTEQÎNE

Pêwîste hûn bizanin rêzdar, fêhma bin û xwe ji rewşên xeternak rizgar bikin. Rewşên we yên heyî pir xeter dibînim. Çi pirsgirêkên we yên jiyanê, çi jî yên şer, ji dûjîn û îmhayê re pir vekiriye. Hûn bi qasî ji aqil, ewqas jî ji dilxweşî bêparin. We xwe pir belav kiriye û xistiye rewşên ne asayî. Di kesayeta we de şêweyek dînîtî tê jiyîn, ev jî pir tewşe. Ger ev rewş neyê derbaskirin, qet pêwîstî bi dijmin nîne. Heta em dev ji şerê li dijî dijmin berdin, dibe ku hûn bi vî şerê we beramberî xwe vekirî dawiya xwe bînin. Ji vê hêlê ve xeterî mezine û li her qadê tê jiyîn. Hewl didim van pirsgirêkan çareser bikim. Lê belê girseyek ketî nava rewşek evqasî ne asayî, mirov nexasim hêza pêşeng anîna ser xeta rast, weke tê zanîn ne hêsane. Nêzîkbûnên bêpîvan û beredayî neyên derbaskirin, siûda we ya yekemîn û dawî jî li benda dawiyek pir xeternake.

Elbet sedema bingehîn bê çandiya di binyata vê de, hemû xisletên kesayeta ku dijmin ji rê derxistî û jiyana hatî tinekirin, bandora neyênî li têkoşînê dike. Ji ber êş û hêvî jî bi rasteqînî pêş nakeve, di hestan de ne asayîbûn nayê derbaskirin û di aqil de jî bi hemû rastiyan lîstin tê jiyîn. Nexasim mantikê polîtîk û reftarên bi vîn êdî di rewşek bêxêr de ne. Qet wate nedana şer, pirsên weke ji bo çi şer, şerek çawa bê wate hiştin, êdî rewşek hîn xeternak de ye. Xwe nevenêrîn niha bûye xisleta herî bingehîn û berfireh tê jiyîn. Ev nêzîkbûn, bêku di şer de ti sînorî binase, weke hoveberek objektif xwe mafdar dibîne. Di vê manê de ger bêjim her yek ji we qetilxwîne, dibe ku hûn ecêb bibînin. Elbet dema şer li gorî quralên wê neyê meşandin, ti ferqa kes ji qetilxwînekî nîne.

Me her tim vegot, kesayeta Kurd, kesayetek tawanbare. Lê pir çewte ku hûn di vê kesayeta tawanbar de israr dikin. Em hewl didin vê pirsgirêkê çareser bikin. Lê belê em bi astengî ser astengiyan re rûbirû dimînin. Me di demê dawî de dijmin ji bîr kir. Êdî dijminê ku bi we re pêk tê bese û zedeye jî. Hûn ji hêza guhdarkirin û têgihiştina bilind a bi zarokên panzdeh salî jî dûrin. Ev jî rewşek seyre. Hûn nikarin xwe kontrol bikin. Lê belê leşkertî, pêşî xwe bi qanûn an jî li ser bingeha xeta siyasî venêrîn û dîsîplînê pêk tê. Mixabin xeta partiyê, zagona partiyê, siyaseta partiyê, quralên kargeriya partiyê qet ne di xema we de ye. Derfetên

azadiyê yên zêde dibin, di nêzîkbûnên we de hîn zêdetir ber bi rewşên quralan nas nakin û dervî xetê ve dibin. Bi mebesta ev çima wisa ye, hûn qet reheta xwe jî xirab nakin.

Em bawermendên sexte yên di dîrokê de baş dinasin. Ji we yên herî baş –jixwe yên zêde serê xwe ranekirî û serwext nebûne-, dibin bawermendên partiyê yên wisa. Ev kêrî çi tê? Pêşî divê mirov a di hundurê xwe de binase. Pêwîste pêşî hûn şerê di nava xwe de ser bixin. Ji bo bikarin li hember derve bibin desthilat, ev hewce ye. Ma hûn nêzî dibin ku xwe binasin? Hûn newêrin yek pirsê weke; "Kîme, çime û rola min çiye?" Ji xwe bikin. Kesayetên ku hesap ji xwe nepirsin, kesayetên xwe ji bîr kirine. Her çendî tawanên herî giran jiya bin jî, kesayeta ku qet deng nedayî wijdana xwe ye. Mixabin ev di pratîka we de pêk hat. Emê çawa pêşî li vê rewşê bigirin? Her tim tê bîra min ku, ji we birevim. Lê ji ber aliyê me yê şerker heye, em ji xwe re dibêjin tiştek bi qasî dijwar serdeçûnê hêja nîne û li ber xwe didim.

Rikek min a şerkirinê heye. Tişta min di zarokatiya xwe de tam nekirî, niha dikim. Nepêkanîna quralan, xisletek ji berê ve dinasime û min ji ber vê îsyana yekem da destpêkirin. Niha jî hûn vê helwestê hîn xetertir raber dikin. Mane bavê we jî nîne, weke bavê min li dijî min derbikeve. Hûn bi mêrxasiya xwe ve daketine naverastê, dilîzin. Ger li pey we çîn hebûya, ezê baştir bi ser de çûbûma. Çîn û eşîra we jî li pey we nîne. Ger hebûya, dê min bi wan re jî weke bi bavê xwe re kirî, şerek dijwar meşandiba. Çîn jî hûnin, kur jî hûnin, bav jî hûnin. Hemû di kesayeta we de gihane hev. Ger tawanên ku hatine kirin, li nêvenga gund rû bidan, evqasî xeternak nedibûn. Lê ev şaşî bi navê hemû netewî tên kirin. Heta me cîhan jî rakiriye ser piyan, li me dinêrin.

Ez di şerê ku min bi dayîka xwe re meşandî de çiqas aqil bûme! Wexta pêwendiyên we yên bi dê û bav, silala we re tînim ber çavên xwe, dibêjim kur wisa nayê mezinkirin, keç wisa nabe, lê êdî çêbûye. Ez bi xwe jî wisa bûm. Lewma zêde loma ji we nakim. Lê dîsa jî nêzîkbûna min pir cuda ye. Ez rast û aqilmend tevgeriyam. Min bi xwe bawer kir, bêhêzî û lewaziyên xwe hîs kir. Min her tim dît ezê kengê bin bikevim û wexta min bi qasî serê derziyê derfet bidest dixist, hewl dida xwe bi wê xwedî bikim. Hinekê jî cewaziya min di vir de ye. Elbet hûn ti carî ne li ser vê hizirîn, ne jî we pêk anî. Bingeha pirsgirêkê çavkaniya xwe ji vir digire. Niha gelê Kurd li cîhanê, nûnertiya gelê herî zêde bûyî bela serê xwe dike. Dîsa jî ez pir bi îdîa me. Min li hember dayîka xwe digot;

“Dayê, dev ji ferzkirina dayîktiya xwe berde, tu tawanbarek mezinî.” Wê demê min ew wisa bêdeng kir. Min rastiyek pir dîrokî bilêv kiribû. Wê demê ez bi tenê bûm, min evqas mirov nas nekiribûn. Lê min nêzîkbûnek ku hêj wê demê ve diyar bû dê çi bê serê min raber kiribû. Min ne xwe eciband, ne jî heta tê bîra min ti başî û xweşikbûnê ez têr kirime. Niha jî em hewl didin di bin navê Rêbertiyê de hinek tiştan bikin. Ji ber ti çareyek we ya din nîne û hêza min jî evqase, halê me wisa ye. Herdu rewşan hema bêje hevdu temam kir. Elbet ev şerek pir zorakî bû. Bes dîsa jî ez dikarim xwe birêve bibim, lê hûn nikarin vê jî bikin. Hêza min a xwe rêvebirinê heye, bes dê halê we çibe?

Bi rastî jî bi qasî min ji tiştekê re sebir nekirî, li hember mezinbûna we sebir kir. Em jidil nêz bûn biceribandin û ezmûnan ve jiyan û şer fêrî we bikin. Bes we gavek herî biçûk jî ne avêtiye û ji rewşa bendewarî derneketine. Elbet pêşengtiya miletek ku mezin nebûye, ji sedî salan ve ecûc mayî jî, dê vê bandora kûr diyar bike. Ya pêk jî tê wisa ye. Hûn mafdarin, dikarin bêjin; “Ma em kengê mezin bûne ku, hûn rêberên rasteqîn ji me hêvî dikin?” Raste, ma hûn ji kur tên, heta mezinbûna xwe diyar bikin. Hûn ji mêj ve hatine tinekirin. Dijmin jî dibêje; “Ji mêj ve hatine kuştin û tinekirin.” Hinekê jî hûn wê kevneşopiyê raber dikin. Di kevneşopiyek ku eslê wî tine bûyî û mirovbûna wî hatî ziwakirin de, yeqîn dikim zehmete kesayetek ku ez dixwazim derbikeve holê. Bihizirin, kesek weke min bihêz daxive, di mijara şer de dikare evqasî biafirîne jî, nikare beramberî rastiya we baxive. Hûn rewşa axatî, paşverûtî, nepêkanîna rastiyan, bêhêzkirin û ya herî girîng jî rewşa rebentiyê dijîn. Tam jî rewşek we ya bela tê gotin heye. Ez jî herî zêde ji vê rewşa we direvim.

Dixwazim di destê xwe de pêwendiyek û hevrêyek nabe bela bigirim. Lê belê berovajî vê hat serê me. Di pênaseya rêhevaltiyê de, misoger cihê qurala bûna bela nîne. Lê belê hûn li ser bingeha mîrateya PKK’ê, dibe ku bikarin bibin eşîrek baş. Li Tirkiyê Tevgera Rêya Şoreşgerî (Dev-Yol) hebûn. Mîrateya Ciwanên Şoreşger (Dev-Genç) bi şêweya qereçiyên çepgirên Tirkiyê bikar anîn. Yeqîn dikim dê mîrateya PKK’ê ji vê xirabtir jî bê bikaranîn. Dibe ku rewşek ji ya qereçiyan kembaxtir derbikeve holê. Min zêde derûniya qereçiyan lêkolîn nekiriye. Lê weke gava destpêkê ya bê gotin, derdorek ku xwe ji çarçoveya quralên civakê derkirî dibîne. Marjînal dimînin. Bes dîsa jî pergalek li gorî xwe dane rûniştandin. Di encama we ji civaka di destê

vîna mêtîngeriya bêrehim de dîlgirtî derxistinê de, yan dê bi milîtaniyek di şêwaza PKK'yîbûnek rasteqîn de nirxek mirovatî ya mezin pêk hatiba, yan jî dê rewşek ji ya qereçiyan kembaxtir derketiba holê. Niha jî ya giraniya xwe dide der, aliyên dişibin qereçiyane.

Vale nabêjim; "Paşayên qereçiyan, fermandarên qereçiyan." Mixabin her ku diçe ev rewş xwe dide der. Ne tam qereçîbûne, hêj we ew pêşketin jî saz nekiriye, lê amajeyên vê zede ne. Em dixwazin jiyîna PKK'yîbûnek rasteqîn jîndar bikin. Bes kes jî nêzî vê nabe. Ezê hîn zêdetir li hember van ferzkariyên we li ber xwe bidim. Zêde ne bi xwestekim xwe bidim pêş, lê belê beramberî ferzkariyên we hewce dike hîn zêdetir xwe bidim pêş. Berdêla wê çi dibe bila be, xwepêşandanek baş dê ya rast be. Min heta niha nexwest zêde mantiq bidim pêş. Her wiha nexwest bi qasî vînê bişkîne û xirab bike bi ser de biçim. Lê ger hûn di helwestên xwe yên heyî de israr bikin, emê ji herdu aliyan ve jî xwepêşandinê raber bikin.

Hûn nahizirin ez çawa xwe bikar tînim û didim şerkirin û ev tê çi wateyê. Ev qet ne di xema we de ye. Hûn her tim axayên berê yên tiştekê guhdar nakin, gundiyê xwe tiştekê dihesibîne û burjuvaziyê biçûk ê pozbilind tînin bîra min. Ez wan hêzên ku hûn nûnertiya wan dikin baş dinasim. Şerê min bi wan re heye û min ew pir tengav kirine. Jixwe taqetek wan a li ber xwe dayînê nîne. Darbeya mirinê xwaribûn û negengaz bû zêde li ser piyan bimînin. Lê dîsa xwe di kesayeta we de didin der. Bes hûn qet ne di ferqê de ne ku nûnertiya çi û kî dikin.

Dixwazim di derbarê xwe de nîqaşek şerkertî jî bimeşînim. Lê hûn qet cidî jî nagirin. Jixwe ji berê ve ez mijara pêkenokan bûm. Gund kena xwe bi min kir, dewletê kena xwe bi min kir, MÎT'ê kena xwe bi min kir, niha jî hûn kena xwe bi min dikin. Lewma dihizirim ezê çawa xwe ji rewşa pêkenokbûnê derbixim an jî wisa bihêz bikim ku we ji dayîkbûna we jovan bikim. Derket holê ti xêr ji gundiyê me, heta dewletê nayê yan jî ev zêde nikarin li beramberî me li ber xwe bidin. Niha jî dora we ye. Misoger ezê fêrî we bikim ku lîstokê li gorî quralên wê bilîzin.

Yeqîn dikim, hûnê xwe bixin nav gelek rengan. Her cure rêyên revê biceribînin. Jiyana bi lenet û jinikbûnê bipejirînin. Dîsa jî hûnê di nepêkanîna rastiyan de israr bikin. Bes dê ev jî hêsan derbas nebe û ezê dîsa jî bi we ve mijûl bibim. Hûn ewqasî bi şerkertiya ku min xwest pêş bixim ve lîstin, ezê têkoşîna li hemberî we, ji we re bidim fêmkirin ev tê çi wateyê. Bûna mirov ne hêsane û heta ku hûn vê rastiyê fêm bikin ezê

bi we re têbikoşim. Ji ber ku bi çeka egîdî, şerkertiyê nayê lîstin. Hûnê birevin cem Barzanî, yan jî Komara Tirk? Her ku dijminê min zêde dibe, ewqasî ezameta têkoşînê bi min re zêde dibe. Nexasim li dijî warên ku xayîn direvinê, têkoşîn dayîn min zêdetir bi daxwaz dike. Ez tolhildêrim, heta wisa nêzî yên erzan dikevin gorê jî dibim. Me ji mêj ve dahûrandibû ku dê yên di gorê de jî nekarin rizgar bibin. Gotinên we yên weke; "Yek canê me hebû, me ew jî da gorê" qet û qet napejirînim. An hûnê fêrî vî şerî bibin, an jî emê wisa bi we re şer bikin.

Ez mirovek pir baldar nêzî heval û dostê xwe dibim. Yek ji wan re jî nabêjim tu çima hatî, di dilê xwe de aciziyek herî biçûk jî najîm. Lê belê ezê kesayeta xwe jî biparêzim û bidim nişan kesayetek çawa ye. Ne min meydan vekir, hûn bi şêweyek sewdaserî bi israr hatin vir. Rêjeyek we mezin gotin; "Emê biçin, li cem Rêbertî hêz bigirin." Jixwe her tim vê dibêjin. Hûnê hêz bigirin, lê belê hûnê wê hêzê çawa bikar bînin? Hûn weke paşayê qereçiyan rihê me bistînin û nirxdarên me qetil bikin hêz bigirin ji bo bikaranînê tên cem me. Êdî emê vê lîstokê bidin rawestandin. Ehda min heye. Heta dawî hêz didim mirovê li cem xwe. Lê sonda wî jî ya vê hêzê rast bikar bîne heye. Ger bikar neyîne dê çi bibe? Yên min nas dikin, dinasin. Biçin ji dewletê bipirsin dikare bi min bê lîstin an na. Biçin ji dayîka min bipirsin bi min tê lîstin an na. Ger yek peyvek hûn fêr dibin nezanin rast bikar bînin, biçin ji şehîdên mezin ên PKK'ê bipirsin dê girêdan bi we ve çêbe yan na. Danin aliyekê hûn ewqas derfetên partiyê û çekên şer heba bikin, ger hûn nekarin yek peyvê rast bikar bînin, bipirsin dê çi bibe, dê ew bersiva hewce bidin we.

Xeyalên me, tol, rik, hêrs û dilşadiyên me çi dibêjin? Heta ev neyên fêmkirin û hûn nezanin bi van ve girêdayî bimînin, negengaze bikarin şer bikin. Tevî min qet perwerde nekirine, hemû zarok jî weke leşkerên bi aqil mezin dibin. Biçin li milet binêrin. Di hemû agahiyên tên de tê gotin; "Milet bi Rêbertiyê ve pir girêdayî ye." Elbet ne girînge gel min binase yan nenase. Lê ji milîtanên me zêdetir girêdayî ne. Zarok pir girêdayî ne, dapîr û bapîrên bi temen jî wisa ne. Bes ji sînorê du temenan ber bi jêr de, nexasim ên di nava PKK'ê de û ber bi artêşê ve, xwe nezanîn, hedê xwe nezanîn her ku diçe pêş dikeve. Lê belê dema zarok û îxtiyar dibin mijara gotinê, dikare yek weke ewliya, yê din jî weke têkil tawanê nebûyî bên nirxandin. Ber bi temenê navîn ve, yên

xwe tiştek dihesibînin ber bi lutkeyên bêquraliyê ve bilind dibin. Emê jî pêşî li vê bigirin.

Egîdî ne hêsane. Temenê navîn, temenê ku herî zêde pêwîste egîdî xwe bide dere. Bes vêca werin ên ev anîne rewşek ku nayê nasîn binêrin. Xala ku herî zêde ji xwe re dibêjim û siberojê ji gel re vebêjim, pirsa çima naxwazin bibin mirove. Ezê bêjim, ez ne ji wan mirovên hûn dinasine. Dema vê bêjim, ezê bidim diyarkirin ku bi van kesayetan tevan re çawa bi nakokim û şer dikim. Mirovên ku bi xiroşek mezin li benda Rêbertiyê ne dê bibînin, ev mirov qet ne ew mirovê tê hizirîne. Ezê li vir bêhempa rol bilîzim. Ezê yên bi salan biçûk lîstin û kesayetên sexte şanî wan bikim. We ez tengav kirim û we rastî qebûl nekir. Ezê jî bi qasî hêza min têrê bike çîroka van ji derdorên berfireh re vebêjim.

Provakatorê navdar di nameya xwe ya dawî de digot; "Tu çawa derketî, erd jî biqelişe wê tu wisa jî bikevî navê." Ev jî gotineke. Min jî ne dixwest wisa derbikevim ser rûyê erdê. Lê xwe jî weke derketî dibînim. Nexwe dê vîn bidin diyarkirin ku kî bikeve nava qelîşteka erdê. Niha hinekê vîna min diyarkere. Ya herî hêsan, mirina erzane. Hûn jixwe ber bi wê ve diherikin. Bes ew jî encamek ku provakatorên dijmin dixwazê ye. Tevahî dîrok destnîşan dike ku divê egîd erzan nemirin. Girêdayî duruşmeya; "Ez erzan namirim" mayîn, yek ji rêgezên me yên herî bingehîne. Rêgeza şer a herî bingehîn, rêgeza erzan nemirinê ye. Elbet di rêya ku mirov erzan nemirê de, gelek kes kuştin jî, ne raste. Hêsan nemirîn, şer dijwar pêşxistin û dijmin tinekirinê ve pêkane. Yê dijmin tine neke, rê ji mirina erzan re vedike. Kesê ku birêxistin nake û kêfxweşî pêş naxe, rê ji mirina erzan re vedike. Ev xisletên bingehînin. Tevî ku hûn dijîn jî, sekna we ya mirina erzane. Ev hemû xisletên teoriya şer ên bingehînin.

Di heman demê de, divê hûn bizanin ez di şer de pir fêlbazim. Nebî jî dibêje; "Ji dehî nehê şer fêlbazî ye." Ez girêdayî vê rêgezê me. Ya hûn raber dikin ne fêlbazî ye, gêjbûne. Hîleyên şer, misoger ne ew fêlbaziyên hûn dikine. Me ev hinekê şanî we kir. Her tim dihizirim gelo ev belengaz tên tevlî şer bibin, an jî dê bibin şerker? Hûn çargavî ber bi karê herî kêm ser bixin de dibezin. Qet nebê we bizaniya weke min bixavin, perwerde û nexasim birêxistin bikin, dibe ku kêrî karekî bihatan. Karê herî zêde hûn nekarin bikin şere û her kes jî vê dixwaze. Dema dibêjim gelo hûn ji karên din re jî amade ne, hemû serê xwe ditewînin ber xwe. Kesayetek pir seyr derdikeve holê. Meşek

fermandariya saxlem danin aliyekê, rûniştinek wî ya saxlem jî nîne. Qaşo ev hemû jî avaniya fermandarin.

Wexta di Kongreya 5. de pirsgirêka fermande hat nîqaşkirin, hinek ji bo rexneyan rakiribûn. Dema tê gotin; "Bêku partîbûn pêk were û serweriyek li ser esasên artêşbûna rast çêbe fermandarî nabe, hinekê xwe ber çavan re derbas bikin. Hewl bidin xwe fêm bikin. Rewşên heyî têbigihin, paşê ger hûnê bigirin erk bigirin", dixeyîdin û dibêjin; "Ma pileya me hatiye xistin, ma em bi fermandariyê lîstine?" Heta li gorî wan teoriyek wan jî heye dibêjin; "Rewşênbîrên ku hinekê dikarin baxivin hatine, gundî jî ji desthilatî ketin." Berê jî hinekan ev digot. Pratîka Kor Cemal jî tê bîra min. Dema me di Kongreya 3. de ji hevalek xwe re got; "Biçe Ewrûpa hinekê bêhna xwe vede." Kor Cemal gotibû; "Rewşenbîr ji desthilatî ketin, gundî bûn desthilat." Wisa şîrove kiribû. Me raye û derfetên pir berfireh dan wî û şand welat. Me di carekê de dît ku, tişta zilam ji desthilatî fêm kirî, bêku bigihije cihê xwe konek qereçiyan vedaye. Wexta digihije quntarên Zagrosan tenê tişta kirî gotiye; "Yên kêfa we jê re nayê dikarin di kêliya pevçûnê de bikujin."

Vî kesî xwe ji kesê duyemîn re amade dikir. Qaşo desthilatiya gundiyan saz kiriye! Fermana ku dayî jî heman wisa ye, gotiye; "Ger kesek li ber çavên we xweş naye yan jî li pêş we astenge û we ev ferq kir, yekser di kêliya pevçûnê de bikujin." Mînak hevalê me **Ş. Erdal** hebû. Me fêm nekir çawa şehîd ketiye û çend hevalên hêja yên din jî bi vî rengî şehîd ketin. Gelo bi fîşeka dijmin, an jî ji aliyê hinek kesên qaşo dixwestin bibin desthilat ve hatin şehîdkirin, hêj nediyare. Heta me di mijara şahadeta **Hevalê Egîd** de jî encam negirt. Di kêliya pevçûnê de ji aliyekê fîşek tê, lê nediyare fîşeka dijmine yan na. Ev kesayet desthilatî wisa fêm dike. Desthilatiyek wisa û welê nîne. Li vir şêwaza tevgera dizekê, hoveberekî yan jî gelek paşketiyan heye. Xweziya gundî jî desthilat bûna! Jixwe desthilatiya gundiyan, demokratîke. Tenê demokrasi dikare wan bike desthilat. Desthilatiya Barzanî feodali ye, hevkarî ye. Qralê wê qadê ewe, jixwe li kêleka serê wane. Dibêjin; "Wexta em tengav bûn, emê biçin cem Barzanî."

Di nava me de fermandarê yekîneyê ye, lê bûye fermandarê taximê û ji ber vê jî aciz bûye. Li hember vê rewşê jî tişta ji destê tê wisa ye: Hinek gundiyên weke xwe kom dike û dibêje; "Ezê biçim di radyoya PDK'ê de bangawaziyê bikim, hûnê jî werin." Vêca çareya ku desthilatiya gundî dîtî binêrin. Wê di radyoya axayê xwe de baxive û

wisa biselmîne ku desthilate! Wê ji burjuvaziya biçûk an jî rewşenbîran tolê bigire! Bihizirin, ev jî hevalên me yên herî kevinin.

Pêwîste her kes xwe di vê eynê de bibîne. Ma qet wisa şerê desthilatî dibe? Jixwe di nava PKK'ê de rewşenbîr û gundiyên wisa jî nînin. Rewşenbîrê yekemîn û gundî jî ezim. Kesek bi qasî min gund bizane, bi qasî min ronakbîriyê bizane jî nîne. Girêdayî vê dibêjim. Pêwîste mirov li kur gundî be, li kur rewşenbîr be? Hemû belengazin, nizanin li çiyan bimeşin. Gundî ye, lê çil salin nikare xwe ji nokeriya cendirmeyekê rizgar bike. Bi qasî nekare xiftanê axayê PDK'ê yan jî 'qralê' wî ramûse belengaze. Rewşenbîr jî pêlîstoke. Qaşo ev hevdu napejirînin, wê desthilatî ji destê hev derbixin!

Di Şerê Başûr de hevalên me di raporên xwe de nivîsandine: Ji ber aciz bûne xeyîdîne, kêfxweşiya wan xirab bûye, tam nekarîne şer bikin! Ma li wir desthilatî heye? Na, li wir îmha heye, îmha tê jiyîn. Dê li wir hemû hêza heyî winda bikin, lê qaşo jî bihizirin ku şerê desthilatî dimeşînin. Xefletek çiqas mezin û nezantiyek çiqas mezin heye. Paşê jî ber bi kurve direvin? Bifikirin, cihê ku diçinê jî bi wan mirin ji mirinan didin ecibandin. Mirov xirabiyê li xwe dike, bes ma wisa? Rewşenbîrê nebes û gundiyê hejar jî wisa ye. Li şûna pêwîste nirxek mezin bidin hevdu, yê rewşenbîr neçare ku di her kêliyê de têgehek din bide fêrkirin, ê gundî jî kedkariya rast pêş bixe, şûna rewşenbîr rewşenbîriya xwe bixe tevgerê, tiştê ku dikin qaşo şerê desthilatiyê ye. Ma mirina zû yan jî vale derketin qet di xemê de ye? Di nava vê ferasetê de, mejiyek bi qasî dendika hêjîrê nîne. Vêca, ezê çawa wate bidim fermandariya we? Ma fermandarê artêşek gel wisa dibe? Ma rê dide xeflet û nezantiyek wisa?

Li biryargehên me gundîtî û burjuvaziya biçûk a di avaniya jêr de, fitne-fesadiya wê rêveberiya me ya herî jor jî rûbirû tîne. Bes biryargehên me jî ne di ferqa vê de ne. Qaşo ew jî rewşenbîrin û di asta herî jor de ne. Rewşek çiqas belengaziye! Lê di rastiyê de ji bo em yekîneyên we piçekê pêş bixin, bi rêbazên ku neyê hişê ti mirovî, ev çil salin em şer dimeşînin. Li şûna ku vê fêm bikin û dersên dîrokî ji vê derbixin, kar û barê wan dihizirin dê çawa xwe ferz bikin. Yeqîn dikim, keçek panzdeh salî jî xwe wisa peşkêşî xwazginiyan nake yan jî yên dixwazin derbikevin sûkê û xwe bifiroşin jî wisa belengaz û hejar nînin. Ma mirov bi vî rengî xwe dike mijara pêkenokê?

Ji bîr nekin, hûn hêj nikarin di ber fermandariyê re derbas bibin. Rewşenbîrên di nava me de jî ji bilî zimandirêjiyê nekarîne tiştek din

bikin. Yên heftî salî jî di navê de, kesê ku bi serûber ronakbîrî ser xistî nîne. Hinekê jî di wateya rasteqînî de, ez hewl didim ronakbîriyê îdare bikim. Nûnertiya gundiyê azad jî ez dikim. Li şûna vê fêm bikin û nirx bidinê, me jî vale derdixin, qaşo di navbera xwe de fesadiya gundîtiya berê dikin û şerê gundîtî dimeşînin. Yek yekî dikuje, yê din jî yê din dikuje. Cendirmeyê Tirk jî tê dayîk û jin dide ber xwe û dijûna dike. Her yekê şeqamekê li wan dide û paşê jî serdestiya xwe dimeşîne. Rewşa we heman wisa ye. Di encamê de, artêşa Tirk serdestê wire. Qaşo ew jî fermandarê gêrîla ne. Li şûna li hember hevdu şerê desthilatî bimeşînin, ma nabe li dijî dijmin bimeşînin? Jixwe, desthilatî ne bi me re, bi dijmin re ye. PKK niha ne partiyek desthilate. Yên desthilat, li kêleka serê we Başûr hevkar û li Bakur jî rasterast artêşa Tirk a bêrehme. Mane biwêjik heye dibêjin; "Nikare kerê dibezê kurtan." Ev jî nikarin li dijmin bidin, lê çend salin ji bo hevdu vale derbixin her cure lîstokên ku nayê hişê mirovan dilîzin. Dijmin li ber serê we ye. Me li Başûr û Bakur şer kir. Hûn dizanin li hember herduyan jî çiqas lewaz û nebesin. Ji ber we bi xwe ev jiyan kir. Vêca şerê desthilatî li kudera vê ye? Ji we tevan, nexasim ji rewşenbîr û rêveberên me dipirsim: Vêca desthilatî li kuderê ma?

Parastinek çeperan û pêşketinek bi serûber nejî, paşê jî bêje; "Kanî fermandarî, kî berpirsê biryargehê ye?" Dev ji van tiştan berdin. We li hember dijmin çi kir? Ger ez li vir şervanan pêş nexim, çek û pereyan neşînim, ma hûn dikarin li wan çiyan zikê xwe têr bikin? Hûn berê jî gundî bûn, rewşenbîr berê jî hebûn, lê hûn li ber deriye PDK'ê dibûn noker û kole. Ma ji bilî vê tiştek din li benda we bû? Deka ji mezinên xwe bipirsin, rewşenbîran nedikariyan bibin pêşmergeyên Barzanî, heta nedibûn nazir jî. Vaye **Sari Baranek** hebû, bi jinek ketî re reviya. Zilam ji xulaman xirabtir kirine, heta avêtine xurfeyekê. Min digot dibe ku katip be, yan jî hinek karên li ber lingan dabinê. Me lêkolîn kir, bes ew jî nedanê. Qaşo ev rewşenbîrên di asta herî jor de bûn! Ji bo gundiyan jî, jixwe PDK vekirî dibêje; "Nikarin pêlavên me jî ramûsin." Ango mezinên we jî bi qasî nekarin lingê wan ramûsin ji nokerên wane.

Wexta rastî wisa ye, qet hewce nake bêjim ku hûn li hember cendirmeyek Tirk çawanin. Hûnê van tevan ji bîr bikin û bihizirin; "Ezê biçim di radyoya PDK'ê de bang bikim." Kes û karên Barzanî dest danîne ser jin û keçên gundiyan. Bi mebesta çima wisa dibe li cem Barzanî gilî kirine. Barzanî jî gotiye; "Pir başe, ger zilamên malbat an jî

êl û binemalên Barzanî keçên we desteser dikin û xirab bikar anîne we mezin dikin. Ma hûn zêdetir çi dixwazin." Vaye tiştên wisa pêş dixin. Lewra hûnê bizanin, hûn diçin kuderê.

Ger mirov hinekê li hemberî xwe rêzdar be, dê ji xwe bipirse; "Ez çi dikim?" Dev ji wê jî berdin, em derfetên bi hezar kedê we bidin jiyîn didin we, hûn jî li ser vê hesaban dikin. Yên dixwazin bibin desthilat qet nebe, dê ji eşîret û gundên xwe li derdora xwe çend sed kesan birêxistin bike. Rewşenbîr jî bi hêza ziman, hêza perwerdeyê, dê hinek mirovan bi rêxistinê ve girê bide. Hûnê yên me amade kirîn û şandî jî bidin revandin, paşê jî bêjin; "Em şerê desthilatî dimeşînin." An jî "Ez wisa hêsan dev ji fermandarî û biryargehê bernadim." Ger vê peywir û rayeyê dixwazin, quralên vê hene, girêdana vê bi şer re heye. Desthilatî tiştek xweşike, lê desthilatî ji kî tê girtin? Ma em dikarin desthilatî ji hev bigirin? Desthilatiyek em ji hev bigirin tine ye, tenê peywirek me bi yekbûnê re girtina desthilatî heye. Hem jî divê pir dijwar rêxistinbûnek hebe, em hevdu bi rêhevaltî xurt bikin û wisa desthilatî parçe parçe ji hevkaran û faşîstan bistînin. Axaftinên weke; "Kî zêdetir bibandore, dê kî bikeve şûna kî, kî yê din erzan bikar bîne, biçewsîne yan jî bi xwe dana pejirandinê ve bikar bîne?", ne axaftinên ku milîtanê PKK'ê bilêv bikine. Suce ku milîtanê PKK'ê van tîne hişê xwe jî. Lê mixabin gotin û fikrên wisa pêş ketine, heta giha rewşa ku naverastê serûbin bike. Ev xalên ku dilê we pir rehet pejirandine. Ev jî rewşek pir xetere.

Van ji bo vê dibêjim: Hûn ne di ferqê de ne çi dikin. Qaşo hem rewşenbîr û fermandarên me yên gundî tev têkil vê tawanê bûne. Van radeya hêza şervanên me ji sedî pênc jî bikar ne anîne. Dev jê berdin derfetên pêşketinê rast bikar bînin, nekarîne pêşî li xirab bikaranîna wan jî bigirin. Gundî jî dibêjin; "Biçin, hûn dikarin bi xapandinê pir tiştan ji PKK'ê bidest bixin." Hûn dizanin çek û qûtên me çawa bi dizî ji destê me hatine derxistin. Vêca dema ev rastî ne, hûnê çawa bêjin; "Dê kî bibe desthilat, kî bi raye û karbidest be?" Hûn raye û bandora di destê xwe de ji dest didin. Pêşî divê hûn li ser vê bihizirin. Derfetên desthilatî zêde bikin, arazî rizgar bikin û nirxan berhev bikin. Ev jî tenê bi perwerde, rêxistinbûn û yekser şer pêkane. Piştî wê ger hûn bêjin ez bûm desthilat, bila hemû desthilatî jî ya we be.

Min çek û şervan şandin hemû eyaletên me. Ma berê li Botanê yek satora we hebû? Min şervan şandin Botanê û ji van şervanan bi hezaran şehîd ketin. Hêj hûn zarokek heft salî bûn, me gava destpêkê avêt nava vê

têkoşînê. Divê hûn hinekê li hember kedên hatine dayîn rêzdar bin. Me şerê wê bîrdozî û polîtîkayê bi salan li Enqereyê bi şêweyek şerê mirin û mayînê meşand. Em bi şerê çil salî ve hatine gihandin û me daneyên wê ji we re ragihandine. Me ev dane tenê ji Botanê re, ji hemû Kurdistanê re ragihand. Ma rastî ne eve? Ma me ji vir bi dehan têkoşîn ji bo Dêrsim û Serhetê ne meşandin? Gelo ev xebat ne bi me destpê kirin? Hûnê van înkar bikin, paşê jî bêjin; “Kî hîn zêdetir xwedî raye û bandore?” Ev qet nayê pejirandin. Hûn nikarin van bigirin ser devê xwe jî.

Ev hemû nirxên partî û nirxên gelin. Di vê têkoşînê de bi hezaran xwîna şehîdan heye û her yek ji van şehîdan ji gundek Kurdistanê ne. Lêkolîna kesên li Kurdistanê ketine bin axê bikin. Hemû jî her yek ji gundek Kurdistanê ya cuda ye. Heta di nava wan de enternasyonalîst jî hene. Bêku rastiya van bê dîtin, hûn bêjin; “Ez begê virim, ez axayê virim”, kes vê napejirîne. Jixwe em cengawerên welatin, heta cengawerên enternasyonalîstin. Ev rêgezên PKK'ê yên şerin. Gelo hûnê van ji bîr bikin û bêjin; “Ez axayê vî çiyayî me” yan jî “Ez fermandarim?” Ma mirov evqasî paşketî dihizire?

Di bin berpirsyariya gelek ji we de ewqas şehîd hatin dayîn. Ew şehîd kîbûn? Gelo fermandarên me navê wan şehîdan dizanin? Me bi bîranîna **Heqî Qerer** partî damezirand. Bi bîranîna **Egîd** di dîroka Kurdistanê de yekem car me gêrîlatî pêk anî. Me ji bo çend hevalên xwe yên nas dikir ev kirin. De başe we çi kir? We bi sedan şehîd dan, mixabin hêj navê yekê nizanin, cihê van di dilê we de jî nîne. Emê çawa li hemberî we rêzdar bin? Hûnê çawa şer bikin? Piştî we nirxê xwe yên herî berz ji bîr kirin, rêzdariya li hember bîranîna wan winda kir, ti ferqa we ji cinawirekî namîne û hûnê siberojê li beramberî dîrokê bên darizandin. Yên van nirxên pîroz paşçav dikin, dikarin behsa çi bikin? Jixwe hûn dizanin ji gel jî ewqas mirov ketine çi halî. Gundên gelek ji wan hatin şewitandin. Hûnê qet li ser van serê xwe ne êşînin, nehizirin, nebêjin peywira me ya beramberî van çiye, paşê jî fermandariya erzan bikin! Diyare ev çiqas şaşe. Lewra ji we re dibêjim, hûn pir xeterin.

## Dilê Milîtan Bi Gel û Rêhevalên Xwe Ve Dagirtiye

Raye, peywir û fermandarî tenê bi yek sedemê dikare bê xwestin. Ji bo tola rêheval û gelê xwe rakirin û peywira xwe hîn serkeftî kirine. Ji bilî vê fermandarî xwestin tawane. Bi feraseta xwe dana jiyîn, bi şervanan lîstin û milet bikaranînê ve fermandarî nayê xwestin. Ger hûn ne dilpak û niyetbaş bûna, hewce dikir mirov weke xafil û xayînekî cezaya herî giran daba we. Ji ber ku dilê şervan bi rêheval û gel ve dagirtiye. Di nava refên partiyê de ji hemû şervanan re, ev rewşenbîr dibe, gundî jî dibe, ji kuderê hatibe bila be, nabe ku mirov nêzîkbûnên weke; "Ez desthilatiyê ji wî bigirim, şûna wî dagirim" bê kirin. Xweziya yekî cihê min dagirta. Mirov ji bo vê hezar carî şikir dike. Xweziya min bikariya bêjim hatine alîkariya min bikin û barê min parve bikin! Xweziya min bikariya bêjim vaye kesek ji teoriyê fêm dike hat, bijî ji min re ez giham wî! Xweziya min bikariya bêjim şervanek, gundiyek çiyayî yê baş hat cem rewşenbîrî, bijî ji min re ku ez giham şervanek wisa! Mirov li ser van bingehan bi hev dilşad dibe. Tevî ku rastî wisa ye, di salên berê de hevdu nepejirandin pir hat jiyîn. Ev dilek çawa ye? Ez kesekî yek alî tawanbar nakim. Yek yekê der dike, yên din jî wî der dike. We bi van nêzîkbûnên xwe ve ziyana herî mezin da partî û milet. Hûnê gundîtiyê di teori û siyasetê de pêş bixin. Dê gundî jî bi xebatê rewşenbîrekî, teorîsyenekî bi pratîk bike. Hûn çima nikarin li hember hev rêzdar bin? Ma her tim di dîrokê de ev wisa çênebûye? Ma şervanên gel bi temamî ne wisa ne? Ma hûnê ji bo xwe bikin fermandar vê rêgezê xirab bikin? Dê kî vî fermandarî û vî rewşenbîrî cidî bigire?

Ji jor heta jêr ji bo we tevan rexneyên min hene. Ma hûnê bi fesadiya gundîtî û zimandirêjiya rewşenbîrî ve min bixapînin? Gelo ev pêkane? Hûn li hember dijmin weke pisîkekê bêdengin, li hember hevdu jî hûnê bibin xirabkar! Paşê jî ma ezê we cidî bigirim? Ezê ji bo jîyîna we cîhanê tengav bikim, hûn jî çiya û qadên amade pêşkêşî dijmin bikin. Paşê jî bêjin; "Me şerê desthilatî meşand." Dê qijik bi vê bikenin. Ma qet ev nêrîn dide bawerkirin?

Ji bo em û hevalên xwe gihan hev, em gihan çek, gihan çiyan, hûnê hezar carî şikir bikin. Rojên ku em tolê ji vî dijmin û hevkarên wî yên bi salane em ji mirovatî der kirine û jiyana me bêzar kirine bigirin hatiye.

Hûnê bêjin bijî ji me re, yekîneyek me ya gêrîla ava bûye. Dê we bi vê taximê re destanan binivîsandan. Gelo tiştek din ji vê hêjatir û dilşadî dibe? Ji bîr nekin, hûn weke civak ji jinan kembaxtir kirine. Şev û roj bi lêdan û dûjînan ji mirovbûnê hatine derkirin. Ma yê welat anî rewşek ku neyê jiyîn ne dijmine, ne hevkarê wî ne? Niha we derfeta tolgirtinê bidest xistiye. Ji bilî vê hûn çi dixwazin? Ma çavê mirov ji bilî dijminê wî tiştek din dibîne, ji bilî wî tiştek din ve mijûl dibe? Hevalek, şervanek, ji bo hebûna herî hêja ye. Çekek ji bo amûra herî başe. Ma mirov qet bi van dilîze û van wêran dike? Lê wexta em li we dinêrin, weke rewşek pir asayî ye, li hember dijmin taktîkek we bawerî dide yan jî li hember hevkaran şerek we ya saxlem tine ye. Bi hevdu ve mijûlbûn, ehbap-çawişî, fitne-fesadî û xirabkirin weke şêwazek jiyanê didome. Yekser hûnê dev ji van helwestên xwe berdin. Ji bo vê dibêjim hûn pir xeterin, dînin, hedê xwe nizanin. Ti wextî ji bilî PKK'yîyek –çi şervanek ji rêzê, çi jî bila kesek bi navûdeng dibe- aresteyî dijmin bibe ti çareya wî nîne, ji bilî vê mafê yek gotinê bike nîne û rêxistin weke çeka herî hêja pêşxistinê zêdetir ti karê wî jî nîne.

Ez van xirabiyan weke qet nehatine kirin dihesibînim, ger we kiribin jî, dibêjim tiştek wisa nebûye. Bes di rastiyê de divê mirov we ceza bike. Hûn jî di fikir û nêzîkbûnên; "Karê min kirî asayî bû, bi sipartina vê ve ezê heq û huquq bistînim" de bi israr nebin. Bersiva tawanên wisa, cezayê girane. Pratîkên we yên berê jî di navê de, ger bangî we hat kirin ku hûn hesabê bidin, tiştek nikare we xilas bike. Nêzîkbûnên wisa şaş û xeterin.

Yên şer dixwaze û desthilatî dixwaze hûnin. Ev jî heta dawî mafê we ye. Ezê di vê mijarê de bi we re alîkar bim. Bes bi derfetên şerê me yê pîroz ve nelîzin, van xirab nekin, berovajî bila tevkariya we hebe. Ger hûnê bi hevdu re pêşbaziyê bikin, bi şêweya dê kî herî baş bike pêşbaziyê bikin. Bijî ji wî pêşbazî re, rêza yekem girtiye. Bijî ji wî fermandarê yekîneyê re ku, di şer de bûye xwediyê gavek pêşveçûyî. Em vê ji we hêvî dikin. Ya herî xweşik jî eve û ev kes dikare ber bi desthilatî ve bimeşe. Yê dizane baş li dijminê xwe bide, li ser axên welatê xwe û di dilê gelê xwe de cîh bigire, dikare ber bi desthilatî ve bimeşe. Li her qadê, her aliyê welat, kesên xwedî vê seknê xwe dinasin. Wê ev kes misoger nêzîkbûna rast ji jiyana nav partî û xisleta herî bingehîn a şervanekî re bikin. Dê kêlî bi kêlî peywirên xwe yên herî bingehîn pêk bînin. Wê çeka rêxistinê pir paqij bigirin. Pêwîste bizanin

xirabûnên li hember hev dikin, zerara ku kontrayê herî baş nikare bide ew didin hev, hinek tişt li hemberî hev bikaranîn tawana herî xetere, carek din teqez ne yekser ne jî neyekser nekevin van rewşan, kesî nexin û rê nedin van helwestan. Ev nêzîkbûn jî di radeya sereke de xwedî girîngiye û vê jî weke kar û peywir bibînin. Ger jêhatiyên wan hebin, dê bi perwerde û rêxistinkirina zêde ve hewl bidin li dijmin bixin. Ger dixwazin bibin desthilat, wê mînakek biçûk a desthilatî danin serê çiyayekî, pêl bi pêl li deştê û ser dijmin belav bikin.

Hûnê terbiya rêxistinê û partiyê wisa bigirin. Tiştên ku hûn heta niha fêr bûne bavêjin zibildankê. Şêwaza fêrbûna rast wisa ye. Ger rêzdariya we li hemberî me hebe, bi hewldanên hûrûkûr ve xalên em ji we re vedibêjin fêm bikin. Hûn her tim kesek wisa nabînin. Fêr bibin, ev hemû ji we re hewce ne. Heyfa we ye, heyfa kesayeta we ye. Ji ber we di mercên pir zehmet de jiyan kir. Rêya rêzdariya li hemberî xwe, nêzîkbûna li gorî van axaftinane. Paşê dikare şêwaza şer rehetî bê destgirtin. Ew jî ne nepeniyek ku qet neyê dahûrandine.

Hûn biçin kuderê li gorî wir teşe bigirin. Li gorî çiyan, li gorî deştê yan jî li gorî herêma sor teşegirtin girînge. Karên weke baregeh, serdegirtin û kemîn pir hêsanin. Ev karên ku em herî baş dikarin bikine. Ev teoriyek kûr jî naxwaze, fêrbûnin. Bi zanebûna bikarin weke avê biherikin, hûnê wate bidin mijarên weke kemîn û taktîkan. Xistina dijmin, li çiyan karê herî hêsan dikare bê kirine. Niha ji bo şerê gêrîla, divê hûn bêjin karek weke pisîk bi mişk re dilîzê ye. Hûn ji hêla têgihiştin, ji hêla wêrekî û fedekariyê ve jî, ji vê re amade û guncavin. Vêca hûn çima nikarin xwe rast bikar bînin? Li şûna hûn bi karên vale re mijûl bibin, bi karên rast ên şer re mijûl bibin. Ger hûn bi karê şer re mijûl biban, niha hûn bibûn general. Ger we dev ji fesadiya gund, hevdu mijûlkirin, di xisletên paşketî û hov de israrkirinê berdaba, niha hûn hemû bibûn xwediyên desthilatiyek rasteqîn. Mixabin bi mantiq û şêwaza jiyana heyî, ev nepêkane. Hinekê ji gotinan fêm bikin, nexwe heyfa we ye.

Ez jî gundiyek bûm, lê niha xwediyê desthilatiyekê me. Çil salin mijûl dibim, lê hêjî xwe naxim dewsa zilaman. Li Kurdistanê mirovek ji min bandortir nîne. Heta di cîhanê de jî di pileya yekemîn de me. Lê hêjî xwe weke xwediyê desthilatî nanirxînim. Tenê hinek din kerb û hêviyên xwe bibandor bikar tînim, ewqas. Weke hûn jî dibînin bi pîvanim û plangerim. Ger ne wisa be, bîst û çar demjimêran min li vê cîhanê nadin

jiyîn. Hûn çima xwe winda dikin? Bêku derfetek biserûber a şer bikeve destê we, bêku hûn xwe biserûber binasin, ma mirov wisa xwe winda dike? Nexwe hewce dike, hûn dev ji vê dînîtiyê berdin.

Karê herî baş hûn bikarin bikin, şere. Ji bilî şer bi qasî pênc quruşan jî nirxa we nîne. Hûnê pariyek nan û şorbeyekê jî peyda nekin. Niha li navenda Amedê, li odeyek teng çar malbat dimînin, di odeyek wisa de tam sih kes dirazin. Nanek somin davêjin, sed kes hêj nanê somin li hewa hewl didin bigirin. Rastiya gelê me dijî wisa ye. Qet hewce nake hûn xwe bixapînin. Divê hûn qîmeta nan jî bizanin. Miletê me her roj dimire, heta tê qetilkirin û di vê rewşê de birçî dijî. Hûn çima çavên xwe ji rastiyan re digirin, çima li hember jiyana gel rêzdar nabin? Çima cihê jiyana vî miletî di dilê we de nîne? Devjêberdin rojê sê danan xwarinê bixwin, nanek somin digirin bin çemgê xwe û bi xwîn û xwêdanê dibezin.

Dewletê raporek weşandiye, li gorî vê raporê ji sedî çilê şêniya heyî jêrî sînorên birçîbûnê de dijî. Ango mirin her kêliyê heye. Ji ber ku we mirin berçav girtiye, hûn nikarin bêjin xwediyê her tiştî ne. Hûnê vê jiyanê weke dilşadiyek mezin binirxînin. Jixwe, ne tenê zikê we têr dibe, hûn ji hêla bîrdozî û siyasî ve jî berz dibin. Ev jî bi pere û mereyan nayê kirîn. Hûn çima bi hestên şikirdar nêzî van nirxan nabin? Dema yek silavek xweşik dide min, ji ber ku wî mirovî silavek xweşik daye min bi qasî cîhanê kêfxweş dibim. Ji ber hinekê pişgiriya wî ji bo min çêbûye, heta qiyametê wî ji bîr nakim. Ji ber dost vê xisleta min dizanin, bi min bawer dikin. Ji ber pir baş qîmet didim nirxê ji min re tê dayîn.

Weke hûn jî dibînin, em ji sifirê destpê dikin we heta vê astê mezin dikin. Bes hûn hêjî hewldanên me înkar dikin. Ev şaşe, ev bêrêziyek mezine û ji hestên şikirdarî dûrbûne. Li hember rastiya gel û şehîdên me bêrêzî ye. Hûn nikarin ji bo wan şehîdan bêjin ew mirin, çûn. Wan canê xwe yên taze dan axê û xwîna xwe rijandin. Misoger wateyek vê heye. Madem hûn dixwazin bibin fermandar, nexwe hûn nûnerê wê xwînê ne û hûnê wî deynî bidin. Ji bilî vê jî nûnertiya PKK'ê nabe. Wateyek şahadetên PKK'ê heye. Tenê yên girêdayî wê dikarin vê têkoşînê bidomînin. Hesabên cuda negengaze. Jixwe ji hêla mantiq, exlaqî, wate û siyasî ve jî ev negengaze. Vaye rastî wisa ne. Ez van rastiyan rave dikim. Mixabin ên me jî ji têlek din ve lê didin. Êdî hûnê dev ji vê berdin.

Ev wisa ne şerê hizbî û ne jî şerê desthilatî ye. Ev lihevketina sebabane. Mirov nikare ji vê re bêje şerê hizbî jî, navê vê qanûna ku dijmin; "Se diberde se ye." Eşkere ji we re bêjim; ev ne şerê desthilatî û hizipkariyê ye. Ger wisa bûya, ezê li hember rêzdar bûma. Ev lîstokek erzan a dijmine. Ji ber ku hûn jî ne di ferqa vê de ne, vê dilîzin. Ev têrkirina xerîzeyên paşverû û erzanin. Bi navê desthilatî, hûn şerê nizanim biçin kuderê çi bikin dimeşînin. Ma bi navê desthilatî şer wisa dibe? Hûnê wate bidin van mijaran, li gorî meyil û birîkirinên xwe guncav xetekê bişopînin. Ev jî xeta partiyê ye.

Kar û barê me şerkertî ye. Ji bo têrkirina zikê xwe jî, ji bilî şer ti careya me nîne. Niha li Kurdistanê şer, şêwaza hilberînê ya yekane ye. Yên ku li Kurdistanê dixwazin nan bidest bixin jî, neçarin bizanin şer bikin. Rastî bi vî rengî ye. Di rapora herî dawî ya dewletê de tê gotin; "Ji sedî çile milet di bin sînorê birçîbûnê de ye." Di vê rewşê de ji bo tenê têrkirina zikê xwe jî be, yekane şêwaza hilberînê şere. Ji ber ku şerê taybet her tişt desteser kiriye. Şerê taybet, şerê desteserkirina hemû derfetên jiyanê yên heyî ye û ev di meriyetê de ye. Ger hûn jî dixwazin li hember wî xwe têr bikin, hûnê şerê xwe li dijî şerê taybet bimeşînin. Nexwe, ev şerê em dimeşînin, şerê pêşî têrkirina zikê xwe ye û ev jî girînge. Ne înkarok bin. Ji bo me pîşeyek din nîne. Piraniya ciwanên tevlî refên me dibin, ji ber birçîbûnê hatine. Pergal van têr nake, nexwe emê ji bîr nekin ku em ji bo nan şer dikin, emê wateyek berz bidin nan. Nan ti carî kêm nebînin, girînge. Hêjî pir hez dikim dawiya xwarinê pariyek nan bixwim. Ji ber ew nan pîroze. Em hêjî şer ji bo wê dimeşînin. Dê feraseta nan wisa be, hûnê bêjin; "Nan pîroze û em ji bo wê şer dikin." Li vî welatî jî ji hezarî salan ve şerê genimê pîroz hatiye meşandin. Nan, nanê genim pir hêja ye. Mirovatiyê nan destpêkê li vir xwariye, ji bo nan, nanê genim şer kiriye. Piştî wê çiqas çalekiyên mirovî yên weke siyaset, heq, huquq, şeref, serfirazî û çand hebin, ji bo wan hatiye şerkirin.

Pêwîste felsefeya me ya şer pir kûr be. Jixwe pir li me hatiye xistin, yek aliyê me lêdan nexwarî nemaye, yek kesê me ku heqaret lê nehatî kirin nemaye. Nexwe hûnê li dijî vê heqaret û bêxêriyê şerekê bimeşînin. Ji bilî vê emê çawa xwe mirov bibînin? Giyanwerî û dilxweşiya me bi erdê re kirine yek. Emê ji bo vê şerê dilxweşî, şerê giyanwerî û şerê şerefê bimeşînin. Piştî me ev tev kirin, emê şerê axa azad bimeşînin. Piştî wê ger pêkan be, emê hîn zêdetir şerê desthilatiya

siyasî bimeşînin. Ev hemû şerin. Fermandar jî, kesê ku van şeran herî baş dizane û dimeşînê ye. Ya herî girîng jî, dijmin dinase û dizane wî bi erdê re bike yek. Wexta yekê bi hîle, zorakî û hemû rêbazên şer ve dijmin paşve xist, hingê ew fermandare. Fermandarê ji bilî vê tevgeriya, tê wateya şaşiyê dike û kes wî fermandar nabîne, ez jî nabînim.

Ji ber hinekê zerar didim dijmin gel hinek tişt ji min re dibêje, ez jî dibêjim dibe. Evqas kar dikim, her kes ji dil û can dipejirîne, bes ez hêjî ji bo xwe napejirînim, dibêjim çima dibêjin Rêber! Tenê ji bo keyfa gel xirab nebe Rêbertiyê dipejirînim. Rastî wisa ye. Ezê çima xwe bixapînim. Ji ber hûn û gel dixwaze dipejirînim. Hêz didim we, dilxweşî didim, lê ev jî min tengav dike.

Lewra pêwîste şer, weke pîşeyek henase dide û av bê vexwarin be. Divê ehda we hebe ku hûn bi taximekê re destanan binivîsin. Pêwîste hûn bêjin yekîneyek pêncî kesî, mînak ji bo qadek weke Botanê bese û zêde ye jî. Ji bo meşandina şerê gêrîla hûnê çavê xwe berdin vê. Ger dê sond û ehdek we tevan hebe, divê bi şêweya gotina; “Ezê bidim diyarkirin ku bi yekîneyek hêza gêrîla, destanên çawa tên nivîsandin” de be. Daxwaza peywir, divê bi hêzek wisa re li ser bingeha wê dijmin çawa bê xistin de be. Lê belê fermandarên me hêza amade jî yan dirizînin, an jî didin revandin. Ma şervantî û fermandariya wisa dibe? Ev suce. Ger hûn di van helwestan de israr bikin, hûnê bi sezayên giran re rûbirû bimînin. Wexta we fermandariyek xwest, divê soza hûn bidin li ser vî bingehî be. Ger hûn wê jî ser nexin, hûnê bêjin; “Ezê xwe nedim jiyîn.” Ji yên wisa bêjin re, serfermandarî jî vekiriye. Bes bila li vî welatî, kesek wisa derbikeve. Lê belê kesek jî nizane derfetên amade yên me dayîn jî bikar bîne, hêza şer a em bi hezar xwîn û xwêdanê didin jî rast nanirxîne, ger rayeya xwe qet fêm neke, wê demê nikare bibe paşayê qereçiyan jî. Ew tenê dikare bibe serkêşê kontra, jixwe wisa jî dibe. Em nikarin firsendê bidin rewşên wisa.

Carek din vedibêjim: Di salên 1980’î de, di bûyera Hîlwan-Sîwerekê de jî wisa dihizirîm. Di çûyîna Botanê, çûyîna Behdîna de jî heman tiştî dihizirim. Ger hûn PKK’yîyek jidilin, şaşî û nebesiyên heta niha we raber kirine tine bihesibînin, a rast jî xalên ez destnîşan dikime. Kesek PKK’yîbûnek wisa pêk tîne û wisa ji şer fêm dike, biçe kîjan çiyayî, bikeve kîjan qadê bila be, ew gêrîlayek bêhempa ye. Vê îdîa xwe diparêzim. Lê hûn li gorî vê tevnagerin. Encamên wê jî li holê ne. Li holê ye hûn ketine çi halî û we çawa winda kir.

Rastî her tim raste, sedsal jî derbas bibe rastiye. Ev milet tenê dikare bi şerek gêrîla ve bê rizgarkirin. Ev niha jî rastiyeke, dê ev rastî sedsal şûnde jî rastî be. Ger beriya niha pêncî salan jî şerê gêrîla hatiba meşandin dê serkeftî bûya. Lê niha ev siûda we ye. Hûnê vê siûdê ji bo rizgarî binirxînin. Hûn ji bilî vê kêrî tiştek din nayên, nikarin nanekê jî peyda bikin. Ya li benda we, îşkence û komkujiyek dijmin a pir xirabe. Lê derfetê pêşî li vê girtin jî di destê we de ye û hûn dikarin bi şerkeriyek bêhempa ve pêşî lê bigirin.

Bila ti kes hesabên şaş neke û firsenda kirinê jî nede. Qîmeta nirxan baş zanîn, li hember kesên bi nirxan dilîzin ne tenê li çiyan, li her cihî dij derketin girînge. Ji ber ji bilî vê negengaze em bibin mirov, heta negengaze em zikê xwe têr bikin. Emê çima bi rasteqînî nebin? Yên ne rasteqîn bin, qîmeta şer û nirxên ku şer biafirînin nizanin. Lewra şerker, mirovê herî rasteqîne. Em ji mirovê ku bi qasî şerê pariyek nan, ewqas jî şerê şerefê herî baş dizane re dibêjin gêrîla û şerker. Hûnê jî vê esas bigirin. Mînak bizinek jî baş dizane çawa xwe li çiyan biparêze. Marek dê çawa pêve bide misqal bi misqal hesaban dike, dê çawa xwe nêz bike nêçîra xwe li cihek teng bigire û pêve bide baş dizane. Ger hûn heywanek dirinde berçav bigirin, hûnê her roj fêrî pêncî quralên şer bibin. Vê sekna we asayî nabînim. Sedema vê jî jiyana we ye. Ji bilî şêwaza we ya şaş û ji ber hûn serî ditewînin dijmin bikare we bîne lîstokan, ti raveya nepêşxistina şer nîne. Ger hûn şêwaza rast esas bigirin, dijmin nikare li hember we li ber xwe bide. Ger dijmin artêşek sed hezar kesî jî derbixe pêşberî we, ew artêş û şerê wî yê taybet dê bibe bela serê wî. Ji bo artêşek sed hezar kesî, hezar gêrîla jî zêde ye. Bila gêrîla salekê şerê ji taqet xistinê bimeşîne, dê ew artêş bibe bela serê dijmin. Hemû teoriya şerê gelan vê xalê destnîşan dikin. Emê çima vê pêk neyînin?

Hejmar û wesfa artêşa wî ya bipergal, her tim bela serê dijmine. Di artêşên fermî de hejmar, qelsî ye. Ger hûn bikarin gêrîlatiyê bi hemû ziraviyên wê ve pêk bînin, dikarin teknîk jî veguherînin rewşa qelsiyê. Ji bo gêrîla hejmara kêm ne qelsî ye. Heta dikare weke derfet bê bilindkirin. Teknîka gêrîla ne qelsî ye, ji ber ku çeka sivik ji tanqekê bandortire. Elbet ger hûn bi qasî hewce bikar bînin, ev wisa ye. Lê belê ger hûn bibin hedefa tanqan, bikevin kemîna tanqan, wê derbikeve holê hûn şervanên xirabin. Dibe ku dijmin komek tanq anibin, bes her tim bi tanqan li çiyan dayîn tenê wê topên wî biqedîne û benzînê xerc bike.

Dikare ji bo firokan jî heman tişt bê gotin. Her wiha ji bo hemû topan jî dikare heman tişt bê gotin. Bes hûnê hemû ziraviyên gêrîla pêk bînin, rêbazên têkoşînê yên weke veşartî, xebatên binerd ên tên zanîn jîndar bikin.

Nexwe ger hûn van pêk bînin, dê hejmar jî, teknîk jî bibe bela serê dijmin. Hejmara we kême, sivikbûna teknîk jî derfeta mezine. Cewhera gêrîla eve. Gelo çima we heta niha şerek bi vî şêwazî nemeşand? Vaye pirsgirêka we di vir de ye. Ji bilî vê derfeta jiyîn û serkeftina di şerekî de tine ye. Vêca li şêwaza şerê xwe binêrin: Bûne hedefa tanq, top û firokan, têra xwe jî pêl mayînan kirine. Ev jî encama şaşiyên ku bi gêrîla re nakok hûn dijîne. Bînewirek paşketî, şivanek, gundiyek nezan û eşqiyak jî van şaşiyan nake. Lê we kir. Ji ber serê we tevlîhev bû û hûn xalên ji dervî şer ve mijûl dibûn. Di van mijaran tevan de hinekê bi aqil bin. Hûn kesên evqasî zanebûn bidest xistine. Hûn çima bi rasteqînî nabin?

Dema **Mao** derdikeve çiyayên Çînê, çar pirtûk xwendibû. Dema **Castro** dest bi gêrîlatî kirî çend pirtûk xwendibû yan jî ne xwendibû. Niha hûn tev bi qasî Mao, bi qasî Castro xwedî zanebûnin. Lê tişta bi we re neyî welatparêziyek hevgirtî, rêxistinparêziyek rast û heta nêzîkbûnek mirovî ya raste. Ez ji vê re jî bi gotina herî sivik dibêjim dînîtî ye, tewşbûn û hedê xwe nezanîne. Hûn ji ber vê winda dikin.

Bi şêweyên şerê hûn pê ve mijûl dibûn, we pir zerar û ziyan da artêş û hevdu. Lewra we şer û gêrîla pêş nexist. Ji ber şêwaza şer û jiyana pir şaş, ma kesê çeka xwe, lojîstîka xwe û hevalên xwe dide dest dikare şer pêş bixe? Bifikirin hemû fermandarên me di çi halî de ne: Ma ev dikarin şer pêş bixin? Nexwe rexnedanek jidil ne li pêşberî me, li hember wijdana xwe bikin û ji bo xwe soza biryardarî bidin. Ji ber ji bilî vê hûn nikarin nanekê jî rizgar bikin.

Li min nenêrin. Gava hûn teng dibin tên cem min û bi giştî jî ji min hêz digirin wisa dijîn. Lê ti ewleya min nîne, li dervî welatim. Her roj hesab li ser min tên kirin û nediyare dê siberojê çi ji min be. Lewra bawerî bi xwe bînin. Evqas jiyîna min jî ji bo xwe, heta ji bo serkeftinê deh qatî zêde bibînin. Ya mayî hûnê temam bikin. Ya rastî jî wisa ye. Ger niyeta we ji bo şerek cidî heye, bi rastî jî hûn dixwazin hinekê şerê welatparêziyê bimeşînin, bi rastî jî dij-faşîzmê bin, hûn neçarin vê wisa bikin. Lewra li ser kiryarên we qaşo bi navê jiyanê kirine xetek sor bikişînin û heta dawî bi derbaskirina wan ve xwe bigihînin rastiyê. Wê

demê dibe ku hûn bijîn. Lê ger bi şerkirinê hûn bijîn, hûnê bi serkeftî bijîn.

Nirx didim we. Hûn jî dibînin, heta bêhna xwe ya dawî hêza xwe jî bikar tînim. Van tevan ji bo em hinek din serbilindî û bi namûs bijîn, wate bidin şerekê dikim. Xwe ji van şaşî û kêmasiyên mezin pak bikin, ji bo hûn wate bidin bêrî û hêviyên xwe, hewcedariyên wê pêk bînin van dikim. Jiyanek din herame. Ji bilî vê emê bibin bênamûsên herî mezin. Wê demê ezê nekarim xwe jî weke heyî û we jî mirov bihesibînim. Heta ku ev şer serkeftî neyê meşandin, kes nikare rû spî û serbilindî bimeşe. Piştî evqas binkeftin, paşverûtî hebin, emê çawa li rûyê hevdu binêrin? Emê çawa weke axaftvanên vale hevdu guhdar bikin? Ji ber min xwe weke hezkiriyê mirov mezin kiriye, li we guhdar dikim. Bes yeke din be, wê di carekê de we li erdê bide. Ti kes mirovên ku li welatê xwe û di nava şerê xwe de şaşiyên wisa dike efû nake. Ez jî vê bi pakbûna we û hinekê jî lîstokên dijmin ve girê didim. Teqez encamê derbixin û misoger xwe sererast bikin. Ji bo şer û têkoşînê kîjan qad dibe bila be, her cih hêja ye. Qada me jî hêja ye. Ji ber ku ez jî şer dikim.

Em li ser vî bingehî ji xizmetê re amade ne. Em gelek pêdiviyên we yên şer û jiyanê pêşwazî dikin. Lê cardin bêjim: Bînin ber çavên xwe me ji bo pariyek nan salên xwe çawa bi şer derbas kir. Qet nebê bila li ser vî bingehî hinekê rêzdariya we hebe. Dê ev herî dawî we jî bike mirov, bike kesayetek bi şeref û serfiraz. Bike xwedî nasname. Carek din nebêjin; "Min fêm nekir, hewcedariyên wê pêk ne anîn." Vê qet nebêjin û wisa pêşberî me jî nesekinin. Hûn diçin kur biçin, bes li ser vî bingehî di refên me de nemînin.

Hûn ne şervanên çînekê, hizbekê ne. Hûn tev jî mirovên hejarin. Wexta hûn tev bibin yek dikarin jiyanê birêxistin bikin û şer bikin. Ji bilî vê ti çeka we nîne. Lewra, hûnê bizanin li hemberî xwe rêzdar bin. Ya demîne hêsane. Hûn dikarin ya dimîne ji min çil qatî zêdetir baştir bikin. Yeqîn dikim hûnê her cure şêweya şer û hemû ziraviyên şêwaza gêrîla ji min baştir pêk bînin. Berê jî ev baweriya min hebû, niha jî wisa ye.

**2 Adar 1996**

## DI ÇAVKANIYA ŞEREF SERFIRAZÎ Û HUQUQÊ DE SERKEFTIN HEYE

Beriya hûn pirsgirêka xwe bi dijmin re çareser bikin, divê xwe bi xwe re çareser bikin. Ji bo binxistina dijminê li eniya vekirî, pêwîste hûn pêşî van nêzîkbûnên jiyanê yên we ji dijmin kembaxtir kirine, mirov bawer nake û zehmete pênase bike bên çareserkirin. Nexasim misoger hewce dike hûn nêzîkbûnên xwe yên partî, rêxistin û şer ber çavan re derbas bikin û jidil li xwe mikur werin. Jidil ji wijdana xwe hesabxwestinek weke; "Em çine, kîne, me çi kir, çima wisa kir, ya rast çibû, dê me çawa kiriba û çima me nekir?" Bikin. Di vê mijarê de rewşên weke ji ber rêxistinê xwestiye, partiyê giraniya xwe daniye yan jî ji bo hinekê xwe bi Rêbertiyê bide pejirandin, bi rexnedanek erzan ve xwe nexapînin. Jixwe hûn bi vê ne dikarin xwe veşêrin, ne jî gavekê nêzî armanca esasî bibin. Êdî divê hûn vê sextekariyê bavêjin. Divê hûn pir dijwar nêzî xwe bibin. Şaşiyên xwe veşartin, sergirtin û bizanebûn ber bi mirinê ve çûyînê de israrkirin, şêwaza ber bi belavbûn û xirabûnê ve dibe neberdan, mezinbûn û rêzdariya wê nedîtin, her tim dibin nêzîkbûnên we yên xwe xapandinê. Vaye em jî ji vê re dibêjin fêrbûnên xirab û bingeha wê jî heta ber bi dijmin ve diçe.

Min ev pir vekirî got: Ti aliyê vê kesayeta we ya bê efûkirin nîne. Kes bi vî halê we ve, devjêberdin we bixe nava arenaya polîtîka û hunera leşkertî ya berz, we nagirin nava cemaetên me yên gundan jî. Werin ser hişê xwe. We xwe sipart min, rûmeta min xirab bikar anî, anîm rewşek nayê nasîn û li hember dijmin lewaz xist. Wisa xwe bi egîd dîtinê ve mirov nabe mirov. Ew hewldana ku ez ji bo yek dilop xwîna we raber dikim, gelo hûn dikarin ji bo wan kedên me yên berz raber bikin? Gelo hûn di vê mijarê de tînin bîra xwe bi qasî misqalekê jî rêzdar bin?

Bi kesayetên xwe yên tine û xilas bûyî re, bi hemû reftarên bêfihêt û ji xwe razî ve, hûn PKK'ê tengav dikin. PKK bîrdoziyeke. PKK şereke. Bêku hûn ti xala vê ya bingehîn berçav bigirin, nabe ku bikaranînê ve bê tinekirin. Hûnê vê bidin rawestandin. Em xizmetek mezin pêşkêşî we dikin. Ewlekariya we saz dikin, we têr dikin. Tişta ji we re dimîne jidil fêrbûn, xwe ber çavan re derbaskirin û bûna mirove. Hûnê çima ji ber vê bixeyîdin, ji vê birevin? Kesê li hember dijminê xwe tiştekê nake, li

hember jiyanê ti nirxa wan nîne, dê kî çi jê bike, çend quruş qîmeta wî kesî heye? Bi paşverûtî û her cure bê edebiyê, xwe bi xwe xapandinê ve, jiyan veguhertina govekê tê çi wateyê?

Bi qasî dibînim kesayeta we ya ku pergalê nekariye bi dîsîplîn bike yan jî pergalê nekariye sererast bike, direve xwe davêje nava PKK’ê. Hemû kesên hedê xwe nizanin jî, dixwazin di nava PKK’ê de li gorî dilê xwe bijîn. Kesayeta ku pergalê jî firsendek nedayî, dixwaze di nava PKK’ê de encamê bigire. Ev jî rewşek pir xeternake. Ti mafê we ji vê re nîne. We canê xwe avêtiye bazarê, ev jî bi şêweya herî xirab xwe pêşkêşkirine. Hûn dibêjin; “Ez kengê dimirim bila be, bes rojekê li gorî keyfa xwe bijîm besî mine.” Taktîka we ya di nava partiyê de wisa ye û ev jî taktîkek pir xirabe. PKK wisa girtina dest, PKK wisa nirxandin, xirabiya herî mezin lê kirine. PKK cihê terbiyek mezine, cihê pêşketina rêzdariyê ye. Cihê mirovê me xwe dibînine. Hûnê PKK’ê weke çarçoveyek wisa, qada jiyanek wisa û dibistanek jiyan ji nû ve tê hilberîn bibînin.

Hinek ji we pîvanên partiyê pir tengav dikin. Bi salane we hinek tişt kirine fêrbûn. Bes wisa nabe, bi vî şêweyî nayê pejirandin. PKK, li gorî axaftinên pêşiyan rêxistinek ewliyane û divê wisa jî be. Kesê xwe negihîne vê, dê minafik bê destnîşankirin. Hemû çeka we, çeka dînîtiyê ye, çeka nexweşiyê ye. Hûnê lîstokên weke ser hişê xwe biçin bikin, her tişt wisa diqede. Hûn bêhişên şoreşê ne. Çawa ku jinên lewaz li hember bûyerekê yekser ser hiş diçin, rewşa we jî heman tişte. Yê tê nava partiyê ser hiş diçe û şaşwaz dibe. Tiştek din ji destê we naye. Pêwîste hûn van bibînin û bizanin PKK rêxistinek çawa ye. Weke hûn dibînin, partî wisa hêsan ji bêhiş, ketî û nexweşan re eleqedarî raber nake û rê jî nade. Hişê xwe bînin serê xwe. PKK rêxistinek bi îdîa ye. PKK rêxistinek emperyalîzmê jî evqasî direcifîne. Hûn kîne bi wê bilîzin? Hûn nikarin serfirazî û şerefa PKK’ê wisa erzan bikin malê xwe. Em kesî bi zorê nadin şerkirin, bi zorê di nava partiyê de nagirin. Lê li hember kesê ku nirxên me binpê dike û xirab dike jî rastiyek me ya efû nake û paşçav nake heye. Hûnê vê di hemû şaneyên xwe de hîs bikin û hişê xwe bînin serê xwe.

Hûn partiyê weke rêxistinek malbatê, yekser weke mala bavê xwe dibînin. Rastî ne wisa ye, berovajî vê ye. PKK li hember malbatperestî, eşîrperestî, her cure feraseta otorîteya feodalî, heta ya herî girîng her cure koletiyê, tevgerek azadiyê ya mezine. Tevgerek bi qasî xwedî

nêzîkbûnek yekîtiya netewî ya mezin, ewqas jî xwedî nêzîkbûnek ber bi mirovatiyek rast ve diçe. Karê herî zêde hûn dikin, rastiya Rêbertiyê xirab bikaranîne. Di vê cîhanê de rastiyek ku herî kêm bê bikaranîn hebe, ew jî rêbertiya ku em li Kurdistanê bilind dikine. Rastiya Rêbertiyê di astek bêhempa de zanyare û kes dinase. Min hemû nêzîkbûnên we yên hûn bi şêwaza dîlawerekî raber dikin, eşkere ji we re vegot. Şêwaza şerê min bêhempa ye. Qet nebê bi qasî dijmin li hember vê rêzdar bin.

Dema hûn tevlî PKK’ê bûn tişta min jî bi we re dît, li hember quralên civakê yên herî kêm weke dîn bên cem hev, hûn her cure dildarî, bêhişî û xirabûnê dilîzin. Di vê rewşê de jî kesên dogmatîk, zimandirêj û koleyên civakî xwe didin der. PKK ne wisa ye. Rastiya min tê zanîn. Kesek wisa me, hemû cîhan hesabê dike, dipîve û wisa gav davêje. Bi hesasiyetek mezin gavên xwe amade dikim û davêjim. Lê hûn bêfihêt, dibêjin ku hûnê Rêbertiyê bikar bînin. Ma hûn qet vê bawer dikin? Li welatek evqasî fêlbaziyên gundîtî û pozbilind lê heyî, bikaranîna Rêbertiyê hêsan bûya, dê wan bikar baniya. Ger ev bihata serxistin, dê wan ser xistiba.

Hûn ciwanin, bi rehetî dikarin ji kirêtiyên ku pergalê hûn têkil kirine xwe rizgar bikin. Ya herî girîng jî, hûnê dawî li kesayeta lewaz, bêhêz, zêde kêrî tiştekê nayê, ti wateyê rave nake û karekî nake bînin. Ma ji vê hêjatir çi heye? Me heta dawî rêya jiyanê vekiriye. Ji bo mirov ji bilî bi şeref bimeşe, çi dixwaze? Em îdîa dikin, me rêya dîtina hemû nirxên bi me dane windakirin vekiriye û derfetên wê pêşkêş kirin. Ji bilî vê hûn çi dixwazin? Hûn dibêjin; “Emê carek din xirab bikin.” De başe ma hûn kontra ne? Hûn dibêjin; “Emê li gorî keyfa xwe û pêdiviyên xwe yên rojane bikar bînin.” Ma hûn gundiyek ji rêzê ne? Armancên we yên siyasî yên mezin hene, armancên we yên netewî hene. Ma mirov rêxistinê qet wisa tengav dike? Ma rêxistinek şer wisa tê bikaranîn? Lewra dehî caran xwe ber çavan re derbas bikin. Xwe bigirin dest, bipîvin. Derbixin holê çi li jêr çi li jor mane, di kesayeta we de çiqasî çorsbûn maye û çiqas nirxên jidil kom bûne. Di vê mijarê de rexnedanek jidil an jî li xwe mikurhatinek rasteqîn hewce dike. Misoger divê hûn vê pêk bînin.

Mikurhatinên xwe binivîsin. Nabêjim xwe bikin gunehkar. Lê jidil bin. Bi rastî jî çiqas gunehên we hebin, çiqas fêlbaz li ser milê we hene, divê ev mikurhatinek van hemûyan derbixe holê be. Hûnê rehet bibin,

qet netirsin. Ol jî vê dibêje, nebî jî vê dibêjin. Ji bilî vê civak sererast nabin. Ez ne temenekê, heta ku rojekê, kêliyekê xwe pak nekim, nebim xwedî şeref, serfirazî û azadiyê nikarim yek gavê bavêjim. Ji wê demjimêrê, ji wê kêliyê ditirsim. Ger tam pak bim û tam hêjayî bim gav davêjim. Lê mixabin we temenek herimandiye, dimeşin û ev jî ne di xema we de ye. Fikrek rast a vî temenî çênabe. Lewra di nava we de kesayetên saxlem û mezin pêş nakevin. Bes niha ji bo vê rê vebûne. Hûn dikarin xwe jidil ber çavan re derbas bikin û wisa ber bi rastiyê ve gav bavêjin. Qet hewce nake hûn xwe bispêrin duruşmeyan, taklîd û mumîntiya erzan. Dikare PKK’yiyek bi îman, zana pêş bikeve. Hêza kesekî tine ye ku bi minafiqtiyê PKK’ê xirab bike.

Tevlîbûnek jidil, nêzîkbûnek pêşî li hember wijdan hesab dide û meşek partî ya bi kesayetek azad hatî sazkirin, misoger ji bo we ya herî hêja ye. Hûn pir dixwazin li hemberî me rêzdar bin. Bi rastî jî negengaze ku em vê nebînin, lê hûn qet nikarin vê pêk bînin. Ez nabêjim xwe tengav û aciz bikin. Xwe bi tevgerên ne jidil nedin kuştin. Ya ez dixwazim hîn hêsantire, hîn kêmtir diwestîne û hîn kêmtir fedekariyê dixwaze. Lê kesayetek hîn bi aqiltirîn, baştir dahûrînê dike, pêdiviyên kar hîn jidil dike û ji vê tawîzan nadê ye. Ger hûn bêhêzin, peywir negirin. Nexasim dema hûn nêzî peywirên fermandarî dibin, weke berê nekin. Divê heta dawî bawerî, tolgirtin û evîna we hebe. Tenê ji bo hinek helwestên we yên keyfî çêbûn an jî ji bo hûn li hember rêxistinê şermîn nebin, tevî ku ne amade ne, nebêjin em amade ne. Nexwe hûnê pir zehmetiyan bijîn. Li hember neçartiyê û ji bo parastina namûsa feodalî ya erzan, peywirên dîrokî nayên xwestin. Ev şaşiyek pir mezine. Nexasim ji vir û şûn de xwestekên xwe yên peywiran, di çarçoveyek rast de binirxînin. Bi rastî jî karên hûnê bikarin bikin, dema hûn qane bin hûnê mafê wê bidinê daxwaz bikin. Peywirê bi biryardariyek misoger ve bixwazin. Ji bo rizgarkirina hinek helwestên xwe yên keyfî yan jî ji ber dîsîplîna rêxistinê, ne jidil û helwestên hêza we derbas dike raberkirin ne rastin. Heyfa we ye.

Ger îdîaya we ya bûna mirov, li hember jiyan û xwe rêzdariya we heye, hûn dikarin behsa şeref û serfiraziyê bikin, hûnê heta dawî xwe ji serkeftinê re amade bikin. Kesê ku li hember dijmin ti nirxî rave nake, ser naxe, hûnê di bin lingê xwe de biperçiqînin û derbas bikin. Kesê ku nekare li hember dijmin tiştekê bike, ji bo min kesê herî ketî ye. Mirina kesek wisa ji mayîna wî baştire. Nexasim kesê ku di nava partiyê de nûnertiya vê dike kembaxtire û nayê efûkirin.

Di çavkaniya şeref, serfirazî, heq û huquqê de serkeftin heye. Ger ev şoreşe, di şoreşê de serkeftin, ger partî ye di rêxistinbûn û çalekiya wê de serkeftin heye. Ji bilî vê heq û huquq nabe. Heq, bi qasî tu ser dixî ye. Mînak mafê PKK'ê, bi qasî serkeftina wê ya di şer de ye. Mafê endamên wê jî, bi qasî ser dixê ye. Peywira wan jî serxistina perwerde, rêxistinbûn û çalekiyê ye. Endamek partiyê pêwîste heta dawî xwedî li mafê xwe derbikeve û divê kedên xwe binpê neke. Jixwe ya mijara gotinê jî, ne tenê keda wane, keda hevpare. Kes bi keda ferdî ve ne xwedî tiştekê ye. Ez jî nikarim bibim xwedî tiştekê. Em tev di nava keda hevpar de yek parçe ne. Vaye milîtan, kesê ku van tevan baş dibîne û wisa weke endamek partiyê dizane jiyînê pêk bînê ye. Ger jidilbûn û cewherek we hebe, divê ev jî heta dawî hebe. Divê em bikarin di vê mijarê de bi we bawer bin.

Bi salane soz tên dayîn, rexne tên kirin, lê mixabin diçin di pratîkê de berovajî dikin. Em hesretî wan şervanên azadiyê yên mezinin. Yek kesê bêje; "Heval, min jî hinek tişt kirin, hêsan nemirim û min xweşik jiyan kir. Ez bi ser kirêtî, dijmin û kesên hedê xwe nizanê de meşiyam. Min ev kar ser xist" derneket. Hemû jî tenê daxivin, hemû ser hiş çûne, girtî mane, eleqeya wan bi jiyanê re nemaye, dîn an jî tenê gazincan dikin. Ev ne şoreşe. Yeqîn nakim wisa ye. Merc çiqas zehmet dibin bila be, misoger şoreş rastiyek bihêz dike. Lê hûn berovajî vê îdîa dikin. Dibêjin; "Şoreş mirov dike ecûc, dixetimîne û dide girîn." Ev tenê dijmin dana axaftine. Ti şoreş ne wisa ye. Jixwe şoreşa me jî ne wisa ye. Miletê me tevî hemû zehmetiyan, di astek bêhempa de li ber xwe dide. Ma hûnê vê înkar bikin?

Jinên Kurd li Almanya meşek bêhempa kirine. Yek ji emniyeta Alman dibêje; "Jinên herî zêde çavsor." Bifikirin, heta doh jina Kurd nedikariya li gundê xwe, li kolana xwe gavekê ji malê bavêje yan jî nedikariya du gotinan bike. Niha li navendek herî pêşketî ya weke Bonn'ê de, bi qasî wan jî şaşwaz bike berxwedêrî raber dikin. Misoger ev bi rihê ku partî û Rêbertî dide ve pêk hatiye. Ev berxwedêriya jina ku dane revandin, bûye penaber û vîna wê hatiye şikandin raber dike, dikare bi çi bê ravekirin? Her wiha dibêjin; "Êrîşkarên PKK'ê" ev, hêza PKK'ê diyar dike. Berxwedaniyên wisa û mîna vê li her alî hene. Em dikarin bêjin ku gel bi gelemperî ev ast bidest xistiye.

Rola we jî hîn cudatire. Hûn pêşengin. Di pêşengiya bîrdozî, pêşengiya polîtîk û pêşengiya rêxistinî de berxwedêrî û heta dawî serkeftin peywira

qadro ya esasî ye. Ma em dikarin PKK'ê cuda binirxînin? Ger hûn PKK'ê cuda binirxînin, hûnê ji jinên kevnar kembaxtir bin. Weke ku dê bi vî halê we kes li hember we rêzdar nebe, dê pehîna xwe jî li we bidin. Jina ku doh digiriya, ger bi qasî bikare Almanan bitirsîne, herî kêm bide gotin; "Ev jî kîne?" Vêca qadroyên PKK'ê pêwîste hezar qetê ji vê bihêztir be. Ger hûn di mijara bûna qadroyên PKK'ê yên heqîqî de bi îdîa ne, hûnê van fêm bikin. Ger ji nava milet mirov di berxwedêriyê de evqasî rasteqînin, divê hûn hîn zêdetir rasteqîn bin. Lê ez we pir xeter dibînim. Wexta ku miletek pêşketinek wisa saz dike, çiqas nexweşiyên netebitî yên weke malbatperestî û ehbap-çawişî hene raberkirin, xweşa we diçe. Ya herî xeter jî eve. Qet nebe nûnertiya asta rêzdarî û girêdana miletê me bikin. Pêşengbûna we hêz dide we. Hûn nikarin vê weke nenaskirina rêxistinê û amûra lewazkirina rêxistinê bikar bînin. Hûn nikarin vê hêzê ji bo bikin qurbanê ferdperestiya xwe bikar bînin. Her wiha hêza we jî têra vê nake.

Weke di her şoreşê de hatî dîtin, hûn dixwazin kesayeta çînên qediyayî raber bikin. Çîna we tine bûye. Jixwe hûn dikarin çi bikin? Hûnê bingeha çînî û bingeha civakî ya PKK'ê fêm bikin. Hûnê hedê xwe bizanin. Dema em girîngiya vê fêrî hemû cîhanê dikin, ma emê nekarin fêrî we bikin? Di nava PKK'ê de gelek kesayetên wisa derebeg, tolaz û hedê xwe nizanin hene. Lê ev derdora herî rizîne. Ger em di carekê de vê derdorê nahilweşînin, sedemên vê hene. Encamên ku pêwîste hûn ji vê derbixin, PKK rêxistinek pir cidî ye, misoger hewce dike hûn li gorî pergal û exlaqê wê tevbigerin. Hem jî vê ne wisa bi zorê, divê ji dil û can bê kirin. Di PKK'ê de ji bilî vê pêşengtî nabe. Tişta ji we tê xwestin jî eve. Ji bilî vê egîdî jî negengaze.

Cihê herî kêm lîstok bên kirin û demogojî lê bê kirin PKK ye. Tiştên wisa li her cihî dibe, lê di nava PKK'ê de nabe. Niha PKK li cîhanê rêxistina pêşeng a herî bi dîsîplîn û cewherî ye. Hem naveroka PKK'ê dewlemende, hem jî rastiyek sazûmaniya wê pir xurte. Ger ev wisa ye, vêca xwe bi vê re bikin yek -berê bi Kuran û çekê sond didan, ji bo me hewceyî sondên wisa jî nake, ev teşeyî ne-, hûnê her kêliya xwe weke sondekê binirxînin. Ji bilî vê ji bo mirovahî pêşengtî nabe, mirovatiya mezin jî jiyanê nabîne.

Em bi îdîa ne. Em ji bo armancên pir hêsan û erzan şer nakin. Ya rastî ger we wateya şerê xwe bizaniya, hûnê bêhempa bûna. Nakokiya we ya herî girîng, hêj we dernexistiye zanebûnê ji bo çi şer dikin. Divê

hûn vê mikur werin. Hûn çima ji ber rêxistinê neçar man evqasî zehmetiyan bijîn? Li şûna vê rast fêm bikin, hûn bi nêzîkbûna; "Emê ji rêxistina ku em xistîn nava zehmetiyan wisa tolê bigirin" bersivê didin. Ev tolgeriya gundîtî ye, politikaya dijmin a parçe bike-birêve bibe ye. Wexta rêxistin we tengav dike, ji bo armancên pîroz tengav dike. Hûnê vê fêm bikin. Rêxistin ji bo wate bide kesayetên we yên tine bûyî we tengav nake. Wexta hûn tevlî refên me bûn, çi tiştê we mabû? Ti nirxê we yê mirovî nemabû. Ma parçeyek axa we ya azad hûn gav bavêjinê hebû? Li gorî ku nebû, ji dil û can beşdarî zehmetiyên rêxistinê bûyîn hewce dike, lê divê sedemên vê jî baş bên zanîn. Ev zehmetiyên hûn dijîn, we neçarî fêrbûnê dike.

Hûn çima evqasî tengav bûn? Nexwe, sedemên vê yên girîng hene. Hûnê lêhûrbûnê bikin û bibin mirovê mezin. Hûn nikarin bêjin; "Ezê tola xwe ji rêxistinê bigirim, rêxistinê vale derbixim û rayeya xwe xirab bikar bînim." Dê ev jî bibe minafiqtî. Dema em we tengav dikin, armanca me bikaranîna mejiyê we ye. Em mirovê Kurd digirin nava perwerdeyek pir lez. Mirovên eleqedar jî bi nêrîna dibe ku mejiyê wan kar bike, pir perwerde dikin. Nexwe rastiya we hûn cemidîne, mejiyê we qet kar nake, dile we cemidiye û ew jî baş kar nake. Dibe ku şer we hinekê bîne ser hişê we. Hûnê ji vê re jî weke mejiyek xirab nikarin bêjin; "Çima rêxistinê ez anîm vî halî?" Ya rastî dermanê we ya sereke şer bû û nêvenga têkoşînê ya pir dijwar bû. Ev nebe, kes we mirov nabîne.

Weke hûn dibînin navê we jî nadin we. Ji Efrîkiyan re dibêjin zencî, nijada reş dibêjin, ji yê din re jî dibêjin nijada zer. Nirxek wan jî heye. Bes ne navê we heye, ne jî rengê we diyare. Lewra hûnê nêvenga têkoşînê ya dijwar weke siûdekê binirxînin. Têkoşînek wisa navberek sedsalî digire, mamoste jî vê dibêjin. Şerê deh salan bê meşandin, dikare tiştên sed salan dayî windakirin cardin bidest bixe. Rastiya ku bi salan neyê fêmkirin, mirov dikare di nava şer de di wextek pir kin de fêr bibe. Vaye tawana we, ev wisa nenirxandine. Hûn bi rengê; "Hişê heyî jî dide windakirin" nêzî şer dibin. Ev jî nêzîkbûnek pir çewte. We bi rengê; "Şer bihêz nake, azad nake, dixetimîne û kirêt dike" nirxand. Ev bêberpirsyariyek mezine.

Bihizirin ji ber hinekê nêzî şer bûm, çawa giham hewldanek pir mezin. Tenê ji bo xwe bigihînim şer, min cîhan derbas kir. Bi nêrîna şer heye, min xwe pir pêş xist. Bergên hejmara wan sedî derbas dike pirtûk hene. Min hemû destkeftiyên heyberî û giyanwerî ji bo vî şerî raber kir. Lê belê

ez gundiyek hejar wisa bûm, dikare bê gotin min bi zorê zikê xwe têr dikir. Lê wexta hat gotin şer heye, eşkere ye min çi kir û li ber çavên we ye. Me gelek tişt ji tinebûnê afirandin û ev hemû ji ber sedema şer kir. Mixabin hûn van tevan di şer de tine dikin. Di destê we de pêdiviyên şer ên ji neçarî hene, lê hûn wan jî çarçûr dikin. Ev helwesta we şaşe. Şer ber bi hewldana mezin û serkeftî ve dibe. Ji ber şer hebû me evqasî hewl da û pêşketin saz kirin, evqas nirxên heyberî û giyanwerî bidest xist. Nabe ev bên înkarkirin. Divê li hember me hinekê rêzdariya we hebe. Şer, ji ber hemû pênaseyên zanistî, yên hêjayî jiyanê lez şiyar dike û dide serxistin. Mixabin feraseta we ya şer xetere. Hûn dibêjin; “Şer a heyî jî ji destê me girt, bi me re bi navê aqil û jiyanê tiştek nehişt.” Ev ne raste. Misoger divê ev felsefeya we ya jiyanê bê hilweşandin. Min her tim xwe mînak diyar kir. Ger weke hûn îdîa dikin bûna, dê beriya we tevan ezê tine bibûma. Lê niha hem heyberî hem jî giyanwerî kesê herî bihêz ê welat ezim. Ev nayê înkarkirin. Elbet min ev jî bi bilindkirina têkoşînê ve pêk anî.

Teoriya şer heye. Ez rojane ji mirovên herî pêşketî zêdetir taktîk û teori dihilberînim. Derfetên vê yên heyberî hene. Me li memleketek xerîb evqas derfet afirandin. Ev nedihat bîra kesî. Kesî ev di xewna xwe de jî nedidît. Şer ez neçar kirim ku eniyek mezin a piştê ava bikim. Bi sebrek mezin, heta tevî astengkirina nûnerên me, hema bêje me li hemû welatên cîhanê xebat meşandin û gav bi gav destwerdana her derî kir. Nexwe pêwîste hûn para xwe ji vê derbixin, êdî van hewldanên me rast têbigihin. Ez dibêjim ku êdî, kesayeta we ya şer teng kirî, dîn û har kirî, karîkatûrîze kirî, lewaz xistî û dayî windakirin nayê efûkirin û teqez divê bê derbaskirin. Bêguman a rast jî wisa ye. Dixwazim ev di kesayeta we de hilweşe.

Fêmkirina Rêbertî û hinekê jî girêdayî mayîn, heman weke fêmkirina partiyê, bi rast fêmkirina şer pêk tê. Pêwîste hûn li gorî pênaseya şer a rast li xwe mikur werin çima we jiyan nekir. Ji ber rewşa we li gorî şer nayê pejirandin. Di rewşek tengbûyî, hişê xwe winda kirî, ecûcbûyî û xetimî de, weke kesek têkçûyî hûn dibin serkêşên rêxistinê. Ev tawana ku herî zêde neyê efûkirine. Ev li ser bingeha pêşengiya me kuştina miletê me ye. Ev ne hêjayî we ye, ne jî tê efûkirin. Ez qetiyen nikarim li hemberî we binkeftinê, ango yên hûn ferz dikin bipejirînim. Qet niyetek min a wisa nîne. Ji ber ku ev şerê rizgarî ya yekemîn û dawî ye. Ji ber ev siûd di kesayeta we de winda kirin, emê çima winda bikin? Çima ezê di kesayeta we ya xwe çil cure binkeftinan vekirî re, xwe jî binkeftî

bihesibînim? Vaye pêwîste li vir wijdana we hebe. Ez hêsan têk naçim. Şer hêj li cem me têk neçûye. Bes hûn ji hêla objektif ve li hemberî me nûnertiya binkeftinê dikin. Ma ev ne xirabûna herî mezine? Rêbertî têk neçû, berovajî mezin û ser xist. Pêwîste milîtan jî hinekê mezin bibe û ser bixe.

Carek din vedibêjim: heta ev neyê sazkirin, mafê we nîne hûn çep û rast jî binêrin. Ger hûn dixwazin bibin milîtanên dîrokê yên navdar, hûnê wisa bikin. Nexwe dê hûnê di pêvajoyên wisa dîrokî de tine bibin. Ev jî qurala egîdiya me ye. Mafê ti kesî nîne ne cuda tevbigere ne jî hêza wî heye. Hêvîdarim hûnê vê tam fêm bikin, jidil li xwe mikur bên û rexnedanê bidin. Piştî vê jî hûnê vê siûda mezin, siûda jiyana me ya yekemîn û ya dawî hêjayî xwe jîndar bikin. Dilxweşiyek ji vê mezintirîn nabe. Min pir lêkolîn kir, hema hema min ji hemû zanist û felsefeyan para xwe girt. Bes ji bilî vê min xwe bi ti tiştî dilxweş nedît. Pir bi nexweşî bûm, pir bê çare bûm, milên min û her derê min hatibûn girêdan, bes ketina vê rêyê ve niha bihêzbûnê dijîm. Em cîhanê li gorî xwe şîrove dikin, li gorî xwe polîtîka dikin û li gorî xwe bihêz dibin. Azadî eve, mirovatî jî eve. Divê hûn heta dawî bi vê bawer bin.

Weke me destnîşan kirî li xwe mikurhatinek jidil û xwe ber çavan re derbaskirin, mezinbûna kes diyar dike. Lê divê hûn vê bi rasteqîn bikin. Ne xwe bixin şûna gunehkarekî bi duayên sexte weke niyazan ji xweda bikin li benda efûyê bin, ne jî xwe bi hinek din ziravkirinê ve, hîn fêlbaztir û xisletên xwe yên nayên pejirandin di bin rûpoşa rexnedanê de bidomînin. Ev ne şêwaza me ye. Van şaşiyan nekin. Di nava me de cewhera xwe nasîn, bi qasî şaşî, lewazî û xapînokên xwe bi wêrekî dîtinê, hêza derbaskirina van jî bi xwe re avakirin û aliyên bihêz derxistina holê jî hewce dike. Ji bo vê em vê weke rewşek ji nû ve xwe gihandina asta biryardariyê, xwe dana efûkirin, sererastkirin, rexnedan, nebesiyên xwe mikurhatin û biryardariyê dinirxînin. Di vê çarçovê de weke bangî hemû partiyê dikin, banga me ji bo we ye jî hûn xwe ji nû ve biryardar bikin. Em dixwazin pêvajoya pey vê re we di astek pîvan girtî, bûyî xwedî biryardarî, hêsan winda nake û serxistin misoger kirî bibînin, binirxînin û bi qasî bikarin ên hewce bimeşînin hêz raber bikin we bihêz bikin. Ev hedefa me ye û astek pir pêşveçûyî jî bidest xistiye. Hewce dike ev biryara me bi girêdayî rexnedanek saxlem pêk were.

Weke parçeyek herî girîng a hemû karan, qadroyên me bi karbidestiyek herî berhemdar nirxandinê em wisa digirin dest. Nirxên

xwe jî bi vê girîngiyê bigirin dest. Tiştên ji we re tên dayîn ne ji bo hêsan bên xerckirin, ji bo hûn bikarin wan bi şêweyek dewlemend derbasî hemû qadan bikin û hêzdariya xwe bidomînin, xwedî nêzîkbûn û pîvanek berfirehkirinê bin. Hûnê vê jî pir dijwar berçav bigirin.

**10 Adar 1996**

## BI XWE BÛNA DÎROK
## BI ZANEBÛNA DÎROKÎ TEVGERÎNE

23'ê Nîsan sala 1920'î, dîroka damezirandina Meclîsa Miletê Tirkiyê ya Mezine. Pêvajoya 76 salên bi ser vê re derbas bûyîn, miletek ku siyaseta xwe ya serbixwe ava nekirî, dê çawa bi destê xwe bikeve pêvajoyek tinebûnê, eşkere ye pêvajoyek dîrokî ya trajîke. Ger di vê dîrokê de miletên heyî di mijara çarenûsa xwe de xwedî zanebûnek siyasî bûna û bizaniyan di astek berpirsyar de nêz bibin, li şûna di bin damezirandina komarek herî faşizan a wê demê de tine bibin, dikariyan xwe bigihînin rastiya miletên herî azad. Li şûna rejîmek di bin navê Komara Tirkiyê de hatî pêşxistin û li cîhanê mîna wê nehatiye dîtin de tine bibin, dibe ku piştî Sovyetan weke Komara Gel a herî azad an jî Yekîtiya Komaran cihê xwe di nava Rojhilata Navîn de dîtiban.

Bêguman sedemên civakî, mercên nav-netewî, dûrbûna ji zanebûna netewî, bandora bîrdoziyên paşverû, bingeha çîna li cem vê xwe ji pêşengtiyê re amade kirî, dîsa rastiya wê ya leşkertî û xisletên navxweyî yên wê dîrokê, bû sedem ku ji ya tê hizirîn zêdetir xirab derbikeve holê. Di pêvajoyek bi qasî temenê mirovan, bi miletan xirab dan windakirin. Anatolî tam bû gora miletan. Yê ser xistî jî, dibe ku di cîhanê de mînaka wê nehatî dîtin, heta ji komprador û hevkarên salên 1920'î xetertir, bû komek çavsor.

Dîrok carek din paşve venagere, ya bûyî çêbûye. Lê belê ger dersên girîng bên derxistin, dibe ku heta dawî hînker bin û pir baş rê nîşan bidin. Bila neyê hizirîn ku îro ji vê ferasetê rizgar bûne. Niha ne tenê di çînên civakî de, li gorî asta di nava partiyê de xwe dide der, kesayetên vîna azadiyê esas digirin bi qasî em bêjin tine ye kêmin. Ger ji van re bimîne, wê ber bi salên 2000'î ve ji mercên sala 1920'î kembaxtir bê jiyîn.

Piştî miletek ket, kesayetek xwe xapand, êdî ew hêsan sererast nabe û bila wisa neyê payîn. Di encamê de miletek di kesayetekê de tê bilêvkirin an jî di rastiya kesayet de xwe dide der. Encama ku min ji ezmûnên xwe derxistîn, em niha rewşek ji salên 1920'î xirabtir dijîn. Qet nebê di wê demê de hinek kes bi nasnameya xwe ya dîrokî û kesayeta xwe ve derketin holê, xwe diparastin û daxiviyan. Îro ew jî nîne. Wisa lê nenêrin di refên me de hinek xwe pir azadîxwaz û

serxwebûnparêz didin diyarkirin. Wexta em dipirsin we hewcedariyên wê çiqasî pêk anîn, hûn dikarin pir rehetî bibînin ku ne di ferqê de ne. Elbet ev jî pirsgirêkek mezin ava dike. Dîsa wexta em li rastiyên we dinêrin, em neçar dimînin pirsên weke ev kîne, kesayetên çawa ne û wê dawiya wan çibe bikin. Qaşo her yek ji we di derdê jiyanê de ye. Ne jiyîn, ne şer, ne jî mirin nezanîn, yeqîn dikim xirabiya herî mezin kesek an jî miletek li xwe bike ye. Em jî niha vê dijîn.

Şêwazek şer a şervanên taybet û jiyanek bi wê re ava kirîn heye. Vê baş dizanin. Lê mixabin em bi navê gelan ne dikarin şer ne jî jiyanê fêm bikin. Di dîrokê de gelek caran sextekariyên mezin û revên mezin hatine dîtin. Bes di van 76 salên dawî de ji ya di nava me de pêk tê şermîn û lenetir çênebûye. Di dîrokê de ji erdnîgariya me ya nêz Cihû revîne. Ermenî revîne, Rûm revîne. Lê bawer nakim yek ji van bi şêwaza me revî bin. Hêj nav lê nekirîn revek çawa ye? Çihat serî, bi kîre kirin, divê çi bê kirin? Em yek kesî di van mijaran de bi yek peyvê rast bihizire û wêrek baxive nabînin. Êdî reva xayîntî û lenetî nizane raweste. Li vir reva fîzîkî, reva herî reben û kêm xetere. Windabûnên rihî, nexasim reva ji fikir û radestbûn, heta çar bi çar ji dijmin re karkirin û li gorî wî fikirandin negengaze di nasnameya ti miletek din de bê dîtin. Di van salan de ev çêbûn.

Şerma min a herî mezin ev rastî bûn. Ya rastî ji bo vê rastiyê nebînim hêj di temenek biçûk de min xwe tengav kir. Min xwest birevim, xwest devjêberdim, lê min çareya wê nedît. Sedema evqas tolazî, evqas kirêtî, evqas belengazî û bêhêziyê, rastiya heyî bi xwe ye. Lewra kes wêrekî li vê rastiyê nanêre. Mane rû nîne lê binêre. Hewl nade fêm bike, hewl bide fêm bike dê xwe eşkere bike ku, kesek pir ketî û lenetî ye. Ma dê çima bixwaze fêm bike? Dema dor tê pêkanê jî, bi qasî misqalekê bi xwe nebawere. Dê çi bike?

Em dikarin li pratîka xwe ya şoreşgerî binêrin vê rastiyê baştir fêm bikin. Tu wî ber bi jiyanek azad û hinekê jî binamûs ve dibî, dîsa jî naxwaze fêm bike. Wê demê em dibêjin ev kesayet, kesayetek pir cuda ye. Yê ev mezin kirî baş mezin kiriye, yê kirî kole, baş kiriye kole. Em dixwazin navekê ji vê şêweya kolebûnê re bibînin, lê em zehmetiyê dijîn wî navî jî bibînin.

Dîsa pir baş tê bîra min, di hemû jiyana xwe de min xwest ji vê dîrokê birevim. Jixwe min dît zêde tiştek bi navê dîrokê jî nîne. Bes wê tu birevî kuderê? Niha baştir fêm dikim ku, çima yên dibêjin em jiyan

dikin evqasî bêberpirsyarin. Kesek weke min ku her gava xwe bi hezaran bismilahan davêje jî piştî ev rewş jiya, dê yên evqasî bi dûjînan dimeşin heta kur biçin û bibin çi? Dîrokek wisa lenetî û faşîzmek wisa ye, mînaka wê tine ye. Ya herî xirab jî di rewşek binde perçiqî, têkçûyî, berovajî cewhera ketî, bûyî xayîn, bûyî dijminê xwe bi xwe ye. Mixabin dîsa jî wê diparêze. Ev di kîjan rastiya gelî de hatiye dîtin? Van salan ev wisa amade kir û da jiyîn.

Me xwest bêjin civaka dînbûyî, lê nebû. Me got civaka mêtîngehbûyî, ew jî nabe. Hinekan got rewşek ji mêtîngehbûnê jî wêdetire. Lê dixwazin çi bêjin ew jî zêde nayê fêmkirin. Xulase rastiyek wisa ye, watedayîna wê jî dibe ku bibe mijara zanistek taybet. Ji bo van nebêjin, min çi jê ye. Hûn berhema vê dîrokê ne. Ji bîr nekin, yê herî mirovî, ya herî hêjayî jiyînê û teqez ya hêjaye ji bo wê hinek tişt bên kirin, di asta me ya herî jor de jî piştî ku anî astek êdî nayê nasîn, gelo weke kes, heta weke milîtanek şoreşger hûnê xwe çawa binasin û çi navî li xwe bikin?

Tam jî di vê xalê de rastiya hûn ferz dikin, nêzîkbûnek bi şêweya; "Ez fêm nakim, zêde bi ser min de neyên" de ye. Reftarên we yên bê wate weke her cure girî, tolazî, dûjîn, hedê xwe nezanîn, rev, radestbûn, durûtî û bê esil xwe sipartina dijmin hene. Êdî hûnê vê kesayetê çawa venêrînin? Êdî zilam carekê xwe ber bi xirabiyê ve herikandiye. Ji bo vê di wateya civakbûnê de em hinek navên ji bo kesayeta mirovên herî ketî tên dayîn destnîşan bikin. Ger yek bi nasnameyek ji vê jî kembaxtir xwe dispêre dijmin û di refên me de kêlî bi kêlî vê objektîf ferz dike, divê hûn li hember wî kesî pir baldar bin. Îdarekirina wî pirsgirêkek mezine. Tam jî di vê xalê de gotina herî baş ê xwedî niyeta herî baş bêje, karê herî baş jî bike, devjêberdane. Îdîa xwe tine ye. Bi vînekê ser vê de çûyînê, hişê xwe re jî derbas nake.

Ger nêzîkbûnek baldarî çênebe, ji bo miletek rêberek, siyasetek û civakek ji bo wê şerek rast bimeşîne nebe, rastiya pêş bikeve wisa ye. Ez ji vê rewşê re dibêjim meymûnbûn. Ev ji paşketinê jî wêdetir astek civakî ya paşverû ye. Civakên qlanên paşketî her tim xweziyên min bûn, li mirovê vê civakê geriyam. Min digot gelo em dikarin ji wan deran destpêkirinekê bikin. Fikrek girêdayî mercên civakî yên pêşketî danin aliyekê, ji ber van rewşên we hêjî li civaka qlanên paşketî digerim. Her tim dibêjin em bigihin wan û mirovatiyê ji nû ve bidin destpêkirin. Kanî ew roj! Bi navê jiyanê mirinek wisa heye, çareserkirina wê jî bi serê

xwe karê zanistek nû ye. Her çendî dijmin bêje; "Ev milet ji mêj ve miriye, hûn nikarin vejînin", hinek di nava rastiya vî gelî de dengên cuda derdixin. Her çendî 'Tirkê Çiya' tê gotin, bi deng û reftarên zêde nayên fêmkirin ve jî be, dixwazin tiştekê bêjin. Dengê evqasî bawerî bi xwe nayîne û li hember xwe rêzdariya wî nemayî tê çi wateyê?

Hêjî di bîra min de ye: Di nava wan mercên gund ên teng de şerma derketina nava mirovan ez heta şaneyên min dihejandim. Li rastiyên me dinêrim: Hûn bi vî halê xwe ve li cîhanê belav dibin. Ev bêfihêtî ye, hûn çawa bêku şerim bikin û aciz bibin pir rehet di nava mirovan de digerin? Min ev pirs her tim dikir. Hêjî pir şerim dikim derbikevim pêşberî mirovan û aciz dibim. Ev ji bo min karek pir zehmete. Di nava gundiyên hejar ên ji rêzê de jî gerîn pir zehmete. Bes hûn weke mirovên çar bi çar azad lê didin dimeşin. Ev rewş jî xefletek pir mezine. Wexta pêl rayê we tê kirin jî hûn dibêjin; "Wey, ma dibe vê bînin serê mirov?" Li gorî min tişta herî kêm li we tê kirin. Divê wisa li we bikin, wexta we fêm kir kî hûn wisa fêr kirine û di meşa jiyanê de rastiya we çiye, daku hûn bikarin vê başiya herî mezin ji bo we hatî kirin bipejirînin. Ev rewşa dijmin we wisa bi şaşwazî digerîne, dişibe rewşa koleyên di sûkan de avêtina ber lingan û firotinê. Li gorî min wateyek wê jî heye. Tevî her tiştî ew kirîn û firotina mirovan a li sûkê watedar bû. Lê şêwaza yên me derdixin sûkê qet fêm nakim. Hêj nediyare em di sûkan de çawa tên firotin. Kî dikire, kî difiroşe ne diyare. Sûkek koleyan a bi gelemperî bûyî heye. Rewşa me, weke yê dixwaze, bêku qet pereyan jî bide, heta di mercên ji heywanan jî kembaxtir dana jiyînê ve ku bikare sûd jê werbigire weke sûkek mirovan tê nirxandin.

Elbet ev ji bo miletekê rewşa herî xirab rave dike. Ji bo bê fêmkirin mirov dikare vê babetê hîn baştir zelal bike. Ger naveroka vê rastiyê wisa ye, hûnê bêjin dê kî bixwaze vê rastiyê fêm bike? Ger eynik her tim a kirêt dide diyarkirin, dê kî bixwaze li vê eyneya kirêt binêre? Vêca dê çi bibe? Êdî ji felsefeya nizanim, nabînim û nabihîsim re bese. Li hember vê rastiyê min her tim şerê xwe yê bûna mirov esas girt û hêjî li pey wê me. Lê dîsa jî min pir li xwe nêrî û di encamê de dît ku dişibim mirovan. Vêca min got nexwe, ma ne pêkane ez bibim mirov? Ez çiqasî bûm mirov? Gelo ez bûme mirovek kêmtir bi lenet, kêmtir şerim dike û dikarim hinek din rêzdarî bigerim? Şoreşa min jî eve. Elbet ev bi miletekî re çêdibe. Ev kar bi tena xwe yan jî ez mirovek xwedî evqas derfetim re çênabin. Min ev zû fêm kir. Bûna mirov, tenê ne pejirandina

rastiya civaka tu endamê wê yî. Wate dayîna wê û ger pêkan be di nava vê rastiya civakî de derfetên bûna mirov dayîna mirov ev pêktê. Ger ev jî bi rizgarî û şoreşekê pêkane, divê ew jî bê dayîn. Me di vê mijarê de dît ku em çiqasî hewceyî vê ne û xwest hinek tişt bikin. Lê belê niha li we dinêrim, şûna hûn ji xwe bipirsin em di kîjan asta mirovbûnê de ne, hûn di nava partiyê de şêwazek meymûnî bi bêşbazî rewşekê dijîn.

Her roj dibêjim rast nêzî peywiran bibin û hewl bidin xwe rast binasin. Lê bersiva ji vê re tê dayîn, weke meymûnên li ser darekê xwe ji vî şaxî davêje şaxê din derbas nake. Yên nikarin karê xwe yê artêşê û karê xwe yê partiyê hêjayî mirov pêk bîne, ji meymûnekê wêdetir ti wateyê rave nake. Çiqas dixwazin hevdu tawanbar bikin, ev jî ew dengên meymûnan ên ecêb tîne bîra min. Di vê mijarê de kesek hinekê arifim, di naskirina mirovan de min gavek pêşveçûyî pêk aniye. Hinekê zehmete ez bêm xapandin. Ji ber rêgezên reftaran, qabîliyeta min a mezinbûn, xweşikbûn û kirêtbûnê dikarim ji hev cuda bikim. Pênaseyek pir zehmete, lê ger em dixwazin tiştekê biguherin, divê pêşî rast nav lê bikin. Ji bilî vê nayê jiyîn. Civaka meymûn di nava rastiya xwe de dana jiyîn, çiqas hêjayî jiyînê dibe?

Min her tim li hember jiyanê şerim kir. Wexta gava pêşî hewcedariya têkoşînê dihizirim, bila ti kes îdîa neke ku min dide jiyîn an jî tiştek daye min. Min di vê mijarê de her kes weke tawanbarekî dît û başiya herî mezin li xwe bikim têkil van nebûn bû. Min ev ferq kir. Ev kes dayîka min jî be, min got tu tawanbarî, li cihê xwe rûne, ezê bi xwe hewl bidim çarenûsa xwe destnîşan bikim. Ger te biryar daye tu mirovî, teqez divê tu bikarî vê ji xwe bipirsî. Kî çi dibeje bila bêje, jiyana heyî ji bo vê civakê, vî miletî, bi rastî jî pir xetere. Ango ziravê mirov diqete, lê binêre. Lê hûnê bêjin; "Em natirsin." Bi we re ne dil jî, ne jî zirav heye. Hûnê bêjin; "Lê dinêrim, bes tiştekê fêm nakim." Bi we re feraset tine ye, hûnê çi fêm bikin?

Mirov dikare bibe dil û mejiyê civakbûnê. Li hemberî vê hûn ji hêla fîzîkî ve weke mirov dixwiyên, lê ji hêla fikrî û rihî ve di rewşek cuda de ne. Dixwazin weke civata dînan binav bikin, dixwazin civata paşketiyan binav bikin, lê trajedîkomediyeneke û negengaze bibe şano jî. Ev hemû çima girîngin? Ger hêjî hûn dibêjin; "Ez li nav sînorên mirovatiyê digerim", hûnê biwêrin li vê rastiyê binêrin. Ger hûn vê wêrekiyê raber nekin, hûn nikarin wate bidin evqasî bêferasetî û bêrûtiya bi rik tê meşandin. Hûn dibêjin; "Ji bo jiyînê ev hewce ye, ger ne durû bim, bi

feraset bim, di vê rastiyê de xwe bibînim nikarim di cihê xwe de rawestim û li ser lingê xwe bimeşim.” Rastî eve. Çima derew û durûtî evqasî di nava me de pêş ketiye? Ji ber ku camêr nikare li rastiya xwe ya civakî û eynika wê binêre. Lê binêre dê rûyê xwe bibîne. Ger rûyê xwe bibîne dê hewce bibîne paqij bike, wê demê jî dê rûyek wî baş û paqij çêbe. Dema hêza wî têrê nake rûyek baş jî raber bike, dibe bêrûyek baş, derewkarek baş, sextekarek baş, xapînokek baş. Ev jî di nava me de pir hene. Vaye tişta em dikarin bikin, rastiya we ya civakî weke eynika zanebûn û eynika partiyê, di eynikê de şanî we kirine.

Elbet hûn di vê xalê de jî me pir tengav dikin. We pir baş dinasim, hûn eynikê temaşe û guhdar nakin. Lê carekê çêbû. Gelo dîrokê tengav kir, me derfet bidest xistin nizanim, lê bi hostatiyek mezin me xwe gihand vê qonaxê û kar heta vê astê anî. Niha jî kar cuda ne. Di rastiya Rêbertî tê binavkirin de, rewşek wisa pêk hatiye, êdî zehmete hûn jê birevin, xwe sipartina dijmin jî pir zehmete. Jixwe kerameta Rêbertiyê di vir de ye. Rêbertî rastiya rê nade van rewşan tevan rave dike. Hûnê xwe bispêrin kîjan dijminî? Me hinekê ev dijmin hincirand. Lê hûn her tiştî li ser û çavên xwe didin. Lê wan deran jî her kêlî bi ava kaniyê paqij dikim. Bi qasî dixwazin qirêj bikin, kaniyên niha ez diherikinîm bi qasî bikare her kêlî her tiştî paqij bike bihêze. Ger hûn tiştek xwe qirêj bikin nebînin, ji bo xwe qirêjkirinê hûnê çi birijînin li ser zemîn? Rêbertî tê wateya tevdîra vê jî?

Tolazî û berdoşî hêzek wisa ava kiriye, ji bo rast bê rûniştandin li dijî vê divê ancex hûn çil carî dîlaweriyê bikin. Heta dîlawerî jî nikare vê bike. Dînîtî heta bêjî hêza aqil dorpêç kiriye. Lê belê Rêbertî dizane yê herî xwe dîn dibîne bixe rêya rast. Li hember girîn û nalînê, hêzek jiyanê ya wisa daniye holê, li hember tevdîrên me pêş xistine, hûn nikarin a rast nexwazin. Dîsa Rêbertiyê ev rastî bidest xistiye. Ev tevdîr tev we dinalînin, bi qasî nekarin li cihê xwe rûnin we aciz dikin. Ez vê pir baş dibînim. Belê nepêkanîna xetê, şer, artêşbûn û xebata rast wisa ye.

Hemû nûnertiyên me nikarin di cihê xwe de bisekinin. Ji ber ku tevdîrên me girtine, pêşiya wan girtiye. Ma dikarin rehet bisekinin? Hinekê jî rewşa di nava partiyê de tê jiyîn wisa ye. Mezinbûna Rêbertiyê, bidestxistina asta mirovbûnê re pêk tê. Ez jî pir bi wate dibînim û dibêjim tiştek başe. Ji ber kesê ku xwe evqasî ji quralên xwe û hemû rastiyên jiyanê der kirî, dê bigihe kuderê, birevê jî dê biçe kuderê?

Kesek wisa dê bibe bela serî. Miletek ku heta Asya, Ewrûpa û Emerîka belav bûyî, vêca remza wê ya di kesayetek wisa de bihizirin. Em heta kur dikarin vî dînî berdin? Ev dîn heta hewşa mala wî jî berdan şaşiye. Lewra siyaseta partiyê, quralê partiyê hewce dike.

Di nava me de nepêkanîna qural ji sedî nod û neh, nokta nehe. Camêr quralan pêk nayîne, ji ber paşketiye û ji quralan fêm nake. Lê tevî vê jî emê xwedî li namûsê derbikevin. Ez hinekê vê diceribînim. Ev rêgez heye û her wiha gel heye. Dîn jî be, emê vî dînî di qefesa xwe de bigirin. Çima wê di nava alemê de me rezîl bike? Bi rastî jî çîrok wisa ye. Ji ber berê ez jî dînek wisa bûm. Paşê min xwe kir qefesê. Ango min xwest hinekê jî qurala bidim pêkanîn. Bila ti kes dilê xwe negire. Min şerê partîbûna bi kesayeta xwe çil salan li dijî xwe meşand. Misoger hewce dikir kesek weke min bê venêrîn. Ji bo xwe bi quralên civakî, netewî, demokratîk, heta sosyalîst ve girê bidim, bi salan mijûl bûm. Heta gundiyên me jî ji bo me digot; "Dînê çiyan ketî." Madem vî dînî xwe wisa bi quralan ve girê da û dimeşîne, nexwe dê ev civaka dîn jî di qefesê de bê girtin. Begên me, xanim û beg, hûnê jî di qefesê de bên girtin. Ev halê we ji dînîtî kembaxtire. Hûnê vê rastiyê fêm bikin.

Eleqeya hûn li hember cixareyekê raber dikin, ger li hember qurala rêxistinê ya herî jiyanî raber nekin, ji bilî ji we re bêjim dînin, paşketîne tiştek din nabînim. Ger hêza we têra xebatek rast a herî hêsan neke, devjêberdin bêjim milîtanên şoreşger, kes we mirov jî nabîne. Em neçarin mirovbûna xwe biparêzin. Me berpirsyariya vê parastinê girtiye. Hûnê vê cidî bigirin. Fêmkirin dê we bibe kuderê? Hûn di vê mijarê de serbestin. Min bi navê vê partiyê hinek tevdîr girtin û van bi gel jî didim pêkan. Di nava we de gelek xirabkar hene. Lê belê ez jî weke kesek dînê berê yê xwe baş terbiye kirî, dizanim çawa li ser mirovan rawestim û di vê mijarê de pir hosta me. Ev jî rastiyek Rêbertiyê ye. Min xwe anî astek wisa. Êdî divê hûn vê fêm bikin. Gelo hûn dikarin rawestin û sererast bibin? Li ser bingeha asta mirovî li ser rastiyan bidin barkirin, hûn dikarin nêz bibin? Bendewariya me eve, em her roj ji bo vê qiyametê radikin. Dibe ku em ser nexin jî. Li gorî min ew jî ne girînge. Ji bo min serxistin, neserxistin pir girînge, lê ev kar bi xwe girîngtire.

## Cengaweriya Me Cengaweriya Dilxwaziya Mezin û Tolhildana Mezine

Anatoliyek dînbûyî yan jî veguherandine timarxaneyê heye. Kurdistan jî di rewşek ji wê kembaxtir de ye. Anatolî kirine gora gelan. Hema dimirin, lê zêdetirîn dişibe timarxaneyê. Mirov dikare li goristanê bigere, goristan ewqasî ne xeternake. Lê li timarxaneyê gerîn pir xetere. Timarxaneya gelan an jî tevî ku warê herî kevin ê mirovatiyê ye, em li warek xistine rewşa herî paşketî de digerin.

Vaye bi qasî temenê vê Komarê 76 salên derbas bûyîn, hinekê jî vê rastiyê dixe hişê mirov. Di nava vê Komarê de pir kêm mirovên ku gazincan ji halê xwe nakin hene. Parlemento, cihê herî bilind ê axaftina civakê ye. Lê mixabin, parlementoya Tirkiyê ji bo me ji mêj ve cihê fermana mirinê daye, tinebûn lê tê jiyîn û êdî em ji nîqaşê jî derxistine. Ji bo muqayese be me got em jî parlementoyekê ava bikin. Lê hêz tine ye. Kî dikare were, ger bê jî dikare çi bike? Zehmete yên rizî, vîna wan ji dest hatî girtin bibin hêza parlemento. Me got dikare li dervî welat pêk were, bes ger pêk were jî wê di asta remz de be. Hêj ji bo dagirtina naveroka wê, ango bûna hêza parlamento şerek mezin hewce dike. Gotinek heye miletê me dibêje; “Ger tu bikarî piştî çil salan jî tola xwe rakî, helal bê ji te re.” Ya me jî hinekê wisa çêbû. Piştî çil salan jî be, me xwest hinek tişt bikin. Ev me dihedirîne. Me xwest vî gelî li cihê ku zimanê wî hatî girêdan bilêv bikin û her kesî jî hinekê xwe fêm kir. Niha jî em dibêjin hinekê hûn baxivin, xwe rave bikin û bibiryar bikin. Qet nebe me îdîayek derxist holê. Yên îdîayên wan heyî dê bizanin rojekê ya hewce pêk bînin an jî dê fêm bikin pêwîste bizanin.

Vêca diyare dîrok, bi tine hesibandin, encamê wê di kesayeta xwe de veşartinê yan jî bêrûtiyê nayê fêmkirin. Her çendî bixwazin wisa nêz bibin, nagihin ti cihî. Ger hûn dixwazin xwe bigihînin zanebûna dîrokî, hûnê vê dîrokê dahûrînin. Ger hûn dixwazin yekser bibin dîrok, hûnê bi zanebûna dîrokî tevbigerin, heta şerê dîrokê bimeşînin. Di bin navê jiyanek din heye de, derewkariyek mezin û xwe xapandinek mezin ve hûnê tiştên din hêjayî xwe nebînin û bizanin ku jiyanek wisa jî nîne. Êdî hûnê hêza derbaskirina vê înkar, bêrûtî û bêvîniya mezin raber bikin. Ez jî xwe dispêrim şerê xwe û wisa dibêjim; “Her çendî di rewşek nayêm

nasîn de jî bim, dîsa jî xwedî zanebûnek dîrokî me û ji vir û şûn de jî hêsan devjêbernadim."

Bi navê gel eşkere, hûn ji kîjan malbatê, silalê yan jî nasnameya miletî hatibin bila be, ger hûn vê şêweya rastiyê di hemû şaneyên xwe de nehesin, ez ji we re dibêjim ku weke mirov dernekevin pêşberî me. Li hember qaşo wê mirovbûna we kerba min heye. Qet nebê bi pişgiriya me hewl bidin fêm bikin dê mirov çawa bibe mirov, weke mirov çawa baxive. Êdî bêzar bûm meymûnên li ser daran temaşe bikim. Hêjî xwe weke cengawerekî dinirxînim. Ez dîsa jî bi cengaweriya xwe bawerim. Ev jî cengaweriyek li gorî mine. Her çendî neşibe ya kes dike, ne bi şêweya kes dike de jî be, dîsa jî bi cengaweriya xwe bawerim. We ber bi vê ve bazda û hatin. Nexwe tika dikim vî cengawerî û cengaweriya wî binasin. Ev şerek mirovî ye, ne şax li ser şaxên daran xwe hilavêştina meymûnane. Wê li cihek cuda bi kesên cuda re bikin. Bi min re nekin, tika dikim. Her çendî di mercên teng de jî be, dixwazim meşek mirovahî bikim, vê meşê xirab nekin. Ger ji destê we nayê, li kêlekê temaşe bikin. Ger we teng dike, hêza we ya dîsîplînê tine ye, vê meşê tevlîhev nekin. Tişta ez girêdayî ezmûna vê meşa mezin bêjim, hinekê quralên vî şerî pêk bînin. Dev ji zaroktiya salan berdin, êdî mirovbûnê hêjayî xwe bibînin. Şertê sereke yê vî şerî eve.

Teqez divê hûn ji cengaweriya me hinek tişt fêr bibin. Ez bi zorê we ber bi vê cengaweriyê ve naherikînim. Ev misoger cengaweriya dilxwaziya mezin û tolhildana mezine. Dîsa di xala tolhildanê de hûn di rewşek bêrik de ne. Hûn nikarin bi vî rengî bên cem me. Kesên rika wan pir ne mezin, li hember dijmin û paşverûtiyê kerba wan neyî nikarin nêzî me bibin. Pir eşkere ji we re bêjim, cihê meymûnan li cem min nîne. Min li hember mercên herî paşketî di temenek pir biçûk de îsyana xwe da destpêkirin, ezê çima we bipejirînim. Nebêjin; "Bi te re xezîneyek heye û em hatine bi navê dijmin te parçe bikin." Rica dikim şiyar bin. Bila ew dijminê we aresteyî min dike bi xwe were. Çima we dişîne? Weke sîxurên dijmin ên objektif, li gorî gotinên îro kontrayên wî neyên. Ew dijminek wisa ye, ger xwe xurt dibîne, bila ew bi xwe bê û bi min ve mijûl bibe. Çima evqas belengazan aresteyî min dike?

Evqas gêjbûnê nelîzin. Hûn di nepêkanîna quralên şer de israr dikin. Hûn nikarin ji sed quralan çend ji wan pêk bînin. Nexwe hûn leşkerên kî ne, ma dê ji we re nebêjin hûn bi navê kî tên vir? Neserxistina peywiran, ji bo peywiran nemeşandina perwerdeya hewce, rêxistinbûn û ferman-

fermandarî, bi navê dijmin hem jî ji dijmin xirabtir bi şêweyek xeternak hûn tên. Ji ber ku endamên pispor, zane yên dijmin evqasî ne xeternakin. Ew hêsan tên eşkerekirin û xeteriya wan sînordare. Dijminatiya şêwaza we jî çil qatî zêdetire.

Cardin dibêjim: Tevî vê em bi zorê nadin kirin. Raste em dibêjin quralên şerê me pir dijwarin, lê ez nikarim we bi xapandinê, bi hinek rêbazên we îdare bike, xelatan an jî bi nêzîkbûnên bê wê wateyê ve we tevlî vî şerî bikim. Ez xwezaya vî şerî baş dinasim. Min hewl da bi jiyana xwe jî vê baş dahûrînim. Şerê me, şerê baweriyek mezine. Cengaweriya têkoşînek xwe bi xwe re, ferasetek mezin, pêwendiyek mezin û lêgerînek mezine. Ger ev bi we re nebin, nêzî refên me nebin.

Her tim wexta gotinên weke fermandarî û derfetên PKK’ê dibihîsim dîn dibim. Derfetên me tine ne. Ne em dikarin biserûber xew bikin, ne dikarin xwarin bixwin, ne jî dikarin biserûber hênaseyekê bigirin. Tişta bi me re heyî rastiyek bi navê têkoşîna dijware. Ev têkoşîn weke hûn dihizirin bi teqandina çend çekan, du gotin kirin nîne. Weke ku ev li cem me nayên wateya têkoşînê, li serê têkoşînê bela ne. Di vî şerî de cîh girtin cuda ye, zêdetir weke me destnîşan kiriye. Biçin cengaweriya xwe ji xwe re veşêrin, bibin leşkerên bi pere, xwe li cihek din bidin şerkirin. Ez şerkertiya we ya bi vî rengî napejirînim. Ji ber dizanim, temenê vê şerkertiya we bîst û çar demjimêre û sedî sed binkeftinê li ser min ferz dike.

Bîlancoyên ku rojane dijmin didan hebûn. Li Amedê, komek me tasfiye kiriye. Encama min ji vê derxistî, ev şervanên ferzkirina binkeftinê ne. Ji ber li gorî min wexta komek derket çiyê, qet nebê di wan mercan de wisa winda nake. Yê winda dike yan jî dide windakirin, şêwaza jiyan û kesayeta we ye. Hûn dibêjin; “Min di civakê de winda kiriye, bi daketina çiyê re bi te jî bidin windakirin.” Piraniya wan jî li deştê û gundan didin windakirin. Ya rastî herdu rewş jî bi hevdu ve girêdayî ye. Dema derdikevin çiyan, ne ji bo li gorî mercên çiyan bijîn derdikevin. Ji bo goka azadiyê bigindirînin jêr tên çiyan. Dixwazin kêm-zêde rêzdariya PKK’ê daxin deştê, gundê nêzîk, li ser bilîzin û hinekê jî xwesteka bi wê re jiyînê heye. Li Amedê, cuda li gelek cihên vî welatî di bin navê gêrîla de wisa hat jiyîn. Goka azadiyê pêşkêşî dijmin kirin. Pêşî hinekê ew lîstin û li gorî wan qaşo ev jî hunera herî baş bû.

Vê pir baş fêm dikim. Ji sifirê, ango ji cihên qet derfetên wê neyî, em çawa wisa hatin heta roja îro? Ger ji hezarî yekê me kiriban, misoger li

wan çiyan komek wisa winda nedibû. Li wir pir cuda tê jiyîn. Hatina gêrîla jî ne ji bo tevlîbûnê ye, ji bo bikaranîna qîmeta PKK’ê, xilaskirina PKK’ê ve dixwazin jiyanek qediyayî temam bikin. Min kesayetên we lêkolîn kir. Ev kesayet di civakê de bi temamî qediyaye, bi qasî pênc quruş neke bênirx bûye. Niha jî dixwaze tevlî partî bibe, ji bo nirxekê bibîne. Weke her kesî ku nirxên partiyê jî diqedîne, dê ew jî erzan bikar bîne û îdîa bike ya wî ye. Niha hûn behsa raye û fermandariyê dikin, lê mixabin herî zêde jî ev nûner didin windakirin. Nexwe di rastiyê de ev rêber an jî nûnerên ku civakê bi wan daye windakirin, niha jî dixwazin ji partiyê bigirin û bidizine. Ji nişkê ve nirxên partiyê wisa hiştin û xerckirin jî vê eşkere dike. Ne zehmete mirov van encaman derbixe. Niyetên wan ên baş an jî ji bo şoreşê çi kiribin bila be, rastî wisa ye. Bi vî rengî derdikeve holê ev kesayet tevlî şer nebûne. Ji ber ger hinekê qîmeta partiyê û çiya nebin, temenê van kesayetan a li hember dijmin ne bîst û çar demjimêre.

Qet rewşa parastin û rêxistinbûnê nîne. Vê nayînin hişê xwe jî. Tenê yê tekneçûyî ez heme. Qîmetên ku me bi navê PKK’ê dane hev hene. Mirov dikare xwe bi sipartina vê ve çil salan bijî. Lê ev jî nade diyarkirin ku ev rewş bi hewldana cewherî ya wî kesî ve pêk hatiye. Ev dide diyarkirin ku ew kes bikaranîna qîmetekê û weke gêjan xwe bi daneyên nirxan ve girê dide wisa dijî. Ev rastî ne jiyane. Tevdîrên giştî yên PKK’ê girtîn û gelek çeperên bidest xistîn hene. Tu mirovê şeht jî bixî nava van dê bijî, heta dê şer jî bike û bêje; “Min serkeftin bidest xist.” Lê ev çepera PKK’ê ye û ti eleqeya xwe bi wî re nîne. Tevdîrek gelemperî heye, lê di nava we de yek kesê vê tevdîra gelemperî bi navê “Serkeftin a mine” parve nekirî nîne. Ez nikarim ji bo xwe vê bêjim, evqasî ne wêrekim. Nexwe hêjî rastiya kesayetên xwe xapandî û binketî rojane didin windakirin. Ew ne ji bo serxistinê, ji bo binxistinê yan jî ji bo pêkana binkeftinê tên. Mixabin kesayetên we wisa ne.

Ger hûn ispat dikin, li bîlancoyên rojane binêrin. Ne gengaze mirovê aqilmend, mirovê weke me şer dimeşîne wisa winda bike. Wisa pênc kesan danin çiyayekê, wê teqez serkeftinên mezin bidest bixe. Ez leşkerê Komara Tirk baş dinasim, bi salan min bi tena xwe li hemberî dewletekî şer kir. Bi wî halê xwe yê belengaz ve, bi wê bêkesî û bêçaretiya xwe ve li hember dewletê şer kir. Tenê qîmeta PKK’ê bese ku dijmin bixe nava xofê, beşek wê ya biçûk bese ku destanan binivîse. Lê kî wê tine dike?

Generalên Tirk rewşa van şervanan seyr dibînin. Vêca li gel van jî bi min dihizirin û dîn dibin. Bi qasî li ser vir şer îlan bikin hişê xwe winda kirine. Lê belê yên li çiyan jî weke pariyek bên daqurtandin dibînin. Yên me jî dibêjin; "Dijmin ket nava me." Çawa çêdibe artêşa fermî tê û dikeve nava gêrîla? Nexwe xafilin û ji bo qîmeta PKK'ê pêşkêşî dijmin bikin hatine wir. Jiyan hatiye xirabkirin, nizanin bijîn. Hinek nirx û çekên partiyê li wir hene. Ji bo wan pêşkêş bikin tên. Ma jiyanek wisa dibe? Xirabûn û jirêderketina jiyanê jî nîne, tiştek nîne. Ji bo em vê derbas bikin pir serde çûn. Hinekê li hember van hewldanên me rêzdar bin, bi feraset bin. Lê kanî ev nêzîkbûn! Vêca nexwe hûn çima derdikevin çiyan, çima tên cem me? Eşkere ji we re bêjim, naxwazim we bişînim çiyê, naxwazim li cem xwe jî bigirim. Ji min re cihek hûn biçinê bêjin, bi rehetî we bişînim wir û ji belaya we xilas bibim. Lê ne ku li hember min şer bikin, jidil soz bidin, bêjin; "Emê şer nekin, misoger dê zerara me nebe." Emê jî we bişînin cihê hûn dixwazin. Na ger hûn bêjin; "Em hatine şer bikin, em jî cengawerin", nexwe xwe di vê eynikê û bîlancoyê de bibînin.

Mîna vê gelek rastiyên we hene. Ne diyare gelo hûn şer dikin, an jî şer asteng dikin. Hûn li nava çavên me dinêrin yek hewcedariyên vî şerî ya herî biçûk jî pêk nayînin. Paşê jî bêjin; "Hinekan em bikar anîn, em ketin lîstokan, me karê xwe nekir û em xirab bûn." Peyre jî hûnê bi van derewan bawer bikin û derbikevin çiyan! Ma gêrîlatiya wisa dibe? Ev helwesta we li hember çiyan jî heqarete. Li çiyan esalet heye, bi vê ecûciyê derketina serê çiyan, li çiyan heqarete. Lewra ez dibêjim we çiya qirêj kirin. Li çiyayên azadiyê wisa nayê jiyîn. Êdî em cihek we bêxinê jî nabînin. Çiyayên azadiyê warên ku em bikarin we herî baş biparêzin bûn, lê we ewder jî qirêj kirine. Jixwe me yên ji çiyê jî hatîn dîtin. Hemû paşketî ne, paş kesayeta pergalê jî mane. Her wiha şer jî nakin. Yek kes jî bixin nava wan qelîştekên zinaran de, wexta dijmin hat, pênc-deh deqeyên xwe bide vî karî, yeqîn dikim wê misoger yek alayê tine bike. Hêjî di bîra min de ye. Li gundê me eşqiyayek me hebû, di zinaran de çeperên baş digirt. Bi dehên caran hêzek alayê bi ser de çû, lê hemû jî vale derketin. Ev xanim û camêr wê jî nakin. Zinarên bêhempa hene, her yek biçe di navê de hêlîna xwe çeke, dibe ku şahadet jî çêbin, lê wê darbeyên giran li dijmin bide. Lê belê yên me hemû di dolan de kom dibin. Wexta pez tên cem hev, serê xwe dixin nav hevdu.

Yên me jî bi heman derûniyê tevdigerin. Dijmin yek topê davêje wan, yekser dorpêş dike û hemûyan dikuje.

Bîst kes li odeyek gundê hatî valekirin de kom bûne, bêku yek kes derbikeve derve hemû tên kuştin. Qaşo hemû jî fermandarin. Ev rewşek sosrete. Bi hezaran bûyerên bi vî rengî hene. Deh deqeyan li derdora xwe binêre yan jî bi wan çekan tevdîra xwe bigire, wê hejmarek zêde yê beramberî xwe bikuje û piraniya gêrîla jî rizgar bibin. Mixabin vê nakin. Vêca çi karê van li çiya heye? Bi rastî jî zehmete mirov wate bide vê rewşa we. Ger bi qasî nekarin binê tehtekê baş binirxînin belengazin, hûn çima derdikevin çiyan? Ez dibêjim bi qasî pezkuviyekê bin. Jixwe qet hewce nake behsa rûvî jî bikim. Nexasim qet behsa teyrê baz nakim. Di nava xwezayê de hinek bûnewer hene, ew cengawerên hosta ne. Vêca li pezkuviyên çiyan binêrin. Ger şêwaza tevgera we bigihe wan, bijî ji we re, hûn gêrîlayê bêhempa ne. Mîh, bûnewerê tawanê ye. Em nikarin we ji xisleta mîh rizgar bikin. Mîh lawirê herî hêsan bê jêkirin û bibe qurbane. Ezê çawa bawer bim, hûnê bi vî halê xwe ve serkeftî bin?

Dibêjin; “Me nekarî, şikêr nedît.” Na, hûn li wir bi tiştên cuda ve mijûl dibin. Pir baş we dinasim. Ji ber hûn li wir karên şaş dikin windahiyan didin. Ji bilî vê ti raveya vê nîne. Dibêjin; “Jiyan hatiye xirabkirin.” Kî wê jiyanê xirab dike? Masî ji serê xwe genî dibe. Qet nebê ya hatî xirabkirin hebe jî, ma ji bo rizgarkirina wê jiyanê jî hûn nikarin bikevin bin tehtekê? Ya rastî rewş cudatire. Mirov zehmetî dijî ku rave bike. Her cure rewşên dijminatî, hîlekar û xafiltî hêjayî xwe dîtine û navê wê jî kirine xirabûna jiyanê. Jiyana gêrîla bê xirabkirin, ji sedî yekê wê jî bimîne, bi vî rengî dawiya xwe nayîne û dîsa hinek tiştan dike. Ger hûn hatine tevlî şer bibin, hinekê wate bidin xwe.

Cardin vedibêjim: Wisa xwe naxim cengawerek bi navûdeng nabînim, lê dîsa jî li ber xwe didim. Li gorî xwe çepergirtinek min, tevdîrên min û şêwazek min a şer heye. Bi rojane van xebatan dimeşînim. Her tişt li ber çavên we ye. Bila cengaweriyek we jî ya rast hebe. Çiya we baştir diparêze, li çiyan çek bi dest de baştir tê şerkirin. Lê binkeftinek wisa nabe û mirinek wisa nabe. Digirîn û dibêjin; “Cihek ez biçimê nîne.” Parsek jî wisa nakevin nêvenga. Gêrîla, nav li sere, şervanê biçeke. Ma belengaziyek wisa dipejirîne? Em raporên wargehê dixwînin. Bi sedan milîtan kirine nexweşê nexweşiyê. Çawa çêdibe bi sedan milîtanî û heta PKK’ê wisa dikin deyndarê xwe û tînin vî halî?

Kesek ji rêzê, di nava sînorên pergalê de tenê ji bo heqê sê nanê somin peyda bike, deh demjimêran di nava xwîn û xwêdanê de kar dike. Ji bo heqê sê nane somin hewce dike heta mirina xwe deh demjimêran kar bike. Îstatîstîkên rojane vê destnîşan dikin. Vêca çawa çêdibe bi sedan kes salane di nava refên me de tevî ku dixwin û vedixwin, dema karên rêxistinê dibe mijara gotinê yek karê baş nakin û weke ku ev jî nebese partiyê jî dikin deyndarê xwe? Vêca li xefleta qaşo fermandar an jî nûnertiyên me yên partiyê binêrin, ji kesên wisa re nabêjin tu çi dikî.

Em tevgerek kesên dil û mejiyê xwe heta dawî pakin. Ji bo fedekariyê em hatine cem hev. Ji bo kêliyekê em li hember dijmin şer bikin hatine cem hev. Li kur hatiye dîtin sed kesî xwe bi xwe nexweş xistiye û li ser pişta partiyê belaş jiyan kiriye? Kî rê ji vê re vekir, kî çav jê re girt? Kêmek maye biryargeh li holê nemîne. Bi navûdenge dibêjin; "Çil salan xatirê kehweyek tehil heye." Wê tu her roj ji partiyê bixwî – ya rastî ev rêxistinek şere, ne wisa cihê xwarin û vexwarinê ye, cihê şerkirinê ye-, her wiha vê jî têr nebînî, zêdetir raye, zêdetir cewaziyê bixwazî! Her wiha wê tu hêvî bikî em jî van ji xweber bipejirînin û daqurtînin! Ev ji kontrayan kembaxtirin, yeqîn nakim ên vê dibêjin jî nexweş bin. Piraniya we ciwanin. Ma di temenê ciwan de nexweşiya rihî dibe? Nexweşiya rih çiye? Li dijî dijmin kerba te ya dînîtî çêdibe û ev jî mejî dişixulîne. Nexweşiya te ya rihî çiqas giran dibe bila be, dê carekê de te rizgar bike. Ez jî berê wisa bûm, lê ji ber niha hinekê dijminê xwe dibînim pir saxlemim. Panzehîra her cure nexweşiyên derûnî, meşa tolhildanê ya şoreşê ye. Ev pir eşkere ye. Li cihên fermandarên me yên herî baş lê ne, ne gelek nexweşiyên derûnî, kontra xwe xwedî dikin. Ezê vê çawa îdare bikim?

Vêca hûn niha dizanin çawa dilîzin? Ger hûn dixwazin ji civatek bi lenetî derbikevin, ji rewşa ketîbûna meymûnan kembaxtir rizgar bikin û dibêjin ji bo vê jî şer hewce ye, hinekê ders ji ezmûnên min derbixin. Berê her kesî ji min re digot dîne. Kesî ez cidî nedigirtim. Lê niha dikarim li hember dijminê xwe hinek tişt bikim. Ger hûn jî dibêjin; "Divê em li dijî dijminê xwe hinek tişt bikin", ji ezmûnên min sûd werbigirin. Ez ne tenê ezmûn didim. Tiştên didim we biçûk nebînin. Ev zehmet tên bidestxistin. Îro çekek bidestxistin ji hêla heyberî ve pir bihaye û ji hêla siyasî ve jî pir zehmete. Çek girtin û dana destê yekî, ew gihandina çiyayên azad, têrkirina şervan pir zehmete. Ez hêjî êrîşî savarê dikim. Carina xwarinên din jî hene, lê ji ber min xwe her tim li

gorî savar û pîvazê eyar kiriye, wê dixwim. Ji ber dizanim, ew xwarin pir hêja ye. Lê mixabin em çeka herî baş, rayeya herî baş, tor û rêxistina şer a herî baş didin we, hûn nirxa wê jî nizanin. Kontrgêrîla jî rêxistinekê wisa mijûl nake. Bi vî rengî şer nayê lîstin.

Nexwe carek din bang dikim ku, hûn rastiya xwe bibînin. Dijmine dê bike, dê mirov bixe vê rewşê jî, heta kembaxtir jî bike. Lê qet nebê em jî di nava rastiya xwe ya Rêbertiyê de nûnertiya hêzek xwedî îdîaya jiyînê dikin. Ev rêgeza me ye. Pratîka me jî pir dijwar li gorî vê rêgezê ye. Ti aliyê vê ya neyê fêmkirin nîne. Min ev pir zelal danî holê. Hêvîdarim hûn xwe ji min mezintir nabînin, xwe ji min zêdetir weke xwediyê hewldanê nenirxînin. Ez razî me hûn bi qasî ji deha yekî min dilnizm bin û li gorî hewcedariyên şer bijîn. Hinekê li hember nirxan rêzdar bin, weke kontrayekê wan binpê nekin. Ya we dide jiyîn û hinekê diparêze nirxin. Hinekê nirx bidinê, bi qasî ji we re hewce bikar bînin. Em bi vê jî razî ne. Ji ber ku şerek mirovahî heye. Me got, em hêjî hene, hêj xilas nebûne, ji nû ve vejîne. Lê belê we got; "Dor hatiye rizgarî." Madem we ev peyv bikar anî, nexwe li gorî hewcedariyên wê tev bigerin û vê jî weke hewcedariyek mirovahiyê bibînin, bizanin.

Hûn ji min ciwantirin, zêde ji taqet jî neketine. Ger rastî jî evqasî eşkere li pêşiya we ne, nexwe hinek karên hûn bikin hene. Ev beriya her tiştî ne. Karên şer wisa nayên kirin, çeper û biryargeh wisa nayên bikaranîn. Rayeyên rêxistinê û nûnertiyên rêxistinê wisa nayên bikaranîn. Heta derfetên jiyanê, dervî welat jî di navê de, ti qad wisa nayê bikaranîn. Ji bîr nekin, em nabêjin we nejîn. Berovajî, em rêya jiyana mirovî şanî we dikin. Wisa li gorî quralên dîsîplîna hişk jî bûyîn, ji bo gengazkirina jiyanê ye. Li gorî ezmûnên xwe dibêjim, ji bilî vê ti derfeta me ya jiyanê nîne. Her tiştê ji bilî vê, ger ji meymûnbûnê ne xirabtir bûya, dê min ji we re gotiba. Lewra bila qural û pêdiviyên şer we tengav nekin. Ev ji bo we dermanin. Ji bo ji wan nexweşî û paşketinan rizgar bibin, çareya sereke pêdiviyên vî şerî bikin û bila her tişt a we be. Ya divê bê kirin jî, baş şerkirin û serxistine. Piştî ev pêk jî hat, bila her cure jiyana heyberî û giyanwerî ya li welat a we be. Lê divê pêşî hûn pêwîstiyên şer pêk bînin. Ger em vê nekin, dê we weke çêlikan belav bikin, weke mîhan serjê bikin û jixwe jê dikin.

Qet nebê ji vê re dibêjim raweste. Hemû tiştên diparêzim û dixwazim hûn di hemû şaneyên xwe de bihesin evin. Ti aliyê van neyê fêmkirin nîne. Berovajî, ev nirxên jiyana me ne. Ne hûn, ne jî bila hinek din bi

nirxên me bilîzin. Di vê mijarê de heta dawî hesas bin. Ji ber îdîaya we ya jiyanê heye. Ma hûnê çima bi vê re nakokiyê bijîn? Hêza we ya jiyan û biryarê pêş dikeve, derfetên we yên jiyanê pêş dikevin. Ji bo ev derfet bi aqilmendî bên nirxandin û parastin xwe baş birêxistin bikin, baş venêrînin, bi kesî nedin binpêkirin û her tim pêwîstiyên vê pêk bînin. Bi vî rengî hûnê gav bi gav nêzî jiyanê bibin. Ji bo vê jî dilnizm bin. Êdî dev ji vê dînîtiyê berdin.

Bi dilnizmî jî be, hûn dikarin bi şêweyek serbilind di nava meşa mirovatiyê de cihê xwe bigirin. Ji bo vê jî hezar carî şikir bikin. Ji ber ku li dervî meşa mirovatiyê bûyîn, ji bo mirov şermek mezine. Tiştek wisa bi lenete û mirov li ber xwe nade. Niha hûn hinekê bi şerefa me dijîn. Hûn bi xwe bibin xwedî şeref. Hûn hinekê bi hêza me ya li ber xwe dayînê li ser lingane. Lê ev jî têrê nake. Hinekê bi hêza xwe ya cewherî ve li ser linga bimînin û şerefa wê bijîn. Ew hîn zêdetir mayînde ye û dê mafê we jî bide we.

Ez cengawerekî miletim. Ango xwe nadim paş ku ya bi navê gel dikim heta dawî berfireh bikim. Lê ev her tim wisa nabe. Mirov û milet di rastiyê de pêwîste girêdayî hêza xwe ya cewherî şer bikin, şeref û serfirazî bidest bixin, derfetên heyberî jî bi mafdarî di navbera xwe de parve bikin. Her tim xwe sipartina rêberan ve jiyan nabe. Jixwe rêberê wisa bide jiyîn jî çênabe. Jixwe dê ev jî jirêderketinek be.

Di van 76 salan de –jixwe beriya wê jî heye- li hember vî dijminî di rastiya me ya Rêbertiyê de bi şêweya cengaweriyek pir zehmet û kêm mînak, bi şêwazek qet ne di hesabê dijmin de jî, her çendî dereng jî be, em şerê tolhildanê yan jî şerê jiyanê binav bikin, şerê mirovahî yan jî rizgariya netewî bêjin, çawa bi nav dikin bila be, me qonaxek berxwedaniyê bidest xist. Ev rastiya em bi serbilindî parve bikin û bijîne. Ji bilî vê nirxa ti kesî ji me nîne. Ji bo me tenê derfeta berxwedêrî wateyekê rave dike, nexwe her tişt vale ye. Lewra ne xeyîdin, derfetên berxwedêrî pir dijwar hemêz bikin. Her ku hûn hewcedariyên vî şerî pêk bînin, biryara vî dijminî ya ku li ser ti civakê nehatî ferzkirin ji mirinê kembaxtir hukmê wî yê dîn û har wê bê derbaskirin. Hûnê jî bi xiroşa ji nû ve mirovbûnê bûna mirovê herî pak pêkanînê re rûbirû bimînin. Jixwe xiroşa vê jiyînê hêjatir tiştek nîne.

Di vê mijarê de dihizirim gelo rêbaza nêzîkbûnek cudatir çawa dibe? Em di têkoşînê de gihane qonaxekê. Bi qasî wateya jiyana nû yan jî pêvajoya em di navê de dijîn heye, şêwaza meşandina wê jî, em

dixwazin bi nêzîkbûnên hîn afirînerî ve binirxînin. Ji vê hêlê ve dikare nîqaşên hîn watedar pêş bikevin, her kes dikare jêhatiyên xwe hîn afirînertir derbixe holê. Ya herî girîng jî hûn dikarin bi hêza xwe ya cewherî ve li ser lingên xwe bimeşin. Li şûna her tim xwe sipartina hêza partiyê ya giştî û her tim xwe sipartina Rêbertiyê bijîn, bi hêza xwe ya cewherî ve, li ser lingê xwe bimeşin. Êdî divê hûn hevgirtina vê diyar bikin. Qonaxa hatî derbaskirin, hûn anîne vê radeyê.

Girêdayî ezmûnên xwe dikarim bêjim, ya rastî me bi sebrek bilind hûn mezin kirin, anîn astek bikarin bi ceribandin û ezmûnan ve bimeşin. Hewce nake hinek bi israr li gorî nexweşiyên xwe yên zaroktî hinek tişt bikin û xwe li ser pişta partiyê bidin jiyîn. Qonaxa vê êdî kevin bû. Dem ew deme her kes hêza xwe ya cewherî di fikir, rih de û fîzîkî raber bike. Wateya vê jî, êdî nikare weke berê bijî û di nava refên me de cîh bigire. Êdî hûnê dev ji rewşên weke her tim loma dike, digirî-dinale, erzan bin dikeve û darbe dixwe yên zarokatiya berê berdin. Xebatên ku we ji bo vê demê kirîn, êdî we dide fêmkirin. Ji kur dinêrin binêrin, ti rewşa we ya bi zarokatî bê ravekirin nîne. Hûn pir mezin bûne. Hûn di fikir de pir mezin bûne. Me ji pêşketinên we yên rihî re jî tevkarî kir. Lewra dev ji van lîstokên zaroktî berdin.

Bi salane we şêwazek hêjayî xwe dîtiye. Lewra li ser me jî fêlbaziya gundîtî, bazirganiya pergalê û dikandariyê ferz nekin. Ger ev firsendê bibînin, wê tenekê bi navê zîve bifiroşin. Hûn jî bi vî şêwazî xwe pêşkêş dikin. Hûnê dev ji vê kesayeta pergalê berdin. Karên wisa bi kirîn û firotinê, pere-mereyan nayê pîvan. Ango dikare bê gotin xebatek bê pere ye, dê ew nêzîkbûn bê raberkirin. Ev xebat qîmeta wê berze, nirxek bi ti tiştî nayê kirîn û firotine. Şêwaza xebata şoreşgeran wisa ye. Nexwe bêku ti kedê bide, weke dizê malê, gelek tişt ji rêxistinê xwestin ne raste. Jixwe xwe jî wisa firotin ne hêsane. Hûn xwe difiroşin kî? Ne raste mirov xwe di şoreşê de bifiroşe. Şaşe mirov tiştekê beramberî hev bixwaze, heta xwestin jî şaşe.

Min her tim ev got: Partî heta dawî ya kese, kes jî heta dawî ya partiyê ye. Dema hûn dibêjin ev partî ya mine, hûn bi xwe jî bi her tiştê xwe ve –lê ne bi nexweşiyên xwe yan jî kesayeta xwe ya ji mirinê kembaxtir ve-, heta dawî bi kesayeta xwe ya dide bidestxistin ve partiyi ne. Divê hûn vê fêm bikin. Sedema ku ez heta niha xwe PKK'yî hîs dikim, heta dawî radeya min dayî bidestxistine. Nexwe wexta bi qasî misqalekê windakirin çêdibe, weke min îxanet li PKK'ê kirî hîs dikim.

Yê winda dike ezim, qetiyen ne PKK'yî ye. Kesayeta min a ser dixe PKK'yî ye. Rêgez eve.

Hûn bi her tiştê xwe ve didin windakirin. Di bin rûpoşa PKK'yîbûnê de dibêjin; "Divê PKK ya min be." Ev dizîtî ye. Êdî pêwîste ev rewşa dizîtiya malê bê berdan. Kêliya we da windakirin hûnê bêjin; "Ez ne yê vê partiyê me", lewra xwe jî tawanbar bibînin. Ger hûn bi israr dixwazin bibin PKK'yî, nexwe hûnê 'kesê bidest xistî' beşdarî partiyê bikin. Niha em di qonaxa vê de ne. Êdî bi hebûna xwe ya hêcetên cuda we dayî windakirin ve, veguherînin hebûna tevlîbûna we bidest dixe û tevlîbûna xwe pêk bînin. Ger tiştek ji destê we naye, di mijara newindakirinê de rawestin. Ger hûn nikarin bidin bidestxistin, nedin windakirin. PKK vê jî dipejirîne. Lê eşkere bêjim, her tim dana windakirinê napejirînim. Ji ber ez mirovê rêxistinê me, hem didim destxistin, hem didim jiyîn, hem jî PKK'yîyek neçarim bidim jiyînim. Ezê çima kesê her roj dide windakirin di nava PKK'ê de bigirim? Emê di nava xwe de ne yê nexweş, ne dide windakirin û ne jî zerar dide bigirin. Kesayetên wisa bila biçin cihek din. Em bi ti hêcetî yê dide windakirin di nava xwe de nagirin.

Nexwe, êdî emê vê rêgezê bikar bînin. Berê di hemû sazî û dezgehên artêşan de wisa dikirin, birîndarên xwe jî davêjtan. Quralê vî karî wisa ye. Lê insafa me heye. Em heta dawî yên nexweş û birîndar diparêzin. Bila kes vê xirab û cuda şîrove neke, ev ne mafeke. Ya rastî li gorî quralên şer tişta divê bê kirin an ji dijmin re hiştin an jî ew bi fîşeka xwe, xwe bikujê ye. Jixwe hinek hevalan jî wisa kiriye. Em nabêjin fîşeka dawiyê bi xwe de biteqînin. Lê qet nebê herî kêm di jiyanê de heta dawî bi partiyê ve girêdayî bimînin. Weke nexweşekî nebin bela serê partiyê, ger milek wî nebe bila bi milê xwe yê din kar bike. Ger lingek wî nîne, bila bi linge xwe yê din kar bike. Bila bi zimanê xwe bike, bila bi milên xwe bike, bi vî rengî partî jî wî xwedî bike. Nexwe berovajî vê partî vî kesî xwedî nake. Êdî ji vir û şûn de rêgeza li hember nexweşan jî bê pêkan wisa ye. Bila ti kes rêgezek din li ser me ferz neke. Bila ti kes di bin navê partiyê de ji van ferzkariyan re nebe pirek. Ev qural ji bo min derbasdare. Jixwe wexta hinekê nexweş dikevim, qet xwe şanî partiyê nakim. Heta hinekê baş dibim, ji odeya xwe dernakevim.

### Em Dixwazin We Ne Ber Bi Mirinê Ber Bi Serkeftinê Ve Bibezînin

Em dixwazin dema pêşiya xwe hîn cudatir bimeşînin. Piştî evqas berxwedanê, em dixwazin di şêwazek kêrî jiyan, şer û her cure şoreşê bê de bimeşînin. Ger ez bi vî temenî ji vê re amade me, hûn çima li ser vî bingehî ne amade bin? Bese êdî we têra xwe xirab kir û pê lîstin. Êdî yek çirkeyê ji vê re sebir nîne. Kanî we dixwest şer bikin? Em dixwazin we ne ber bi mirinê, ber bi serkeftinê ve bibezînin. Lewra hewce dike di vî şêwazî de têkoşîn bê kirin. Li gorî ku min sebir kir û li ber xwe didim, hûnê çima nekarin li ber xwe bidin? Evqas nirxandinên amade pêşkêşî we dikim. Hûn çima van fêm nakin? Tiştek din nekin, van rast fêm bikin bese.

Ezê bi şaşî, xeletiyên rêberên şoreşên din kirine nejîm. Weke kesek ji sifrê dest pê kirî û dizane tolê ji dijminê xwe bigire, yeqîn dikim ji kesên weke we bi rastiyên şer dilîzin zêdetir dikare hesab bixwaze. Hûnê çima min şaş fêm bikin? Ez cengawerekim. Hûn bi xwe dibînin li hember dijminê xwe çi dikim. Ma hûn kîne, evqasî zerarê bidin? Ma emê ji we re serî bitewînin? Min hêj di deh saliya xwe de li hember malbatê hostatiya şer, heta mezinbûna wê raber kir. Ma emê di vî temenî de û bi vê ezmûnê ve nekarin we dahûrînin?

Eşkere bêjim: Bi zorê nabêjim werin, bi min re hevbeş şer bimeşînin. Hûn bi xwe hawar û qêrîn tên. Wê demê tika dikim li gorî pêdiviyên vê bin. Daku ji xwe zêdetir derfet û cîh didim we. Hûn çima qîmet nadin vê? Vekirî bêjim: Ger hûn dijîn û tên jiyîn, ev hinekê jî ji bo ji we tolgirtinê ye. Ez mirov tînim astek wisa, qelişandina erdê jî dibe ku ji bo wî rizgarbûnek be, ancex dê wê siûdê jî nebîne. Hûn dizanin hinekê jî vê dikim. Ez tolhildêrekim, dê we beriya niha ev fêm kiriba. Ji bo pariyek nan hêj di deh saliya xwe de min çawa şerek meşandibe, hêjî heman şerî dimeşînim. Di vê xalê de tiştek bi min re hatî guhertin nîne. Berovajî pêşketinên pir mezin hene. Ji bo bidestxistina mirov min sal xerckirin. Hûn di carekê de bi dehan mirovî winda bikin, peyre jî rojekê derbikevin pêşberî min, heta hûn di gorê de jî bin, ezê we efû nekim.

Me cara yekê li çiyayê Bagokê bîst heval şehîd dan. Nîsana sala 1988’an bû. Hevalek berpirsyar hebû. Min got ez biçim gora wî vekim û bi ser de biçim. Li gorî min darbeya herî mezin li me da. Mirina wisa

erzan napejirînim. Kesayetên hêsan namirin û her tim serkeftî şer dikin ji bo min hewce ne. Ev rastiyên Rêbertiyê ne. Ger hûn dibêjin; "Em jî hêzekin", ez jî ji we re dibêjim rawestin, kî hêze, emê şanî hevdu bikin. Ma hûn dihizirin ez ne cengawerek başim, xweliyê bixwim û hûnê min bixapînin. Ger evqasî bi quralan bilîzin, hûnê encamên wê jî bipejirînin. Berê ji bo van mirinên bêwext xemgîn dibûm, niha dibêjim divê xwe xemgîn nekim. Ji ber ev lîstokeke. Ger xwe xemgîn bikim, ezê têkil lîstoka dijmin an jî van mirinên erzan bibim. Ezê qet xembar nebim, heta hejandinek herî biçûk jî nejîm, ji ber tevlî vê lîstokê nebim.

Bi qasî quruşekê nirx nadim ên mirina erzan hêjayî xwe dibîne. Min ji bo **Mazlum** û **Egîd** nirxandinên pir watedar kirin. Lê hinekan jî ji nedîtî ve têm. Êdî kes nikare bi mirina erzan xwe bispêre refên PKK'ê. Ji ber li wir ê dimire û dikuje jî zerar dide PKK'ê. Can ne canê we ye, canê PKK'ê ye. Canê xwe yê beriya niha biçin li cihek din tine bikin. Wexta hûn beşdarî PKK'ê bûn, canê we yê PKK'ê ye. Yek ji we ne xwedî wî mafî ye wisa erzan li ser vî canî bilîze, hêsan bide kuştin. Heta yek ji me ne xwedî wî mafî ye vî canî ji bo serkeftinên kêm bikar bîne. PKK'yîbûnek rasteqîn wisa ye.

Hêjî di bîra min de ye: Li gundê me jinek hebû, digot; "Ezê narîncokê bigirim, biteqînim, ma ev can ne ya mine?" Vê gotinê qet ji bîr nakim. Çil sal sere derbas bû, encama ku min ji vê bûyerê derxistî, kesek nikare di bin navê ev can yê mine de, vî canî bigire li gorî dixwaze bikar bîne. Ji ber pêwîste ev can ji bo civakê bê bikaranîn. Ango hûn nikarin canê xwe li gorî keyfa xwe bikar bînin. Hûnê ji bo partiyê û xwezayî ji bo civakê bikar bînin. Bi encama min ji wê bûyerê derxistî ve heta roja îro xwe ji bo civakê bikar tînim. Şêwaza dijberî bikaranînê, şêwaza xwe bikaranîna ketiyekê ye. Jixwe hûn dizanin ev jî xizmetê ji kî re dike.

Nexwe di nava PKK'ê de mirina hêsan, çek li erdê dayîn û raye binkeftî bikaranîn nabe. Ev rastiyên cewherî yên PKK'ê ne. Ji ber PKK tevgerek bi zehmetiyên mezin bidest dixe. Em neçarin vê biparêzin. Terbiya PKK'ê ya rasteqîn, fêmkirina vê rastiyê ye. Hûn dibêjin; "Em çawa her roj dimirin, me çawa hezaran çek ji dest dan, fêm nakim." Ez saxim, tenê ji bo van li ser linga me. Teqez ezê hesabê van bipirsim û di vê mijarê de hûn jî dizanin kesek pir hosta me. Min Komara Tirk bîst salan da razandin û hêjî hesab dipirsim. Vêca ma ezê hesab ji we nepirsim? Tenê ji bo hesab ji we bixwazim, we didim jiyîn. Min ne

dixwest van gotinan bikim. Ji ber di cengaweriya min de xisletek heye. Ji ber hinek niyazbaş hene, daku nebêjin; "Me ne bihîst, keyfî jiyan kir û jiyan xirab kir" van dibêjim. Kesek hinek berpirsyariya min dizane yan jî bi aqil be, vê nêzî hişê xwe nake. Her kêlî bi nirxên me lîstin, ew wêran kirin, wisa hêsan ne hedê kesî ye. Ev rastiyên girîngin û teqez hûnê derbixin zanebûnê.

Hûn fêrbûnên xwe didomînin û me tengav dikin. Ez jî pir sebir nêzî we bûm. Mixabin êdî nikarim van helwestên we bipejirînim. Dê ev rastiya PKK'yîbûnê bimeşe. Ji ber pir baş dizanim, ji bilî vê hêza min têrê nake yek ji we bidim jiyîn. Ji aliyekê ve li dildariyên we yên jiyanê dinêrim, li hember jiyanê hinekê baldariya we heye. Lê ji aliyê din ve nêzîkbûnên we yên rê ji mirinê re vedikin jî me pir tengav dikin. Evqas seresertî, evqas sivikbûn, evqas quralên girîng ser guhê xwe re avêtin û bi quralan lîstin nayê pejirandin.

Dihizirim, ecêb dimînim çawa dikarim li hember van rewşên hatine jiyîn li ber xwe bidim. Ev ezabek mezine. Dayîkek wexta lawê xwe winda dike, deh salan bi ser xwe ve nayê. Em jî kêm-zêde berpirsê vê malê ne. Kîjan kesayet dikare beramber evqas windahiyên rojane li ber xwe bide? Me got ji bo vê jî mezin hizirîn, hemû derfet û firsend baş nirxandin hewce dike. Mixabin hûn kêleka van re jî derbas nabin. We rewşek xerckirinê ya mezin jiyan kiriye.

Ev têkoşîn me bi destê xwe anî heta vir. Emê çima pêşkêş bikin? Ne tenê şer, aliyên jiyanê yên din jî hene. Emê çima şeref û serfiraziyê bixin bin lingan? Emê çima xweşikbûn, dilxweşî, azwerî û xiroşa jiyanê veguherînin xembariyek mezin? Evqas şehîd hatin dayîn, evqas îşkence hat jiyîn, ma ev têrê nakin? Gelo mafê kesî heye bi van bilîze? Wan ji bo jiyanê pêk bînin, ango ji bo dilxweşî û xiroşa jiyanê bidest bixin evqasî li ber xwe dan. Lê hûn dixwazin jiyanê cardin veguherînin xemgînî û di nava bêhêviyê de bixeniqînin. Me ji hêla dîrokî ve serbilindî û dilxweşiya jiyanê bidest xistiye. Nexwe hûnê jî jidil nêz bibin ku vê binpê nekin. Ev xalên ku milîtanek şoreşger û rêberek her tim berçav bigirine.

Dema em li ser pêvajo radiwestin, ev fikir carek din tên bilêvkirin. Ya rastî wexta me dest bi têkoşînê kirî jî, ya li ser me serwer dîsa jî ev fikir û reftar bûn. Ancex we ev bi rikek mezin înkar kirin. Lewra em jî carek din piştî evqas pêşketinan van datînin pêşiya we. Qet nebê piştî evqas keda mezin hewl bidin rastiyan fêm bikin, bi aqil bin û bizanin

bibin şerkerek quralmend. Qet nebê bila niha mirov bi qasî bawerî bi soza we dayî bîne xurtbûnê bi we re bibîne. Berê jî baweriya min bi we tevan hebû, min digot dikarin vî karî bikin. Ancex niha xwe weke kesek bîst sale hatî xapandin dibînim. Mafê we ya wisa nîne. Ma min hûn xapandin? Nebawerim. Rehetî divê hûn bipejirînin, li hember we yê herî rasteqîn û ya nehatî yeqînkirin jî kirî, di rewşek serkeftî de bersiv dayî dîsa ezim. Hûnê çima evqasî min bixapînin? Min yek carê jî derew li we nekirin û hûn nexapandin. Ancex jiyana we derewkarî û belengaziyê derbas nake.

Belengazî, bêhêzî û binkeftin, ji derewkariyê xirabtire. Hûn derewan bikin, zêde windahiyên we çênabin. Lê wexta binkeftî bin, hûnê winda bikin û bidin windakirin. Hûn her roj dibêjin; "Emê kesayeta Apo'yî esas bigirin, wisa şer bikin, wisa bijîn." De başe, vêca ew kirêtî, binkeftin, bêquralî, bêhêzî û lewaziyên hûn li pey xwe dihêlin çine? Kes ji we re nabêje gotinên biryardarî bikar neyînin, bes dema we got jî hevgirtî bin. Şertê sereke yê leşkertî, li ser xwe serwerbûne. Çarçoveyek jiyanê ya hatî destnîşankirin heye, armanc heye, amûr heye û ked heye. Hûnê bizanin bi wan ve girêdayî bin. Dîsîplîn jî eve. Wexta we pêwîstiyên wê pêk anîn, nexwe hûn li ser xwe serwerin. Tê wateya we bi şêweyek pir cidî gava yekemîn a leşkerbûnê û gava misoger a serkeftinê avêtiye. Beriya hûn li ser dijmin serwer bin û çend darbeyan li dijmin bidin, gelo hûn li ser xwe serwerin?

Me bi hezaran şoreşger şandin. Bes yekê jî hêza pêkanîna çarçove û dîsîplîna hatî destnîşankirin raber nekir. Vêca leşkertî li kur tê jiyîn? Hûnê kengê destpê bikin bibin leşker? Ma leşkerek evqasî xwe înkar dike û evqasî dîsîplînê înkar dike dibe? Hûn dibêjin zehmete. Hûn leşkertiyê dixwazin. Ez jî ji we re dibêjim rica dikim, li gorî quralên wê yên dîsîplînê û pêwîstiyên wê tevbigerin. Mixabin hûn jî ser guhê xwe re davêjin. Ger we di xebata siyasî de îflas kiribe, ma hûn dikarin gêrîlatiyê bikin? Pêşî fêrî xebata siyasî bibin. Hûn dibêjin; "Ez ji çekê fêm dikim." Lê mixabin hûn tiştek ji çekê nizanin. Hûn tam bela ne. Em bi vî halî ve çi ji we bikin? Ger çend berendamên fermande yên ji vî karî fêm dikin hebûna, neha em gihiştibûn serkeftinê. Bi qasî hejmara tiliyên destekê hebûna besbûn. Ancex ew jî nîne. Hemû jî kesên her roj bi quralan dilîzine. Nexwe emê çi ji vê leşkertiya we bikin? Jixwe dijmin jî hûn girtine berçav û wisa li we dide.

Pêwîste hûn nirxandinên Serfermandarê Giştî fêm bikin. We weke kewên hatine girtin, berxan dinirxîne. Hûn xwe çi dihesibînin? Hûn nikarin xwe bispêrin min bijîn. Şerker mil didin hev wisa dijîn. Mafê şerkeran nîne hevdu vale derbixin. Hêza we ya pêkanîna dîsîplînek herî biçûk jî nîne. Hûn dibêjin; "Ez dixwazim kêliyekê zûtir biçim çiyan." Mafê gêrîlayan nîne vê bêjin. Dizanim, ne ku piraniya wan dixwazin ber bi peywirên dîrokî ve biçin, ji bo ji dîsîplînê direvin dixwazin ji vir biçin. Em hinekê bi dîsîplîn dikin û bi jiyana leşkerî didin nasîn. Piranî jî dixwazin ji vê birevin. We bi xwe got; "Em li vir fêrî leşkertiyê dibin. Hûn hinekê fêr dibin, bêhna we teng dibe. Vêca hinekê hevgirtî bin.

Ger em bikarin ji nava we çend berendamên fermandar ên saxlem derbixin, wê çarenûsa şer bê guhertin. Her wiha dê helwestên her carê me dixin fikaran tine bibin. Wê qonaxek şerê watedar û li nava dilê dijmin bide destpê bike. Ger hêza we ya li ber xwe dayînê hebe, soza we ya leşkerbûnê hebe, bila di vê çarçovê de be. Qet nebê ji vir û şûn de van firsendan binirxînin. Ezê dîsa bi azweriyek mezin van karan bikim. Bes bi we re hêza kirinê heye? Soza şerefê bidin, soza egîdî bidin û em jî karan bi we re hinek kûranî bigirin dest. Bi rastî jî derfetên me berfirehin. Em dikarin rayeyên girîng bidin we, lê hûnê van rast bikar bînin. Her kêlî gotinên weke; "Ez hatim lîstokan, me lihev kir û hatim çewsandin" nekin. Hûnê weke mirovan bêjin; "Ez hatim, min dît, ser ketim. Min nirxand, rast destnîşan kir, bi ser de çûm û ser xist." Ji bo pêkanîna vê ti astengî nîne. We dît ez weke tê hêvîkirin derneketim, min jî guhdar nekin. Ez jî li pêş we asteng bim, min binpê bikin û bi ser peywirê de biçin.

Hûn behsa kîjan astengî, çewsandin û lihevkirinê dikin? Êdî ev derewin. Divê êdî kesek van gotinan negire ser devê xwe. Ji ber rastî, rastiye. Cudabûna kesî nîne li hember rastiyan li ber xwe bide. Her kes neçare van pêk bîne. Vê PKK'ê û gêrîla wisa bingeha xwe çêkiriye. Hedê kiye li pêşiya me bibe asteng?

Ger komek me ya biçûk, li ser vî bingehî çarçoveya xwe dane, xwe bigihîne asta sond û biryarê, dê çarenûsa vî şerî biguhere. Ma qet wijdan bi we re nîne? Dayîk û bavên we di nava xwîn û xwêdanê de ne. Dilê kesî bi vî rengî windabûna van mirovên ciwan ranake. Hemû jî tên bibin gêrîlayên cengawer. Yek endamê fermandar xwedî li van derbikeve, wê destanê binivîsin. Bes hûn rihê mirovan distînin, dev ji vê berdin. Ji bo vê jî divê hûn di hemû şaneyên xwe de berpirsyariyê bijîn. Pêwîstiyên

kar derbixin zanebûnê, êdî divê hûn weke berê bi van karan nelîzin. Heta dawî wate bidin dê çi, çawa bê kirin, çawa nêzî çi bibin û li ser vî bingehî diyar bikin ku ji peywiran re amade ne. Bila komek kes vê bêje, emê hemû rayeyan bidin wan. Ma hîn zêdetir dikarin çi ji me bixwazin? Ger hûn van karan nakin ji min re bêjin, ezê ji we re mal kirê bikim. Ev hêza me jî heye. Em dikarin we weke karmendên teqawîd jî bidin jiyîn. Ancex hûn bi israr dibêjin; “Em cengawerin, egîdî em mest kirine.” Nexwe ez jî dipirsim hûn dikarin xwe li gorî quralan û pêwîstiyên wê amade bikin? Sozên ku heta niha we dayîn axaftinên pîremêran derbas nekirine. Heta fêm bikin ji wan jî xirabtirin û rica dikim hûn dikarin soza rast bidin?

Hivde salin min li cihek teng çeper girtiye. Dîsa jî pir dijwar li ser van karan disekinim. Ez xwe weke we pir bi navûdeng jî nanirxînim. Hêz û derfetên min sînordarin. Dîrok diyar dike ev jî mucîze ye. Min dixwest ez jî weke we tevbigerim û yek rê şanî min bide û min derbixe serê çiyan. Lê kes nebû vê bike. Devjêberdin rê şanî bide û derbixe serê çiyan, her kesî ji rê derdixist. Jixwe her tişt ji rê hatibû derxistin. Lê me rast kir. Hûn jî gihan çiyayên azad û her cure çeka wê. Ancex hûn van bikar nayînin. Ma hûnê vê înkar bikin? Nexwe hûnê rewşên diqewimin di hemû şaneyên xwe de bihesin.

Her wiha van tevan ji bo vê vedibêjim: Dijmin hûn kirine hedef, vê şêwaza we ya şerkertiyê baş lêkolîn dike, dixwaze têbigihe û we tine bike. Vaye politikaya hukumetê ya dawî wisa ye. Yê rê ji dijmin re vedike, bi wî dide gotin; “Em dikarin gêrîla têk bibin”, ne ezim, hûnin. Ji ber rojeva min cuda ye. Ev tolaziyên hûn dikin, amajeya dibe ku gêrîla bin bikeve heta dawî we ava kir. Hûnê di demek herî kin de vê amajeyê biguherin. Nexwe ji min peywir nexwazin. Emê çima we weke berxê qurbanê ji dijmin re bikin xwarin? Ger hûn nakin bêjin. Min li Başûr cîh vekir. Li hemû cîhanê cîh vekir. Biçin wan deran, li tenduristiya xwe binêrin. Bila kes soza xapînok nede. Ger di nava we de yê bi rastî jî dixwaze bibe fermandar hene, bila ew soz bidin. Daku ez jî van bizanim, bi fermandar û şerkerên rasteqîn re nîqaş bikim û biryarek diyarker pêş bixim.

Ji vir û pê ve ya girîng, di demek ku bi qasî dijmin cihê hûn li dimînin jî wêran bike har bûyî de, xwesteka karên baş û encamgir pêşxistine. Em jî dixwazin bi ser qonaxek evqasî ku dijmin bi ser ve diçe de biçin û karên serkeftî derbixin holê. Ev hem peywira me ya bingehîne, hem jî serkeftî bikaranîna wan çeperên ku me bi zorê girtine.

Hûnê jî hewcedariyên vê bi berpirsyariyek mezin fêm bikin û bicîh bînin.

Jiyanek we ya pir zehmet jiyayî û ji ya min zehmetir derbas bûyî heye. Îdîayek we ya cengaweriya di wateya rasteqîn de derxistî zanebûnê û îdîaya we ya fermandarî heye. Êdî çarçoveya wê jî bibînin. Di vê mijarê de heta dawî bi dîsîplînim, di pêkanîna pêwîstiyên têkoşînê de dijwarim. Piştî ev alî tev hatin fêmkirin, ev kar pir dereng jî bin dê bikevin rêya rast û serkeftina wê jî pêş bikeve.

**23 Nîsan 1996**

## MILÎTANÊ HEVGIRTÎ ÇARENÛSA GELÊ XWE YA XIRAB ÇARESER DIKE

Em amade ne fêr bikin, ancex hûn zêde naxwazin fêr bibin. Li vir pirsgirêk çavkaniya xwe ji me nagire. Serê we pir tevlîheve, rih û vînên we pir sistin û ev kesayetên we yên serdestiya pergalê didin der, me tengav dikin. Ev rewş, çavkaniya xwe ji şêwaza nêzîkbûn û xisletên kesayet digirin.

Di şoreşê de misoger fermandar hewce ye. Heta ku pirsgirêka qadro çareser nebe, ti pirsgirêk çareser nabin. Hûn weke qadro pêşberî me ne, ancex nêz nabin pêdiviyên wê pêk bînin. Ne dijmin, pêwîstiya çareserkirina we derketiye holê. Ne gengaze mirov li hember vê rewşa we şaşwaz nebe. Ev çawa zarokatiya gele an jî ev çi PKK ye, tevî evqas ked û salan, nikare qadroyên xwe li ser bingeha rastiyên partiya xwe dijwar mezin bike? Teqez divê hûn xwe di vê mijarê de lêpirsîn bikin. Ji ber wext tenge û jiyan di bin xeteriyek mezin de ye.

Li gorî fikra min, hûn di polîtîkaya qadro de şaşiyek dîrokî dikin, wate û girîngiya rastiya Rêbertiyê zêde berovajî dikin. Dibe ku mîna rastiyek lenetî ya dîrokî hûn di nava PKK’ê de bi niyazek baş, heta li gorî şêwaza xwe, bi kedek mezin dijîn. Divê mirov vê lîstoka we ya xwe xapandinê xirab bike. Ger em vê lîstokê xirab nekin, emê nekarin zêde qadroyek wesifdar ava bikin. Emê vê lîstokê çawa xirab bikin? Vaye em li ser vê radiwestin. Bi qasî dibînim hûn ji gelek tiştan razî kirine. Hema ji her cure windahiyan, pir hêsan serxistinê û pir kirêtiyan razî ne. Di şer de jî hûn her kêlî ji xapandinê re vekirî ne. Bi we re kûraniya misoger û dîsa hêza mantiqê nabînim. Ev jî xeteriya herî mezine. Pêwîste şagirtên Dibistana me ya Partiyê ne wisa bin. Beriya her tiştî divê baweriya we bi vê dibistanê hebe. Dibe ku ne weke dibistanên pergalê ye. Zêde berjewendiyê jî nade we, lê dibistanek dîrokî ye, dibistana gelê me ya yegane ye. Hûn şagirtên bê amadekarî ne. Ne ezmûnek we û ne jî amadekariyek binesazî ya qedir bide nirxa mezin a vê dibistanê heye. Em di carekê de di asta herî jor de perwerde didin û asta we jî vê ranake. Ev jî sedemeke. Lê tevî van hemûyan, madem me baweriya xwe bi rizgariya gel aniye, nexwe tiştek ku em jê bidin paş nîne û binkeftin jî nayê hizirîn.

Pêwîste teqez em ji nava xwe rêber, milîtan û fermandar derbixin û çarenûsa we ya xirab çareser bikin. Milîtanê hevgirtî, milîtanê çarenûsa gel a xirab çareser dike. Hûn nikarin bi ti hêcetî vê paşçav bikin. Hûn nikarin bi hêcetan ji bin vî barî derbikevin. Serxistina van karan, di serî de rastiya şer, bi girêdayî hemû hêcetên jiyanî ve jiyîn û hêza xwe têra van hêceta kirine. Pîvanek din a mirovbûnê nîne. Hezar carî şikir bikin ku, me derfetek vê ya girîng xistiye xizmeta we. Nexwe ne gengaz bû hûn bibin mirov û ji bo kêliyekê jî be behsa jiyanek bi şeref bikin. Dervî vê her tişt ketî, xayîntî û bêşerefî ye. Ji dervî vê yan jî di vê wateyê de Kurdewarî ya herî bi lenet rave dike. Em jî vê bi berxwedaniyek mezin pêşwazî dikin û hêjayî xwe nabînin. Em hinekê rêya şeref û egîdiyê vedikin. Êdî li bendê ne wê kî binirxîne, kî mafê wê bide û ked didin. Kar evqasî giranin.

Hêjî di bîra min de ye: Temenê deh salî, salên naskirina kesayeta xwe ye. Bijî ji min re, di wan salan de wexta ez li gorî feraseta kevnar bi mirovbûnê yan jî nebûnê re rûbirû mam, ketim nava pêvajoyek xwe lêpirsînê. Wexta malbat û dayîka min hewl didan li gorî kevneşopiyan min bixin nava pêvajoya mirovbûnê, min hêza gotina ku ew zêde ne hêja ye û wêrekiya wê raber kir. Min got weke hûn dikin mirov nayên mezinkirin û nirx ji mirov re nayê dayîn. Min ferzkariyên malbatê red kirin. Min hewl da rê û rêbazên cuda yên mirovbûnê bibînim. Ji ber min li hember hemû encamên wê li ber xwe da, hatim heta îro. Mixabin we ji vî temenî ve winda kiriye. We mirovbûn li gorî kevneşopî, malbat û saziyên pergalê bûyîn pejirandiye û xwe mirov dihesibînin. Lê mixabin hûn nebûn mirov. Ancex weke mirovê herî baş xizmeta pergala dijmin bike, we ev jî di hemû şaneyên xwe de bikar anî. Sedema bingehîn di nava me de kesayetên mezin dernakevin, nebûna mirove, lê mixabin xwe li gorî kevneşopiyan jî mirov dîtine.

Baweriya min bi nêzîkbûna; “Ji Kurd mirov dernakevin, Kurd evqase, leşkerê hinek dine, baş xulamtiyê dike û ji bo hinek din kar dike” nîne. Min hêj di wî temenî de ev zêde watedar nedît û nepejirand. Min ji xwe re got ne dibim mirovek wisa, ne wisa kar dikim, ne jî wisa dibim leşker. Bi soza xwe ve jî girêdayî mam. We ne wisa got, ne jî bi soza xwe ve girêdayî man. Şaşiya we jî di vir de ye. Ji ber hûn pir xirab hatine mezinkirin, di nava sînorên tolazî, kirêtî, bêçaretî, bêferasetî û bêterbiyek mezin de we kar kir. Di encamê de hûn hatin bikaranîn û wexta ber bi me ve jî hatin hûn di rewşek bêxêr, zêde nikare kar bike û

kêrî tiştekê nayê de bûn. Divê hûn li xwe mikurhatinê şerim nekin. Ger hûn ne wisa bûna, misoger hewce dikir hûn xwediyê serkeftinên mezinbûna. Kî ji we dikare bêje; "Ger ez bijîm, yeksan serkeftina mezine?" Kesê wisa bêje nîne. Ji bîr nekin, hûn di rewşek belengaz de ne.

Çima ev gel xwe dispêre min û wisa behsa şan, şeref û azadiyê dike? Heta hûn çima xwe dispêrin min wisa xwe dinepixînin, dihizirin ku şer dikin û ez çima rê ji vê re vedikim? Di rastiyê de ne di wê rewşê de me ku rê ji vê re vekim. Bihizirin: mirovê serkêşê vî karî bi xwe ger vê guncav nabîne, vêca ev çi hale? Vaye di vir de kesayeta xwe nepixandî, kesayeta xwe xapandî derdikeve holê. Ji bo hûn şaşiyan nekin an jî rewşa hûn hêjayî xwe dibînin nejîn, her roj bi xwe re şer dikim. Di vê mijarê de ezmûnek min a mezin heye û misqal bi misqal xwe dipîvim, radikim-datînim. Di şerê xwe yê li hember pirsgirêkên jiyanê de hem ji bo pirsgirêka çareser bikim, hem jî serkeftinê bidest bixim, nirxên herî hêsan jî ji bo xwe berz eyar dikim, didim karkirin, bibiryar dikim û dimeşînim. Vêca hûn çawa tevlî van hemûyan dibin? Ger bi rastî jî wijdana we û sozek we ya mirovbûnê heye, pêwîste hûn lêpirsîna vê bikin.

Wexta em li reftarên we yên rojane dinêrin, em dibînin ku hûn nikarin xwe ji pirsgirêkbûnê jî rizgar bikin. Wexta lêpirsîna we dikim, dipirsim gelo şervanên me çiqas li ser karê xwe rizgarkirinê radiwestin? Ji ber rewşa gelek ji we li benda rizgarkirinê ye. Ango ne bi rengê; "Ez rizgarvanim, hatime rizgar bikim" de ye, piranî hûn dibêjin; "Ez hatime min rizgar bikin." Hûn rizgarkirinê jî yan ji yên weke li benda rizgariyê yan jî ji min dixwazin. Ev jî şaşiyek mezine. Vaye tengezarî di vir de ye. Ya rastî wexta destpêkê rêketim, min mirovên bên rizgarkirin girt beramberî xwe û bi wan re şer kir. Fêrbûn û rika we pir bihêze, ji ber çeka yekane ya xwe parastine ewe. Ger hûn bi aqil bin, xwe biguherin û veguherînin, dê ew çek jî ji destê we bê girtin. Lewma min hemû fêrbûnên we bi erdê re kirin yek. Min guherbarî kir sedema pêşketinek mezin û lewra ev pergal ji neçarî ber bi guhertinê ve diçe.

Hûn veguherîne laşen lewaz ketîn, hestiyên wan her kêlî ji çil cihê şikestî ve cardin bişkin û wisa qels bûne. Lewra guhertinek herî biçûk we dişkîne û hûn dilê xwe digirin, dixeyîdin. Mixabin ez xwe naecibînim. Her tim dihizirim hîn zêdetir çawa dikarim xwe biguherim û veguherînim. Ya rastî cihê min tenge, ger min bikariya weke we

bigerim, vêca min çi nedikir! Weke zarokên gel, di rêjeyek mezin de nexweş, li ser bingeha nirxên seqet, heta bi şêweyek dijberî hemû nirxên pêşketina bingehîn hûn hatine mezinkirin. Ji bo hûn ji nû ve bîn mezinkirin, ez dibêjim bişkin. Vê carê jî hûn ditirsin û dibêjin; “Ma emê sax bimînin?” Bes çare û qanûnek din a vî karî nîne. Li gorî ku her alî bi seqet hatiye girêdan, pêwîste mirov bişkîne, ji nû ve girê bide. Wexta hestiyek we dişke, ger rast neyê girêdan hûnê seqet bimînin û nikarin bimeşin. Rewşa we dişibe şikestinên ji çil aliyan ve hatiye girêdan. Bi rastî jî ji ber vê rewşa we xemgînim.

Ciwanên ku xwe PKK’yî dibînin û di vî şerî de erzan dikevin hene. Ev ciwan dihizirin ku wêrekiyê jî ji me digirin û xwe davêjin nav xeteriyan. Ya rastî em ne wisa ne. Vêca li me binêrin em çawa aresteyî şer dibin. Hesasiyetên me, tevdîrên me, amadekariyên me û gav bi gav em çawa dijmin dişopînin binêrin, bêhempa ye. Di navbera tevdîrên me girtine û tevdîrên we girtin de bi qasî çiyan cewazî heye. Yeqîn dikim, li wan çiyayên bêhempa we negotiye; “Em civînek şer lidar bixin. Kêmasiyên me hene, rastî çine, divê em çawa nêzî çi bibin?” We negot û yek ji we jî civînek lidar nexist. Fermandarek we yê pêşeng jî ji bo van ronî bike yek civîn lidar nexistiye. Bêku hêza nêzîkbûnek zanistî ji rastiyan re bike, hema ser guhê xwe re avêtiye û we pêvajoyên bêhempa vale derxistin.

Jixwe daxwazek we ya cidî nîne. Mantiqê şer, rastiya şer, rastî û şaşiyên kar destgirtin, di vê mijarê de xwe berpirs dîtin û hesabxwestin hişê we re jî derbas nabûye. Qaşo hûn di şer de ne. Ger ez bêjim yek carê çareyek we nîne, werin di bin pişgiriya min de xebatekê bimeşînin, civînekê lidar bixin, hûn wê jî nakin. Ya rastî min deh hezaran civîn lidar xistin, min deh hezaran kes areste kir. Ev hemû jî wexta dijmin di xewde min pêk anîn. Vêca li xwe binêrin: Her tişta hûn dikin di bin venêrîna dijmin de ye, her tişt ji aso û tevdîran dûrin, dîsa jî hûn rehetin. We di vê mijarê de lêpirsîna xwe nekir, heta ji vê revîn. We got; “Civîn, hevbeşî û rêxistinbûn hewce nake, dikarim hemûyan jî bi tena xwe bimeşînim.” Heta we yên li derdora xwe çewsandin, hinek jî lihev anîn û wisa xwe da jiyankirin.

Şerkertiya wisa nabe. Hûn çawa dikarin li ser vî bingehî biçin şer? Mînak li teymenek Tirk binêrin: Ev camêr bişkokên leşkerên xwe jî dinêre bêka girêdayî ne yan na, kontrol dike. Kêlî bi kêlî razan û her gava davêje vedinêrîne. Mixabin fermandarên me yên paya herî bilind,

ji sedî nod û neh karên tê kirin dervî venêrîna wî ne û laûbalî ne. Ancex ne di ferqa vê jî de ne. Ma artêşek gel a wisa tê damezirandin? Dilê fermandarên me naxwazê artêşê saz bike, bi tiştên din ve mijûl dibe û felsefeya jiyana wî cuda ye. Lewra plansaziya karek mezin nayê hişê wî. Ev kes camêrê karên hêsan, li pey rojane rizgarkirina cixareyekê û rojaneyî ye. Karek mezin, karek dîrokî heta dawî dûrî vî camêrî ye.

Xwe berçav bigirin, hûnê bibînin hûn jî wisa ne. Ev drameke, bêçaretiyeke. Ancex piraniya we jî vê weke jiyana aqilmend, bêku zêde xwe biwestîne weke rêya jiyanê dinirxîne. Ev şaşiyek mezine. Vêca li yeke Emerîkî, yeke Çînî binêrin: Ew li ser deqa ne û her tiştê wan plansazî ye. Ev netewên dewlemendin, netewên mezinin. Ev netew, tevî ewqas dewlemendin, dîsa jî naxwazin firsendek bi qasî misqalekê jî ji dest berdin. Lê em pir feqîrin, derfetên me pir sînordarin, ancex hinde destbelaviya me heye, tinekirina derfetên me û demê ya heyî jî di astek nayê fêmkirin de ye. Vaye kesayeta tine bûyî, vaye kesayeta bidest dixe wisa ye. Divê hûn van bibînin. Li şûna vê hûn bêjin; "Ez naxwazim cîhanê fêm bikim." Ev jî şêwaza we ye. Paşê jî hûnê bêjin; "Her çendî dawî mirin jî be bila be" û dev ji xwe berdin. Ji bo tenê wisa nebim, min ev rêya berxwedanê hilbijart.

Xweziya we hinek din ji mirovbûn û rêhevaltiyê fêm kiriba! Gelo min xwe çawa da bazdan? Wijdan jî, aqil jî bi we re nîne. Hûn qet nêzî nabin qanûnên ti bazdanê fêm bikin. Hêjî di bîra min de ye, yên beriya we jî heman weke we nêzî hemû mercên me bûn. Ez hemû mirovan baş dinasim. Hinek ji van mirovan me teşfîk kir, hinek jî me firsend da, lê dîsa jî me nekarî bidin bazdan. Hinekan sê mehan, hinekan jî rojekê li ber xwe da. Bes me bazdanek dîrokî daye destpêkirin. Dixwazim ji we bipirsim, bi rastî jî baweriya we bi fêrbûnê û jiyînê heye? Hûn heta mirina xwe bi me ve girêdayî ne, lê dîsa xwe neçar dibînim vê pirsê bikim. Bi rastî jî hûn amade ne fêr bibin, bi me re bijîn û bi me re têbikoşin? Li gorî min hûn ne amade ne yan jî yên tevlî bûyîn jî tije şaşiyan ve tevlî bûne. Hûn dibêjin; "Ez ji vî karî re amade me", lê rêjeyek mezin me cidî nagirin.

Tiştek seyre, lê tevî kesê herî bibandorim, rehet dikarim bêjim kesê herî zêde cidî nayê girtin jî ezim. Şaşwaz dimînim çima wisa dibe. Hûn hevdu pir cidî digirin, lê min cidî nagirin. Wateya vê jî eve: Hûn min li ser bingeha rastiya xwe cidî digirin û ev jî rastiyên civakî ne, rastiyên pergalê ne. Rastiyên min û pergala min jî, pergala rastiyên şoreşê ne.

Hûn di vê mijarê de nikarin min cidî bigirin, ango ez dizanim hûn xwe pir cidî digirin. Ji ber rewşa we xembarim, wexta hûn rastiyên me hinekê cidî digirin jî, tenê dibin qurbana niyetên baş. Li gorî gotinên dijmin xwe ji mirinê re amade dikin. Min ev jî ne dixwest. Di hevalbendiya me de cihê vê nîne. Em nikarin li ser mirinên we yên erzan hesaban bikin. Ancex kesayetên erzan namirin, dikarin bibin rêhevalên me. Yên erzan dimirin, divê qet nêzî me nebin. Canê xwe ji bo malbat, heta dijminê xwe xerc bikin, lê ji bo me erzan mirin nabe. Cihê mirina erzan a neyê ravekirin, rastiya me û partiya me ye. Di nava partiya me de mirinên erzan nabe. Bes her roj mirinên erzan hene. Ez hêsan jî jiyan nakim, erzan jî najîm. Jiyana erzan li her derê dibe, bes li cem me nabe.

Mixabin bi we re di rewşek tinebûnê de hêsan jiyîn heye û vê jiyanê li ser me jî ferz dikin. Hûn çima wisa bûn, ji hêla wijdanî ve çima wisa lewaz man? Çima hûn nebûn xwedî sozên mezin û gavên mezin? Pêwîste hûn di vê mijarê de her tim lêpirsîna xwe bikin. Qet hewce nake hûn derdora xwe biçewsînin û sextekariyê bikin. Egîdî, nêzîkbûna rasteqîn û xwedî li soza xwe derketine. Carekê jiyan dikeve dest mirov, tenê yên wê bi berpirsyariyek mezin digirin dest dikarin rol bilîzin. Em jî bi vê rolê ve rûbirû ne. Bes hûn nêz nabin wê jî rast bigirin dest. Me qiyamet rakir û qîr da. Yeqîn nakim di dîrokê de kesekî bi qasî min qîr kiribe yan jî bang kiribe. Dîsa jî em nikarin we bînin ser xeta rast. Ya rastî hewce dikir pirtûka bangên min û li gorî xwebûna we bihata nivîsandin. Romana vê bihata nivîsandin dê çiqas baş bûya. Pir ecêbe, me ev têkoşîn ji kur girt, em dibin kur? Her yekê xwe kiriye kunekê û her kêlî bi belavbûnê re rûbirû ye. Em neçarin van kom bikin û bidin meşandin. Fermandarên me bi qasî zîrevanekî jî nikarin hêzên xwe biparêzin. Devjêberdin rêbertiya wan bikin, nikarin zîrevaniyê jî bikin.

Niha li vî welatî revek mezin tê jiyîn. Hema bêje hoveberek ketiye nava berx û mîyên li wir, bi qasî dikare dixwe, yên din jî ger bikarin direvin. Rewşa tê jiyîn wisa ye. Dijminê me ji xwe re dibêje; "Gurêboz." Ketiye navê êrîş dike, yek ji vir, yek ji wir lê dide û dixe. Vêca em li rewşa we binêrin: Gelo hûn ji mîhbûnê rizgar bûne? Bihizirin: Hûn tev çiqasî, ji kur ber bi kurve reviyan? Di vê manê de berxwedanî çiye? Ez reva fîzîkî zêde girîng nabînim. Reva di rih û hişê we de, gelo di kesayeta we ya hatî tarûmarkirin de çiqasî pêş ketiye? We di vê mijarê de qet pirs jî ji xwe nekirine. Jixwe lewma hûn bi şer, welat

û serkeftinê ve nayên girêdan. Kesayeta revok, ti carî bi hestên serkeftinê û berz ve nayên girêdan. Ew her tim direve, her tim kêliyan tevdigere û hewl dide xwe rizgar bike. Ji bo wî jiyîn, kesayeta ji xwe revek mezine û ev kesayet bi fikra mezin ve nayê girêdan. Kesayeta wî tenê xwe rizgar dike yan jî reva xwe pêk tîne.

Di vê mijarê de dîsa xwe mînak bidim: Dibe ku min nedikariya mezin ser bixim, lê hemû rev jî ji bo min zehmetin. Reva ji jiyanê zehmet bû, lê min jiyan jî tam ser nedixist. Derketina ji gund û çûna dibistanê zehmet bû. Nedikariya ji van deran birevim, lê zêde jî fêr nedibûm. Her tiştî ez neçarî revê dikirim. Xwe li ber çavan bigirin: We di heman kêliyê de firda, pişta xwe da hezaran nirxên berz, serserkî ketin nava her cure kirêtiyê, îxanet li hemû xweşikbûnên rû bidin kir û bêku li pişt xwe binêrin reviyan. Gelek caran dihizirim, çima ev kesayet welatparêz nabe. Ger hûn van nêzîkbûnên xwe bidomînin, ti cengaweriya we di rêya nirxên berz de çênabe. Hûnê parazvantiya çi û şerê çi bikin?

Niha van baştir fêm dikim. Hûn nêzî zehmetiyên fêrbûnê û esasgirtina dersên mezin nebûn. Weke rev jî binav nakim, ji ber tiştên wisa qet nehatin bîra we jî. Ji revê jî wêdetir, ya rastî ez vê kesayetê, kesayeta dîn, civaka hatî dînkirin binav dikim. Kesayetên bêmejî û hemû nêzîkbûnên psîkopatî ji xwe re girtine, ji hêla rihî ve jî nexweş, elbet bi nirx ve nayên girêdan. Weke dînan li her derî digerin û hemû pêwendiyên wan jî dînîtî ne. Jixwe di nava PKK’ê de her tişt ji sedî nod û neh dînîtî ye. Li gorî min tişta bi aqil pir kême. Dînîtiyên her roj tên jiyîn, mirov har dikin.

Yek li şêwaza fêrbûna xwe, şêwaza welatparêziya xwe dinêrim, yek jî ya we dinêrim; li kesên hewce dike niha li qadên welat ên herî xweşik bin dinêrim, dibêjin; “Emê kengê ji vir biçin?” Ji wan re dibêjim; “Hûn diçin kur?” Dibêjin; “Em diçin Bakur.” Bakur û Başûr berovajî hevin, berê wan berovajî ye, lê herduyan jî di heman kêliyê de dixwazin. Şûna şer yan jî nêvengek hîn rehetir, tiştên sedî sed bi nakok heman kes dibêje. Agahiyek hat, yekê gotiye; “Yan hûnê min bişînin nexweşxaneyê, yan jî bişînin Bakur şer.” Tevî ku hevalan gotiye; “Raweste, bila rê vebe emê te bişînin.” Wî jî gotiye; “Na, ezê xwe bikujim” û wisa jî kiriye. Dibe ku ev bûyerek be, lê rewşek wê ya remzî heye. Dibêje; “Yan nexweşxane, yan jî şer.” Ya rastî ti eleqeya şer û nexweşxaneyê bi hev re nîne. Dixwazin an hîn zêdetir biçin Başûr, an jî

zêdetir biçin Bakur. Di rastiyê de ev jî nakokî ye. Di rastiya vî karî de, ji wê jiyanê û rastiya şer rev heye. Qaşo ji bo çûna Bakur nexweş ketine. Roja paştir dijmin ber bi wir ve diçe, vê carê jî nizanin şer bikin. Ger tevdîrên me yên giştî nebin, dê weke çêlikan belav bibin, kanî we şer dixwest? Kanî we Bakur dixwest? Dijminê we li ber serê we ye. Kanî dê we li dijî wî hinek tişt kiriba? Ev qet nayê hişê wan û dibêjin; "Na, şer li cihek din dibe."

Vaye ev jî dînîtî ye. Van ji ber xwe ve nabêjim, her tişt li ber çava ye. Hûn tên cem me, welat dixwazin. Diçin welat, vê carê jî dibêjin; "Kêliyekê zûtir me ji vir derbixin." Yên li Ewrûpa dil davêjin bên cem me, li vir jî çend kes hene dixwazin biçin Ewrûpa. Vaye bûyera dînîtiya mezin ku behsê dikim wisa ye. Bazdanê ji metrepolan tên cem me, lê rojekê li hember mercên me sebir nakin û cardin dixwazin biçin metrepolan. Ev helwest eşkere, amajeyên kesayeta revokin. Ez jî vê vedibêjim: De başe, vêca em we danin kur? Li vê cîhanê kesekî weke hûn dihizirin cihek ji we re nehiştiye.

Civaka me bi komî di rewşa revê de ye. Yeqîn dikim ger ber bi Serê Bakur an jî Serê Başûr (Kuzey Kutbu-Gûney Kutbu) ve çûyînek bê sazûmankirin, emê rêza yekem bigirin. Serî ye, li wir her tişt dibe cemed, lê ji bo yên me ev ne girînge. Bes bila bêjin li wir kar heye. Dema em dibêjin we bişînin welatê we, rastiya binasin, şer binasin, weke dîna li we tê. Yekser dibêjin; "Ne li gorî mine" û xwe didin paş, çep û rastê davêjin erdê. Rastiya xwe lêkolîn bikin, wê derbikeve holê hûn wisa ne. Dev ji Seriyan, Parzemînan berdin, yek cihê we bipejirîne welatê we ye. Mixabin hûn ji wir jî weke ji marê reş birevin, direvin. Ev bûyerek tirsnake, lê rastiya jiyana we ye. Divê hûn lêpirsîn bikin, çima wisa ne. Kesên pêwîste kêliyekê zûtir serkeftinê ava bikin, li gorî soza dane pêwîste wan çiyan veguherînin warê jiyanê, dihizirin ku dê kengê ji wir rizgar bibin. Heta hinek dihizirin ku gava bimirin dê rizgar bibin. Jixwe ev jî mantiqê xwe kuştinê ye. Ne ji bo pêşxistina jiyanê, ji bo erzan şer bike û bimire diçe Bakur. Ji civînekê direve, hewldana pêşxistina plansaziya şerekê nake, lê dîsa jî şer dixwaze. Tevî ku hûn ji bo şer civînek cidî û plansaziyek cidî nakin, şerek çawa û li kur dixwazin? Ya rastî ji vir diyar dibe ku, xwesteka we ya şer derewe. Amadekariyek ji rêzê nakin, lê di qada herî zehmet de şer dixwaze, ji ber dê peyre bimire. Ger rewşa gelek ji we ne wisa ye, hingê hûn dikarin her tiştî ji min re bêjin. Ger rewşa we wisa ye, vêca hûn ne dînin çine?

Nexwe, pêşî hewce dike hûn bizanin li dijî dînîtiyê şer bimeşînin. Egîdî, di kesayeta xwe de li hember dînîtî bend avakirine. Nexwe hûn nikarin her roj li nava çavên me binêrin û biselmînin ku mirovin û aqilmendin. Ma min ji we re got wisa bimînin? Na, ji roja xwe dinasim ve hewl didim fêr bikim û birêve bibim. Tevî di vî temenî de me, ez jî ji bo xwe rizgar bikim neçarim bihizirim û kar bikim. Wisa qudret û hêzên mezin em xwe bispêrinê tine ne. Ji bilî xwe sipartina hêza cewherî ti çareya me nîne. Xwe nespêrin min, rastiya min evqase. Ger hûn dixwazin fêm bikin, em nîqaş bikin. Wêrek bin, netirsin, hewl bidin weke mirovan fêm bikin û negirîn. Kes we tengav nake.

Van tevan ji bo vê vedibêjim: Gelo di nava we de hinek hêdî hêdî bi wijdan, aqilmend, şiyar û bi feraset dê bêje; "Ez vê carê ji bo rastiyan amade me?" Gelo wê ji nava we kesek vê egîdî û duristbûnê raber bike derbikeve? Armanca me bi vê rexneya mezin ve, rastiya me derxistî holê derbaskirin, hêz û kesê ji şêwaza bê pejirandin û ser bixe re xwe amade dibîne derxistina holê ye. Girînge hûn tev vê siûdê baş binirxînin. Nexwe heyfa we ye, divê mirov we qet neşîne şer. Li şûna hûn biçin şer birevin, hunera xwe ya kevin bidomînin. Bi baweriya xwe bi min anînê ve li ser bingeha şaş tevlî nebin û newin şer. Ger we xwe gihandibe şêwaza min, dikarim we erê bikim, ji bilî vê tevlî refên me nebin.

Şev û roj bi hinekan re daxivim. Dibêjin; "Me xwe esas girt." Xwe esasgirtina we tinebûne. Ez dibêjim dev ji xwe esasgirtinê berdin. Bes xwe jî tiştek dihesibînin. Feraseta gelek ji we ya mirovbûn û egîdiyê di pîvanek mezin de bi şêwaza evîndariya li hember belengaziya xwe ye. Ev nabe, hûn bi vê şêwaza xwe di refê de mane, çima di vê de israr dikin? Ew jî dibêjin egîdî wisa ye. Vaye xisletek kesayeta Kurd a pir xeternak derdikeve holê. Bila mal û can a min be, çi dibe bila be! Ev helwest xweperestiyek pir kirête. Ev kena xwe bi hemû nirxên dewlemend û nirxên xweşikbûnê kirine. Şêwaza mêrxasiya we, xweperestî û nexweşiyek wisa ye.

Madem rewşa we wisa ye, vêca şaşî di kur de bû, min çawa li hember vê rewşa we sebir kir? Hem ezê bêjim rêberim, hem jî nekarim pêşî li vê rewşa we bigirim. Pêwîste em vê çawa fêm bikin? Vaye ez jî her roj van ji xwe dipirsim. Dîsa jî min tevdîrên xwe girtine. Ez xwe didim jiyîn, lê hûn nikarin xwe bidin jiyîn. Yeqîn dikim ji jiyana min a heta niha hatiye fêmkirin ku, ez xwedî plansazî me. Çi dibe bila be, min ji tinebûnê afirandiye û xwe jî demdirêj da jiyîn. Lê tevî hemû derfetên

me dayîn, ên nikare xwe bide jiyîn û hêsan dimire dîsa hûnin. Niha divê em we çawa bidin jiyîn?

Wexta mirov beşdarî şoreşê dibe her tişt dibe awarte û derbasî raperînê dibe. Vediguhere teqînek hem bîrdozî, hem fikrî, hem jî rihî. Mixabin ev bi we re pêş nakeve. Hûn jî dibînin, vejîn û îsyangeriya min di astek pêş de ye û bi min re acizbûn tine ye. Nexasim ger li wan çiyan bim, li qadên tevgerînê bim, ezê zêdetir weke bahozê bim. Hûn dişibin hebûnên mirarbûyî. Hûn çima wisa ne? Di gelek pratîkê de derket holê ku, yek aliyê we yê lome jê neyê kirin nîne. Ger wijdana we heye, sedemên vê ji xwe bipirsin û bersivê bidin. Lê belê bersiva hûn ji van pirsan re didin dibe; “Ez tenê dikarim li hember vê rewşê bigirîme.” Mirov li hember vê rewşa we xemgîn dibe. Di rastiyê de mirovê egîd nagirî. Bê girî û nalîn bersiva rast bidin van pirsan. Em dixwazin we bi rastiyan re rûbirû bînin. Bes rastî we dikujin. Rastiyên netewî, rastiyên civakî, rastiyên şer û partiyê we dikujin. Lê di rastiyê de hewce dikir rastiyên me we bidin jiyîn. Ez tevî evqas kedê, nabêjim westiyam û nikarim bikim, her tim jî dafirînim. Ancex tevî evqas keda me, hûn çima nikarin gavekê pêşve biçin?

Hûn di vî temenê xwe yê ciwan de hişk bûne. Çi ji we hatiye? Çima evqasî bêçare ne? Niha hûnê bêjin; “Em bêçare ne, ji ber xirab hatin mezinkirin, xirab li me ketin.” Em çi bikin, ev qanûna koletiyê ye. Rastiya me wisa ye, ji bilî parçekirina vê rastiyê ti çareya me nîne. Em wê jî fêrî we dikin, hûn jî werin fêr bibin. Eleqeya ku hûn li hember cixareyekê raber dikin, em dibêjin li hember fêrkeriya jiyanê ya hêjayî nirxa zêrîn raber bikin. Bes di wir de jî bêhna we teng dibe, xwe didin aliyekê. Vêca emê we çawa bidin jiyîn? Rêyek din a ji vê rastiya koletiyê rizgarbûnê nîne. Pir dijwar bi rastiyan ve girêdayî me. Hûn rêya ji vê rastiya koletiyê derketinê şanî min bikin, ez jî di astek bêhempa de bi we ve bêm girêdan. Bêjin; “Ez didim jiyîn û ser dixim.” Peyre jî xizmeta herî mezin ji min hêvî bikin. Bes ew hêza we jî nîne. Lewra ez dibêjim, bi rastî jî hûnê nêzî fêmkirinê bibin? Bersiva van pirsan ji wijdana xwe bipirsin an jî ger wijdana we nîne bidest bixin.

Ji pirsgirêka rev kes nikare bigihe ti cihî. Ger pirsgirêk reva we ya ji fedekariyê bûya, dê me ev cuda bigirta dest. Lê pirsgirêk ne eve, ji ber baş dizanim hûn ji min zêdetir fedekar û wêrekin. Bes fedekarî û wêrekiya ne rast jî pir xetere. Bi we re vê dibînim. Hema nêzîkbûna we ya bi şêweya; “Gunehên me yên mezin hene, divê em bibin qurban,

lewma em fedekarî û wêrekiyê raber dikin" hene. Bi we re fedekarî û wêrekiya qurbanbûnê heye. Ancex em jî vê napejirînin. Ma hûnê ji bo çi û kî bibin qurban? Ev feraset şaşin.

Ez weke we yek dilop xwîna xwe bikar nayînim, vale narijînim. Xet û şêwaza min heye. Bêhngirtin û dayîna xwe jî li gorî wê eyar dikim. Ji bîr nekin, hûn weke herikîna kaniyê xwînê dirijînin. Lê xwîna hûn dirijînin, ne li gorî pêwîstiyên şêwaza Rêbertiyê ne. Hûn xwîna xwe jî piranî bi şêwaza ketina lîstoka dijmin dirijînin. Hûn çima wisa dikin? Ma kes ji we re dibêje, xwîna xwe wisa birijînin? Ma vê li ser we ferz dikim? Şêwaza Rêbertiyê diyare. Her gava Rêbertî davêje û her gotina dike diyare. Ger we ev hemû fêm kiriban, hûnê biban şagirtên bêhempa. Dê ji nava we hinek fermandar jî derketiban, devjêberdin li welatê xwe nekare gundekê fetih bike, wê welat bi xwe ji wî re teng û kêm hatiba. Mixabin hûn ji serdema destpêkê kembaxtirin.

Pergala dibistana me dişibe dibistana **Eflatun**, dibistana **Sokrat.** Hemû fermandarên Yûnanî wan dibistanan re derbas bûne. **Îskender** jî ji wir derketiye û şagirtê **Arîstoteles** bû. Wexta Îskender di sih û sê saliya xwe de mir, sê parzemîn fetih kiribû. Ji Ewrûpa destpê kiribû, Asya re derket, Afrîka û rêyên şaristaniyê yên pêwîste xwe bigihîne tev girtibûn. Mixabin hêj hûn nikarin bi şêwazek fetihkar nêzî gundê xwe bibin. Temenê gelek ji we jî herî kêm nêzî sihî ye. Vêca, hûnê çawa ji xwe re bêjin em fermandarin? Ew Îskender bû, di serdema koletiyê de dijiya û çiyayên Hîndîkuş ên li Hîndîstanê, tevahî Torosan, tevahî Çiyayên Kurdistanê, çolên Ereban, çolên Misrê û Îran derbas kir, hêj sih û sê salî bû. Vêca hûnê kengê gundekê fetih bikin? Di navbera we de kesek ku plansaziya fetihkirina gundeki çêkirî heye? Em dev ji gundekî berdin, fetihkirina pêwendiyekê yan jî plansaziya fetihkirina karek bi aqil heye gelo? Çima hûn nikarin li welatê xwe, li cihek bi qasî bostekê saxlem bimînin? Em wê jî berdin, çima hûn nikarin peywirek ji rêzê rast pêk bînin? Ev pirsên girîngin û hûnê bersivê van bidin.

Hûn nikarin min demek dirêj bi teoriya dînîtî mijûl bikin. Êdî divê hêdî hêdî bi aqil bin. Êdî vê kesayeta derew û merewan derbas bikin. Ma hûnê hêjî pêdiviya vê fêm nekin? Ma hûnê hêjî hewl bidin min bixapînin û ji rê derbixin? Di demek ku dijmin her derê me dorpêç kirî de, gelo wê tu li ber xwe bidî, yan birevî, bin bikevî an jî serbixî? Gelo em bi hevdu ve girêdayî ne, em dixwazin yekbûnê ava bikin an naxwazin? Dijminê me heye yan nîne? Gelo em dixwazin van nirxan

biparêzin an na? Ma hûnê bêku van pirsan ji xwe bikin, bêjin em amade ne? Vêca hûn ji bo çi amade ne? Mirov weke we naçe dawetan jî. An jî berovajî hûnê bêjin; "Berde heval, ev kar nayê serxistin, teqez dijmin serdeste, ew qadirê her tiştî ye. Berxwedaniya te, doza te ji destpêkê ve winda kiriye." Ev jî fikra dijmine. Ger wisa ye, ma ji bo feraseta; "Em egîdiyê qirêj nekin, madem el û alem evqas pêşve çûye, bila dengek me jî hebe" hûn li van deran digerin?

Ev şêwaza namûs ji hêla herî xirab ve rizgarkirine. Ev şêwaza Kurde û li ti cihî ava nake. Rica dikim me nexapînin. Yeqîn dikim min hinekê ser xistiye ku ji bo vî welatî aqilmend bim. Min ev şanî dijmin jî da. Hûn jî me nexapînin an jî herî kêm bi qasî dijmin cidî bin. Jixwe dijmin perspektîfên me yên rojane esas digire, wisa bi ser me de tê. Serfermandarê paya herî bilind, heta bin biryargeha me şer dimeşîne. Vê jî perspektîfên me esas digire wisa dike. Mixabin ên me hêj amadekariyên xwe li gorî perspektîf û fermanan temam nekirine. Di vê mijarê de kêmasî ne yê dijmin a me ye.

### Jiyîna Li Ser Bingeha Azadî û Mirovatî Jêvenegere

Rêjeyek mezin dibêjin emê şer bikin. Şer karê mejî ye, şer şêwaza çalekiya ku fikir xwe herî zêde dijwar dike. Ji ber bin ketiye û şer nekiriye fikir û teoriya şer a rastiya Kurd nîne. Lê aliyê wê yê leşkerî heye. Ev çiye? Ev tê wateya; "Ez ji şer re ne amade me, nikarim şer bimeşînim." Şerek fikir û teorî li ser ne serwer be, misoger şerek nîne yan jî di wê kêliyê de hatî windakirine. Hemû şervanên me jî –ev jî yên herî zêde şer dikine- vê dînîtiyê dijîn. Ger nexim bin kontrolê, hêza xwe ya fikrê mezin bikar neyînim, dê her tişt di bîst û çar demjimêran de biqede. Ger emê şer bikin, nexwe hûn neçarin ji jor heta jêr vê politikaya xwe ya qadro û feraseta xwe ya fermandarî biguherin.

Niha aliyê me yê herî lewaz rêxistina şer û rêveberiya şere. Berovajî meşandina şer, bêfikrî, bêtevdîrî, bêplanî, bêamadekarî û hemû hêcetên taktîk avêtina aliyekê, li cem me şêwaza şerê serwere. Hem hûnê bêjin em şer dixwazin, hem jî hûnê nakokiya mezin bijîn. Ev nabe! Di vê mijarê de hinekê hevgirtî bin, bila hêza we têra şêwaza şerê rast bike. Hûn vê bi zanebûn nakin, ev meseleyek hêzê ye. Ji bo peywira xwe ya li hemberî we

pêk bînim, xwe evqasî parçe dikim. Ez dikarim nîv deqî de bêjim we hûn çawanin, xwe ji nav vî karî derbixim. Bes ji bo şaşiyên we yên hûn li ser rastiya şerê me ferz dikin serûbin bikim, pir dijwar serde diçim. Ji ber ez dixwazim vî karî ser bixim. Hûn ne wisa ne. Wexta şaşiyên we weke ribanê di çavê we re diçin jî, hûn yek gotinê nakin û bi ser de naçin. Heta hûn qirika xwe jî nawestînin. Vêca hûnê çalekiyek weke şer tund çawa bimeşînin?

Fermandarek herî baş nikare xîtabek ji rêzê pêş bixe. Mînak wexta komekê dişînin çalekiya herî mezin, xîtabek fermandar nîne. Perspektîfek wî nîne. Ser çavê xwe davêje û şervan li ber çavan dişînin nava şaşiyan. Hûn nikarin bêjin; “Ev nêzîkbûn ne li gorî qurala ye, ne li gorî taktîkên şervanên azadiyê ne.” Ne tenê di şer de, hûn di jiyanê de jî wisa ne. Şer danin aliyekê, hêj we di abc’ya jiyanê de jî gavek ne avêtiye. Jiyîn zehmete. Ez tevlî vê jiyanê bûm, lê hêjî hewl didim jiyanê fêr bibim. Kes min cidî nagire, ger hinek bêku bal bide ser rastiya min a netewî û civakî dixwaze min weke gêjekî bide jiyîn, karê ez bikim ezê bêjime qet nekin, ev pejirandin îxaneta herî mezin a li hember cewhera xwe kirine. Ancex li gorî cewhera xwe guncav jiyîn, li gorî rastiya netewî û civakî, li ser bingeha azadî û mirovî jiyîn pir girînge. Ger hêza min têra vê jî nake, nexwe ezê çi bikim? Ez giham vî temenî, ger dîsa jî îdîaya min a jiyanê heye, ezê heta mirinê kar bikim. Niha hûnê bêjin; “Ma mirov wisa dibe?” Bes ev rastiyeke.

Vêca li axa û paşayê xwe binêrin, bibînin çawa dijîn. Wer dizanin ku dijîn, ancex her tişt ji destê wan hatiye girtin, rezîlên cîhanê jî ewin. Qet nebê pir nirxên min hene. Li gorî dijminê xwe li ser linga me û zerarê didim dijmin. Her roj bûyerekê derdixim û ev jî tiştek başe. Şûna ezê vale biçim, ezê li dijminê xwe bidim wisa çûyîn, a herî başe. Bila em jiyan nekin, ev ne girînge, ev jî şêweyek tolgirtinê ye. Lê belê di mercên qet neyê jiyîn de bê wate jiyîn hesibandin, li şûna darbe li dijmin bide, firsend ji darbeyên wî re vekirin weke şer hizirîn tê çi wateyê? Hûn çima ji rastiyan direvin? Hûn çima li hember dijmin aqil nabin? Ger a hîn baştir heye, em wê derbixin holê. Ez ti carî xwe naxim dewsa zilaman. Bes axaftina zilamê sexte jî li ser xwe nedana gotin, deynê stûyê mine.

Li gorî min kesayetên ku mirov heyranê wan be hene. Lê hêj ev derneketine holê. Ez ji bo wan şer dikim. Piştî ku evqas şaşî, evqas binkeftin, evqas belengazî di bin fermandariya min de hat jiyîn û ez

rêberê netewî me, ezê çawa bêjim hûn zilamin? Hêj xwe naxim dewsa zilaman, ezê we çawa wisa bibînim? Çil salin kêlî bi kêlî li pey vî karî me. Lê hûn hêj nû navê xwe kite dikin. Lewma hûn çawa li bendê ne we bixim dewsa zilaman? Qanûnên mirovbûnê hene û zehmetin. Tu li gorî dijmin li ser lingayî yan na, dikarî li ber xwe bidî yan na? Ji bo min pîvanê egîdî wisa ye. Ger di vê mijarê de bi israr navek Rêbertiya Netewî heye, yeqîn dikim ji ber vê ye. Nexwe ma vî gelî yek quruşa xwe jî dida yan jî yê herî lewaz evqasî li hember zehmetiyan li ber xwe dida?

Tevî hûn ne zilamin, xwe dixin dewsa zilaman. Jixwe bi vî rengî we ji mêj ve xwe xapandiye, lê ne di ferqa vê de ne. Cewaziya min ji we, di bin şermiya vê rewşê ya kûr de me, lê tevî vê hêjî seknek jêneveger esas digirim. Şêwaza min wisa ye. Hişyarim. Wexta yek min naxe dewsa mirovan, weke we pevçûnek bê wate nameşînim, lê ji vê ders derdixim. Li gorî di hinavê xwe de hesabên tola mezin dikim û wexta roja wê hat, bi qasî serê derziyê firsendek çêbû yekser bi ser pirsgirêkê de diçim. Jixwe bi Komara Tirk re hesapxwestina me, bi her cure kevnare yan jî dijminatiyan re hesapxwestinek wisa bû. Mixabin we di rewşên wisa de, li hember rêhevalên xwe jî pevçûnên bêwate meşandin. Rewşên wisa nekêmin. Di rewşek nikare li hember dijminê xwe tiştekê bike de jiyînê, gelo hûn egîdî dibînin? Ma hûn dikarin vê bi min bidin pejirandin? Ma zilamê çil salan xwe bi zorê ji vê zextê derxistî, wisa tê xapandin? Hûn her tim dibêjin Rêbertî. Vaye Rêbertî wisa ye.

Ne li dijî mirovbûna we me. Niha ji rewşa mirovbûna we ya pîvanê berê di nava malbat, dergeh, eşîretê re tiştekê nabêjim. Bes dema wexta wê hat, ezê êrîşî wê jî bikim. Hûn niha dikarin wisa derbas bikin. Hûn li qada me ne, heta ji Rêbertiyê ders digirin. Ger şerê xwe bi xwe dimeşînim jî fêm nekin, xwe bi temamî dervî şer bihêlin, emê li gorî qanûnên egîdiyê li we bikevin. Hûn nikarin weke mirovên sexte ji me erêkirinê bigirin. Eşkere bêjim: Ez xwe naxim dewsa mirovan, lê hewl didim bibim mirov. Her roj xwe amade dikim. Nîqaş, plansazî û çi ji destê min bê amade me wan pêk bînim. Dikarim van tevan pir jîr û jidil bikim. Hûnê çima vê nekin? Ma hûn zarokê axa û paşa ne? Ger wisa jî be, di nêvenga me de çend quruş dike? Li qada min axa, paşa û dayîk, bav tine ye. Li qada min li gorî pîvanên berê mêrxasî, zilamtî û jiniktî jî nîne û nabe. Wexta hûn tevlî partiyê bûyîn, hewce dikir hûn vê fêm bikin. Li qada min pêşî xwe ji hemû girêkên kor ên berê û hemû xalên

girêdayî bendên wê rizgarkirin, xwe bi nirxên bingehîn ve girêdan esase. We xwe bi hezar benê berê ve girê daye û nikarin wan jî qut bikin. Li hember nirxên me yên herî bingehîn bê eleqe û bê çare dimînin, paşê dema em bi ser we de tên jî hûn digirîn. Ev dikare weke xisletên nemerdiyê bên nirxandin.

Weke hûn dibînin ez jî şervanekim. Ger nikarim pêwîstiyên vê pêk bînim, bêjin; "Tu têrê nakî, tu karên xwe nakî." Her wiha min derbas bikin. Kes ji vê nareve, ji ber ku egîd narevin. Divê hûn jî nerevin û negirîn. Beriya her tiştî şer meydana egîdane. Li meydana egîdan jî ne rev, ne jî girî dibe. Lê di vê meydanê de du xiftan jî nabe. Ma hûn li ser vî bingehî nehatin qada me? Ma we xwe xapand an jî hatin min bixapînin? Ger hûn dibêjin na, vaye ji we re esasên meydana şer! Ger hûn min esas digirin, vaye Rêbertî wisa ye. Ma yê ji pêwîstiyê vê direve ezim? Jixwe ez wisa behsa rêbertiyek navûdeng jî nakim, hûn wisa binav dikin. Li gorî min, ez ji bo rêbertiyê ked didim. Ango weke kesek rê nişan dide, weke kesek dibêje rêya aqil eve. Ji Rêber zêdetir, dişibim fêrkerekî. Fêrkerek wisa me jixwe hûn nêzî nabin ji sedî nodê axaftina min fêm bikine. Dîsa jî em bi israrin, ji ber fêrkerek din nîne.

### Şerê Me Şerê Xwe Ji Nû Ve Dîtina Jin û Zilame

Me her tim behsa zilaman kir, lê ev ji bo jinan jî wisa ye. Jin piranî zilaman esas digirin. Eşkere bêjim: Li vî welatî zilamê herî karbidest ezim, bes halê min jî li holê ye. Qet hewce nake mirov xeyalên zilamtiya sexte bijî. Li vî welatî ji mêj ve zilamtî miriye. Ji ber di destê zilam de hêz nemaye. Hûnê niha bêjin; "Zilamtiya çors", ti feydeya wî jî nîne. Rewş wisa ye, ez ji ber xwe nabêjim. Zilamên we ji mêj ve bûne leşkerên dijmin. Ji bilî zextek çors, serdestî û xerîzeyên xwe têr bikin, tiştek bidin we nîne. Divê hûn xeyalên xwe yên zilamê sexte danin aliyekê. Dibe ku zora hevalên we yên zilam û we jî biçe, lê min zilamtiya xwe pir eşkere danî holê. Zêdetir ji min nayê, ancex dikarim evqasî bikim. Her çendî dayîka min gotibe, ez çi bikim, bila dayîka min lawek baştir mezin kiriba! Hûn zilamên baştir mezin bikin. Madem hûn bi xwe bawerin, hestên we hene û wêrekin, nexwe zilamê baş mezin bikin. Kes zorê nabêje we wisa bikin, welê bikin. Bes zilamê ku li gorî

naveroka xeyalên we, we biparêze, hez bike û çavdêrî bike nîne. Ger ev gengaz bûya, dê min pejirandiba. Lê kerba min jî pir çêdibe ku, hûn dibin jinên pîrejinên erzan.

Min bi dayîka xwe re şer kir, şerim kir û teng bûm. Ji ber li gorî min jin bi wî halê xwe ve her tiştî tine dikin û bi jina wisa re jî qet nayê jiyîn. Li gorî we ferasetek we ya zilam heye û hûn rêketine. Ez jî vê reva hevbeş û reva komî binav dikim. Ti darbe ji vê re nabe çare. Elbet ji hevalên me yên zilam re jî dibêjim: Bûna zilam bûyerek pir zehmete. Nexasim li gorî van jinan bûna zilam hîn zehmetire. Mînak hûnê çi bidin jin an jî keçek ku hûn nirx didinê, çiyê we heye? Hêza min nîne tiştekê bidim. Vê neku pir mezin dikim. Ez rastiyê dibêjim û cidî me, ji zilamê xwe herî baş dibîne jî baştir zilamim. Lê wexta dîsa jî bi rastiya dijmin re tê muqayesekirin, weke zilamên heyî ti halê min nîne zilamtiyê bikim. Dema em li gorî dahûrînan dinirxînin, mirovê xwe zilamek wisa dibîne, li gorî min pir xirabe. Rewşa jinê kembaxtire. Ji jina li gorî zilamê wisa jî, acizim û bi hêrsim. Heta jinên wisa, ji jinên ketî jî xetertirin. Jinên bi zilamek wisa ve erzan hatiye girêdan an jî paşketî pir xeterin.

Encama ku hûn ji vê derbixin, karê vî şerî ne ewqas hêsane û jinbûn jî ewqas ne hêsane. Piraniya we bi feraseta baviksalarî, li gorî zilaman hatine eyarkirin û PKK'ê jî dixin dewsa zilaman. Tiştek bi navê wê PKK we biparêze û pêş bixe nîne. PKK, ne rêxistinek zilame. PKK, ji destpêkê ve di mijara jinê de rêxistinek wekhevî û azadiyê ye. Ancex hûn naxwazin wê wisa bibînin. Hûn nêzîkbûnên di nava PKK'ê de, weke nêzîkbûnên hewce dike we bixe bin serdestiya xwe dibînin an jî weke ku pirsgirêkek wisa nîne nêz dibin. Di nêvenga me de helwestên wisa nayên pejirandin.

Em nikarin rastiya civakî red bikin, rastiya jinê red bikin. Jiyana bê jin nabe, lê bi jina wisa û bi zilamê wisa re jî jiyan nabe. Ev çima wisa ye? Dijmin wisa kiriye lewma. Bostek cihê ku hûn rehet lê razin nîne. Ji bîr nekin, hûn weke xayînekê ji welat direvin. Hûnê li kur bijîn? Nikarin bi tenê jî bijîn, hûnê cot çawa bijîn? Hûnê weke netew çawa bijîn? Ev pirsgirêkên dijwarin. Hûnê van ji xwe re nekin pirsgirêk, paşê jî bêjin; “Evîndariyên me yên çavreşî hene!” Ma ez van dipejirînim? Ger hûn dihizirin min bi van bidin bawerkirin, hûn xwe dixapînin. Ji ber dema hûn wisa bikin, hûnê darbeya destpêkê ji min bixwin. Wexta dayîka min jinbûn û dayîktiya xwe li ser min ferz kir, min weke baranê kevir li ser

barandin. Wexta xwîşkên min li gorî min tevnedigeriyan, min pehîna xwe li wan dida. Vêca hûn kîne?

Tenê yek tişt dikare me ji vê rewşê rizgar bike: Ew jî hêcetên rast ên şer, şêwazên rast ên şer û şêwaza rast a jinê ye. Ew jî di rastiya Rêbertî û egîdiya em pêş dixin de xwedî cihek girîngin. Bihizirin: Jiyana jina herî baş, çiqas bela serî ye. Mirov silav bide kîjanê, roja du weke bela li ser serî dihilweşe. Ji hezkirinê fêm nake, li ser şer bare û li ser hezkirinê bare. Em bi vî halî çi ji we bikin? Elbet rewşa zilaman kembaxtire. Ev pirsgirêkên cidî ne. Lewra perwerde, nîqaş û şer şertê sereke ye. Ji bo hûn beşdarî jiyanê bibin, raveya jiyanê ya azad û wekhev peyda bikin, em evqasî ked didin. Çima her şêwaza pêwendiyên we rê ji revê re vedike, hestiyarbûna her yek ji we rê ji îxanetê re vedike? Kesê bersiva vê nede, gelo dikare behsa egîdî, nexasim hezkirin û evînê bike? Bes hûnê bixapînin û dizîve bikin! Em ji destpêkê ve vê evîndariyê lenet dikin û nadin jiyîn.

Di huner û şerê Rêbertiyê de cihê jinê girînge. Bila jin jî tevlî meydana şer bibe, lê bila heta dawî bizane quralan ve girêdayî be. Di refên me de cihê jina digirî û serdestiyê ji zilam hêvî dixwaze re nîne. Di refên me de ji jina ku dixwaze bi hestên sivik û cînseltiya xwe ve cîh bigire, heta ji jina nabe çavkaniya hêzê re cîh tine ye. Emê çi ji jina wisa bikin? Wê çi bi jina xwe li serê me kirî bila be? Min ji mêj ve dev ji dayîka xwe berdaye, nameyek jî jê re nenivîsand. Ezê çima bi vî halî ve nirx bidim we? Yek tişta ku nirx didimê, xebata jina azade.

Dibe ku hinek heval bixwazin bi jinê re pêwendî pêş bixin. Ancex ger hûn sedî sed pêwîstiyên mêrxasiyê pêk neyînin, divê mirov we li gorî zagonên şer ceza bike. Ev kar wisa ne hêsanin. Di vê mijarê de ne revê, ger hûn şer pêş bixin dê pêwendî watedar be. Lê em ji bîr nekin, li cem me her pêwendî tê wateya ji destpêkê ve ji şer tawîz dayîn û ji partiyê tawîz dayînê. Ev jî xisleta ketîbûnek mezine. Ji bo derbaskirina vê jî, me berxwedaniyek mezin derxist holê.

Eşkere bêjim: Her çendî xwe tam naxim dewsa zilaman, qet niyeta min nîne bibim zilamek erzan jî. Qet derfet nîne hûn zilamên bendewar bibînin. Ji bo zilaman jî weke berê jinên ku bên bikaranîn tine ne. Li vir şer û jiyanek mezin a tê girtin heye, hûnê wê bigirin. Heta li gorî encamên dawî şerê me, şerê jinê ye yan jî şerê xwe ji nû ve dîtina jin û zilame. Kesên vî şerî rast nemeşînin, bila behsa jiyanê nekin. Ya rastî ev mijar, hêcetek girîng a şerê me ye. Bi qasî dixwazin min cidî negirin. Ez

jî ji we re dibêjim, hûn çima ne xwedî yek raveya jiyana bi serfirazin? Hûn qet behsa hezkirinek rast nakin, di pêwendiyek herî biçûk de dibin pirsgirêk. Bi qasî bê gotin hezkirinên we nînin ziwa bûne û kirêtin. Ma ev rewş li gorî egîdiyê ye? Berê ji bo ser vê rewşê bigirin jin li cihekê digirtin û davêtin quncikekê. Ev helwest jî ne raste. Jin avêtina aliyekê, jin weke milk dîtin û li ser şer dana meşandin, ne li gorî egîdî ye. Ev ferasetên egîdiya sexte yên dema feodalî û burjuvaziyê ne. Wisa şerê jinê yê şervanên azadiyê nabe. Em hewcedariyên wê jî derdixin holê. Hûnê vê cidî bigirin.

Jinbûn ne hêsane. Dizanin hûn weke jin, di nava şermek mezin de hiştine û nikarin kêleka hezkirinê re jî derbas bibin. Girêdana vê bi rastiya netewî û civakî ve heye. Ez jî ji bo xwe bidim hezkirin, neçar mam evqasî karê netewî bikim. Hatina hezkirin tiştek başe, bes ev jî bi şer dibe. Heta di vê manê de xisletek girîng a şerê me jî, şerê hezkirinê ye. Ev jî tam karê hunerî ye. Ji şerkertiya çors pêşketîtir şerek zirave. Qanûnên hezkirin û hatina hezkirinê hene, pêdiviyên vê hene û ev jî bi hunerek zirav ve tên birêvebirin. Hûn hezkirinê dixwazin, eleqe dixwazin, ancex kêleka vî şerî re jî derbas nabin.

Jin be, zilam be, naxwazim ti kes erzan ji min hez bike. Mafê we nîne hûn erzan ji min hez bikin. Heta kî min rasteqînî hez bike û eleqedar be, ji bo min ew girînge. Bi qasî li gorî tê xwestin be û girêdayî rastiyan be hêja ye. Ev hem heq, hem jî peywireke. Tenê gotinên weke; "Tu Rêberî, em pir ji te hez dikin û rêz digirin" derewin. Ji ber hûn di bin navê vê hezkirinê de gelek şaşiyan dikin, xwe bi vê vedişêrin. Nehezkirin jî xirabe, ji ber ku rewşên bên hezkirin derketine holê. Tiştên hûn heta mirinê hez bikin pêk hatine. Ger hûn wan jî nebînin û hez nekin, we tiştek ji vî şerî fêm nekiriye, derewkerin û tê wateya hûn zêde nikarin şer bikin.

Misoger girêdana şer bi hezkirinê ve heye. Yên hezkirina wan ne mezin, şerê wan jî pêş nakeve. Jixwe hûn ditirsin û dibêjin ku xetimîne. Ji ber asta we ya hezkirinê nîne. Ancex nirxên hûn mezin hez bikin û ji bo xweşikbûnan hûn dikarin şer bikin. Ma mirov ji bo keviran şer dike? Mirov dikare ji bo xweşikbûnên welatê xwe şer bike. Lê belê hezkirina we li hember van xweşikbûnan nîne. Vêca hûnê şerê çi bimeşînin? Ger bimeşînin jî, dê ew şer bibe têkilhevbûna îxanet, rik, hêrs û kirêtiyan. Di vê mijarê de jî hûn kêleka rastiya Rêbertiyê re derbas nabin. Rêbertî ji destpêkê ve, her çendî sînordar jî be bawer kiriye ku li welatê wî û bi

gelê wî re hinek xweşikbûn hene û di rêya vê de hunera şerkirinê ye. Rêbertî di vê mijarê de pir cidî ye, weke we dev ji têkoşînê bernade.

Hûn behsa jinê dikin; di mijarên nêzîkbûna jinê de, min ji we re dîroka xwe jî vegot. Dîsa bi qasî şerê nirxên din, ji bo nirxên jinê jî şer dimeşînim. Min çima karî di refên me de evqas jin kom bikim? Ji ber min şerê parastina hinek nirxên wan meşand. Çima bi we ve nayên girêdan, lê bi min ve tên girêdan? Ji ber peywira parastina hinek nirxên wan ên herî girîng jî min rakir. Tişta we fêm nekirî jî, me girêdana jinê bi welat ve, girêdana jinê bi jiyanê ve, girêdana jinê bi hezkirina xweşikbûnê ve saz kirî ye. Jinan ev fêm kir û wisa hatin. Lê hûn, hema behsa rayeya rêxistinê û hêza zilam dikin û wan diçewsînin. Ev helwest, şêwaza despotên berê yên bi xwe ve dana girêdanê ye. Ger hûn wisa bikin, hûnê kîjan jinê bi xwe ve girê bidin? Heta hevjîna we jî be, dê roja duyem partî bê, wê ji destê we derbixe. Ji ber we dizî kiriye. Girêdanek bi vî rengî nabe. Qanûnên bi hevdu ve hatina girêdan hene. Lewra weke berê mêrtî û jiniktî nabe. Hûn bi vî rengî mêr jî peyda nakin. Ger yek dibêje mêr peyda kiriye, emê roja duyem ji destê wê bigirin. Jixwe em digirin jî. Ev karên egîdî ne. Ger em pêwîstiyên wê nekin, şer pêş nakeve. Ji bo jinê şer bikin, lê di şêwazek rast de şer bikin. Sedan, hezaran jin di bîra min û xeyalên min de ne. Min ji bo hemûyan şer kir, heta min ji bo wan şerên girîng meşandin û biryarên girîng dan. Hêj we ev fêm nekirine. We xwe sipart partiyê û jin weke milkekê kir jina xwe. Ev kiryar, weke kiryarên dijmine. Elbet hûn ne di ferqa vê de ne. Di vê mijarê de ferasetek we ya evîna rast, hezkirina rast jî nîne. Tenê hûn dibêjin; "Emê biçewsînin, hêz û rayeya xwe bikar bînin." Ez nikarim vê bikar bînim, vêca hûnê çawa bikar bînin?

Jinê wisa bi hêza xwe ve pêşve dibim. Lê ev jî têrê nake û tim dibêjim, divê ez hîn zêdetir bikim. Vêca hûnê ji bo pêşxistina bûyera hezkirinê bêku tiştekê bikin, çawa biçewsînin û bigirin? Weke hûn jî dibînin, ev kar wisa ne hêsanin. Jin jî pêwîste bizane, em vê jinê napejirînin. Hêjî ji hemûyan dûr disekinim. Em li ser bingeha pêşketin û pêşxistinê nêzî wan dibin. Jina ku hûn zêde xwe dispêrinê, dibe ku we bişewitîne. Ji ber lewaze, bêçare ye û fêr bûye di civakê de lîstok bilîze. Ger min xeteriyên di vê mijarê de derbas nekiriban, ma dikariya bibim cengawerek wisa? Hêj min çavên xwe venekirî, jinan dikariya min tine bikin. Jixwe Komara Tirk xwest vê çekê bibandor li hember min bikar bîne. Dua bikin ku, yekem car min çeka vî dijminî vale derxist. Ger min

vale dernexistiba, yek nirxa şerê me li ser piyan nedima. Ev jî rastiyên girîngin. Ji we re dibêjim, fêr bibin, ancex hûn qet nêzî fêrbûnê nabin.

Pêwendî xirabin, hişyarî, hezkirin û rêzdarî pir lewaze, şaşin û xeternakin. Rêbertî ne wisa ye. Di vê mijarê de ya Rêbertî dijî bêhempa ye. Ger hûn li hember van hewldanan rêzdar nebin, ji bingeh ve xwe ji nû ve ber çavan re derbas nekin û ava nekin, her tişta ku hûn dest bavêjinê dê weke belayekê di serê we de hilweşe û hûn nikarin hesabê vê jî bidin. Ev hemû ji bo egîdbûnê xalên bingehîn ên esas bên girtine. Min ji bo netewekî wisa jiyan kir. Ger min ji bo berjewendiya xwe ya şexsî yan jî li gorî kevneşopiyan şeref û serbilindiya xwe esas girtiba, min weke we xwe di şer de xapandiba, yeqîn dikim em dihatin vê rewşê, min şer jî evqasî dirêj nedikir. Niha hûnê bêjin; “Ev kar zehmetin.” Bes weke din jî mirov nikare li ser piyan bisekine, weke din îsyangeriya we ya herî mezin jî li hember dijmin nikariye ji du mehan zêdetir li ber xwe bide. Di dema dijminê we herî zêde xurt û hûn herî zêde lewaz de, ma min bi tena xwe şer neda destpêkirin? Bi derfetên sifrê ve, heta bi deynan, heta roja îro serkeftin ser serkeftinê re, me ev kar heta roja îro ne anîn? Ger hûn endamek vî şerî ne, dê tevkariyek we ya çawa ji vê re çêbe? Weke sozek şerefê, sozek egîdî pêwîstiyên vê pêk bînin.

Hûn her tim behsa girêdana bi me ve dikin. Me ev ser xist. Ger hûn bêjin; “Fêm nakim, cidî nagirim”, nexwe hûn derewkerin û hûn hatine lîstok bilîzin. Nexwe şerker ji we dernakevin û em jî we napejirînin. Ji bo pêşketina we hûnê van esas bigirin. Di vê manê de divê hûn xwe cidî bigirin. Hûn ji min ciwantirin. Ger ez evqasî cidî digirim, çima hêza we têra vê neke? Ger hêza we têra vê neke, hûnê bibin bela. Vê carê jî hûnê tam bibin kesayetek derew, dek û dolaban, kesayetek vale. Di vê rewşê de her gavek we şaşî ye û zû-dereng hûnê bên binpêkirin.

Jixwe ji nava we fermandarek bi navûdeng derneket. Ger wisa biçe, hûnê hewl bidin min jî tine bikin. Elbet hûn neçarin min ji vê hêlê ve jî binasin: Hinekê rika min heye. Hûn çiqasî bêjin; “Rika me jî heye”, li vî welatî rika ti kesî bi qasî rika min ne xurte. Ji ber min ev hêz bidest xistiye. Weke kesek ji zilamê herî lewaz ber bi zilamê herî xurt ve pêşveçûnek çêkirî, li hember rika we ti carî serî natewîne. Heta yê evqasî hêz dide we, li hember hêza we serî natewîne. Di vê manê de êdî divê hûn bizanin Rêbertî cidî bigirin. Qanûn û şêwazên Rêbertiyê hene, van di hemû şaneyên xwe de bihesin. Ger hûn wisa bikin, misoger hûnê zêdetir xurt bibin. Wê demê hûn dijwar bin, rastiyan baş serwer bikin,

serkeftin bi ser serkeftinê ve bikin. Hûn çima ji vê direvin? Min lêkolîn bikin, ji min hêz bigirin û rast bikar bînin.

Hûn pir lewazin, teqez divê xurt bibin. Hûn pir binkeftî ne, divê ser bixin. Ji ber jiyan pir hatiye kirêtkirin û tenê li vir bedewkirin heye. Di rastiyê de xala nêvenga me dide destxistin eve. Kesên bi baldariyek mezin van di hemû şaneyên xwe de jîndar nakin, nikarin bibin şagirtên me yên pir baş. Ger hûn ne wisa bin, an xwe sererast bikin an jî birevin. Misoger divê hûn vê rastiyê bidest bixin. Ger hûn dudilî û nîvçe tevlî têkoşînê bibin, dê heta mirinê ev rastî bela xwe ji we venekin.

Bila di rih û hişê we de teqîn çêbe. Bila tevlîbûna we ne ji rêzê be. Şerek qiyameta sor heye û em neçarin xwe bigihînin wê. Hûn çima hêza xwe wisa erzan bikar tînin? Ez heme, hûn çima hebûna xwe saz nakin? Ma hûn dewlemendin, li paş we xezîneyên we hene? Na, hûn ji min zêdetir di zehmetiyê de ne û her tişt we neçarî fetihkirinê dike.

**15 Hezîran 1996**

## ŞOREŞA HERÎ MEZIN ŞOREŞA FÊMKIRINÊ YE

Hûn nikarin dem û war baş binirxînin. Hema bêje hûn rojekê dikin mehek û wisa bersivê didin. Ev jî dibe rastiya şerê me ya her ku diçe xwe ferz dike. Politikaya me ya qadro di kesayetên we de herî kêm bi qasî dijmin astengiyên bibandor re lihev dikeve, xalek em gelek caran dubare dikin ber bi şikestinan ve diçe û em dikin-nakin di asta tê xwestin de danakeve cewhera we jî eve. Nabe ku niyeta baş, wêrekiya çors û fedekarî weke pîvana qadroyek saxlem bê nirxandin. Çiqas zehmetî jiyaye, çiqas hewldanek çors jî kiriye ji bo qadrobûnê ne pîvane. Qadroyê xeta PKK’ê ya îro bi qasî bîrdozî ye, hewce dike ziraviyek polîtîk jî hebe û aliyê hunerî jî di asta herî bilind de be. Pêwîste hûn bipejirînin di pîvanên cîhanê de jî ev ji gelek partiyan zêdetir ziraviyê dixwaze. Ger hûn naxwazin bibin ev belaya qadro ya pirî caran derketiye holê û wisa bimînin, binyata kesayeta we ya berê, xislet û hedef çi dibin bila be, ji bilî şikandina vê, kesayeta xwe li gorî pîvanên PKK’ê yên rasteqîn hedefkirinê û xwe li gorî vê ji nû ve avakirinê wêdetir ti vebijêrka we nîne.

We bi salan nêzîkbûnên xwe yên teng pir tirsnak pêş xistin, her qada hûn çûnê ev hîn kûrtir xistin meriyetê. Lewra ev jî pirsgirêka me ya qadro ya herî bingehîn a navxweyî ye. Gelo we destpê kir xwe binasin? Hûn çiqas di ferqa cidiyeta vê mijarê de ne? Şerê herî mezin, her tim şerê mirov bi xwe re ye. Gelo hûn dikarin wate bidin vê? Gelo hûn dikarin di vê mijarê de jidilbûnek cewherî, fedekarî û dîsîplîna vê, fikir û teşegirtina reftarên vê yên hûrûkûr pêş bixin? Di vê manê de ma hûn dikarin bi çavek qadroyên PKK’ê li xwe binêrin?

Niha enflasyona qadro heye û weke tê zanîn enflasyon jî her tim rûxînê tîne. Tevî ku em ti gumanê li hember niyeta we ya baş nakin, di maneya qadrobûnê de, hûn tam enflasyonekê, ango seknek pir erzanbûyî dijîn. Daxwazên we yên fermandariyê bilind dibin. Bes hûn li gorî rastiyên wê teşe nadin xwe û bêku di ferqê de bin zerar didin. Bila kes nehizire dê bikare bi van reftaran ve nûnertiya PKK’ê bike. Di vê mijarê de hêzek me ya sebra mezin heye. Raçaviya heta niha dikim, zehmete hûn bi vî halê xwe ve bibin qadroyên xeta PKK’ê. Elbet neçare tevlîbûna we ya ji refên me re watedar be û wateya wê jî di çarçoveya

me destnîşan kirî de ye. Lê piştî tevlîbûnê xwe weke giraniyekê, her ku diçe tevlîhev, bi nêzîkbûnên paşverû û xeter ferzkirin şaşe. Ne weke kesê hewceyî alîkariyê ketî nêvenga me, bi armanca weke milîtanê misoger dê hêz bide rizgariya giştî mirov tên vir. Lewra pêwîste sereke wisa bê nirxandin, tevlîbûna rojane jî di vê çarçovê de bi dîsîplînek bilind bikin. Ger we sozek tevlîbûnê daye xwe, divê ancex hûn wisa fêm bikin û bi şêweyek îdîa jî pêk bînin.

Kesên dijminên xwe biçûk nabînin, yeqîn dikin divê dijmin bin bixin, tengezariya jiyanê û wesfa wê ya nayê pejirandin têdigihin, tevî vê jî hêviya xwe ji jiyanê qut nakin, azweriya jiyanek rast, xweşik û serkeftî esas digirin, zehmetiyên me çiqas mezin dibin bila be, astengî çiqas zêde dibin bila be, di vê çarçoveya tê gotin de ji dayîna hêza hedef û pêkanê dûr namînin û xwe nadin paş. Kesên ku xwe bi hedefên takekesî û pirsgirêkên navxweyî yên cur be cur ve mijûl dikin, nikarin li hember zehmetiyên nêvenga me li ber xwe bidin û xwe ji pirsgirêkbûnê jî rizgar bikin. Niha rewşa giştî tê jiyîn jî wisa ye.

Yên li pey dozên mezinin, ti carî xwe bi pirsgirêkên navxweyî yên erzan ve asê nakin, nexasim bi azwerî û fikrên mezinên me negirêdana bi dozê ve napejirînin. Jixwe bi hewldanên heyberî yan jî hinek tawîzên helwestên keyfî ve mirov nikare kêleka dozên wisa mezin re jî derbas bibe. Berovajî, ev helwest roj bi roj berovajî wê dikevin û ber bi îxanetê ve dibin. Bi rehetiya takekesî, ji bo hinek bêriyên xwe rêyên xwe têrkirinê gerînê ve, ancex îxanet li dozên mezin tên kirin. Berovajî ketinek çêdibe û bi dozan tê lîstin.

Di vê manê de her tim mînakên xwe şanî we dikim. Emê diyar bikin mirovên dozên divê çawa teşe bigirin. Emê diyar bikin pêwîste ev ji bo me weke xebatek herî diyarker girîngî bê destgirtin, peywirek sereke ye û di cewhera hemû amadekariyan de cîh digire. Ger hêza we û di rêhevaltiyê de îdîayek we hebe, hûnê hem xwe ji pêdiviyên van re amade bikin, hem jî biryardariya bikarin hemû encamên wê rabikin diyar bikin û ji pêkanên wê jî xwe nedin paş. Pêwîste ciwantî û egîdiya we di vê manê de xwe bide der. Ev jî PKK bi xwe ye.

Hinek xalên ez dibînim hene. Çi di nav malbatê, çi jî pergalê de teşe wergirtibin an jî çi weke kesên hedê xwe nizanin xwe anibin rewşek ku neyên nasîn, kesayet niha bêberpirsyariyek ku di nava ti miletî de nayê dîtin dijîn. Qutbûna ji armanc, xwe xapandin, xwe ti carî hêjayî otorîte û serweriyê nedîtin û ji belengaziyek wisa jî rizgarbûnê hewce nedîtinê di

radeyek girîng de dijîn. Kesên tevlî refên me dibin, li ser vî bingehî di nava PKK’ê de qadrobûnê esas digirin, êdî neçarin di karê fêmkirinê de hevgirtin, duristbûn û wijdan bidest bixin. Ji roja xwe dinasim ve rewşa jê acizim, bêku baldar nêzî xwe bibe û xisletên xwe yên rasteqîn binase, pirsgirêkên xwe pir paşverû, pir ketî û weke pîremêran li naverastê hiştin, dev ji xwe berdan û weke kesek tine bûyî xwe dana diyarkirine. Heta dawî rihek gilî û gazinc di her astê û ji her alî ve dana der weke marîfetek zanîne. Ya rastî ev mijar hinek din, mijarên wêjeyê ne. Lê belê keyfa we tevan ji vê re tê. Kî xwe çiqasî bi kul û dert, gilî û gazinc û tengaviyê de ye bide diyarkirin, wer dizane ku polîtîkaya herî baş ew dike. Rewşek derûnî ya nabe yan jî wê nebe çiqas raber bike, wer dizane çiqas vê bike ewqasî marîfetê dike. Eşkere bêjim: Min hêj di deh saliya xwe de ji van helwestan nefret kir, lewma ji mirovan dûr ketim û bijare ketim nava lêgerînek rêya nû. Ne gengaze ku min bi vê bixapînin, mijûl bikin û bandor bikin. Di rastiya Rêbertiyê de, xala ku herî zêde zelal bê zanîn jî eve. Ya ku PKK heta roja îro anî jî ev helweste. Ger li gorî we ye, derd an jî gazincên we zêde ne, biçin cem Marko Paşa. Na ger hûn dixwazin xwe bigihînin hêza çareseriyek bilind, şertê vê yê sereke di karê fêmkirinê de ciddiyet û ji bo serwerkirina vê ya di jiyana pratîkî de vînekê raber bikin.

Niha hêdî hêdî her kes behsa bandora otorîteya Rêbertiyê dike. Dibe û ev jixwe şerek mezine. Bi dost û dijmin re, di hundur û dervî partiyê têkoşînek dijwar dimeşînim. Niyeta we ya baş berçav digirim, wisa vedibêjim: Misoger hilbijartina xwe rast û bê taloqkirin bikin. Nabe qet bi polîtîkayê bê lîstin, nexasim li cem me polîtîka xiftanek ji agire. Ew otorîteya hûn pir hez dikin, ew rayeya hûn pir hez dikin, ev an jî ew xisleta fermandarî xiftanek ji agire û nabe mirov li ber xwe bike. Kesên wê li ber xwe dikin, divê bizanin ku ew zirxek sorbûyî ye, tenê ji bo mirov dijwar şer bike, xwe ji hinek darbeyên dijmin biparêze û li dijmin bide wê li ber xwe dike. Nexwe dîn jî vê xiftanê li ber xwe nakin. Divê teqez hûn vê fêm bikin.

Xiftanê PKK’ê yê şer li ber xwe kirin dişewitîne. Berê ev zirxek bû, niha jî dibêjin xiftanên ku fîşekê derbas nakin. Bes ev jî teşeyî ne. Xiftanê PKK’ê cuda ye. Lê yê cem me hîn zêdetir dişewitîne û girane. Ew li ber xwe kirin, tenê ne ji bo di şerên şovalye de bikar bînin an jî xwe li hember hinek fîşekan biparêzine. Xiftanê PKK’ê weke tufanê ye, weke lehiya baranê ye, li hember her cure amûrên êrîşên ji her alî ve tên,

her cure êrîşên bîrdozî û polîtîk –jixwe teknîk beşek ji van êrîşan a herî kême-, zirxê xwe parastinê ye. Ger hûn wê li ber xwe nekin, negengaze rojekê jî li ber xwe bidin. Ger li ber xwe jî bikin, giraniya wê heye û hûnê pir tundî şer bikin. Şerên berê yên şovalye bînin ber çavan. Dema wan valehiyek biçûk jî didît çawa riban wî zirxî re derbas dikirin, qetînek herî biçûk a di xiftanê we yê PKK'ê de dê bibe sedem hûn bibin parî. Lewma em dibêjin zirxê bîrdozî, zirxê polîtîk û zirxê leşkerî.

Kesên nasname û kesayeta PKK'ê hêjayî xwe dibînin, ger vî karî weke karê zarokan nabînin –hûn jî dizanin, pêlîstokên ne eslî yên zarokan jî hatine amadekirin-, ger li ber xwekirinek weke pêlîstokên zarokan esas negirtibin, divê baş bizanin xiftanê fermandarî û Rêbertî pir sotînere. Li gorî min hûn vê hîn zêdetir bi zaroktî, çawa li bazaran demanceyên sexte û amûrên şer ên sexte hebin, weke çav diberdin wan wisa bikar tînin. Ev jî tiştek tirsnake û encamên wê jî roj bi roj sotîner dibin. Pêwîste misoger hûn bizanin em cengaweriyek ku şerên şovalyeyên serdema navîn jî li pey xwe dihêle, hem jî bi însyatîfa takekesî tê meşandin esas digirin.

Li cem me bi zorê nîne. Hûn dixwazin bibin şervan, heta fermandar. Lê divê mirov li gorî rastiyên wê jî aqilmend be. Nexwe hûnê bên perçiqandin. Hûnê niha bêjin; "Jixwe em Kurdin, heta niha ezmûna me nebû. Dibe ku destpêkê wisa be." Bes dijmin jî di gava destpêkê de bi erdê re dike yek. We wê rojê dît; welatparêzek qaşo di asta zagonî de polîtîkayê dimeşîne, di kongreya partiyê de, yeqîn dikim provakasyonek ji hêla polîsê Tirk ve baş hatî amadekirine, bûna asteng danin aliyekê, heta dawî derfet daye. Jixwe ji aliyê dijmin ve jî ev ewqasî ne girînge, zêde bi ser de neçû. Bes metirsiyê jî wisa xwe dida der: Gotin; "Hewce dikir em ji nişkê ve eywana werzîşê ya girtî dorpêç bikin. Em yek kesê jî saxlem nehêlin." Serdozgerek kevin vê dibêje. Ev dewleteke. Hinekan dikariya wir bişewitînin û tevan qetil bikin. Bes wext û cîh ne guncav bû. Gotin; "Ev tu yî hinekê dudilî dimînî, tevlî xeta dewletê nabî. Ka vêca were hundur." Piraniya wan binçav kirin, qaşo dê aqil bidin wan. Li vir rêya polîtîka meşandinê, pêkanîna xeta dewletê re derbas dibe. Yên li hember vê jî zêde li ber xwe didin, bi şêweya; "Binêre, emê wisa bikin" gef li wan kirin.

Navenda partiya me û qadroyên me jî ji fêmkirina vê dûrin. Wê meh û sal derbas bibin, paşê dibe ku yên hinekê serê wan dişixule tiştên ku hewce dike bên kirin fêm bike. Polîtîkayek pratîkî ya wisa nabe. Ev xwe

weke lokumê pêşkêşkirine. Di heman demê de vê ji bo kesên dibêjin; “Mirov di saziyên zagonî de rehet dijî. Kesayetek qadroyê nû ava dibe, mirov dikare li vir bi şêweyek bîrokratîk jî bijî” û jiyana di nava PKK'ê de wisa şîrove dikin re dibêjim. Ev helwest xwe bi xwe xapandine û ti carî firsend ji vê re nayê dayîn. Fêm nakin, ji ber fêmkirin karek mezine û kedek mezin dixwaze.

Weke min her carê gotî, şoreşa herî mezin şoreşa fêmkirinê ye. Siyaset, di mijara nirxên jiyanî yên miletekî, netewekî, çînekî û heta partiyekî de hêza herî zêde lêhûr bûyî û kûraniya fikir, rave û xîtaba her kêlî amadeyî tevgerê ye. Ger ji bo vê îdîaya we nîne, xwe têkil xeteriyan nekin.

Hûn her tim behsa rastiya Rêbertiyê dikin. Li vir nakokiyek mezin heye. Tevî ku kesî fêrî me nekiriye, em bi temamî ji jiyanê fêr bûne, tevî rastiya Rêbertiyek ku her kes hewl dide şaşwaz bike û bixapîne, bi her cure xeternakiyê re têkilhev hatina heta roja îro, li gorî we zêde nirxa wê ya mirov fêr bibe nîne. Bes ev rastiyeke, hat jiyîn, hat şerkirin û wisa em hatin heta vir. Mixabin hûn nêz nabin dersên vê jî bi serûber bigirin. Dîsa hûn lîstokên xwe yên zaroktî, lîstokên ketîbûnê yên malbatperestî û civaka kevin didomînin. Ger hûn wisa berdewam bikin, hûnê bi xwe heyfê li xwe bînin. Naxwazim kesî erzan bandor bikim. Di hemû pêwendiyên xwe yên bi mirov re, min pêşî bi hînkeriyek berz û rast ve dest bi kar kir. Bi ehbap-çawişî nêzî kesî nebûm. Ti carî tenezilî nêzîkbûnek ku hest û ramanên berz esas nagire nekir. Yên vê xirab dikin an jî berovajî dikin ne ez, hûnin. Di asta bilind de em ji fitne-fesadî bigirin, heta bûyer ji berjewendiyên xwe yên pir teng re kirina amûr, gelek neyênî di nêzîkbûnên we de rû didin.

Hûn avakirina hêz weke xisletek kesayetî vedibêjin. Ez jî ji we re dibêjim ku, ew xislet girêdayî koletiyê ye. Koletî bilêvkirin, her tim di kesayeta we de lewaziyê dide der. Li hember dijmin rawestînê danin aliyekê, hûn ji aliyê koleyek çiqas baş de ne xwe ravekirinê ve mijûlin. Koletiya xwe baş ravekirin, ev jî di liv û tevgerên xwe de dana der nabe nêzîkbûnek eslî û nabe ku weke çalekiyek rizgarî bê nirxandin. Pergalê hûn fêr kirine baş gilî û gazincan bikin, xwe bavêjin erdê, karan bixetimînin, karên vale ve mijûl bibin, komplogeriyê bikin, xwe bixapînin û bigirîn-binalin. Jixwe civaka me di vê mijarê de yekemîne û rastiya civakî jî di nava partiyê de dana jiyîn jî hinekê wisa ye. Bes ev

hemû jî dijberî rastiya Rêbertî ya tê wateya bijareya fêrbûn û reftarên berzin. Ji ber ku jirêderketin û minafiqtiyê rave dikin.

### Polîtîka Helwestek Hostane Dixwaze

Ji bo polîtîka vale negotine 'meydana siyasetê.' Navê polîtîka yê din jî meydana darvekirinê ye. Berê wexta meydana siyasetê dihat vekirin, seriyê din jî sêdar dihatin amadekirin. Di siyasetê de darvekirin zêde bû. Pêwîste bi çavek xwe jî her tim bibîne di sêdarê de diheje û wisa beşdarî vî karî bibe. Min jî wisa dît. Dilê min zêde wan sêdaran, zindanan an jî îşkenceyên we jiyan kirî ranagire. Di vê mijarê de jî nakokiyek mezin dijîm. Hem beşdarî siyasetê dibim, hem jî metirsiya hejandina di sêdarê de dijîm. Em yekbûna diyalektîkî jî ez aresteyî xebatek bêhempa kirim. Ji bo serê min hêsan bi benê sêdarê ve neyê girêdan, min bi lezek mezin di xebatên xwe de tempoyek pratîkî raber kir.

Siyaset meydana darvekirinê ye. Di dîroka me de hemû pêşengên îsyanên me di demek kin de li Amedê û Elezîzê bi benê sêdarê ve girêdan û pêşkêşî alemê kirin. Kesên vê nezane nîne. Vêca li komkujiyên miletê cuda binêrin: Di vê mijarê de çîrokên kursiyan pir tirsnake. Ji bilî vê xistina bîrên bê binî, şikeftan û robaran, ev hemû wexta hûn serî hildin û dest bi siyasetê bikin rastiyên divê yek kêliyê jî paşçav nekin û ji dîtinê dûr nesekinine.

Yeqîn dikim vêca hûn vê înkar dikin an jî wexta dibînin jî li ber xwe nadin û dikevin. Ji darvebûn û sêdarê netirsin, lê paşçav nekin ku her kêlî jî diheje. Ger hûn bikarin van herduyan bi hev re bibînin û bimeşînin, dikarin siyasetê bikin û ji xwe nepejirînin ku hewce dike şaşiyek herî biçûk jî nekin. Elbet ji bo vê jî hewce dike li hember jiyanê rêzdariyek mezin raber bikin û pir baldar nêz bibin jiyan di sêdarê de nexeniqe. Ji bo jiyan di girtîgehê de nerize, jiyan li serê çiyan nerize şiyarbûnek mezin hewce dike. Camêrê li çiyê jî xwe bi rizandinê û terkî mirinê kirinê ve di rastiyê de ji zû ve darvekirin pejirandiye. Ev hemû di rastiya PKK'ê de xeternakin û encamê nadin.

Dibe ku piraniya we bêje ev kar ne li gorî we ne. Heta nikarim tam binirxînim jî. We xeterî ji min zêdetir jiyan kirine. Weke gelekan nikarim girtîgehê bijîm. Hûn min bikujin jî nikarim weke we li çiyan bijîm. Bes tevî vê di hemû canê xwe de mezinbûna xeteriyê dihesim. Ev

xeterî jî min ber bi ziraviya şêwaz û tempoyek bêhempa ve dibe. Cuda hêmanên bingehîn ên min areste dikin çine, gelo dengên li bilindahiyane? Belê. Êşên miletê me yên giran jî di vir de rol dilîze. Dîsa ji hêla takekesî ve jî azweriyên serkeftîbûnê rol dilîzin. Lê di rastiyê de xeteriya komkujiya ku dijmin ferz dike di hinavê xwe de, di nava gel de valederxistinê ve mijûl bûm. Ji ber xeteriya herî mezin, xeteriya komkujiyê ye. Kesê nekare vê vale derbixe nikare tiştekê asteng bike û li hember ti nirxa jiyanê rêzdar be.

Siyaseta ez dikim, tevgera rawestandina komkujiyê ye. Ma hûn dixwazin rastiya Rêbertiya PKK’ê fêm bikin? Navê vê jî wê komkujiyek pir berfireh çawa bê rawestandine; komkujiya bîrdozî, rêxistinî, çalekî û rihî rawestandine. Cureyek din fêmkirina min û bi min re meşîn negengaze. Ji ber li gorî daneya zanistî navê rejîma derbasdar, rejîma komkujiyê ye. Ev ne wehiyên minin, kesên di qada zanistî de nirxandina objektif esas digirin vê destnîşan dikin. Kesên hinekê zanista civaknasî, zanista siyasî û zanista rihî esas digirin vê dipejirînin.

Nexwe, ger hûn di vî karî de bi îdîa ne, hûnê berê pêşî bipejirînin ku bibin şoreşger û milîtanên rawestandina pêvajoya komkujiyê, pêşî lêgirtinê û her ku diçe rizgarvanî. Ger ev pejirandin rastî be, wê demê bi biryar bikin ku divê şêwaz û tempoya we ya xebatê di çi rewşê de be. Barê yek ji we bi qasî yê min ne girane. Ancex gazincek herî biçûk nakim û rewşek min a weke; “Nikarim, çênabe” nîne. Her kêlî li ser pişta şûr û li ser pira siratê dimeşim. Dost û dijmin her kes dizane polîtîka kirin weke li ser pira siratê re derbasbûne. Lê tevî vê, bêku bigirîm û binalim di rêya xwe de dimeşim. Dibe ev ne meşek bi navûdeng be, bes dîsa jî meşek pir bi bandore. Her çendî hûn nepejirînin jî, niha ya ku kêm-zêde xebata her kesî diyar dike meşa mine. Jiyana rojane ne tenê di rastiya Kurdistanê, rastiya herêmê, heta rastiya navnetewî de, yê herî bi bandor û yên dijber radiwestin jî heta dawî li hember tevdîr digirin ezim.

Tevî vê, ya ku vê hêza li ber xwe dayînê çiye? Girêdana min jî bi armancan ve, girêdana min bi şêwaza xebatê û jiyanê ve heye. Hinek îdîa û dildariyên min hene. Van rasteqînî dinirxînim û ev jî min li ser piyan digire. Lewra xwe pir baş eyar dikim. Mînak hest û ramanên xwe, ya herî girîng jî ked û hewldana xwe tînim astek pir zirav û pîvanê wê baş eyar dikim. Mînak em bêjin ji te re hatiye gotin li vir sitilek av heye û wê tu salekê xwe bi vê xwedî bikî. Elbet kesî ev ne gotiye, lê ez hîs

dikim. Ezê salekê bi vê avê îdare bikim, divê vê hîs bikim û bizanim. Ji ber nezantî dibe ku min ji bê aviyê ber bi xeniqandinê ve bibe.

Ev têrê nake. Her wiha pirsgirêka dê ev av çawa bê bikaranîn heye. Deka em bêjin ez kesek pir tî bûme. Dibe bikarim di carekê de vê avê vexwim û ev jî tenê yek-du rojî rizgar dike. Vêca wê pêdivî wisa pêk were. Her wiha em bêjin min ne karî xwe, min jî weke we av dît û nekarî xwe di carekê de ew av heta dawî vexwar. Vaye şêwaza we ya çalekgerî jî vê ji min re vedibêje. Şêwaza we ya rijandina xwîna xwe yan jî pejirandina nirxek partiyê dişibe vê. Lê ji bo min cuda ye. Ezê çawa bi wê salekê îdare bikim? Divê pêşî wê bipejirînim û vîna min vê bipejirîne. Ev têrê nake, her wiha hewce dike taktîka dilop bi dilop bikar bînim. Di şêwazek medeya min ziwa nekê, ango di sînorê mirinê de negirê de, bi qasî nekevim vê astê ezê dilop ser bikim, lê di heman demê de ji wextê re jî bihêlim. Heta ezê vê mezinbûna dilopan diyar bikim wisa pêk bînim. Ger radeya dilopê yek santim be, wê şeş mehan min îdare bike, ger nîv santim be salekê îdare bike. Wê demê ezê nîv santîmî esas bigirim û dilopan daqurtînim.

Niha hûnê bêjin; "Ma ziraviyên jiyanê yên wisa dibin, kî tehemulî vê dike?" Vaye ev jî şêwaza we ye. Li gorî şêwaza min, mirov pir baş dikare tehemul bike, heta ji vê zewq werbigire. Ez jiyanê wisa digirim dest. Felsefeya min ya jiyanê wisa ye. Em welatek amade bidin we, yeqîn dikim hûnê di demek kin de pêşkêş bikin. Yan jî hinde medeya we ziwa bûye, we xwe bi tiştên xirab ve, hinde we bi îçkiyê xwe bêhiş kiriye, hûn nikarin dermanek we baş jî bike bigirin. Derfet ne kemin, nirxên zêde hûn xwe pê xwedî bikin hene. Bes şêwaza we ya bikaranîna van bi metirsiyê encam dibe. Ev metirsi jî çavkaniya xwe ji kesayetên we yên bi nexweş digire. Kî dizane biserûber xwîn birijîne, kî serûber bi êş û jana re şer dike, kî serûber rêyên derbaskirina hesretan dizane? Ev hemû di şêwazek pir xeternak û tinekirinê de dibin û ev jî windakirine.

Xalek din a min fêm nekirî jî eve: We çima heta niha polîtîka li ser vî bingehî fêm nekir? Hûn behsa Rêbertî dikin, ji bo wî zehmetiyên wisa berçav digirin. Bes hûn çima hewl nadin têbigihin cewhera wî jî wisa ye? Hûn dibêjin; "Em ji mirinê re amade ne, lê ji şêwaza rast re ne amade ne." Ev çi ferasete, çi kesayete, ecêb dimînim. Divê ev nakokî bê çareserkirin. Xwe bi xwe belavkirinê, xiftanên cur be cur li ber xwe kirin, helwest û reftarên cur be cur raber kirinê, ev nakokî nayê çareserkirin. Ev bi temamî girêdana bi karê şerek hostane, şerê bîrdozî,

şerê polîtîk, şerê rêxistinî, şerê rihî û herî dawî jî şerê leşkerî ve dibe. Nexasim wexta hûn tevlî şerê leşkerî bûn, hûnê bêhempa bin. Milîtanê beşdarî şerê leşkerî bibe, li gorî gotina min divê tam weke bahozê be, heta weke xwedayê bahozê be. Ji bilî vê divê kes danekeve meydana şer. Em carina vê weke peyvên gurê şer, rûviyê şer, şêrê şer, bazê şer bi mînak bikin.

Camêr nikare du axaftinên bi serûber bike, nikare bi serûber pirsgirêkek rêxistinî çareser bike, bi serûber haya wî ji şiyarbûna siyasî nîne, lê qaşo camêrê çalekiyê ye, çek bikar tîne! Hişê min vê ranake. Mezinên me di tevahî dîrokê de her tim bi vî şêwazî îsyan kirin, gelek miletî jî wisa kir, lê hemû jî pir metirsîdar hatin qetilkirin. Dîroka me di vê mijarê de xwedî mînakên pir balkêşin. Rêberên me bi şêweyek êşa giran ve yan radest bûn, an di sêdaran de rih dan, an jî reviyan carek din jî bi vê pirsgirêkê ve mijûl nebûn. Yekem care em vê çareser dikin û hewl didin rastiyê bidin. Ev pir hewce ye. Ji ber ger em vê nekin, çiqas dixwazin serhildan û gêrîlatiyê bikin, çiqas dixwazin li qadên cur be cur xebatan bikin, ev kar hemû jî ti wateyê rave nakin. Zû-dereng hemû jî mehkumî binkeftinê ne. Ne ez vê dibêjim, rastiya jiyanê, şêwaza sazkirina serdestiya dijmin vê dike. Ez jî hewl didim vê çareser û derbas bikim. Bêku em biwestin û aciz bibin li pey vî karî ne.

Dîsa jî hêza we nîne hûn vê mijarê bi rasteqînî têbigihin. Vêca rêbertî, milîtanî û fermandarî li kur dimîne? Gelek ji we bi jirêderketinên çep an jî rastê ve xwe dixapînin, dihizire yan wê jor de bifire, yan jî di herî jêr de xwe bide jiyîn û wisa van pirsgirêka derbas bike. Ev hemû xwe xapandine û wisa nabe. Xala pê xemgîn dibim jî eve. Min ji bo têkoşînê hezaran mirov amade kirin. Lê belê tevî hemû nêzîkbûnên min ên cewherî, yekê jî şêwaza min pêk ne anî. Hûn di vê mijarê de çi hêcetan bidin pêş bila be, hêjî pirsgirêka herî bingehîn eve. Ger hûn min esas digirin an jî dibêjin; "Wê ev kar bi vê rastiya Rêbertiyê ve pêk were", nexwe êdî asta vê ya zimandirêjî derbas bikin, hêza daketina cewhera wê raber bikin û hêzek wisa jî bixin meriyetê.

Bal bidinê, derfeta weke lokumê polîtîkayê bikin pêşkêşî we dikim. Lê yên pêşberî min zêde xwe nadin ber ferasetan. Mînak di huzura milyonan de me ev ji hêzên çepgir ên din re jî got. Lê ew weke fanatîkan taximên xwe li ser min ferzkirinê marifet dibînin. Tişta tê hişê min, êdî mirov ji van re bêje fanatîkên polîtîk. Çawa fanatîkên Fenerbahçe û Bêşîktaşê hene, ev jî li Tirkiyê fanatîkên polîtîk ên

çepgirin. Bi vê taxim nayê rizgarkirin. Di werzîşekê de jî serkeftin bi fanatîzmê nayê bidestxistin. Jixwe her cure fanatîzm xetere. Divê hûn hinekê vê di rastiya xwe de jî bibînin. Bi fanatîkî ji xwe razîbûnê ve, hûn nikarin karê fêmkirinê jî pêk bînin. Politikaya ku ez dizanim, fêmkirinek misoger û pir nêzî rastiyê û heta dawî xwînsarbûn, di nava helwestek hostane de bûyîn şertê sereke ye. Her tim amadebûn û xwe bi uslubek pir saxlem ve ravekirin şertê sereke ye. Ev nêzîkbûnên teng, seresere hûn hestiyarî binav dikin, ti şêweya sûbjektîvîzmê we ber bi ramanek polîtîk a saxlem ve nabe.

Her kes dibêje hunera polîtîka pir zehmete. Ji bo me jî ev huner hewce ye û emê bi zanebûna zehmetiyên vê hunerê nêzîkbûn raber bikin. Derkirina pêdiviyên polîtîkayê ve hûn zêde nikarin karekê bikin. Dibistanên pergalê yên hûn jê hatîn hene. Ev dibistanên îxanetê yên hûn ji rê derxistine. Li wan deran ne politikaya gelan a azad, koletî tê fêrkirin. Li wan deran her cure reftarên bi qusur, weke şêwaza kirêt, helwest tê diyarkirin û didin pejirandin. Zimanê we jî lale, tiştek bi navê xîtabê nadin we. Jixwe ji ber vê her tiştê we di çavên min re diçe. Ji ber baş dizanim, hemû hest û reftarên we di dibistanên dijmin de teşe girtine. Ji bo min jî li hember dijmin li gorî berjewendiyên têkoşînê û milet teşe daye xwe, her tişta dijber di çavên min re diçe û yekser fêm dikim. Dîsa ya rast jî lez têdigihim û dipejirînim. Rêbertî her wiha baldariya vê ye, zemîna vê ya hesase. Kesê ku kêlî bi kêlî bandorên dijmin fêm neke, bi êşên wê nehese, bertekên xwe pêş nexe, dîsa kêlî bi kêlî ya rast nehese û nepejirîne derewkere û bêxeme. Lewra nikare bibe milîtanê rêber.

Di vê mijarê de ezmûnên xwe jî mînak didim we. Ger ji nav we kesên cidî dibêjin; "Dixwazim bibim weke Rêbertî" hene, bijî ji we re. Ger ji nav we kesayetên wisa hebin, her roj di xizmeta wan de me û ezê bêku qet aciz bibim xizmeta wan bikim. Bes êdî xwe weke hatî xapandin dihesim an jî dibînim ku we xwe xapantiye û zehmetiyên we hene. Ne bi navê xwe, negengaze mirov bi navê we zehmetiya nejî û hêrs nebe. Di helwestên we de dubarebûn zêde heye. Rik û hêcetên vê jî berfirehin. Min ne dixwest evqas bergên pirtûkan, her meh pirtûkekê bidim nivîsandin. Berê qet li ser vê nedihizirîm, heta manîfestoyek têra min dikir. Lê wexta niha dinêrim, fêm dikim ku hêjî têrê nake. Rêberên ti tevgerê wisa ne nivîsiye û wisa ne axiviye. Ez xwe neçarî vê dibînim. Ji ber hûn hema dibêjin; "Devjêberde, ji kuderê ve zirave bila ev kar ji

wir biqete, xilas dibe jî bila be." Bi min re jî rika divê ev kar wisa xilas nebe heye. Vaye ev jî rê ji rakêşiyek mezin û şêwaza min a xweser re vekir. Di encamê de ne hûn dikarin hêsan ji min rizgar bibin, ne jî ez dikarim ji we rizgar bibim. Ezê kêm-zêde xwe bidim meşandin, bes zehmete hûn xwe bimeşînin. Ger hûn birevin rûyeke, nekarin li ber xwe bidin rûyeke, şer jî bikin rûyeke, şer jî nekin rûyeke, her rûyî de jî dibin dert. Ji ber we wate neda ya esasên vî karî. We fêrbûn û pêkan bi hemû cidiyeta wê ve esas negirt. Nakokiya we ya herî bingehîn jî ev bû.

Eşkere bêjim: Sebra min jî heta cihekê ye. Ez ji qasî hûn dizanin zêdetir hostayê karkirinê me. Li hember karên ji rêzê hestiyariya min heye, ji karên dîrokî heta karên pîroz, bi hemû karan ve mijûl dibim. Min xwe weke kesayetek wisa ava kiriye. Di pêwendiyên mirov de xwedî rewşek pir xweserim û her ku dijîm negengaze bêm binxistin. Hunera min kesên qet fêm jî nake bandorkirin, dîsa yê qet sererast nabe hêza mirovbûnê dayînê ye. Dîsa di vê mijarê de bandorkirina mirov jî pir pêş ketiye. Elbet hûn kêleka vê hunerê re jî derbas nabin. Lê Rêbertî wisa ye. Hostayê hemû karên ku rêbenê bavê min ê gundî jî tenezil nedikir, pêk nedanî, hişê xwe re derbas nedikir bûm. Di her karê dest davêjimê de ya herî baş derdixim holê. Niha jî min ev rade gihandiye şêwaza polîtîka û şer.

Ev naverok çiye, rewşên diqewimin çine? Vaye ev xalên ku herî zêde pêwîste hûn fêr bibine. Ji ber hînkeriya Rêbertî, hînkeriya Rêbertiya PKK'ê ye. PKK di vê manê de hînkeriya artêşê ye. Ger hûn bêjin; "Pirtûkên cuda jî wisa bûn, ez jî hinek tişt fêr bibûm, min hewl da û di rastiyê de jî min xwe di şerkertiyê de daye jiyîn" jî, tiştekê rave nake. Ji ber ev hemû hatine ceribandin û têk jî çûne. Li vî welatî heta niha yê têk neçûyî û hêjî kar dike tenê şêwaza mine. Vê ne tenê ji we re, ji hêzên çepgir û Îslamparêz re jî vedibêjim. Hemû jî hewl didin li ser vî bingehî sûd werbigirin. Dijmin jî dixwaze li ser vî bingehî xwe ji nû ve ava bike. Mafê wî ye vê bike û dê bike jî. Nexwe divê hûn jî xwe derbas bikin, di nava şer de bizanin bi me re bimeşin û dîsa hêza we têra vê bike.

Dîsa li cem me nêzîkbûna bi zorê nîne, dilxwazî esase. Bes ev jî tevlîbûnek ji her cure nêzîkbûna zoraki zehmetire. Ji ber nirxa wê ya dilxweşî û giyanwerî pir berze. Dibe ku bi zorê bê pejirandin, dibe ku hûn bi zorê xwe bixapînin, lê bi nirxên me yên mezin ên dilxweşî û giyanwerî re nakokbûn, dijberî van rawestîn an jî pêdiviyên van nepêkanîn, tiştek ji vî karî nefêmkirine. Ev jî di encamê de ji ber şere,

xwe xapandine û ya herî xirab jî windakirine. Jixwe em nikarin bi zorê tiştekê fêr bikin. Ev karê fêrbûnê bi azwerî dibe. Ez çiqasî bi vî karî ve eleqedar bim, ji ber hûn ciwanin divê hîn zêdetir bi azwerî, ezamet û xwestek nêz bibin.

**28 Hezîran 1996**

## TEVLÎBÛNA RAST A JI PKK'Ê RE DI MILÎTANIYA VEJÎNER Û RIZGARVANIYÊ DE BIRYARDARÎ YE

Bêku pirsgirêka qadro û rêveberî ji girîngiya xwe tiştekê winda bike, heta hêjî girantir didome. Di rastiya Rêbertiyê de pirsgirêka herî bingehîn, qadroyên me yên esasî valederxistinek mezin li ser me ferz dikin û nikarin xwe ji bûna hêza tasfiyekirinê rizgar bikin. Ne em li bendêbûn pirsgirêk evqasî giran bibin, ne me ev heq kiribû, ne jî ti aliyê vê yê watedar heye. Tevî ku me xebata herî mezin ji bo pêşketina qadro cuda kiriye, pirsgirêka herî mezin û xirabiyên herî mezin ên çavkaniya xwe ji vê digirin jî em bi qadro re dibînin.

Gelo ji ber em pir eleqedar dibin wisa dibe? Me li kur şaşî kir? Di vê pêvajoya şoreşa me ya herî girîng de, tevî ti hêceta wê ya mafdar nîne, ev pirsgirêk hêjî evqasî girankirin tê çi wateyê? Ev dikare bi çi hêcetî bê ravekirin? Me bi hêzek bêsînor ve bersiva perwerdeyê da. Ji bo her qadroyê dixwaze kar bike derfet hene. Dîsa ji bo şoreşekê çiqas hewce be, tev hatine dayîn. Lê tevî vê qadroyên di nava PKK'ê de hema bêje kar ji rê derdixe, vale derdixe, heta dikare bê gotin, jirêderketinên ku pisporên şerê derûnî yên dijmin nikarin ava bikin û xirabiyan zêdetir pêk tînin. Ger em dijmin bigirin dest, em dikarin hezar carî wî bin bixin û bînin qonaxa em dixwazin. Lê mixabin tevî evqas nêzîkbûnên erênî, em nikarin we bînin asta herî erênî.

Elbet neku sedemên vê nayên fêmkirin. Misoger xwe tevlî şerê rêbertî û partîbûnê nekirine, berovajî pêşketina rêberî yan jî derfetên partîbûna li ser vî bingehî ji bo pêşwazîkirina birçîbûn û xizaniya xwe ya takekesî bi şêweyek ferdperest û çavsorî desteserkirinê ve bikaranîne. Ancex bi şêweyek hêjayî dizek hosta, rewşek weke dizên rêxistinê, dizên raye, dizên siyasî tê jiyîn. Şêweya vê ya din jî, vê carê berovajî bi encamên keda xwe ve qet mijûl nabe, pratîka xulamek herî paşketî raber dike, rastiya ku pirsgirêka partîbûnê ya sereke parastina nirxên partiyê ye datîne aliyekê, tevlîbûnek bê îdîa, mirî û kêr naye li ser partiyê ferz dike. Ev jî xirabiya herî mezin li partiyê bê kirine. Lê mixabin, tevî gelek ji wan derketine holê, kes xwedî li vê rewşê dernakeve û bi nêzîkbûnên durû, çend rûyan ve dibêjin; "Ev ne ezim, ev her tim ji bo

hinek din tên gotin." Wisa bi fêlbaziya gundîtî ve hewl didin xwe ji vê xilas bikin û her kes jî vê polîtîka dihesibîne.

Xwe tevlî perwerdeyek dijwar nekirin, wêrek nêzî xwe nebûyîn, dilnizmî nebûn, di ferasetê de neduristbûn, nebûna xwedî xeyal, vîn û ezametê, şûna wê pir belave, di rastiyê de ji gelek aliyan ve rizî, bê xwestek, bê îdîa û bi qasî xisletên xwe yên lehengî dikare bi derfetên rêxistinê ve bide jiyîn, ecêb dayîna jiyîn û li gorî xwe şerê dayîne. Em dikarin wêneya rewşa we bi van tevan rêz bikin. Bes rêzkirina van wêneyan jî têrê nake. Divê ev wêne bê parçekirin û bi erdê re bibe yek. Niha encama herî girîng ez gihamê wisa ye. Yê min vale derdixe ne dijmine, ne milete, ne jî şervanên ji rêzê ne. Di serî de navenda me ya min vale derdixe, bi temamî qadroyên peywirê ne. Niha xeteriya herî mezin ji van tê raberkirin.

Mirov yeqîn nake, dihizirim niha em çi ji van bikin. Ya rastî di mînakên dîrokî de rewşên wisa bi çend şêweyan bi encam dibin. Yên bi şerên hizipkarî ya çors ve derdikevin bi her cure rêbazan ên din diçewsînin, tasfiye dikin an jî rêxistin xwe bi xwe belav dibin. Nayê payîn ku ev nêzîkbûn encamek din bide der. Ya ku hûn bi vê nêzîkbûna qadro ve li bendê ne, weke di mînakan de jî derketî holê, çewsandina yekê û tasfiyekirina yên din, rêjeyek mezin jî xwe bi xwe tasfiye dike.

Li rastiya rêveberiyê binêrin, hemû ezmûnên PKK'ê yên dîrokî – jixwe belgeyên hemûyê hene- ji xwe re rave bikin, hûnê bibînin rastiya we wisa ye. Elbet bingehên vê yên dîrokî pir eşkere ne, dîsa pir rehetî dikare hedefên vê yên siyasî û encamên wê bên destnîşankirin, lê pir xeterin. Bi vê tenê dikare ji bo dijmin bibe zemînek binkeftinê ya baş. Weke baskê dijmin ê pêncemîn, sîxurê objektif tevdigere. Ev jî bi şêweya herî xirab diyarkirina rastiya me ya civakî û dijwar pêkanîna statûya mêtîngeriyê ye. Di bingeha hewldanên me yên salên dawî de ev xeterî dîtin û derbaskirin heye. Em vale van hewldanan nakin. Weke di hemû pratîkên we û nêzîkbûnên we yên jiyana rojane de tê dîtin, hûn hinde tengin, weke bi nexweşiyek çareser nabe girtiye hîn zêdetir kûr dikin û wisa nêzî pirsgirêkan dibin. Ne gengaze mirov li hember van rewşên we şaşwaz nemîne.

Misoger ger bi zarokan re mijûl bibim, wê di demek kin de –daneyên vê hene- hemû çeleng bin. Niha tişta herî zêde daxwaz dikim, bi komek di navbera temenê deh-panzdeh salî re eleqedarbûne. Êdî mirov ji rastiya we ditirse. Nêzîkbûnên evqasî mirov bêzar dikin, bi mirovên

heftî salî re jî nîne. Mirov pir baş dikare bi wan re kar bike. Elbet mirov neçar dimîne van metirsî bibîne. Hûn çima di vî temenî de dibin xwediyê nêzîkbûnên wisa? Elbet di vî temenî de, bi vî şêweyî tevlîbûna ji siyasetê re pir xetere. Wexta zarok mezin dibin rastiyan û pêdiviyên jiyanê zêde hemêz dikin. Ezmûnên îxtiyaran jî pirin. Ji ber ew jî di dibistana jiyanê ya bêrehim re derbas bûne, lewma nirxek mezin didin karên rastbînî. Li hember qehweyekê, derfeta jiyanê ya herî biçûk jî rêzdariyek mezin raber dikin. Ev herdu jî bi we re nîne. Ji ber tine ye hûn ji jiyîna rewşên herî xeternak şerim nakin.

Me xwest vê rewşa we bi pêşxistina dibistana jiyanê û nêvengên PKK’ê yên bi salane em pêşkêşî we dikin ve derbas bikin. Bes hûn hêjî nêzîkbûnên xwe yên xeternak raber dikin, xwe jî pir fêlbazî ferz dikin. Min got dê jiyan fêrî van bike. Evqas şer tê meşandin, lê mixabin bi qasî dijmin jî nekare bihizire di rastiya fermandar, artêşbûnê de û di pêkhatina rêveberiyê de rewşên herî dijber hatin jiyîn. Ya nayê bawerkirin sepandin, ferz kirin û dan jiyîn. Pêşketinek feraseta rêbertiya herî erzan, herî bê terbiye, zêde dide revandin, xwe zêde ferz dike, pirsgirêkan mezin dike, ne çareser dike zêdetir dixetimîne û her ku diçe vê bi xwe re kûr dike derdikeve holê. Niha rêjeyek mezin li ser vî bingehî pêşberî me ye. Xwe kiriye bela, hema hema dibêje; “Ez beşdarî PKK’ê bûme. Min xwe jî feda kir. Lê tola xwe jî ji rastiya Rêbertiyê û rastiya partiyê wisa digirim.”

Wexta em li pratîka lêpirsîna dawî em dixwazin pêş bixin dinêrin, em di kesayeta van hevalan de bûyera tolhildanê dibînin. Di rastiyê de ev hemû jî duristin. Tiştek din a seyr heye: Qaşo ev kesayet heta mirina xwe bi me ve girêdayî ne, heta weke yên herî zêde girêdayî tên nasîn. Lê belê pratîka wan ji Rêbertiyê û partiyê tolgirtine. Mirov bi vê yeqîn nake. Çawa rê ji vê rewşê re vedikin? Wexta em hîn zêdetir gelemperî bigirin dest, vediguhere tevgera qadrobûn û ji rastiya Rêbertiya PKK’ê tolgirtinê. Elbet di bin vê de jî dilketinên desthilatiya pêşwext, her cure bêteşebûna ku çavkaniya xwe ji xwe neperwerdekirinê digire, takekesî, bandorên çînayetî û zehmetî hene. Ev hemû di kesayetê de rastiya herî bela ava dike û ji bilî vê jî ti encamê nade.

Beramberî nirxên dîrokî, xalên şoreşê yên fermana serkeftinê didin baldarî nîne. Lê kes jî vê ji xwe re nake pirsgirêk. Bila li hember dijmin bostekê pêşve biçin an jî darbeyekê lê bidin, vêca bila deh darbeyan li min jî bidin, ez bi vê jî razî me. Mixabin ev jî nîne. Misoger meşa wan a

ber bi dijmin ve yan bi şêwaza xwe kuştinê ye, yan şêwaza rastgirî û duvikbûnê ye. Xwe nadin ber avakirina ti nûbûnê. Şêwaza wan bi temamî li ser bingeha binkeftinê ye, belave û bêpergale. Heta dawî muhafazekar, înkarger û bê hêvî ne. Bi rastî jî ev helwesta wan xeteriyek mezin ava dike. Jixwe ne rasteqînî ne. Ger zehmetî hebûyan – jixwe ji bo derbaskirina van jî me gelek derfet pêşkêş kirin- dibe ku ev bihata fêmkirin. Lê belê li cihê karê herî baş bê kirin, rewşê di astek kembaxtir de ferz dikin.

Lewra nabe ku nebesiya qadro wisa nebesiyek ji rêzê bê dîtin. Ya rastî li gorî quralên leşkerî pêwîste cezayê herî giran bê dayîn. Nebesî weke oportonîzm pêşxistin û ji hemû bêberpirsyariyan re kirina hêcet, ji hemû binkeftinan re xiftan amadekirin, hema bêje bûye hunerek. Ev hunerên herî hêsanin, tişta herî zêde ji destê we tê, lê nêzîkbûnên ti sîûda wê ya pêşketinê jî nîne. Ev nêzîkbûn ne rastin û divê di heman kêliyê de ji holê bên rakirin. Bes tişta ecêb jî, hûn di vê mijarê de îtîfaq û lihevkirinek baş dijîn. Ez li aliyekê me, hûn tev li alyekê ne. Hinde hûn ji zimanê hev baş fêm dikin, ev ziman jî zimanê kevne, rastiya zimanê Kurdê kevne.

Ya rastî di vê mijarê de mirov neçar dimîne vê ji xwe bipirse: Gelo wateyek vê heye ku em evqasî bi ser we de tên, evqas mijûlbûna bi we re karek aqilane? Ji xwe dipirsim gelo çima bi kesên rastiya wan wisa û qonaxên girîng wisa digirin dest ve mijûl dibim? Xwe hîn zêdetir tengav dikim, çima rêbazên cudatir nabînim. Divê hûn di hinek tiştan de li mukir werin û biryaran bidin. Ma hûnê vê pêk neyinin? We heta dawî rastiyek xwe dide axaftin pêş xistiye.

Rastiyên me yên berzbûnê ku dost jî, dijmin jî baş dizanin, vîna me ya siyasî û fermiyeta me heye. Êdî me ev anîne qonaxek ku dijmin jî baldar nêz dibe, vêca hûn çima baldar nêz nabin? Hûn çima çalekiyek afirandinê, kedek cewhera vî karî bidestxistinê raber nakin? Niha hedefa bingehîn a bi we re mijûlbûnê eve: "Ez ji bo çi heme, bi çi ve mijûl dibim û divê mijûlbûna min a esasî çibe?" Van ji xwe bipirsin. Divê hûn bêku taloq bikin misoger bersiva van pirsan bidin.

Eşkere bêjim, bi vî rêbazî tişta hûn bi xwe dikin, dijminê herî xurt jî li we nake. Hûn di nava şaşiyek mezin de ne. Neheqiyek mezin li vê dema dîrokî ya watedar dikin, bi bêteşebûnek mezin ve bersivê didin. Di rastiyê de ji aliyekê ve hûn dizanin ev sîûdek mezine û divê girîngiyek mezin bê dayîn. Lê hûn dihizirin vê bi bê edebiyek mezin, bê

berpirsyariyek mezin û binkeftinê bikin malen xwe. Bêku hûn baldariya vê ya mezin bi kesayeta xwe re ava bikin, keda têrkar raber bikin – gelo weke gundiyê herî çors binav bikim, an jî weke kesayeta herî tolaz û beredayî binav bikim- xwe davêjin nava derfetan û dihizirin ku wan desteser bikin. Dema hûn dibînin bi vê şêwaza nêzîkbûna xwe ve serkeftî nabin, ev kar wisa ne hêsanin, vê carê jî zêde texrîbkariyê dikin, hema bêje herêmekê yan jî nêvengekê ji holê radikin.

Şahadeta bi dehan hevalan, ji derfetên serkeftî yên pir girîng dûr mayîna we, hemû ji nêz ve bi vê şêwaza nêzîkbûna we ve girêdayî ye. Nêzîkbûna salên dawî herî zêde me hêrs bike eve. Nêzîkbûnek baldar, şiyarbûnek sînordar, xwedî li peywirên xwe derketin, bûna berdevkê rastiyan û pêdiviyên vê pêkanîn, dibe ku gelek serkeftinan jî ava bike. Bes nêzîkbûnek we ya pir bêxîret û weke ku pêdivî bi vê nîne heye. Mînakên vê hene. Kesên ku me hêza çareseriya herî bilind dayî wan, nikarin axaftinek ji rêzê bikin, bi kesekê re eleqedar nabin û civînek rêxistinê lidar naxin. Pirsgirêkek taktîkî ya dikare pir rehetî bê destgirtin û xebatek pratîkî nagire dest. Ya rastî ev heqarete, tawanek girane. Hewce dike ev kes yekser bên dadgehkirin. Lê we xiftanê vê jî peyda kiriye. Hûn bi pirsgirêkên kesayetî ve xetimîne, we xwe jî xistiye rewşek ji kembaxan kembaxtirîn nexweşiyê dijîn û wisa hewl didin bêrûtî xwe ji nav vî karî derbixin. Her wiha şerim nakin vê kesayetê jî raber dikin.

Ma kesayetên siyasî wisa dibin? Kesayetên leşkerî yek şaşiyên ji vê hêlê ve nakin. Lê ev bi we re bûye fêrbûnek. Hûn dibêjin; “Bila rêxistin vale derbikeve, bila qural pêk neyên, bila kesek xwe bixe dewsa her tiştî, ma çiye avanî bi temamî li ser maye, roj bê berhemin û vale diçin. Ma çiye derfetên me yên şer çarçûr dibin.” Her tim hûn dibêjin; “Ma çiye û tiştek nabe.” Uslubê we wisa ye. Ev kesayet bi vê nêzîkbûnê ve, bi serê xwe xeteriya herî mezine. Elbet ev tê wateya bê wijdaniyek mezin jî. Pirsgirêka we ya wijdanê ya cidî heye. Misoger dibînim ku wijdana we ber bi xirabûnek wisa ve çûye. Misoger divê em vê çareser bikin. Bi we re tiştek bi navê wijdan nemaye. Bi we re li hember nirxan, dîrokê, peywiran ne wijdan, pir xirab azweriyên takekesî yan jî qet berê xwe jî nedana wir û nêzîkbûnek devjêberdanê heye. Ya herî xirab jî, sedemên heta dawî rê ji vê re vedike bê wate ne û qet ne hewce ne. Ya rastî ger hinekê vîn, hinekê îdîa hebe û hinekê jî bikarin bêjin ezê bikim,

ev xisletên esasî yên şoreşgerî ne. Kesayeta şoreşgerî, kesayeta ku her tim dikare bêje ez bi vînim, ji rastiyê û serkeftinê re amade me.

### Wêrekbûn û Şêwaza Rast Derxistina Holê Xisleta Herî Bingehîn a Milîtane

Gelek ji we girankirina pirsgirêkan û derbasî cem Rêbertî kirin, ji xwe re kirine fêrbûnek. Gelo çi raveya evqasî girankirina pirsgirêkan heye? Niha her kes bi hev re pêşbaziyê de ye, wê çawa pirsgirêkan zêdetir giran bikin. Heta hinek mînakên wisa hene, ji bo ez pê re eleqedar bim, taybet pirsgirêkan derdixe. Ji nişkê ve dibêje bila hemû qural li aliyekê bin, hestiyariyekê dijî û xwe davêje erdê. Qaşo dê rêxistinê mijûl bike, qaşo wê deng derbixe! Kesên ku bêfihêt xwe li gorî vê eyar dikin ne kemin. Kesên wisa pirsgirêkan bêwate pêş dixin, qet nikarin di nava me de bimînin.

Di nava rêxistinê de xwe wisa ferzkirin, beriya her tiştî ji hêla exlaqî ve bêşerefiyek mezine, dîsa ji hêla siyasî ve ferzkariya herî xeter û bi temamî xirabkirina rêxistinê ye. Hemû jî tawanên giran rave dikin. Hûn weke rêbaz fêrî vê kirine. Ez dîsa ji bo pêşketinan çareyekê dibînim. Lê ezê van kesan efû nekim, mafê jiyanê nedim van kesan. Devjêberdin eleqeyek ku ew li bendê raber bikin –elbet ezê eleqedar bibim, lê divê hûn bizanin evê eleqedariyek çawa be-, dibe ku eleqe û nêzîkbûnek ku wî ji dayîkbûna wî jovan bike bê raberkirin.

Min her tim got aliyê şer ê din ji me ne kême, em bi her cure rêbazî mijûlkirin, hem jî li nêvengên herî cidî em beramber rêz digirin ev wisa kirin nêzîkbûna herî ketiye û xirabe. Bi zanebûn dilîzin. Camêr ne nexweşe, dest û milê wî neşikestîne, ti nexweşiyek fîzîkî û rihî ya cidî jî nîne. Hinek bi zanebûn quralan pêk nayînin, bi zanebûn xebatê xirab dikin û ji vê jî aciz nabin. Tişta para min dikeve, jixwe bi ser van kesan de diçim, lê divê hûn jî bi ser de biçin. Qadroyên me li ber destê kesekî digirîn û dibêjin; “Em tine bûn, dixwazin birevin.” Hûn qadro ne, beriya her tiştî rihê rastiyan distînin, lê hûn tiştekê nakin. Tawana yekemîn jî eve. Ya duyem, hûn xwe jî tînin rewşek kêrî tiştekê nayê û vê jî asayî dibînin. Ev jî tawanek mezine û mafê axaftinê nade we. Gelo mirovê peywirê, mirovê rêxistinê tê çi wateyê? Hûn fêr bûne qet xwedî li peywirên xwe dernekevin û teoriyên bûhranê bijîn. Parastin û hêcetên

vê nabin. Hûnê dev ji vê exlaqê berdin. Mirovê peywirê her kêlî ji bo peywirê ye. Hûnê vê exlaqê bidest bixin.

Ya min eleqedar dike, quralên rêxistinê û peywirên rêxistinê yên pêwîste bên serxistinin. Gelo mafê kesan heye vê vale derbixin? Hûn jî dizanin mafê kesî nîne. De başe, ger kesek bi israr xirab dike, tevî hûn sed kes li cem hevin, hûn çima hevgihîna vîna rêxistinê pêk nayînin? Kole jî ne wisa ne. Lê vê bê pîvanî û vê ketîbûnê hûn tev didin jiyîn. Hûnê çawa bersiva van bidin? Hûn weke pîremêran dibêjin; "Xwe ferz kir, ez tengav kirim, ez çewsandim. Ma ev li ser me tê gotin? Hûn milîtanên rêxistinê yên egîd û cengawerên egîdin. Hedê kîye vê dibêje? Ya rastî ev rewş bêkesayetiya xwe li ser rêxistinê ferzkirine.

Aliyê vê yê bi êş jî, hem rê ji vê re vedike, hem jî tevî ti maf û hêceta we neyî, vê di nava me de didin der. Hem li peywirên xwe xwedî dernakevin û pêdiviyên wê pêk nayînin, hem jî ev bi temamî ev rewş dana der nayê pejirandin. Ger hûn dibêjin; "Hatim xapandin, min nekarî", bila di hundurê we de bimîne. Hûn çima li ber çavên Rêbertî didin der? Ev jî nayê wê wateyê ku hûn çiqas aqilmend û fêlbazin, ya rastî diyar dike ku qadroyek di çi astê de ye. Hûn dibêjin; "Newêrim, însiyatîfa min nîne, di derbarê rewşên biqewimin de pêşbîniya min nîne, nizanim dê çi bibe?" Milîtanek van axaftinan nake. Wêrekî û însiyatîf, şêwaza rast danîna holê xisleta herî bingehîn a milîtane. Qadroyek ji bo heye. Ji bilî vê mirov nabe milîtan. Ji bilî vê mirov nabe fermandar, nexasim kesên dîrokî yên binavûdeng.

We bi van nêzîkbûnên xwe çi bidest xist? Xisletek civaka me ya kûr her tim ji we re vedibêjim: Helwestek civaka me ya girî, xwe dixapîne, her tim bi bûhranê dide der û di vê de israr dike heye û xisletên di ti civakê de neyên dîtin hene. Elbet dijmin ev ferz kirine. Jixwe PKK berovajî vê ye, rihê vê xisletê sitandiye. Me li hember vê hêrsek mezin jiyan kir û wisa rêketin. Ma dibe mirov vê di rêxistinê de bide der? Em ji bo rihê vê xisletê bistînin hene. Lê niha li PKK'ê dinêrim, dibînim naveroka wê bi van nexweşiyan dagirtine. Çend aqilmend derneketin û negotin; "Ev ne rastiya PKK'ê ye, ez rastiyê dizanim û hinekê jî dixwazim pêk bînim." Ger hûn bal bidinê, kesek wisa bi aqil dernakeve.

Elbet ev fêrbûne, evîndariya mirov a li beramberî xwe ye û ev xisletên we jî li gorî keyfa we ne. De başe berjewendiya vî halê evîndariya li beramberî xwe bêjin. Heta niha ji bilî gera aware û temenê xwe çarçûrkirinê we çi kir? Ji bilî ketina lîstoka dijmin, bêpîvanî û

bêrêziyê we çi bidest xist? Deka bêjin, we kîjan xislet bidest xist û rê ji kîjan rêzdariyê re vekir? Li civaka me binêrin: Em bi van xisletên jiyanê ve li kîjan asta cîhanê ne? Ma li cîhanê miletek ji me paşketîtir heye? Di dîrokê de miletek ku dijminê wî zextek wisa li ser pêk anî heye? Ev rastiyên bîrdozî ne. Hûnê van bizanin, zanînê jî têr nebînin, dijber derkevin. We qetiyen bi vî halê nexweşî ve napejirînim.

Min xisletek bingehîn a pêşketinê ji we re got. Min li hember vê bertek jiya û wisa rêketim. Di PKK’ê de Rêbertî bi temamî ji civakek wisa reve, îsyana li hember vê ye. Hûn çawa vê fêm nakin? Xisleta PKK’ê ya esasî heye û dimeşe eve; ger wateyek wê ya dîrokî hebe, girêdayî vê rastiyê ye. Hûn jî vê red dikin. Çiqas xisletên we yên tolaz û netebitî, nexweş ên ji civakê hatine girtin hene, hem jî di vê qonaxa dîrokî de hûn tînin û li ser min ferz dikin. Hema bêje hûn dibêjin; “Bipejirîne, li ber xwe bide, bikişîne, bibe û bimeşîne. Berê min tolaz jî, hêza tolazan jî baş dinasiya. Ditirsiyam kêleka wan re derbas bibim. Min digot ger bi wan re bigerim ezê tine bibim. Lewma min dev ji wan berda. Min şerek li gorî xwe pêş xist. Niha dibînim tolazên berê zêde bûne, bi PKK’yîbûnek sexte ve xwe biçek kirine û temamî bi ser xebatên me de dimeşin. Niha di PKK’ê de, tolaziya hevbeş an jî tolaziya objektif serê xwe girtiye dimeşe.

Weke tê zanîn tolaz û dîlawer ji axaftinan fêm nakin, ya xwe dikin û ne bi dîsîplînin, lê tiştek jî ji destê wan naye. Di destê polîsan de pêlîstokin. Di rastiyê de pir bêhêzin, ji tiştekê re nabin çare. Dikarim bêjim, mixabin tolaziya siyasî ya di PKK’ê de ti rêxistinê de nîne û hinek jî vê weke xisleta bingehîn a milîtan ferz dikin. Tolaz û berdoşên cur be cur hene. Vêca devên van jî vedibe, ango ji PKK’ê zêde hêz girtine. Ya rastî ev a herî xetere. Berdoşên li kolanan jî pir rêzdarin û ez êdî wan xeterî nabînim. Bes ên di nava PKK’ê de pir xeterin û hesabên şaş dikin. Berdoş li cihên ne hewce gengeşê derdixin, pevçûnan ava dikin. Rewşa we ya di nava rêxistinê de dişibe vê. Di cihê qet ne hewce de hûn lihev nakin û pêşxistina pevçûnan divê mirov weke nakokiya bi quralên rêxistinê re binirxîne.

Ehbap-çawişî şêwazek berdoşî û dîlaweriyê ye û li beramberî xwe rik dijî. Ev hemû jî bi we re hene. Di nava heman rêxistinê de komek rêhevalên xwe weke can-cîger dipêçe, digire cem xwe, yên din jî xistina dewsa dijmin tolazî ye, dîlaweriya kolana ye. Ti fermandarê di yekîneya xwe de komekê weke dijmin dest negire nîne. Çend xulaman jî digirin

cem xwe. Misoger ev rêxistinkirina tolaziyê ye û ti nirxa siyasî ya van pêwendiyan nîne. Keyfa we ji van nêzîkbûnan re tê. Lê ez jî dibêjim, ti qedir û qîmeta vê nîne.

Hûn xwe dispêrin hêza PKK'ê û bîrdoziya herî qirêj, kesayeta herî qirêj a civakî didin jiyîn. Tişta herî ecêb jî, girêdana we ya bi min ve, weke girêdana tolazan a bi hinek nirxan ve ye. Nêzîkbûnên we yên bi şêweya; "Bavo, em nikarin bê te bikin. Bira, xalo, tu her tiştê me yî" hene û ev jî şêweyek tolazî ya dine. Çima wisa ye? Ji ber hûn hêza xwe ya esasî ji min digirin. Ma ev çarenûseke? Ma hûn nikarin vê derbas bikin, hûnê bi vê re bimirin? Yeqîn dikim dê ev bibe xirabiya herî mezin hûn li xwe dikin. Kesên dibêjin; "Hêj çênebûyîm mirime, jiyana min ji bilî bela ne tiştek dine" hene. Ma hûnê vê piştrast bikin? Hûn bi vê sekna xwe ve ne dikarin tiştek din piştrast bikin, ne jî biselmînin. Di vê manê de muhafezekar nêz dibin. Bi vî rengî jî diselmînin ku dixwazin weke kesayetên herî bêrêxistinî, bêterbiye û bêpîvan bimînin. Ev nêzîkbûna kîye? Vaye min nav lê kir. Ma ev cureyek pevçûna başe? Hem jî ji cihê rêxistinê yê herî jiyanî dûello xwestin, ma karê aqilane? Li gorî we asayî ye, li gorî we şerê çînayetî ye, şerê desthilatî ye. Bes ev ne şerê qereçiyane jî, ev şerê ji xwe re cihek desteserkirina van cureyên tolazane.

Elbet rastî ne tenê evin. Nabêjim hûn karek din nakin û aliyên we yên cuda nînin. Ew jî hene. Lê bêku di ferqê de bin, hûn rihê xwe distînin. Tevî pir dihizirim û hewl didim ezê we çawa qane bikim, rêyek derketinê nabînim. We li ser bingeha rastiyan qanekirin û ber bi ferasetê ve kêşan, bi rastî jî bûyerek nehatî dîtine. Li gorî min hûr nezan jî, evqasî kor nêz nabin. Min ji biryargeha me re got, rêveberiya we weke rêveberiya hûr nezanan dinirxînim. Ev jî pênaseyek nû ye, rastiya rêveberiya hûr nezana ye. Gelek sifat hene, yek sifat jî wisa ye. Karan weke dibe dide diyarkirin, lê derbasî meriyetê nakin. Bêdesthilatî di hemû şaneyên wan de bicîh bûye. Min ev dahûrandin. Mînak kesê çîroka min çawa ji bêhêziyê xwe gihand hêzê nezane nîne. Lê hûn hêjî fêr nabin. Ango gelo niha divê weke mirov bi we û mejiyê we bawer bikim? Gelo em xîtabkirina mejî li aliyekê bihêlin? Gelo em encamek ku bi we re mirovbûn an jî pêşketin rawestiya ye diyar bikin? Gelo em gotina; "Ez nabim mirov" erê bikin û bêjin hûn bi temamî wisa ne?

Kurdê li gorî xwe yan jî mirovê Kurd ê li gorî we hêza wî têra tiştekê nake. Hûn jî pir baş dizanin ku, di vê manê de Kurd, niha belengaz, bêçare û binkeftiyê cîhanê ye. Lê Kurdek bikare kar bike hebe, ew jî

Kurdê ez dixwazim pêş bixime. Kesê vê nezanê jî nîne. Ger di vê qonaxê de hinekê şanaziya mirovahî ya her kesî hebe, hinekê şanaziya netewî hebe, ev jî li derdora me zindî bû. Ev pir eşkere ye. Emê çima vê esas negirin? Emê çima vê hinekê bi rêzdarî nenirxînin û bi nêzîkbûnek weke; "Ezê vê bi wêrekî bigirim dest, ev hêvî dide min, ezê xwedî li vê rastiya mezin û siûda mezin derbikevim" raber nekin? Em vê ji bo we dixwazin, ji bo xwe naxwazin. Pêdiviya we bi vê heye.

Ma hûn bi qasî zarokatiya min a danzdeh salî jî ne bihêzin? Bes me hûn pir xurt kirine. Wexta niha lê dinêrim, bi rastî jî di xala gavên destpêkê de jî dibînim ku hûn bela ne. Tiştek ji destê we naye. Tevî ku min yek gotin nedizaniya, ti ezmûnên min nebû, di derbarê mijarên civak û dewletê de ji bilî şaşwaziya min tiştek din nebû, wexta min hinek gav avêtin, pir bi pîvan, bi hevsengî û pir sekeftî bûm. Li van kesayetên we yên mezin dinêrim, hûn berovajî vê ne. Ji bilî bêjin; " Me çawa winda kir, me rêxistin çawa parçe kir" tiştek din nizanin. Ez dibêjim ku, ev tê wateya Kurdê tine bûyî. Ev tê wateya Kurdê ku her roj çil caran bin dikeve. Ev tê wateya Kurdê ku, dijmin her roj her tiştî li ser disepîne. Ma hûn dikarin vê înkar bikin? Hûnê van fêr bibin. Ev waneya destpêkê ya mirovbûnê ye. Bûna welatparêz, PKK'yîbûnê danin aliyekê, bibin mirov. Bêku xwe mijûl bikin û xiftanekê jê re bibînin, divê hûn vê biryarê rast bidin.

Rêbertî di vê mijarê de pejirandiye ku we efû bike, sererast bike û alîkariya we bike. Tenê bi şertekê: Hûnê di vê çarçovê de bibin mirov, welatparêz bin û ger pêkane bibin leşker. Niha hûn xwe leşker dihesibînin, lê ez hêjî bi leşkertiya we dikenim. Vê rewşa we ya leşkerbûnê ecêb dibînim. Hûn min bikujin, nikarim bibim leşkerê weke we. Li gorî min şêwaza hûn pêk tînin, ji şêwaza dînan xetertire û şêwazek zêdetir bêwate ye. Hûn vê jî wisa hêjayî xwe dibînin û dimeşin. Min ji ber vê ev hêza dahûrandinê ku di cîhanê de kesek nikare berpirsyariya wê raber bike, kir meriyetê. Dixwazim hinek tişt ji we re vebêjim. Li şûna hûnê wisa bikin, devjivêberdin, xwe nexapînin. Leşkertiyê danin aliyekê, civakbûna herî ji rêzê jî evqas bi nêzîkbûnên dînîtî pêş naxe. Ji bo em pêşî li dînîtiyê bigirin û hinekê jî feraset bi we re bidin avakirin, evqasî lêhûr dibim.

Bireve hema bireve, bimire hema bimire! Evê heta kengê û kuderê biçe? Ji bo me ne rev, vegera li cewher, ji bo me ne mirin vegera li jiyanê hewce ye. Wesfa yekemîn a bûna ewladê miletekî, bi navê milet

bûna rêber, vegera li jiyan û cewhere. Ger kedek me heye, ew jî ji bo xwe gihandina vê ye. Şer û leşkertî jî her tim ji bo vê amûrin. Kes fedekariya zêde ji we naxwaze. Eşkere dibêjim, girêdan, fedekarî û heta wêrekiya hûn ji bo me raber dikin jî pir zêde ye. Jixwe ez vê girêdanê xeter dibînim. Ji ber ku hûn bi vê girêdanê di rastiyê de ji neyêniyên hûn bi xwe dibêjin re dikin hêcet. Hûn dibêjin; “Ma min xwe neda ber mirinê, min heta mirina xwe, xwe neda ber yek-du karan?” Ya rastî ev xetere. Hewce nake hûn evqasî zêde xwe bidin ber mirinê yan jî feda bikin. Ev nêzîkbûn şaşe. We şaşî di vir de kiriye û bersiva wê jî bêku qet rêxistinê binase, wate bide yek quralê rêxistinê û pêdiviyên jiyana wê, weke xeteriya du serî dixwazin berdêla wê jî bi me bidin dayîn. Bi vî rengî jî şaşî kûr dibe. Ev şêwaza tevlîbûna we, hem we hem jî rêxistinê ji taqet dixe.

Min ji we re negotiye bi wêrekî wisa ber bi mirinê ve bazdin, xwe wisa feda bikin. Min got xwe weke min tevlî bikin. Min got bila tevlîbûna we li ser bingeha çil carî bipîvin, rakin-danin, dijmin baş bişopînin, derfetên xwe baş birêxistin bikin, xwe erzan ber bi mirinê ve bernedin û biparêzin be. Ma min ev ji we re negotin, şev û roj jî van nabêjim? Vêca di navbera şêwaza we û vê de ti girêdan heye? Hûn xwe erzan ber bi mirinê ve diberdin, bi ya herî erzan jiyanê dilîzin. Fedekarî, wêrekî, tevlîbûna partiyê, tevlîbûna şerê ku ezê berpirsyariya wê parve bikim, ma kêm-zêde ne zelale? Ma peywira we ya herî bingehîn ne fêrbûna vê ye û şertê jênevegere? Ev şêwaza we, bi qalibên we ji xwe re ava kirine çalekiyek heta mirinê ye yan jî xwe windakirinê temamî fedakirine. Ez vê naxwazim.

Şêwaza daxwaza min diyare. Min ev şêwaza xebata xwe ji bo keyfa xwe têr bikim raber nekir. Bi hesabên herî zirav ve, bi hestên berpirsyariya herî mezin ve, ji bo gavek şaş ne avêjim, bi pîvan rakir û danî, ji bo miletekî ber bi rizgarî ve bibim, ango ji bo ya ku di dîroka me de qet nehatiye serxistin, ser bixim, min ev kar kir. Hemû pêşketin jî xwe dispêrin vê. Lê hûn ji bo rihê van hewldanên me bistînin, dibêjin; “Min jî xwe feda kir, min jî çek rakir, min jî xwe tevlî kir” û pesnê xwe didin. Paşê jî bêku di ferqê de bin bi şêweyek sînornenas li pey heq û huquqê digerin.

### Di Lehengiyên PKK'ê De
### Pêwendiya Ku Xwe Dispêre Berjewendiyan Nîne

Min nedît ezê ferasetek berpirsyariya çawa bidim we. Dîsa zaroktiya xwe, pêwendiya min a yekemîn bi mirovan re tînim berçav; dibînim ku çiqasî bi hestiyar û berpirsyar nêz bûme. Nexasim dema em aresteyî karê partiyê bûn, berpirsyariya siyasî ya me girt û hewldana me ji bo pêşxistina vê tevgerê û partîbûnê dayî, hûnê wê hestiyariyê çawa paşçav bikin? Bêku hûn van qet fêr bibin, ma hûnê bi ferzkirina berovajî vê bibin milîtanên PKK'ê? Ev jî xirabiya herî mezin li me bê kirine. Di vê mijarê de şêwaz û hesasiyeta min lêkolîn bikin, dibe ku hûn hinekê feraset bidest bixin. Ev pîvanin, rastiyên hatine selmandin û encam girtine. Hinek tiştan fêr bibin û ger pêkane nûnertiya wê bikin. Hûn bi xwe têne cem me. Bi şêweya çavsoriya herî giran evîndarên Rêbertiyê hûnin. Nexwe hinekê wate bidin min. Ne ji bo sûd ji keramet û fezîleta şêx bigirin, ji bo hûn di karê xwe yê netewî, siyasî, rêxistinî û di vê manê de gelek xebatên din de karan çawa ber bi serkeftinê ve dibim, xwe çawa pêş dixim û çawa dibim Rêber fêr bibin, hûn tên cem me. Ez ne kesek wisa me yan jî ne ji bo mûçeyan belav bikim hûn tên cem me.

Xisletên min eşkere ne. Ez xebatkarê keda hevbeşim. Kesek yekbûnê, rêxistinbûnê çêdikim û her roj bêhempa xwe tevlî dikime. Girîngiyek mezin didim pêşketina bîrdozî û pêş dixim, kesek siyasîbûnê jî dixim meriyetê. Ger pêkane hûn jî hewl bidin bi van xisletan bijîn. Em vê ji we dixwazin. Ji bo we ti aliyê vê yê xirab nîne. Berovajî, xalên herî bingehîn hûn pêdivî pê bibînin dayîna we ye. Hûn weke fesadek gundî, koleyek gundî yan jî axayan tên cem me. Hinek jî weke mûçe ji paşa bixwazin, hinek jî ji fezîleta şêx li benda hinek tişte, hinek jî weke ji dergeha bavê xwe li benda hinek tiştan be, ango her kes hewl dide li gorî xwe eyar bike û wisa tê cem me.

Eşkereye em çiqas zanistî ne û çiqas vînek rasteqînin. Gelo hûnê rastiyê weke heyî, yan jî li gorî xeyalên xwe bigirin dest? Kîjan raste? Ma ez we weke zanist nagirim dest, heta dawî siyasî nêzî we nabim? Hema hema her gotina min ma ne li ser vî bingehî ye? Ya ji we jî hêvî dikim heman tişte. Pêwîste hûn jidil, bawermend û hewce bike dijwar bin. Ji ber ez wisa me. Çend kesên ji we jî divê ji bo vê partiyê û ji bo vî miletî bijîn. Ne wisa zêde jî, çend kes vê bikin têrê dike. Ma li qadekê

yek-du kesê serwextê berpirsyariya xwe derbikevin, dê qiyamet rabe? Nêzîkbûna; "Ez ji bo gel dijîm, ji bo partiyê dijîm", li gorî we hema bêje dibe darbeyek mezin. Ji bo vê gotinê nedin gotin, hûn çil teqleyan davêjin.

Mezinbûna min, min soz daye ku ezê ji bo vî gelî hêza jiyînê peyda bikim, ji bo hinek karên vî gelî yên dîrokî berdevkiyê bikim û li ser vî esasî bi vê ve girêdayî bim. Di encamê de ev pêşketina mezin derket holê û vî gelî baweriya xwe bi me anî. Ji ber ku dît ez girêdayî karê soza xwe me. Girêdan, weke hûn dizihirin ne xapandin û hatina xapîne. Li ser vî bingehî her kêlî rih û zanebûna xwe li gorî gel saxlem digirim, zindî dihêlim û bikar tînim. Ango kesayeta miletê me her tim di dîroka xwe de lê digeriya ev bû. Min hewl da vê duristbûnê raber bikim. Ji bilî vê ti xisleta min a din nîne. Ne bi qasî we fedekar û wêrekim, ne jî bi qasî we hinek jêhatiyên min hene. Lê bi hinek nirxên bingehîn, hinek nirxên jiyanê yên milet ve girêdayî dimînim, di wê mijarê de kesayeta xwe bi sebir digirim dest, derfetek bi qasî serê derziyê û siûdek herî biçûk jî bi hewldanek mezin dinirxînim, wisa hewl didim xwe bidim jiyîn. Heta dawî dilnizmim û hedê xwe dizanim, lewma min karî vê bikim. Her wiha weke we derfeta amade nabînim û nanirxînim. Nirxek bi qasî serê derziyê û derfetek afirand û wisa meşiyam. Me di vê mijarê de jiyan wisa girt dest. Vê di kesayeta xwe de jî pêk bînin.

Hûn li serê partî, gel û artêşê weke bela ne. Vêca hûnê çi ji xwe bikin? Hûnê kengê fêm bikin ji bo miletekî çawa tê jiyîn? Li rastiya xwe binêrin: Hûn her tim dibêjin; "Ez bi nirxan lîstim, nebûm bersiv, pêşî lê negirt, bûm amûr û ez vale derxistim." Ji bo miletekî wisa nayê jiyîn. Gotinên wisa bikaranîn jî, ji bo miletekî bêrêzî ye, heqarete. Devji vê berdin. Mirov xwe ji miletekî qût dike yan jî kena xwe bi wî miletî dike, lê ma evqas? Ma bi qasî misqalekî wijdana we nîne? Rewşa milet a bi êş, belengaz û pir ketî qet di dilê we de cîh nagire? Ma hûnê qet şêwrê bi mejiyê xwe re nekin, lêkolîn nekin û ji vê re çareyekê nebînin? Dê lêgerînek we ya wisa kengê çêbe yan jî hûn girêdana bi partiyê ve çawa dihizirin? Artêşbûnê danin aliyekê, bi xetên giştî ve ji bo milet jiyînê hûn çawa dihizirin?

Elbet nirxên we girê didin tine ne. Em lêbikolin: Ne diyare hûn bi çi ve girêdayî ne yan jî hûn li pey hinek darezên nirxên paşketî û vale derdixe yên dijmin dane we, xerîze û berjewendiyane. Ji bo gel ti nirxa van tevan nîne, ji bo kes jî ti rêzdariya wê nîne. Berovajî ev keyfên ti nirxa wan

neyî, wateya wan neyî û dendika hêjîrê jî danagrin, karên vale ne. Bendewariya gelek ji we wisa ye. Ger hinekê we bizaniya weke min bi gel ve girêdayî bimînin, hinekê ji bo gel bihiziriyan û jiyîn esas girtiba, dê rastiya we ya milîtanî gelo evqas cihê şaşiyan hebûya? Gelo evqasî bi nirxan bihata lîstin? We di bin berpirsyariya xwe de çiqas çek winda kirin, li kêleka xwe çiqas rêheval winda kirin an jî dan revandin? We rêhevalên xwe bi sedemên sivik dan revandin, xwedî li wan derneketin. We sedemên vê jî qet ji xwe nekir û ji wijdana xwe jî nepirsî.

Ez kesayeta xwe dixapîne, kesê bêpîvan û nesazkirî û zimandirêjiyê dike baş dinasim. Min hemû çîroka jiyana xwe ji we re vegot. Ger hûn vê roja min jî fêr bibûna bes bû. Ma yek ji nava we nikare xwe bîst û çar demjimêran bixe dewsa min? Ger pêkane bila hevalek ne ji bo hemû wextê xwe, bila rojekê xwe bixe dewsa min û wisa bijî. Ma dê ji vê qiyamet rabe? Ji bo we her roj wisa dijîm. Hûn jî tenê rojekê weke ji bo we dijîm dewsa min bijîn. Hûn nikarin vê hêzê raber bikin. Fêmkirina vê ne zehmete. Bihizirin gelo karê partiyê bûya dê vî hevalî çawa bijiya, xebatek ji rêzê bûya dê bersivek çawa bida. Vê tenê rojekê bikin. Bes hinde hûn xweperestin, her tişta hûn dikin, bi navê; "Ezê vî çawa ji xwe re bikim amûr, çawa bi xwe ve mijûl bikim, xwe çawa ferz bikim" de tê kirin.

Kes ji we re nabêje xwe wêran bikin, xwe înkar bikin. Kes ji we re nabêje di carekê de van xisletên xwe derbas bikin. Her çendî şaşî û nebesiyên we hebin, hûn heta mirina xwe û her kêlî bikare xwe feda bike helwestekê tevlî dikin. Ez jî di asta feraset de didim diyarkirin ku divê ev çawa be û dibêjim, êdî li vir siyaset xwe derbaskirine, fêrbûnên xwe yên jêneveger jî derbas bikin û heta kesayeta xwe ya kevin jî înkar bikin. Quralên rêxistinê bi jiyana xwe ve yan jî beşdarbûna wê ve bikar bînin. Hûnê bêjin; "Ezê zimanê rêxistinê bikar bînim, ne yê xwe." Êdî li vir "ez" dimire, rêxistin destpê dike. Rêxistin, hewldana yekbûyî ya lêhûrbûna we tevane. Helwesta yekbûnê karkirina hevbeşe, ew binpê nekirine. Ger di vê mijarê de xweperestî û paşverûtiya we hebe, ew kuştine, ger kirêtiya we hebe ew hinekê jî di xwe de tinekirine. Pêşveçûnek gelemperî pêkanîn, sifata rêxistinê bidestxistine. Ger îdîayek we ya leşkerbûnê heye, xisleta we ya herî bingehîn pêkanîna fermana ye û polîtîkaya rêxistinê ya bingehîn esasgirtine. Ev aliyê leşkerbûnê ya herî dijwar û bi dîsîplîne. Ango leşkertî ne weke hûn dihizirine, mafê hûn bikarin wê bi rik û hestên di hinavê xwe de li ser

partiyê ferz bikin nade. Ger hêza we têra tiştekê nake, ma têra xwe terbiyekirina we jî nake? Gelo hêza we têrê nake hûn ji şaşiyên hinek din re bûna amûr red bikin û bêjin ez vê nakim?

Weke tê dîtin hûn di van mijaran tevan de xeterin. Zêde eleqeya vê bi zanebûn û ezmûnê re jî nîne. Bêterbiyek li holê heye. Vê napejirînim. Kes nikare min wisa bigire dest û bikar bîne. İsrar nekin. Jixwe hûn zehmetiyê dijîn, hûnê hîn zêdetir tengav bibin. Ger hûn hîn zêdetir bi ser min de bên, wê asta min a şer bilind bibe û ezê we bipirçiqînim. Cîhan jî beramberî min tehrîkê dike, lê ji bo veguhertina we, li beramberî we sebra xwe diparêzim. Divê hûn jî wan temam nekin. Ma hûn rastiya Rêbertiyê çi dibînin? Ji bo em we pir zarok dibînin û dibêjin tiştên wisa nakin, bi ser we de nayên. Ango ne ji bo me nedîtiye û hêza me têrê nekiriye. Em naxwazin rêhevalên xwe bi zorê terbiye bikin, ji bo em di terbiyekirinê de rêbaza qanekirinê esas digirin em bi ser we de nayên. Nexwe otorîteya me pir berze. Bi qasî nehêlim di nava partiyê de kes henase bigire xwedî amadekarî me. Min di vê mijarê de xwe birêxistin kiriye. Vê rast têbigihin û werin girêdan. Em jî wisa bi we re bimeşin. Pêşî şev û roj vê fêr bibin û wisa bikevin rêzê. We dît ev kar ne li gorî we ye, wê demê sempatîzaniyê bikin. Lê ger di nava we de yên wêrek hebin, li ser vî bingehî hêza wan a pêkanê hebe û di vê çarçovê de derfetê wan ên bi min re bimeşin hebe, bila derbikevin holê. Dixwazim bi wan re bimeşim. Kesên gotin û cewhera wan wisa, hêza wan a bikare van rabike hebe, kesayetên dîrokî ne. Ev dikarin ser bixin. Ez li benda kesên wisa me. Vê kedê jî ji bo wan didim.

Dijwariya demê û asta şerê dijmin ji her hêlê ve li holê ye. Emê kengê xwe rêkûpêk bikin? Emê çi demê têbigihin dijwarbûn rêbazeke? Emê kengê bi ser karan çûyînê de vê pêk bînin? Em girêdana bi zorê naxwazin, soza bi zorê naxwazin. Divê soza we dayî û girêdana we jidil be û di her şert û merci de nirxa wê ya şer hebe. Em wisa dixwazin. Nexwe weke putan li pêşberî me nesekinin, bi tika û minetê kar nekin. Misoger pêdiviya me bi vê nîne. Qet qinyata min bi kesên wisa nîne û naxwazim bi wan re bimeşim. Kesê bi me re bimeşe wê jidil be û di her şert û mercî de girêdana mezin raber bike.

Vaye min biryardariya berxwedêriya 14'ê Tîrmehê û lehengiya wê wisa nirxand û rastî jî wisa bû. Her roj di nav PKK'ê de lehengî pêş dikeve. Wateya van jî wisa ye. Em li pey rêxistina kesên wisa ne. Ancex kesên wisa dikarin ber bi serkeftinê ve bimeşin. Kesên bi vê dilîzin, bila

yekser ji nava me derbikevin. Kesayetên bi vî rengî nikarin tiştekê bikin û nikarin xwe jî rizgar bikin. Misoger hewce dike li pêşberî min kesên xwedî seknek saxlem, wexta bi tenê dimîne, ji bo serkeftinê derfetên pir kêm dimîne, vê helwestê esas digirin hebin. Teqez divê ev baş bê têgihiştin û di her kesayetê de kêm-zêde wateya wê dakeve cewher, weke rastiyek perwerdeyê bibe xisletek kesayeta we.

Çi di hinek mijarên siyasî de dibe, çi esasên rêxistinî de dibe, dîsa çi jî di taktîkên leşkerî de dibe, heta niha we yek pirsa cidî ji min nekir. Her kêlî bi tena xwe yek alî didim, bes hûn xwe ji wê re jî venakin. Lê ez ne wisa me. Vêca asta hestiyariya min ji dijmin bipirsin, ji Emerîka bipirsin, ew şêwaza nêzîkbûnên min baş dizanin. Ecêbe, her kes vê dizane, bes hûn fêr nabin û berovajî dixin meriyetê. Hûnê kengê polîtîk bin, kengê leşker bin? Ji bilî vî şêwazî, ti rê firsendê nade. Hûn ciwanin, ji taqet neketine, zêdetir bikin. Jixwe yên min dayî we ne kemin. Hûn zarokên vî miletî yên hejar û şepirze ne û ji min zêdetir hewl didin jiyana xwe feda bikin. Ez jî rê, rêbaz û rastiya vê nîşan didim. Ji bo hûn li hember dijminê xwe bi dawiyek hoveber re rûbirû neyên, vê hesasiyet û hewldana mezin raber dikim.

Ti eleqeya we bi têgehên weke rik, hêrs, jiyan, tol, şanazî, serfirazî, îdîa û li ser piyan mayînê re nîne. Di kesayeta we de cihê têgehên weke tirs, fikar, wêrekiya rast, derfet, firsend û siûd nîne. Ma di jiyana we de cihê van têgehan nebe, hûn dikarin siyasetê bikin? Dê heyfa ciwantiya we be. Mirov evqasî bi soza xwe nalîze. Her tim hûn dibêjin; "Me piştî salan fêm kir." Elbet wexta hûn fêm jî dikin, her tiştî diqedînin. Ji we dipirsim: Ma qey milîtanbûn, mirovbûn, hêzdarî li ser lingê xwe sekin pir zehmete? Pir zehmete hûn hinekê wate û cîh bidin vê? Bi rastî jî vê mereq dikim. Ji bo min bê vê yek kêliyê jî nayê jiyîn. Ez li gorî van têgehan henase digirim û dijwar dijîm. Wexta binkeftinek cidî rû dide, xwe dixwim. Heta asta serkeftina min a heyî jî ti wateyê rave nake. Ger her kêlî serkeftinek nû berçav negirim nikarim bijîm.

Li xwe binêrin: Hûn kêleka serkeftinê re jî derbas nabin û dihizirin ku rehetî bijîn. Ez bi asta serkeftina heyî re dibêjim nabe, çawa dikarim hîn zêdetir bikim. Ez xetimandime, girê dame, asteng kirine, lewma dibêjim çawa dikarim van astengiyan derbas bikim. Me gelek ji we ji sifirê anîn van rojan. Tevî vê hêjî dibêjim wisa nabe û hema xwe dixwim. Derûniya min wisa ye. Vêca li xwe binêrin: Weke tiştek nîne rehet dijîn û xwe davêjin erdê. Hêza we ya li ber xwe dayînê nîne yan jî weke patpatkê xwe

diteqînin û dibêjin; "Di kur de zirave bila ji wir biqete." Ser guhê xwe re davêjin. Serkeftina mezin danin aliyekê, hûn nikarin hêza serkeftinek ji rêzê jî raber bikin. Ya herî girîng jî, van serkeftinan ne weke şêwazek jiyanê, bi şêweya bûyerên li ser razin û çend rojan pê rizgar bikin dinirxînin.

Ji we re dibêjim: Em dev ji rizgarkirina çend rojan berdin, heta ku ev serkeftin nebê malê milet, hemû partî bi vî teşeyî dijwar nedin axaftin, nikarim bêhnekê bigirim û sebra min ji tiştekî re nîne. Şêwaz eve, fêrbûn eve. Hûnê çima vê fêm nekin? Ya rastî nêzîkbûna piraniya we jî dide windakirin. Di encamê de bi we re xwe bi serkeftinê ve girêdan nîne. Ger çend serkeftinên we çêbin –ev çiqasî mafê we ye, ew jî ne diyare-, hûn dihizirin xwe sipartina wê ve bikarin bijîn. Ti eleqeya vê bi rastiya Rêbertî û rihê Rêbertî re nîne. Lêkolîn bikin me ev derfetên rêxistinkirinê çawa ji sifirê afirandin û ev di hemû pêvajoyên jiyana me de çawa hatine destgirtin û bi xwe re muqayese bikin.

Rêbertî, ne bûyerek kesî ye. Ger dê ev milet rizgar bibe û bijî, êdî aliyek dîroka wê ya li ser lingan bimîne mabe, di derbarê pêşerojê de hêviyek wê mabe, Rêbertî eve û ez jî berdevkê vê me. Wê hinekê digihînim raman û ziman, hewl bidim birêxistin bikim. Berê zimanê we nebû, ti hêviya we nebû û ne di ferqa tiştekê de bûn. Niha jî, vîn, hêvî, çek, ziman û heta nanê we heye. Van biçûk nebînin. Ez hêjî li pey nanê tisî dibezim. Ango van erzan nagirim dest, ji ber pir baş girêdana wê ya bi kedê re dizanim. Hêjî li pey hestên xweşik û fikrên xweşik de me. Pir dizanim, dê ev çawa bi şerek dijwar bên bidestxistin. Ji bo min fikrê rast pir girînge. Niha em qederek bergên tije rastiyan dixin destê we, ya herî xweşik, astên mirov pê hestiyar bibe û zemînan pêşkêşî we dikin. Mirov li vir baştir hestewar dibe, baştir dihizire û ev jî bûne derfetê şerên mezin. Ev pir girîngin. Ji ber berê zimanê me nebû, du fikrên rast nebû. Her tişt bêrêzî bû, kesî ne dixwest hevdu fêm bike. Nexasim di destê we de qet çek nebûn. Hûn çawa van ji bîr dikin?

Berê çend mirovên me, xwîşk û bira jî di navê de, ne dikariyan jidil bên cem hevdu. Ma ev hemû ji bo we hêsan û jixweber çêbûn? Na, min şerê van meşand. Ji bo di plana netewî û siyasî de yek-du peyvên rast bibînim, min kedek mezin da. Heta hinek vê têr jî nabînin. Lê li dîroka xwe û paşeroja xwe binêrin, fêm bikin hûn çawa ne û li gorî wê wate bidin pîvanên heq û edaletê. Tevî we ti tevkarî nekiriye, ya heyî jî têr nabînin. Vê bêrêziyê rawestînin. Eşkere vedibêjim: Bavê we demanceyek

xwe çawa girê dida? Ew dizîve vedişart. Vêca we çi li çekan kir? Bavê we ji bo pariyek nanê tisi çawa xwêdan dirijand, çawa dixwar û vedixwar? Vêca li xwe binêrin çawa nêzî nirxên rêxistinê dibin. Pêwîste mirov rastiya xwe înkar neke. Kêmek maye, dê xwe ber bi bandora hinek nirxên PKK'ê ve berdin û me binpê bikin. Lê di rastiyê de em nebin dê birçî bimînin, em nebin wê di bîst û çar demjimêran de her tişt ji dest wan derbikeve. Di vê astê de çavsorî pêş ketiye. Ma mirov evqasî xwe winda dike?

Ji bo ez li vir gavek şaş ne avêjim, bi salane çepera xwe digirim. Ji bo em we bidin jiyîn, çiqas li pey berpirsyariyên mezin, hesasiyetên mezinim. Çiyayên azadiyê li bin lingê we tevane. Mixabin hûn nikarin bi zanebûna wateya wê rojekê jî rast derbas bikin. Li gorî we her tişt jixweber çêbûye. Na, me ev pêk anî. Ancex hûn vê bêwate dikin. Ma evqas mesrefa zêde ji ber xwe çêbû? Devjêberdin xwe gihandina welatên din, ma xwe gihandina welatê xwe pirsgirêkek hêsane? Ev bûyerek mezine. Wexta ji aliyê hinek kesan ve li ser wate û girîngiya nirxan sextekarî tê pêşxistin, we jî li wan temaşe kiriye û wisa fêr bûne.

Niha di nava we de kesê di pileya yekemîn de xwedî biryar û azad tevdigere ezim. Lê bal bidinê: Ez çawa ji ber berpirsyariyên xwe pêşve diçim? Ji bo şaşiyê nekim, nirxan çarçûr nekim, çi, çawa digirim dest? Ev girîngin û divê hinekê ev ji bo we jî derbasdar bin. Hûn hema dibêjin; "Ez û ez." Bes di vê de ti qîmet nîne. Ji bilî xirabkirina jiyana xwe çi nirxa vê heye? Ti naveroka wê ya we bide jiyîn nîne. Tenê axaftina ziwa û rikek kor a vê hebûnê heye. Ne ji bo li ser yek ji we ferz bikim van vedibêjim. Jixwe di jiyana me de cihê vê nîne. Ji bo hûn xwe pir xeternak li ser me ferz nekin, hêjî vî şerî pêş dixim û di nava partiyê de ferzkariyên wisa bêwate napejirînim. Ger hûn nikarin vê rabikin, qet nebê ferzkariya xirab danin aliyekê.

Bi salane kesên îdîayên wan hebin bêjin; "Ez dixwazim erênî beşdar bibim, misoger ezê nelîzim, ezê rêxistinê bi nexweşiyên xwe ve mijûl nekim", xisleta tevlîbûna rast didim wan. Li cem me tevlîbûn bi dilxwazî ye, ne zoraki. Lê kesên soza vê dayîn, biryara vê dayîn, êdî divê nêzîkbûna xwe ji vê sozê re ne bi şêweya; "Vê carê jî ji mine", bila bi tevlîbûnek radîqal û rast bersivê bide, ez pir girîngiyê didim vê. Naxwazim rêhevalan tengav bikim. Ya herî xirab bi rêhevalan re pevçûnên wisa jiyîne. Vê jî li ser me ferz nekin.

Ez artêşa koleyan, artêşa burjuva yan jî artêşa xanedanan saz nakim. Bi belavkirina berjewendiyan ve em li derdora xwe yekîtiyê saz nakin. Di şêwaza min de bi temamî wate dayîna rastiyên jiyanî, -ev ji bo miletekê dibin, ji bo partiyekê dibin yan jî di kesayeta yekî de dibe- ev tam weke karek bawerî, karek îmanê, karek hostatî, karek hunerî girtina dest heye. Di vê tevlîbûnê de ji vê rêyê acizbûn, westandin, li pey mafên takekesî û huquqê bazdan nîne. Li vir tenê dikare behsa serkeftina armanca pê ve girêdayî û maf û huquqa li ser vî bingehî bê kirin. Ev jî tenê ji bo hîn zêdetir xizmetkirinê ye. Ger evê milet vejîne, ber bi rizgariyê ve bibe, ev şêwaz çareya yekane ye.

Tişteke min xelat bidim kesî nîne. Ango berjewendî pêşkêşî kesî nakim. Bi vê jî bawer nakim. Tişta pê bawerim bi rêhevalan re armancên mezin parvekirin, nêzîkbûna pêkanîna rastiya hêza mezine. Ev jî her tim bi jêhatî û baweriya mirov pêk tê. Di zimanê me de pêwendiyek girêdayî berjewendiyên beramberî hev nîne. Jixwe di lehengiyên PKK'ê de cîh ji vê re nîne. Di PKK'ê de ji bo armanc mînakên fedekarî û wêrekiyên bêsînor hatine raberkirin. Elbet ev jî weke gelek ji we dike ne bi koranî, zanebûn, di cîh de û wextê de tê kirin. Wexta **Xeyrî'**yan xwe ji bo jiyana herî mezin dan razandin, ezê nebêjim mirin, -em ji vê re dibêjin jiyana mezin-, dîsa herî dawî **Zeynep Kinaci'**yan xwe li gorî xwe ji jiyana pir mezin re da razandin, -ezê ji vê re nebêjim xwe teqandina bêhempa-zanebûn û biryar pir di cîh de bû, pêkan jî pir bêhempa bû. Wexta em behsa wêrekî û fedekariya bêsînor dikin, em behsa van dikin. Ango kesên ku wexta bêhna wan teng dibin û xwekujer diçin, ne ji me ne.

PKK'yîbûna rasteqîn, PKK'yîbûna vejîndar, PKK'yîbûna rizgarvan wisa ye. Hûn niha bi vê re şer dikin. Ji vê xirabûnê dixwazin û ez jî misoger napejirînim. Êdî hûnê vê fêm bikin. Ji fêmkirinê jî wêdetir, ger hûn behsa PKK'yîbûn û tevlîbûnek rasteqîn dikin, hûnê her kêlî bi ronakbîriyek zanebûn a zelal û xelek jidil ve girêdayî bin, qet firsendê nedin xeflet û nexasim minafiqtiyê. Ger hûn berendamê fermandariyê bin, hûnê her kêlî ji raberkirina kesayetek şêwaza êrîş û şer fermanê dide re amade xwedî helwestekê bin. Cewhera tevlîbûnê wisa ye. Hûnê vê fêm bikin. Di PKK'yîbûna rasteqîn de mafê ti kesî nîne bi nexweşiyan tevlî bibe û rêxistin bi xwe ve mijûl bike.

We dît ev hêza me jî nîne, wê demê li kêlekê rawestin, bibin sempatîzanek û vî karî ji lehengan re bihêlin. Me ev derxistin holê, ev kesayet cîh digirin. Ev serkeftinên herî mezin ên Rêbertiyê ne. Rêya vê

hatiye vekirin û vê asteng nekin. Her kes nabe leheng. Ev ji bo miletekî destkeftiyên mezinin, li hember van rêzdar bin. Ger hêza we ya tevlîbûna rast nîne, dua bikin, ev jî bese. Ev nirxên pîrozin, ger hûn dihizirin ev bê xwedî ne, hûn xwe dixapînin. Ger bi minafiqtî, xwe veşartinê ve dihizirin hûnê bikarin li ser van nirxan bijîn, hûn xwe dixapînin. Bi rastî jî ev girane û nayê efûkirin. Min her tim ev got: Ez beriya her tiştî berdevk û parazvanê van nirxa me. Ma hûnê wisa li ber çavan van nirxan bi min bidin binpêkirin? Ger hûn dibêjin; "Ez jî ji vî karî re amade me", nexwe pêdiviyên rastiyan li holê ne.

Li hember van nirxan bêxemî raberkirin, îman nekirin û nemezinbûn tê çi wateyê? Hûn dikarin vê bi çi biparêzin? Ger evqasî îman bi we re heye, hûn dibêjin; "Ez ji vî karî re amade me, wijdanê min van kiryarên dijmin napejirîne, ezê jî pêşberî van lehengan hewcedariyên girêdana xwe pêk bînim" û durist bin, wê demê pirsgirêk dernakeve. Êdî divê ji xalên em hewl didin saxlem bên fêmkirin sozek we hebe û her tim dibêjim bila destpêkirinek we ya saxlem çêbe. Çi dikare vê asteng bike? Ger şerê taybet ê dijmin ferz dike vê asteng bike, herî zêde dê we ber bi binkeftinê ve bibe û we bikuje. Ez ji vê re tiştekê nabêjim. Şere, dibe ku pêşketinên wisa rû bidin. Ger we hewcedariyên têkoşînê pêk ne anîbin, dibe ku binkeftin jî çêbin. Kes behsa serkeftina teqez nake. Serkeftina teqez gengaze; Lê ne her kes, çend kes dikarin hewcedariyên vê pêk bînin. Sedema vê jî kêmbûna zanebûn an jî kêmaniya ezmûnê ye. Ji vê re jî tiştekê nabêjim. Dibe ku em tev jî di vê mijarê de nebesiyan bijîn. Lê ya nayê pejirandin, pir hatî nîqaşkirin, xwe gihandî hêzê û xalên hatine pejirandin hêjî bi sedemên zehmet ve hewcedariyên wê nepêkanîn û di vê xalê de ji hinekan re bûna amûre, lihevkirine. Hûnê vê nekin. Hûn nikarin vê bi ti hêcetî û xisleta xwe ya kesayetî ve bi hêcet diyar bikin.

Em nikarin evqasî li hemberî xwe bêrêz bin. Ya divê hûn bikin berzbûna Rêbertî, partîbûn û leşkerbûne. Li ser vî bingehî rêzdarî hêjayî xwe dîtin, tenezilî bi nakokiyên hewcedariyên wê re nekirin û rê nedana wane. Ev jî tê wateya çavdêriya armancên xwe kirin, armancên xwe binpê nekirin, di şaşiyan de ne israrkirin, firsend nedana wan, xwe li ber bayê fikar û gumanan neberdane. Pêwîste her tim gumanên rêxistinî esas bên girtin û ji bo serkeftina vê her tiştê xwe dane holê. Pêwîste ziman weke bilbilan bidin axaftin, ew weke şûr danin holê û dema hewce kir bikarin bêjin; "Ezê bi xwe hemû peywiran bigirim ser xwe."

Wexta min dît kes xwedî li van karê milet derneket, min jî wisa kir. Mixabin mirovek pir lewaz bûm. Lê min dît, divê hinek kes xwedî li van karan derbikevin. Min pir xwest hinek din xwedî lê derbikevin. Heta min ev ji we tevan hêvî dikir. Ji hemû mezinan hêvî dikir. Lê belê min dît ku kêleka vî karî re jî derbas nabin û niha jî min ev kar girtiye ser milê xwe. Hem jî bi qasî hêz bidim we tevan, di zanebûna berpirsyariyên xwe de min girt. Ev milet jî, tevî miletê herî zêde di zehmetiyê de ye, bi azwerî û xiroşek mezin dibêje; "Tu vî karî dimeşînî." Bêku tengaviyek herî biçûk bijî beşdarî têkoşînê dibe. Ji ber em gernasê sonda xwe ne. Emê vê esas bigirin.

Ma ez qet dibêjim westiyam û ji taqet ketime? Gelo we dîtiye ji ber van min dev ji karek herî biçûk jî berdayî? Ji bo we jî ya hewce ya herî bingehîn, jêneveger, jiyanî û hatî windakirin, her tiştê me bi me bide bidestxistin ev xisletên Rêberî yên bingehînin. Devjêberdin em ji bilî vê bi rêyek din ber bi rizgariyê ve biçin, pir eşkere dibînim ku em nikarin li pêşiya têkçûnê jî bigirin. Li ser vî bingehî ya herî hêja û bi rastî jî ji ya bi hewldanek bêhempa ve hatî serxistin re, siûda dîrokî ya mezin bi nirxandinek bêhempa ve û bi şêweyek bi vê neyê lîstin bersivê bidin. Serkeftina vê bi qasî siûdek mezin, weke derfetek mezin jî binirxînin. Bizanin û bawer bikin jiyan ancex bi vê tê destxistin û ji bilî vê ti rêyek din negengaze, wisa tevlî bibin. Bang dikim hûn nirxek mezin bidin vê û nêzîkbûnên nirxdar kêm nekin wisa bi ser xebatê de biçin û ser bixin.

Ma pêkane mirov ji vê mezintirîn başiyê li we bike? Ma ji bilî vê bi rêyek din rizgariyek hevbeş gengaze? Heta milet rizgar nebe, negengaze rizgariya kes pêk were û hûn bibin xwedî jiyanek serbilind. Emê çima kena xwe bi rastiyan bikin, çima çavên xwe kor bikin? Ez hemû hêza xwe ji vê helwestê digirim û ev xwe gihandiye serkeftina herî mezin. Vêca hûnê çima beşdar nebin, çima beşdarbûnê nêzî nirxdariyê nekin? Hûnê çima ji kesayeta serkeftina mezin birevin? Ma ti hêceta vê dibe? Nexwe vê tevlîbûna ji pir aliyan ve hatiye selmandin, derketiye zanebûnê û xwe gihandî îmanê teqez di kesayeta xwe de pêk bînin. Hêjayî vê bin û hûnê bêjin; "Bila serkeftinek jî ji min be."

**19 Tîrmeh 1996**

## ÇAVKANIYA JIYANA PAŞVERÛ BÎRDOZIYÊN PAŞVERÛ NE

Nirxandinên hûrûkûr ên we tevan eleqedar dikin tên pêşxistin. Bes hûn rûyê xwe yê rasteqîn nadin der. Ji bo rastiya xwe derxistina holê wêrekî û baweriya we têrê nake. Hûn bi vê rewşa xwe ve zêde nikarin pêşeroja xwe bizanin û plan bikin. Êdî divê baweriya we li hember we pêş bikeve. Têgehek mîna mafê jiyanê dayîn heye. Li gorî vê têgehê divê hûn çareyekê ji jiyana xwe re bibînin. Evqasî pûçkirina mafê jiyana xwe û sîûda jiyana xwe em windahiyek mezin dinirxînin. Li gorî ezmûnên xwe dikarim bêjim, sîûda jiyanê rast nirxandin, dibe ku ya herî baş û nayê payîn xwe bigihîniyê bi we bide bidestxistin. Pirsgirêka we ya herî bingehîn jiyana xwe rast nirxandine. Hûn sîûda jiyana xwe di radeyek berz de bi sedem û armancên erzan pûç dikin. Ev jî encama koletiyê ye. Bi mirovan re li hemberî xwe bêbawerî û bêqinyatî avakirin, armanca polîtîk a hêzên serdeste. Ev armanc jî li ser we hatiye pêşxistin.

Her çendî ev rewş bi ferasetek çarenûsî jî bê nirxandin, ji sedî salan ve xwe bi temamî ji bandora çanda zexta serdestiya hatî bicîhkirin nerizgarkirine. Me dide hizirandin ku hûn çima vê çanda koletiyê naşkînin. Weke tê dîtin ev kesayet bi ya herî kêm têr dibe, di raveya xwe ya polîtîk û rêxistinî de weke we têrbûn nêzîkbûne. Xwe bi ya herî kêm têrkirin gundî û karkerê di bin serdestiyê de rave dike. Hûn jî weke rastiyek vê rave dikin. Hişmendî heman hişmendiye, biryar heman biryare. Pêwîste mirov çavkaniya binkeftina we li vir bigere. Lewma heta hûn dibin ê xwe û bi qasî dixwazin bi dest bixin divê têkoşîna çînayetî û têkoşîna azadiyê xurt bikin, ev jî cewhera karê em weke têkoşîna bîrdozî binav dikine.

Têkoşîna bîrdozî, têkoşîna mirov xwe xurtkirinê ye. We ev têkoşîna bîrdozî ne dahûrandiye. Dev ji têkoşîna bîrdozî berdin, hûn tevlî çarçoveya polîtîk an jî rêxistinî jî nabin. Ev rewş jî pir xirabe. Hûn xwe weke gundiyek belengaz an jî ewareyek weke qawêrê dizivire derdikevin holê. Kesayetek we ya hatî dagirtin, plankirî û sazbûyî nîne. Hûn zêde nikarin bi vê maf û sîûda jiyana xwe bikar bînin. Ez hewl didim vê ji we re vebêjim. Hûn dixwazin bijîn, ancex em dev ji jiyanê

berdin, hêj hûn ne di ferqê de ne mafê jiyanê çiye. Bes her tişt jî li derdora vê saz dibe. Zêde gazinc, zêde xwe xapandin, dê bibe navê temenek dirêj û wisa xilas bibe. Têkoşîna bîrdozî têkoşîna bingehîne û heta ev neyê çareserkirin hûnê di hemû jiyana xwe de mehkum bibin. Di bin serdestiya bîrdoziyên cuda de jiyînê ve yan jî bi şêweyek bê bîrdozî hûn nikarin bigihin ti cihî.

Di çavkaniya hemû şaşiyên we de nebesiya bîrdozî heye. Serkeftina bîrdozî, zafera bîrdozî maka hemû serkeftina ye. Hûn velvele û fikarek mezin a bîrdozî dijîn. Ev velvele û fikara bîrdozî çiye? Di rastiyê de zelalbûn û karbidestiya bîrdozî destpêka azadbûnê ye, biryara jiyana azade û baweriya jiyana azade. Ger di vê mijarê de hevgirtinek we hebe, li gorî min negengaze hûn evqasî velveleyê bijîn. Ger hêjî hûn di polîtîka û rêxistiniyê de evqasî velveleyê, heta nebesiyê dijîn, misoger bîrdoziya we yan bi şêweya bermahiyên serdestiyê ne yan jî we rewşa bêbîrdoziyek kûr derbas nekiriye. Mirovek bêbîrdozî weke kesê bêhedef, bêpusula û bêçepere. Nikare bimeşe, ger bimeşe jî meşa wî jixwebere, nesazkirî û bêplane. Bîrdozî ne tenê di asta fikir de hinek tişt têgihiştin an jî fêmkirina hinek rastiyane. Bîrdozî esasî biryara jiyana azade, di mijara jiyana azad de zelalbûn û misogerî ye. Mixabin ev bi we re nîne yan jî hebe lewaze.

Di radeyek berz de di bin bandora jiyana ji aliyê serdestan ve tê ferzkirin de jiyîn, tê wateya bê dilşadiya ew ferz dikin jiyîne û di bin bandora bîrdoziya wan de jiyîne. Di vê manê de hûn bi temamî weke kesê birîndar û hatî mehkumkirî ne. Kesê ku nekare sîûda jiyanê di asta herî berz de azad plan bike, misoger di bin bandora bîrdoziyên cuda de ye yan jî di bin vîn û biryara serdestên xwe de ye. Êdî divê hûn vê fêm bikin. Hûn nikarin di bin bandora her cure bîrdoziyên serdest de jiyînê weke çarenûsekê bidin pêş me. Hûn nikarin ji bo vê jî partiyê bikar bînin. Nabe ku ev weke azadî, mafê jiyanê yan jî mafê kes bê nirxandin û daxwazek wisa jî bikin. Ji ber di bin bandora bîrdoziyên cuda de jiyîn bêmafiya herî mezine.

Di vê mijarê de ezmûnên min hene. Ji bo sazkirina zelaliya bîrdozî, tê bîra min, min çiqas sal xwe di nava şerek mezin de girt. Em ji lêgerîna ol bigirin heta lêgerîna felsefeyê û paşê jî lêgerînên bîrdozî û siyasî ji bo xwe qane bikim min ewqas salên xwe da. Min salên xwe yên herî bi êş û jan di van salên têkoşînê de jiya. Min ji bo vê ewqas sal xerc kirin û ev lêgerîn hêjî didome. Di mijara xweza û civakê de kesê ku ne

xwedî ramanek saxlem be û ne xwedî ramanê rêxistinê be çalekiyek wî ya rast jî çênabe. Çalekiya wî hebe jî tenê dê weke ya we be. Ger hûn her tim ji ber şêwaza çalekiyekê winda dikin û didin windakirin, hûn li wir ji hêla objektif ve xwedî seknek tinekirinê ne û tê wateya hûn weke sîxurekî ne.

Hûn dibêjin ku jiyanê dipejirînin. Bes zanebûn û vîna azadiya ku ji bo jiyînê hewce çiqas bi we re heye? Li vir durûtiyek û xwe xapandinek heye. Ji bo derfeta azadiyê bidest bixin, pêwîste hûn maf, sîûda azadiyê û sîûda jiyanê baş fêm bikin. Tişta ku gelek ji we ji mafê kes û jiyanê fêm dike, xerckirina pir erzan a rojane hem bêje bi qasî duxana cixareyê ye yan jî xwe bi tiştên pir bê wate têrkirine, lewma bi vê kesayetê jî tiştek nayê qedandin. Ger kesek li pey jiyana heyberî ya kesî yan jî têrkirina xerîzeyên xwe baz dide û wexta firsendê jî dibîne xwe bi van digire, ti xêr ji vî kesî naye. Dê ev kes her tim li pey xerîzeyan be û her ku wan têr bike kesek wisa ye dê bêje; "Ox, min jiyan kir." Ev xwe xistina nav bîrdoziya koletî û bîrdoziya paşverûtiyê ye. Hûn jî vê hûrûkûr dijîn. Ez li eleqeya we ya li hember kêliyek jiyanê dinêrim û vê yekser dibînim. Hema bêje bîrdoziya paşverûtiyê ji her derê we tevan re dibişkive.

Di gelek bîrdoziyên olî yên girîng de derwêş û mumîn bi salan şerê îmanê, şerê zikir û fikir dimeşînin wisa xwe digihandin lutkeyan. Ev hewldan tev ji bo bidestxistina wesfdariya bîrdozî bûn. Di salên dawî de hema bêje li nav PKK'ê reva ji bîrdozî bûye fêrbûnek. Nexasim li qadên pratîkî yên şer di radeyek mezin de ji bîrdozî rev tê jiyîn. Ev tê çi wateyê? Ev reva ji raman û bîrdoziya azadiyê ber bi heywanbûnê, paşverûtiyê ve dibe û dibe qûtbûn. Jixwe daneyên revên ji bîrdoziyê paşê bi şêweyek rewşên xayînên herî xurt jî nekarin bikin derdikeve pêşberî me. Elbet ev jî pir xetere. Lewma di vê manê de me gêrîla weke xebatek bîrdozî ya herî lêhûrbûyî nirxand. Gêrîla, yekîneyên jiyana azad ên lêhûrbûyî ne. Ancex berovajî vê hat pêkan. Di encamê de ger hewldanên bêhempa nebûna, tenê di nava pêvajoya salekê de dê gêrîla bihata xirabkirin û ev jî bes bû deh PKK'yî tine bike.

Hûnê van jî fêm bikin. Hinekê jî xwedî hestên berpirsyarî bin, wêrekî pirsgirêkên we ava kirine çine bixin rojeva xwe nîqaş bikin û dahûrînin. Hûn pîsiyên xwe yên bi qasî çiyan datînin pêşiya me û dibêjin çareser bikin. Ma qet hûn ji vê rewşê fihêt nakin, ji vê natirsin? Evqas paşverûtî di nava partiyê de belavkirin û li serê partiyê bûna bela ve, gelo hûn

difikirin ji berpirsyariyê rizgar bibin? Gelo ji bo vê her cure fêlbaziya gundîtî, her cure dest nedana kesayet an jî di seriyekê de îxanet, di seriyê din de ferzkirina mirinê rêya xilasbûnê ye? Ma ev namûsbûn û şerefe? Ma ev we ber bi serkeftinê ve dibe? Hûnê lez dev ji van helwestan berdin.

### Têkoşîna Bîrdozî
### Cewhera Hemû Xebatane

Dikim-nakim we fêm nakim. Bandora kolekirinê ya di bin serdestiya dijmin de fêm dikim, lê belê vê rewşa ferzkariya we ya di nêvengek evqasî azad de fêm nakim. Evqas paşverûtiyê fêm nakim. Ev rewşek kembaxe. Di mijarên armancên xwe de, di mijara xisletên şerê xwe de evqasî bêberpirsyar tevgerîn bi sîxurtiyê re yeksane. Hûn çiqas bixwazin xwe veşêrin, ji bilî vê hûn nikarin xwe rave bikin. Hemû çeka we tawanên xwe li derdora xwe belavkirin, avêtina ser filan û bêvane. Rik û hêrsek we heye, ancex ew jî ji zanebûnê dûre. Hûn xwe terkî bêçaretiyê dikin, ev jî asta koletiya herî paşketî ye. Êdî dev ji vê berdin. Aliyê mirovê Kurd ê herî lewaz, rê ji her cure bandora neyêniyan re vedike. Ji ber vê ew ji miletbûnê hatiye dûrxistin. Ji her cure bandoran re vekirîbûn, tê wateya windakirina di zemîna bîrdozî de ye. Mirovê Kurd anîne rewşek ku ji xweza, civak, netewbûn, rêhevaltî û hêzê tiştekê fêm nake. Ev rewş jî, bandora parçebûna ku serdestiya dijmin pir kûr ferz dike. Lewma ti wateya wê nîne ku em jî vê weke çarenûs an jî xisleteke bi xwe re bidin jiyîn.

Bêrêxistinîbûn û zêde polîtîk nebûn, tê wateya pejirandina kesayeta di bin bandora dijmin de parçe bûyî. Di vê manê de partî, tê wateya yekîtiya bîrdozî ya parçebûna bîrdozî ji holê radike. Hûn bi van paşverûtiyên xwe ve partiyê nezantî û niyazbaş bi navê dijmin parçe dikin. Ez rastiyan û ezmûnên xwe ji we re vedibêjim. Ger zelalbûna min a bîrdozî nebûya, min nedikariya gavekê jî bavêjim. Lê hûn ya xwe dikin. Weke kesek bi salan pêvajoyên vî karî yên dijwar re derbas bûyî, eşkere ji we re vedibêjim: Mirovê xwe qane nekirî, xwe li gorî azadiyê û nirxên wê yên bingehîn amade nekirî, her tim di bin bandora bîrdoziya dijmin de ye û di encamê de ji hêla objektif ve sîxurtiya wî dike.

Hûn pir rehetin, bi asta xwe ya heyî re rehetî têr dibin. Nexasim bi esasên bîrdoziya partiyê lîstin xweşa we diçe. Eşkere bêjim, ev rewşa we, sîxurtiya objektîf a bi we re pir bibandore. Çawa hûn nêvengekê dibînin xerizeyên xwe yên çînayetî û malbatî bêtirs û bêfihêt dijîn an jî weke seriyek vê ya din belengaz jiyînê ji xwe re weke rêya berjewendiyê dibînin. Ev jî pir ketîbûne. Êdî divê hûn bipejirînin ku terbiye bibin. Mirovê ku her tiştê xwe winda kirî dema evqas belengaziyê, evqas bê asobûnê û bê îdîayê dijî, herî kêm bi qasî çavsoriyê xeternake. Van di bin navê helwest de li ser partiyê fez nekin. Êdî devjêberdin, van li ser pêwendiyan ferz nekin.

Hûn xwe pir fêlbaz dibînin, bes ne wisa ne. Em rojane bi hezaran kesî ve mijûl dibin. Ger em wan di halê wan de berdin û bi destê wan negirin, yek peyva azadiyê ji devên wan dernakeve. Divê mirov hinekê rasteqîn be. We xwe di astek bilind de bi derewan daye bawerkirin. Hûn hewl didin rastiya xwe bi derewên dijwar û israran ser veşêrin. Her wiha vê li ser min jî ferz dikin. Ger vê bipejirînim, daqurtînim an jî xirab bikim, tê wateya binkeftina bîrdozî ya herî girîng. Paşê jî wê partî ber bi rastgiriyê ve biherike. Bal bidinê, xebata herî bingehîn ez di PKK’ê de dikim, meşandina têkoşînek bîrdozî ya pir dijware. Em li vir tenê têkoşîna bîrdozî dimeşînin. Li qada em lê ne nêvenga em xebata polîtîk a saxlem jî bikin nîne. Lê hûn dibînin, hêza herî mezin çavkaniya xwe ji vê têkoşîna bîrdozî digire.

Ev têkoşîna bîrdozî ya ez li vî cihê teng dimeşînim, yekbûna herî mezin a dîrokî derxistiye holê. Tevî evqas ferzkariyên we, nexwe têkoşîna bîrdozî biçûk nayê dîtin û cewhera hemû karî ye. Hûn bîrdoziyê pir biçûk dibînin, ji civînek cidî direvin. Xîreta we nîne yekîneya xwe bigihînin hêza bîrdozî, heta vê hewce jî nabînin. Vêca li rewşa nav gêrîla binêrin: Ev tê çi wateyê? Tê wateya derî heta dawî ji binkeftinê re vekirine. Kesê helwesta bîrdozî dijwar raber neke, ti gavên pratîkî ber bi encamê ve nabe.

Têkoşîna bîrdozî şerek zehmete, şerê kes xwe bi xwe bike mirove. Şerê xwe ji nû ve avakirinê ye. Zehmete, lê çareyek din jî nîne. Çareya cuda jî tê vê wateyê: Nêzîkbûnên dibêjin; “Bihêle weke koleyan bijîm, weke gundiyan bijîm, bihêle bi rêbazên hezar zimandirêjiya wê burjuvaziya mezin ve bijîm. Bihêle weke dixwazim xwe ferz bikim.” Ma ev rastin? Hûn tenê dikarin xwe bi van bidin jiyîn, lê nikarin partiyê bidin jiyîn. Partî jî nekare bijî, ma tiştek bi navê ‘te’ dimîne? Bila di vê

mijarê de wijdana we hebe, bi rastî jî baweriya xwe bi pêdiviyên vî karî bînin û pêkanîna van jî bipejirînin.

Ez şaşwazim. Gelo hûn sekna xwe ya li PKK'ê dizanin an jî ji wê jî wêdetir êrîşên we li hember kî ne? Ma hûn dînin? Ma mirov wisa di nava partiyê de dimîne? Eşkere ye, sekna we zêde xizmetê ji yekbûnê re nake û we zêde ber bi wesfdariyê ve nabe. Heta ku hûn vê rewşa xwe nenirxînin, çawa dikarin xwe qadroyên PKK'ê bibînin? Bi paşverûtî yan jî bêhişiya xwe ya bîrdozî ve hûn dibêjin; "Werin, me bidin jiyîn." Ev jî xisletên civaka Kurd a herî qediyayî û tine bûyî li ser me ferzkirine. Ez hewl didim şer rast binav bikim. Her kes dikare xwe ber bi xerîzeyên jiyana erzan ve berde, ev qet ne tiştek zehmete. Her kes dikare bibe gundiyek fêlbaz, her kes dikare bibe çavbirçiyê burjuvaziya biçûk. Her kes dikare bêje hinek firsend dîtine û diziye bike. Lê ev ne tiştên wisa berzin. Ev tenê ew bê exlaqî, bêrêzî, bêkesayetî û di encamê de rastiyek koletiya kesayet ji tinebûnê wêdetir nabe ku gelek caran di civakê de tê dîtin rave dike. Qulpan jî wisa pê ve dike, hûn wisa dixemilînin û dibêjin; "Bila partî teqez van bipejirîne."

Eşkere bêjim: Hûn qiyametê jî rakin nikarin min paşve bixin. Negengaze ez bêm paşvexistin. Negengaze ez di şerê bîrdozî de bêm paşvexistin. Êdî hûn neçarin hinek rastiyan bibînin û hêdî hêdî bila hêza we jî têra pêkanîna pêdiviyên van rastiyan bike. Salên mezin vale derbas bûn. Hemû wargehên me yên li Kurdistanê, dikariyan rolek navendî ya bêhempa bilîzin. Ancex min lê nêrî, hemûyan ewder weke cihê reva ji bîrdoziyê dîtine. Tevî ku evqas pêdiviya min nîne, hûn dibînin li vir şerê bîrdozî çiqasî sazûmankirî dimeşînim. Gelo maka yekîtî, rêxistinbûn û polîtîkayê ne eve? Ma hûn rizgariyê naxwazin? Yek ji xalên bingehîn tê bîra min eve. Ji bilî vê her tiştî biçûk bibînin, wisa zêde jî xwe nespêrin çekê. Xebatên ji rêzê hûn dikin hene û wan jî zêde girîng nebînin. Ya hûn girîng bibînin xebata herî bingehîn û pêşî, asta bîrdozî çiqas ber bi vîna azad ve dibe û çiqas rê ji biryarek azad a pêşî lê nayê girtin re vedike. Kesê xwe gihandî zelaliya bîrdozî, dest bavêje kîjan karî, teqez wê serkeftinên mezin bidest bixe. Kesê ku li ser asta bîrdoziya partiyê serwere, wê di hemû xebatên din de hevgirtî nêz bibe. Ger hêjî bi hinekan re şer dikim û min ev şer dijwar kiriye, wateya vê bi aliyê beramber re şerek bîrdozî tê meşandin.

Di nava partiyê de şerek bîrdozî ya mezin heye. Hêceta aliyê beramber vekiriye. Qaşo hewl dide marîfetên xwe rêz bike. Dixwaze ji

xwe re qad veke. Dixwaze xwe rayedar û karbidest bike. Ya rastî bîrdoziya van bi xwe heye. Ev çiqas dixwazin bila xwe cuda bidin diyarkirin û bixapînin, xwe veşêrin, ev negengaze. Wê di encamê de ev biçin bidin diyarkirin ku nûnertiya rêbertiya bîrdozî yan jî raveya bîrdoziya vê yan jî wê çînê, vê yan jî wê nasnameyê, kesayet, malbat û xwecihiyê û heta ketîbûna kesî dikin. Bingeha partiyê yekbûna bîrdozî ye. Yekbûna bîrdozî, raveya yekbûna herî berze. Ma em dikarin bîrdoziya kesê ku evqasî bi rêhevalên xwe re nakoke, evqasî bi rastiyên partiyê yên bingehîn re nakoke û evqasî beşdarî yekîtiyê nabe weke bîrdoziya partiyê binirxînin? Kesê ku yekbûna bîrdozî bawer kiriye û têkoşîna bîrdozî di kesayeta xwe de serkeftî pêk aniye, nabe ku beşdarî yekbûna rêxistinî ya partiyê nebe, bingeha xeta polîtîk û leşkerî ya partiyê pêk neyîne. Ger yek bi israr xeta leşkerî, xeta polîtîk, xeta rêxistinî, heta xeta jiyanê xirab dike û tevlî wê nabe, bizanin ji bo wî kesî pêdiviya herî esasî, pêdiviya bîrdozî ye. Ger paşverûtî yan jî cihekariyek wî ya bîrdozî heye, divê wê derbas bike.

Di nava partiyê de di pêkanîna takekesî, xwe taybet û cihe dana jiyînê de israr, misoger nepejirandina bîrdoziya partiyê ye. Helwesta kesê ku dibêje; “Ev an jî ew helwesta min a taybet heye, rewşek min a wisa cuda heye, divê baldar nêzî min bibin. Divê teqez min cuda bigirin dest û binirxînin”, tê wateya dibêje; “Bîrdoziyên min ên cuda hene, ez jî vê li ser partiyê ferz dikim.” Li ser partiyê bîrdoziyek cuda ferzkirin, tê wateya li ser partiyê rêxistinek cuda, xetek polîtîk û leşkerî ya cuda ferz dike. Elbet ev jî destpêkirina her cure parçebûn û belavbûnê ye. Hinek ji we bi salane di nava partiyê de ne rehetin. Ev tê çi wateyê? Ev tê wateya gotina; “Ez tevlî pîvana yekbûna bîrdoziya yan jî felsefeya partiyê nabim. Ferasetek min jî ya jiyanê li gorî xwe heye.” Li pişt her ferasetek jiyanê felsefeyek û bîrdoziyek heye. Ev israr jî tê wateya dibêje; “Ez dixwazim xwe di nava partiyê de bi bîrdoziyek cuda birêxistin bikim.”

Jixwe ev gelek caran derketiye holê. Hema bêje rêxistina ehbap-çawişî ya her yek ji we heye. Li derdora her yek ji we seknek diwêre rêxistinekê ava bike heye. Ev çiqas xetere, hûn çawa diwêrin vê bikin? Ger em partiyê weke yekbûnek bîrdozî dihizirin, hûn çawa dikarin van pêş bixin? Nexasim hûn çawa dikarin bi reftarên xwe ve salane ji bo van helwestên xwe mafê taybet ji me bixwazin? Hûnê dev ji vê berdin. Mirov fêlbaz dibe, mirov dibe nûnerê çînên din bes ne evqas. Ev çavsorî ye, her wiha feydeya vê ji kesî re nîne. Negengaze kes di PKK’ê de bi

vê çekê tiştekê bidest bixe. Kesê ku xwe ji her hêlê ve ji rastiya bîrdozî re amade dike, di PKK'ê de hêza mezine. Kesê ku xwe bi temamî ji rastiyên bîrdoziya PKK'ê re amade dike, negengaze di polîtîka, pratîka wê ya rêxistinî û leşkerî de ber bi serkeftinan ve neçe. Ger kesek di qada bîrdozî, polîtîk û çalekgerî de zêde serkeftî nabe, yan para xwe ji bîrdoziya PKK'ê negirtiye, yan baweriya xwe pê nayîne, yan jî wê berovajî dike.

Wexta em hemû reftarên xwe bi safoka bîrdozî re derbas dikin, negengaze em negihin vê zelaliyê: Safoka bîrdozî weke kevanê ye. Hûn kî ne, çi ne derdixe holê. Yên ne ji wê ne li jor dimînin, ên li binê safokê dimînin jî yên partiyê ne. Bi bîrdoziya PKK'ê re derbasbûn, tê wateya safoka bîrdozî re derbasbûnê. Beriya her tiştî jî tê wateya PKK'yîbûnê. Li jorî wê mayîn, helwest û reftarên cuda ne, nêzîkbûna taybete, nerehetî ye, xwe her tim cuda dîtine, li derdora xwe rêxistina ehbap-çawişî pêşxistine û xweseriyên li gorî xwe daxwazkirine. Li jorî safokê mayîn, tê wateya herikîn û tevlî yekîneya xwe ya esasî nebûnê. Her wiha ji ber ku ev helwest jî safokê re derbas nabe, zû-dereng dê ji partiyê bê avêtin. Di PKK'ê de hinek tişt hene, weke ayetên bingehîn ên di bismila yan jî nimêjê de bên xwendinin. Ji bo we jî destpêkirina herî bingehîn, divê di şêweya rastiyên bîrdozî de bin. Ji bo hemû temenê we vale neçe, pêşerojê xeyalên we vale dernekevin û hewldanên we serkeftî bin, şertê sereke nebesiya xwe ya bîrdozî derbaskirine.

Ger pêkane li hember pêdiviyên vê hûrûkûr baldar bin. Heta hûn xwe zelal dikin, digihînin biryarê û vîna ku li pêş xwe ti astengiyan nas nake, hewldanên xwe bidomînin. Di vir de heta dawî hevgirtî bin û piştî we xwe biryardar kir, nebêjin pirsgirêka min a kesayetî heye. Ev leşkerî, rêxistinî û polîtîk dibe, ev qad dibe, ew qad dibe, hûn diçin kur biçin, nêzîkbûnên şaş ên weke; "Ez berpirsyarim, nikarim xwe ji serkeftinê re amade bikim" raber nekin û jixwe nikarin raber bikin. Li şûna hûn bi derewên xwe, xwe bidin razandin, alîgirê wê me bi we re nîqaşek vekirî bikim. Em dikarin van tevan eşkere nîqaş bikin. Bêxêriya xwe weke marifet nebînin. Mirovê bêxêr pênc quruş nake. Şerê bîrdozî, şerê herî mezine. Kesê vê ser bixe, ji niha ve ji sedî nodê serkeftinê bidest xistiye. Ger baweriya we bi serkeftinê heye, di vê xalê de jênevegeriya wê bidest bixin û nebesiyên xwe jî derbas bikin. Tenê dema we xwe ji bo wesfdariya bîrdoziya PKK'ê amade kir, dikarin encamê bigirin.

Kesên jiyana xwe evqasî fedayî şoreşê kirine, nikarin astek

binkeftinek cidî weke çarenûsekê pêşwazî bikin. Nexasim qet nikarin wê biparêzin. Ji bîr nekin, serkeftinên we yên berz tine ne. Hûn fermandariyek berz pêşkêş nakin. Em neçarin teqez sedemên vê jî bibînin. Bila hinekê wijdana we hebe, êdî bila hinekê hestên we yên berpirsyarî zindî bin. Ger emê bijîn, dikarin wisa bijîn. Van xeyalên jiyana sexte danin aliyekê. Ev di radeyek mezin de fêrbûnên ku dijmin salane li ser we ferz dike û bandor dikine. Ev vê diselmînin. Hûn çima tenezilî vê dikin?

Ew acizî û bêçaretiya hûn kûr dijîn, misoger encama bîrdoziya koletiyê ye. Kesayeta serî hilnade, asoyan bidest naxe û vînê dijwar nake, tê wateya hûrûkûr koletiyê dijî. Şerê herî mezin, xwe azadkirina kese. Kesê xwe azad neke, nikare yeke din azad bike. Kesê xwe şêlo, nebes û parçe dihêle, dê her tim zerarê bide derdora xwe. Kesê pirsgirêkên wî giran, li derdora xwe jî pirsgirêkan belav dike. Kesê dilxweşiyek mezin pê re neyî, li derdora xwe jî bê dilxweşiyê belav dike. Kesê hêza çareseriya bilind pê re neyî, derdora xwe jî ber bi bêçaretiyê ve diherikîne. Bêbaweriya kûr misoger qelsiyek bîrdoziya serdestan ava kirî ye. Ev jî cewher û bingeha koletiyê ye. Wêrekiya herî mezin, wêrekiya di wateya bîrdozî de tê raberkirine. Kesê serhildana bîrdozî pêk tîne, ji bo hemû serhildanên din zemîna herî saxlem bidest dixe. Di bûyerên weke bîrdozî, xweza û civakê de bûna xwediyê ramanek, fikrek, rastiyek û helwesta herî bingehîne.

### Kesê Di Rastiya Serkeftinê De Xwe Bidin Pejirandin PKK’yî Ne

Li gorî xwe bîrdoziya malbat, eşîret, netew, civak, çîn, emperyalîsta û mêtîngeran tevan heye. Di vê manê de her kes xwedî bîrdozî ye yan jî mirovê bê bîrdozî, miletê bê bîrdozî, civak û netew nîne. Bîrdoziya yekê di şêweya serdestiya emperyalîstî ya dijwar de dibe, bîrdoziya yê din jî, di şêweya koletiya di asta herî jêr de hatî parçekirin dibe. Yek pir hatiye belavkirin, pir kûr bêbîrdoziyê dijî. Temamî qutbûna ji bîrdozî, ber bi heywanbûnê ve çûyîne. Hatina vê astê, tê wateya her cure serdestiya ji ya mêtîngeriyê jî kembaxtir li ser tê meşandine. Mixabin civaka me jî wisa ye û kesayeta we jî hûrûkûr vê dijî. Nexwe ji nan û avê zêdetir, pêdiviya we bi berzbûna bîrdozî heye. Pêdiviya we bi bîrdozîbûn, helwesta bîrdozî

û ramana bîrdozî heye. Ango despêkirina her cure jiyanê ev be, dibe ku hûn ser bixin.

Elbet hûnê piştî wê fêrî polîtîkayê bibin. Polîtîka bi serê xwe şerek mezine. Şerê polîtîk pir tund girêdayî şerê bîrdozî ye. Lê ne heman tişte. Cewhera şerê polîtîk, dewleta beramber dîtine. Ger hêzek dewletê weke dewleta xwe nabîne û dixwaze wê hilweşîne, şerê polîtîk di vir de bi vê re eleqedar her cure fikir û her cure rêxistinbûnê ji bo hilweşandina dewletê û şûna wê ya xwe bicîh bike xizmetê dike. Bîrdozî, di mijara desthilatî de wexta dihilweşîne jî, ji nû ve çêdike jî xwe ronîkirine. Ev jî pirsgirêka hêzê ye. Polîtîka hêze, hêz jî rêxistinbûne. Ti rêya proleterya jî, ya gel jî ji bilî xwe xurtkirin û rêxistinkirinê nîne. Hûn çiqas bikarin birêxistin bikin, tê wateya hûn ewqasî hêzin. Di zimanê polîtîkayê de, hêz yeksan rêxistinbûne. Lewra yên dixwazin bihêz bin, neçare hîn zêdetir di xeta bîrdozî de rêxistinbûnê pêk bîne. Ji bo rêxistinbûnek baş jî, pêwîste her tim zanebûna polîtîk bê pêşxistin. Zanebûna polîtîk, di derheqê hemû kiryarên dewletê û dîsa desthilatiya xwe ya siyasî de bûna xwedî zanyarî ye. Partî jî amûrek vê ye.

Propagande şêweyek têkoşînê ye. Çiqas bikarin propagande bikin, hûnê ewqasî bikarin têkoşîna siyasî bimeşînin. Çiqas bikarin bi civakê re girêdanê saz bikin, hûnê ewqasî bibin desthilat. Êdî van hinekê fêm bikin. Rewşa we ji ya zarokan kembaxtire. We xwe avêtiye naverastê, lê ti lîstokê jî nizanin. Tenê lingê xwe çep û rast davêjin. Polîtîka ne lîstoke, maka hunera ye. Polîtîka weke hunera herî zirav tê pênasekirin.

Hinek xisletên we yên we ji zarokatiya li hemêza dayîkê girtîn hene. Dikarim van bi bîranînên xwe re hîn zêdetir vebêjim. Di bîra min de ye: Min digot ez çiqas bigirîm, wê dayîka min a dixwazim bîne. Hêjî di bîra min de ye: Di destpêkê de pir giriyam. Kesek ji min zêdetir bi dengê bilind digiriya nebû. Heta ji bo dengê xwe bi hemû gund bidim guhdarkirin, pir bilind digiriyam. Lê min dît ku nabe, êdî min dev ji girî berda. Siûda min a herî mezin, min di temenek biçûk de dev ji vê helwesta xwe berda. Bi aqil bûm. Êdî ji bo her tiştî bi destê xwe pêk bînim, li şûna bigirîm, ji xapandina dayîka xwe bigire, heta pê re her cure şerî bimeşînim, min her cure rê ceribandin. Ji ber min dît girî, şêweya têkoşînê ya herî xirabe û tiştek bi wê nayê bidestxistin. Niha jî we ev bîrdoziya zaroktiyê aniye çi halî? Van di bin xiftanên pir zirav de didomînin. Her roj gazincan dikin, her cure aciziya we li gorî bîrdoziya vê zarokatiyê ye. Tenê we ev zirav kiriye, şêweya wê guhertiye, lê hêjî hûn

zarokin. Dengê bêçaretiya li her cihî, xirab windakirina li her cihî, ferzkarî, bertek û hişkbûn, di encamê de xisleta we bidest xistî dide der. Ferdê Kurd, di jiyanê de zarokek mezine.

Bi rastî jî şerê min ê herî mezin, ji bo ji van zarokên mezin rizgar bibim. Her kes xwe dispêre min û dikare bêje; "Ez jî egîdim, ez jî Kurdek wisa me, wisa bi şerefim." Ez bi mirovên xwedî nêzîkbûnên wisa re şer dikim. Sedema evqasî teoriya mirovbûnê pêş dixim, ji ber vê rewşa we ya zaroktiyê ye. Carina hûn pir mezinin, carina netebitî ne, carina digirîn, carina jî ji bilî bûna zarokên diçewsînin ma ti xisleta we heye? Hûn fêr bûne her tim pirsgirêkan ava bikin. Kesên wisa nêzî peywiran dibin, pêdiviya xebatê ya herî biçûk pêk nayînin, di maneya polîtîk de ma ti ferqa wî ji zarokekî heye? Zarok her tim digirîn, dibêjin; "Şîr bîne" û derdora xwe belav dikin. Ma tişta hûn jî di rêxistinbûn û polîtîkayê de dikin ne eve?

Polîtîka hunera herî zirave. Fermana plansaziya herî berz û reftarên pir guncav dide. Ma reftarên we yên wisa hene? Hûn nikarin civînekê jî lidar bixin. Vêca bêfihêt jî hêcetan derdixin. Di şêweyek cidî de civînek navendê û rêveberiyê nayê lidarxistin. Her tim hûn dibêjin; "Em ferdî man." Ferdî mayîn, tê wateya; "Ez zarokek netebitî û quralan nas nakime." Ango ne di wateya ez xurt de me. Di polîtîkayê de navê ferdî mayînê wisa ye. Jixwe wexta hûn bi tenê dimînin, ti ferqa we ji zarokekî namîne. Ev tiştên hûn dikin xwe xistina bin hezar xiftanî û xwe xapandine. Ev reftarên we ne rastin û divê hûn biterikînin. Ji bo vê dilnizm bin, baweriya bi xwe bi bîrdozî bidest bixin, li gorî quralên polîtîka yên saxlem jî ahengê raber bikin. Êdî di vê mijarê de me jî mijûl nekin.

Em hinek tişt didin we. Em ji bo we ji zarokatiya polîtîk rizgar bikin kar dikin. Hêjayî vê bin. Hinekê xwe mezin bikin. Ma hûn dixwazin polîtîkvan bin? Ma hunera we ne politikaya herî dijware? Hûn dixwazin dewletê birûxînin û dewletê damezirînin. Ger ev raste, ma mirov bi vê kesayeta derewker ve digihe vê armancê? Xwe terbiye û mezin bikin. Dikarim bi we re nîqaş bikim û ezmûnên xwe parve bikim. Nexwe heyfa we ye. Ji ber hûn di vê mijarê de duristin, wisa ne niyetxirabin. Hûn bi armancên pir taybet najîn, tenê xwe dixapînin. Dev ji vê berdin.

Êdî naxwazim zanyariyên di derbarê we de bibihîzim. Ji ber dizanim her tim heman tişt tên bilêvkirin. Tê gotin her tim bi tenê maye, qet nebûye komîte, nebûye kordîne û rêveberî nedaye meşandin. Yek

dernakeve, nabêje; "Ez hukumetim." Em ji Asûr bigirin heta Roma, Osmanî'yan û Komara Tirkiyê dîrok bi mînakên van ve tije ne. Em li mînaka Atatûrk binêrin: Polîtîkaya wan hunera qutkirinê ye. Bihizirin: Ma kes ji we weke wan dikare qut bike? Hûn nikarin gundekê jî qut bikin, nikarin pêwendiyekê jî saxlem saz bikin. Vêca ezê çawa yeqîn bikim hûn fermandarek baş û polîtîkvanek başin? Em serê derziyê re derbas bûn, hatin heta van rojan, ango polîtîkaya rasteqîn dimeşînin. Hûn jî, nikarin berfirehiyek bi qasî Neqeba Çanakkale'yê re derbas bibin. Ezê çawa bi vê politikaya we yeqîn bikim?

Hûn pêwendiyên amade wêran dikin, nêvenga partiyê ya amade xirab dikin, piştî wê jî weke polîtîkvan û rêveberiyên binavûdengin xwe li ser min ferz dikin. Kes bi vê yeqîn nake. Ezmûnên min hene. Ji bo pêwendiyekê bidest bixim, min salên xwe dan. Hûn piştî pêwendiyên amade jî xirab dikin, ma dikarim we cidî bigirim? Min ji bo yek-du pêwendiyan salên xwe da. Mixabin rêxistinek mezin belav dikin. Hûn bi şêwaza xwe ya ferdî tine dikin û didin windakirin. Ji bo vê fêm bikin ma divê teqez serê we li erdê bikeve? Pêwendiyê ji bîrdozîbûnê, polîtîkbûn û rêxistinbûnê dixe, piştî wê li nava çavên me dinêre û li bendê ye ez bipejirînim. Ev nabe. Hûnê pir dijwar van helwestan biterikînin.

Ger di nêzîkbûna we ya bîrdozî de raveyek polîtîk û rêxistinî koalisyon û derfeta lihevkirinê hebûya, dê me ew jî biceribanda. Di vê manê de PKK di radeyek girîng de weke yekîtiyek eniyê jî dibînim. Lê ev nade diyarkirin ku min dev ji doza partiyê berdaye. Yekîtiyek Eniyê, tê wateya îdarekirina kesên weke we xwedî helwestên cur be cur û meylên li pey van. Lê ji bîr nekin, hûn jî xwe PKK'yî dihesibînin. Lewra sînor şêlo ye. Vêca nediyare hûn PKK'yî ne, yan jî endamê eniyê ne. Ji ber vê me ti karê tomarkirinê nekir ku hûn endamê PKK'ê ne. Di PKK'ê de sicîla kes ji we heye, nimreya wî diyare gelo? Na, ji ber gelek xalên ku zelal nebûyîn hene. Kesê ancex di rastiya serkeftinê de xwe bide pejirandin PKK'yî ye. Li cem me cuda pênaseyek PKK'yîbûnê nîne. Xwe ji hinek şaşiyên bingehîn rizgar bikin. Bi gotinên weke; "Ez fermandarek PKK'ê me, navenda PKK'ê me" ve, eşkere dibêjim, hûn tenê xwe dixapînin. Ji bo hûn wisa bin, hinek pîvanên bingehîn hene. Ger hûn bikarin xwe bigihînînê tê wateya hûn PKK'yîyek başin.

Ez Rêberê PKK'ê me. Dikarim her cure enîbûn û koalîsyonê îdare bikim. Komara Tirk jî bikar tînim. Ma ezê nekarim we binirxînim? Şaşiyên we yên sivik hene. Hûn dibêjin; "Em jî rêberin." Dibe ku rêber

bin, lê rêberê eniyê jî heye. Em vale behsa rêbertiya proleterya nakin. Her kesê aciz dibe û di nava partiyê de aramiyê najî, kesê ku ji sekna xwe ya li nav rêxistina eniyê ne razî ye. Ango ew jî xwe tiştekê dihesibîne. Lê ji ber ku ya dixwaze bidest naxe, aciz dibe. Em di rêxistinkirina eniyê de adilin. Heta em şerê eniyê li dijî Başûr û li hemû Kurdistanê dimeşînin. Ango li dijî gelek hêzan em rêxistina eniyê dimeşînin. Ew jî ji vê pir acizin. Her roj yek hêzê ku aciziya xwe ji min re ranegihîne nîne. Em hundurê PKK'ê li aliyekê bihêlin, ên em dost dizanin jî bi nameyan tên cem me. Dewlet jî wisa ne. Gelek dewlet jî gazincên xwe ji min re radigihînin. Êdî fêrî van bûme, min xwe li gorî van eyar kiriye. Elbet bersiva van jî didim û kurtasî îdare dikim. Di vê manê de enî, îdarekirina koalîsyonê ye. Li gorî em dizanin dewletan îdare bikin, ma emê nekarin we îdare bikin?

Pêwîste hûn di van mijaran tevan de aqilmend bin. Ger hûn dixwazin weke PKK'yîyek rasteqîn tevbigerin, pîvanên vê hene. Ger hûn xwe weke endamek eniyê dibînin, hûnê bizanin proleterya jî rêberê wê ye. Proleterya adile, mafdare û hêza çînek din a rêvebirinê nîne. Ger kesek ji çînek din danim dewsa xwe, roja duyem li naverastê tiştek bi navê Kurdistanê namîne. Bimîne jî, weke berê bûyî, dê weke sedî salan mayî bimîne. Nikare xwe weke mêtîngehek paşketiyê cîhanê jî wêdetir bibe. Hûnê jî bibin nûnerê wê. Lê niha rewşa min ne wisa ye. Weke tê dîtin, em navê pêşveçûnê ne. Navê bi hev re meşandina her cure çîn û tebeqeyê ne. Hêza me heye em kesên weke we hêsan nayên rêya rast jî bimeşînin. Bi zanebûna ev jî hunera polîtîk a mezine û wate dayîna vê ve, hûn cîh û helwesta xwe diyar bikin. Hûn bikarin van tevan hinekê bizanin, hûnê baş bizanin divê çawa bê jiyîn jî. Hûnê bizanin li gorî heq û huquq, li gorî pîvanên kedê divê çawa bê jiyîn.

Ji her kesê aciziya wan heyî re dibêjim: Tu ji keda xwe zêdetir tiştekê dixwazî. Ji yên binkeftî re jî vê dibêjim: Tu li hember keda xwe rêz nagirî, te wate nedaye hewldanên azadiyê û bê kedî, lewra belengazekî û zêde tiştek te ku parve bikî nîne. Te bêrêziya herî mezin li xwe kiriye, li hember keda xwe bêrêzî, lewra tiştek bi te re nayê parvekirin. Ji ber tu bi her tiştî razî yî. Kesên ji qasî xerc kirî zêdetir dixwazin, wê jî peyda nakin. Dema peyda nekin jî, hewce nake aciz bibin. Ji ber di PKK'ê de pîvan li gorî kedê ye. Ger hûn bi van qane bûne, pîvan saxlem hatibin girtin, ti sedem nîne ku kes ji sekna xwe aciz bibe. Li ser vî bingehî girîngiya lêhûrbûna we destnîşan dikim. Pîvanê

xwe saxlem bikin û dijderketinên bêwate, helwest û reftarên nayên pejirandin bila bên derbaskirin. Ger pêkane weke PKK'yîyek rasteqîn, ger nepêkane weke endamek eniyê yê baş hewl bidin cihê xwe yên di refên me de zelal bikin. Hewldanên xwe li ser vî bingehî dijwar bikin û hewl bidin encamê bigirin. Di vê de bi israr bin. Ger hûn tev li ser vî bingehî tevbigerin, hûnê ji pirsgirêkên dijîn re çareseriyek girîng peyda bikin.

Weke tê dîtin, ev hemû baş didin diyarkirin ku bîrdozî çiqas girînge û carek din vê rastiyê datîne pêşiya me. Çalekî hêza xwe ji bîrdozî digire. Em her tim çarçoveya wê ya giştî datînin. Ger hûn bikarin vê pêşnûmeya çalekiyê ya çarçoveya giştî, ango asoyê her tim pêş dixe, her wiha pêşiya we ronî dike di kesayeta xwe de bixin meriyetê, wisa ti astengiyek cidî we rawestîne namîne. Hûnê ne netewî, ne siyasî, ne jî leşkerî rawestin. Ji ber em bi asoyek berz û ronakbîriyê li we tevan dinêrin û dahûrîn jî hene, ger hûn têgihiştina me ya bîrdozî jî bikar bînin, hûnê encamê bigirin. Em ji dîplomasiyê bigirin heta leşkertiyê, yên perspektîfa wan a bîrdozî xurt, ji bo saxlem nêzî xebatan bibin û serkeftî bin, ti sedem û astengiyên cidî tine ne. Lewra karbidestiya xwe ya bîrdozî têrkar bikin. Bi asta xwe ya paşverû ya heyî re, hûn nikarin bîrdozî û politikaya PKK'ê, herî kêm raveya vê ya bi min re têbigihin, lewra dê hêza we jî têrê neke.

Bîrdoziyên paşketî kar nakin. Bîrdoziya paşketî îmha ye, bê bîrdozî jî belavbûne. Li ser vî bingehî hûnê bi bîrdozî bawer bikin û bibin raveya wê ya wesifdar. Ger em ji dervî vê bimînin, weke civak, weke gel, ji bilî rêya komkujiyê wê ti dawiya me nebe. Di vê mijarê de henek bi vî karî nabe. Di vê manê de PKK'ê weke rêber, weke rizgarvan, heta weke siûda dawî yan jî yekane raveya rizgarî binirxînin. PKK hêza xwe, ji bîrdoziya xwe digire. Ew hêza xwe weke hûn dihizirin wisa ji tiştên weke çalekgeriyê nagire, piraniya wan çalekiyan bela serê me ne. Dîsa hêza xwe ji wê milîtaniya we jî nagire. Ew jî li serê me pir bela ne. Ger hûn bikarin xwe wisa veguherînin, bêguman ji bo nebin rizgarvanek berz ti sedemên cidî namîne. Wexta ev esasên asoyî û bîrdozî kêm-zêde di kesayeta we de serwer bin, dê her yek ji we rolên girîng bilîzin.

Hûnê li ser vî bingehî bawerî, qinyat û asoyên xwe berfireh bikin û xwe xurt bikin. Jixwe fedekarî û wêrekiya we heye. Hûnê yekbûna van tevan pêk bînin, meşa serkeftî ya milîtanên PKK'ê yên rasteqîn her dayîm bikin û ji serkeftinan ber bi serkeftinan ve baz bidin.

**4 Sibat 1997**

## ŞOREŞ BÛYEREK DILXWAZIYEK MEZIN Û HÊZA MEZIN DAYÎNA HEVDU YE

Şoreşa herî mezin, li dijî rastiyên me yên sedî salane me paşketî hiştiye û li hember her cure dijminatî her tim ber bi binkeftinê ve dibe, şerê herî mezin em dimeşînine. Girêdayî serdemê yek ji nêzîkbûna şaş a herî bingehîn, hûn dihizirin emê bikarin şoreşa xwe jî weke şoreşên din ên hemdem pêk bînin û ji bo vê jî çi teorik, çi jî pratîkî baweriya xwe bi hewldanekê anîne. Wexta ev encam jî nade bi bêhêviyê re hûn ji rê derdikevin û xwe mehkumî binkeftinê dikin. Me evqas jî zêde bi îdîa pêş nexistibû. Ji ber cewaziya me, me hêviyek herî biçûk jî neda ku emê weke şoreşên welatên din, şoreşên miletên din bin. Lewra bêku wêrekiya têkoşînê jî raber bikin, weke encama reva ji rastiya, em bûn rastiyek netewî, civakî û takekesî ya teşe dayî vê, dibe ku di cîhanê de ya herî zêde hatî xapandin, xwe bi derewan dayî bawerkirin û di pirtûkan de jî raveya wê neyî be.

Ev misogere: Di bûyer û rastiya Kurd de êdî cidîbûn û bi aqilmendî xwe dayîna vî karî –elbet ev yek ji îdîayên PKK'ê ya herî bingehîne-karê bingehîne. Xweseriya PKK'ê jî di vir de ye. Em bi ser şêwaza şerek dibe ku pir kêm kesî, yan jî ti kesî newêrî pêk bîne de çûn û em navê şerê rêbertiya vê ne. Ji hêmana leşkerî û siyasî wêdetir, nexasim ji ber rastiya civakî ji bo dijmin zemînek guncav bû, çarçoveya vê ya meşandina mêtîngeriyê pir rehet ava dikir, niha me jî ber bi girtina vî zemînî û çareserkirinê ve dibe. Ji bo mirov behsa serkeftinên leşkerî û siyasî bike, divê mirov bi zemîna civakî ya me ber bi her cure xirabûn, neyênî û windakirinê ve dibe re hesabxwestinekê bijî. Jixwe di salên dawî de hewldanên me yên Rêbertî jî ber bi vir ve ne. Me mijûlbûna bi eniyên derve re di plana duyem de hiştiye. Ya rastî me danî holê ku bi derbaskirina asta dahûrînan ve, em dikarin eniya derve pêş bixin.

Elbet li cem me dahûrîna kamilbûna civakî li aliyekê, têgihiştina wê jî jêhatiyek mezin dixwaze. Netewên cuda dibe ku bi hewldanên sedsalan dirêj dike ve rastiya xwe ya civakî fêm kiriye, têgihiştiye, bi zagon û siyasî kiriye. Ev dewlet piştî parastina xwe, karîne ber bi berfirehbûna emperyalîstî ve jî biçin. Tişta bi me re tê jiyîn, kes nêz nabe ku rastiya xwe ya civakî binase û têbigihe. Tu kiyî, çiyî, ji cem kî tî, nûnertiya çi dikî? Devjêberdin di ferqa van de be, her tim ji van

diyardeyan rev heye. Mantiqê bireve-rizgar bibe heye. Elbet di vir de rola dijmin diyarkere, lê ev nêzîkbûn di hemû şaneyên we de jî bicîh bûne. Nêzîkbûna tu çiqasî ji xwe birevî, wê tu ewqasî rizgar bibî serdeste.

Hêjî di bîra min de ye: Piştî min xwe nas kir, amade kir ji gund derbikevim û bi dibistanên min xwendî re, qutbûna ji jiyana kevnar û dest bi jiyana nû ya nedihat payîn dê çi bi xwe re bîne kir, min ev astengiya civakî dît. Ev her tim ji bo min benê li nav lingan bû. Min digot; "Ax, xweziya malbata min ne wisa bûya, xweziya dê û bavê min jî weke dê û bavên ên din bûya yan jî ne gundiyek bûma, ji vî cihî bûma." Ev ji bo min astengî bûn. Li vir tişta girîng, di wî temenî de jî, min dît ku zemînê civakî çiqas astengiyek mezine.

Pir watedare ku em şoreşgeriyê bi derbaskirina vê astengiya civakî ve girê didin. Kesên nikarin zemîna xwe ya civakî derbas bikin, gumane ku bikarin pêngavek leşkerî û siyasî bikin. Mirovê vî zemînê civakî bivê nevê, dikare bibe leşkerek dijmin ê baş, karkerek karsaz ê baş, xulamek axa yê baş û her tim di karên qirêj de bibe xebatkarek. Jixwe ev zemîna civakî ji bilî vê tiştek din jî ava nake. Yê herî ji xwe razî jî hevkarek ketî ye. Xayînê herî baş, qaşo dibe kesê herî jêhatî. Vî welatî cuda mirov mezin nekirin. Ji hinavê vî miletî mirovek cuda derneket. Kesê herî xwe egîd dibîne, mêrê hevjîna xwe yê herî baş an jî hevjîna herî baş a mêrê xwe ye. Ji bilî vê hêjî me civakbûnek û exlaqê wê nedîtiye. Pirsgirêk ne keyfa xwe xirabkirin, ne jî rewşa we ya zîrevanê bostanekê erêkirine. Pirsgirêk bi wêrek nêzîkbûna ji rastiyan re ye. Ger emê bijîn li ser vî bingehî ji bo vê destpêkirinek nû pêkanîne.

Wexta bi zanebûna min ji ezmûnên xwe girtî lê dinêrim, derdikeve holê dê kar wisa nemeşe. Jiyan bi we re pêş nakeve. Di vê manê de hûn bi şoreşekê re rûbirû ne. Yan hûnê vê şoreşa hundurîn bi mafdarî pêk bînin û bêjin amade me, yan jî hûnê dawî li vê meşa xwe ya teretûre bînin. Em mezin nakin. Ti peywira ji yek we re hatî dayîn wateya xwe neditiye û ser neketiye. Berovajî, ji bo binkeftinê bûne zemîn. Em nikarin vê ji nedîtî ve bên. Wexta em peywirekê digirin ger siûda me ya serkeftinek berz nîne, wê demê emê çima xwe bixapînin? Emê çima bikevin nav pêvajoya şoreşgerî ya xiftanek ji agir? Ma ne heyfe? Qet nebê hesabek wijdanî bikin. Hûn çima xwe davêjin nav vî agirî? Di şoreşê de neçarî nîne. Şoreş bûyerek dilxwaziya mezin, hêza mezin dayîna hevdu ye. Vêca beramberî vê li hemû pratîkên xwe binêrin.

Rewşek berovajî vê mijara gotinê ye. Bûyera hêz dayînê, dil dayînê, hema bêje hatiye windakirin an jî bi şêweyek pêşketî nehatiye bikaranîn.

Ti guman ji niyetên we yên baş û keda didin nîne. Lê tiştek heye, hûn di vî karî de ne rehetin. We ev kar mezin hemêz nekiriye. Nikarin vî karî bi biryardariyek mezin bimeşînin. Lê ez jî dibêjim ku, şoreşgerî, partîbûn û artêşbûnek wisa nabe. Di nava darezên nirxên feodali yên mezin de yan jî ji ber bêçaretiyê, hûn dibêjin em heta cihekê dikarin. Ev şaşe, hebûna mirov wisa pêk naye. Di mijarên leşkerî yên herî hêsan de, bi salane tevî vî şerê biryardar, we taktîkek serkeftî pêş nexistiye û ber bi xebatek rêxistinê yê rehetî bê meşandin ve bi civînekê jî bersivek nedaye. Wexta rewş wisa ye, em nikarin we cidî bigirin. Em nikarin we bixin dewsa mirov û milîtanên rasteqîn. Ji ber di vê rewşê de hûn çi dibêjin bêjin, her tişt ji bilî xapandinê ne tiştek dine. Gotina we ya dibêje; “Ma dema tevlî vî karî bûm, min mirina xwe berçav negirt?” Hîn xirabtire. Bi vî halî ve di vî karî de mirina xwe berçav girtin ji zindîbûna kembaxtire. Em mirina we naxwazin. Erzan şerkirin û bi sedemek vale mirin, li cem me bi qasî jiyana herî sexte dibe tawan. Hûn bi mirina xwe ve, tenê xemgîniya me zêde dikin. Çawa ku hûn bi jiyana xwe me tengav dikin, bi mirina xwe ve jî zêdetir tengav dikin. We xwe daye ber mirina erzan. Lê ji bo min rêhevalên erzan namirin hewce ne. Jixwe di nava me de her roj her kes erzan dimire. Hûnê bibin navê mirina ne erzan, di heman demê de jiyana ne erzan. Em hewl didin van çareser bikin.

Ez gelek caran weke hatina we, dixwazim xwe hêsan qane bikim. Niha dixwazim hîn birêkûpêk û encamgir bim. Lê kar weke hûn dizanin nameşin. Li hember rewşên hûn dijîn pir bihêrsim. Pirsgirêk ne xwe îdarekirina mine. Pirsgirêka min a herî mezin di vê kêliyê de jiyana ne serkeftî û di mijara şerê zêde ne pêşketî de xwe nexapandine. Hemû pirsgirêka min, yekser di mijara pratîka rojaneyî de bêku xwe bixapînim, ger pêkan be hinek gavên rasteqînî pêşvebirine. Ev ji bo min her tişte. Bes hûn bi yek pêşdarezînê salên xwe winda dikin û didin windakirin. Bêku hûn binêrin raste yan na, îdîaparêzî û waswasên we hene. Hûn tenê ji bo wê partî dikin qurban. Beşek jiyana we ya herî zêde bi şaşî û nebesiyan dagirtiye, lewra hûn bi binkeftinan dagirtî ne. Ger hûn binkeftinên xwe weke rikdarek mezin ferz bikin, gelo hûn hesabên encamên vê dikin? Ya herî xirab jî hûn çav bernadin jiyanê.

**Şoreş Bi Kesên Zorê Kar Dike Re Çênabe**

Li gorî min, ji rewşa hûn çiqas dijîn an jî çiqas şer dikin zêdetir, di mijara jiyanê de şaşiyek we ya mezin heye. Bi we re di derbarê naverok û çawaniya jiyanê de şaşî hene. Hûn di derbarê cewher û çawaniya jiyanê de hûrnezanin an jî muhafezekarek xirabin. Xeyalên we yên xurt tine ne. Tişta ecêb jî, yên heyî jî pir xeterin. Xeyalên wisa ne, rastiyan bi erdê re dike yek. Ezê çi ji vê xeyalê bikim? Ya herî girîng jî hûn bêxeyalin. Em dev ji vê berdin, dibe ku xeyal nekarin ewqasî bandor li we bikin, lê nediyare hûn li hember çi xwedî azwerî ne. Ger em azweriyên we bi rêya anketê derbixin holê, wê bê dîtin meylên we yên pir cuda hene. Yeqîn dikim, wexta hûn serbest bimînin, dê ev meylên we giraniya xwe bidin rûniştandin.

Di ola Îslamê de rojî, yek ji çalekiyên ecêb an jî tevdîrên **Hz. Muhammedin.** Ji aliyekê ve dibêje; "Hûnê biçin bihuştê, hingiv bixwin û şerbetê vexwin, bi huriyan re bijîn." Ji aliyê din ve dibêje; "Hûnê biçin dojehê dê we bisotîne. Hûnê bi mehan nexwin, venexwin, a di destê kafiran de talan bikin." Ji aliyek din ve jî dibêje; **"**Wê tu nefsa xwe wisa terbiye bikî, bi firîşte û huriyan re wisa bijî." Ev xalên tên gotin tev bi hev re nakokin. Lê ji bo mirov zindî bike hewce ne. Nefsê terbiye dike, daxwazê zêde dike, paşê dide şerkirin. Li gorî demê dibe mijarek bîrdozî û armancê. Mirovan pêşve dibe û di encamê de serkeftî jî pêk tîne. Lê mixbin niha kî wateya rojiyê dizane?

Misilmantiya di dema Hz. Muhammed de cuda bû. Yên di vê demê de jî qaşo tev Misilmanin. Li naverastê Misilmanên wisa tine ne. Lê tiştek min ji cewher de girtî heye ku, ya rastî ev di sosyalîzmê de jî wisa çêbû, tişta hatî serê gelek bîrdoziyan jî eve, ev bîrdoziyên mezin tev ji cewher hatine valekirin, berovajî hatin pêkanîn. Di zindik û minafiqên ku Îslamê di qonaxa destpêkê de gotîn de jî pêşketin heye. Jixwe rastiya cîhana Îslamê jî vê eşkere destnîşan dike. Lê jiyanek aîdê zindik û minafiqan heye. Ev jiyan, paşketî û tije fitne-fesadî ye. Her çendî di gotin de bêjin li dijî kafirane, ji hêla cewherî ve weke jiyanî ji kafiran kembaxtirin. Di jiyana kafiran de mirov pêşketinekê dibîne, lê di jiyana Misilmanên roja me de mirov vê nabîne.

Wexta em dibêjin li holê Misilmanek nîne, gelo sosyalîst hene? Weke bizava bîrdoziya hemdem kanî sosyalîzm? Sosyalîzm, li Sovyeta

ku herî zêde lê hatî pêşxistin de jî, gotinek herî zêde niha li bin lingane. Bîrdoziya ku wextekê cîhan dihejand, weke pîsî tê avêtin. Em dev ji wê jî berdin, em li hember rewşa xwe ya bûna mirovê herî erzan, bersivê bidin pirsa mirov çawa dibe mirov. Yeqîn dikim, ger ev pirsgirêka bingehîn nebûna, yek ji me nedihat cem hev. Şaşiya me di vir de çêbû: Pêşwext xwe desthilat dîtin, pêşwext xwe mirov dîtin pêş ket. Ji bo çareserkirina vê pirsgirêkê çeka herî bingehîn bikarim bibînim, çareserkirina mirovbûnê bû. Ti şerma vê nîne. Hûn çiqasî mirovê yeman bin bila be, dibe ku hûn di dîrokê de jî hinek tişt bikin, lê hêjî ez mirovek min xwe qane nekiriye. Di her mijarê de pirsgirêkên min ên mezin hene. Bi serûber nikarim rûnim, bi serûber nikarim bi dostan re li ser mêzeyekê xwarinê bixwim, di cihê xwe de pir tengav dibim. Nikarim bi we re serûber bijîm. Dibe ku dijîm, lê ev pir hûrûkûr û tund derbas dibe, bi aramî nabim.

Niha hûnê bêjin; "Ma ti rêber wisa dibin?" Lê rastî hinekê jî wisa ye. Xwe nexapandin, ji bo min pir girînge. Ango ger mirovbûn zehmete, ezê bi dîmenek sexte ve çi û çima rizgar bikim? Hemû tişta ku civaka me dike, wexta navê xwe dike Muhammed, weke ku bi rastî jî Muhammede nêz dibe. Hûn bi nav hene, lê naverok tine ye. Ya herî baş mirov vê nîqaş bike, li şûna nav hebê bila ew bi xwe hebe baştire. Bihizirin: Navê çend ji we Şêr an jî Pilinge? Yan navê we, yan jî paşnavê we wisa ye. Navê çend ji we Ayşe, Fatma yan jî Zeynebe? Lê belê ev çiqas bi Ayşe, Fatma û Zeyneba di Îslamê de heyî ve girêdayî ye? Di nava we de kesek wisa be nîne, tenê navê we hene. Civaka me mirîyê navlêkirinê ye. Dihizire wexta nav lê dike, dê ew jî weke wan be. Hûn hizirîn vê şoreşê jî wisa bikin. Weke ku teoriya giştî û çeka şoreşê bi destê xwe xistin pêkhatina şoreşê ye, xwe xapandinek hat jiyîn.

Ez niha li vir hatime astek hîn pêşveçûyî. Dijmin di nava mantiqê xwe de pir birêxistinkirî ye, xwe pir pênase dike. Bi yên me re jî, rewşek berovajî heye. Jixwe ev lêhûrbûna dema dawî jî, qet nebê ji bo vê xeteriyê daxin asta herî jêre. Hîn ji niha ve bi vî halê xwe ve nikarim bi aramî bim. Bes hûn yekser dibêjin; "Vaye şoreş pêk tê" û xwe li her derî bicîh dikin. Qet hewce nake hûn rehetî yan jî belengaziya we ya cihên hûn jê hatine, dîsa cihê xwe ya di nava jiyanê de binepixînin an jî pir xemgîn bibin. Qet hewce nake hûn bêjin; "Mafê me ji dest çû, em tam nehatin fêmkirin." Li wir karek me ya pir girîng heye. Lê belê gelo çeng

peywirdarên me yên bi qudret hene? Weke kesên niyazbaş, pir hêsan di wateya erê de, hûn tev ji min jî baştirin.

Ger hinek kesên mafê van karan bide hebe, ez dikarim hemû hêz û derfeta xwe bidim wan. Çiqas jêhatî, bandor û rayeya min hebe, hemûyê dikarim bidim. Bi rastî jî mirovek bikare kar bike heye? Tine ye. Dê biçe, hemû karî li ser û çavên xwe bide. Vêca ma em ala radestbûnê rakin? Gelo em dev ji vî karî berdin? Hinde we xwe bi hinek tiştan ve girê daye, eşkere bêjim, ne dikarim weke we bimeşim, ne weke we diçim eniyê, ne daxivim, ne jî weke we tevlî civînan dibim. Li gorî min yek jî ne cidî ne. We tenê ev hêjayî xwe dîtine. Lê belê gelo li gorî min ên rast û têrkar tine ne? Belê hene. Di vê mijarê de dikare bi mijûlbûnek mezin, ferasetek mezin, lêpirsînek mezin û hesabxwestinek mezin encam bê girtin. Bes hûn xwe nadin vî karî.

Li gorî min kesê Kurd, niha di cîhanê de kesê herî şemitok û bêxêre. Tu destê xwe dirêj bikî, dê winda bibe. Niha rewşa we ya di destê min de, hinekê jî dişibe vê. Hûn weke dayîka behrê ya di avê de ne. Carekê dibînî ketiye destê te, lê winda bûye. Taybetmendiya xwe wisa ye. Rewşa we heman dişibe dayîka behrê ya di avê de. Tu dibêjî min dorpêç kiriye, girt, di destê min de ye, ancex carekê dinêrî winda bûye yan jî tişta di destê te de mayî şêlobûneke. Kesayetek teşe negirtî wisa hêsan winda dibe û hêsan dihilweşe. Elbet ger hiş hatibe belavkirin û dil bi erdê re bûbe yek dê wisa be. Ev di heman demê de rastiya civaka hatî belavkirin û hilweşayî ye. Di vî temenê xwe de, hûn dikarin lêhûrbûnek di vê manê de bijîn. Hûn dikarin ji min zêdetir bêjin; "Min li welat jiyan kir. Ez nikarim bê wan axan bijîm, nikarim bê azadî bijîm." Bes li gorî min mijûlbûnek we nîne, mijûlbûna we berovajî ye. Dê xeyalê van tiştên hûn li pey baz didin jî nemîne. Divê hûn di vê xalê de cidî bin.

Şoreş bi kesên zorê kar dikin ve çênabe. Xwe li ser hinek derfetan dana jiyînê jî qet nabe. Em kî ji we bikin kesayetên şoreşê yên herî wesfdar, dê roja duyem ti belayên xeter neyîne serê şoreşê nemîne. Di vir de rewşek ji niyeta baş wêdetir heye. Kesayet nehatine sazkirin, bêrêxistinî ne û her kêlî ji her cure şaşiyê re vekirîne. Hemû tişta dikarim bikim jî, bêjim ev kar wisa nabe, misoger tu şaşî, hinekê bimeşe, pêşketin gengaze. Bal bidinê, ez tiştek din nakim. Zêde nikarim rewşek fermanê dide raber bikim. Ji ber mirovên wisa bi fermandariyê bimeşe tine ne. Emê fermandariyê bi kîjan ji we bidin pêkan? Ji bo mirov bibe fermande, divê ew ast bê girtin.

Em li Osmanî’yan binêrin, li Roma’yîyan binêrin, li Fermandarên Îslamê binêrin: Mirovên hemûyan jî yên bêhempa hene. Heta em li Vîetnamê binêrin: Fermana ku bi qasî nîv rûpelî **Ho Chi Minh** dayî **Giap** heye. Giap, di nava pêvajoyek dem kin de ji seriyekê heta seriyê din dikeve Vîetnamê. Artêşa cîhanê ya herî pêşketî artêşa DYE û artêşa hevkaran a bi qasî milyonan têk dibe. Dema destpê dike di destê wî de zêde hêz tine ye. Di destê wî de taximek ji hev ketiye. Derfet û bêderfetiyên wî hene. Lê li vir ya girîng fermandarek ku xwe dayî ber vî karî derketiye holê.

Vêca em li fermandarên xwe binêrin: Bi rastî jî ji hêla hejmarî ve fermandar zêde bûne. Lê rikdarê vî karî yê mezin, mirovek me li gorî pêdiviyan xwe bide vî karî nîne. Kesê herî zêde me wesfdar kirî jî, tevî hemû piştewaniya me –jixwe yeqîn nakim di cîhanê kesek evqasî pişgirî bide-, ji bo bi têkçûnek giran ve neçe, her roj li her çar aliyên wî sing girê didim. Geh dikişînim vî milî, geh wî milî, daku bikare li ser lingan bimîne. Camêr nikare xwe birêve bibe, têk diçe, lê ne di ferqa vê de ye. Ger bi milê wî negirim û paşve nekişînim, dê camêr serserkî li erdê bikeve. Em li vir tam bi rûdanek Kurd re rûbirû ne. Ev kesayet jî niha taklîtvanek herî baş ê PKK’ê yan jî artêşê ye. Di nava wan de kesê bi îdîa nîne. Hinek hevalên me bi navê; “Gelo dê PKK erk bide me, yan ne?” Xemgîniyê dijîn. Li gorî min divê ev berovajî bihizirin. Halê van ên erk bigirin nîne. Xweziya bikariyan erk bigirin, me jî ew bi rayeyên awarte ve ew dagirtan. Belê, hinek hene, înkar nakim. Lê li pratîka welat ên mirovên me yên herî pêşketî binêrin, hûnê bibînin ji bilî xirabkirinê tiştek din nekirine.

Qet nebê em niha bi heman cidiyetê nîqaşa xwe bidomînin. Lê vê carê bi rastî jî hûnê hewl bidin têbigihin? Ji bo meşandina karê artêşê, nexasim ji bo fermandarî hinek hevalên me yên geş bûyîn hene. Bes hewce nake hûn geş bibin. Gelo hûnê hinekê ber bi cidiyetê ve werin an jî bi rastî jî kêmekê ji vî karî re amade ne? Her tim dibêjim çima di dîrokê de pêşeng, mîr, siltan û keyên me yên yeman û saxlem tine ne. Niha me dev ji van berda, êdî serdema van derbas bû. Milîtanî û fermandariya em hêjayî xwe dibînin karek mezine. Bihizirin, dê di refên me de qaşo evqasî fermandar hebin, lê fermandarek ku bikare taximekî rast bikar bîne jî nebe. Ev mirov bêzar dike.

Em dev ji mijarên leşkerî jî berdin. Hûn çima nebûn welatparêzek mezin? Hûn çima nebûn xwediyê dilxweşî û terbiyek mezin? Çima

rastiyek me ya civakî ya pir bi êş heye? Hûn çima xwedî li wêje, êş û xemên vê civakê derneketin? Kirêtî hebûn, çima we ev pir caran nîqaş nekir? Çima hûn nebûn du rêhevalên bi hevdu ve girêdayî û xurt? Ev pirs sotînerin. Em dev ji bûna rêhevalek ku erka leşkerî û siyasî girtî berdin, hûn çima nebûn xwedî nêzîkbûnek ku di pîvanên jiyana civakî de nirxek mezin didin hevdu? Mînak hûn tev dixwazin bi min re bibin rêhevalên baş. Ez di nava vî miletî de, di pêşxistina peywendiya mirovan de, mirovek herî zêde xwe tevlî dikime. Lê ji bo pêwendiyek rêhevaltiya heta dawî em bikarin li ber xwe bidin jî, zêde kesekî nabînim. Ma xwe pir diecibînim? Na. Hema bêje hemû pêwendiyên we nîvçe dimînin û zêde li ber xwe nadin. Çiqas heyfe! Ya rastî em di qonaxa bidestxistina pêwendiyên sed sal têrê nakin de ne. Xemên we jî weke agirê puş pê dikeve û ditefe. Vêca kêfxweşî û azweriyên we, ew jî nikarin xwe weke agirê puş ditefe rizgar bikin. Azweriya kî ya her tim mezin dibe heye? Ji bo hevalên me yên herî kevin an jî we tevan ber bi pêwendiyê ve bikişînin û pêwendiyan kûr bikin, tevî ku em hêza xwe pir dijwar datînin holê, hûn heman kêliyê dixwazin ji vê xilas bibin.

Devjêberdin hûn xwe bigihînin wateya mezin a pêwendiyê, nêzîkbûna ji pêwendiyê re weke kevneşopiyek xirabe. Ji bo hûn heman kêliyê birevin biçin dibêjin; "Kêliyekê zûtir birevim û xwe bidim jiyîn." Yeqîn dikim, dibe ku hûn weke hevalek şerker pir xemgîn bin, bi nêzîkbûna; "Nirxek bû çû, windahiyek bi êşe" janekê bijîn. Lê di wê xemginiya we ya zêde de jî, dibînim ku hûn vê najîn. Ev jî bi êşe, lê rastiye. Ger tengezariyên we siberojê veguherin giriyek mezin, ev tê wateya ji ber li gorî hûn dixwazin nikarin bijîn lewma digirîne. Ev jî şêweyek bi êş a rastiya we ye. Bes li gorî min raveyek giran a rastiyê ye. Li vir hêza kûrbûnê, hêza xwe dayîna mezinbûnê nîne. Li ser we bêxîretî û paşverûtî pir serwere. Ya ez dikim, ev hemû hinekê derbaskirin, rê ji pêwendiyên kûr û hezkirinên kûr re vekirine.

**11 Sibat 1997**

## ŞOREŞ BERHEMA KESÊN HETA DAWÎ DIKARIN BIMEŞIN Û BIAFIRÎNINE

Êdî em dixwazin beramberî xwe kesên aqilmend û xwediyê sonda xwe bibînin. Kesayetên demek dirêje hûn raber dikin, kesayetên mirov bêzar dikin. Ti xisleta van kesayetan a siyasî û leşkerî tine ye. Bêfihêt bi israr hûn vê kesayeta xwe ferz dikin. Hêjî kesê ku li gorî soza xwe, biryara xwe û baweriyên xwe bi rêzdariyek mezin bijî nîne. Bes me xwest xizmetek mezin bikin. Bêku aciz bibin, bi rêyên cur be cur hûn hewl didin qaşo xwe bidin jiyîn. Ev ne hêjayî we ye. Em van xisletên we napejirînin. Ev xisletên we ji kur tên? Çima nikarin derbas bikin? Di rewşek pir bê çare û nebes de jiyînê, bi israr rengê xwe guhertinê ve ji jiyînê hûn çi hêvî dikin? Heta ku hûn xwe bi ser baweriyek kûr û rastiya serkeftinek kûr ve nedin, hûnê çawa bijîn? Qet wate nadim vê. Ez bim, ezê vê kesayetê bixim bin heft qetên erdê û heta wisa jî nekim dernakevim pêşberî mirovan. Ev kesayet têrê nakin, nayên pejirandin, kar nameşînin, pir eşkere ne û ji gelek windahiyan re rê vedikin. Hûnê çi ji vê kesayeta serkeftina wê neyî bikin? Nexasim ger bi rastî jî seknek we ya siyasî û leşkerî, îdîayek we ya kesayeta cidî hebe, vêca ev hemû ji bo çi ne? Ma dibe mirov wisa bijî?

We ez tam tengezariyekê re rûbirû hiştim. Hemû armanca me, pêşî pirsgirêka kesayatên têr û feydeya doza me nake çareserkirine. Ji bilî vê em nikarin bi ser dijminê beramberî xwe de biçin. We serê xwe girtiye û dimeşin, çiqas seqetî, sextekarî û nebesiyên dawiya wan nediyar hebin, hûn bêfihêt dijîn. Ev bi mirovê dozê yê cidî re nabe yek. Hûn xwe dixapînin. Hûn nikarin bi vî şêwazî bigihin ti encamê. Pêşî heta hûn paşverûtiyên xwe, sedemên binkeftinên xwe û aliyên xwe yên kirêt bin nexin, çima di nêvenga partiyê de digerin, heta çi karê we li hember mirovatiya xwedî îdîa heye?

Me gelek caran di vê mijarê de hûn şiyar kirin. Me dahûrînên dewlemend pêş xistin. Mixabin lê dinêrim, ev hêjî ne di xema gelek ji we de ye. Ger bi ya min be, nabe mirov pariyek nan jî bide van kesan. Em nikarin kesên wisa bidin jiyîn. Ez jî di navê de, ger di van refan de feydeya me çênabe, bi qasî em silavekê yan jî şorbeyekê heq bikin cihê me nîne. Hûn van tevan fêm nakin. Ji ber şaşiyên pir kûr û xwe

neterbiyekirinê, gelek xisletên nayên pejirandin weke çarenûseke yan jî neçariyeke hûn ti carî naxwazin ji xefleta ferzkirina wan derbikevin. Nabe, cîhan me wisa napejirîne, mirovatî û elbet partiya me jî wisa napejirîne. Malbat û rastiya we ya civakî berpirsê vê bûne! Bes me kesên sererast nabin dît û şerê xwe yê destpêkê jî beramberî van meşand. Heta em vê civakê û sedemên hemû lewaziyên me nadin jiyîn derbas bikin, me hewce dît bi salan xwe perwerde bikin. Me bi xwe re şer kir û ev jî duristî kir. Lê hûn ji nebihîstî ve tên. Wesfa meyil û terbiya we çiqas ser beredayî ye, çiqas belav dike, xirab dike, çiqas têrê nake û bê çare ye, ma hûn dizanin? Bêku qet pîvana van bikin hûn dibêjin; "Deka, jiyînê berdewam bikin." Li gorî min ev nêzîkbûn şaşe.

Li ser vî bingehî di nava vî miletî de kesayetek rêzdar, karzan û dikare ser bixe derneket. Ger hûn bi vê şêwaza xwe bidomînin, dê ji we jî kesayetek wisa dernekeve. Ma di nava we de kesayetek encam girtî heye, mînak heye? Mirov serberedayî û kor dibe, lê li gorî min divê evqas nebe. Li gorî min bi vê pişgiriya ewqasî ji we re hatî dayîn, êdî divê hûn ji vê rewşa xwe re çare bibînin. Ma hûn li hember xwe ne rêzdarin? Mînak heta dawî xwe dipîvim. Gelo dimirim, feydeya min heye, dikarim hinek tiştan bikim, her kêlî ji xwe dipirsim. Mixabin hûn weke ku ti pirsgirêkên we yên wisa tine ne û em neçarin we bi her tiştê we ve bipejirînin nêz dibin. Çi xema naxwin! Em xwe jî wisa napejirînin. We çima bipejirînin?

Hûn dibêjin; "Em bêçare ne, belengazin, kesek me nîne li me binêre." Nabe ev gotin beramberî me bê gotin. Em li ser vî bingehî nagirin beramberî xwe, dibêjin cihê bêçareyan, warê bêçareyane. Biçin, li wir ji xwe re cîh bibînin. Cihê kesên binkeftî û têkçûyî di nava me de nîne. Biçin, di nava civaka şepirze de hêjayî xwe cihekê bibînin. Li cem me ji vê re cîh tine ye. Evder cihê kesên bi qudret, kêrî hinek tiştan tê û destê xwe davêje çi bidest dixê ye. Li vir cihê mirovên ku hewcedariyên soza xwe pêk bînin heye. Di demên dawî de çiqas kesên serberedayî hene, tev hewl didin li cem me cîh peyda bikin. Heta dixwazin vî cihê xwe bikin quncika sereke. Di nava we de mirovên durist hene, di nava we de bi rastî jî kesên bi bawerî dixwazin hinek tişt bikin hene. Lê ev bêçare her tiştî vale derdixin. Elbet di encamê de jî dibe heyf. Kesayet, nasname û li ser vî bingehî tevgerek me ya bi dil û can beşdarî vê dozê bûyî û di hemû meşa xwe de ev selmandî wisa encam girtî heye. Ezê çi ji meşa we ya şepirze, binkeftî û çewt bikim? Vêca hêjî ev dudilî, ev

zivronek û ev zimandirêjî ji bo çine? Ma kesayetên we bi vê dikarin xwe bigihînin cihekê? Ti feydeya vê meşa we ji min re nîne. Biçin, li cihek din li gorî xwe cihekê eyar bikin. Ev refên me cihê kesên bi dil û mejiyê xwe yekbûnê esas digirin, bil ez hem dizanin bawermend bin, hem jî bi derfetên herî ji rêzê ve jiyîn û şerkirinê esas digirine. Bi rastî jî baweriya we bi vê têkoşînê heye? Gelo we xwe ber bi rastiyê ve berdaye?

Kesên beşdarî me bûyîn, kesayetên herî şepirzene. Demek dirêje bi wan ve mijûl dibim. Bes hêjî ew bi aliyên xwe yên netebitî û nebes eyarkirinê ve mijûlin. Weke ku çarenûseke, ji ber reftarên wan ên keyfî û kêrî tiştekê nayên, dixwazin partiyê bi qasî dijmin nekarî bike vale derbixin. Qaşo piraniya wan jî vê bi niyetek baş dike. Êdî em nikarin van rakin. Li vir em ne neçarin li gorî kesan bin. Ger qabîliyeta kes a veguhertin û ahengek cewherî heye, cihê wan di nava me de heye. Kesên dixwazin her roj vê partiya mezin bikin amûrê ferdperestî û helwestên xwe yên keyfî hene. Ev dixwazin partiyek ku nûnertiya vîna milyonan dike û bi şahadetên deh hezarî derbas dikeve xwe kirî vîn, tevlî vîna xwe ya kesî bikin. Ma minafiqtiyek ji vê mezintirîn heye? Kesê bêdil, xweperest û xerîzeyên xwe ve tevdigere, dixwaze van nirxên pîroz li gorî xwe eyar bike. Nêzîkbûnên bêfihêt, nîqaşên teng û şêlo raber dike.

Ev sucin û dê kesayetên wisa di nava me de nemînin. Tevî rastiyên bi qasî rojê sotîner li holê ne, ev naxwazin van rastiyan bibînin û cîh ji xweperestiyên xwe re digerin. Em ne bêçare ne, lê li hember mirovan rêzdarin. Nexwe em dikarin van kesan rojekê jî di nava xwe de negirin. Emê çi ji vê gengeşeya ziwa yan jî kesayetên kêrî tiştekê nayên bikin? Me bi rêhevalan bawer kir, serê xwe danî û kar dikin. Tişta ji destê me tê eve. Dikarim vê bikim. Tişta ji min tê eve. Ger hûn na ecibînin, biçin li cihê hûn diecibînin ji xwe re cîh û jiyanê bigerin. Ger li gorî pîvanên we cîh û jiyan nîne, ez çi bikim? Min ev hemû pir ronî kirin, hêjî hewl didim ezê bijîm an na bi vê têkoşînê diyar bikim. Yeqîn nakim ezê bikarim weke we xwe bidim jiyîn. Me ev pir ronî kirin. Me xwest jiyanek bê jiyîn ronî bikin. Em jî hewl didin biceribînin vê bi zanebûn û şerê xwe ve bidest bixin.

## Em Neçarin Xwedî Bawerî û Hewldanek Bêdawî Bin

Nûnertiya rewşek ne diyar û bêpîvan a jiyana kî, jiyana çi û şerê çiye kirin xetere. Her wiha rewşek weke; "Derfetên PKK'ê hene, weke dixwazî bijî" jî tine ye. Ev nêzîkbûn pir çewtin. Ji ber sedema namûsek mezin, mirovatiya mezin, şerefek mezin û jiyanek mezin em evqasî li ber xwe didin. Bes bi we re qet wijdan nîne. Pir ji neçarî nebe, teqez hinek sedem û esas nebin, em nikarin yek demjimêrê wisa bijîn. Şerek mirovatiya mezin, şerê me yê mirovbûnê nebe, em bêmafiyek pir mezin re rûbirû nebin, nikarin li ber xwe bidin. Lê ev ne di xema we de ye. Hûn xalên weke şeref, teqez li maf gerînê, ji bo vê çareyek teqez û derfeta berxwedaniyê peydakirinê qet nahizirin. Bi nêzîkbûnên; "Gelo di nava PKK'ê de derfetek li gorî keyfa min heye?" Bi çavsorî dijîn. Ez newêrim van nêzîkbûnan bikim. Hêza min têra van nake. Dê hêza we çawa têrê bike?

Rastiyek me heye, komkujiyê re derbas dibe. Miletek me heye, dervî mirovahî hatiye hiştin. Kî dikare van paşçav bike? Ger rastî wisa ye, hûnê rêzdar bin. Hingê hûnê bikarin behsa têgehek weke namûs û serfiraziyê bikin. Her çendî sînordar jî be, hûnê afirandina derfetan bi azweriyek mezin û weke pêşketinek girîng bibînin û derbasî nav jiyanê bibin. Nexasim wexta we derfeta pêşketinek girîng bidest xist, divê cîhan a we be. Ji ber li wir derfeta jiyanê derdikeve holê, darbeyek li bêmafiya mezin tê xistin û şerefek tê bidestxistin. Niha di van de dikare jiyan bê dîtin. Cureyek din nayê jiyîn. Ezê çi ji jiyana yên hedê xwe nizanin û pîvanên wan neyî bikim? Ezê çi ji jiyan û kesayeta yên nizanin li ber xwe bidin bikim?

Hûn bi israr bi nêzîkbûnek 'nebê nabê de' naxwazin hinek rastiyên me bibînin. Ji ber zora we diçe û ne li gorî pîvanên we ne. Wê demê ev jî diyar dike hûn rêwiyên rêyek dine û nikarin bi me re bimeşin. Çima heta niha meşa we seqet ma? Ez jî bi navê vî miletî xwedî kedekê me. Ma bi qasî misqalekê jî zerar didim vê têkoşînê? Ji ber wê her cure hewldanê bi qasî mirov bêje bêqusure, ma bi baldariyek mezin pêk nayînim? Ma ya esasî jî ne eve? Beriya her tiştî hûnê vê têbigihin û weke rêgeza jiyanê ya jêneveger fêr bibin.

Terbiye beriya her tiştî bi hedê xwe zanînê û pîvan girtinê ve destpê dike. Ger dil û mejiyek we hebe, hûnê li ser vî bingehî bêhempa bikar bînin. Em hatine vî temenî, hêjî li pêşberî we em ji we re dibêjin pirsgirêkên pir dijwar hene. Devjêberdin weke we bijîn, nikarim henase bigirim. Elbet em berpirsin. Em nikarin weke we, tevlî jiyana xwe bi xwe dixapîne bibin. Em nikarin şêwazek nediyare gelo daye jiyîn an jî kuştiye, bidest dixe yan jî dide windakirin efû bikin. Em nikarin van tevan hêjayî xwe bibînin. Bes ji bo we her tişt pêkane. Di şêwaza we de heta dawî binkeftin heye. Weke we avek cemidî vexwariye bi ser pirsgirêkê de diqevizin. Derewkariya siyasî, hema bêje di kesayeta we de bûye pîşeyek. Hûn serê xwe li ser mijara leşkerî ya herî xeter na êşînin. Dîsa çek digirin destê xwe. Ev tiştek xofe. Hûn nikarin bi vê re bijîn. Biserûber serê xwe li ser pirsgirêkekê na êşîne, lê dihizire fermandariyê bike. Hûnê dev ji vê berdin. Ji bo vê me bi baldariyek mezin şerê perwerdeyê li ser we ferz kir.

Tê gotin li welat baweriya pir kesan li hember serkeftinê nemaye. Xirab bûye, dixwaze keyfî bijî! Mirov xwe nagire vê pirsê neke: Ger baweriya van kesan nîne û ser halan de dixwin û vedixwin, nexwe emê çi ji van bikin? Ma kesên bi şanazî di nava civakê de dijîn jî bi qasî van dikin? Ew ji ber bêrehmiya jiyanê bi vî rengî dijîn. Wexta firsendek hêjayî jiyanê jî dibînin, bi baldariyek mezin ve ya rast dihilbijêrin. Lê belê rehetiya yên me di cîh de ye. Dixwin, vedixwin û dibêjin; “Hêviya min nîne, baweriya min nîne.” Qaşo niyetbaşin. Qaşo rêveber hene. Emê çi ji kesên rewşa wan wisa bikin? Yekser van mehkum bikin, ger hûn nikarin vê rewşa wan çareser bikin, biqewitînin. We fitne-fesadî û bêbawerî bi xwe ve girê daye. Kar û barê we pêşxistina şêlobûn û xirabkariyê ye. Hûnê vê bi çi rave bikin? Yan hûnê wî camêrî di nava bîst û çar demjimêran de sererast bikin an jî biqewitînin. Bi salane hûn van li ser min ferz dikin. Ev nêzîkbûnên nayên efûkirinin. Mafê we nîne vê bikin.

Hinek tişt hene, neçare kêlî bi kêlî bên çareserkirin. Her kêlî pir û erzan bi me re daxivin. Mirov ecêb dimîne. Ez bim, newêrim yek gotina van axaftinên we bêjim. Li şûna wisa baxivim, ezê karê xwe bikim, şer bikim. Ger nikarim ser bixim, ezê dev ji vî karî berdim. Bi salane li ser erkan rûdinin. Li kêleka serê wan her cure xirabkar, revok û mirovên bêbawer derdikevin, lê naxwazin xwe berpirsê vê jî bibînin. Her wiha weke tehrîk bike hemûyan jî li ser min ferz dikin. Ma piraniya we wisa

nekir? De başe, ma ev raste? Kî ev fêrbûn dan we? Çi eleqeya vê bi PKK'ê re heye? Çi eleqeya vê bi nirxên PKK'ê yên pîroz, şehîdên wê yên mezin, berxwedêrên mezin, keda kesên sozdar û xwedî cewherek rast ve heye? Ma çareserkirina van zehmete? Lê hûn çareser nakin. Hûn çawa vê kesayeta xwe dipejirînin? Hûnê şer bikin. Zimanê jiyana me, zimanê şere. Di hundurê me de şer, dervî me şer, bi xwezayê re şer heye. Kurtasî ji bo xwe gihandina armanc, çi hewce dike em ji bo wê şer dimeşînin. Ji bilî vê ma rêya jiyanê û rêya serkeftinê heye?

Gelo xwe bi xwe terbiyekirin û li gorî hinek nirxên berz jiyîn pir zehmete? Bersivê bidin vê pirse. Bi rastî jî hûn dixwazin bijîn? Ma hûn dixwazin bi şêwaza partiyê bijîn? Bi rastî jî ji bo serkeftinê hûn dixwazin ber bi welat ve bimeşin? Ma hûn ji vê re amade ne? Gelo we pîvan, rakir û danîn, hûn ji vê yeqîn dikin? Me di şerê azadiyê de, firsendên bêhempa dan destê yên xwedî îdîa. Ancex ger li naverastê pirsgirêkek we ya weke azadiyê nîne, tevî her tişt ji destê we hatiye girtin, hûn kesayetên wisa ne li hember vê hêrsek we ya mezin jî nîne, elbet hûnê bibin bela serî. Ez nabêjim dê her kes bibe partiyiyên bêhempa. Bes wê teqez li cihekê kesên di asta herî bilind de bi doza vê partiyê ve girêdayî derbikevin û ev xurtin, dizanin karên xwe bimeşînin. Kes nikare li beramberî van raweste. Mînak xwe wisa dibînim. Min ti carî doza partiyê nexist, ti carî ber bi binkeftinê ve nebir. Min di bin her merci de ev kir.

Gelek kesayetên nediyare çine, ti eleqeya wan bi xetê re nîne, girêdana temamî bi rastiyên me re qût kirî, bêdil û mejî, lê xwe xwediyê her tiştî jî dibînin derketine holê. Ev kesayet bêbawerî û xirabkariyê jî belav dikin. Tevî vê çav diberdin her tiştî. Hinek mijar hene, hewce dike ev bi qasî şûr dijwar bin û kêlî bi kêlî fermana çareseriyê ferz dikin. Nexwe dê jiyan ji dest biçe. Tiştek ecêbe; bi salane hûn fêr bûne em we wisa didin jiyîn û hema bêje bi vî şêwazî jiyîn jî pir xweşa we diçe. Lê belê ez weke we jiyanê nagirim dest. Hûn jiyanê sivik digirin dest. Bê nirx digirin dest. Ev nêzîkbûnên pir şaşin. Em qet nikarin jiyanê wisa bigirin dest.

Hûn evqas di temenek ciwan de ne, ancex hêjî we nekarî enerjiya xwe di rêyek rast de biherikînin. Bi salane em hewl didin pirsgirêkek qadro çareser bikin. Ji bo hûn rihê vê qadrobûnê bistînin, hema bêje hemû ferzkariyên kêrî tiştekê nayên ji kesayetên we derdikevin. Em çiqasî derfet bidin we, hûn ewqasî xwe winda dikin. Bi nêzîkbûnek; "Ez

çibûm, nexwe ez pir hêja me, pir mezin bûm”, navendê nas nakin, rêveberî nas nakin, her tim dibêjin; “Ez û ez.” Vêca we ev hemû gotin çibû? Lê di rastiyê de hêz, ji yekbûnê derdikeve. Ji yên herî hêsan jî, gava pêkhatiyek bihêz derdikeve dibin hêz. Hûn vê jî bi bêferasetiyek mezin ve vale derdixin. Dîsa dibêjin; “Ez yê herî bihêzim.” Ma ev bi xwe ne ferdperestiya pergalê ya herî tirsnake? Kesên herî har ên li dijî civakê kar dikin, ma ji vê pergala faşizan derneketin holê? Mane di nava me de jî xwe wisa dide der? Kesên hebûna xwe di nava xeta partiyê, vîna partiyê de nehelandîn, berovajî bi israr xwe ferz dikin, nûnertiya kesên herî xeternak ên li nav me dikin. Jêhatî û rewşa wan çi dibe bila be, -çi paşketî, çi pêşverû, çi zane, çi nezan, çi bi niyet baş, çi jî niyet xirab- ev ên herî xeternakin.

Vêca ev xwe fêlbaz dihesibînin, ji halê xwe jî razî ne. De başe, ma partî ji vî halî razî ye, vîna partiyê ji rewşa heyî razî ye? Elbet ne razî ye. Vêca hûn çawa bi vê razî dibin? We xwe bi xwe zerar daye xwe, wisa jî guncav dibînin. Vaye nebûna qadroyê partiyê wisa ye. Jixwe di vê xalê de bi van re tiştek bi navê wijdan û dil jî nîne. Xebat ji me pêşveçûnek çawa dixwaze, pêşketin tempoyek çawa ferz dike, ne di xema van de ye. Ev hema dibêjin; “Dilê min wisa dixwaze” û vîna partiyê şeht dikin.

Di encamê de ev hemû ne we dikin leşker, ne jî siyasî dikin. Hinek tişt hene, divê pêşî hûn hêza binxistina wê raber bikin. Di serê van de jî, yekbûna xwe bi vîna partiyê re pêkanîne, heta bigihije wê, bêku aciz û biweste xwe perwerdekirine û anîna asta têrkarî ye. Ev tiştek başe. Jixwe weke kes, vîna piraniya we hatiye şehtkirin. Zêde dijwariyek vîna we nîne, weke kes jî tiştek hûn xwe bigihîninê û derbas bikin nîne. Ji ber hûn belengazin, lewma hûnê biperçiqin. Karê xêrê ya herî baş hûn bikin, vîna xwe bi vîna partiyê re bikin yek, bi vîna giştî re bikin yek. Ji vê hêz bigirin, bi baldarî û însiyatîfek mezin ve xwe xurt bikin, ji nû ve ava bikin, veguherînin û carek din beşdarî jiyan û şer bibin. Ji bilî vê çareya me nîne. Cîhanê jî bidin me, em nikarin cuda şoreşê pêk bînin. Wê vîna me şoreşê çêbike. Dê vîna partiyê şoreşê diyar bike. Heta vîna partiyê ya hevbeş nebe, ti serkeftin çênabe. Her şoreş, karê komek mirovên ku mezinbûna vînê raber dikine. Şoreş heta dawî berhema mirovên xwedî îdîa ne, heta dawî dikarin bimeşin û dikarin biafirînine.

Bi salane hûn xwe jî, me jî bi pîvanên şaş mijûl dikin. Li gorî we, divê her tişt ji min bê pirsîn. Hûn hemû serkeftinan ji min hêvî dikin. Lê derfeta we tevan ji ya min zêdetir heye, zemîn û dem jî ji ya min zêdetir

guncave. Gelo we cewherî çiqasî çav berdaye serkeftinê? We dilê vê yê mezin çiqasî bidest xistiye û xwe daye? Hûnê biçin welat, bes hêj nizanin baxivin, nikarin civîneke lidar bixin, nikarin rewşekê binirxînin, wate bidin peywirekê. Nexwe çi ji vê kesayetê bikin?

Ger we xwe perwerde nekiriye, berpirsê vê kiye? Nefêmkirin û nezantiya çawa nêz bibin sucê we ye. Em yeqîn dikim me li vir her tişt zelal kiriye. Hûn dibêjin; “Ez çewt kirim, astengî derketin pêşberî min.” Bes ev hemû jî derewin. Kesek nikare qadroyek partiyê li ser bingeha xetê bixapîne. Hêza kesî têra vê nake, peywirek wî ya wisa jî nîne. Peywir û rayeya kesekî ya yekî bixapîne, ji xetê û taktîk dûr bixe nîne. Hemû biryargehan şêwazek ava kirine, qadro vale derdixin. Ger qadro bi rastî jî qadro be, dê her tiştî serûbin bike, wê navendê bîne ser rêya rast. Ger li beramberî wî rêveberiyek heye, dikare hesabê ji wê jî bixwaze. Yan dê bîne ser rêya rast, yan jî dê tasfiye bike û ya rast jî saz bike. Ev hemû jî bûna xwediyê pîvanên qadro yên rast ve pêkane. Ma heta niha we wisa kiriye? Hêj hûn nikarin bi ser pirsgirêkekê de biçin. Ger hûn dakevin nava pirsgirêkê, dibe ku hûn wê pirsgirêkê jî bînin halek wisa êdî nekarin ji nav derbikevin. Her wiha dê ev rewşa we jî qet ne di xema we de be. Nêzîkbûn û hewldanek wisa nabe.

Di rastiya PKK’ê de ne li jor, ne jî li jêr tiştek bi zorê nîne. Di rastiya PKK’ê de ji bo rastiyan her tim şerek mezin hatiye meşandin û ev hatiye selmandin. PKK li hember hemû zehmetiyan hatiye ceribandin. Serkeftina taktîkek mezin tenê zewqeke, mezinbûna azwerî ye û hewldana mirov mezin dike ye. Çima hûn ji vê direvin? Ma hûnê kengê vî zimanî û vî laşî bidin karkirin?

Xala ecêb dimînim eve: Bi hezaran li cem hevin, bes wate nadin pirsgirêkek herî hêsan jî. Nikarin biryara pêşveçûnek rast bidin, bi hevdu re naxivin û bi qasî hewce dike bi hev re nîqaş nakin. Hema şêwazên pê bawer nakin û biryarên erzan digirin. Piştî wê jî heta dawî ferdperest û çiqas reftarên wan biryaran bê wate dike hebin hemûyê raber dikin. Di serî de jî kesê bi navê fermandare pêşengiyê ji vê gengeşeyê re dike. Vêca de werin ji nav vê derbikevin. Jixwe baweriya xwe bi vesazbûnê nayîne û pir xeter dibîne. Ji bo ferdperestiya xwe, li ser bingeha esasên rêgezî vesazbûnan hewce nabîne. Ji ber dîsa hesabên kesî dike. Ji bo tenê ferdperestî, xerîze û rojek xwe keyfî bijî, bi dîrokê û van hewldanên me tevan dilîzin. Ya rastî rojek keyfî û kêliyek keyfî bê jiyîn jî nîne. Ev tenê xwe dixapînin. Lê dema vê jî dikin, hemû nirxan

tînin astek ku êdî kêr neyên.

Ma ev kiryar rastin? Na. Ma we heta niha her tim wisa nekir? Belê. Vêca çima? Bêdeng dimînin, bersiv tine. Wate nadim rewşa we, meşa we, şêwaza we ya bi ser erkan de çûyînê. Ez jî mirovim. Ez jî bi navê vî miletî tevdigerim. Lê biçim kuderê, li pey yên bêderfetim. Ti caran weke we bi derfetên amade re nemeşiyam. Ji bo min ti carî erk nehat diyarkirin. Dîsa jî her tim bi nûbûn û hewldanên afirîner ve mijûl dibim. Meşa min her tim li ser vî bingehî ye, ti caran ji ked dayînê bêzar nebûm û bi ti astengiyê ve asê nemam. Di meşa min de her tim afirandina nirx heye. Camêr tiştek nekiriye, ji rihê xwe bêzar dibe. Ji bo welat, milet û rêxistina xwe ti nirxî jî bidest naxe. Xwe bi xwe avakirinê danin aliyekê, ya heyî jî xirab dike û vê jî dike pirsgirêk li ser me ferz dike û qaşo em jî fêm nakin! Niha refên me bi kesên wisa ve dagirtiye. Hevalên me yên bi aqil û durist jî, dibêjin; "Min ferq nekir, hêza min têrê nekir û me lihev kir." Ew jî bêku hebûn û tinebûna wan diyar be bijîn û bi şerkirinê tine bibin.

Van bi temamî şaş dibînim. Ti eleqeya van bi me û meşa me re nîne. Ev kar bi pere û mereyan, tika û minetê pêk bihata, dê me ev rêbaz jî biceribandan. Lê bi van nabe. Ev doz bi vê helwestê nayê serxistin. Heta gav jî nayê avêtin. Bi pêşdarezên takekesî, daxwazên cuda û ji bo hebûna xwe tiştek cuda xwestinê ve ev doz nameşe. Ev doz ancex di çarçoveya em dixwazin pêş bixin de dikare bimeşe. Ev doz ne bi hesabên weke; "Min evqas da, evqas jî dixwazim", bi helwestên weke; "Ez hemû miletê xwe bidest dixim, hemû partiya xwe bidest dixim, hemû milet ê mine, hemû partî ya mine, ez bi temamî yê partiyê û miletê xwe me." Niha hemû avaniya me ya fermande û rêveberî hesabên weke; "Min çi daye, dikarim çi bigirim" dikin.

Hatime vî temenê xwe, xwedî kedek evqasim, lê di wateya hebûna min de yeqîn nakim tiştek ku daxwaz bikim hebe. Jixwe feraseta min wisa ye: Ez bi temamî yê partiyê û miletê xwe me, milet jî yê mine. Ji bilî vê ti nêzîkbûna min jî çênabe. Vêca li feraseta xwe binêrin: hezar hesabên we yên fitne-fesadiyê hene. Hûn di nava hesabên weke; "Dê rêxistin çi bide min, kîjan ritbeyê bide, dê milet çawa min li ser destan bigire, min çawa bide jiyîn? Ezê çawa xwe bidim jiyîn?" De ne. Ev hemû şaşin. We çalekiyek hêsan kiriye, di berdêla vê de gelek daxwazî tên kirin. Hûn dibêjin; "Bila ritbeya min zêde be, keyfa min zêde be, kes jî nêzî min nebe." Ev daxwaz tev jî şaşin, dîsa jî bi we re hene. Ev hemû

şêwaza me ya partiyê xirab dike. Dîsa jî hema bêje her kes di vê mijarê de bi hevdu re pêşbaziyê de ne. Nexasim asta herî jor jî di navê de, hinekan weke dîn û haran pêşbazî kirin. Ji avaniyê jî hinek wexta ya hêvî dikin nabînin direvin. Qaşo mafê wan heye, daxwaza girêdayî mafê wan heye û dema wê nabîne direve. Ev rewş jî çavkaniya xwe ji nêzîkbûnên partîbûnê serwer nake digire. Şêwazek min jî heye, kesên bi min bawerin û jidil bi min re ne, ti carî narevin. Ev hemû eşkere ne.

Êdî divê hûn hinek şêwazên we bi xwe efirandî biterikînin. Ger serkeftin gengaze, ev jî bi pêkanîna şêwaza partiyê ve gengaze. Dibe ku di nava me de sîxur hebin û kesayetên sererast nebin hebin. Dibe ku em wan jî bibînin. Ti wateya wê nîne PKK wisa şêlo-mêlo, dîsa fermandariyê bi kesayetên wisa serberedayî dagirtî ve bê meşandin. Ger ev kesayet ne li gorî xisletên kesayeta PKK’ê yên bingehîn bin, dê çima bibin fermandar? Ger pîvanê wan ne guncavin, em çima van bi xwe re digerînin? Yan dê xwe bînin rewşek guncav û bimeşin, an jî em wan napejirînin. Ma em mehkumê pejirandina vane, em neçarin serî ji van re bitewînin, ma em evqasî bêhêzin? Na, ne wisa ne. Lê binêrin, we ev şêwaz ava kiriye. Bi vî rengî çi zanebûn çi jî nezantî, zehmetiyên herî mezin hûn derdixin pêşberî me. Hinek kesên ji partiyê fêm dikin, hewce dikir şerê vê bimeşînin. Lê ji ber xweperestiyên wan ên hêsan nekarîn vî şerî bimeşînin.

Her tim dibêjim: Hesabê şaş ji vir û Şamê vedigere. Hemû hesabên şaş ên we kirîn, li dîwarê Rêbertiyê dikevin, rastiya partiyê dikevin û paşve vedigerin. Nexwe, hûn deh sal din jî ferz bikin, wê dîsa ev hesab paşve vegerin. Ya rast jî wisa ye. Hûnê di heman kêliyê de dev ji van hesaban berdin û bidin berdan. Gelek kesayetên weke kalantorê, li çep û rastê rêxistinê belav bûne. Em ne mehkumê vane. Em nikarin van di nava xwe de bigirin. Ev bê bawerin, daxwazkarin, ev kesên bela serê mirovên me yên ne di ferqa peywirên pîroz de ne û li pey jiyana kesî ne. Ji ber rêxistin li gorî wan tam ne guncave, ji bo rêxistinê li gorî xwe guncav bikin dihilweşînin. Qaşo dê hesabên jiyana wan a kesî jîndar bibe! Ev kesayet tawanbarê herî mezine. Li hember van helwestan karê pêşî bê kirin, ev plansaziya wan bi erdê re kirina yeke.

Ma dil bi we re nîne? Gelo bi we re baweriya beramberî doza rêxistinê nîne? Şertê bingehîn a peywirdarbûna we ya jêneveger, li ser vî bingehî şev û rojên xwe dana mijûlbûnên rêxistinê ye. Li kuderê nebesiyek heye, hûnê bi ser de biçin. Ger hûn bêjin pirsgirêka girtina

şêwaz heye, hûnê li ser wê jî bihizirin û amade bikin. Em yeqîn nakin dê ev mirov sererast nebin. Gotinek dijmin heye dibêje; "Ev milet nabe mirov." Em jî vê napejirînin. Em pir baş jî dikarin bibin mirov û dikarin hemû karên xwe jî rast bikin. Em dikarin xwe têra vê pêş bixin. Ev zimanê şoreşgerane, zimanê me ye. Ev şêwaz û rastiya me ye. Hûnê dev ji şêwaz û zimanê dijmin berdin. Ew hemû fikrên weke, nabe mirov, kêr nayê, bêxêre, divê her tim bin bikeve, hemû ferzkariyên dijminin.

Niha hûnê bêjin; "Xebat zehmete, zehmetiya qadê heye." Ancex hemû pêvajoyên me wisa derbas bûne. Kesî ji me re negotiye hûnê pêvajoyekê rehet derbas bikin. Dostên me yên herî em bi wan bawer dikin jî di nav de, her kesî zehmetiyên herî mezin derxistin pêşberî me. Heta we jî di hemû pêvajoyan de ji bilî zêdekirina zehmetiyan tiştek pêşkêş nekir. Lê bi rastî jî tevî vê em meşiyan û bi rastî jî me ser xist. Li ser dîroka partiyê bihizirin: Kî çiqasî alîkariya kî kiriye? Kî ev kar bi israrek mezin pêş xist? Hemû dostaniyan jî dizanim, hemû li pey berjewendiyan bûn, hemûyan jî bêku yekê bidin deh dixwestin. Lê me tevî van kar pêşve birin. Şêwaza me wisa ye.

Em ti carî li hember astengiyek sînordar teng nebûn. Lê hûn, derfetên amade, nêvengên amade jî nanirxînin, nikarin tevdîrek sînordar jî pêş bixin. Hûn dibêjin; "Bila her tişt ji min re amade be." Hema bêje hûn ji min serkeftinek sexte amade dixwazin û hêvî dikin. Hûn dibêjin; "Wê ev zilam serkeftinê jî saz bike." Bila bextê we hebe! Mirov baweriya xwe bi dogma û mûcîzeyan tînin, lê belê yên bawer jî dikin bêhempa şer dikin. Yên me jî bêku tiştekê bikin, qaşo li benda serkeftinên wisa ne. Ev bûye modayek. Ev hemû tên fêmkirin û yeqîn dikim we baş fêm kir. Ger we fêm nekiribe, teqez divê hûn karê fêmkirinê temam bikin. Hûnê rêbikevin, divê mirov wisa rêbikeve. Nexwe cuda dê heyfa giyana we be. Ger di vê manê de we xwe biryardar nekiribe, dê pir heyf be. Dê ev canên we vale biçin û berpirsê vê jî ne ezim.

Ez di bin her merci de bi rastiya peywirê ve girêdayî mam. Ev li holê ye. Ger hêza min têra ti derî neke, hêza min têra kesayeta min dike. Qet nebê ezê kesayeta xwe ji neyêniyan re nekim amûr û kesayeta xwe biparêzim. Vaye terbiye, bi pîvanên partiyê yên rasteqîn ve tevgerîne. Ji bilî vê tiştek din we sererast nake. Hûn dikevin nêveng û pêvajoya têkoşînek wisa, hûnê bi vî halê xwe ve şepirze bibin. Hinek bawerî û hêviyên we hene, di vê rewşê de dê hemû bi serê we de hilweşin û şeht bibin. Ti nirxa mirovê binkeftî dimîne nîne. Piştî yek binkeftinê, du

binkeftinê, hûnê jiyanê ji bo xwe bêwate bikin. Jixwe hûn vê jî hûrûkûr dijîn.

Ev ne çarenûse, encama şêwaza we ye. Ez ti carî kena xwe bi mirovan nakim û wan biçûk nabînim. Bes hûn bi israr naxwazin di çarçoveyekê de cîh bigirin, pak nêz bibin û di nava hestiyariyek mezin de najîn û bi vî rengî jî rewşa xwe ya pêkenok bi xwe derdixin holê. Piştî vê qonaxê, em nikarin xwe weke kesayetên ji rêzê û bê kesayet bixin devê kesî û me heta roja îro jî nexist devê kesî. Ancex hûn bi vî halê we ve kêmek maye PKK bibe partiyek herî zêde bê kesayet, pêkenok û bikeve rewşên herî xirab. Çima? Dîsa ji ber vê şêwaza we ye, dîsa ji ber nebesiya vê rewşa nûnertiya we dibe ku wisa be. Her çendî hûn bi qasî dixwazin ferzkariyan li ser min bikin, piştî vê qonaxa welat û miletê me di navê de dijî, ezê her cure nebesî, neyênî û pêşketinên ku bersivê nadin armancan hûn derdixin holê nepejirînim û erê nakim.

Di bin şerê PKK'ê de, misoger hinek nirxên ku rêz bên girtin hene. Kes nikare ji me hêvî bike em ji van nirxan tawîzan bidin. Şehîdên me hene, kesayetên wan fermandarên fermanê ne û dê pêdiviya wan jî pêk were. Bendewariyên miletê me hene, soza me heye ku divê miletê me jî bixin dewsa mirovatiyê û dê pêdiviya van jî pêk were. Ez ti astengî û nebesiyên we yên li pêş van napejirînim. Baweriya me bi mirov heye, mirov esas digirin. Li gorî me mirov ser dixe. Piştî mirov ket ser rêya rast, tişta ku nekare bike nîne. Lewma nikarim vê meşa we ya çewt bipejirînim, wate nadim vê û erê jî nakim. Li vir di navbera me de şerek heye. Li vir a hewce dike veguhere ne ez û partî ne, hûnin. Em neçarin heta dawî mirovê baweriya bêdawî û xwedî kedek bêdawî bin. Ev xisletên kesayetî yên PKK'ê dikin PKK yan jî me di mijara hedefên me de bibin serkeftinê ne. Mînak ez di mercên herî zehmet de jî wisa me. Ev şert ji bo min jî derbasdarin. Ma hûnê çima ne wisa bin?

Rastiya esasî ya rexneyan wisa ye. Rastiya rexneyan di vê xalê de çeka xwe gihandina vê encamê ye. Heta hûn vê xalê bidest bixin, hûnê bên rexnekirin. Ji bo ji rexneyan rizgar bibin, divê hûn xwe bigihînin vê kesayetê. Heta hûn negihin wê şêwaza xebatê, kesayeta xebatê, kesayeta serkeftinê ya ez behsê dikim, yek kêliyê jî wê tîrên rexneyan li ser we neyên kêmkirin. Wê ev tîr li her cih û aliyê we yên kar nakin û ser naxin bikevin. Heta gorê jî hûn nikarin ji van rizgar bibin. Beriya her tiştî hûn neçarin cidiyeta li nav PKK'ê fêm bikin. Ev cidiyet, cidiyeta rexneyê ye. Li dîroka PKK'ê binêrin: Li wir her tişt li ser bingeha rexneyê ye. Ango

rexne bêhempa ye û heta mirinê ye. Heta mirinê ye, di gorê de jî didome. Lewma me pîvanên behsa wan kirî destnîşan kirin. Heta hûn xwe bigihînin wan pîvanan, hûn di nava PKK’ê de di bin tufana rexneyan de ne. Heta hêza we têra vê neke, hûn nikarin çavên xwe jî vekin. Ev çima hewce ye? Ji ber çareyek din nîne lewma. Her kes li benda rizgariyê ye. Hûn pir daxivin, hinek tiştan pir dixwazin û xwe gihandina vê jî gengaze. Bêrî û xeyalên we hene, ev jî ancex xwe gihandina vê kesayetê pêkane. Ji bilî vê tiştek din me têr nake û temam nake.

### Refên Me Cihê Bi Dil û Mejiyê Xwe Tevlîbûnê Esas Digirine

Divê mirov xwe bigihîne kesayetek şerê mezin. Kesayeta şer jî, ne kesayetek hûn wisa dizanîne, kesê pir baş rexne dike û pir baş dike ye. Em ji kur bên bila be, em çiqasî ji rê derketibin bila be, emê tev vê bidest bixin. Emê hêza nûnertiya vê hema li her cihî ji her kesî re raber bikin. Nexwe dê hemû hewldanên we bê encam bimînin û bi rastî jî temenê we vale biçe. Heta hûn ji hêla zanebûn ve têgihiştîbin û li her cihî bibin mirovê peywirê, dê ev hewldanên me bidomin. Ji bilî vê ti pirsgirêka me nîne. Ji bilî vê em nikarin bikin û destwerdanê bikin. Ji bilî vê negengaze rojekê jî em we îdare bikin. Em hinek din sist bikin û berdin, wê dîsa ji her alî ve kesên bêbawer, lewma kesên ketî û xayîn rêya xwe bigirin zêde bibin û yek ji we jî nikare ji bin vê xeteriyê derbikeve. Ma ev tiştek başe yan jî we tine nake? Lewra dibêjim, têkoşîna herî mezin, hem di şêwaza partiyê de zelalbûn, hem jî ew li hember her kesî û ji bo her erkê bi qasî bikare serkeftî bimeşe, bi xwe re misogerkirin û biryarkirine. Kesayet wisa di her rewşê de saxlem girtin û dana meşandine.

Kiryarên di dema dawî de tên kirin, ev ji çewtkirin, jirêderxistin, parçekirin û şûna vê her kes bi navê partiyê kesayeta xwe ferzkirine. Her tim li bendê ne van kesayetên xwe ferz bikin. Xeteriya herî mezin jî eve. Pir eşkere xeteriyê şanî we didim. Qaşo wexta hûn hewl didin bi vîna xwe ya keyfî bijîn, ji wê rêxistin, çeper û hêza hûn ne di ferqê de ketine çêdibe û ev jî hemû hesabên we serûbin dikin. Ti cihê we hûn biçinê nîne. Niha hûn bi rêxistinê û politikaya em dimeşînin ve li ser

lingan dimînin. Lê nefêmkirina vê û encam nederxistin jî xweşa we diçe. Li ser vê hesabên şaş kirin, weke jiyanek jixwebere xwe sipartina vê jiyanê hema bêje xafiltiya we tevan rehetî ji bo xwe pejirandiye, lewma xisleta we ya ber bi encamên herî xeternak ve dibe.

Hûn bi pîvanên pir xweperest û ferdperest ve tevlî refên me bûn û hêjî israrên we hene. Ya rastî zêde yeqîn nakim baweriya we bi jiyanek hevbeş jî heye. Ji ber hûn li hember wê jî bihêrsin. Ev ji nêzîkbûnên we yên beramberî hev diyarin. Nediyare kî dixwaze çi li kî bike. Nediyare kî ji xwe re kî gelo heval an jî hevrik dibîne. Kî ji xwe re kî çiqas hewce dibîne, çiqas weke hevalê dozê dibîne nediyare. Hûnê xwe bi van bigihînin kuderê? Ev nêzîkbûnên we bêserûber dimeşin. Ev jî ferdperestiya herî paşketî ye. Di demên dawî de kesayeta herî zêde pergal tehrîk dike ew bûyera bi navê azadiyê vaye wisa ye. Jixwe bingeha kesayeta we ya dîrokî jî, milet esas nagire û di vir de jî nava tengezariyek mezin de ye.

Ez van gotinên we bi ti hêcetê napejirînim: Hûn dibêjin; "Em bêçare ne, tine bûne, em nikarin di vê qonaxê de bi îdîa bin, nikarin veguhertinek mezin pêk bînin." Em jî vê beramber xwe, partiya xwe û miletê xwe bêrêziyek mezin dibînin û weke çavkaniya herî mezin a hemû xeteriyan dibînin. Helwesta herî xeter eve. Axaftina weke; "Evqas ji min tê, ez tenê dikarim wisa bim", dijminatiya herî mezine. Ev xisleta muhafezekar a herî mezin ku tevahî pêşketinan radiwestîne. Ev her tişt rawestandine û bi israr xalên hûn tê de asê dimînin jî evdere. PKK'yîbûn, dervî vê ferasetê derketine. PKK'yîbûn, ev rewş weke çarenûs nedîtine, wê parçe parçe dike ji bo vîn heta dawî hewl dide, derfeta azadî û serkeftinê dayîne. PKK û Rêbertiya PKK'ê wisa ye. Ger hûn nekarin vê astê bidest bixin, negengaze mirov ji bilî siûda bûna berxê qurbanê bide.

Hûn bi vê kesayeta xwe ve nagihin ti derê. Lewma hesabên xwe saxlem bikin, me jî ji vê ezaba wijdanî rizgar bikin. Êdî dilê min bi min naşewite. Ji ber xwe didim karkirin û jiyîn. Dilê min bi we dişewite. Ji ber hûn nikarin xwe bidin karkirin û astengiyan derbas bikin. Niha ezê çi ji we bikim? Ger hûn di pergalê de weke welatiyek ji rêzê biman, dê feydeya we ji karekî re hebûya yan jî qet nebê dê karê gelek ji we hebûya ku bikare xwe rizgar bike. Hûn ji bo şoreşê rabûn, lê we bersiva kesayeta wê neda. Hûn ji bo şer rabûn, lê we hêza ku ji ti pirsgirêka wê re ava bike raber nekir. Ji min jî tam di vê xalê de lîstokan hêvî dikin,

afirandinê hêvî dikin û tiştên ne eslî hêvî dikin. Hûn dibêjin? “Ma dê çi bibe, dikarim wisa jî îdare bikim.” Ma hûn dîn û harin? Kesê ji bo şer û azadiyê radibe, ma qet di vê rewşê de van gotinan dike? İzdiraba min jî tam di vê xalê de ye.

Xwe nadim ber şêwazek wisa ya îdarekirinê. Nabêjim ezê van wisa bi vî halî ve îdare bikim. Yeqîn dikim ger vê bikim, dê bibe xirabiya herî mezin li xwe dikim. Ezê çima we wisa bipejirînim. Yan hûnê rêya xwe bigirin biçin an jî ezê li dijî van xisletên we tevan heta dawî têbikoşim. Êdî divê ev îşkence biqede. Ji ber ti destê bi vî rengî ji bo şoreşê rabûyî ser nakeve. Bi salane hûn fermandariyek pir sexte û rêveberiyek pir sexte li ser min ferz dikin. Dibêjim, dev ji van bê esliyên xwe berdin. Lê belê hûn jî vê ji xwe re şanazî nabînin. Ev hîn xirabtire. Ger şanaziya we heye, wê bi şêwazek rast raber bikin.

Ez îllahî ne li pey afirandina serkeftin û destana me. Kes jî tiştek wisa ji we naxwaze. Lê rewşek wisa jihevketî, dudilî û cinan jî napejirînim. Peywirên ji rêzê hene, ger hûn evqasî berovajî nêzî wan bibin, em nikarin we bipejirînin. Em weke rêheval bi hevdu re û bi serkeftina xwe re her tim serbilindin. Ancex bi vî halê we yê zêde binkeftî ve, emê çawa bi we serbilind bin? Mînak ez dixwazim wisa bim. Jiyana min serbilindî, ewlehî û wêrekiya gel û hûn tev endamên Partiyê ne. Vêca hûn çima nikarin vê raber bikin? Ma egîdî, ji bo derdora xwe ne bûna çavkaniya serbilindî, serkeftin û wêrekiyê ye? Hûn xwe çawa bi pîvanên sexte yên cuda ve bidin pejirandin? Bi zoraki û lîstokan ceribandina xwe dana pejirandin, ma ne karê pergalê ye? Hemû polîtîkvaniya pergalê, di quncikê de rêya xwe dîtin ne wisa ye? Ma em dikarin vê bipejirînin? Jixwe ma gengaze mirov bikare van di nava PKK’ê de bisepîne? Di nava PKK’ê de pêkanîna vê, ji bo min nêzîkbûna herî kujere.

Nexwe, di vê xalê de rexne li xwe kirin, xwe sererastkirine. Ez li pêş vê astengiyek cidî nabînim. Ger astengî hebin jî, em kêliyekê zûtir van astengiyan ji holê rakin. Kî asteng dike hûn xwe bigihînin encamek wisa? Ma kes beramberî we heye? Ger heye, diyar bikin. Ger hûn nekarin van pêk bînin, nexwe hûn berxê dayîkê ne. Hûnê bi vî halê xwe ve bi ser kîjan şerî de bimeşin? Mirov nikare bi vî dilî û mejî bi ser dijmin de biçe. Niha ez bi tena xwe şer dikim. Bi vî halî nikarim bi we re şer bikim. Lewra ger çareyek we heye, hêza we heye di vê çarçoveyê de bi me re bimeşin, danin holê. Hêza eşkere, bê acizbûn û xapandinê

danin holê. Em jî bizanin ku bi kî re dimeşin. Bila sozek we bi qasî bikarin pêk bînin hebe. Em destanan ji we naxwazin, lê karek herî hêsan jî xirabkirinê yan jî ger hûn heqê wê nedinê asayî nabînin.

Di vê xalê de bi israr dixwazin vê bêjin: "Bihêle bila wisa derbas bibe. Bihêle bila her kes ya xwe bike." De başe, ger wisa be dê encam çibe? Wê di encamê de PKK'yek ku di navê de kes kesî sererast nekirî, bi şêweya herî ketî xirab bûyî û tine bûyî derbikeve holê. Kîjan dil vê dipejirîne? Pêwîste di vê mijarê de lêpirsîna dil û wijdan hebe. Emê çawa bikarin pêşî li rewşek wisa ku bê serê me bigirin? Kesê ku evqasî xwe hêjayî bêrêziyê dibîne, gelo wê di çi rewşê de be? Hûn dixwazin, di nava rojên zor û zehmet de bikevin û bixeniqin. An jî hûn xeteriyê ferq nakin, dibêjin rojên wisa ji me dûrin. Ev ne rastin. Ger tevdîra wê neyê girtin, ev rojên xeter nêzin. Ger berxwedaniyek pir dijwar re rûbirû neyê, dê ev roj bên serê we.

Hûn weke ev tenê karê mine nêz dibin. Ma ez neçarim her tim we saxlem bigirim, şeref û serbilindiya we li ser lingan bihêlim? Ezê çawa bi tena xwe we li ser lingan bigirim? Heta tevî van zehmetiyên we, kesayetên we yên têrê nake û ferzkariyên we yên her tim di meyla xirabkariyê de, ezê çawa van karan bimeşînim? Bila mirinek erzan dûrî we be, her tim jiyanek binkeftî dûrî we be. Ji bo xwe çare bibînin. Şev û rojê xwe bikin yek, ji bo erzan nemirin, binkeftî û şepirze nejîn, çare bibînin. Peywira we ya sereke eve. Çare tenê li cem min naqede, çare hûnin. Xwe nespêrin xeyalên sexte, baweriya sexte, pêwendiyên sexte û kesayetên sexte. Bizanin xwe bispêrin hêza xwe ya cewherî û bibin çare. Hûn dixwazin tevlî pêvajoyek şer bibin û bi ser gelek peywiran de bimeşin. Lê divê ev ne ji rêzê be. Li vir çeka we ya herî mezin, hêza we ya rêxistinkirinê û hêza we ya qadro ku nûnertiya vîna rêxistinê dike. Ji bilî vê ti çek nikare we rizgar bike. Qadro, hêza nûnertiya partiya me ye. Qadro li nav şer, enî, hundur û dervî welat hêza nûnerê ye û rizgarvanê herî mezine.

Niha ez bi vê pirsgirêkê re rûbirû me. Hûn xwe dispêrin min wisa dijîn. Ez xwe naspêrim xwe, hûnê çawa xwe bispêrin min? Dihizirim, çi li cem min hebe, min ewqas daye. Jixwe, dîsa jî tişta ji destê min tê dikim. Lê ev ji xwe re kirina palpişt ve hûn nikarin temenê xwe yê ciwan jî bidin jiyîn. Li gorî min divê tam berovajî be. Firsendên ku heta niha ji we re hatî dayîn nekêmin. Şaşiya bi we re, hûn ne di ferqa vê de ne, heta yên tên dayîn têr nabînin û zêdetir dixwazin. Hûn nekarin vê

kesayetê derbas bikin, hûnê beriya her tiştî bêrêziyê li hemberî xwe bikin. Li gorî min hêj we nekariye vê kesayeta xwe derbas bikin. Kesayeta we di nava xwe de hatiye zincîrkirin û di rewşek mehkumê bêçaretiyê de ye. Me jî xwest vê çareser bikin. Hêza herî mezin em bidin we eve. Li hember vê li ber xwe nedin. Li gorî min hêza herî mezin her cure dijminî ber bi binkeftinê ve bibe, hêza teqîna mirove, hêza şerkirinê ye û hêza rêxistinkirinê ye. Ger em bikarin vê derbixin holê, em dikarin dijmin têk bibin. Ji bilî vê kî çi dide kî şaşe. Kî ji kî re dibêje; “Tu xurtî, dikarî cuda jî xurt bibî, tu dikarî xwe bispêrî min, ez jî xwe bispêrim te dikarin hêz ji hev bigirin” şaşe. Ev di heman demê de bêrêzî ye.

Ezmûnên min ev nîşan dan: Me ev mirov hinekê bi hêza cewherî ve dan karkirin, em hatin heta vir. Me ev milet hinekê gihand hêza wê ya cewherî hatin heta vir. Bes li gorî min hêjî nirxandina hêza cewherî sînordare. Hêza mirov a bêsînor mezinbûnê heye. Ger mirovek bixwaze dikare bi xwe re her tiştî biqedîne. Rêbertiya PKK’ê eve. Şêwaza serkeftina PKK’ê ya di şoreşê de eve. Xwe ji pêşvebirinê, bûna xwedî pîvanên serkeftinê neçar dike dûr nexin. Ji vê netirsin. Bila azwerî û vîna we her tim ber bi vê ve bimeşe. Tiştên ji dervî vê erzan bibînin û tenezil nekin. Ezê çi ji kesayeta min ber bi serkeftin û her cure çareseriyê ve nabe bikim? Ezê çi ji kesê ku min li hember dijmin weke lîstokekê dihêle û her roj bi sedemên erzan ve winda dike bikim? Pirsgirêkên herî bingehîn ên di nav me de tên jiyîn evin.

Li vir ber bayê xeyalên sexte nekevin. Ez hêjî xwe nadim ber xeyalan. Ma ez dibêjim min mezin ser xist û tişta dixwazim min kir? Ma xwe dinepixînim? Na. Hêjî kesek wisa me dixwazim xwe bi xizmetek bêsînor ve bidim jiyîn. Ma bêku xwe bispêrim keda xwe, dixwazim bijîm? Ma dixwazim li ser keda hinek din xwe bidim jiyîn? Na! Ji bo min tişta herî bi wate hewldanên minin, zewq û azweriya hewldanên min didine. Ji bilî vê li hember tit tiştî eleqe raber nakim û tenezil jî nakim. Mixabin hûn bi temamî li ser keda hinek din xwe mezinkirinê dana jiyînê, hostatî û fêlbazî dihesibînin. Ji bîr nekin, rêya her cure heramî û her cure diziyê jî eve. Hûn ne di ferqê de ne, çawa li ser keda kî dijîn.

Ez di keda xwe, encamên keda xwe û bi hinek din re rast parvekirinê de ne tiştên ji xweber, van rêgezan esas digirim. Mirov nikare li ser nirxên rêxistinê hesaban bike yan jî van tine bihesibîne û nezane rast

bikaranînê re bijî. Ji bilî vê hûn di rewşa kesên pir belengaz de ne. Hûn bi vî halê xwe ve nikarin li hember şerê hovane yê li welat li ber xwe bidin. Hûn nikarin di nava PKK'ê de bijîn. Mafê we nîne hûn aciz bibin û xwe bixetimînin. Ez ji we re dibêjim çareserî wisa ye. Tevî barek bi qasî cîhanê li ser milê mine, ma qet ji we re dibêjim bêzar bûme? Hema hema her tişt li pêş me asteng bû. Tevî vê ma me ti carî gilî û gazinc kirin? Erkên li pêş we sînordarin û ti aliyên wan ên bên lomekirin jî nîne. Ti erkên hûn nekarin ji bin rabin jî nîne. Hemû jî erkên hûn pir rehetî dikarin bikin.

Vaye tişta em dixwazin li vir bibiryar bikin û kesayeta em nûnertiya wê dikin eve. Armanca me xwe gihandina vê kesayetê ye. Ev alfabeya me, baweriya me, şertê me, soza me, ehda me û fermana me ye. Em bi vê rêbikevin, emê her derî bişewitînin, hilweşînin û ji nû ve ava bikin. Ji bilî vê hezar carî we jovan bike zêdetir tiştek ne li benda we ye. Em dixwazin li vir bibiryar bikin. Cardin em li vir pir cidî li ser karin, girêdayî soza xwe ne. Hûnê soz û biryarê bidin û di kesayeta xwe de pêvajoyekê bidin destpêkirin. Teqez divê rexne we bînin vê qonaxê. Heta hûn neyîn vê qonaxê, xwe saxlem bernedin. Destpêkirinek wisa bikin, hûn dikarin ji vir û şûn de di vê çarçoveyê de bibînin. Ev ya herî başe. Ez çi bikim, ji bilî vê nepêkane berpirsyariya we rakim.

Vê rastiya ku li Rêbertiyê jî serwere binasin. Neçarim rêbertiya pir kesî bikim. Vê ji her alî ve bibînin û ji cihek wê ve bigirin. Kar zehmetin. Naxwazim ti xeyalê xam danim pêşiya we. Ev hemû ji bo rastiyan bi hemû dijwariya xwe ve şanî we bikin. Vê bipejirînin, hem hûn jî bi temamî rastiyan û ya erê bînin, hem em jî we weke baskê meşek heqê wê dide û baskê pêşeng bibînin. Dîsa em jî yeqîn bikin ku em dijîn û nûnertiya hinek tişt dikin. Bila wateyek jiyana me jî hebe. Ez dîsa di vê xalê de zêde xwe û nûnertiya xwe girîng nabînim. Ger hûn biçin di roja duyem de bikevin, dê pir hef be û piştî evqas hewldan dê berpirsê vê jî hûn bi xwe bin. Ji ber binkeftin û bêçaretiyê, nepêkanîna rê û rêbazan hûnê xwe berpirsyar bibînin. Dibe ku hemû taktîkên şer şaş jî bin, dibe ku hemû rêveberî jî di rêya şaş de bin, lê dîsa jî qadroyê ku di vê çarçovê de dijî, dikare pêşveçûnekê bibîne.

Di rewşa heyî de ji bo me xeterî êdî ne dijmin an jî ev hevkare. Ger em nekarin vê astê bidest bixin, xeteriya herî mezin di nava me de ye, yekser di kesayeta me de ye. Ji ber van sedeman, naxwazim radeya zerara em didin xwe bihizirim. Sedema evqasî li ser van pirsgirêkan radiwestim eve.

Niha ger ev hewldanên min nebin, hema bêje hûnê rihê hev bistînin. Dê we ji heft salî heta heftî salî rihê hev bistanda. Rastiya Kurd di vê mijarê de temamî bela ye û dixwaze carek din dîrokê dubare bike. Hûn temamî gihiştine vê qonaxê. Emê jî vê hilweşînin û derbas bikin. Karê herî bingehîn divê hûn fêm bikin eve. Jîrî fêm bikin, têrkar fêm bikin. Tiştên vedibêjim zelalin û rewşek pêkanîna sînordar jî dikare ber bi encamên mezin ve bibe.

Em cuda nikarin nirx bidin we. Em nikarin dilê we bi tiştên hûrûmûr bihedirînin. Weke gelek kesan kirî misoger tiştek bi xelatan û pesindanan nayê dayîn. Dê ev xapandin be. Nirxa herî mezin em bidin hevdu, di meşa fermandar a rasteqîn de, hevdu dijwar amaje kirin û hêzek mezin li ser vî bingehî derxistina holê ye. Ji vê hêjatir nîne. Piştî vê qonaxê, cuda ti çareyî nabînim. Kesê ku di rastiyê de doza xwe ser naxe, nikare ti benê jiyanê bigire, nikare serê wê jî bigire. Ya esasî piştî windakirinê, hûn bijîn jî bi qasî quruşekê nirxê vê nîne.

Van bi israr vedibêjim. Ji ber we pir serî tewand, bi şaşiyan re pir lihev kir, xweperestiyên we her tişt şikand, derbas kir û ev ne di xema we de bû. Nikarim li hember van rewşên web ê bertek bim û weke xeteriyek ji rêzê jî nagirim dest. Ji ber ez li vir her cure xeteriyê dibînim. Her cure hilweşîn, her cure binkeftin ne li cihek din, li vir heye. Hûn bi xwe li ser gelek biryargehan serwer bûn. Gelek yekîneyên partiyê di bin fermana we de bûn. Çima wisa nîvçe û di rewşek sosret de hiştin? Hêz û dilê we çawa ev pejirand? Ma dibe ev xebat wisa hêsan bê destgirtin? Mixabin li gorî we hêsan û hûn dibêjin; "Çawa dibe bila be, em wisa bimeşînin." Ma wisa dibe? Ma bi van fêrbûnan, hûn dikarin beşdarî meşek mezin bibin?

Tevgerên mezin hene. Kiryarên dijmin ên rojekê jî heta erşan me ber bi îsyanê ve dikişîne, vedixwîne îsyanê. Vêca ma emê bi vê kesayetê, bi vê berxwedaniyê beramber vê îsyanê bikin? Ma hûnê bi vî şêwazî hesab ji dijmin bixwazin? Çeka partiyê ya herî zêde pêwîste hûn bikar bînin, di nava xwe de tînin halek ku êdî kar neke, gelo hûnê wisa bi ser dijmin de bimeşin? Bi xisletên milîtanê yên herî bingehîn lîstinê û hewcedariyên wê nepêkanînê ve gelo hûnê artêşê bidin şerkirin? We heta niha paşverûtiyên xwe bi fêrbûnek mezin û wêrekî ferz kir. Lewra neçarim partiyê biparêzim. Ji van kiryarên xwe re dixwazin bêjin çarenûs, dixwazin bêjin ketina mezin, çi jî ketîbûna mezin, dixwazin bêjin ferdperestiya mezin û xweperestiya mezin, çi dibêjin bêjin, emê jî li hemberî vê xwe biparêzin û bînin asta saxlem. Heta em xwe negihînin

asta saxlem, bila ti kes ji me erêkirinê hêvî neke.

Em nikarin ji belengaz û bêçareyan re bibin derman. Li vir cihê van nîne. Ji kesê hêza wî têra qural û nûnertiyek saxlem nake re jî, ez nabim derman. Me ya hewce dikir daye, hewce dikir ji mêj ve we xwe gihandina tenduristî. Li hember van karan tevan, nikarim seknên we yên wisa bê wate bipejirînim. Ya rastî hewce dikir berovajî bûya. Hewce dikir kesayetek rêhevalê hêj pirsgirêk derneketin dibîne û şêwazek rihê wan distîne ji mêj ve bihata girtin. Ti vîn û hêcet nikare me ji vê pêkanê dûr bixe. Êdî hûnê dev ji hêcetên xwe berdin. Çi tiştê we yên bi ti hêcetê neyên parastin hebin, hûnê tevê berdin. Rexne eve.

Ger soz mezin û watedar bê dayîn wisa dibe. Ma em tine bibin, bila her tişt ji destê me biçe? Ev dijmin di nava bendewariyek mezin de ye. Tevî neheqek mezin û zalimek mezine, dixwaze me bi reşbînî û xirab dana nîşandanê ve encam bigire. Ma dilê we vê dipejirîne? Hûnê çawa vê hêsan bipejirînin? Ger hûn dibêjin; "Dilê me ti carî vê ranake", nexwe hûnê xala biryardarî û asta nûnertiyê wisa bidest bixin. Ji dervî vê her tişt derew, sextekarî û bi awayek objektîf dijmin esasgirtine. Ger şêwaz, ziman û hewldan têrê nake, hûnê xwe kamil bikin. Ya rast eve û ev jî pêkane. Ya din tenê derewe, mijûlkirine.

Ger pêkane ji her alî ve xwe ber çavan re derbas bikin, bi qasî hewce dike rexneyan jî xwe xurt bikin vê xalê û asta biryardariyê bigirin. Ev biryar li her derî û her demî ji bo we di asta hêjayî zêrîn de ye, siûdek mezine û ya herî hêja ye. Cuda tiştek din evqasî ji bo me feyde nade. Ji vê xweşiktir, watedartir, hewce û hîn zêdetir azad nîne. Fêrkeriya herî xweşik a hemû mirovahiyê, her cure fêrkeriya xwedayî, her cure fêrkeriya mirov a berz bûyî, fermana vê dide. Hûnê çima li dijî vê derbikevin. Kesê li dijî vê derbikeve dijmine û dê ew jî biçe cihê ku heq kiriye. Lê em nikarin biçin cihê ku me heq nekiriye. Ji bo vê em bi israrin. Ji bo vê berdêla wê çi dibe bila be, hûnê vê xalê hêjayî xwe bibînin. Dema hewce kir weke ji nû ve biwelidînin, ji nû ve dest bi jiyanê bikin, vê pêşketinê bidest bixin.

Wê li ser vî bingehî rexneyên we jî li ser esasî rasteqînî pêş bikevin û rexnedana we jî di astek tam biryarê rave bike de be. Ev jî li beramberî jiyanê bibe sekna we ya herî bi îdîa û meşa we ya herî bi saxlem.

**25 Adar 1997**

## SERKEFTIN HER DEM Û LI HER DERÊ YA MILÎTANIYA PKK’Ê YE

Nefêmkirina rastiya Rêbertiya PKK’ê û hewcedariyên wê nepêkanîn, ji her demê hîn zêdetir hebûna di nava me de û hemû hêzên dervî me ber bi binkeftinê ve dibe û ji jiyanê der dike. Hêza pêşveçûna derketina rêberiya ku di dîrokê de kêm hatiye dîtin, şêwaza di bin wê de û hostatiya nêzîkbûnan weke ku raveya jiyanê ya yegane ye, yê bi wî re nakok jî tîne astek nekare bijî. Çi di nava partiyê de, çi dervî partiyê, em pêvajoyek şerê ku hêzên dijberî me şer dikin pir bê wate û ketî ferzkariyên xwe tundî dimeşînin dijîn. Em ji hêza xwe cendirmeyên cîhanê dibîne bigirin, heta ecûcê di nava me de, ev derdor tev li hember rastiya Rêbertiyê xwedî helwestin û nêzîkbûnên xwe bi tundî ferz dikin.

PKK’ya me nas kirî û nirxandî weke ku rê ji şêwaza jiyanek şênber re vedike, tê dîtin ku li beramberî vê xwediyên şêwaza jiyana cîh digirin jî, dev ji şerên xwe bernedane û ev şer hûrûkûr tê meşandin. Em şerê bi hêzên dervî xwe re zêde nakin pirsgirêk. Ev hêz hatine nasîn û nêzîkbûnên ji wan re hatine diyarkirin. Bi hewldan, wêrekî û fedekariya hewce dike ve bi ser van de çûyîn heye û rewşên diqewimin jî li gorî xwezaya şer guncav tên jiyîn. Bêguman peywira hîn zêdetir naskirina van, hîn balkêştir pêşxistina rêbazên têkoşînê û serkeftî bûyînê her dayîm hene. Ji bo serxistina şerekê pêwîste mirov şênber be, li gorî rewşên li qadan û di nav artêşê de diqewimin her dayîm lêhûrbûn hebe. Emê bi kî re, li kur û çiqasî şer bikin? Emê bi kîjan rêbazan û taktîkan encamê bigirin? Bersiva van pirsan dayîn, di pratîkê de peywira herî bingehîn a kesê ku dibêje ez ji vî şerî re amade me. Kesê vê bike dê ser bikeve, yê neke jî dê bin bikeve. Ji bo hêza mirov têra vê jî bike, ya herî zêde hewce divê em li nav xwe bigerin.

Bi mînakên rojane derdikeve holê, wexta em rast nêzî sedemên navxweyî nabin, em nikarin rave û dahûrîna nasname, kesayetên neyênî û nexasim vesazbûn û çalekgeriya yekîneyan bikin. Pir caran hatiye dîtin ku rewşek bi şêweya qet nayê payîn, dijmin jî di nav şaşwaziyê de dihêle bi îmha û radestbûnê ve encam dibe. Ev mînak bi xwe jî dide diyarkirin ku ya di şer de bi me dide windakirin ne dijmine, sedemên me yên navxweyî ne. Wexta hemû dîroka PKK’ê hat lêkolînkirin wê bê dîtin, girêdanek ji rêzê ya li hember xisletên vê dîrokê yên erênî jî

misoger serkeftinê saz dike. Lê nikare xwe bigihîne nirxên wê yên bingehîn û ji ber heqê wê nayê dayîn, berovajî xwe dispêrin wan nirxan rêxistinê dikemirînin û çarçûr dikin, di nasnameyekê, kesayetekê û şêwaza jiyanê de jî rewşên nayê pejirandin û windahî tê jiyîn. Lewma ya ji bo şer hewce, şerê navxweyî ye.

Ev demek dirêje em vê hûrûkûr nîqaş dikin. Eşkere destnîşan bikim, wexta min destpê kirî heta niha tişta min bi hêrs dike, ne rastiya dijmin a beramberî mine. Vê rewşa dijmin pir xwezayî dibînim. Ger min bikuje jî axînek herî biçûk nakim. Lê tiştek bi qasî vê ketîbûna di nava me de min bihêrs nake. Ger ez bêjim di mijara ev çawa me dikujin an jî divê em çawa wan bikujin de xala herî zêde em zehmetiyê dijîn rastiya we ye, dê ev mijar baştir bê fêmkirin. Eşkere dibêjim: Pir baş tê bîra min, ji destpêkê ve nefretê ji vê rastiyê dikim. Em ji nav malbatê bigirin heta gund, her ku çû ji wir ber bi civak û heta jiyana dewletê, ji roja xwe nas dikim ve nefretê jê dikim. Niha tê dîtin hûn dev ji vê bernadin. Elbet ev rewşa we tê fêmkirin. Tişta herî zêde hûn ji darezên nirxan dûr xistin, her cure şaşî û xirabiyan ve xwedî kir, ev nêvenga civakî û dewlete. Dîsa di rastiya me ya welat û milet de, her tişt li dijî mirovê azade, qedandina vê rastiyê jî di destê pergala serdest û hevkaran de ye. Em ji yê herî nêzî xwe bigirin heta yên dijberî xwe ev hemû bi yekdestî ji bo vê kar dikin û niha baştir fêm dikim ku hûn jî berhema vê ne.

Niha hîn baştir bi dahûrîner dibînim ku nêzîkbûna min a destpêkê raste û dinirxînim. Tawanbar dikim, hêrs dibim û elbet şerê vê jî dimeşînim. Bi ya min, hûn qet çênebûna û we jiyan nekiriba dê baştir bûya. Vê jiyanê lenet dikim û hovane dibînim. Ya herî girîng jî, hêceta yekane ya vê jiyanê bi vê re, ango bi we re şerkirin dibînim. Di nêzîkbûna xwe de niha baştir fêm dikim di vê mijarê de şaşiyê nabînim û meyla min a esasî jî raste û yeqîn dikim divê mirov bihêz bijî. Her wiha dibînim ku şêwaza şerê rast jî encamên serkeftî dide.

Elbet hûnê di nefêmkirina vê de israrê bikin. Di vir de ti gumanê min nîne ku niyeta we başe û hûn dixwazin karên baş bikin. Ji bo hewldanên we ti gotinê nakim. Ji bo min ev ne mijara gotinê ye. Ji bo min a mijara gotinê rewşên cuda ne. Ji bo min, ya girîng şerê di hundurê xwe de rast dana derve û li gorî sonda xwe guncav nûnertiya serkeftinê kirine û ev ast girtina we ye. Bila kes xwe nespêre hinek xisletên xwe yên erênî û nebêje; “Ma ne duristim, hewldana min nayê dîtin?” Pêwîste misoger ti kes bi van nêzîkbûnan me tengav neke û paşguh neke ku em dixwazin çi

bêjin. Pêwîste her kes bikare rastiyan fêm bike, bibîne, pê baxive û wê duristbûnê raber bike. Vê ji bo xwe nabêjim. Tê gotin hinek ji we duristin û dixwazin şer bikin. Ji bo ev vale neçin van vedibêjim. Elbet ji bo vê jî êdî divê hûn bizanin çi divê çawa bê kirin û hewldana vê jî rast bidin. Eşkere bêjim: Heta hûn vê raber nekin, ji bîr nekin hûn dibin çavkaniya hêrsê. Bûna milîtanek hêja ya partiya me danin aliyekê, hûnê ji bîr nekin tenê bela serî û sitiriyekin. Hûnê bizanin zû-dereng dê hesabê vê bê pirsin, weke encama şaşiya we bi xwe jî hûnê dawiyek bi êş re rûbibû bimînin, ger hûn bijîn jî, ji bîr nekin dê rojekê hesabê vê ji we bê xwestin.

Rolek dîrokî me dayî xwe heye. Dema em hewcedariyên vê pêk tînin, ne ji bo hûn xwe bixapînin an jî bi mirinek erzan ve xwe li ser ferz bikine. Ev hemû zêdetir ber bi şaşiya hîn xirabtir ve dibin. Pêwîste hûn tiştekê di hemû şaneyên xwe de bihesin. Heta wate nedin rastiyan û pêdiviyên wê pêk neyînin, dê kes we mirov nebîne û hûnê jî nekarin behsa şeref, rêzdarî û jiyanê bikin. Her çendî hûn bi kelogirî jî bin, bendewariyên we hebin, qetiyen hûnê ya hewce peyda nekin. Hûnê bizanin ev qanunek Rêbertiyê ye, şerê vê yê dijwar heye û wate bidin xwe. Ger hêza we heye, egîdiya we heye, sondek we heye, hûnê di vê şêwazê de raber bikin. Nêzîkbûnên weke; "Min fêm nekir, bi vî sedemî yan jî astengî re rûbirû hatim", pir erzan xwe xapandine.

Hêza we tine ye! Kesê hêza wî neyî, çi karê wî di nav şer de heye? Ango girêdana we bi nirxan nîne! Vêca kesên bi nirxên herî berz ve negirêdayî be, çi karê wî di nav vî şerî de heye? Hûn bi kîjan dilî tên cem me? Ma sondek we ya şerefê heye? Ez jî di van refan de ji bo van nirxan heme. Ma hûn vê berçav digirin? Gelo hûn çav û guhê vê ne? Deriye hûn vedikin û nêzîkbûna we ya ji nirxan re, wexta rûpoşa we tê derxistin, dide diyarkirin ku hûn cuda ne. Dîsa dibe ku bi qasî hûn xwe dispêrin bêhêziyê, xwe dixapînin, hûnê derdor jî bixapînin an jî tam weke bêrûyan bi zanebûn xwe ferz bikin. Dibe ku hûn bêjin; "Ma dê çi bibe, vaye ezê wisa xwe ferz bikim û bidim pejirandin. Bimirim jî, bijîm jî nexeme. Ev ji bo min ne girînge." Ev helwesta kesayetek pir ketî her tim raber dike. Bes weke gelek caran tê gotin tenê ketîbûne. Ti nirxa wê ya bîrdozî û siyasî nîne. Nexasim di cengaweriyê de ti nirxa wê nîne.

Hûn çawa dikarin vê kesayetê evqasî bijîn? Nexasim di nava me de wêrekiya wisa jiyînê ji kur digirin? Kî ji we re got dikarin wisa bijîn? Hûnê çawa bêrûtî, bêarî û fêrbûnên xwe bidin pejirandin. Dibe, fêm

dikim hûn çima bêarin. Dizanim we zêde para xwe ji hestên namûsê û serfirazî ne girtiye. Lê belê gelo negengaze ev bê bidestxistin? Gelo em nikarin hinekê bidin? Çima hûn ya ji we re pir hewce nagirin û nahizirin bigirin? Ev hinekê me dixe nav fikaran.

Ji roja xwe dizanim ve derdora me bi kesên tinebûyî, qediyayî û bêşeref ve dagirtiye, ev jî bi dawî nabe û dê hêsan jî derbas nebe. Lê me ji van tevan re şerek da destpêkirin. Dibe ku yên beşdarî refên me bûne hestên wan ên girîng pêş ketibin. Dibe ku ji hinek peyvan re wate peyda kiribin, bi salane jiyana xwe feda kirine, di jiyanê de rêzdarî bidest xistine. Lê niha dinêrim, ev jî têrê nake. Ev zêde encamê nagire, heta rê ji encamên xirabtir re vedike. Hûn dibêjin; "Min şer kir, di destê min de çek hebû, nexwe dikarim hemû nirxên li derdor hatine afirandin hêjayî xwe jî bibînim." Ev feraset hîn xetertire. Niha em baştir fêm dikin ku, ev kesayeta ketî ya civaka ji rêzê, heta ji tolazî, berdoşî jî xetertire û di nava me de kesên wisa nekêmin. Vê pir xofdar dibînim. Em ji qetilkirina rêhevalê xwe bigirin, heta îmhakirina yekîneyên mezin, kesên her cure zerarê didin nekêmin. Ev hemû li derdora we rû didin. Lewma dibêjim, mixabin hestên we yên ar û namûsê zêde pêş neketiye. Ji ber rewşa li ber serê xwe nedîtin an jî dîtin dijwar nêz nebûn, rasterast dide diyarkirin ku hûn bêşerefin. Di vê mijarê de qet hewce nake hûn xwe bispêrin filan û bêvan. Hûn dibêjin; "Fermandarim, pir bibandorim." Bes li ber bêvla we helwest û reftarên nayên efûkirin rû didin. Dîsa peywirên we hene. Tevî vê hûn berê xwe jî nadinê. De başe, nexwe hûnê çawa baweriyê bidin? Hûnê kî bixapînin?

### Şervanê Azadiyê Ji Bo Armancên Xwe Kesê Ku Xwe Birêve Dibe Ye

Fermandarî hinekê pêş dikeve. Bes hûn bi wê lîstinê jî ji xwe re dikin fêrbûnek. Şeref û serfiraziya milîtan heye. Bi vê lîstin, bi yek tiştê xirabkirina fermandariyê ye. Hûnê vê nekin. Dibe ku bi van lîstinê hinek tişt keyfa we diçe. Lê belê hûn wê gêjbûna xwe ya cihê xwe di ti têgehên leşkerî de neyî, ji hêla siyasî ve jî ti wateya xwe neyî, ew kesayeta tê zanîn ku di civakê de winda kirî nebûyî xwedî rastiyan, bi ziravkirî didomînin. Ev xweşa we diçe û têra we dike. Lê ev rewşek hûn xetertire. Hûn dikarin gelek hêcetan rêz bikin û bêjin; "Min ji ber vê

sedemê nekarî bikim, hêza min têrê nekir, min nexwest, nehatim girêdan." Mixabin hûn bi van hemûyan dibêjin ku, ji pêdiviyên hunera têkoşînê dûrin. Dîsa jî bêfihêt dibêjin; "Ez amade me." Divê hûn vê çareser bikin. Heta ev neyê çareserkirin, divê hûn li nav refên me nemînin. Heta hûn xwe bigihînin sozek rast, pêwîste xwe terbiyekirinê bidomînin. Êdî dev ji wê nêzîkbûna xwe ya evîndariya xwe dana jiyînê ku bi çavê me re dikin berdin.

Eşkere bêjim: Me hêj di rojên destpêkê de, ev dayîka me jî be, bi şerê li hember van nêzîkbûnan ve hatin heta niha. Weke ku tiştek me devjêberdayî nîne, ti şerê ku me ji bo pêdiviyên têkoşînê nemeşandin jî nemane. Ma pêkana vê pir zehmete? Ger zehmete li ser rawestin. Dixwazim bawer bikim hinekê aqil û wijdanê we heye. Şervanê azadiyê, kesê pêşî li ser xwe serwer û ji bo armancên xwe dizane xwe bimeşînê ye. Ger ev hêza we jî nîne, nexwe xwe cuda bigirin dest. Beriya her tiştî ji bo hûn wisa bin, xwe binirxînin. Qet hewce nake xwe bincil bikin û cureyek din ferz bikin. Beriya her tiştî xwe jidil û bêtirs sererast bikin. Bila hemû bêşermiyên we derbikevin holê. Dibe ku ev we ber bi çareseriyekê ve bibe. Qet nebe hûnê di jiyana partiyê de xwe bigihînin rêzdariyê.

Em neçarin di nava PKK'ê de nîqaş, daxuyanî û veguherînên yekser pêk bînin. Çewtbûna ji rêzê kirine û bêpîvaniyê danin aliyekê, wêrekiya vê raber kirin jî –ger xirabûnek pir cidî nayê jiyîn-, xeflet û nêzîkbûnek bêberpirsyar ji xebatan re kirine. Piştî ev berpirsyarî hat raberkirin, nabe mirov behsa cidiyetê bike. Di nava PKK'ê de beriya xwe bigihîne rastiyan sekna we, sekna xafilekî ye. Di helwestên xwe yên heyî de israr we ber bi belabûnê ve dibe. Ger hêjî hûn di nava pêvajoyek amadekarî de nagihin encamê, ev jî dide diyarkirin ku hûn kesek bêferasetin an jî weke her carê derfetên partiyê desteser dikin, ji bêriyên xwe yên takekesî heta armancên xwe yên çînayetî dibin kesek hewldana xwe gihandina gelek tiştan dike.

Çeka we ya herî mezin, israra di nefêmkirinê de ye. Çeka we ya sereke, çavên xwe girtine, weke margîse li gorî nêvengan hunera reng danê ye. Bi vê jî ancex hûn dikarin sextekariyê yan jî seknek cuda bidin pejirandin. Her çendî dervî vîna we jî be, rewşa hûrûkûr hûn dijîn wisa ye. Soza we pir eşkere, helwesta we jî pir têrkar û dijwar nîne. Hûn dibêjin; "Pêdiviya me bi perwerdeyê heye." Tevî hûn pir tên perwerdekirin, gelo kî heta niha di pratîkê de rast bersiv daye? Kî rast û

di cîh de wate daye rastiyê? Ezê nebêjim hûnê bêfihêt bi helwestên xwe yên takekesî ve bijîn, qet nebê heta ku ewleya xwe saz bikin jî hûn nikarin bi jiyanê ve bên girêdan. Her cure bê eleqedarî, nefêmkirin, nedîtin û ji her cure pêdiviyên jiyanê dûrketin xisletên we yên herî diyarkerin. Hûn dibêjin; “Ma hinekê bê eleqe bim dê çi bibe, hinek rastiyên bingehîn ji xwe re nekim pirsgirêk dê çi bibe, peywirên taktîkî yên hîn girîngtir hene, ma van jî jinek din re bihêlim dê çi bibe, xwe bi xebatek ji rêzê ve sînordar bikim dê çi bibe û helwestek xwe îdare bikim esas bigirim dê çi bibe?” û van dikin. Dibe ku ya herî zêde hûn dixwazin jî ev be. Lê belê gelo hûn qet ji xwe dipirsin; “Ez li kurim, erka min çiye, dijminê min kiye?” Hûn nizanin xeterî ji kîjan alî ve tê. Tenê dema xeterî li çavên we dikeve yan jî mejiyê we parçe dike –jixwe yeqîn nakim hûn wê jî dibihîzin-, hûn ferq dikin. Ev ne raste. Mirov bêarî û dev ji xwe berdanek wisa kêm dibîne.

Bawer nakim di helwesta min de xapandinek hebe. Bi min re lêgerîna rastiyê pir dijware. Bi hemû nêzîkbûnên xwe ve rastiya hiş bidestxistin û ew bi şoreşê veguhertin di astek bêhempa de ye. Lê tevî vê hêjî fêm nakim hûn çawa ewqasî xwe dixapînin. Hûn bi min re tam berovajî ne. Hûn girêdana xwe ya bi rastiyan re qût dikin, tiştek ku pêwîste bê veguhertin û serxistin hebe, pişta xwe didin wê jî. Kî ev fêrî we kir, we ev rêbaz ji kî girtiye? Li vir çeka we ya herî mezin gotina; “Ezê çavên xwe ji rastiyê re bigirim.” Devjêberdin rastiyek herî biçûk pêk bînin, hûn nêzîkbûnên bi şêweyên; “Ji bo bidim diyarkirin ti eleqeya min bi wê re nîne, dikarim her cure lîstokê bikim” raber dikin. Rewşên we yên niha wisa ne.

Kesayeta bê îdîa, kesayeta ku haya xwe ji rastiyên dîrokî û civakê yên bingehîn neyî, pir ferdperest û xweperest hatî avakirine. Çawa ku di civakê de hezar kes êrîşî karên dergevanî û hemaltiyê dike, hûn jî di nava PKK’ê de weke hemal û dergevanên wisa ne. Ne ji bo pêkanîna peywir û serkeftinê, hûn êrîşî rayeyek biçûk dikin. Şoreşgeriya raye em behsê dikin, her tiştê xwe dana jiyîn û helwestên keyfî em behsê dikin, kesayeta ku ji bo dergevaniya begê civakê û karmendê biçûk ê dewletê êrîş dike ye. Hûn vê didin der, ev jî kêrî pênc quruşan nake û pir xetere. Di refên me de şoreşgeriya raye kirin, xwe bi têrkirinên biçûk û keyfî ve dana jiyîn, weke şapeyekê mezin bûye. Em ji nexweşiya desthilatiya pêşwext bigirin, heta sitandina rihê rayeyekê ku xwe pê têr bike, gelek nêzîkbûn tên raberkirin. Şervantî xirabkirin, rastiya şervantî hunere

paşçav kirin û hemû rastiyên wê dana aliyekê tê jiyîn. Şaşwazim ev çawa pêş dikeve? Hûn çima evqasî heyranê vê ne? Jixwe hûn berdêla encamên van jî pir giran û bi êş didin. Hûn li beramberî dijmin îmha dibin û li ser gel dibin bela. Rewşa we tam karesate.

Tiştek nedaye, bi salan xwariye, vexwariye. Hîn zêdetir bi çavsorî dibêje; "Tiştên din jî dixwazim." Ketiyek jî wisa naxwaze. Dîsa jî dibêjim ev hevalin û ez jî van mirovan nas dikim. Ji hinek neçariyan ketine nav mijarên kirêt. Mirov siûdekê bide dê bibin mirovên baş. Mixabin ger hinek hêjî li nav refên me hemû derfet û hewcedariya mezinbûn, xweşikbûn û serkeftinê, fermana hatî dayîn li aliyekê dihêlin û dibêjin; "Emê çawa xwe bidin jiyîn", ezê ji van re bêjim ketî û bêjim hûn nikarin wisa bijîn. Ger hûn bêjin; "Li welat ez wisa fêr kirime." Ezê bêjim ên hûn fêr kirine jî ketîne. Hûn vê ji kî fêr bûn? Li naverastê dîroka PKK'ê heye. **Mazlum** çiye, **Zîlan** çiye? Hûn çima wan berçav nagirin? Ma wan weke we xweperestî kir? Ma wan weke we xwe sipart raye û berjewendiyek herî biçûk jî kirin? Na! Vêca ya hûn dikin çiye? Hûn çawa diwêrin vê bikin? Bersiva we ji vê re nîne. Ma hûn sîxurin, bela serî ne?

Xebatên ku kesayeta **Mazlum** afirandî û xebata şerên we yên sexte afirandî ji hev cuda ne. Hinek nirxên ku me dayîn û şervantiya wan û qaşo ew gotinên li derdora we erzan tên gotin ên weke; "Ez fermandarî didim te, raye didim, vê berjewendiya kesî didim" ji hev cuda ne. We wisa îdare kir. Merîfetên we, şêwaza jiyana we ber bi vê ve dibe. Ma hûnê çima xwe bincil bikin? We girêdana bi nirxên şoreşê yên berz ve nezaniye û ya herî girîng jî we mirovên hêja nas nekirine. Piraniya van nûciwan bûn. We nirxê ku hewce dikir ne daye wan. Ya herî girîng jî we kesên xeternak di bin navê fermandarî de kiriye serkêş. Weke ehbap-çawişên hevdu bixapînin, we derdora xwe jî birêxistin kiriye. Lê di vê rewşê de ya dibe tê serê partiyê.

Me ewqas çek û şervan dan we. Hûn çil salan jî mijûl bibin, ma dikarin yek ji van pêşwazî bikin? Elbet ji bo we ev ne girîngin. Hûn dibêjin; "Jixwe dê Rêbertî pêk bîne." Vêca kanî wijdan û kanî peywir? Hûnê çawa xwe bidin bawerkirin? Niha baştir tê fêmkirin çima bîrdozî û di xeta fermandeya çil carî bê pîvan de israrkirin hewce ye. Ger hestek we ya namûsê hebe, peywirên bi qasî çiyan hene. Me hemû rê û rêbazên jiyanê fêrî we kirin. Ev jiyan û ev sekna min tê çi wateyê? Ev peywir û fermandariya min a raye tê çi wateyê? Vêca ger hûn ne di wê rewşê de

hesabê vê bidin, çima disekinin? Çima hûn bi şêweyek nayê fêmkirin de daxivin? Madem hûn nikarin peywirekê ser bixin, nexwe hûn çima erkdarin? Hûn dibêjin; "Mirovan nas nakim." Ma kesê mirovan nas nake, dibe rêveber? Hûn şervanên, dibêjin; "Nikarim li ser xwe serwer bim." Kesê li ser xwe ne serwer, navê wî diyare. Ma dibe mirov van kesayetan bigire nav PKK'ê? Ma mirov çek dide dest? Ma mirov wî digire nava mirovên binamûs? Ev qirêjan bi xwe re digerînin. Hûnê wan pak bikin û ji wan re bêjin rawestin. Hûn bi salan van kesayetan di nava refên me de digirin, vaye ew jî ber bi radestbûnê ve dibin. Xebatên me yên dîrokî sabote dikin.

Vêca hûnê hesabê vê çawa bidin? Hûn fêr bûne, dibêjin tiştek nabe. Ev pêşketin bi keda we çênebû. Xebat ne bi hewldanên we hatine heta vir. Li gorî gotina herî sivik hûn erzan dijîn. Qaşo kesên ji cih û fermandariya xwe ne razî hene. Hûn behsa cih û fermandariya çi dikin? Tu tawanbarekî. Tu bi qasî nekarî li vir pariyek nan bixwî ji heq bêparî. Tu kêrî tiştekê nayî. Ti cihê te li vir nîne. We di şer de tenê zerar da. Ev çend salin hûn di nav PKK'ê de, we ewqasî zêde zerar da. Kesên zerar dayîn, niha jî li pey lêgerîna heqin. Kesên hewce dike hesabê bidin, niha cîh ji me dixwazin. Hûn jî çavên xwe ji van re digirin. Ji ber bi salan we bi van re lihev kiriye, xwedî li erkên xwe derneketine, ji bo hinekê jî hûn weke wane.

De başe, vêca wê hesabê van rewşên rû didin kî û çawa bide? Devjêberdin hûn hesab bidin min, gelo pirsgirêkek we ya wijdan heye? Ger ez bim, li wan çiyan pirsgirêkên wisa jiyînê danin aliyekê, dê li wan waran yekîneyên pîroz bihatan avakirin. Qet nebê mirov ji xwe şerim dike. Gelo hûn bi van kesayetên xwe ve çiqasî hêjayî van çiyane? Ev kesayet çiqas hêjayî van çekane? Hûn çima vê ji xwe napirsin? Ger kesê ji bo xwe dibêje; "PKK'yî me, cengawerim, şanazim û serbilindim" hene, dê ji nû ve van di ber çavan re derbas bike.

Xwe jî, me jî nexapînin. Ger hêza we têra peywiran nake, nexwazin, lê wexta we peywir jî girt bi ser de biçin. Beriya her tiştî û ya pîroz peywire û serkeftina wê peywirê ye. Mixabin hûn hewce nabînin devê xwe jî biwestînin. Hewce nabînin serê xwe bêşînin û ya heyî jî fêm bikin. Hûn fêr bûne bêjin; "Dîsa jî di nava PKK'ê de jiyan heye." Di PKK'ê de jiyana çi heye? Kî gotiye di PKK'ê de jiyana wisa heye. Ger hêza we têrê nake eşkere bêjin; "Rewşa min eve, tevgaviyê de me, ger hûn weke parsekan pariyek xwarin bidin min, ezê ji bo we hezar carî

şikir bikim." Ger rastiya we eve, mêrxasî bêjin, em jî we têr bikin. Lê belê hûn tên bibin cengawer û fermandarên binavûdeng. Hûnê kengê fêr bibin ev peyv tên çi wateyê? Belê, pergalê hûn kirine demagok. Her kes bi derewan jiyan dike. Lê em jî yeqîn dikin me hinek tişt fêrî we kirine. Jixwe, tişta li holê jî canê we ye. Hûnê vê fêr bibin. Ger hûn van fêr bibin û pêwîstiyên wê bikin, erk fermandarî ye. Di van mijaran de xwe nexapînin.

Hûn jî dibînin nikarin hesab bidin. Qaşo hûn her tim dibêjin bi nirx û me ve girêdayî ne. Em hinek waneyên girîng didin. Em ji hêla kesî ve waneya jiyana dewlemend jî didin. Girêdana ked û fikir a bi hev ve û hemû hewcedariyên wê yên tên zanîn didin. Ancex dîsa jî qaşo şêwazek we ya nû heye, cardin ya xwe kirin xweşa we diçe. Li holê ye ev çi şêwaze. Kesên li ser xwe ne serwer sekna wan a li hember dijmin û encama jiyana wan li holê ye. We fêm nakim û tehlîl nakim. Gelo hûn pir bêhêz hatine hiştin, pir belengazin? Gelo bi qasî nekarin bibin xwedî ti sondê bêhêzin? Gelo bi qasî nekarin rastiyan bibînin korin? Hûnê li gelek cihên ku biçinê jî rê ji heman rewşan re vekin. Dibe ku weke tolê rakin vê bikin. Ma mêrxasî wisa ye? Her çendî hûn her ya xwe bikin, min tevdîra xwe girtiye. Hûn dibêjin; "Çi ji min bê kirin heqe, hunera min eve, ez kêrî karek cuda nayêm." Dizanim ku ev huner çawa tê avakirin. Dibe ku hûn van tevan weke çarenûs û ji ber keyfa we jê re tê ferz bikin. Lê dema roja wê hat, emê jî li gorî hêza xwe van ji holê rakin.

Ev hemû hûrûkûr di civakê de tê jiyîn. Hûn jî dixwazin van di nava me de bidin jiyîn. Ne şaşwazim ku hûn van dikin. Lê dîsa jî li gorî min di vir de şaşiyek heye. Ji ber bawer nakim hûn van tevan bi qestan dikin. An tam bibin derewker û sextekar, an jî ger pêkane ji van dûr bikevin. Lewma bi israr li ser we disekinim. Peywira min eve. Kes nikare vê weke çarenûs ferz bike. Em di nav civakê de jiyîna van fêm dikin, lê di nava me de nabe.

## Kesê Ku Di Rih û Hişê Xwe De Qiyametê Raneke Nikare Ti Şerî Bimeşîne

Şerefa mirovekî, bi radeya girêdana wî ya bi hebûna diparêzê ve tê pîvan. Bêşerefî û ketîbûna mirovekî jî, nakokiya bi tişta qaşo bi wê re heye. Vaye emê vê derewê ji holê rakin.

Min gotinek bihîst: Beriya niha sê hezar salî, di dema fîrawûnan de, yekî ji Misrê helbest dinivîse. Ecêb dibîne, dibîne ku mirov bi gotinên xwe re nakok û ne li gorî pratîkên xwe de ne û dibêje xirabûnek mezin heye. Bi vê êşa dijî re helbest dinivîse. Ji ber di serdema koletiyê de di navbera gotin û pratîka mirovan de qûtbûn heye xemgîn dibe û helbest dinivîse. Min jî ev mînak girt, anî roja îro. Di nava me de kî girêdayî sozê ye? Kendala di navbera rewşa paşverûtî û gotina civakî de, bi qasî ti serdemên dîrokê û civakê de pêk neyê vebûye. Vaye hûn jî raveya vê ne. Hûn jî ji nav vê rastiyê hatine, girêdana di navbera rastî û gotinê de tînin rewşek neyê nasîn. Civakên beriya niha sê-çar hezar sal berê, wexta hinekê ji vê qût bûn qiyamet rakirin. Di dîrokê de jî xirabûn wisa destpê kir. Niha jî we ev ji xwe re kiriye kesayetek û şerê vê li ser me ferz dikin. De vêca bide pejirandin, de vêca bide bawerkirin!

Cardin bêjim, li vir ji rewşa bi zanebûnê kirin zêdetir bêçaretiya we mijara gotinê ye. Yeqîn dikim hûn niha baştir fêm dikin em çima we naxim dewsa mirovan. Yek kesayeta ji bo min bê pejirandin, bûna kesê me destnîşan kiriye. Çiqas dixwazin teqleyan bavêjin, hûn nikarin vê sekna xwe bi min bidin bawerkirin. Kesê bi xeta bingehîn û nirxên bingehîn ve negirêdayî, ji bo me ti nirxa wî çênabe. Kes nikare bi ti hêcetê bêje; “Wisa jî dibe, ev çarenûse, em fêr bûne wisa bijîn, ne hewce ye em li gorî evqasî xet û rêgezê bijîn. Çima hinekê destûr ji jiyana keyfî re nayê dayîn?” Rêya ku destpêkê pir asayî, lê dema hinekê tê israrkirin ber bi her cure karesatê ve dibe, çavkaniya xwe ji vê ferasete digire. Hûn bi zorê bi derfetên ji nû ve avakirinê re rûbirû ne. Vê jî bi helwestên xwe yên heyî ve ne tenê vale derdixin, xwe ferz dikin û me jî tînin asta nekarin kar bikin.

Van ne tenê niha, bi salane dibêjim. Neku nepêkane ev pêk neyên. Ez her şervanî wisa digirim dest. Rojekê, du rojan dinêrim, ger zêde ne hevgirtî be, yekser qirika wî re digirim. Neku bihêzin evqas kesayetên paşverû di nava partiyê de cîh digirin, ji ber hûn xwedî li peywirên xwe

dernakevin, çavkaniya xwe ji vê digire. Ji gava me dest bi şer kiriye heta niha ev tê kirin. Ji reftarên gundî yên xaf ku nehatine perwerdekirin re gotin; “Hêza wî ya leşkerî heye, hêza wî ya çalekiyê heye.” Helwest û ferasetên bê feraset û paşverû, derxistin erş û ezmanan, hinekan jî çend peyvên ku ji partiyê fêr bûne di devê xwe de kirin benîşt, bêku qet serê xwe bêşînin dê şêwaza wê ya pratîkî çawa be, xwestin bi wan peyvan li ser piyan bimînin. Ev jî PKK’yîbûn fêm kirin û xwe anîn rewşek neyên nasîn.

Hûnê di vê de israr nekin. Ger feraset, cidiyet û namûsa we hebe, êdî hêza derbaskirina van raber bikin. Ger hûn dûrî vane, çi karê we li derdora min heye? Ger hûn wisa berdewam bikin xwe bixapînin û di encamê de jî hûnê winda bikin. Ji ber ez nikarim weke we winda bikim. Min tevdîra xwe girtiye. Ez bi kesê dixwaze bi min bide windakirin, didim windakirin. Xwe zêde bi aqil nebînin. Hûn xafil dihizirin û wisa dihesibînin ku dê kar wisa jî bimeşin. An jî hûn dibêjin; “Ger ne meşe jî ne pirsgirêke, ma dê çi bibe?” Em van nêzîkbûnan xeter dibînin. Misoger nabe nêzîkbûnek wisa ji rastiya fermandar û şervan re bê kirin. Helwestek ku ji bo we ji rêzê ye tasfiyekarî ye, ya herî mezin vale derdixê ye. Ne ji bo hewldanên min, heyfa jiyan û hewldanên we bû. Heta ku ez bijîm, ev hewldanên min vale dernakevin. Lê wê hewldanên we bi temamî vale derbikevin. Ma ne heyfa we ye? Hûnê xwe berpirsê vê bibînin. Ji ber wexta yekê evqas hewldan vale derxistin, tê wateya we vale derdixe. Wexta we di bin berpirsyariya xwe de winda kir, her wiha hûn didin windakirin. Ji ber vê hinekê bi aqil bin.

Şertê sereke yê şer, hêza watedayîna sondek rast raberkirin û qiyamet jî rabe ji wê rastiyê jênevegere. Wexta hûn ji ber sedemek herî biçûk berovajî rastiya herî bingehîn dikevin an jî dema hinek berovajî van dikevin, hûn bêdeng dimînin. Ger em gotina herî sivik bêjin, piraniya we lihev dike. Bi we re rêgeza şer û şerê li ser şêwaza bi qasî mirov bêje nîne kême. Beriya her tiştî hûn şer di rih û hiş de nameşînin. Kesê ku di rih û hişê xwe de qiyametê raneke, nikare beramberî derve ti şerî bimeşîne. Hûn bandorên burjuvaziya biçûk ên pir xirab dijîn. Xwe jî zêde dixapînin. Hûn pir xirab hatine mezinkirin û hewl didin bi vê jî kesek weke min bixapînin. Van li her derî bikin, lê li cem min nekin. Ger bandora min li ser partiyê heye, serwerim, di nava partiyê de vê nekin. Li gorî min nêzîkbûna dibêje; “Çiqas bikim, ewqas feyde ye”, bêwate ye. Em girêdana we ya bi partiyê ve danin aliyekê, ev bilêvkirin

jî berovajî partiyê ketine. Hûnê bêjin; "Ma ez evqasî berovajî ketime?" Elbet, hûn berovajî ketine. Ya rastî tiştek ku neyê çareserkirin nîne. Berovajî, gelek tiştên girîng ku bên fêmkirin û pêk werin hene. Bes hûn nizanin bi çi re rûbirû ne û ev jî ne raste.

Kesê ku zêde tiştekê ji we bixwaze nîne. Hûn hatine û we jiyana xwe daniye holê. Ez jî pêdiviyên vê fêrî we dikim. Ger şaşî û kêmasî hebin, didim nîşan ku çavkaniya xwe ji kur digirin. Weke tê zanîn, em heta dawî ji rexneyan re vekirîne. Lê ger piştî wê hûn dibêjin temame, ji rêgezan tawîzan nedin. Li gelek qadên ku hûn xebatê lê bimeşînin, wê dîsa heman xayîntî bên jiyîn, heman kêmasî bên jiyîn û hûnê dîsa tênê lê binêrin! Hûnê bi van gotinên xwe yên teng ku dibêjin; "Min xwe negihand, têrê nekir, nehatim guhertin, nekarî biguherînim, bê eleqe mam, hatim xapandin û mijûl bûm" ve, dîsa derewên xwe rêz bikin. Elbet hûn di rojekê de negihan vê kesayetê. Ji dergeha dayîkê ve fêrî vê kesayetê bûne. Lewma ez û we lihev nakin. Heman weke di civakê de bûyî, ez û we wisa hêsan lihev nakin. Lewra hûn xeternakin, nexwe baş dizanim hûn çiqas dixwazin bibin rêheval.

Li ser bi min re nakokbûnê baş bihizirin. Ez belengazên xwedê ji xwe re nakim rêhevalên şer. Jiyana min ji her hêlê ve li holê ye. Ji aliyê taktîkî ve we birêve dibim û didim jiyîn, lê tenê ji bo we li gorî pîvanên xwe bikim rêheval vê dikim. Divê hûn qet xwe bi van nexapînin. Ma hûnê xwe bispêrin van û keyfê bikin? Ma hûnê xwe bispêrin van wisa gêj, xafil û keyfî bijîn? Ma ev pêkane? Ev di nav her rêxistinê de dibin, lê di nav rêxistina me de nabe. Karê sereke bê kirin, hûnê bêjin; "Ev çine rû didin, ez çiqas dikarim di nav vê de cîh bigirim, çiqas dikarim girêdayî bimînim?" Û fêr bibin. Ger hûn dihizirin zêde fêr bûne, binêrin pratîka we li ber çavane. Van ne ji bo me bişemitînin û windahiyan bidin kirin, ji bo rê ji çend serkeftinên girîng re vekin fêr bibin. Nebêjin; "Rêvebirim, karbidestim û bi raye me" û xwe nexapînin.

Em dixwazin cidî bin û cidîbûn mafê me ye. Em neçarin di navbera soz û peywiran de, di navbera hewldan û armanc de, di navbera şêwaza we û serkeftinê de pirekê, têkîliyekê saz bikin. Kesayetek teqez derewker, teqez bêpergal û ne diyare çi dike nabe. Kes nikare me bi seknek wisa pozbilind û bêberpirsyar ve girê bide. Hûn nikarin xwe wisa ferz bikin. Fermandariya me û şêwaza jiyana me firsendê nade vê. Her çendî hûn van xalên destnîşan dikim, bêfêhmiyê bidin, hûnê ewqasî winda bikin.

Ne di van rojan de, hêj dema karkerek reze ji rêzê bûm jî, kesê li kêleka min kar nedikir, min çavên wî re derdixist. Min şerê xwe yê yekemîn wisa da destpêkirin. Di nava partiyê de ji bo nirxan weke kesek evqasî şer dimeşîne, ma hûnê bi min bidin pejirandin evqasî xwe li ser nirxan bidin jiyîn? Jixwe ji nav we bi hezaran erzan mirin. Jiyana wan vale çû. Vaye ez bi vê xembar dibim. Ji bo dilê min bi we dêşe fêm bikin û ger hûn ji van karan re amade ne, dibêjim li gorî wê bi me re bimeşin. We çek girtine destê xwe û xwe jî tiştek dihesibînin. Ez hêjî bi binesaziya wan çekan ve mijûl dibim. Gelo ev evîndariya beramberî xwe çavkaniya xwe ji kur digire? Kî ji we re got hûn bihêz bûne? Hûn îmha dibin. Çek wisa nayê bikaranîn. Jixwe hûn ne di ferqa çekan jî de ne. We bi qasî tonek alav û amûr bi destê dijmin ve berdan. PKK'yîyek nabêje; "Çiqas bidim windakirin, ewqasî bi aqilim." Ger hûn wisa bikin, dibe ku rojekê li cihek din bimirin, lê hûnê di nav PKK'ê de her roj bimirin. Kes wisa we nade jiyîn.

Çeka we ya herî mezin, di nefêmkirinê de israre. Nefêmkirin, ya hewce nekirin û di karên xwe pir cuda dana diyarkirinê de hûn bi zirav û hosta ne. Ez jî hêsan bela xwe ji we venakim, hewce kir ezê dakevim asta we û qirika we bernadim. Ev xisletên min jî hene. Ger hûn nikarin xwe bigihînin rastiyan û mezinbûnan, gelo hûn dibêjin min dakeve jêrê? Ezê jî dakevim wir. Ma hûn dixwazin lîstok bilîzin û behsa xapandina kesayetan dikin? Yeqîn dikim di van mijaran de kesê bi qasî min hosta nîne. Van ne tenê li kêleka min, hûnê li her cihî bizanin. Hûn dibêjin; "Tenê me, ezê bikim û wê çêbe, kes nabîne." De vêca em binêrin, gelo kiryarên hûn dikin dê ji we re bimîne, yan na? Hûn dibêjin; "Çawa dixwazim ezê wisa bimirim, biçim gorê." Navê vê ne mirine, xwe veşartine. Ancex ji niha ve we mehkum dikim. Hûnê ji vê re çi bêjin? Ger hûn bimirin jî, heta henaseya xwe ya dawî xirabin. Nexwe hûn nayên efûkirin.

Li ser pêvajoya ku dijîm rastiyan ferz dikim. Ger pêşerojê bi Komara Tirk re hevdîtinê bikim, ew kesên revîn li kur bin, ezê li wir jî bi qirika wan re bigirim. Ji ber wan bi navê mirovahî suc kirine. Emê hemûyan wexta dijîn jî bigirin, wexta dimirin jî bigirin. Bes hûnê wê demê negirîn, wexta bimirin jî weke belengazekî negirîn. Ma hûn şerkertiyê çawa dibînin? Şerkerên li cem me lehengin. Bi şervanên me re girî nîne. Hûnê di jiyana xwe û mirina xwe de jî nekevin nava rewşên girî. Ger hûn rewşên wisa bijîn, dê qirika we re bê girtin. Êdî divê hûn fêm bikin,

di van mijaran de PKK'ê û rastiya Rêbertiyê wisa weke dilê we dixwaze bikar bînin. Lewra çi hewce dike, ji bo xwe bikin.

Ma kesî we bi zorê tevlî şer kiriye? Kesî bi zorê erk daye we? Hûn bela xwe ji min venakin. Ev kar li gorî keyfa we nabe. Ger wisa bûya dê hemû bizin bûban şêr. Rê û rêwaniya vî karî heye. Şêwazek vî karî ya hatî ceribandin heye. Ger her kesî egîdî kiriba, dibe ku îro li Kurdistanê miletek ji egîdan bihata sazkirin. Bes hûn jî dizanin mirovek wisa xwe bigihîne vê nîne. Bi zora hewldana min, qaşo hûn çek diteqînin, nav û şanê xwe vedibêjin. Ev hemû jî xêra min çêdibin. Baldar bihizirin: Bi xêra we çênabe. Ger bihêlim, hûnê çend rojan bikarin li ber xwe bidin? Weke navê xwe hûn jî dizanin nikarin li ber xwe bidin û hûn bi xwe vê dibêjin. Hûn dibêjin; "Emê di rojekê de bibin çend parçe?"

Dihizirim gelo çima mirovên vî miletî hatine xistin. Êdî pir ji dê û bavan jî aciz dibim. Berê şerê min a bi dayîka min re jî li ser vî bingehî bû. Tenê ji bo ji wê rizgar bibim, min ev beza çil salî da destpêkirin. Niha jî hûn lîstoka kevin derdixin pêşberî min. Dibêjin; "Em dixwazin wisa bijîn." Naxwazim şanî we bikim, hûn çiqas sivikin. Ne ji ber nizanim, hûn tenê belengazin. Bi nêrîna dibe ku hinek aliyên we yên hêjayî hebin, bi we re mijûl dibim. Lewma rewşek hûn evîndarên xwe bin nîne. Kesên ku beramber welat, dîrok û şerefa xwe evqasî ketî mafên wan ên axaftinê nîne. Ew bi yek gotinê, bi qasî bikevin bin erdê bêfihêtin.

Ger ev derfeta pêşveçûnekê didin, beramberî vê ya divê hûn bikin nirxa vê ya mezin zanîne. Wexta hûn li cihek din ehbap-çawîşeke xwe dibînin heta sibehê daxivin, lê dema dor tê bi rastiyên berz re bi ahengi jiyînê bêhna we teng dibe. Wexta bi ser we de jî têm hûn teng, aciz dibin û xwêdan didin. Ma hûn ne wisa ne? Wexta hûn ji xwe re nêvengê dibînin, em serê we jî jê bikin nikarin we derbas bikin. Ji bo we zêde tawanbar bikim van nabêjim. Mixabin bi kiryarên we kirîn re we ev rexne heq kirine. Hêjî ji ber hûn roja xwe nanirxînin, hûn van heq dikin.

Hûn dihizirin dikarin bi PKK'ê, dîroka PKK'ê bilîzin û PKK'ê sivik pêk bînin. Sozek min jî dayî şehîdan heye. Hûn nikarin min jî weke kesek ji xwe ku qedir nade nirxan binirxînin. Dibe ku di gelek mijaran de kêmasiyên min hebin. Bes hinek nirxên PKK'ê yên ji bo min pir girîng û pêwîste pêk werin hene. Wesiyetên şehîdan ên ji me re mayîn hene. Dîsa beramberî gel baldarim û encamên min di vê mijarê de derxistîn holê hene. Her wiha radestî dijminê xwe nebûm. Şiyarim û di

ferqa xalên ku pêwîste bikim de me. Temamî li gorî hewcedariyên vê dijîm. Hûn nikarin min ji vê vegerînin. Hûn çil teqleyan jî bavêjin, yek teqleyê jî ezê bi we bidim avêtin. Hûn nikarin xwe bi min bidin pejirandin. Bi qasî misqalekê giriyên we ne di xema min de ne.

Kesê li hember nirxên herî berz neheje û negirî, wexta beramberî van karên vale girî, ev tiştekî rave nake. Kesê nekare ji bo nirxên mezin hêza jiyînê raber bike, ti nirxa wê nîne ji bo tiştên sivik bijî. Di heman demê de li hember van kesayetan pir rikdar û bihêrsim. Ez xwe di asta bêhempa de eyar dikim. Ji asta herî ketî ya mirovahî heta xwe digihîne asta herî berz, min xwe bi qasî xwedayek zanyar, karbidest û bi vîn ava kiriye. Hûnê çawa min bixapînin? Li cem min hûn ji zarokan jî belengaztirin. Ne dihizirin ezê fêlbaziyên we û lîstokên we nezanim. Her wiha bi qasî xweda xwedî vînim. Kêm-zêde dizanim mirov bi çi dêşe, bi çi naêşe, dilrehmî li hember çi tê kirin, çi nayê kirin. Min vîna xwe evqasî bi teşe kiriye û pêş xistiye. Ji bo wê fêm bikin û ger hûn dibêjin; “Ji bo vî karî amade me”, xwe rast çêbikin. Ger ne li gorî we jî be bêku ji rê derbikevin li cihê hûn lê ne û rawestiyane bimînin.

Ma min gotiye min şaş binirxînin, bi min bilîzin û şaş bi min ve werin girêdan? Na! Ma pêwîstiyên peywirên xwe pêk nayînim? Ma xizmetê ji we re nakim an jî qet nebê li ser bingeha armancan tişta para min dikeve pêk nayînim? Elbet hûnê jî tişta para we dikeve bikin. Kesek hewldana herî giran û hûrûkûr raber dikime. Kesek vê hewldanê hem demdirêj dikim, hem dijwar û kêlî bi kêlî pêk tînime. Vêca, hûn çine? Hûnê xwe bînin rewşek ku nekarin xwe jî pênase bikin, destpêkek li gorî pîvanan guncav nekin, hemû helwest û reftarên neyên pejirandin ferz bikin û bi vî rengî jî bêjin; “Deka em bijîn.” Hûn jî dibînin kesê beramberî we zêde ji wê re ne guncave. Çeka we ya sereke nezantî, xeflet, zaroktî, girî û bi vî rengî xwe ferzkirine. Dayîk û malbata min jî xwe wisa ferz kiribûn. Lê hêj di deh saliya xwe de min ew li erdê dan. Bi vî temenî û di vê danehevê de çil salin di nava şerekî de me. Ezê çawa we weke kesên pêwîste li gorî rêgezan nêzîkbûn bê kirin bipejirînim? Ecêb dibînim. Niha hûnê bêjin; “Em zêde ne, axatî ya me ye.” Jixwe ferasetek we jî eve. Hûn dibêjin; “Ez pir baş xwe bincil dikim, pir fêlbazim. Hêza Rêbertiyê têra van tevan nake. Qet hewce nake mirov wisa fêm bike. Jixwe hewce nake em jî wisa pir zirav û baldar bin. Pêwîstiya jiyanek wisa jî nîne. Çawa dibe bila be, heta kur diçe bila be, bi hemûyê jî razî me.” Dibe ku hûn di van mijaran

tevan de xwedî helwestek wisa bin. Lê belê ez jî hostayekim û jiyanê weke we areste nakim.

### Jiyana Nû Bê Armanc Bê Ked û Bê Şer Nabe

Pir ecêbe, hinek ji we jiyana ferdî pir dixwaze. Başe, min derfeta vê afirand û yeqîn dikim bi gelek ji we re daxwaza jiyînê pêş dikeve. Ev jî başe, pêşî ev hat afirandin. Niha li Kurdistanê jî vê dafirînim. Niha her kes li Kurdistanê hinekê dixwaze azad bijî, yên beramberî me jî wisa ne. Yên îro pir dijwar bi me re şer dikin jî dibêjin; “Em niha baştir dikarin bijîn.” Ev jî başe. Ancex ev, tenê eniyek vî karî ye û di eniya din de jî berpirsiyariyên girêdayî kedê hene. Kesê dixwaze bijî wê bi armanc ve girêdayî be, kesê dixwaze bijî wê bi kedê ve girêdayî be. Kesê dixwaze bijî, wê bi şêwazekî, tempoyekî, ango şer û pêdiviyên wê ve girêdayî be. Ev jî pir zelale. Ger hûn bêjin; “Ez ji bo yekê amade me, ji bo ya din ne amade me”, hûn nikarin tiştekê ser bixin. Bi vî rengî jiyînê danin aliyekê, hûn nikarin xwe jî ji erzan bikaranînê rizgar bikin.

Kesê xwe ferz dike û ferdî ye, kesê pir dixwaze bijî ye. Ev çil salin ez jî dixwazim hêzdar bijîm. Lê belê evqas karê min kirî jî têra vê nekir. Jiyan û şerê min ê çil salî, nebû bersiva şêwaza wê jiyana hûn dixwazin bijîn. Hûn çawa hêjayî xwe dibînin bêku kedê bidin, tam berovajî weke dizan û xapandinê bidin jiyîn? Bersiva vê bidin. Nexwe, ev hemû bi sazûmanî li ser we tevan hatiye ferzkirin. Hema bêje emê hemû mirovatiyê ber bi rastiyan ve bikişînin, mixabin hêjî di nava me de kesên dibêjin; “Ev nabe, ji bo me tiştek din hewce ye. Em nikarin bikin.” Hûn jî dibînin, dikarim vî karî bi cîhanê bidim kirim. Jixwe wê destpê tevgerê bikin û hinek tiştan jî pêk bînin. Ezê vî karî bi dijmin bidim kirin û pêşerojê vî karî bi dijmin re pêşve bibim. Wê demê dê halê we çibe? Jixwe, cîgiran jî di asta bêhempa de ava dikim. Hûnê beramberî van tevan çi bikin?

Nexwe her tişt we neçar dike, hûn rast bin. Ango min tevdîra her tiştî girtiye. Hûn dikarin tiştekê bikin, dikarin li bendê bin heta ku bi temamî bêbandor dibim. Wexta ez ji hêla fîzîkî, fikrî, heyberî yan jî giyanwerî bi temamî bêbandor bûm, hingê dibe ku ji wan ferdperestiyên xwe re qad vekin. Dibêjim dibe ku, ji ber ew jî ne misogere. Vêca, hûn nikarin siyasetê erzan bibînin. Hûn nikarin

rêberek siyasî, Rêbertiya PKK'ê ji rêzê bigirin dest. Wextekê Barzanî jî digot; "Ez ê herî mezinim." Niha jî di rewşek pir tengav de ye. Ger ez bijîm, dê siberojê bikeve rewşek neyê nasîn û êdî rica bike. Ew jî nikare xwe rizgar bike, nikare ji bo xwe qad ava bike. Hûnê çawa bi vî halê xwe, heta bi helwest û reftarên ji wî zêdetir zerar û ziyanê didê ve ji bo xwe qad ava bikin? Hinekê bi aqil bin. Rêbertî, ne rêbertiyek hûn dihizirine. Naşibe ne bavê we, ne dayîk û xwîşka we û ne jî kesek din. Rastiyek vê saziyê heye. Piştre wexta hûn ketin tengasiyê şûna rica bikin, niha bi pêdiviyên wê re parvekirinê bersivê bidin û em bi navdar bimeşin. Me şêwaza rast a hemû jiyanê destnîşan kir.

Ne li dijî jiyana takekesî me. Lê belê jiyana takekesî bê ked, bê armanc û bê şer nabe. Bi belavkirina nirxan, lîstina şer û xwe kirina pirsgirêk ve, ma hûn dihizirin takekesî bijîn? Ger hûn wisa bikin, hûnê di heman kêliyê de tine bibin. Dîsa jî ji bo we hemû rê û rêbazên jiyana nû tê pêşniyarkirin. Beriya hûn xwe ferz bikin, nîqaş bikin ji bo vê heqê we heye yan na û ger heqê we heye dê ev çawa be. Hûn peywirdarin ku heta dawî van fêrî hevdu bikin. Ma hûn dixwazin bi kesî bijîn? Ma hûn dixwazin jin û zilam bi hev re bijîn? Şêwazên wê yên hatine ronîkirin hene. Bes bi xayîntî, zêde xweperestî û tinekirina nirxan ve çênabe. Jixwe jiyan ji bi vî rengî kirêtkirinê nayê jiyîn.

Me di vê mijarê de ji şer heta evînê dahûrîn pêş xistin. Me pêwendiya şer û evînê ronî kir. Ji hêza hestan, heta hêza ramanî, ji xweşikbûn heta kirêtiyê, me pênaseya pîvan û zanistiya van mijaran tevan çêkiriye. Me pirsgirêk ji hêla civaknasî, derûnî û hemû aliyên din ve danîn holê. Paşê jî mirov çawa dikare rast bijî, ango evê bi şoreşê re çawa pêk were şanî we kir. Ger hûn bal bidinê, em li vir şerê tiştekê dimeşînin. Yan emê bibin mirov, serbilindî, serkeftinê û xweşikbûnê bidest bixin, an jî tine bibin. Yan hûnê wisa bin, an jî nebin. Hebûna van karan jî diyare. Nebûna wê jî diyare. Ti bersiva nemirovbûnê nîne, nejiyîne. Ma hûn girêdana bi nirxan ve çawa dihizirin? Girêdana bi nirxan ve, hêza tevkariyê ji ya çêdibe re dike, rê jî nade ya çênabe. Ev demek dirêje hûn me mijûl dikin. Li ser vî bingehî qiyamet rû dide. Di jiyanê de her tişt girêdayî we ye. Yên ku gefan li vê jiyanê dixwin hûnin. Ez di rojekê de her tişta ji bo serkeftinê hewce didim. Bes hûn hêjî di nefêmkirinê de israr dikin. Ger di şêwaza we de derfeta serkeftinê heye, dibêjim ku ezê pêk bînim. Lê ew jî nîne. Yên

hewceyî rastiyan hûnin. Nabe ku mirov rastiyan ser guhê xwe re bavêje yan jî nîv bi nîv bigire dest.

Em ne tenê we pêş dixin, dihizirin di kesayeta we de tevkariyê ji partiyê, milet û heta mirovatiyê re bikin. Ev girînge. Hewldanên me di vê mijarê de xerc kirîn watedarin û xalên me vegotine nabe serguhre bê avêtin. Hûn dibêjin; “Em hêj zarokin, jiyan nas nakin. Ma hinekê şaşiyan bikin dê çi bibe. Tu çima evqasî bi ser me de tî?” Ji ber bi şaşiyên hûn dikin re, dê di kesayeta we de partî tine bibe. Wexta partî jî tine bû, jixwe tiştek namîne. Cuda ti derfeta vî miletî jî nîne. Rêyek din her tiştê we ber bi tinebûnê ve dibe. Gelo wijdana we heye, bi rastî jî hûn dilovanek egîdin? Divê hûn hêza bikare bêje; “Dê her tişt bi min re evqasî derfeta jiyanê bibîne, soza min heye û ezê pêwîstiyên wê pêk bînim” raber bikin.

Dibe ku we heta niha ji ber sedemên cur be cur rast tevlî nekiribe. Xwe ber çavan re derbas bikin. Yeqîn dikim di nava partiyê de aciziyên we yên pir cidî hene. Partî zêde we zane dike û vîna we azad dike. Dibe ku dijmin bi we lîstibe, lê nêvenga me pir rehet dikare we bîne ser hişê we. Lewma heqê nêvenga me bidinê. Ji bo destpêkirinek nû, firsenda we tevan heye. Ji ber kêmasiyên we, kes naxwaze we bixeniqîne. Em kesên tawanên herî giran kirî jî, sererast dikin. Hêz didin ên herî lewaz. Ji bilî vê derdek we ya din nabe.

Dahûrîn, ji bo xisletên we yên bûne kevir derbas bikin, dermanê herî başe. Em dişkînin û ji nû ve dicebirînin. Hinekê jî li ber xwe bidin. Ji nû ve avakirin pêkane. Bi salane dilnizmiyek mezin sebir dikim. Hûn çima sebra hewce dike raber nakin? Hûn dikarin hemû xalên didin windakirin bi sedemên wan re ronî bikin. Piştî evqas hêz giha hev û evqas çeperên têkoşînê di dest de tên girtin, hûn dikarin hemû rêyên serkeftinê bibînin. Jixwe hûn fedekarî û wêrekiya hewce jî dike raber dikin. Lê rê û rêbazên vê yên rast hewce dikin. Em jî rê û rêbazên rast pir baş nîşan didin. Êdî hûn jî bi israr rastiyan bişopînin û di mijarên me destnîşan kirîn de xwe nû bikin, êdî xweliyê danequrtînin û xwe bi şaşiyan nemeşînin, bibin xwedî helwestên zelal, vê li her derî û her wextê, li hember her kesî raber bikin.

Ji ber sedemê cur be cur hûn çiqas tengav kiribin, anîbin rewşek ku nayê nasîn bila be, nêvenga me dikare wer sererast bike. Lê hûnê ji bo vê dilnizm û cidî bin. Ji kuderê ve hewceyî nûbûna we hebe, li kuderê nexweşî heye, êdî hûnê di tedawîkirina wê de biryardar bin. Ji bo vê

hevgirtî bin û ji raberkirina cidiyeta hewce jî dûr nekevin. Yeqîn dikim bi we tevan re hewesa şoreşê heye. Hûn jî welat pir dixwazin û ji şerkirinê re amade ne. Ez jî esasên vê yên jêneveger şanî we dikim. Hûn jî pir eşkere dibînin ku, em tev nefrete ji windakirinên erzan dikin. Li her derî derfeta pêşî li vê girtinê di destê we de heye. Ger hûn rê nedin helwestên ku sedemên wan hatine destnîşankirin, misoger pêkane her cure fermandarî, her cure yekîne û her cure şer bê pêşxistin.

### Kesayetên Xwe Fedayî Rastiyan Dike Dikare Her Tiştî Ser Bixe

Hemû dahûrîna jiyanê hatiye kirin. Qaşo wisa jiyîn zehmete, bila zehmet be. Mirov dikare birçî jî bimîne. Ji bo me her tişta hêsan tê gotin, bermahiyên dijmine. Jiyana hêsan, jiyana kesên vale digerê ye. Jixwe, ew jî li cem me nîne. Jixwe, rêya jiyanê ya yegane me dît. Ma hêzek bi qasî PKK'ê yekgirtî heye? Ma hêzek bi qasî PKK'ê bihêz heye? Ma hêzek bi qasî PKK'ê endamên xwe rast têr dike heye? Nexwe her tişta rast di nav PKK'ê de heye. Çima hinek din nakin? Ma şerê hêzek din heye? Tine. Kesê herî zêde xwe Kurd dibîne jî, xwe bi nokeriya dijmin re dide jiyîn, heta tevî ewqas xizmetê ji dijmin re dike her tim metirsiya mirinê dijî. Nexwe, rêbertiya di nav PKK'ê de, bi şêwaza xwe ser xistiye. Rêbertiya di nav PKK'ê de, di her mijarê de bûye hêza jiyanê.

Beriya her tiştî bi zewqek mezin lêkolîna rastiya Rêbertiyê tê kirin. Mirovên ji rêzê û dostên ji gelek qadên cuda hatine jî bi xiroşek mezin lêkolîn dikin û hewl didin rastiyan fêm bikin. Hûnê çima fêm nekin? Milîtanê PKK'ê bi vîne, milîtanê PKK'ê wêreke. Diyare dê ev milîtan li hember şaşiyan serî netewîne. Mirovê evqasî beramber zehmetî û îşkenceyê li ber xwe dide, dê çima li hember şaşiyan serî bitewîne? Hûn ciwanin, her wiha halek we ya wisa ji taqet ketî û westiyayî nîne. Ma tiştek xwe fedayî rastiyan kirinê hêjatir heye? Kesê xwe fedaî rastiyan dike, dikare her tiştî ser bixe. Dikare şêwaz û rêbazan diyar bike. Me bi cewherî hûn amade kirin. Kesê bê nêvenga me, misoger dikare xwe fedaî rastiyan bike. Dibe ku hûn pir xirab hatibin mezinkirin, hatibin xapandin û xapiyabin, ancex dikari şaşiyên zaroktî yên hûn dikin bi

temamî derbas bikin. Em her tiştî sererast dikin. Hemû aliyên rast fêmkirinê datînin holê. Ne girînge we berê çi jiyan kiriye, ya girîng pir balkêş wate dayîna rastiyên niha û li gorî wê jiyîne. Ez her tim xwe weke zarokekî ji fêmkirinê re vekirî dihêlim. Pêwîste hûn jî heman dilnizmiyê raber bikin. Bê navber li ser rewşên rû didin radiwestim. Divê hûn jî li ser van tevan rawestin. Ma hûn ji min zêdetir binavûdeng, bibandor û rayedarin?

Di mijara jinê de jî hemû aliyên jiyanê yên rast hatine destnîşankirin. Derfetên xwe rast girtina dest, rast parastin, naskirina bi nasname û kesayeta zilam û hesabxwestinê heta dawî hatine dayîn. Nabe bi van bê lîstin. Ger lîstin çêbe, hûnê xirabiya herî mezin li xwe bikin. Ma em evqasî hewldanê vale dikin. Ne ji bo hûn erzan li ser bijîn, ji bo hûn ya pir hewce û heta ji her tiştî zêdetir hewce bibînin, em vê nêvengê vekirî dihêli. Ger hûn nirx nedin van hewldanan, hûn nikarin li nêvenga me bimînin. Lewra kesên ku pêwîste vê siûdê herî baş binirxînin hûnin. Wê hestiyariya salan a erzan hatiye fêrbûn, di serî de hûnê mehkum bikin. Pêkanîna bêriyan û bidestxistina azadiyê ewqasî ne hêsane. Di vê manê de bidestxistina namûsê jî ne hêsane.

Tê dîtin, divê em li ser vî bingehî şer berdewam bikin. Her tiştê dervî vê, dide diyarkirin ku cuda ti rêya rizgarî nîne. Lewra bi qasî xiroşa herî balkêş, em we neçar dihêlin ku hûn bi feraset û vînek bidest dixe vê siûdê binirxînin. Bi hewesên erzan ve tiştek nayê bidestxistin. Heta ku mirov nebe xwedî hewldan û kedek berz, nabe mirov tenezilî jiyanê bike. Rêbertî di vê mijarê de heta dawî balkêş û siûdeke.

Ev xebatên me didin diyarkirin ku emê yek ji pêşketinên dîrokê yên herî mezin bidest bixin. Lewma emê çima nenirxînin? Ev pêşketin siûdek mezine û jixweber neketiye destê we. Berovajî, bi kesê hatiye afirandin, derfetek ku bi şerek mezin û zehmet ve hatî bidestxistine. Ma hûn hêjî xiroş û şiyarbûna min a bilind nabînin? Hêjî ji leza xwe ya berê tiştekê windakirinê danin aliyekê, ma hîn zêdetir ne zana û biplanim? Hêj we nû dest bi vî karî kiriye. Berê pêşketinek biçûk xiroşek mezin dida me. Ma dê çima ev pêşketinên dîrokî xiroşê nede we û ya herî girîng jî çima we bi şêwaza serkeftinê ve girê nede? Ma tiştek ji vê hêjatir heye? Her çendî piraniya we bi nêzîkbûnek; “Em zarokin, ezmûna me ya jiyanê nîne” wate nedin xebatan jî, ez ji gelek aliyan ve wateya wê şanî we didim.

Beriya hûn karekê bikin fêm bikin. Xisleta herî girîng a şêwaza Rêbertiyê eve. Heta ku çil carî nepîvim û fêm nekim, yek peyvê nakim. Ji bo têgeha mêtîngeriyê bilêv bikim, min bi salan di hundurê xwe de dûbare kir. Bi şêwaza xwe ya îro ve, hizirîm ku gelo dê encamên wê piştî salan çi be. Min ev têgeh weke bifirim, kes nekare min bigire û dijwar xwe bigihînim pêwîstiyên wê bilêv kir û encamê jî ez anîm heta vir. Bi peyvan nelîstim, tenê min pêwîstî pêk anîn. Min wisa piştî roja destpêkê devjê berneda, her tim pêş xist û kûr kir. Îro jî min xwe gihand berzbûna bîrdozî ya herî mezin. Tenê di pratîkê de nesekinîm, giham hêza ku her pêwendiya dest bavêjimê bikarim birêxistin bikim. Ev jî rêbazeke.

Ma tiştek ji vê hêjatir heye? Her wiha gelo ji vê wêdetir tiştek ji we re hewce heye? Gelo ji bilî vê tişta ji her cure birînên we re dibe derman û hûn pir hewceyî wê heye? Gelo hûn dizanin ji bilî vê, hûn di rewşek belengaz, bi êş û şermîn de ne? Gelo hûn dizanin ji bilî vê her tişt bi we dide windakirin? Ji bo kesê ku îdîayek wî ya jiyanek ji rêzê jî heyî, ger ne tolaz, ketî û xafil be, ma ji bilî vê rê û rêbazek hêjatir heye? Ma ji bilî vê çareyek din dibe? Ne tenê di roja me de, di dîrokê de jî gelo şêwazek ji şêwaza Rêbertiya PKK’ê xurtir û serkeftîtir heye? Ger hûn dixwazin dewlemend, bihêz û xweşik bin, hez bikin û qîmeta we hebe, ev hemû bi vî şêwazî pêkane. Ev pir eşkere ye. Tişta para we jî dikeve fêmkirin û pejirandina vê ye. Kesên bi îdîa dikarin vê şêwazê di hemû şaneyên xwe de bijîn. Kesê dixwaze dikare di vê şêwazê de xwe bigihîne her cure serkeftinê. Niha hûnê çawa dev ji vê berdin? Ma em dikarin bêjin tiştên din jî hêja ne?

Hinek din jî gotin; “Bîrdozî û rêxistina me heye.” Ancex ev niha di rewşek wisa de ne nikarin zikê xwe têr bikin. Nikarin gotinekê ji dijmin re bêjin. Her tişt evqasî eşkere ye. Dîroka partiyên cuda jî hene. Lê ev niha di rewşek nikarin baxivin û heta nikarin malbatê xwedî bikin de ne. Rêberên cuda jî hene. Lê yek gotina wan ku pê baxivin nîne. Axaftina wan jî ne tişteke. Ger ev hemû rastîne, nexwe tişta para we dikeve, ji nan û avê zêdetir hewceyî van rastiyan bin û bikin malê xwe. Ger hûn vê şêwazê fêr bûne, nexwe misoger hûnê bibin milîtanên serkeftî, bihêz û di her meşa xwe de jî serkeftî. Bes bila henase bê girtin, ya dimîne serkeftine. Ji ber ku Rêbertî eve. Di vê Rêbertiyê de derew nîne, di vê Rêbetiyê de astengî nîne, di vê Rêbertiyê de binkeftinek demdirêj

negengaze. Di vê Rêbertiyê ji tinebûnê hebûn afirandin û derfetek herî biçûk jî weke têk naçe afirandin heye.

Bila kes nebêje; "Min dîsa jî ya hêvî dikir nedît." Li vir hem ji ya herî berz re wate tê dayîn, hem jî her tişt dikeve ser rêya rast. Ji kesên bi israr dibêjin; "Ez dixwazim xwe bijîm" re jî, ger hinekê fêm bikin, rê û rêbaza wê jî tê fêrkirin. Li vir ya hewce, hinek rastî ji dil û mejiyên van kesan re dana fêmkirine. Hema bêje di derbarê her tiştî de, ya rastî çiye û mirov çawa dikare xwe bigihîne van rastiyan hatine ronîkirin. Elbet ji vir û şûn de hêcet napejirînim. Ji ber rastiya her tiştî hatiye destnîşankirin. Bes kesê ku qet van rastiyan fêm nakin an sîxurin an jî kesên qet sererast nabine. Lê belê çareya herduyan jî heye. Emê kesê sîxur dahûrînin, ên sererast nabin jî di bin çavan de bigirin. Hûn nikarin mîkrobekê bi zanebûn berdin nav nêvengekê. Dibe ku hûn nekarin li nav nêvengê jî bigirin, lê ger hûn nekarin yekser jî bikujin, di bin çavan de bigirin. Hûnê sîxur jî dahûrînin, ger xirab dikin wan jî di bin çavan de bigirin. Di civakê de sîxur û nexweş baz didin. Ger ev li vir jî baz didin, wateya vê hûn qet ne di ferqa peywirên xwe de ne û heta bi wan re lihev dikin. Vaye min ev hemû şanî we kirin. Ger rewşek wisa nîne, ya dimîne bi rasteqînî xwe bi armancên xwe ve girêdane. Jixwe wêrekî û fedekariya we heye. Dibe ku her kêlî mirin jî were. Lê belê wê zû-dereng ên dimeşin û şer dikin bigihin encamê.

Hemû dîroka PKK'ê vê rastiyê piştrast dike. Misoger serkeftin a vê PKK'ê ye. Em naxwazin ti kesê hatî nav partiya me der bikin. Ji kur hatibe bila be, guneh, lewazî, heta tawanên wî yên berê çi dibin bila be, em wî dipejirînin. Lê ev, nayê wê wateyê bila wê guneh û tawanên xwe bidomîne. Ji bo xwe sererastkirinê, ji bo ji wan rizgar bibe, bila gav bavêje. Em wext didine, dê lez xwe ji van dûr bixe. Ji ber pêwîste mirov bizane lez xwe sererast jî bike û jidil ji gunehên xwe jî rizgar bibe. Mane xweşikbûn û başî jî li vire. Ger kesek di neyîniyên xwe de israr bike, misoger ew sîxure yan jî emê bêjin kesek sererast nabe û kûr li ser bihizirin. Raye û fermandarî dana wî bidin aliyekê, emê heta dawî hewl bidin wî sererast bikin.

Min behsa rewşên welat ên xeternak kirin. Li qada me jî, behsa kêmasiya rêbazên nêzîkbûnên we dikim. Misoger hûnê van derbas bikin. Ji bo vê jî pêşî divê cidiyet, dijwariya dîtinê û helwesta ku pêwîste bê raberkirin xwe bidin der. Ger hûn rojekê jî vê xirab bikin, tê wateya we di fermandariyê de winda kiriye. Kesê ku carekê ji şaşî yan jî

fêrbûnekê re çavên xwe girt, bingeha şaşiyek ku di hemû jiyana xwe de bijî daniye û ew kesayet nabe kesayetek bihêz.

Xulase şêwaza xwe ji we re vebêjim: Di astek bêhempa de bi rastiyekê ve girêdayî me. Dibe ku yekser hêza min têrê neke li hember helwesta ku bi vê rastiyê re nakokiyê dijî têbikoşim, lê vê pirsgirêkê mezin dikim, dikim mijarek girîng, pê re şer dikim, qet nebê radest nabim, serî natewînim û heta ku derbas bikim ji nedîtî ve nayêm. Ev carina dibe ku çil sal an jî deh salan bajo, lê serî ji şaşiyan re natewînim, paşçav nakim û bi wan re şer dikim. Encam jî, kesayeta serkeftî ye. Ya kesayeta min dike ez, vaye ev xislete. Ger bikarim têk bibim yekser heman kêliyê dikim, ger nekarim têk bibim ji demê re dihêlim.

Vaye xisleta şerê gelêrî ya demdirêj li cem me wisa derketiye holê. Hem pir tund û bi tempo ye, hem jî bi qasî hewce dike ji demê re dimîne. Lê kes vê kêliyê ji bîr nake, şoreşgerê herî dijwar ê vê kêliyê ye. Pêşeroj li ser vî bingehî hîn ji niha ve hatiye bidestxistin. Dîroka PKK'ê, dîroka Rêbertiya PKK'ê eve. Elbet ev xalek pêwîste hûn ji navê xwe zêdetir têbigihine. Ji bo we beriya nan û avê hewce ye. Ji ber nan jî, avê jî û jiyanê jî ev tîne. Elbet dê ji bo vê biryarek we hebe. Lewra yekemîn tişta pêwîste bê kirin, li ser xwe serwerbûn û biryara; "Ezê van hemûyan pêk bînim" dayîne. Ya duyem jî, biryardariya hevgirtina pêkanîna van biryaran raberkirine. Ya dimîne kede, hewldane û jixwe ew jî bi we re heye. Jixwe hûn wêrekî û fedekariyê zêde jî raber dikin.

Lewra wexta em cardin rewşên ku di nava partiyê de rû didin dinirxînin, ya herî girîng jî rojaneyî peywirên li pêş me girtina dest û nexasim dema em li ser sedemên pir erzan û bi qasî dijmin hêvî nake pir ketî û rezîlane bi me didin windakirin radiwestin, dîsa rewşa nasname, kesayet û yekîneyên şer, dema em ser pirsgirêka fermande û rêveberiyê de diçin, hûnê van xalan pir tund û cidî bigirin dest. Qet nebê ji vir û şûn de li cih û peywirên hûnê çûnê û we xwe gihandiyê bêjin; "Ez amade me û li cihê ez lê me şaşî çênabin." Wisa rê ji rewşên pir çors, nexasim dijmin jî hêvî nake re vekirin, qet nabe. Hûnê misoger bikin ku, bibin xwedî wê sozê. Ji bo vê jî hûn dikarin fêrî hemû ziraviya şêwaza hewce bibin û dijwariya vînê saz bikin. Ger em bikarin PKK'yîbûnê wisa bi teşe bikin, ango milîtaniya PKK'ê ya ji berê ve heyî ancex ger hewce kir emê ji nû ve saz bikin a hevgirtî û tê pejirandin bê bidestxistin, piştî em gihiştin vê qonaxê, encama ku bi van derfetan re bê bidestxistin, misoger serkeftine.

Hinek bi israr dixwazin bi vê bilîzin û derfetên bi qasî çiyan pêşkêşî dijmin bikin. Me jiyana xwe fedaî vê têkoşînê kiriye, em xwedî evqas şehidin, elbet emê di heman kêliyê de van helwestan bibînin, bi ser de biçin û hesab bixwazin. Ma ji ber derfet hene, dibe ku ev nêzîkbûn sivik bên destgirtin? Elbet na. Wisa kirin, xirabiya herî mezin li xwe kirine. Rastiya PKK'ê ya esasî eve. PKK'ya ku em dimeşînin eve. Em qet tiştekê li ser kesî ferz nakin. Her kes bi dilê xwe tê û hema dibêje; "PKK nebe ez nikarim rojekê jî bijîm." Nexwe ger hûn pir dixwazin bi PKK'ê re bin, bi wê re bijîn, pir jê hez dikin û pir dixwazin, bizanin rastiya PKK'ê eve. PKK'ya ku hûn bi niyeta baş hatine û dixwazin bi wê re encam bigirin eve. PKK bikin malê xwe û şerê wê yê li hemû qadan rast bimeşînin. Beramberî jiyana xwe ya we feda kirî bersiva herî hêja bê dîtin eve.

Sererastkirina di vê mijarê de ji nû ve ber çavan re derbas bikin, her çendî ji bo we bi êş jî be, xwe ji şaşiyên xwe rizgar bikin. Kêmbûnên xwe derbas bikin, jêhatiyên we yên veşartî mane gur bikin, bi qasî bikarin dijwar bihizirin, pratîkbûna wê jî di nav hev de belav bikin û bimeşînin. Kurtasî xwe bi gihandina şêwaza serkeftinê bidest dixe ve, hûnê ya herî rast pêk bînin. Pêşî ya divê bê bidestxistin xeta milîtaniya PKK'ê ye. Em zêde naxwazin xeta milîtaniya PKK'ê bidin nîqaşkirin. Qetiyen destûr nadin ku kes jî bi vê bilîze. Dîroka PKK'ê vê din av yekbûnê de dide hînkirin. Rastiya Rêbertiya ku rojane dijî û serkeftî dimeşe jî, bi şêweyek bêhempa fermana vê dide.

Heta niha jî vê bingehê bi we daye serxistin. Êdî em hatine qonaxa ku dost û dijmin jî dibêjin; "Ev şêwaz dikare encamê bigire." Piştî vê qonaxê tişta divê bê kirin, bi qasî hewldanên pir alî, divê em hêza xwe ya hejmarî û wesfdarî jî li gorî serkeftinê binirxînin. Dîsa dema hewce kir ji nû ve afirandin û bi vî rengî soza ku ji bo şehîdan hatiye danîn pêkanîn û ji bendewariyên miletê me yên pir dijwar re bûna bersiv, êdî wate dayîna jiyana ku pêwîste bê avakirin û ji vê re bûna bersive. Milîtanek tenê dikare xwe li ser vî bingehî watedar bike. Li ser vî bingehî dikare xwe peywirdar bike, bimeşe û ser bixe. PKK'yîbûn ji bilî vê pênaseya milîtanî ne tiştekê tîne hişê xwe, ne dikare bimeşe, bide jiyîn û ne jî dikare bide şerkirin.

Neku ji ber ez fermana vê ya dijwar didim, ji ber wate dayîna evqas şehîdên ku di dîroka ti tevgerê de nehatiye dîtin, em ji derfeta jiyana yekane ya vî miletî re bibin bersiv û di dîrokê de siûda jiyanê ya yekemîn û dawî bi serkeftinek mayîn de nûnertiya wê bikin, hûnê fêrî

van bibin. Weke kes ez jî ji bilî vê nedikarim wate bidim tiştek din, ne jî dikarim bipejirînim. Weke kesek ku min ev roj wisa amade kirine û bidest xistiye, elbet fermana bi şêwazek hîn balkêştir û encamgir serkeftinê bidest bixe zêdetir nikarim tiştek din bidim. Piştî min evqasî xwe da karkirin, elbet nahêlim kes xwe li ser van nirxan bide jiyîn. Jixwe ji we tevan zêdetir amade me ku, para ji min re dikeve milîtanî pêk bînim.

Madem her kes egîdê soza xwe ye, halek we westiyayî û ji taqet ketî nîne, ger ev hebe jî negirînge, jixwe mirin jî her tim heye, her wiha me cara yekê siûda jiyanek ku bê pejirandin bidest xistiye, nexwe hûn dikarin serkeftî peywirên xwe bimeşînin. Ez çiqasî bi xiroş û hêvî me, hûnê jî ewqasî bi hêvî û kelecan bin. Ez çiqasî tevlî jiyanê dibim, hûnê jî ewqasî tevlî bibin. Li cem me her tişt hevbeş tê meşandin. Lê her tişt bi şer û şêwaza wê ya serkeftî tê afirandin. Hûnê jî vê di her kêliya jiyanê de ji her demê zêdetir hêjayî xwe bibînin û li hember peywirên girîng jî raber bikin.

Bi vê pêvajoyê re êdî hilweşîn, belavbûn û windakirinê danin aliyekê, dihizirim ku em pi nêzî serkeftinê bûne. Lê pêwîstiyên vê hene. Ger hûn pir balkêş wate bidin van, derfeta di gelek peywiran de bidestxistina serkeftinek bilind heye. Her çendî dereng jî be, me xwe gihand wê. Her çendî heta niha me nekarî li gorî tam dixwazin bikin, me vê carê ev derfet bidest xist. Weke ku wê ne derve, ne jî di hundur de tiştek li pêş vê serkeftinê nebe asteng, em dikarin derfetek ji rêzê jî ber bi serkeftinê ve bibin.

Wexta çeper û derfetên PKK'ê yên heyî bi hevbeşî bên nirxandin, dîsa her kes pêwîstiyên peywirên xwe bi milîtanî pêk bîne, wê bê dîtin, serkeftin ji her demê zêdetir nêze. Em hem bi xiroşek mezin nêzî vê dibin, hem neçarî û mehkumê vê ne. Serkeftin her wextî û li her cihê ya milîtanên PKK'ê ye.

**28 Hezîran 1997**

## ŞOREŞ DOZA BAWERÎ EZAMET Û VÎNA MEZINE

Hewldanên hûrûkûr ên me di derbarê partîbûna mezin û bi vê re rastiya artêşa me de dayîn meşandin û şerên mezin hatîn dayîn, ti carî ji rûbirû hatina astengiyên navxweyî rizgar nabe. Ev jî bi qasî nahêle em bi serkeftinên mezin bimeşin, her tim rê ji windahiyên bêwate re jî vedike. Xebatên me yên amadekariya mezin, ji ber hêjayî wê qadrobûn çênabe tê valederxistin.

Me ev rewş bi raveyên giran ve nirxandin. Ya rastî divê em vê hîn zêdetir li ser kesayetan û di derbarê feraseta nûnertiya wê dike de bikin û bimeşînin. We çawa sal wisa derbas kirin? Bêku lêpirsîna wê bikin, bipîvin, hesabê wijdanî bikin, hesab nekin dibe sedema çi û ber bi çi ve dibe, elbet bêku fihêt bikin û aciz bibin, xwe wisa pejirandin, yeqîn dikim xirabiya herî mezin hûn li xwe dikine. Ancex ev qet ne di xema hinek kesan de ye, jixwe hinek qet berê xwe jî nadin wê. Hinek jî van rewşên rû didin, bi şêweyek herî neyênî dinirxînin, heta hîn zêdetir xirab dike û weke tiştek asayî ye hûn tev jî lê temaşe dikin.

Li ser şehîdan hizirîm. Min kesayeta berxwedêrên 14’ê Tîrmehê ber çavên xwe re derbas kirin û elbet hêrsek mezin dijîm. Gelo ev partî, partiyek biryardariya berxwedaniyek mezine, yan jî partiya rêjeyek mezin kesên we ye? Kesayeta şer û berxwedaniya rasteqîn a berxwedêrên 14’ê Tîrmehê ye yan jî ya kesayeta we ya ku kar û barên we xirabkirin, tinekirin û ferasetên hûn hûrûkûr dijîne? Muqayese dikim û her ku diçe hêrsa min girantir dibe.

Ew hewldanên me yên bêhempa ferdîkirin, bi şêweyek ti wateya wê neyî û feydeya wê li kesî çênebe anîna rewşek nenas û vale derxistin, bi navê kî tê kirin? Hewl didim vê fêm bikim. Encam jî, kesayetên we yên xwe didin deste. We ji mêj ve rêzdarî winda kiriye û dev ji jiyana ji bo armancan berdaye. We bi temamî xwe kiriye çavkaniya pirsgirêkan. Elbet bi vî rengî jî hûn ketine rewşek rêvebirinên xebatên dijber. Kesê ku kar û barê wî ferzkirina vê ye, weke nexweşiyek herî xeternak û şêwazek oportonîst pêş dixe. Ger bêjim gelo feydeya van kiryarên we çine, hûn bi xwe jî nikarin rave bikin. Hûn dibêjin; “Ez wisa me, evqas ji min tê, ji vê zêdetir çênabe.” Çavên xwe her tim berdana erdê, nebûna tiştek, sernexistin û ne afirandin –jixwe, ev peyvên ku pêwîste hûn

negirin ser devê xwe ne- bûna xwedî feraseta jixweberî û pratîka wê ya kirêt xweşa we diçe. Elbet rewşa we, berdoşiya windakirî ya di civakê de em pir baş nas dikine. Kesayeta ku kêrî tiştekê nayê, carek din xwe di nava me de dide der. Ev xisletên kesayetî bi salan lêhûr bûye, tam veguheriye elemekê. Ev kesayet, tevî hemû hewldanên me yên sererastkirin û pêşxistinê, hundurê partiyê aniye rewşek nekare bêhn bigire. Karek ku bi rehetî dikare bê kirin jî, xirabkirinê ve mijûle.

Dîsa şehîdên me yên herî mezin bibîr tînim. Di pêvajoya herî lewaz, pêvajoya zehmet bû hêvî jî li ser piyan bimîne de, di nêvengek qet derfet neyî û li cihek weke zindana hovîtiya herî mezin lê dihat meşandin de, li bawerî, girêdan û kesayeta wan a berxwedêriya bêhempa dinêrim. Li aliyê din jî li kesên ku ger destê xwe bihejîne dê yekser ber bi serkeftinan ve baz de, tevî xwedî her cure derfet û nêvengê ne bi zanebûn xwe beramber pêşketinan dikin asteng dinêrim. Ma dibe mirov li hember vê rewşê hêrs nebe? Ev partî, partiya kiye û partiya kîjan nirxa ye? Ev şer, şerê kîye? Kesên şer kirîn bi navê çi û çawa şer kirin? Van tevan muqayese dikim û îsyanê dijîm.

Ev pratîkên xwe kirine şêwazek û hema bêje heq dibînin. Li hember karek herî biçûk jî eleqe raber nakin. Mînak ez dibêjim perwerde, ew dibêjin; “Perwerde zêde ne girînge.” Dibêjim de başe pratîka şoreşgerî, dibêjin; “Ew jî me dixetimîne.” Dibêjim başe, nexwe ya amade jî rast û durist biparêzin û nirxên we didin jiyîn rûmet bibînin, dibêjin; “Ew jî ne li gorî em tam dixwazine.” Vêca hûn kîne û çine? Di nava vî miletî de di berdêla mûçeyek pir kêm de hijdeh demjimêran karkirin jî, weke nîmetekê tê dîtin, gelo hûn vir çi dibînin? Yeqîn dikim mirov tenê ji bo keda xwe rizgar bike, girêdayî pergalê ne kêmî panzdeh demjimêran kar dike û ev jî nabe nesîbê her kesî. Hûn xwedî nêzîkbûnek pir dûrî kesên ku şerê pariyek nanê ji rêzê jî didine. Elbet ev nexweşiyek mezine. Kesê ku evqasî hovane li pratîka şoreşgerî ya mezin û feraseta şoreşgerî dinêre, evqasî tinebûyî lê dinêre, bênamûsê herî mezine. Ger em ji hêla dilxweşî û siyasî ve binirxînin, hêzek jirêderxistin û tasfiyekare. Nexasim dema ji hêla artêşê ve mirov lê dinêre, tam xirabkarê artêşê ye û di nava refên me de ev pirin.

Niha we kar aniye halek wisa, bi feraseta; “Jixwe her kes dişibe hev”, we lihevkirinek bêdeng saz kiriye. Hûn dibêjin; “Tu nêzî min nebe, ez jî nêzî te nabim. Tu min bincil bike, ez jî te. Ezê wisa bidomînim û bi vî rengî bimeşim.” Xirabiya herî mezin wisa li miletekî

tê kirin. Dewlet û partî jî wisa ji dest diçin. Nexasim em dev ji serxistina şerekî berdin, şer jixweber tê windakirin. Naxwazim zêde vê rexne jî bikim. Ev ne rexneyeke, ya rastî tawanek we pêwîste bê ronîkirine. Hûn siûda pêşketina em bi baldariyek mezin didin we çarçûr dikin. Cîhanek we ya pir sivik heye, bi şerê mezin re derbas nebûne. Hûn nizanin şerê bîrdozî çiye, we qet bala xwe nedaye wir û zêde ne di ferqê de ne, şerê îmhayê yê bêrehim çiye.

Yên di şer de ya rastî ji dervî hemû zagonên şer mane û hema bêje bûne girêkek kombûyî. Vaye pirsgirêka herî bingehîn eve. Ger pirsgirêk zêde bibe, hûnê xwediyên van tevan jêkin bavêjin. Nêzîkbûnên pêşdarez, dogmatik, tinebûyî û bêberpirsyar ên bi qasî rê nedin ferasetek zanistî, ancex wisa dikare ji holê bê rakirin. Me her tim ev got: Doza şoreşê, doza bawerî, ezamet û vîna mezine. Kesên di asta herî kêm de bersiva pêwîstiyên vê dozê nedin, ti ferqa wan ji sîxuran nîne. Eşkere ye, hûnê hinekê me mijûl bikin, lê negengaze ev kesayet zêde bikare li hember me li ber xwe bide. Em baş dizanin ev kesayet hejare û zêde siûda wê nîne bi ser xwe ve bê. Bi vê zanebûnê em hatin heta roja îro. We xwe li hember dijmin tewandiye. Bi navê her kesê hatî li devê we daye, ne dil û ne jî mejiyê we maye, em neketin rewşa mêtîngeran an jî ew helwestên we xwe pê ve girê dayî. Ji bo em siûda pêşketina azad derbixin holê wisa nêz bûn. Lê belê hûn an li ser vê razan an jî we çarçûr kir. Nepêkane em vê bipejirînin.

Ji bo fêmkirina vê min teori pêş xist û di dahûrînan de ronî kir. Me çîrokên xwe yên dawî di derbarê şer û jiyanê de jî bi şêweyên cuda pêşkêşî we kirin. Mixabin hûn dihizirin, ezê jî bi we re lihev bikim û serî ji we re bitewînim. Elbet divê hûn bizanin ev nepêkane. Lewma weke min gelek caran destnîşan kirî, çi di wateya kesayet de, çi di wateya sazîbûnê de dibe, hûn xebat û şerê em di bin navê Rêbertiyê de dimeşînin nas nakin. Heta di asta rêzdarî de jî pêwîstiyên wê pêk nayînin. Hûn bi qasî mirovek ji rêzê, heta bi qasî dijmin, bi pîvanên hewce nêz nabin. Me jî got dibe ku ev reftarên wan ji ber cahiltiyê ne, zêde terbiye nedîtine, lewma zêde em bi ser wan de neçin. Ancex me paşê dît, we ev weke heqekê dîtiye. Heta hinek ji we xwe ferzkirin anîne qonaxek sînornenas, partî nas nake û nirxên pîroz tine dihesibîne.

Çi dibe bila be, kî dibe bila be, bêku roniya çavên wan binêrim, bêku cihe bikim kiye û ji kur hatiye, emê misoger bi ser kesên di vê rewşê de biçin. Ji ber em mirovên têkoşînê ne, emê bi tevdîra tê xwestin ve bi ser

we de bên. Li gorî me gotinên we yên weke; "Dilê min êşiya, ji evqasê re ne amade me, ez jî şaş dimînim çawa hatime vê rewşê, nizanim" bêfîhetî ye. Ya rastî hewce dike mirov hîn zêdetir bi ser we de bê, we çawa evqas sal wisa derbas kirin.

### Pêşengê Herî Baş Yê Têkneçûyî Ye

Kesê xwe li gorî pîvanên rast perwerde neke, bênamûsê herî mezine. Di vê rewşê de hûnê xwe çawa biparêzin? Zirxên ku hûn li vir xwe bispêrinê, tenê paşverûtî û muhafezekarî ye. Dikarin bêjin; "Ez durû me, ez jidilbûnê dûrim, ya rastî ez ne li gorî vî karî me, di encamê de ez sîxurim. Ti dozek min a cidî bibim mirovê wê nîne." Lê diviya ev destpêkê bihata fêmkirin. Ger hûn fêm nakin newin nav refên me, ev hêza we nebe nêzî şer nebin. Ger hûn nikarin hêza xwe perwerdekirinê jî raber bikin, nexwe weke mafdar, emê bêjin çi karê we di nav refên me de heye. Ev pirsek zelale, ji hemû partiyê û we tevan tê pirsîn. Hêza we têrê neke, hûnê misoger ji xwe re sînorekê diyar bikin. Ger hûn ferzkariyên kesî bikin, ezê jî hewl bidim hêza xwe bikar bînim.

Yeqîn dikim ji gêjbûn û ketîbûnê re azadî xwestin ne mafeke. Maf xwestin, ji bo karên baş û xweşike. Maf xwestin, ji bo berhemdar bikaranîna kedê ye. Dûrbûna ji kedê, ji bo koletî û kirêtî qetiyen weke maf nayê daxwazkirin û ger dê şirîktiya tawanê jî neke, kes jî ji vê re nabe amûr. Kesî bi zorê ji we re negotiye werin, bi şoreşê re bimeşin. Hûn bi xwe vê dikin. Lê belê pirsgirêka we piştî vê destpê dike. Lewma hûn bawerî bi pêwîstiya amadekariyek cidî nayînin. Mirov wisa bi ser ti karî de naçe. Hûn şoreşê tenê weke karên vale dibînin. Lê di rastiyê de karê herî cidî, karê şoreşê ye. Mînak ên dixwazin bi me re kar bikin, divê bizanin jêhatiyên xwe di asta herî baş de bixin meriyetê û vê bimeşînin. Ji bilî vê cuda bi me re meş nabe.

Kes naxwaze we ne di cîh de ji hev bixe. Bes hûn tawanên şoreşê yên herî giran dijîn. Ger hûn tawanên cuda bikin, evqas xeter nabe. Ji ber tawana şoreşê tawana herî mezine û weke gelek caran hatî dîtin bi gelemperî cezayê herî giran ji vê re tê dayîn. Dixwazim qinyata min tam be ku hûnê di van mijaran de durist bin û di çarçoveya pîvanên fermanê de bimeşin. Ger yek kesê ne wisa mabe, dixwazim hesabxwestina xwe ya pê re temam bikim. Em dixwazin dawî li helwestên we yên kevin û

kêrnehatî yên girêdayî we bînin. Em dixwazin misoger bêku zorî hebe, bi merdinî hûn bibin xwedî soza xwe. Êdî dawî li sozên derew bînin, divê bi qasî bikarin bikin soz bidin. Ev tiştek başe. Bi qasî bikare bûna xwedî soza xwe, yeksanî mirovbûna herî başe.

Ger em di şoreşê de cîh bidin derewker û kesên nexwedî sozên xwe, emê xirabiya herî mezin bikin. Hûn dixwazin vê sucê bi min bidin kirin. Ev helwestên we, me pir tengav dikin. Van tevan jî bi navê zaroktî dikin. Jixwe pir sedemên we yên ne rast hene, lê ev jî weke tawanek pir mezin derdikevin pêşberî min. Ma bila kesayetên miletê me yên saxlem nebin? Ma bila kesayetên xwedî soza xwe nebin? Ma bila kesayetên we yên bi navê dîrokê, bi navê milet kar dike û dizane çi dike nebin? Li gorî we ev ne girîngin. Li gorî we asayî ye her kes xwe ferz bike. Bal bidinê, ev rûdan li ser berjewendiyên miletekî yên herî bingehîn ferzkariyek pir ketî ye. Hûn dikarin her tawanê bikin, lê qet divê tawanek wisa nekin.

Di nav me de fêr bûne: Ji bo berjewendiyên milet ên bingehîn çi hewce dike, welat, welatparêzî û azadî çiye? Hûn dibêjin; "Ev zêde kêrî me nayên, niha ev tiştên giştî ne." Lê belê sedema bi temamî em winda dikin, dervî mirovatî ketina me û ya rastî hûn jî ji hêla objektif ve vê diparêzin. Mînak xala keyfiyet û xweperestî hûn esas digirin, li ser derfetên heyî xwe têrkirine. Derfeta heyî, bi qasî hêz têrê dike, ji bo xwe dana jiyînê bikaranîne. Ji ber ji armanc û berjewendiyên gel ên bingehîn qût dibe, rêxistinê û pratîkên şoreşgerî li aliyekê dihêle, karên xwe yên takekesî eyar dike. Niha helwesta herî xeternak jî eve.

Rêbertî di van pêvajoyan de li şûna xwe bijî, xwe li gorî berjewendiyên gel ên bingehîn dide jiyîn. Hemû merîfeta min eve. Ji bilî vê ti karê min nîne. Karê herî bingehîn dikim û min dike min, bûna berdevkê gel ên hinek rastiyên giştî û bi wê re ahengê de jiyîne. Her wiha bêku xwe bixapînim hêza dana jiyînê raberkirine. Berjewendiya gel a giştî, siyaseta gel a azadiyê ye, amûra gel a şere, partiya gel, artêşa wê û quralên wê ne. Her cure amadekariyên artêşê û çalekiya wê ne. Pêşengê herî baş, kesê van tevan bê qusur pêk tîne û mayînde serkeftî dike.

Dema hûn van pîvanan li gorî xwe saz bikin, hûnê bibînin kesayetek tam berovajî vê ne. Li gorî we ne karên bingehîn ên pêwîste pêşî bên sazûmankirine. Mijara fikarê ya bingehîn hûn bi xwe ne. Ya herî xirab jî dev ji xwe berdana we, tam weke kesayetek nexweş xwe avêtina erdê ye. Ev hîn zêdetir xeternak dibe. Îdîa dikim, ev rewşa we asayî nayê

dîtin, ez jî nayêm vê lîstokê. Ji roja destpêkê xwe nas dikim ve min li dijî vê lîstokê ala xwe ya şer rakiriye û heta roja îro hatim. Bingeha rastiya min eve. Yan ev rastiye, yan jî hûn. Niha wexta rastiyên we bipejirînim, wê ji bo min her tişt biqede. Wexta Rêbertî xwe bîne asta we, dê berzbûn û serkêşiya wî raweste. Ma xirabiyek ji vê mezintirîn heye? Bihizirin her kes dibêje; "Bijî Rêbertî, wisa bibe serkêş, tu ji bo me hewce yî." Vaye hûn jî hewl didin vê bidin rawestandin.

Tiştek din jî heye: Bal bidinê, we temamî îflas kiriye û ev jî astek ku ti rastiya wê nemaye. Ev asta we ya jiyanê kêrî tiştekê naye û bi rastî jî zik jî têr nake. Kes li hember jiyanê ne rêzdare. Vêca emê çima vê rewşa ji rêzê bipejirînin? Xala dixwazim bi van mijaran tevan re ji we re vebêjim, astengî û zehmetiyên we yên hundurîn çi dibin bila be, li ser bingeha pêkana rast ji dil û can, biryardar û bi hewldanek têrkar ve beşdarî xeta têkoşîna PKK'ê bûyîne. Ev çênebe, em nikarin tiştekê saxlem bigirin dest û dê kar jî xirab bibin. Her cure çîn, her feraset û heta her cure kesayet di refên me de xwe didin jiyîn. Ev jî asta koletiya ku civak dijî ye. Nexwe, nabe mirov dev ji pêşengiya li ser bingeha rast berde. Em nikarin dev ji pêşengiya partiyê û serkantiya artêşê berdin. Ger amadekarî hewce dike, hûnê heta dawî xwe amade bikin. Hewldan hewce dike, elbet hûnê hewldana têrkar raber bikin. Jixwe karek we ya cuda jî nîne.

Ma şoreş ne karê bingehîne? Gelo hûn vê dipejirînin û di vê de biryardarin? Ger hûn dibêjin erê, nexwe hûnê hewldana wê bêhempa bimeşînin. Emê çima xwe bixapînin? Dixwazim di vê mijarê de qane bim. Êdî dixwazim hûn min nexapînin. Xwe ferz nakim, rastiyan şanî we dikim. Li gorî min mirovê bi tendurist, mirovê ku rastiyan ji her tiştî berz dibîne ye. Bi qasî esasgirtina rastiyan, berzbûn û erdemtiyek mirov a hêja nîne. Ji bo we vebûn, azadbûn, hêzbûn û xweşikbûn her demê ji nan û avê zêdetir hewce ye. Ancex kesên wisa dikarin xwe ji hêla heyberî û giyanwerî ve bidin jiyîn. Li hemberî vê ti israra we derbas nabe.

Ji xebatek ji rêzê ya teknîkê bigirin heta karên ti eleqeya wê bi çekê re neyî, bi tena serê xwe di quncikek dûr de, li zindanê, heta hûn li warek xerîb jî bin, ev hemû bi navê tevgerê di nav kîjan xebatên partiyê de dibe bila be, didin diyarkirin ku divê hûn her tim xwedî hevgirtinekê bin. Dixwazim bêjim ji bo serkeftina şertê me ya bingehîn eve. PKK'ya ku bi şêwaza zanebûn û afirîner tê pêşxistin eve û pênaseyên PKK'ê yên

ji bilî vê jî şaşin. Ev helwest ji bo hemû karî ne. Dibe ku ev kar, xebatek aborî ya ji rêzê jî be. Pêşeng xwe wisa pênase dike û wisa dest bi kar dike. Xala ku pêwîste hûn pêşî di nava xwe de çareser bikin eve. Pirsgirêk li ser vî bingehî ye.

Gelo hûn dikarin bibin milîtan? Me wextek dirêj da we, têra xwe jî dem da we. Xwe hevgirtî binirxînin û bersiva xwe bidin. Nexwe hûnê carekê bibînin hêj we bersivek bi serûber nedayî, ketine navenda şer, we her tişt bi ser û çavên xwe daye, dest û lingê we li hev hatiye badan û xwe jî bi fermandariyê re rûbirû hiştiye. Vaye rewşa herî zêde li hember hêrs dibim eve. Nikare baxive û derdikeve pêşberî dewletan. Hêza wî nîne du gotinan ji gel re bêje, bûye serkêşê gel. Ne di wê rewşê de pêwîstiyên şer ên herî kêm pêk bîne, bi jiyana sedan kesî dilîze. Rewşa metirsîdar wisa ye. Ger em nekarin vê derbas bikin, hema bêje dê karesat di nava me de me tine bike.

Ez dikarim dev ji her tiştî berdim, lê nikarim dev ji rastiya pêşengî berdim. Hûnê behsa pêdiviyên şoreşê bikin. Ezê bersiva wê jî bidim. Ya min eleqedar dike şoreşe, pêşengê şoreşê ye. Ji berxwedêrên berxwedaniya 14'ê Tîrmehê ger em cardin **Kemal Pîr** bibîr bînin, ya rastî ji bo wê biryarê bide pir nîqaş dike û dibêje; "Em dest bi berxwedanî bikin û nekin jî, dê Rêbertiya heyî karê xwe bimeşîne. Ger em îxanetê jî bikin dê ew dîsa jî ser bikeve." Divê em vê bipejirînin. Wateya vê nîqaşê eve: Di wan mercên hoveber de jî me û xwe tînin beramberî hev û soza hevgirtinê didin. Ew biryar wisa tê dayîn. Weke we ne li nêvengên azadin û derfeta wan a azad şerkirinê nîne. Tişta ku dijmin kêlî bi kêlî li ser wan ferz dike, helwesta; "Yan hûnê radest bibin, an jî hûnê nejîn." Polîtîkayek tirsnak tê ferzkirin û biryara wê berxwedaniyê li ser vê bingehê derdikeve holê.

Van şoreşgeran di nava dudiliyek mezin de dihêlin. Ger tu dixwazî bijî wê tu gav bi gav ber bi radestbûnê ve biçî, neçarî ber bi serî tewandin û ketîbûnê ve biçî! Jixwe bi vî rengî sedan ji dest diçin, dijmin nahêle çavên xwe jî vekin. Rastiya tê sepandin ne tenê îşkenceya çorse. Tişta di berdêla vê de dixwazin, ew dev ji hinek nirxên partiyê berdin, dev ji armancên partiyê berdin, girêdana xwe ya bi partiyê re qût bikin û dev ji girêdana bi rastiya Rêbertiyê re berdin. Vaye ew wê soza hevgirtina mezin di vê xalê de didin. Dibêjin; "Na, emê baweriya xwe biparêzin, bi armancên xwe ve girêdayî bin û dê vîna vî karî jî teqez jî ser bikeve." Baweriya wan eve û bi wisa vê berxwedaniya dîrokî pêk

tînin.

Hema bêje em hatine ber serkeftinên girîng, yê bixwaze dikare gelek tiştan ser bixe. Ji bo her kesî siûda jiyanê, derfeta şerkirin û serxistinê heye. Lê belê hinek beramberî vê dibêjin; "Xetimîm, hêza min têrê nake." Ya rastî zêde bi serkeftinê bawer nakin. Ev rewşa herî ketî ye. Vêca em li berxwedêrên mezin ên PKK'ê binêrin. Çi eleqeya vê helwesta we bi van mirovên hêja re heye? Ev helwestên we lîstokeke, di şêwazek xeternak de xwe bi xwe ferzkirine. Jixwe qet hewce nake li vir eşkere bê ferzkirin. Em hinekê li wijdana xwe binêrin. Ma ev ne rêhevalên me ne? Vêca ma van ne ji bo şeref û serbilindiya me ev berxwedanî raber kirin? Wan jî dikariya radest bibin û weke we bêjin; "Ez jî xetimîm, êdî nikarim." Bes dê wê demê tiştek bi navê şeref, serfirazî û mirovahiyê bima? Hûnê vê ji wijdana xwe bipirsin.

Ne ji bo ez dibêjim, ji bo armancên hevalên we yên dozê ne hûnê vê bikin. Niha lê dinêrim, her kesî ev ji bîr kiriye, li pey tiştên weke ritbe û berjewendiyê dikevin. Bêku şer bikin û mezin li ber xwe bidin têk diçin. Vaye ev jî me hêrs dike. Nabe ku ev bê parastin. Nabe ku bêfêhmatî û bê baldarî me wisa ji nirxên dîrokî dûr bixe. Nabe girêdana me ya bi wan ve û weke wan bûyînê asteng bike. Nexwe, dê li ser vî bingehî partîbûn pêk were.

Hûn bi qasî Tansu Çîller jî ne xurtin. Wê jî got; "Yan dê biqedin, an biqedin." Lê niha ew bi xwe diqede. Ma pêşberî me hûn ji wê xurtirin? Hûn ferz dikin; "Yan dê PKK weke em dixwazin be, yan dê bibe." Bes diyare ev nabe. Cîhan aligirê wê bû. Ma hûn kîne, hêza we ya bi çend quruşî heye? Divê mirov hedê xwe bizane, li hember xwe jî rêzdar be. Niha jî ji bo Tansu Çîller dibêjin; "Ev dîn û hareke." Vaye di encama hinek çavnebariyan de rewşa xembar a kesayeta ku nikare xwe venêrîne ketî navê wisa ye.

Dibe ku ev ji bo we jî bên gotin. Ger hûn nekarin xwe li gorî armancên xwe venêrînin û bêjin; "Yan dê wisa be, yan wisa" israr bikin, hûnê bikevin nav rewşên li nav şoreşê kembaxtir. Vê qet bi axaftinên erzan ve nekin. Dê yekser otorîteya şoreşgerî we daqurtîne. Hûn dihizirin ku li nav cîhana hinek xirabkaran de ne yan jî kiryarên hûn dikin dê ji we re bimîne. Ev ne wisa weke hûn dizanine. Ji bo hûn xwe bi rêkûpêk bikin, me wext da we. Nexwe hûn dikarin li dijmin jî binêrin û wisa fêm bikin lêdana we çiqasî tunde. Bes kelecana we nîne, têrkarî wate nadin rêzdariyê jî. Eşkere bêjim: Ez beriya dijmin, dijminê van

nêzîkbûnên we me. Hem di nav malbatê de hem li nav derdor ji temenê biçûk ve dijminê yekemîn min beramber şer kirî ev bû. Hûn nikarin min bi cureyek din pênase bikin.

Hûn artêşbûnê dixwazin, heta ji bo vê bêsebrin. Şertê yekemîn ê artêşbûnê eve. Heta ev şert pêk neyê, ti çekê negirin destê xwe, neçin welat û erk nexwazin. Ev şaşe û dê zerar bide we. Piştî vî temenê xwe divê êdî em we aqilmend û bi vîn bipejirînin. Êdî fêm bikin hûn ne civatên xirabkarane. Bipejirînin hûn mirovên biryardar û dikarin kar bikine, li gorî vê jî gavavêtin hewcedariya vî karî ye. Hûn pişt me re li her eniyê, li qada xebatê neyêniyên ku dijmin jî nikare bike raber dikin. Vê fêm dikim. Lê naxwazim bipejirînim. Erd biqelişe hûnê bikevin nav, lê hûnê wisa jiyan nekin. Ji ber ger vê bipejirînim dê her tişt biqede. Dibe ku hûn erzan bijîn, lê eşkere ye yên hêsan dijîn di çi halî de ne.

Ji bo ji jiyanek wisa dûr bisekinim, min dîsîplîna herî mezin li ser xwe pêk anî. Ji deh saliya xwe ve bi nefretek mezin li hember vê jiyana hûn dipejirînin min xwe bi dîsîplînek mezin girtiye û ev jî xwe bi xwe kir. Bihizirin: Partiyek mezin dixwaze we bi dîsîplîn bike, lê hûn xwe bi xwe hewl didin vê siviktiya mezin bijîn. Bêku tiştek li naverastê hebe, ango dema em li asîmanan peyvek rast digerin, hewl didin bibin xwediyê pêkanîna gavek rast, hema bêje me her tişt ji jor daxist danî pêşberî we. Mixabin hûn niha dibêjin; "Cîhana me ya herî sivik, fêrbûnên me yên kevin, azweriyên biçûk, karên biçûk, fêrbûnên jiyana biçûk." Ya rastî jiyana me bi van tarî bû. Li welatê me her tişt ji rêzê ye, wateya her tiştî tine bû. Her tişt bû tarîgewrik, biçûk bû û her tişt ji mirovbûnê derket. Niha ji hêla felsefî û dilxweşî ve, çi jî ji hêla siyasî ve ji ber ku hûn dixwazin bibin xwedî jiyana azad, divê êdî hûn vê bibînin.

Ez bi tena xwe hatim heta vir. Gelo çima weke hûn dikin, nikarim xwe bi xwe bixapînim? Rewşa min tam berovajî rewşa we ye. Hûn tev bibin yek, bi qasî quruşekê jî nirx nadim rewşa tevahiya we dijî. Ji ber ev nakokî pir balkêşe. Ez evqasî tiştên mezin li ser we ferz dikim. Lê hûn jî ewqas tiştên biçûk li ser min ferz dikin. Ya rastî min di temenê herî biçûk de dev ji van tiştên biçûk berda û nefretê ji van dikim. Hema bêje hemû cîhan beramberî min bû yek, lê ez reviyam. Vêca vê em ber bi kur ve birin? Niha dema dest davêjim karekî, ma dibe kêmasiyekê bikim? Di vê mijarê de beramberî we ecêb dimînim. Mirov karê mezin neke, nikare bijî. Heta serkeftinên girîng çênebin mirov nikare bijî. Heta dema pirtûkek jî tê xwendin, li gorî min ger baş neyê têgihiştin mirov

nikare bijî. Hêjî di bîra min de ye: Wexta min di pirtûkekê de hevokek baş fêm nedikir, min şerê herî mezin li ser wê hevokê dimeşand û heta min cewhera wê fêm dikir, pir zehmetî dida xwe bi tena xwe li ser disekinîm. Ev, şerê fêmkirina rastiyê ye. Hûn li pey derewên bi dûvik ketine, weke dînan dilîzin û paşê jî hewl didin van bi min bidin pejirandin. Ez kesek wisa şerê peyvan, şerê rastiyan a di nav pirtûkan de dijwar dimeşînime. Ezê çawa derewên we yên bi dûvik bawer bikim û çawa destûrê bidim vê? Mirov cahil dibe, lê ma evqas?

Her tişta hûn di nava pratîka şoreşê de dikin dek û dolabin. Ev jî bêhêziyê diyar dike. Nikare mafê civînekê bidiyê û hûn nikarin du pêwendiyan bi hev ve girê bidin. Li derdora we şaşiyên mezin hene, ancex nikarin li dijî wê jî derbikevin. Vêca ger hûn weke min bûna, ango li naverastê tiştek nebûya, di kêliya asta têgehan de jî tu tî înkarkirin de, wê te çawa ew şer bimeşanda û ser xistiba? Ger hûn nikarin a amade jî binirxînin, hûnê bikarin şerê ji tinebûnê avakirina hebûnê çawa bimeşînin? Ma ez mirovek çawa me, tevî van hemûyan xwe weke xebatkarek pir dilnizm dinirxînim? Vêca hûn kîne, xwediyê kîjan û çi xebatê ne?

Evqas nirxên berz ên amade hema dibêjin ha min bigire û serkeftinê saz bike. Mînak girse û çek amade ne, li her alî pêşketinên heyberî û giyanwerî hene. Ger hûn bixwazin dikarin şerek herî encamgir jî plan bikin. Heta ku ev hemû neyên dîtin, fêmkirin, hemû tişta hûn bikin xweperestî û ferdperestiya şêwaza kevin ku hûn ji silaleya xwe fêr bûne. Ne diyare hûn çi dixwin, çi vedixwin û çi dikin. Jixwe ne diyare we naverast jî çiqasî tevlîhev kiriye. Ya rastî hûn nizanin bixwin û vexwin jî. Cîhanek we ya biçûk heye. Tişta hûn ji vê cîhana xwe ya biçûk fêm dikin, şêweya herî bê naverok a xweperestî û keyfiyete. Di nava keyfa hûn behsê dikin de jî, tiştek bê wateya keyfê jî nîne. Lê hûn fêrî vê kirine.

Niha her tiştê li nav partiyê ji bo we zêde ye. Ya rastî we partiya ku mezin dibe qet fêm nekiriye. Lewra bi serûçavên xwe didin. Ev dişibe kesek hejar û birçî yê dikeve nav baxçeyek tije fêkî. Yan ditirse û qet naxwe, yan jî dema dixwe nizane dê zikê wî çiqasê bikare bixwe. Paşê jî ji nişkê ve dikeve. Sekna we ya di nava partiyê de jî dişibe vê, vê tînin bîra me. Lewra me wext da we. Em dibêjin partî wisa tê xwarin, partî wisa tê daqurtandin, partî wisa tê helandin, piştî wê mirov wisa di nav

de kar dike, bersiva wê jî wisa tê dayîn. Vaye ev, dîsîplîna jiyan û xebatê ye.

Hûn li hember vê li ber xwe didin û dibêjin; "Em birçî û feqîrin. Lewra emê bi çavsorî êrîşî her tiştî bikin." Hinek wehşî hene, êrîşî her tiştî dikin. Heta ev lawirên hovin. Tê zanîn çi tişta digirin çawa davêjin devê xwe û parçe dikin. Beramberî vê jî her kes metirsiyê dijî. Vaye di wateya siyasî de hest û arestebûnên we jî dişibe wî wehşî û ev jî pir kirête.

Şêwazek din jî eve: Dibe ku li wir rêgez hene, lê her tim tirsoneke û xwe dide paş, ev jî bi we re pir bibandore. Tiştên ku dikare bixwe jî naxwe, şerim dike. Ji ber di cîhana wî de ev qet nîne û divê nêz nebe. Ne diyare çiye. Ev jî raveya we ya xwe dana paşe. Ev tiştek bi êşe, lê rastiye. Ji bo nekevin rewşên wisa tirsnak, hûnê pir nirx bidin wê perwerdeya em didin we. Çima cîhan kena xwe bi me dike, çima em miletek ji qabîleyên cîhanê yên herî paşketî jî paşde ne? Vaye ji ber vê sedemê evqas tişt rû didin.

### Şehîd Paşçavkirin Xwe Înkarkirine

Zêde naxwazim bêhsa xwe bikim, min çawa şerê nêzîkbûn, eleqe, gotin û reftarên cur be cur meşandiye. Ji bo şaşiyê nekim, her tim direcifîm, ji bo bibandor bim li ser çi û çawa dihizirî û dikir? Jixwe di vê manê de bi we re baldarî jî nîne. Ango di nêvengek wisa de reftarên tawanî jiyînê danin aliyekê, ger ezê serkeftî nebûma min nedikariya bêhnekê jî bisekinim. Ger henaseya min digirt û dida şaş bûya, di qirika xwe de digirt, ne dida der. Bal bidinê, pir kêm şaşiyan dikim. Ev jî ji ber hêza min a dîsîplîn û jêhatiya min a ferasetê ye. Hûn şaşî û kêmasiyên çors ên dibe nabe ferz dikin. Ya herî girîng jî, ya hewce dike bikin pir tirsonek dikin, weke paşketiyan qet naxwazin bi ser de jî biçin. Ev herdu jî pir xeter û şaşin.

Ji bo hûn vê rewşa xwe derbas bikin em pirşgiriyek mezin didin. Min çima evqasî xwe perwerde kir? Cardin dibêjim: Hêj di temenê biçûk de di hemû karên min dest davêtiyê de, min bêqusurî esas digirt. Ez îro çibim, wê demê jî ew bûm. Ango min karên bêqusur kirin û bi çi ve mijûl dibûm hewldana wê ya hewce min dikir. Elbet vê xisletê her tim rê ji vê re vekir: Her tim pirsên kar li kur û çawa baş tê kirin li pey xwe

anî û vê jî ez ber bi hewldanek bêhempa ve birim. Encam, heta vir ber bi berzbûnê ve anî.

Çima mînaka wateya berxwedêrên mezin ên 14'ê Tîrmehê didim we? Ji ber mirovên weke **Xeyrî**, mirovên weke **Kemal**, mirovên girîng xwe beramberî me berpirs û deyndar dihesiyan. Her wiha ew şehîdên mezinin. Em nikarin van paşçav bikin. Ew paşçavkirin, tê wateya xwe înkarkirinê. Em neçarin wan li ser her tiştî serwer bikin. Ji ber ji vê pîroztir nîne. Bihizirin: Bi zorê Hz. Îsa jî bi çarmixê ve girê dan û niha milyaran mirov girêdayî bîranîna wî Xirîstiyaniyê dipejirînin. Ev mirovên me bi biryara xwe ya cewherî ve biryara mirovahî ya mezin di bedena xwe de bi şêweyek ji çarmixê jî xirabtir pêk anîn. Hêj doh wan wisa kir û we jî îro ev ji bîr kirine. Hûn di xêra bîranîna wan de xwe naguherînin jî.

Eşkere dibêjim: Ez hêj xwe weke tam bersiv dayî bîranîna wan nabînim. Êdî çiqas bê pejirandin ewqasim. Ango ger misoger soza me ji bo hinek nirxên pir mezin heye, ev wisa ye. Jixwe bi hezaran nirxên me yên wisa hene. De werin em sekna we bi van nirxan rave bikin. Ev nirx tev ji bo we tevan şeqamin. Ger hûn israr bikin, hûnê her roj ji cihekê şeqamekê bixwin. Ez neçarim wan bideng bilêv bikim. Ji ber wesiyetên xwe ji min re hiştine. Hewce nake hûn dilê xwe bigirin, heta ku bijîm ezê vê wesiyetê pêk bînim. Divê hûn tev jî girêdayî wan bin. Di vê manê de girêdana we têrê nake. Dijmin jî beramberî wan rêzdare.

Dixwazim vê bêjim: Di nava PKK'ê de tevî van nirxên me yên mezin, li hember kesên xwe wisa ferz dikin hewl didim şer bikim. Wijdana yek ji we razî nabe ku van nirxan wisa cuda bide diyarkirin. Parastina vê jî nabe. Devjêberdin kes ji we wisa xwe ferz bike, gel jî dibêje; "Ev nirxên me nebin, em jî nabin." Ger sozek we jî ya şeref û serbilindiyê heye, misoger hewce dike hûn bi van nirxan ve girêdayî bin.

Li rewşên bi navê şer we jiyan kirine dinêrim û dîsa xwe nagirim **Kemal Pîr** bibîr neyînim. Çûbû Sîweregê. Di sala 1980'î de diçe Sîweregê, wê pratîkê lêkolîn dike û dîtibû. Di nameya xwe ya dawî de gotibû; "Ezê bela xwe ji berpirsên vî karî venekim, ezê wan bigirim, ji wan re bêjim we çawa rê ji vê re vekir." Eşkere ye, ji ber qaşo van kesayetên we yên fermandarî li Sîweregê jî wêrankariyek wisa kûr nehatibû jiyîn. Li Sîweregê şer sînordar hatibû meşandin. Lê tevî wê **Kemal Pîr** eynî wisa digot; "Ezê bela xwe li wan bidim bêjim te çawa

wisa kiriye.” Ger em bi xeta leşkerî ve girêdayî bin, ger em girêdayî wan bin û encamê ji bîranîna wan derbixin, ev ji bo me tevan hişyarî ye.

Ji bilî vê girêdanê ti çavkaniya me ya hêzê nîne. Ev girêdan heman weke şerê wan meşandî, şerek mezine. Hûn jî dixwazin tawîzên vê ji min bigirin. Hûn dibêjin; “Bihêlin, em şer bikin, lê ne li gorî vê girêdana mezin.” Niha ev daxwaza we ne tenê tawîze, îxaneta herî mezine. Her tiştî bixwazin, lê ji vê şêwaza mezin, ji şêwaza vî şerê mezin tawîzê nexwazin. Ji ber hêjî dibêjim: Cengaweriya herî mezin bi vê girêdanê, bi vê baweriyê hat destpêkirin. Emê heta serkeftinê jî wisa bidomînin. Ger hûnê erk bigirin, beriya her tiştî divê hûn vê di hemû şaneyên xwe de bihesin. Hingê hûn dikarin bibin nirxek PKK’ê yên rasteqîn.

Yeqîn dikim hûnê jî paşerojê binirxînin. Jiyana we weke girêkek tawanê ye. Mirov hêrsek mezin û êş dijî. Niha emê çi ji we bikin? Hinekê dev ji venêrînê berdim, bi rastî jî her tişt govaniya ku, dê ev kar di rojekê de tine bibe diyar dike. Nexasim hinek çavbirçî hene, hinek qaşo aqilmend hene, ji bo me bixwin xwe amade dikin. Xwe amade dikin her tiştî parçe bikin, her tiştî bixetimînin û me tine bikin. Heta wexta em bêxemiya gelek ji we jî berçav digirin, wê bê dîtin radestbûn çawa hatiye pêşxistin û îmhabûn çawa çêbûne. Mixabin zemîn heta dawî ber bi vê ve çûnê de amade ye. Çi li dijî xeta partiyê ya bîrdozî, siyasî û rêxistinî dibe, çi jî li dijî xeta leşkerî û rastiya artêş û şerê wê dibe, ger hûn vê paşverûtiya xwe, jixweberiya xwe, vê feraseta ku çavkaniya xwe ji her cure nexweşiyê digire û nêzîkbûnên xwe derbas nekin, hûn nikarin di pratîka ti qadê de serkeftî bin.

Her tişt eşkere ye. Ger hewldanên min ên xweser nebin, ma dê xêrek ji xeta leşkerî ya PKK’ê were? Em xebatên qadên din danin aliyekê; ger emê bi gelemperî li ser xeta leşkerî rawestin, em ji pratîka Sîweregê destpê bikin û heta roja me werin. Ya rastî min serbendên vê dabûn. Wexta em xeta leşkerî lêkolîn dikin, divê em hinek karan bikin. Beriya her tiştî divê hûn bizanin li nav PKK’ê xeta leşkerî çawa li gorî teoriya leşkerî tê pêşxistin. Em beriya ku rasterast serî li tundiyê bidin, me pirtûka bi navê **Di Kurdistanê De Rola Zor** nivîsand. **Di Kurdistanê De Rola Zor**, raveya teoriya şer dike. Çima li Kurdistanê zora şoreşgerî hewce ye, di zimanê hemû cîhanê de jî bi mînakan hatiye ronîkirin. Di vê pirtûkê de tê gotin; “Ger dê li Kurdistanê guhertinên şoreşgerî çêbin, pêdivî bi teoriyek şer heye, ango zora şoreşgerî hewce ye.” Ev pirsgirêk tê ronîkirin û me jî ber bi biryara şer ve dibe.

Ger tê xwestin şoreş nexasim piştî salên 1980'î bi serkeftî bê meşandin, divê nêzîkbûnek rast ji pirsgirêka zorê re bê kirin. Ji bo em pirsgirêkên şer, nexasim artêşê ronî bikin, beriya koman bişînin welat, tevî em di mercên zehmet de bûn, me ew pirtûka berfireh nivîsand. Ji ber berpirsyarî me ne tenê ew pirtûk nivîsand, me perwerdeya pratîkî ya komên sedan kesî jî da. Di pêvajoyên destpêkê de bi hezarî hewldanên pratîkî ve ji bo em yek şervanî bidest bixin, me şeş mehên xwe veqetand. Ji vê jî wêdetir ji bo em biryara têkoşînê bi kesan bidin dayîn sal hewce dikir. Ne wisa bîst û çar demjimêr, ji bo mirov demjimêrek xwe ji veqetînin me salên xwe dan. Ji bo em yek kesî fêrî xwe bikin, têkoşînê pê bidin pejirandin, hezar carî li ber yekê digeriyan. Hêj li naverastê tiştek bi navê leşkerî jî nebû. Ma pêkan bû em çek bidest bixin? Me nedikariya xwe nêzî çek jî bikin. Tenê ji bo em biryarekê bigirin, em neçarbûn van tevan bikin. Niha fermandarên me yên herî baş pêvajoya reva ji şer dijîn, lê belê ne di ferqa vê jî de ne. Mixabin ya amade ji dest diçe, lê hûn naxwazin vê jî bibînin. Li gorî we ev qet ne girîngin.

Bihizirin, fermandarên me yên herî ji xwe razî, qet naxwazin aliyê kar ê qanebûnê, aliyê biryarê, aliyê dilxweşî berçav bigirin. Şerê bidestxistina çekekê çi ji me distand? Ji bo we ev jî qet ne girînge. Ji ber çek pirin. Bes li gorî min rewş qet ne wisa ye. Ji bo ez komên gêrîla bişînim wan baregehên qadan, tam bîst salên min çûn. Tê bîra min: Ji salên 1970'î, heta beriya wê jî, dihizirîm ku emê kengê derbikevin ser çiyayên azad. Ji bo azadiyê salên wisa derketina çiyan encama evqas hêvî û hewldanên mezinin. Lê dinêrim, xwe gihandine çiyayên azad ên fetihkirinê, lê qîmetê nadin nirxa çiyan. Nikarin nirxandinek erazî ya hêsan jî bikin. Di nava me de fermandarên wisa tije ne. Ger bikarin hinekê wan çiyayên bêhempa binirxînin, dikarin her cure xwe bicîhkirinê bafirînin û şerê gêrîla bimeşînin. Lê qet naxwazin van fêm jî bikin. Nexasim ji bo em komek xwe bişînin wan deran, me sih salên xwe da. Ji bo em mirovek baweriyê bafirînin salên dirêj hewce kir. Çîroka çekekê heye: Di mercên destpêkê de ji bo peydakirina wê salên dirêj hewce kir. Me ev hemû serê xwe da ber mirinê wisa pêk anîn. Ji ber ger çek bihata girtin cezayê wê giran bû, nexasim cezayê çekên mezin hîn girantir bû. Ma her cure çekên hûn bikar tînin, jixweber ketin destê we?

Ji bo xwe gihandina çiyayek azadiyê bi hezaran astengî hene, destêkê de hidûd hene. Dê ji bo çûna çiyê komek mirovên ji hêla fikir ve dagirtî,

bawermend û çekdar hebin. Piştî vê hûnê çawa evqas hidûdî derbas bikin? Her wiha hemû rê jî hatine girtin. Ji bo xwe gihandina wan çiyan sebir hewce dike. Her wiha dibe ku îmhabûn jî çêbe. Ji bo pêşî li vê girtinê jî şiyarbûn pêwîste. Me bi salan ev hemû pêk anîn. Elbet li gorî we ev hemû ne girîngin. Ya girîng ew fermandariya we ya sexte ku plansazî, keşif û venêrîna wî nîne. Ev jî bi navê we bêşermiya herî mezine. Ezê her tim li nav çavên we bixim we çava ev bêşermî kiriye. Lê ji we re dibêjim, me ji bo otorîteyek leşkerî, ji bo leşkerek bikeve rê, salên xwe dan. Rêzdariya we jî li hemberî vê nîne. Weke ku rêzdariya we nîne, nirxên heyî jî çarçûr dikin.

Min şerê baweriyê ya berxwedêran bi canê xwe dayîn jî ji we re mînak dan. Vêca hûnê çi bêjin? Wan wisa şer kir, me jî wisa amadekarî kir. Vêca we çi kir? Ango gelo ti karê bê kirin nebû? Ma ne dibû hinek kar rast bên destgirtin? Qaşo berpirsên me yên leşkerî herî binavûdeng jî zêde hêviyê nadin. Xetimandin di asta pêşde ye. Ger kesek weke min van karan bîne vê astê nebe, hema bêje hûnê karan di halê xwe de bihêlin. Ev nêrîna dijmine, em devjê berdin. Li naverastê hinek nirxên ku me berhev kirîn hene û hinekan jî bênamûsî çav berdane van. Vê jî weke rê şanî her kesî dikin. Tê gotin; "Tu jî hinekê xwe bijî."

Xebatên me yên dîrokî em dimeşînin hene. Vêca we çi da serxistin? Ji bilî hûn pişta xwe bidin me û bijîn, kesayeta xwe ya netebitî û têrê nake ferz bikin çi jêhatiya we heye? Gelo li çiyan çeka partiyê desteserkirin egîdî ye? Ma li serê çiyan li ser şervanên partiyê qaşo fermandariya xwe dana jiyîn jêhatiye? Ma dê exlaqek serûber a şoreşgerî nebe? Gelo hûnê dev ji vê çanda sînor bernedin? Hûnê çav bernedin yek çalekiya serkeftî, xwe nedin ber yek taktîka şer ya rêkûpêk, paşê jî di bin navê fermandariyê de xwe ferz bikin. Ev tê çi wateyê?

Hûnê dahûrîna vê bikin. Beriya hûn tawanên wisa giran bikin, bêjin; "Ez peywirek wisa dixwazim, fermandariyê dixwazim", van rewşên rû didin pêşî ji xwe re, paşê ji partiyê re rave bikin û rexnedanek jidil bidin. Hûnê hemû rewşên di wateya leşkerî de rû didin jidil vebêjin. Mirin çarenûsa her kesî ye, yên îsyanê dikin tên kuştin. Lê îsyan kirin jî têrê nake. Em ne civatek îsyana ji rêzê ne. Jixwe exlaqek îsyangeran jî heye. Em di asta herî kêm de jî we li gorî quralên gêrîla ava bikin.

Li rewşa hemû eyaletan binêrin. Rojekê nîqaş dikin û dibêjin; "Dê gêrîla girêdayî gundan be." Ev jî rojane di zanyariya dijmin de jiyîne. Kar û barên wan xwe dana jiyîne. Dibêjin; "Her tişt lojîstîke." Ma li vir ji bo

gêrîla quralek herî biçûk jî heye? Dibêjin; "Ji bilî vê jiyan nabe" û kêmek maye vê jî bi min bidin bawerkirin. Gelo ji bilî vê cuda çawa çênabe? Beriya her tiştî hûn mirovên xwedî dijminin, mirovên ku diyare dê dijminê wî çi bike ne. We çima yek qural jî pêk ne anî? Ez ji bo şervanekê pêş bixim wisa salan kar bikim, hûnê jî wan perik perik belav bikin. Ez şerê baweriya salan dimeşînim. Hûnê jî baweriya wê xirab bikin. Wisa nabe!

Ji bo peydakirina çekekê hewce dikir hewldanek mezin bidim. Hêjî di bîra min de ye: Hevalek me bi navê Hisên Sariçîçek hebû. Çek dizîve dixist maşînê û dibir. Tam sê rojan destê min li ser dilê min bû. Gelo hat girtin an na bêhna min dernediket. Pênc çek hebûn tinebûn. Hem jî me tevî her cure zehmetî û bêderfetiyan ev derfet pêş xistin. Yên we jî nirxên amade ne. Tê zanîn li hinek cîhan çiqas çek ketine destê dijmin an jî çek di nav zengê de mane. Niha hûnê werin van tevan bi navê PKK'yîbûnê li ser min ferz bikin. Tawanên we yên wisa mezin hene. Ger hûn nikarin van karan bikin, xwe bidin paş. Kes ne hewceyî şerkertiya we ye. We xwest û min jî bi hemû ziraviyên wê ve ji we re dê hem teorî hem jî pratîka şerê vî welatî çawa bê kirin destnîşan kir. Her wiha ji sedî notê pratîkê jî min amade kir. Ger hûn nikarin ji sedî dehê pratîkê jî amade bikin, nexwe hûn tiştekê ji vî karî fêm nakin.

Her kesê ku dixwaze ger li ser vî bingehî xwedî hêza pêkana rastiyane dê erêkirinê û destûrê bixwaze, bêje; "Ez ji vî karî re amade me." Çend kesên ji vî karî re amade hebin jî, ez dixwazim bi wan re kûr bikim. Dîsa dikare hinek milîtanên hêja yên weke **Kemal Pîr** û **Xeyrî** derbikevin. Dixwazim bi wan ve mijûl bibim û vî karî bi wan re pêş bixim. Vêca hûn çima her kêlî xwe ferz dikin? Dê hinek mirovên vî miletî yên bi namûs derbikevin. Niha wan jî asteng dikin û dibêjin; "Em nakin û nadin kirin, şer nakin û nadin şerkirin." Yekser di helwesta ferzkirina binkeftinê de israr heye. Emê jî vê lîstoka li ser xeta me ya leşkerî tê ferzkirin xirab bikin.

Êdî bi van ferzkariyên we bawer nakim. Eleqeya van ne bi nebesiya derfetan, ne jî bê teoriyê ve heye. Ev rasterast lîstokeke û nexweşiyeke. Karê herî bi xêrê ez bikim, xirabkirina vê lîstokê ye. Eşkere dibêjim: Yan hûnê weke raveyek van nirxên berz bêjin em amade ne, yan jî bêku bi yek were şer bikim hûnê xwe vekişînin cihê hûn jê hatine. Şertê yekemîn ê leşkerbûnê eve. Rêzdariya min li hember evqas şehîd û hevalan heye. Ji ber vê ez nikarim tiştek din bikim. Ger ez xwedî

namûsek ji rêzê bim, li hember evqas pêkanên dijmin ên metirsîdar û wehşî êdî divê nekevim nav van lîstokên we û lîstokên we xirab bikim.

**Kemal Pîr** bi vî dilî çû. Vêca ezê bi kîjan dilî li ser piyan bimînim? Dema wî şaşiyek biçûk didît, digot; "Ezê bi destê xwe sitûyê wî bigirim." Vêca ezê beramberî evqas şaşiyên we çi bikim? Tişta ecêb jî ewe, serkêşên vî karî tasfiyekariyek eşkere ferz dikin. Jixwe mînakên wan ên pratîkî her roj tên dîtin. Her cure rewşên weke radestî û îmhabûnê amade dikin. Çiye, qaşo bi gêrîla nayê serxistin! Mane we şer nekir, hûn bi valederxistin cewhera kar û radestbûnê ve mijûl bûn. Heta neyê pêkanîn behsa serkeftin an jî binkeftina gêrîla nayê kirin. We nekarî quralek cidî ya gêrîla pêk bînin. We çend rastiyên bingehîn ên ji hêla teorik ve hatine ronîkirin û bi pratîka hemû cîhanê ve hatî selmandin jî pêk ne anîn. Di dilê we de xwestekek serkeftinê ya girîng jî nîne. Wêrekiya kor, hestên kor û dijwar bi kesên herî ji xwe razî re jî heye. Ger hûn bi şikestinê ve dijmin bişkînin dê çiqas bi feyde be? Jixwe ew jêhatiya we jî nîne. Hûn du darbeyan bixwin, hûnê yekser dev ji her tiştî berdin. Hûnê bi dil û mejiyê xwe ve van pratîkên we yên kêrî tiştekê nayên bi mêrxasî ber çavan re derbas bikin û hêza vê raber bikin. Li ser vî bingehî li ser vê pirsgirêkê rawestin. Ger ev hêza we nîne, weke pîremêran xwe bavêjin aliyekê. Kesên zêde egîdiya ku hêza min jî têrê nake dixwazin, nikarin kevin bûyî û weke pîremêran nêzî karê leşkerî ya berz ku hewldanên min jî têrê nakin bibin. Nikarin bi van helwestên xwe ve nêz bibin.

Hewce nake hûn dilê xwe ji ber van rexneyên min bigirin. Ger heysiyetek we heye, hewl didim we sererast û xurt bikim. Hûnê bi hemû hêza xwe ve vê wisa fêm bikin. Ger derfetek we ya kirinê heye, hûnê bi hewes û baldariyek mezin li ser rawestin. Ya herî girîng jî, hûnê ji tiştên raveya wan pir zehmet û her tim hêrs dikin –jixwe ev di heman demê de nîv bi nîv hûn bi xwe ne- encaman derbixin. Weke din milîtanê şoreşê û fermandarê şer dernakeve holê. Hûn bi vê helwesta xwe ve kar tam dixeniqînin. Bi van ferzkariyên xwe ve, xirabiya herî mezin li hewldanên berxwedaniya mezin a pîroz dikin. Ger hewce kir, ezê hinek karan ji nû ve bigirim dest. Vêca hûn çima bi nêzîkbûna; "Navê me, şana me derket", xwe ferz dikin? Li xwe mukir werin, hêza we têra van karan nake. Şaşiyên hûn dikin diyarin. Rewşên û erkên nehatine pêkanîn ma nediyarin? Hûn çima hêcetan derdixin û xwe di pişt wan de vedişêrin? Bi berxwedanî û şerê di nava PKK'ê de min jî derbas dike re, nirxên ku xwe

selmandîn hene. Di serî de neçarim van jî biparêzim.

Nexasim dê û bavên we her yek weke gola xwînê, di nava rondikên xwe de xeniqîn, ji min jiyîna we dixwazin. Hûn diçin nava çiyayên azadiyê, lê mixabin salane nikarin xwe di vê mijarê de perwerde bikin. Hûn nikarin vesazkirinek teknîkê bikin û çeka xwe biserûber bikar bînin. Dibêjin; “Çiya mirovan paş dixe, dike wehşî, bi mirov re hest namînin.” Ma ev ne teoriya lawirbûnê bi xwe ye? Hûn diselmînin ku çi tişta me heye înkar dikin. Ev ji bo min girîngin.

Berxwedêrên Tîrmehê jî dikariyan wê biryarê nedin. Ango dikariyan wê biryara ku nirxên herî pîroz jî nikarin xwe bigihîninê bidin. Lê dan, ji ber neçar bûn girêdayî bimînin. Ev qanûnek şere. Wan canê xwe helandin heta dawî şerê xwe meşandin. Ma cengaweriyek ji vê mezintirîn heye? Ger emê di PKK’ê de behsa xeta şer bikin, nexwe emê şêwaza wan esas bigirin. Mazlûm, Kemal û Xeyrî derfeta berxwedanê bi darikek kibrîtê dafirînin û agirê Newrozê pîroz dikin. Lê belê derfetên we yên şer bi qasî çiyan hene. Di destê wan de jî tenê laşê wan heye û wê dihelînin. Çeka wan ew laşe. Êdî laşê xwe bikar tînin û dihelînin. Xeta şerê PKK’ê eve.

Wan li zindanê, yek hûcrê de li ber xwe dan û ser xistin. Niha jî hinek dibêjin; “Tiştek zêde bê kirin nîne.” Ma we çiqas şer kir, we kîjan çek rast û li gorî quralên wê bikar anî heta ku ser nexist? Hûn behsa xetimandina çi û encam negirtina çi dikin? Nexasim piştî ku em hatine vê rojê, kî çi dibeje bila bêje, ji bo serkeftinê em ji her demê zêdetir xwedî derfetên zêde ne. Ev ji her hêlê ve wisa ye. Dinya alem vê dibêje û ev dibe biryara cîhanê. Tam jî di vê qonaxê de nêzîkbûna; “Em ji taqet ketin, ji armanc dûr ketin, xetimîn, ti siûda me ya serkeftinê nîne”, bênamûsiya herî mezine. Li dîroka PKK’ê binêrin, li dîroka şer binêrin. Qet tiştên wisa hene? Kêmek maye hûnê min jî radest bigirin. Li ser bingeha şaşiyên we yên wêrankar an jî tasfiyekariya xwe, gelo niha dor hatiye têkbirina min? Qet di vê mijarê de nebêjin; “ Min eleqedar nake.” Ev xalên em vedibêjin tev, pêşî ji bo endamên li qada şer dimînin derbasdarin. Her kesê ku mafê xeta leşkerî nadiyê berpirsê vê ye. Ti eleqeya vê bi niyeta baş re nîne. Eleqeya vê bi hostatî û pêkanîna peywiran re heye. Ma we ev pêk anî, yan na?

Hemû derfetên me weke ku mafên wane, dixin bin serdestiya xwe. Jixwe harbûna wan a herî mezin –ez ji vê re nabêjim şaşiye jî-, weke ku raye desteser kirine bikaranîna rêxistinê ye. Ya rastî xweziya desteser

kiriban û heqê wê jî bidana. Qet nebê bila ji bo xwe bikar bînin, lê bi radestkirina dijmin re çarçûr nekiriban. Heta bila li hemberî min jî bikar baniyan! Yek ji van nakin, ew bi xwe jî di navê de her tiştî weke wê dergeha silaleyê tine dikin. Ev çîroka tinekirinê, ya kesayeta tinebûyî ye. Lihevkirin jî li ser bingeha tinebûnê pêş dikeve. Kî ji silala xwe çi fêr bûye tê, wê jî di nav artêşê de dirijîne. Ti eleqeya wî ne bi leşkertî, ne teorî, ne jî amadekariyên pratîkî re çênabe. Xerîzeyên wan hene, tenê ji bo wan têr bikin, şerkertiya ku ji bavê xwe fêr bûye pêşî bi kuştina hevalê xwe re pêk tîne. Hinek rik û hêrs ji silala xwe fêr bûye, pêşî wan li derdora xwe dirijîne. Xerizeyên wî hene, terbiye nedîtiye, wan jî pêşî li dijî me vediguherîne îsyanê. Şêwazek jiyana ne diyare çiye heye, li qada peywirê ya herî dijwar, heta li cihê şer bêku şerim bike, dixwaze wê bijî.

Li padîşah û paşayên Osmaniyan binêrin, hûn li ber wan sifirin. Di nav Osmaniyan de ger fermandarê kelhê heta dawî diparêze di şer de bin bikeve, pêşî serê xwe dirêj dike. Piranî berdêla binkeftinan serê xwe dayîne û pir dijwar jî şer dikin. Vêca li yên me binêrin: Niha ji bo fermande mînakekê nabînim. Her cure reftarên kêrî nayên di bin navê; "Karê Kurde" de weke fermandarî ferz dikin. We ev şaşiya mezin kir. Niha hûnê vê çareser bikin. Ger hûn dixwazin berdewam bikin, hûnê min qane bikin ku we ev derbas kiriye. Hûn neçarin min qane bikin ku, li hember hinek rastiyên bingehîn rêzdarin. Naxwazim ji van lîstokên we re bibim amûr. Ev ferzkariyên we ji bilî binkeftinê rê ji tiştek din re venake. Ezê çima ji van ferzkariyên we re serî bitewînim?

Kes şerek wisa ji we naxwaze. Hûn bi xwe dibêjin; "Ez nikarim devjêberdim, fêr bûme." Tu kiyî û fêrî çi bûyî? Barzanî jî xwe wisa ferz nake. Sîxurê di nava me de jî, xwe wisa ferz nake, wisa zerarê nade. Vêca hûn bi navê çi wisa zerarê didin? Ma fermandariya wisa dibe? Ev sih salin van hewldanan berdewam dikim. Min xwe parçe kir, lê hêjî xwe bes nabînim. Mixabin tevî wî tiştek nekiriye, li ser hêza amade xwe fermandar dibîne. Li derdora xwe jiyanek vale birêxistin kiriye, keç û xortên partiyê yên herî hêja di xizmeta xwe de dide bazdan. Ji ber şervan jî me û nirxên mezin ên PKK'ê nas nakin, ev kesayetên fermandeya sexte pejirandine.

Pir bi êşe, lê ev kesayet lîstokek mezin bi destê xwe amade dikin û dilîzin. Vêca dixeyîdin jî. Kî dixeyîde û kî dilê xwe digire? Vaye vêca di lîstokê de bi vî şêweyî derdikevin pêşberî me. Rewşa dilê xwe girtin,

xeyîdin, bê eleqeyî, hem tawanbar hem jî bihêzbûyî tê jiyîn. Tengavkirin nîne, bila jiyana we ya we be. Lê bihêlin, ez dixwazim bi çend mirovên me yên bawer kirine re hinek tiştan bikim. Hûn çima min ji vê dûr dixin? Ez dixwazim di vê rêyê de bimeşim û hewldanên xwe bi hewldanên din re hevgihînim. Çima vê asteng dikin, çima vale derdixin?

Ev nirxên berxwedaniya mezin ên PKK'ê rastî ne. Berxwedêrên mezin ên PKK'ê, hemû şehîdên wê wisa têkoşiyan û cengaweriya ku ez jî fêm dikim eve. Di vê rewşê de emê bi we re kudera xeta leşkerî nîqaş bikin? Bi van rewşên we ava kirine ve, we destûr neda ti taktîkî saxlem bigirim dest. Hûn firsendê nadin li ser planek şer hûrûkûr bihizirim. Ji ber ferzkariyên we astengiyên mezin saz dikin. Beriya girtin û xistina dijmin, hûn li pêş min astengin. Mînak nirxa çekê çiye, dîroka wê çawa ye? Bidestxistin û afirandina mirovek me ya biryara şer dayî çawa çêdibe? Kesên dibêjin ji xeta leşkerî re amade me, dê pêşî fêrî van bibin û weke navê xwe jiber bikin. Xwe gihandina komekê ya ber bi qadên şer û baregehên girîng ve tê çi wateyê? Hûnê li dîroka vê binêrin. Di hemûyan de hewldanên bêhempa hene, hûnê van weke navê xwe jiber bikin û encaman derbixin. Ji bo hûn heta roja îro werin van mirovên mezin çi kirin, bi van hewldanên mezin ve çi hatin afirandin? Vêca hûn îro xwe dispêrin kî û weke encama kîjan kedan û berxwedaniyên bêhempa li ser van çiyayên azadiyê ne?

Ez tenê PKK'ê venabêjim. Her wiha beriya PKK'ê heye. Ji bilî me bi hezaran şoreşger hene, heta di dîroka me de jî mirovên ku berxwedaniyek mezin raber kirîn hene. Ew jî neyekser weke gavek me yên jêrin, emê wan jî esas bigirin. Dîroka şer, lêkolînkirina van tevane. Dîroka şer ji xwe re weke bingeh bigirin dest û pêk bînin. Ez hêjî li ser fermandarek Roma ya beriya hezarî salî çawa xisleta leşkerî bidest xistiye bi xiroşek mezin her hevokê weke daqurtînim dixwînim. Ji xwe re dibêjim çi xisletek bêhempa ye, ev kar çawan kirine û kelecana min zêde dibe. Mixabin hûn îro quralek leşkerî ya jiyanî jî bê eleqe nêz dibin. Ma leşker wisa dibe? Leşkerbûna jiyanê xiroşê dide min, lê hûn ji vê direvin. Ev çil salin raveya jiyana me ya şênber, derfeta leşkerî ye. Lê hûn wê dehf didin û tînin rewşa ku kêr neyê. Lê ya rastî ger dê ya herî zêde xiroşê bide û eserê herî mezin mirov be, her tişta me jî eve.

Lîstoka niha tê lîstin, ne esasgirtina leşkerbûnê ye, berovajî di şêweya valederxistinê de ye. Me sih hezar mirov li vê qadê, li cihê qet nabe pêş xist. Camêr jihevketî tê, ez şerê baweriyê dimeşînim. Hejare,

em têr dikin. Nexweşe, em tedawî dikin. Bê derfete, em heta dawî biçek dikin. Bê qeza û bela pir rehet digihînin cihê ku lê şer bike û bijî. Lê dinêrim, ev jî dibe pirsgirêk. Vêca, em mirovên çawa ne? Bihizirin, em van xebatan çawa bi xiroşek mezin û hewldanek bêhempa ve dikin, lê hûn acizin ku xwe jî binirxînin. Ma ez neçarim ji bo we wisa kar bikim? Na. Em ji bo armanc kar dikin, ji bo şeref û serbilindiya me tevan kar dikin. Armanc û serbilindiya we jî eve. Dibe ku hewldanên min kêm dimînin, hûnê zêdetir hem jî hîn zêdetir bikin.

Ez van hewldanên xwe jî kêm dibînim. Firsendek bi qasî serê derziyê dinirxînim. Hûn jî dibînin ji bo em dijmin bigirin û rojek din temenê we dirêj bikin çawa nefes bi nefesê me. Ma hûn jixweber dijîn? Ji mezinên xwe û bavên xwe bipirsin, ji hemû kesên îsyan kirîn bipirsin, wan nekariye heftiyekê jî li ser piyan bimînin. Ma hûn van karan çawa dibînin? Hûnê ji hêla pergalê ve tawana herî mezin bijîn û tevî vê jî bihizirin ku asayî dijîn. Na, wisa nabe. Li vir jî we dana jiyîn, hewldanek bêhempa dixwaze. Ji ber we serî li hember pergalê rakiriye, hûn tev li ber darvekirinê ne. Gelek mirovên li ber darvekirinê, serkêşên eşqiya hene. Biçin ji wan bipirsin, yek hefteyê xwe veşartina wan jî karek mezine.

Em bi salane ne tenê we bi tenduristî diparêzin, bi her cure perwerde û pêdiviyan xurt dikin. Bes hûn vê jî bêwate dikin. Li gorî we ev jî hewldanên jixweber û sivikin. Vê nekin. Mirov xirab dibe, ma evqasî xirab dibe? Ev jî dibe helwesta ku hûn her tiştî asayî dikin û ji nirxa wê dixin. Ma ev kesayet qet dikare di hunera leşkerî de rol bilîze? Ger hûn hemû nirxên şer wisa jêrde bigirin dest, hûnê tiştekê ji mijarên artêşbûn, çalekî û taktîk fêm nekin û her tim zerarê bidin. Gelo hûnê dev ji vê pratîka sexte û vê şêwaza hemû dîroka şerê me davêje aliyekê berdin? Gelo hûnê rexnedana vê ya jidil bikin? Ma hûnê bikarin li gorî pîvanên vê yên rasteqîn biryara rasteqîn bidin? Gelo hûn bi xwe re hewldana vê ya hewce dibînin? Pirsên ku pêwîste hûn pêşî bibersivînin evin. Ne hûn, ne jî ez, em hevdu tengav nekin.

### Bi Şêwaza Têkoşîna PKK'ê Meşîn
### Karê Milîtanê PKK'ê Ya Yekane Ye

Li hember jiyana we rêzdarim û nirx didim jiyana we. Lê parastina jiyana we jî ancex wisa dibe. Hûn bi hovane tên qetilkirin, cesedên we

tên parçekirin. Ev rewşek metirsîdare. Ancex sedema vê dîsa jî hûnin. Divê mirov wisa erzan xwe nedê dest. Ma hûn min nabînin? Ma ez xwe erzan didim dest? Çima erzan xwe nadim dest? Vaye dîroka şerekî jî eve, dersa şerê mezin jî eve. Rêbertî di şerê xwe yê li dijî dijmin de çawa ye, nêzîkbûna xwe ya ji gel û nirxan re çawa ye? Ger hûn van fêr bibin, hûnê bibin cengawerên bêhempa.

Hemû cengawerên leheng û şehîdên PKK'ê li pêşberî min sekinîne, ji min dipirsin; "Gelo şer bi qasî me xwe tevlî kirî dimeşe yan na?" Ez neçarim bersiva wan bidim. Ew mirovên baweriyê bûn. Nikarim li hemberî wan durûtiyê bikim. Her çendî zehmetiyê bijîm jî, neçarim bersiva rast bidim. Li cihekê sêsed gêrîla hene, li cihekê pênc sed gêrîla hene, bes dîsa jî ev şeş mehin pêşketinek nîne. Hûnê vê çawa rave bikin? Heta ku ev rewş neyê çareserkirin û ev neyê ravekirin, hûn nikarin pirsgirêkên leşkerî jî lêkolîn bikin. Ev di heman demê de hûnin. Ji ber di bin fermandariya we yan jî pêvajoya şervantiya we de ev rewş hatin jiyîn û we ev pejirandin. Kesê ev pejirandî di leşkeriyê de qediyaye. Hûnê vê qedîna xwe çawa derbas bikin? Kesê ku ev ast pejirandî her çendî fermandar jî be, şervanek ji rêzê jî be bi rastî jî qediyaye.

Niha li vir xebatek ji rêzê dimeşînim. Vê xebata min bi hewldanên xwe ve muqayese bikin. Gelo ti eleqeya vê bi ya we re heye? Ez li gorî rêjeya kombûna we zêdetir kar dikim. Lê gelo min ti carî negot westiyam, xetimîm, nikarim? Hêza hûn li ser kar dikin an taximek an jî yekîneyeke. Bihizirin, hûn bi mehan nikarin pêdiviya vê hêzê ya leşkerî û dilxweşiyê pêşwazî bikin. Hûn nikarin li çiyê hêza serûber bi çeper bikin. Hûn nikarin çend taktîkên bingehîn rast û dîsîplîn pêk bînin. Vêca hûn di vî halî de çawa xwe dipejirînin? Piraniya we wisa ye û navê fermandariyê jî hêjayî xwe dibînin.

Ma Xeyrî jî heman tişt negot? Ya rastî me tiştek neda Xeyrî. Lê wî li hember armancên me yên pîroz girêdana xwe diyar kir. Dîsa jî got; "Ez tawanbarim, ji ber deyndarim, li ser kevirê gora min wisa binivisînin." Zêde sucê wî jî nebû. Tenê di hinek karan de têrbûna hewce dikir raber nekiribû. Ji ber bi gelemperî karên xwe baş dikir. Pêwendiyên wî yên bi gel û rêhevalên wî re pir baş bûn. Ez baş dizanim, tempoya wî giran bû û ji ber giran dima dijmin ew girt. Em bêjin nekarî xwe ji girtinê rizgar bike. Ev jî ne suce. Ji bo mercên wê demê ev hinekê jî neçarî bû. Lê tevî vê jî xwe efû nekir. Bes hûn bizanebûn şaşiyan dikin û nebesiyê raber

dikin.

Nexwe ketina nav pirsgirêk û çareseriya xeta leşkerî, bi bersivdana van pirsên ku ez zêde ji we dikim pêk tê. Êdî di vê mijarê de ji we kamilbûnekê dixwazim. Dixwazim ji bo we bêjim hevalek hêja ye, dê erkan rast bigire dest û berdêla wê canê wan jî be pêk bînin. Êdî kesê ku bêje; "Min nekarî ked bidim, çûm û min xwe jiyan kir" bênamûsê herî mezin îlan dikim. Fermandarek bi şeref wisa naxive. We dît hûn nikarin bikin, wê demê efûya xwe bixwazin. Dema ez jî di asta giştî de nûnertiya vî miletî dikim, rojane her tim dafirînim. Ez jî mirovekim, lê rojekê jî nabêjim hêza min a nûnertiyê kême yan jî serkeftina wê nîne. Heta roja îro hemû rewşa min a nûnertiyê dijmin jî şaşwaz dike. Her tişta dikim li holê ye. Ma her kes nabêje; "Ev tiştên tên kirin mûcîzeyî ne." Ya hûn dikin karek ji rêzê ye. Mixabin hûn karek wisa ji rêzê jî tînin asta ku neyê nasîn.

Ma ti nirxa vê nêzîkbûnê ya leşkerî heye? Kesê ku vê hêjayî xwe dibîne, her tişt di destpêkê de winda nekiriye? Leşkertî di cîhanê de karê herî cidî ye. Vêca li serbazên Komara Tirk ên hûn her roj bi wan re şer dikin binêrin: Bûlent Orakoxlu derket, di rojên dawî de xwestiye di derbarê wan de hinek zanyarî kom bike, yekser qiyamet rakirin. Gotin; "Çawa heqaret li me kiriye, ma bawerî bi me nîne?" Ev zilam dan girtin. Bihizirin: Gelo yek sucê ku we li hemberî nirxên me yên leşkerî nekirî maye? Heta sucek ku we bincil nekirî maye? Vaye artêşa Tirk, ji ber vê artêşa Tirke. Ev jî diyar dike ku ev artêş ne mafdare, ji hêla dîrokî ve jî li hember gelê xwe, gelan û mirovahiyê zêde ti nirxa wê nîne. Lê ev binyata kesayetî, wan evqasî xurt li ser piyan digire.

Abc'ya kesayeta leşkerî, kesayeta xwe naxapîne û dizane ya rast pêk bînê ye. Ji ber vê kesayetê canê xwe feda kiriye. Ew duristbûna girêdayî rêgezekê û fermanekê jiyînê raber dike. Gelo di kesayeta we ya leşkerî de yek fermana ku we binpê nekirî maye? Yek qusura ku we bi zanebûn nekirî û helwestên we li dijî hev raber nekirîn maye gelo? Lewra hûn nikarin artêşbûnê pêk bînin û kesayetek we ya leşkerî û serfiraz pêş nakeve. Hûn di nav şerek dijwar de ne. Lê mixabin dijminê xwe nas nakin û li dijî wî jî şer nakin. Emê vê şaşiyê ji holê rakin. Ger şeref û serfiraziya we heye, hûnê soza pêkana vê bidin û di pratîka xwe de jî bidin bawerkirin.

Hûn mirovên bejî ne û bi we re tiştek bi navê wijdan nemaye. Dibe ku hûn bêjin dijmin wisa kiriye. Ancex tevî vê, di nêvenga PKK'ê de ez

hizirîm hûn tiştên erênî bidest bixin. Piştî evqas danehevên nirxên mezin, her tişta ku ji bo van hewce, min got hatiye afirandin. Lê belê li bilançoya ku her roj tê binêrin. Ji ber şaşiyekê panzdeh heval şehîd dikevin. Xwe bi xwe anîne vê rewşê. Ev ne xeta mine. Ma ti carî min wisa şer kiriye? Gelo min dawiya xwe wisa amade kiriye? Hûn bi wêrekî û her cure derfetên ji me digirin ve rê dikevin, lê belê weke ku beramberî we qet dijmin nîne nêz dibin. Paşê jî her serê gavê dikevin. Ev dînîtî ye. Ma ti carî wisa bi ser têkoşînê de çûme? Ancex niha her kes wisa dimeşe. Hûn dibêjin; "Em natirsin, ger hatina dijmin heye, tişta ku bibîne jî heye." Çi eleqeya vê bi xeta me ya şer û hunera me ya şer re heye?

Li pêş we pirsgirêkên wisa bi qasî çiyan hene. Bes hûn li herêmekê nayîn cem hev û van lêkolîn nakin, nikarin civînekê jî lidar bixin. Civînên tên kirin jî, civînên bêzariyê ne. Ne ji bo ji pirsgirêkan re çareseriyê bibînin, li ser bingeha takekesîkirinê civînên kûrkirina wane. Hûn li biryargeha me ya navendî dinêrin, bi baldariyek mezin yek civîn jî lidar nexistine. Dê şerek girîng destpê bike, mixabin ji bo vê amadekariyek ji rêzê jî nîne. Ezê çawa ji kesê ku şaşiyên em ji vir de dibînin, lê ew nabînê re bêjim fermandare?

Li cihekê nêzî hezar kesî gêrîla û hema bêje çil-pêncî fermandar hene. Lê belê ev şeş mehin yek serkeftinek hêja saz nekirine. De werin, vê çareser bikin. Ma hûn ne rêhevalên girêdayî soza xwe ne? Ma dê qet sozek we ya egîdî nebe? Ma hûnê di vî halî de erk bigirin? Gelo hûnê jî biçin bibin şirîkê vê sucê? Kesê ku axaftinên min fêm dike, dibêje; "Ez mirovê erka pratîkî me, erk digirim", bi hezar gêrîlayî ve, qet nebê dikare di pratîka xwe de yek-du şerî bimeşîne. Dê bi vî şerî windahiyên mezin bi dijmin bide û jor heta jêr fermandariya hezar gêrîlayî jî birêxistin bike.

Ger fermandarek bixwaze dikare kemîn dane û êrîş bike, dijmin parçe bike, dê şev û roj rêbazên cuda biceribîne û wisa gelek karan bike. Wê teqez çalekiyek pir xurt derbixe holê. Ji ber fermandar afirînere. Dema pênc-deh windahiyan dide, ger ji aliyê dijmin jî çend sed windahî dabin kirin, ev windahî zêde mirov na êşîne. Hûn dibêjin; "Me çalekî kir. Lê dijmin ferq kir û em ketin kemînê. Çalekî veguherî pevçûnê, em paşve vekişiyan, lewra çalekî pêk nehat." Ma hûn her roj agahiyên wisa nabihîsin? Ma ji sedî notê çalekiyên we ne wisa ne? Çima? Ji ber baldariya fermandar nîne, fermandarek serwer nîne. Tenê gotiye;

"Biçin, bikin, ewqas." Dibêjin; "Birîndarên me hebûn, me jî dev jê berda." Birîndar û şehîd dayîn, ma ji bo desteserkirina hedefê ye, yan jî ji bo paşve vekişandin û dev ji çalekiyê berdanê ye? Her roj van bilêv dikin. Ya rastî bi van rewşan diyar dikin ku karê wan kêleka xeta fermandariyê re jî derbas nabin. Her wiha van şaşiyên dikin jî, bêşerim ji me re radigihînin.

Tê gotin; "Evqas rêveberî û mirovê fermande hene." Lê di asta herî jêr de jî bi perwerdeya yekîneyan ve mijûl nabin. Vêca evqas fermandar li wir çi dikin? Ev fermandarên çi ne? Divê hûn van dahûrînin. Ma wijdana we vê dipejirîne? Ger hûnê li hember van bêçare bimînin, ji van re bibin amûr, neçin wir. Dê heyfa we be.

Dibe ku her kes nikare bibe leşker an jî egîd. Ger hûn erêkirina fermandariyê dixwazin, hûnê heta dawî mert, fêhma û kedkar bin. Dîroka hemû şeran lêkolîn bikin, hûnê bibînin fermandarên wisa nebes tine ne. Ger emê bibin artêş, hûnê têrkar bibin çareseriya van pirsgirêkan. Hûn nikarin bêjin; "Ji bavê me wisa fêrî me kirine, ezê jî hunera bavê xwe berdewam bikim. Karê Kurd wisa ye, nikare bibe artêş." Na, hunera bav suce. Hunera bav, bûna leşkerê dijmin û xayînê xwe ye. Hûn nikarin vê li ser min ferz bikin. Min ala şer a mezin hilda wisa li dijî vê derketim. Hûn dibêjin; "Em nabin mirov, lê dikarin bibin leşkerek dijmin ê baş. Em nikarin artêşbûna xwe baş saz bikin, lê dikarin bibin piyonek baş." Ezê çawa bi vê bawer bikim? Van nêzîkbûnên we çawa bipejirînim? Dema li cem we behsa fermande tê kirin, yekser hûn diçin weke axayek gund rûdinin û ferasete bi qasî dikare bijî bi we re heye. Pêwîste hûn van tevan bibînin. Ji ber di vir de sucê we tevan heye.

We siûda leşkertiya mezin xirab bikar anî. Xirab nêzî wan çekên pîroz bûn. Ew hunera leşkerî ya pir zirav anî rewşek nenas. Vaye niha jî ez hewl didim vê sererast bikim. Karê herî rehet hûn dikarin bikin, we bike mirov, zikê we têr bike û tiştên we winda kirine cardin bide bidestxistin, heta karê yekane hûn bipejirînin ji wî karê leşkertiya şêwaza gêrîla fêmkirin bû. Karê herî bi xêrê hûn bikin eve. Jixwe xeyalên we yên cuda hûn bikin jî tine ne. Hûn çima xwe rast nas nakin? Ger ez şaşim, qet netirsin vê nîqaş bikin. Diyar bikin ez çima têrê nakim û di vê mijarê de biryarê bigirin. Ger rastiya xalên ku destnîşan dikim zêdetirin, nexwe divê hûn pêdiviyên vê pêk bînin. Lê ya herî xirab hûn dikin, ya xwe kirine. Her tiştî bikin, lê vê nekin. Ango bi hunera leşkerî

nelîzin.

Ez nabêjim di bin fermandariya min de, bi hemaltî xizmetê ji min re bikin. Ger hûn dixwazin hinekê wate bidin û bi min re bimeşin, divê em xizmetê ji hevdu re bikin. Ev kar ancex wisa dibin. Me teoriya herî zirav, helwest û reftarên herî hevaltî anîn ber lingê we. Ancex we bersiva van neda. Me ji bo hemû hewesên we derfet dan. Me ji dildarî û hêviyên we yên herî xweşik û hûn ti carî nekarin bi tena serê xwe bidest bixin re çare dît. Ancex we bersiva vê wisa li ser me ferz kir. Ma we çalekiyek baş pêş xist û rêxistinek pêk anî? Ma we perwerdeyek baş da? Tenê hûn xwedî pratîkek tijî şaşî ne. Lê ez ji bo bersiva hemû bendewariyên gel bidim, her cure pêdivî û derfetê saz dikim. Ji pirsgirêkên herî giran ên di serê we de derbas dibin re jî, ma di wextê de û bi kûranî bersivê nabînim? Ma keyfa we xweş nakim? Ji sedî heştiyê vî welatî birçî ye. Ma em hemû xwarin û vexwarina we pêk nayînin? Ma hûn dihizirin ev hemû jixweber tên pêşwazîkirin? Gelo ji bilî vir her der ne di nav girî û nalînê de ye? Ma keyfa herî saxlem, ne li cihê ez lê me? Gelo cihê herî zêde mirov serbilind, ne cihê ez lê me? Ev hemû xizmetin û van jî bi kedê didim.

Hûn bi hemû nexweşiyên xwe ve tên nêvenga me. We çiqas şaşî kiribin, çiqas di halek kelogirî de bin wisa tên. Ma qey min qet pêşberî we gotiye min evqas kar kir, westiyam, ji taqet ketim, êdî nikarim, bihêlin hinekê reheta xwe binêrim? Berovajî vê, ji her kesê tê nêvenga me re ji ya tê xwestin deh qatî zêdetir hêz didim. Ji ber em mirovê soza xwe ne û dizanin çi dikin. Ji ber tola me, biryara me ya têkoşînê, amadekariyên me û sebra me heye. Bi rastî jî em her karê xwe hûrgulî dipîvin. Çil caran radikin-dipîvin wisa gav davêjin. Kes nikare ji me re bêje; “Te nekarî bikî, tu nikarî ji bin vî karî derbikevî.”

Her kes tê min dibîne, tiştên em dikin bêhempa dibînin û rêz digirin. Ma wisa ne baştire? Jixwe ev ne ezim. Ev nirxên berxwedana mezin ên PKK’ê ne, şehîdên wê ne. Weke kes ez xizmetkarek wan ê rêzê me. Ne xwe, nirxan didim axaftin. Heta ger hinek aliyên we yên erênî hebin, wan jî didim axaftin. Ger wisa nekim, ma hûn dikarin bi vî rengî li ser piyan bimînin? Girêdayî ezmûnên min ên mezin, êdî dixwazim meşên şaş û tirsnak rawestînim. Em dixwazin cengaweriya hêjayî lehengiya mezin a PKK’ê hem pêş bixin, hem bi encam bikin, hem jî bi serkeftî bimeşînin. Sedema em evqasî bi ser we de jî tên eve û ev di heman demê de ji bo we çareya yekane ye. Ji ber hûn pir di tengaviyê de ne.

Hûn pir sozan didin, lê wate nadin vê sozê. Piştî vê qonaxê em yeqîn nakin dê şaşî û nebesî evqasî xwe ferz bikin û serî jê re bê tewandin. Hêza we têra tiştekê jî neke, dê kesayeta we ya cengawer xirab nebe, kes nekare we ber bi mirina erzan ve bişîne û kes nikare şaşiyan bi we bide pêkan. Dema hêza we têra we jî nekir, yek çare dimîne, ew jî xwe bidin aliyekê. Evqasî bûna xwedî çareseriyek zelal, ev peywireke li benda me, hem jî li hember evqas êş û neheqiyên dîrokî weke bersiva me ya yegane li pêş me ye. Tişta min li ser piyan digire jî eve. Ev rastî bi xwe ye. Ya dimîne ziravî ne.

Ya dimîne çiye? Ma emê nekarin kemînekê pêş bixin, fêlbaziya êrîşekê jî bikin? Ev lîstoka zarokane. Piştî em gihan vê kûraniya feraset û me ev hestên berpirsyarî parve kirin, ger hûn bixwazin dikarin bibin rûvî, şêr, gur û bazen çiyan jî. Çawa hewce be hûnê bibin ew. Dê bi kîjan devî darbe lê bê dayîn, hûnê bi wî devî lê bidin. Êdî dê ev jixweber pêş bikeve. Piştî ku we feraset û xet pêk anî, dê taktîk jî weke lîstokên zarokan biherikin. Hûnê di heman kêliyê de têbigihin û dest bi pêkanê bikin. Piştî ku feraseta erk ev be û xwe jî bigihînin kesayetek ku wisa tevdigere, ya dimîne ziravî ne yan jî weke tenê rûpel zivirandin û xwendinê ye. Bi şopandina pêşketinên rojane ve şer tê fêmkirin, hem jî rasteqîn tê fêmkirin.

Ez jî wisa dikim. Piştî ku ev ferasetên bingehîn bi min re hatin rûniştandin, rojane vê têkoşînê wisa dimeşînim. Dev ji şaşiyên çors berdin, di radeyek ku mirov bêje bê qusure de, bêku alîkariya ti kesî hebe min ev têkoşîn heta roja îro meşand. Her wiha tevî zehmetiyên we li ser me ferz kirîn, van karan dimeşînim. Çawa dimeşînim? Vaye efsûna vê jî xwe dispêre vê feraseta bingehîn û hestên berpirsyarî. Piştî ku wate ji amadekariyên pratîkî re hat dayîn û sebra vê jî hat raberkirin, çi kar derbikeve pêşberî min bila be ezê bikim. Jixwe piştî van pêşketinan, wê kar jixweber bimeşe û dimeşe jî.

Ez vî gelî çawa areste dikim? Bi giranî girêdayî esasên xeta partiya me ve em xeta xwe ya leşkerî dimeşînin. Di mijara bi nêzîkbûna girêdana feraseta rast û nirxên bingehîn ve divê çawa bê meşandin de serbend jî min dane. Pêwîste hûn li gorî vê xwe amade û bibiryar bikin. Ji ber mirovê leşker, mirovê dîsîplînê ye. Kesê ku dizane di heman kêliyê de şaşiya xwe rast bike. Dîsa kêmasiyên xwe ne bi mehan, kesê ku di demek pir kin de dizane derbas bike ye. Ji bilî vê dema hûn bi ser erkan de çûn, ji bo pêdiviya we bi çi heye zelal bikin û rewşê binirxînin

dê pêwîstiya we bi çend rojan hebe. Jixwe derfeta vê jî zêde heye. Ya dimîne heta ku hûn henase digirin tê wateya; “Kar dimeşê.” Piştî ku we pala xwe da hêza çareseriya bilind a PKK’ê, ma ew pirsgirêkên hêsan çine? Dê hemû pirsgirêkên bên jiyîn, bibin karên ku hûn bi zewqek mezin dikin û rehetî jî çareser bikin.

Îro mirovê cîhanê yê herî dilxweş, mirovê PKK’ê ye. Miletê herî dilxweş miletê Kurde. Di şêwaza şerê xwe de meşîn, karê yekane yê vî mirovî ye. Ev karê wî ya yekane û rêya jiyanê ya yekane ye. Li gorî vê dijwar girêdayî pêdiviyên wê ye û ti hêza dijmin jî nikare beramberî vê cengaweriyê li ber xwe bide. Ez hinekê di nav rastiya vê de me û weke dibînin jî ser dixim. Vê eşkere dibêjim. Ger hûn vê fedekarî û wêrekiya xwe bi şêwaza cengaweriya min re bihevgihînin, yeqîn dikim hûnê ji min zêdetir serkeftî bin.

**17 Tîrmeh 1997**

## BÛNA XWEDÎ FERASETEK XURT TÊ WATEYA DI JIYANÊ DE BIDESTXISTINA ÎDÎA YÊ

Rastiya we ya hûrûkûr tê jiyîn, asta we ya biryara şoreşgerî, lêhûrbûn û pêkhatinê pir tevlîheve û rastiyeke ku aliyên xeternak dihewîne. Heta ji vê rizgarbûn çênebe, ne hûnê bikarin xwe bigihînin jiyana azad ne jî bikarin her tişta ku dijmin ji destê we derxistî ji nû ve bidestxistinê de serkeftî bin. Hemû tiştên me winda kirine li hember rastiya ku em weke dijmin pênase dikin bi şer şerkirinê ji nû ve bidestxistinê de nêzîkbûnên tevlîhev û şaş, cewhera pirsgirêkan destnîşan dike. Heta helwest û reftarên di vê mijarê de hêz didin dijmin, ji jêr heta jor di her astê de xwe ferz dikin.

Bi zanebûn an jî nezantî, her cure reftarên ku xwe li ser aliyên paşketî ferzkirin, xerizeyên xwe jiyîn, bi hevre hevriktî û ferbûnan ava dike di nav me de zêde bûne, nêvengê tengav, şêlo û jehir dikin. Elbet ji ber vê rewşa we, hewldanên me yên şer jî dibe ji dijmin zêdetir ji we darbe dixwin û lewaz dibin. Ev jî me ber bi dahûrînek kûrtir ve dibe. Dema em hewl didin vê şanî we bikin, xala ku em fêmkirinê de zehmetiyê dijîn, ji aliyê we ve li şûna xwe gihandina hêza biryara mezin û ya girîngtir jî sazkirina têgihiştina girîngiya mezin a pratîkbûnê, hûn dev ji xwe diberdin û weke berê jî çêbûyî zemîna ku bi temamî serweriya dijmin a li ser we bilind dibe ye. Çi di ferqê de bin, çi jî na, rê ji bandora van kêmasiyan re vekirin, hêz dana vê û bûna zemîn, yekser şêwaza wê dana axaftin ji bo me heta dawî tirsnake û fêmkirina wê zehmete.

Kî hûn anîne vî halî? Dixwazim vê fêm bikim. Xisletên kesayeta di bin bandora dijmin de teşe girtî, bandorên derdorên civaka pir paşketî yên mezinkirinê û ji rê derdixe, bê perwerdehiya zêde, dibe ku rê ji vê rewşa we re vekiribe. Me jî ev çareser kirin. Lê ger kêmekê eleqeya we li hember jiyanê hebe, ger hinekê dixwazin ji têgehên weke şanazî û serfiraziyê fêm bikin, di çarçoveya guncav û bê pejirandin de xwe dana jiyîn çima ji bo we zore û evqasî çewt nêzî vê dibin? Ma hûn zewq ji kirêtiyê digirin? Ma binkeftina şêwaza pratîkî xweşa we diçe? İsrara di helwest û reftarên ku bi zanebûn we ber bi binkeftinê ve dibin û heta rê ji imhaya we re vedikin de tê çi wateyê? Di berdewamkirina vê de çi

berjewendiya we heye? Tişta fêm nakim, ger ev berjewendiya we bûya, dê me gotiba li pey wê ne. Ancex ew jî nîne. Me derxist holê ku, tişta hûn dikin bi zanebûn xwe tinekirin, bêwate kirin û ber bi tinebûnê ve birine.

Elbet di vê xalê de tişta yekser tê hişê mirov, xisleta kesayeta we ya li hember dijmin tine dibe ye. Kesê ji mêj ve li hember dijmin têk çûyî, her roj têkçûnê bi nefsa xwe dayî pejirandin, dev ji milîtanî, leşker û gêrîla berdin, dê her tim dijmin bide axaftin. Vaye em jî vê xeteriyê dibînin. Derbaskirina vê jî niha ji bo me mijûlbûna herî zehmete. Dibe ku hûn ne di ferqa vê rewşa xwe de bin, lê pratîka we li holê ye. Rexne û rexnedanên we bi hemû rastiya xwe ve derxist holê ku, rewşa we zêde ne başe.

Em di temenê xwe yê herî biçûk de bi ser van aliyên xwe de çûn. Wexta behsa nebesiya teorîk hat kirin, yek-du peyvên amade jî nebûn. Ancex me bi rikek mezin weke ku pirtûkxaneya mirovatiyê piç piç ji hev bikin, ji bo xwe nirxand. Bi hêviyek mezin jî nêzî hinek bermahiyên me girtî bûn. Ji hêla pratîkî ve jî bi salan ji bo peydakirina çend quruş pere, têra çend quruşî xwarin û cil û berg, hewldanên pir mezin hatin xerckirin. Niha di vê mijarê de bi qasî derya derfet hene. Lê belê bi were nêzîkbûnek ku hêjî wateya van nizane, bêrêz nêz dibe û çarçûrkirin bûye şêwazek. Ji bîr nekin, kesê nezane xweşik baxive, pratîka wan jî ya xweşik çênabe. Lê em peyvên herî xweşik û hevokên herî xweşik amade didin we û ev jî we aciz dike. Em dixwazin bi we nasname û kesayetek birûmet bidin bidestxistin. Ancex hûn li ser vê jî xwe ferz dikin. Heta bi hinekan re tam kesayetek kontra û tawanê xwe dide der. Hêz, çek û rayeya me girtiye, bi vî halî şerim nake xwe li ser hemû partiyê ferz dike. Hinek evqasî har bûne. Vêca hûnê vê çawa rave bikin, heta kur bibin? Behsa mafên kesî dikin, ancex weke tê zanîn li hemberî dijmin ne tiştekin. Ger bikarin hinekê li dijmin bidin dîsa tişt nabe. Eşkere ye, partiya ku dijmin bi hemû hêza xwe ya seferber kirî ve nekarî têk bibe, dixwazin bi vê kesayetê belav bikin.

De werin vêca vê rave bikin. Esasên kargeriyê û rêyên pêşketinê dixetimîne, paşê jî dibêjin; "Ev mafê min ê kesî ye, ezê wisa bijîm." Hema her roj tê dîtin, em ji asta herî jor bigirin heta jêr, vê kesayetê xwe pir berfireh kiriye. Negengaze ku mirov li hember vê rewşê îsyanê neke. Ev kesayet çawa xwe diparêzin? Ev pir eşkere ye, ji bo rizgarkirina jiyanekê, heta rizgarkirina kesekê jî, divê hinek esasên rêxistinê li ser

piyan bimînin. Ger derfet, qenal û pêwendiyên rêxistinê nebin, nikarin li çiyê du rojan jî li ber xwe bidin. Bes vê jî tênagihin, rêxistina ku wan li ser piyan jî digire nas nakin. Hûn dibêjin ger hûn rêxistina xwe nas nekin, dê temenê we ya bi qasî rojekê tenê bimîne. Lê ew naxwazin rojê jî bizanin. Hêjî dibêjin; "Mafek min heye, xwedî şêwazek jiyanê me." Elbet di vê xalê de jî dîsa xisletên kesayeta me ya civakî ku paşverû ye gur dibe. Bi temamî weke belayek xwe avêtî naverastê ev xislet tev pejirandin, heta ev li ser derdora xwe ferzkirin tê çi wateyê? Hûn biryara vê bidin.

Neku ji ber ez dixwazim an jî we tengav dikim, ji ber feraseta we û beramber jiyanê rêzdariya we pêş ketiye divê hûn xwe veguherînin. Ma hêjî wijdana we şiyar nebûye? Ma hêza we jî nîne hûn bi vîna xwe di pîvanên guncav de bersivê bidin van pirsgirêkan? Ger ev hêza we nîne, nexwe hûn çima bi navê milîtan an jî rêveber pêşberî me disekinin? Carina bi ser dergehên malbatî, van darezên nirxên civakî yên kevin de diçim. Bes ev jî we xilas nake. Bûna xwedî ferasetek bihêz, tê wateya bidestxistina îdîaya di jiyanê de. Di rastiyan de israrkirin, tê wateya zêdekirina siûda jiyanê. Nexasim xwe birêxistinkirin û li ser esasên rêxistinbûnê serwerbûn, dikare we bi qasî hêza we têra şerekê xurt bike. Hûnê hemû bala xwe bidin ser van xalan. Hûn xwe di ferzkirinê de israr dikin. Belengazê doh, hinekê firsenda xwe jiyînê dibîne, paşê jî sînor nas nake. Me di kesayeta hinek fermandarên xwe yên binavûdeng de ev dahûrand. Camêr ji rêxistina ku hebûna wî saz dike jî natirse ku tine bike. Ev kesayet di rewşa ketina nexweşxaneyê de ne. Her tiştê xwe ji partiyê û keda me digirin, lê ji ti pêdiviya têkoşînê re jî nabin bersiv. Hêjî ev kesên sosret di nav me de hene û bibandorin. Ger hêza we heye, di van mijaran de misoger xwedî helwest bin.

Êdî ev ne karê perwerdeyê ye, ancex tevî ne hewce me dîsa jî li ser van mijaran radiwestim. Ger hûn hinekê dixwazin rêzdar bin, pêdiviya we heye ku pratîka jiyanek ku teqez divê hûn xwe bigihînînê pêk bînin. Ev nebe, kes we cidî nagire. Ez jî weke berpirsê vî karî yê siyasî û leşkerî we qet cidî nagirim. Hûn dibêjin; "Hêza me nîne." Lê nabe ku mirov xwe di mijarên rastiyên bingehîn de wisa belengaz bihêle. Ya rastî li vir lîstokek heye û ez jî dixwazim wê lîstokê xirab bikim. Armanca van dahûrînên dawî jî zelalkirina vê ye. Kîne vê lîstokê dilîzin? Me hinek kes derxistin holê. Her roj vê destnîşan dikim.

Berê dizên milk an jî korsan hebûn û ev dizê giyanan bûn. Dizên

siyasetê, dizên leşkerî jî kesayetên casus bûn û casûstî dikirin. Ev kesayetên dijwar bûn. Niha jî, dixwazim wesfa diz û casûsê di nav me de fêm bikim. Jixwe çeka van a herî mezin pir şêlo û ji zelaliyê dûrin. Nabêjim kesayetên sexte jî, kesayetên ku mirov nayîne hişê xwe ne. Berê ji kesên wisa re dihat gotin tu lîstokan dikî yan jî bi rûpoşê digerî. Ev kesayet ji vê rewşê jî wêdetir xwedî seknek wisa ne, lîstok û rûpoşên kevnar li ber wan ne tişteke. Di mijara rastiyên rêxistinê yên herî bingehîn de bi qasî şervanek dijmin ê derûniya taybet jî nekare areste bike û vale derbixe de, şêwazekî ferz dikin. Hem jî li çavên me dinêrin vê dikin. Tişta herî xirab jî, di nav we de kesên ku ji van kiryaran re nebin amûr tine ne.

Lewra qet keyfa min ji sekin û jiyana we re nayê. Asta we ya lêpirsîna jiyanê pir lewaze. Di vê asta hûn hêjayî xwe dibînin de hûnê li hember çi rêzdar bin? Gelo dê li hember gelê we feydeyek we ya herî biçûk hebe? Qaşo nirxên hûn pê ve girêdayî hene. Di vê wateyê de di mijara van de hûn ne tiştekin. Ger ev rewşa we bê pejirandin, tişta ku ji destê we bê devjêberdane. Nexwe em jî ji bo we rêyek din bibînin. Ma kesayeta leşkerî û siyasî qet wisa dibe? Peywirên we yên fermandeyî hene, lê hûn li ser van nasekinin. Heta li ser sekinandinê danin aliyekê, hûn nava wê vale dikin. Hem jî li çavên me dinêrin û tevî hemû hewldanên me vê dikin. Heta ji wê jî wêdetir, hûn dibêjin; “Bêhna min teng dibe, ez belav bûme. Bihêle her tiştî biqedînim.” Vêca ev helwest ji kur derket? Hûn bi navê kî wisa daxivin? Ma li pey vê şeref û serfirazî heye? Elbet nîne.

Dibêjin ku, çil salan xatirê fincanek qehwe heye. Hûn dixwin-vedixwin, lê bi qasî mêvanekê jî nikarin rêzdar bin. Wate jî nadin ti şerî. Vêca ev tê çi wateyê, hûn bi navê kî wisa dikin? Li vir bi temamî kesayetek nayê fêmkirin heye. Em bêjin sîxurtiya dijmine, hûnê wê jî piştî demek din derbixin holê, dê rastiya mukir bê û bêje; “Min xwe veşart, xwest karên we wisa vale derbixim.” Wexta em bi ser yên di nava me de diçin û dibêjin; “Tu çima wisa yî?” Nikarin du gotinan baxivin. Lê li ser tiştên ku bi qasî quruşekê jî nirxê wan neyî û mirov nekare bêje berjewendiyek hêsane jî weke zimandirêjan daxivin. Ji bo bermahiya jiyanek sexte ya ku wan sînordar eleqedar dike, rê ji mirina dehan rêhevalan re vedikin. Dikarin ji bo vê rasterast fermanê jî bidin. Lê deh salan jî li ser tenduristî û pêşketina wan bijîn, dikarin tiştekî nekin.

Tevî evqas pişgiriya em didin, emê vê kesayeta ku naveguhere çawa pênase bikin? Vêca ma em neçarin evqas pişgiriyê bidin? Armancên her kesî yên netewî û civakî yên bingehîn hene. Heta ger hûn dixwazin weke kes jî bijîn, hûn dikarin bi yekbûna hinekan re jî vê saz bikin. Wê tu li gorî gotinê min bî, ez jî hinekê girêdayî armancên te bijîm, di encamê de hevdu bimeşînin. Ev quralek hêsan a jiyanê ye. Civak destpêkê li ser vî bingehî ava bûn. Mirovê ku bi tena xwe nikare yek kevirî rake, ji yeke din re dibêje; "Were em bi hev re rakin" û wî kevirî radikin an jî dibêjin em bi hev re neçîrê bikin. Paşê jî pêkve sûd ji encamên vê werdigirin. Lê hûn, nikarin esasên damezirîna civaka paşketî jî pêk bînin. Berovajî yek nêzîkbûna we heye, ew jî belavkirine.

Vêca dê ev kesayet vê rewşê çawa rave bikin? Heta ku vê rave nekin, dê bibin kedkarên çi yan jî li pey çine? Dibe ku ji bo we hêsan be, lê hûn bi quralên civakî yên herî bingehîn ve dilîzin. Ji yekbûna avabûna destpêkê ya mirovên destpêkê hêz çêdibe. Lewra hûn rêgeza civakbûnê jî serûbin dikin. Weke sedem jî dibêjin; "Serê min tevlîheve, ne li gorî hesabê mine, bi hêrsim, di bûhranê de me." Ya rast çiye, ya li gorî hesabên we çiye? Dibêjim ku bersiva van pirsan bidin, lê hûn wê jî nakin. Ev bêçaretî ye. Elbet piraniya we jî bi esasgirtina kesayeta ku di bin bandora dijmin a giran de perçiqî û têk çûyî raber dike.

Çavkaniya çalekgerî û hêrsa min a herî mezin ev bû: Em ji xebatek aborî ya hêsan bigirin heta xebatek fikrî, min digot, dikariya ev kar hîn zêdetir serkeftî bin. Bi nêrîna ev şêwaz şaşe, me di her karî de hewldanek mezin kir. Niha jî lê dinêrim, hûn li hember vê xebata me ya ku dîrokî ye, hêjî bêquraliyên mirovên destpêkê jî nekin dijîn û weke zemîna ji helwestên koletî pêşkêş dikin. Li kesên îtîrafkar û xayîn binêrin: Ew bi qasî dijmin jî nexwaze xwe didin ber xizmeta wî. Dijmin ti carî nabêje; "Were, wisa cerdevaniyê bike, xayîntiyê bike." Lê ew di vê mijarê de bi hev re pêşbaziyê dikin. Şêweyek din a vê rewşê jî niha hûn bi vî rengî didin der. Şûna ku hûn ji vê rewşa rû dide re bersivek mezin bidin, nêzîkbûnek; "Em jî vî ji hêz bixin" raber dikin. Hûn bi helwest û reftarên ku raber dikin ve vê disepînin. Ev lîstokek pir mezine. Bêku di ferqê de bin, hûn xwediyên xwe didin axaftin. Mirovê ku nekare xwe biparêze, ji hêla objektîf ve begê xwe diparêze. Jixwe diyare begê we jî kiye.

Dibe ku hûn ne weke ez dixwazime, lê hûn nikarin ferzkirina xwe jî bi min bidin erêkirin. Ev pir vekiriye, qet nebê beramberî we parastinê

dikim. Çawa li hember dijmin parastinê dikim, niha beramber şêwaza we jî parastinê dikim. Ev parastinek bi şêweya ezê nebim noker, berpirsyariya we negirim û ji kiryarên we re nebim amûre. Vaye vê jî pir eşkere dikim. Xwe sipartina min ve ne xwe, ne jî min tengav nekin. Gelo hûn dizanin, hûn bi navê me çi dikin? Li vir xalek pir girîng nîqaş dikim: Yan di rêya şeref û serfiraziya mirovê azad de hûnê bibin xwedî biryar û asta pratîkî bê girtin, an jî dê tiştek neyê jiyîn. Têkoşîn li ser vî bingehî ye. Emê xwe di nav çarçove û sînorek teqez de bicîh bikin.

Ger pirsgirêkên we hene amade me ku kêlî bi kêlî guhdar bikim û her tiştê we parve bikim. Lê di vê mijarê de jî dijderketinek heye. Hûn dibêjin; "Dev ji me berde, bila em weke xwe bimînin." De başe hûn çi dixwazin? Tişta dixwazin eşkere bêjin, dê wê demê bê dîtin ev ji bilî kirêtiyê ne tiştek dine. Hinek ji we li derdor bi navê min behsa şeref û serbilindiyê dike. Ger vê rexne dikim, divê hûn rûnin û bihizirin. Çawa ez bi navê we karên wisa erzan nakim, pêwîste hûn jî nekin. Ti wateya pesindana bêhêzî û kirêtiyê nîne. Hewce nake hûn vê bincil jî bikin. Tiştekê nade serxistin.

Weke din li hember rastiya me bêrêziyek mezin heye. Em mirovê wisa ne, me zanî ji sînorên mirinê jî serkeftî derbas bikin. Hem di îdîa û hem jî di pêkana wê de em xwedî hebûn û hewldanek mezinin. Niha jî hûn êrîşî vê dikin. Li gorî we ev ne girîngin. Li gorî we hûn girîngin. Na, ji asta binkeftinên we yên her rojî diyar dibe ku hûn ne girîngin. Kesayeta ku her roj bin dikeve, di mijara hebûnê de cidî nayê girtin. Bersiva ku ez didim watedayîna xwe yan jî navê Rêbertiya ku hêjayî min tê dîtin, hebûna xwe eşkere bilêvkirin û pêkanîna wê ye. Şêwaza min a xwe pejirandinê eve û vê jî pir eşkere, bi selmînên wê ve, di destpêkê de jî bi navê gel dikim. Di vê manê de di navbera teşe û şêwaza hebûna xwe danîna holê û ya we de çi cewazî heye?

Ger hinek tiştên hûn li vir bikin baş bin, hûnê bi azweriyek mezin bi ser erkên xwe de biçin û hebûnê jî hêjayî xwe bibînin. An jî ger ji bo we xeterin û ne li gorî we ne, wê demê hûnê dûr bisekinin. Nexwe rastiya ew parsektiya di civakê de em behsê dikin çibe, sekna we jî ya li hember şoreşgertiyê dişibe wê. Hûn ne şoreşger, parsek an jî dizin. Weke din ev ji bo min pir bê wate ye: Ma kesayet evqasî bê qudret dibe, çima xwe evqasî erzan xerc dike, çima binkeftina hêsan hêjayî xwe dibîne û çima di ya pir eşkere kirêt de ye israr dike? Çima di xala tê de binkeftî de israr dike? Hûn di vê xalê de di nav israrek mezin de ne. Çima? Ev çi bi we dide

serxistin? Çi wateya pesindana kirêtiyê, parastina bêxîretî, bê eleqeyî û kurtasî her tişta di asta ketîbûnê de heye? Hûnê bi vê çi ser bixin? Niha hûnê bêjin; “Ev sekna me ne bê bingehe, ma civaka me jî ne wisa ye? Li cihê em lê mezin bûyîn û pêş ketin her tim wisa bû. Wisa ji me re gotin. Her ku li ber guhê me gotin, em jî wisa fêr bûn.” Bes niha civaka we, rastiya cîhanê ya herî trajîk û qet hesabê wê nayê kirin rave dike. Hûn xwe bi sipartina vê civakê ve dikarin kîjan îdîayê bikin? Ango ger agahiya we ji abc’ya şoreşgerî heye, hûn nikarin xwe bispêrin binyatek civaka wisa. Ger bi we re tenê abc’ya şoreşgerî jî hebe, divê hûn tam di rewşa îsyanê de bin.

Elbet dê niha hewce bike em li ser koletiyê dahûrînên nû pêş bixin. Ya rastî me ev hinekê nirxand, lê dîsa jî pêdivî bi raveyek berfireh û ziravî heye. Dema hinekê tê şopan ev tê fêmkirin. Her kes dibêje; “Îxaneta bi me re naşibe îxanetek asayî, koletiya heyî naşibe koletiya asayî, jiyana heyî naşibe ti jiyanî.” Her kes dibêje ku tiştên ecêb hene. Elbet me ev ronî kirin. Ya rast karê me ev hîn zêdetir bi ziraviyan ve ronîkirin bû. Lê hûn jî qadro, pêşengin û pêwîst bû ya hewce dikir ji mêj ve fêm kiriba. Tam jî di vê xalê de hûn ji sempatîzanekê û heta civakê zêdetir di rewşa belayê de ne. Tevî ku milet, civak û sempatizan gihane qonaxek baş, ezê nebêjim tam oportonîzm, weke min jor hewl dayî rave bikim, rewşek hîn cudatir dijî.

Hûnê qet rastiya evder meydana cengê ye û em ji bo şer daketine naverastê sivik nekin. Kesayet û nasnameya we çi dibe bila be, evder meydanek cengê ya hêja ye û hûnê rastiya amadekariya vê astê xirab nekin. Eşkere bêjim, me bi tika û minet bangî yek ji we nekir werin vê meydanê. Lê qetiyen vê sekna ku ne diyare ji bo şer, serfirazî, mezinbûn, sîxurtî û ketîbûnê hatiye napejirînim. Emê çi ji mirovê ku nikare wate bide astek gotinek asayî, di mijara pratîkek asayî de jî ne xwedî vîn bikin? Ev sekna we ji bo me û mirovatiyê weke heqarete. Dibe ku hinekê keyfa we ji vê re bê, bes ji bo min sosretek divê yekser bê perçiqandine.

Ger hûn bi jiyanê bawer dikin, teqez pêwîste xwe biselmînin. Eşkere bêjim, dibe ku hûn min saf bibînin, bes tê dîtin ez jî hinekê şiyarim û wisa hêsan jî dev ji vî karî bernadim. Mêrxasbûn, xwîngerimbûn, mafê li ser nirxên pîroz lîstinê nade we. Berovajî, dibe ku îxtiyar nekarin hêza beşdarbûnê raber bikin, lê baldariya zarokan jî ji ya we hêjatir û berztirîne. Heta di reftarên mirovên me yên bi temen de jî dikarim bêjim

qet bêhna min teng nabe. Kesayeta sosret piranî bi we re dibînim û hûn wê jî bi navê min dikin. Ji ber min rê ji van karan re vekir. Ger min rê venekiribûya, evqas jî nediketin pey we. Nakevim pey Barzanî, burjuvaya biçûk û peşmergeyan. Min ji mêj ve dev ji wan berdaye. Dem bi dem dest li kar û jiyana wan jî didim. Lê ji sedî not û pêncê wextê min hûn dibin. Ev hinekêjî dişibe vê: Êdî hûn vê jî di çarçoveya terbiya xwe de asayî dibînin.

Hûn dibêjin; "Qet nebê em ketine nav baxçeyek ku hinekê namûsa me xilas dike. Her çendî mezinê me li me jî bide, dujîna jî bike, keramet û fazilete." Lê ev rewşek xefletê ye. Dibe ku we namûs xilas kiribe, lê di şer de hûn li hember dijminê me ne tiştekin. We di vî karî de, di radeyek pir sînordar de xwe qane kiriye. Di mijara têkbirina dijmin de ti fikra we nîne. Hêza we ya li ser piyan mayînê jî nîne. Gelo di nav we de yên dibêjin; "Ez hêsan namirim" hene? Di nav we de kî heye xwe du rojan de neke qurban, bi rastî jî weke xwediyê serkeftinê bi vîn, plansazî û perspektîfê ve tevdigere û xwedî şêwaza xwe bi her tiştê wê ve selmandî heye? Çima hûn xwe di navbera axaftinan de vedişêrin? Kî ji we bi enerjiya serkeftinê ya xilas nabe ve dagirtî ye?

Me halê rêveberiyên herî ji xwe razî jî dît. Wan reftarên herî ketî raber kirin. Têrê nakin û belengazin. Firsendek ji wan re bê dayîn, ji bilî sivikbûnên xwe bijîn tiştek din nakin. Di bin fermandariya gelek ji we de, di mijara karên ji rêzê de jî pir zelal diyar bû wate dide çi. Vêca hûnê li welat, li dijî dijminê mezin çi bikin? Divê hûn di mijara nebesiyên xwe de li xwe mukir bên û teqez bibin xwediyê yek-du peyvên rêzdar. Ez xapandin an jî xwe xapandin ne mêrxasî ye. Erzan ji nav vî karî derketin jî, paşatiyê nade mirov.

Heta ku mirov bi wijdana xwe ve mijûl nebe, ew hêza we ya ji xwe bipirse dikare bibe xwediyê kîjan hewldana mezin heye. Elbet wexta van tevan li ser we ferz dikim, rewşa ku beramberî xwe dibînim ecêbe. Bi qasî dixwazî li ser koleyan ferz bike, bi qasî dikarî mirovên bûye dîwar an jî hişkbûyî re baxive, hûn hewayek zêde tiştek nayê guhertin didin der. Hûn dibêjin; "Axayê min tu çi dibêjî, vaye emê biçin bimirin." Ma ji nav we yê herî baş ji bilî vê tiştek din bilêv dike? Vêca ev egîdî ye? Li ser vî bingehî pêwendî bi min re pêşxistin, ma bi serê xwe ne karesate? Ma ez kesek weke we me? Bi hemû hewldanên xwe ve çime û çawa me? Divê hûn van tevan fêm bikin. Cewhera têkoşînê eve. Di hemû pêvajoyan de yek ji we encamek bingehîn ji van dernaxe.

Rêbertî çavkaniya hêzê ye. Hişmendiya; “Em sûd jê werbigirin û pey wî jî xwe bidin jiyîn” ne raste. Ma ev pêkane? Ev di kîjan pirtûkê de heye? Di dîroka kîjan rêxistinê, dîroka kîjan şerî û dîroka kîjan dewletî de hişmendiyên mîna vê hene? We xwe bi xwe ev çêkirine, lê êdî dev ji vê berdin. Ji bo bûna xwedî kesayetek watedar, ev şertin.

### Yên Mafê Wan Heyî Hêza Wan Yên Hêza Wan Heyî Sipartekên Wan Hene

Ji bo em rastiya Kurdê heyî veguherînin rêketin. Ya hûn jî dixwazin biselmînin berovajî vê ye. Hûn dixwazin ji îdîaya dijmin a bi şêweya; “Kurd ji tiştekî fêm nake, tiştekî nizane” re bibin delîlek. Hemû tiştên hûn diparêzin evin. Ev pir xetere û ne raste. Ya rastî ev rastiyên dijminin. Nexwe, ji bo derbaskirina vê rewşa we, divê hûn pir bihizirin û çareyek pratîkî peyda bikin.

Ez hêjî cengawerekim û min dev ji vê bernedaye. Kesên weke we li derdora min tije dibin, ger hûn min xwedî gotina yekemîn dipejirînin, di mijara pîvan û quralan de ezê rista xwe bilîzim. Lê ger hûn nekarin pratîkbûnek ji rêzê ya ku deh qatî li paş şêwaza min a pratîkî dimîne jî pêş bixin, bi we re hevaltiya lîstokek hêsan jî nayê kirin. Jixwe bi salane berovajî vê raberkirinê de pêşbaziyek heye. Elbet ev dikare bi hinek xisletên civakê ve jî bên ravekirin. Hûn min xwediyê gotina yekemîn dibînin, lê pêkanên berovajî min jî disepînin. Ev jî dide diyarkirin ku hûn ne duristin. Hemû kesên komploger, xayîn û piştê ve xençer dikin her tim wisa derdikevin holê, di vê zemînê, îdîa û şêwazî de teşe digirin. Ger dev ji karên we kirîn berdim, dê ber bi komplo ve biçin. Jixwe civak bi mînakên vê dagirtî ne.

Bal bidinê, bi şêwazek dilxwazî, xwestekek mezin û raberkirina her cure eleqe ve me mêrxas an jî keçên ciwan girtin cem xwe. Emê her cure derfetan pêşkêş bikin û pêş bixin. Her roj ji mêrxasên me dipirsim; “Ma bavê te jî wisa li te dinêre?” Dibêje; “Na, Rêbertê min.” Dipirsim; “Ma li nêvenga malbatê eleqeyek wisa û derfeta pêşketinek wisa hebû?” Dibêje; “Na. Li vir her tişt pir xweşike û pir baş pêş dikeve.” Ji keçan dipirsim; “Ma li mala bavê te, hevserê te evqas eleqe hebû?” Bersiva na dide. Ev hemû rojane hatin raberkirin. Ji bo pêşketinê hewldanek bêsînor tê dayîn. Ango ji bo mirovê xurt, mirovê rêzdar û hezkirî

derbikeve holê, hewldan kêlî bi kêlî wisa tên raberkirin, ravekirin û yekser dikevin meriyetê.

Vêca bersiva ji vê re tê dayîn çiye? Kêlî bi kêlî tiştên pir cuda tên raberkirin. Mînak serkêşên wan nîvê şeve, bi dizî ve, demjimêr du-sê diçin dîtina hev. Niha bihizirin: Ger ez padîşahek an jî otoriteyek navê wî yê fermî bûyam, dema li qestê yan jî biryargehê yek-du kes çûn dizîve têkîliyê pêş bixin, tişte destpêkê bê hişê mirov, elbet xisletek vir ya biryargehek mezin heye, xisletek vir a siyasî û leşkerî heye. Yekser ezê bêjim; “Ev entrika ye, ev komplo ye.” Ger di vî karî de xeteriyek wisa bê kirin, bi vî armancî tê kirin.

Deka em bêjin nasname û kesayetek wisa siyasî û rêxistinî yê me pêş neketiye, deka em bêjin qaşo di rewşek hestewar a dijwar de dijî. Rêyên wê jî yên pir asayî hene. Her roj wê jî didahûrînim. Rêya vî karî ya asayî diyare. Em her roj vê weke ders pêşkêşî we dikin. Ango pêşî em bibin siyasî û leşkerî, bila kesayetek we hebe, wê demê em hev hez bikin, bikarin wate bidin hev. Lê rêxistina wî nîne, kesayeta wî ya siyasî nîne, tam berovajî ye. Ya herî jî tine dihesibîne. Çiye, dilê wî hinek tiştan dixwaze. Hem jî li kur? Hemû jî peywirdarin. Mînakên weke vê li her cihî tên jiyîn. Ji bo mînak van digirim dest. Mînakên wisa hinek din nasnameya we dide dest. Ya rastî, eşkere bêjim kesayeta we zêde pêş neketiye.

Qaşo fermandarê me yê herî kevne, nizanim navê wî derketiye, dibêje; “Mafê min wisa ye.” Koleyekê digire kêleka xwe, naxwaze jê qût jî bibe. Em dipirsin ka peywir, ka şêwaza serkeftinê. Ew dibêje; “Na, kes nikare dest bi min bide.” Namûsa wî evqase. Qet hewce nabînim mînakên dîrokî jî bidim. Di mercên me yên civakî yên asayî de jî kesayetên wisa nînin. Tişta ku herî zêde bi çavsorî pê ve girêdayî ye, nizanim hevjîna wî, jin an jî dergistiya wî hebe jî, nîvê temenê xwe derve derbas dike. Bes ên di refên me de jî nikarin bibin xwedî helwestek yeksanî vê. Berovajî dixwin û vedixwin, tenê dibêjin; “Ez ketim.” Hemû evqase.

Elbet ev jî tam rewşek bûyera nexweşxaneyê ye. Hûnê bêjin bêhêziye, lê her tişt li holê ye. Ya rastî ev mirovên bihêzin, ger bixwazin dikarin pir xurt bin. Lê li pey vê bandorên çînayetî, bandorên siyasî û rêxistinî hene. Jixwe em tevan rave dikin, dikarin zêdetir jî bikin. Mînak bûyerên bi vî rengî bên romantîzekirin, wê serdestiyek çîna feodal a çar bi çar derbikeve holê. Dê êrîşa çînek beramber derbikeve. Ev bi hestên

xwe bilêv kirine. Lê ger firsendê jî bibîne –jixwe weke cinawiran kar dikin-, mînak dê yekser kom an jî saziya xwe ava bike. Hinek din çek zêde bin, tenê ji bo vê jiyana li gorî xwe dê êrîşekê sazûman bike, du-sê rêxistinan tine bike. Dîrok bi mînakên wisa ve dagirtiye. Vêca tevdîrên ku min girtîn hene. Ez ne kesek bê tevdîrim ku xwe bixim van rewşan. Em weke gurane. Kîjan mêrxas, kîjan keç dikare bi me bilîze? Ev nepêkane. Temenê me bi vê derbas bû. Misoger naxwazim we bixim rewşek pêkenok, lê mafê me jî heye ku em tevdîrên xwe bigirin.

Li cem me leşkerbûn ne karek hêsane. Li cem min ne evîn hêsane ne jî hêsan tê şerkirin. Ma ez jî ne wisa me? Hûn bi her tiştê xwe ve li cem me tên avakirin. Yên mafê wî heyî hêza wî çêdibe, yên hêza wî heyî sipartekên wî çêdibin. Sipartekên we jî tine ne. Ger em we ji vir derbixin, bi qasî nekarin bîst û çar demjimêran xwe bidin jiyîn belengazin. Ez jî bi vî halê xwe ve, li ser van axan mafek wisa bi xwe re nabînim. Ji ber dibe ku siberojê bi destê min bigirin bavêjin cihek din. Ezê çima bikevim rewşên nekarim li ber xwe bidim? Bihizirin, hûn mirovên ji rêzê ne, lê wê şêweya bûna xwediyê heq a hûn bi xwe re dibînin jî, ez bi xwe re nabînim. Ez tenê hewl didim hinek tişt rizgar bikim, ewqas.

Ya rastî rewşa heyî jî xwedî xisletek pêwîste mirov zêdetir eleqedar bibe. Îxanet, komplo, hizipti, nakokî û hevdu valederxistin jî wisa destpê dike. Ev di heman demê de çîrokek Kurde. Ancex me tevdîra van tevan girt û ji her hêlê ve sererast dikin. Ev hêza me jî heye. Derdor tev bi van ferasetan re lihev dike. Ger hûn bal bidinê, em ji rewşa hestiyar bigirin, heta rewşa rêxistinî, mirov dikare ji her hêlê ve reftarên şaş bibîne. Di nava me de rewşên bi vî rengî zêde hene. Jinek an jî zilamek belengaz, acize ku nasnameya xwe jî pênase bike, pir rehet dikare xwe ferz bike. Ya rastî xwe ferzkirin jî, bêçaretî ye. Mirovê ku di vê mijarê de yek-du gotinan dike, misoger divê pirsên; "Bi rastî jî hêza min çiye, feydeya min ji çi re heye?" Ji xwe bike. Weke tê zanîn mafê koleyan ji bo tiştekê nîne. Hêj we xwe bi serûber ji koletiyê rizgar nekiriye, hûn behsa kîjan mafî dikin?

Ez xwe wisa ne mirovek tam azad, mirovek nîv azad dibînim. Di vê rewşê de xwe weke yên me zilam jî nabînim, weke nîv zilamî dibînim. Berê min xwe çarîkê jî zilam ne didît, heta min xwe qet ne dixist dewsa mirovan jî. Ji ber ku zilamtî kirine bela serî. Asta derûnî û civaknasî ya zilamtî tam pirsgirêke. Niha jî pir tiştan dide fêrkirin. Madem hest, evin

û egîdiyên te yên wisa hene, nexwe tu çima xwe wisa dixî rewşên belengaz? Ev jî we dide dest. Ez jî di navê de kes nikare di nava rêxistinê de xwe wisa bide jiyîn. Em nikarin xwe ber bi hestên ku rêxistinê tine dihesibînin ve berdin.

Hûn jî vê pir baş dibînin ku, ger min xwe ber bi hestek wisa ve berdaba, ezê ji mêj ve bibûma koleyê dijmin. Ne tenê dibûm nokerê wî û di bin venêrîna wî de dimam, dê rihê min bitefiya û hestên min tine bibûna. Ezê bibûma kesek zêde bêxîret û xwe tine kirî. Jixwe kesayetên wisa ji bilî bûna amûrek wêrankirinê kirî tiştek din nayên. Weke mayînên serseri zerar didin derdora xwe. Li ber serê me gelek kesên wisa kar û barê wan tenê belavkirina rêxistinê hene. Ma ev hemû sîxurtên sûbjektîfin? Yeqîn nakim. Bes bi şêwaza xwe ya jiyanê ve ji sîxurekî xetertirin. Piştî demekê kesayetên wisa çavsor dibin an jî evîndar dibin. Di heman demê de çandek wisa girtine. Li gorî çand û feraseta pêwendiya Kurd mezin dibin û dibin cinawir. Tenê ji bo wê cinawirtiyê rizgar bike, astengiya herî mezin çibe êrîşî wê dike.

Di filmek li ser Sezar de, di derbarê Sezar de rêxistinkirina komployê bi hinek sedemên pir ecêb ve girê didin. Sezar wê demê, weke rihê cîhanê û xwedayê cîhanê bû. Elbet li Roma jî hêzek mezine. Roma, bi asîbûna xwe ve navenda împaratoriyek mezin û binavûdenge. Sezar jî ber bi împaratorbûnê ve diçe. Di vê kêliyê de yên komployê sazûman dikin jî kesên li qesra Sezar bûn. Yek ji wan jî xwarziyê Sezar kesek bi navê Brûtuse. Hestên kesayetên komplo kirîn a bingehîn bi şêweya; "Ev rih me teng dike" ye. Lê di rastiyê de yê Roma kirî Roma jî, Sezare. Paşê di wesiyeta xwe de hinek xalên destnîşan kirîn hene û her kes jî vê dizane. Cîhan bar kiriye Roma. Îdîayên hemû kesên ku komplo jî kirine, dê Roma çawa rizgar bikin. Mane serbilindiya hemû Roma girêdayî Sezar bû. Di cîhana wê demê de yê ku Roma dike Roma fethên Sezarin. Yê ku hemû zêr, xenîmetên hêja yên hemû cîhanê dibe Roma Sezar bi xwe ye. Şûna ku hezar carî ji vê re şikir bikin, kesên li qesrê di bin baskê Sezar de mezin bûyîn û kesên nûnerên civaka kevin ku ji wan re esîlzade tê gotin komploya tê zanîn sazûman dikin. Tişta ji destê esîlzadeyên Romaya berê yên digotin; "Em jî hêzekin" dihat jî, bi dizî ve sazkirina vê komployê bû.

Komplogerî weke fikrek wê demê wisa tê pêşxistin. Êdî piştî vê têkoşîna komplogeran û yên beramberî van şer dikin di nav de cîh digirin cîhan tarî, xirab dibe û her tişt têkilhev dibe. Paşê li ser Sezar jî nîqaş tên

kirin, li qesrê yan jî biryargehê şer rû didin û êdî Roma bi ser xwe ve nayê. Ew rojên şan û şemlên mezin bi dawî dibe. Romayiyan xwe di nav fitne-fesadiyê de dibînin û wêrîne ku vê bikin. Di encamê de Roma, her ku çûye şana xwe winda kiriye û paşê jixweber dihilweşe. Zemînek fesadiyê tê vekirin û êdî sedî salan wî dikemirîne.

Elbet rewşek me ya weke Roma û Sezar nîne. Ya em hewl didin tenê ceribandinek desthilatiya hêsane. Ceribandina hêzê ye. Em dixwazin vê pêş bixin. Lê pêkenokiyên hûn ava dikin, vê fitne-fesadiyê jî li peyxwe dihêle. Xweziya her yek ji we weke Brûtus bûya! Ew di heman demê de şerkerên mezin bûn. Lê ev bi we re nîne. Ango rewşa we ji komîktî jî wêdetir pêkenokî ye. Mirovê ku çav diberde desthilatî û dibêje; “Ez jî hêzekim”, qet nebê plansaziya xwe saxlem çêdike. Lê ez bi yek nêrînî we tevan digirim. Em li ser rêveberiyên me yên qadan radiwestin. Bi salane pir dûrin, lê tiştek ji destê wan naye. Hinekan bi komployên ku pêk anîn re rihê çend belengazan sitandine. Şerê yek-du qadan xirab û ziwa kirine. Komplogeriya wan jî evqase. Ji ber hêza wan têrê nake. Tişta dikin karên li vir valederxistine. Tişta ji destê wan jî tê, bi hewldanên vale vêderê ji bûna xwediyê pêşketinan dûrxistine. Ya rastî hinek din ji destê wan bê, mînak ger bi qasî Brûtus an jî komên komploger bin, dê xencer û şûrê xwe wisa lê bidin, hûnê bêjin ev tam endame.

Kesayetên van a wisa xurt nîne. Hêz danin aliyekê, tenê dikarin bibin fesadên sivik, kesên sivik ên vale derdixin. Elbet rewşa we jî pir belengazî ye, tenê dikarin kesên weke we bixapînin. Biryar û îdîayek we ya wisa ji bo tiştên mezin nîne. Ji bo we ya girîng rizgarkirina roja xwe ye, ger we roja xwe jî rizgar kiribe bijî ji we re! Bi vê şerê desthilatî nayê meşandin. Ger hûnê şerê desthilatî wisa bimeşînin, qet nekin baştire. Wisa komplogerî jî nayê kirin. Bêku şerim bikin ji bo nêvenga me dibêjin; “Me evder bê wate dît, em zêde pêdiviya xurtbûnê nabînin.” Ev hemû li hember jiyanê heqaret, bêrêzî ye. Xwe bi xwe tinekirin û xwe ji qeşmerekî kembaxtir kirine.

Elbet li benda vê ne: Ezê ji wan re Romayekê ava bikim, dê piştre jî ew Roma biparêzin û lê miqate bin! Qet nebê hinek parazvanên Roma yên cuda jî hebûn. Roma, ango welatê xwe, herêma xwe ya rizgarkirî hûn bi xwe bafirînin û wê demê jî tişta dixwazin beramberî min bikin. Ezê hemû welat rizgar bikim, hûnê hemû karên xwe jî bi min bidin kirin, tişta para we jî dikeve li ser vê komplo kirin û xwe ferzkirine! Ma

ev, zêde nabe xambûnek kûr? Fêlbaziya gundîtî jî ne wisa ye. Gundî jî piştî hinek hewldanan fêlbaziyê dikin. Ev rewşa we sosretiya we ya di polîtîkayê de destnîşan dike. Vêca hûn xwe pir aqilmend dibînin. Jixwe aliyê vê yê herî ecêb jî eve. Ti eleqeya vê ne bi aqil, ne jî gundîtiyê ve heye. Hûn weke komplogerek rojaneyî û pir paşketî, koleyek paşketî ne.

Elbet li hember pêşketinên ku ez nûnertiya wê dikim, ev ne tiştên başin. Li hember cengaweriya min xwedî li peywirên xwe nederketin, bêçare bûyîn û bi ser vê de gotina; “Em heq dixwazin” suce. Hemû pratîka heyî, we dide dest û hemû rastiya we derdikeve holê. Ger hûn dixwazin hinek tiştan bikin, qet nebê hinekê veşartî, hinekê bi plan bikin û hinekê jî şer bikin. Ji ber komploger jî bi gelemperî kesên ku şer dikine, ango kar dikine. Jêhatiyek we jî ya wisa nîne. Ev tê vê wateyê: Bigire, hêzê kom bike, ger tu dixwazî şer jî bikî, bila hêza te hêz û feraseta te jî feraet be. Lê belê rewşa hûn di navê de dijîn tam pêkenokî ye. Yeqîn dikim ger em van binivîsin, dê têra xwe bikenin. Lê dema carek din firsend dîtin, dê vê carê jî rê ji trajediye re vekin. Ev mijar evqasî tevlîhevin. Ji ber bi nirxên girîng dilîzin.

Hêjî di bîra min de ye: Dema ez karmendê tapu qadastro bûm, gundiyekê digot; “Ey begê min, em weke vî kerî ne.” Belê, li cihek nêz kerek guhê wî li erdê diket hebû. Çavên wî tije mêş dibûn, lê wî nedikariya guhê xwe jî bihejîne, qet ne diliviya û bêxîret bû. Ev axaftin ne li gorî me bû. Dîsa li derdora me kesek bi navê Mamo hebû, her tim li ber dîwarê mizgeftê rûdinişt. Wexta min hinek axaftin ji Mamo re kir, wî jî got; “Em weke vî depî ne, ma êdî dibe ku em şîn bên?” Dibe ku wê demê rewş wisa bû. Lê me ew dep pir şîn kir. Niha ew gundî jî pir başin. Ango ber bi hêviyê ve çûn.

Li ser me bi ferzkirinên bi vî rengî yan jî yekser bi vî şêwazî meşandina şer ve kes nagihe ti cihî. Hûn nikarin xwe ne bi mirina xwe, ne jî zindîbûna xwe ve ferz bikin. Emê egîdiyê bafirînin. Her çendî hûn berovajî vê ferz bikin jî, ezê di vê şêwaza xwe de israr bikim. Dayîkên we hûn çawa welidandi bin û çawa mezin kiribin bila be, ez hêjî di mijara jiyanê de bi îdîa me. Hûn dikarin her tiştî hêjayî xwe bibînin. Lê ez weke mirovek serfiraz, jiyanek bi cureyek din napejirînim. Ezê ji bo we jî asta jiyanek bê pejirandin bafirînim. Emê ji bo vê plan çêbikin.

Ger rewşa we ne saxlem be, biçin cihek din. Her kes nabe leşkerek saxlem. Qet xwe nexapînin. Jixwe min evqas xebat ji bo mirovên xwe nexapînin derbixin holê kir. Kes nikare li ser bingeha xapandinê we

bişîne mirinê yan jî kuştinê. Ger kesayetek we ya dilbiêş hebe, derbixin holê, em jî şev û roj li ser wê kar bikin û çareyekê bibînin. Hemû xebatên ku me heta niha kirîn, ji bo vekirina çavên mejî û çavên dile we bû. Yeqîn dikim enerjiya we ji ya min zêdetire, hûnê niyeta xwe ya bûna kesê cidî danin holê û fêm bikin em jî hêzekin. Bi nêzîkbûna; “Rêberê Mezin” ne mirov bi koranî bi ser mirinê de diçe, ne jî dibêje; “Hinekê jî emê xwe bijîn.” Na, ev herdu jî li dijî me heqaretin. Hûnê li ser bingeha derbaskirina hemû nebesiyên xwe bibin hêz. Ji bilî vê we napejirînim. Nexwe divê mirov we bişîne jîngeha dayîk û bavê we. Hewce bike ezê mirovên cuda ji nû ve bigirim dest û dibe ku feydeya wan ji bo me zêdetir be. Lê naxwazim kesayetên wisa xeter, nehatîn dahûrandin û tam neketiye rê bi xwe re bimeşînin. Her kes nabe egîd.

Mirovên PKK’ê yên herî leheng jî, li hember rastiya dijminê bêrehim jî ev gotine; “Her çendî me li gorî xwesteka we şer nekiribe, me belengaz jiyan nekir, jiyînek wisa jî ne pejirand!” Wan ev gotinên xwe pêk anîn. Xwe şewitandin, xwe kirin bomba, heta ku çerim û hestî man tawîz ji xwe nedan. Elbet ev mezinbûneke. Em nikarin PKK'ê cuda, nexasim weke hûn bi rêjeyek mezin dixwazin bidin jiyîn bigirin dest. Emê li vir dijmin bin bixin, em neçarin dijminê di hundurê xwe de bin bixin. Qet nebê hûnê di derbarê leşkertiya destpê de gavekê bavêjin. Hûn çima xwe di vê mijarê de li ser min ferz dikin? Mane ji bo hûn bibin leşker beşdarî refên me bûn? Ez ji we re dîroka PKK’ê vedibêjim. Ger hûn ji vê fêm nekin, rastiyê bi dahûrînan rasterast şanî we dikim.

Ma ji bo hûn erzan bijîn, her roj li pey min entrika bikin û her ku firsendê dibînin xwe wisa ber bi helwestên sivik ve berdin, beşdarî refên me bûne? Ma hûn ji bo hestên erzan hatine? Ma hûn ji bo reftar û kesayetên armancên wan nediyar, mirî û tine bûyî raber bikin hatine? Xalek din ku pir ecêb dimînim eve. Lê belê ev şaşiyeke û xwe xapandine. Komara Tirkiyê jî ev şaşiya herî mezin jiyan kiribû û niha jî di tengaviyê de ye. Her kes dibêje; “Komara Tirkiyê welatek di bûhranê de ye.” Me ew xistiye vê rewşê, ev pir zelale. Ew bi xwe vê dibêje. Belê, piştî ku me ew Komara Tirkiyê ya ku xwe sipartî wan kesayetên we yên biçûk û kena xwe bi me dikir, wisa hewl dida xwe rizgar bike jî xist vê rewşê, ma emê serî ji we re bitewînin?

Elbet van tevan ji bo vê vedibêjim: Em ji rêveberî bigirin heta kesên qaşo dê xizmetên herî hêsan bi navê peywir bikin dek û dolên pey min re kirîn binêrin. Pêwîste mirov hinekê bikare lêpirsîna van bike. Dibêjin

ku zehmetiyê dijîn. Vêca, derketina pêşberî gel, bi navê gelan soza ku dibêje; "Ezê şer bikim" hûn çi dihesibînin? Ma hûnê bi van nêzîkbûnên erzan tevkariyê ji asta netewî re bikin? Kesê ku soza wî neyî, şerefa wî neyî, ma tiştek wî ya bikare bide netew û gel heye? Kesên evqasî xwe dixapînin beramberî netewekî çi dikare bêje? Kesên evîn û hestên wan jî wisa di mijara hezkirinê de, dikarin çi bidin? Ma xêrek wî ji wî re çêdibe? Elbet na.

Egîdî baş têgihiştin, baş bihîstin û ger pêkane hinekê jî selmandine. Lê belê rewşên hûn dijîn, ji bilî komployek rezil wêdetir ne tiştek dine. Berovajî ger hûn şervanek niyet baş jî bin, hûn zêde kêrî wê jî nayên. Yek ji wan kêrî tiştekê nayê. Ez misoger ne li dijî me hûn şervanek baş bin. Li hember cengawerên mezin rêzdarim. Jixwe hemû kar û hewldanên me ji bo vê ne. Ne li dijî me hûn evîndarek mezin jî bin, lê quralên vê jî hene. Di vê mijarê de bila kesek me şaş fêm neke. Hûn dibêjin; "Mafên min hene." Ti kes ne li dijî mafên we ye. Ancex hûn bi vî rengî pêşketinên herî bi erdê re dikin yek. Bi van helwestên xwe ve hûn êrîşî mafên mirovan, mezinbûna hestên mirovan dikin. Hûn êrîşî curê mirovan dikin û wan kirêt dikin. Yê wan mezin, xweşik, watedar û jîndar dike emin. Divê xwe parastin û nîqaşkirin wisa be. Ango nêzîkbûna; "Ezê rêxistinê xirab bikim, belav bikim, serê min tevlîhev bû" ne şêwazek parastinê ye. Divê dev ji van helwestan bê berdan. Her wiha hûn nizanin xwe û hevdu lêpirsînin. Ev jî ne başin û we jî dixe rewşa pêkenokiyê.

Nexwe karê yekem hûn bikin, weke; "Ez çime û ji çi re bi feyde bim?" Ji xwe pirsin û di derheqê xwe de biryarek rast dayîne. Bes seknê we pir belengaze. Lê ez karê serxistina dîrokî şanî we dikim. Çima bala we li hember vê pêş nakeve? Ji jor heta jêr her kes bê eleqe ye. Bila hestên we yên mezin hebin. Hûn çima hestên hejar hêjayî xwe dibînin? Hestewariyên we yên herî biçûk jî sedî sed li ser bingeha îxaneta li welat, îxaneta li rêxistinê û îxaneta li cengaweriyê ye. Ezê çi ji vê evînê û hestê bikim? Ezê çi ji vê jinê û vî zilamî bikim? Ez ji bo nebim kesek wisa, min hezar carî xwe ji nû ve çêkir. Ji ber ti aliyê vê kesayeta we ya saxlem û feyde ji ti karî re bike nîne. Êdî divê di van mijaran tevan de ferasetek we pêş bikeve. Ev ne ku li we xirabî ye, rastiyek wate û nirx dayînê ye.

Kesayeta ecûc, êdî divê ji çarenûsiyê bê derxistin. Divê hûn weke egîdan derbikevin holê. Ji hewldana vê netirsin. Em şerê mirin û mayînê dimeşînin. Bê eleqeya beramberî vê tê çi wateyê? Jixwe, hûn ji şer

narevin. Ji her cure şerî re amade ne. Li ber çavan ji min zêdetir şerkerin, lê cewhera we vale ye. Di pratîkên we de tiştek bi navê serkeftinê nîne. Kesên xwe naxe meriyetê û nikare xwe rast plan bike hûne. Ev jî we xilas dike. Em jî dixwazin van pirsgirêkan çareser bikin. Van pirsgirêkên xwe çareser bikin ku, em wate bidin her cure pirsgirêkên şer û jiyanê û hêz bidin çareseriya wê. Hûn hêsan ber bi mirinê ve şandin ne egîdiye. Jixwe ez ne kesek wisa me. Em çawa tenezil dikin erzan bijîn? Xwe sipartina min ve ev fikirîn jî çiqas tiştek hejarî ye. Ev ne hêjayî me ye.

Tevî ku bi giştî biryara we ya beşdarbûna têkoşînê heye, di pratîkê de ji asta we ya pêkanînê guman û fikarên min hene. Li vir xizmeta ji dijmin re bigirin heta xirabkirina yekîneyan, helwest û reftarên we yên veşartî rê ji binkeftinê re vedikin hene. Ji bo diyar bikim ji derbaskirina vê rewşê wêdetir ti çareya me nîne vê parastina mezin dikim. Her çendî hûn hêjayî xwe nebînin jî, ji bo wate û rihê kesayetek mezin bi we bidim fêmkirin, hewce bike emê mejiyê we bikaranînê de israr bikin. Ji bilî vê ti çareya vî karî nîne. Nexwe dê hewce bike em têkoşîna navxweyî hîn zêdetir dijwar bikin.

Em nikarin di mijara jiyanê de weke heqaret bikin nêz bibin, nexasim qet nikarin bê eleqe bimînin. Hûnê jî van helwestan derbas bikin. Hûnê siberojê biçin hemû esasên taktîkî û hemû xisletên fermandeyî danin aliyekê, wê kesayeta xwe ya sivik gur bikin. Lê ti nirxa vê ya leşkerî û siyasî nîne, ti raveya vê ya rêxistinê nîne. Me şer pir kûr kiriye û teqez divê em ji aliyê xwe ve bi encam bikin. Ya herî girîng jî ev meylên we yên bi şêweya sivik, bêçare û bê eleqe bi erdê re kirina yeke. Divê em kesê bi navê gel, bi navê mirovatî diqîre û dibêje; "Ezê bimeşînim" derbixin holê. Ji nav we çend kesên wisa derbikevin, bi wê jî razî me. Derxistina van kesayetan jî peywira me ye.

Hûn jî ji bo vê beşdarî refên me bûn. Ma em jî di vê mijarê de qet bi hêvî nebin? Ma dê ji nava we yek mirovê wisa dernekeve? Vêca, dayîkan hûn ji bo çi welidandin? We çima evqas zehmetî berçav girtin? Hûnê sibe biçin erzan bimirin. Vêca çima? Niha ev pirs girîngin. Divê bersiv jî ewqasî ne hêsan bin. Ger hûn di van helwestên xwe de israr bikin, di encamê de hûnê winda bikin. Ma ez bi soza xwe ve girêdayî nemam, ez kêm kar dikim? Yeqîn nakim mirovek din wisa fîzîka xwe di vî temenî de rehet bigire. Elbet hiş û rihê me jî li holê ye. Me ev jî nîşan da. Ev nayên înkarkirin.

## Ji Bo Me Jiyana Şoreşgerî Bi Qasî Zêr Hêjaye

Rastiyek gelê me ya wisa heye, weke di bûyera trêna aştiyê de jî hatî dîtin, dibêjin; "Em vê mirovatiyê fêm nakin. Van hukumetên we fêm nakin. Çima wisa dibe?" Li hember rastiyek milet a wisa, mirovek ku qet em ne bihîstin jî îsyan dike. Dibêje tiştek wisa nabe. Vêca em weke kesên bi hemû şaneyên xwe ve di nav vê rastiyê de, ji van kîjan encaman derbixin? Ez li rastiya miletê me ya heyî dinêrim û rika wî ya şerê deh salî derdixim. Weke kesên vê rastiya civakî hûrûkûr dijîn, vêca rika we li kur ma û hêrsa we li kur ma? Ma ew nebin şer dibe? Neçare teqez ji bo gelê we xeyalek we hebe. Mixabin ji bo vê jî eleqeyek we nîne. Eleqeya we beramberî hev jî nîne. Tenê hûn hevdu vale derdixin. Ma ji vê xetertir dibe? Vaye îxaneta kêliyê û kesayeta evîndarî wisa ye. Hûn çawa dikarin li hember vê rewşê wisa pêdeng bimînin?

Ger hêjî hûn her tim bêjin; "Em di nav bêçaretî û bê eleqeyê de ne", xwe bixin bin erdê, lê wisa nemînin. Ji ber êdî wisa jiyîn şerme. Ger hûn di van helwestên xwe de israr bikin, ezê navên xirabtir hêjayî we bibînim. Elbet ezê li hember van helwestên we jî parastina xwe zêdetir pêş bixim. Ev hêza min heye. Ez wisa hêsan têkçûnê napejirînim. Negengaze pêşberî we hilweşim. Ger hûn cengaweriya me hêsan bigirin dest, emê jî mezin bilîzin. Jixwe qet hewce nake em xwe wisa jî bidin diyarkirin. Ji ber kar dimeşin. Ger ji bo serkeftinê vebijêrkek din hebûya, me tenezilî we jî nedikir. Her tim çep û rastê we kendalin, heyberî û giyanweriya we tine ye. Di vê rewşê de rêya herî rast eve.

Ji hêla zanistî ve jî hatiye selmandin, karek we ya din ku hûn xwe pê mijûl bikin nîne. Her aliyê welatê me xirbe ye, heta ji sedî notê gelê me bêkare. Li ser bingeha pergala dijmin a heyî, karek cuda bê kirin li kure? Karê we eve. Ji bilî vê ti kar nîne. Min selmand ku ji me re ti karê bê kirin nehatiye hiştin. Hûn ji bo karekê çil teqleyan davêjin, heta ber bi welatên Ewrûpa û çolên Ereban ve jî diçin. Lê karê herî hêja hûn bikin eve. Rêya aqil û dil jî me ber bi vir ve tîne. Jixwe ev karek bi qasî zêr hêjaye. Niha xwe ji bo vê qane bikin. Kes şoreşê li ser we ferz nake. Ji ber karê sereke rast bê kirin eve, em jî van vedibêjin. Ji kûranî qane bibin, ji qanebûnê wêdetir divê misoger biryarek we hebe. Ji bilî vê ne em kêrî karek din tên, ne jî karek din ji me re tê dayîn. Jixwe ne dana kar, dê her tiştî ji destê me bistînin. Ji bo bidestxistina kar pêşî ax hewce

dike, weke hêza hilberînê ya mirov divê azad be. Ma di destê me de yek ji van jî heye?

Rastiyên zanistî yên herî bingehîn jî înkar dikin. Weke ku di destê we de karek û jiyanek we ya pir baş hebû lê min hûn xapandine helwestên weke; "Em zêde nikarin vî karî bikin. Hûn zêde mûçe nadin me" raber dikin. Ev hemû derewin û dijmin bi we daye bawerkirin. Hûn dikarin bi nîqaşkirina van ve, derewên ku dijmin ferz kirîn ji kesayeta xwe bavêjin. Hûn çima nabin şoreşgerek mezin? Çima kesayetek we ya fermandariya bi navûdeng pêş nakeve? Elbet ji ber we tam baweriya xwe bi vî karî ne aniye. Weke ku di pergalê de jiyanek we ya hinek tiştan rizgar bike heye, ji we hatiye dizîn fikaran dijîn. Ji ber hûn bi rewşek weke ku min hûn xapandine de beşdar bûne, lewra nikarin xwe baş tevlî bikin. Di navbera we de kesên weke me jiyana wan diziye bîst salin li pey tolhildanê dibezin hene. Hemû kesên xwe tam beşdarî têkoşînê nakin di vê rewşê de ne.

Lê ev derewan dikin, dixapin û dixapînin. Ya rast ne eve. Em îdîa dikin û diselmînin ku, li vî welatî hemû baskên kar ji destê we hatiye girtin. Hemû nirxên jiyanê yên heyberî û giyanwerî, nirxên çandî û dîrok jî di navê de her tişt ji destê me hatiye girtin. Bask, dil û hemêza we di valehiyê de ye. Çavên we çavên dînan, zimanê we nediyare, ango yek jî ne di rewşa dîtin ne jî bihîstinê de ne. Bi serûber nikarin baxivin. Ev hemû rastî ne. Ger ev hemû rastin, nexwe dê şoreşgerî jî tiştek bêhempa be.

Rêya rizgariya şoreşgerî, rêxistina şoreşgerî, şerê şoreşgerî, perwerdeya şoreşgerî û jiyana şoreşgerî ji bo me bi qasî zêrîn hêja ye. Ji bo ez wisa digirim dest evqasî li pêşberî we bi çalekim. Karek herî biçûk dikim jî di nirxa zêrîn de ye. Wexta derfetek herî biçûk dibînim, yekser dinirxînim. Hinek nêçîrvanên pir hosta hene, piç piç hesab dikin û bi ser nêçîra xwe de diçin. Rewşa min jî wisa ye. Mixabin hûn hedef hêştir jî be nabînin. Vêca me ji vê şerkertiyê çi fêm kir? Ma hûnê bi vê welat rizgar bikin? Hûn bi vê dikarin çi fetih bikin? Ez nikarim bi vî rengî berpirsyariya we rakim.

Bihizirin, gundiyek bêkar, hemalek bi qasî bikare zikê xwe têr bike ji bo parçeyek nanê somin bidest bixe, hijdeh demjimêran di nava xwîn û xwêdanê de kar dike. Ma rastiya welatê me ne eve? Ma hûnê vê înkar bikin? Hinek ji we çûn Ewrûpa, lê weke we jî dît Ewrûpa rê neda trênek aştiyê jî. Ewder ji bilî xwîna gelê me birijîne çi dike? Ev rastiyeke û

nayê înkarkirin. Ger ev raste, karê dimîne kirine û pratîke. Li vî welatî ji bilî şoreşgerbûnê û karê şoreşgerî kirinê tiştek din bi nirx nabe. Jixwe karek cuda jî nemaye. Ger helwesta we wisa ye, hûnê bibin partîparêz, rêxistinparêz û propagandevanek. Nexasim dema we leşkerbûn pêk anî, hûnê bibin milîtan û fermandarên bêhempa. Bibin plangerên çalekiyek bêhempa. Ji ber hûn ji her tiştî hesab dipirsin. Ji ber her ku diçe şoreş jî ber bi bûna nirxek zêrîn ve diçe. Karê leşkerî, beşa karên bîrdozî û siyasî ya herî zêde encam digire. Mirov pir baş pêş dikeve û li wir nayê desteserkirin. Gelo we bi şêwaza xwe hemaltî jî kir çi bidest xist? Ma hemû gelê we ne birçî û hejare? Ma hûn mirovê di nav rêxistinê de jî ber bi tinebûnê ve nabin?

Hûn di nava şer de ne. Bes we heta niha kîjan çek, kîjan şervan baş bikar aniye? Ma we tev jî wêran nekirin? Her wiha we xwe jî çiqas kêrhatî kir? Êdî hûnê soza leşkerbûnê bidin, kesayeta leşkerî bidest bixin, bi yekbûyî xwe bigihînin milîtanî û karkeriya partiyê. Nebêjin; “Derfeta min a pêkana van nîne.” Bêku hûn van bikin zehmete bijîn, heta bêderfete. Niha ev asta we ji min re weke jiyanek jiyîna wê bêderfet û tam îşkenceyeke. Di vê manê de xirabiya herî mezin hûn li xwe dikin. Xalên ku min di vê mijarê de destnîşan kirîn di nirxa zêrîn de ne. Mînak wexta derfeta xebatekê bidest dixim, ma li hember vê bê eleqeyek herî biçûk, nebesî û bêfêhmatî heye? Diçim gelek cihan, her roj li ser karim.

Vêca hûn çima nikarin di civînek herî girîng de jî baxivin? Çima nikarin biryarek herî girîng bigirin û qurala herî girîng pêk bînin? Hûn çima serberjêriya ku tê jiyîn nabînin? Vêca hûnê çawa bibin xwediyê van karan? Di derbarê karê hûn dikin hêja ne de çawa min qane bikin? Nexwe hûn derewkerin. Hûn tenê bi qasî dijmin dixwaze dikare bibin şervanên sominekî. Hûn dikarin bibin pale yan jî hemalek dijmin dixwaze. Ev jî karek ne hêjayî mirove û koletiyek dijware. Tişta ku ez heta ber bi vir ve anîm, şêwaza nêzîkbûna min a di derbarê kar de bû. Ger di nava sînorên pergalê de bimam, niha di bîrokrasiya dewletê de min dikariya di asta herî jor de jî kar bikim. Lê min ev ne hilbijart, ji ber min got ew kar pir xirabe.

Wexta min dest bi karê şoreşê kirî rewş xirab bû. Min her tişt bi deyndariya dewletê destpê kir. Di heman demê de deyndarê dewleta ku dijberî şer bikim bûm. Lê min got ev karê dikim hêja ye. Min wisa dest bi karê şoreşê kir û heta vir hatim. Mixabin hûn, ji ber di nav pergalê de tiştekê peyda nakin tên û vir jî bi pergalê re têkilhev dikin. Lê min bi

zanebûn pergal terikand. Tevî derfeta xwe gihandina paya herî bilind jî hebû –jixwe derfeta serkeftina karê me bi qasî mirov bêje di sifirê de bû qet hêviya xwe nebû-, me karê şoreşê esas girt û heta vir hatin. Hûnê van tevan bizanin wisa dest bi kar bikin. Di meşandina me ya vî karî de domdariyek bêhempa heye. Ev çil salin ti demî eleqe û venêrîna me ya li ser vî karî kêm nebûye.

Ji ber vê dibêjim: Bi nêzîkbûna mane kes li çiyê min nabîne, hûn bê eleqe û bê baldarî nêzî erkên xwe dibin. Hûn bi vî rengî nikarin kêleka şerkertiyê re jî derbas bibin. Di şerkertiyê de evqasî bê eleqebûn nayê pejirandin. Ger hûnê wisa bikin, van bi navê min nekin. **Kemal Pîr** vale bi bîra we naxim. Wan kesayeta me sînordar nas dikir. Lê şoreşgeriya wan di mercên herî dijwar de bû û qet nebê ji bo nekevin rewşek bêşermiyê ew berxwedêriya mezin raber kirin. Hûn li çiyan bi çekên amade di destê we de jî, bi vê jiyan û sekna xwe ve weke kena xwe bi me bikine. Çi kevin, çi nû ti kes bi ti hêcetê nikare bêje; “Nabe ev kar wisa bi eleqeyek zêde ve bê destgirtin, dev ji karan berde, kar evqasî ne girîngin.” Kesê vê dibêje qet sererast nabe. Gotina rast bê kirin li her derî derbasdare, nexasim li cihên diyarker û di asta her fermandarî de pir girînge.

Xwe her tim tînim rewşa çekek her tim kar dike û windahiya sedî salan di deh salan de vediguherînim destkeftiyan. Di kesayeta min a fermandeyî de jî, nûnertiya kesayeta bibandor û herikbar dikim. Ez ji bilî vê çavên xwe ji tiştekê re nagirim. Soza min eve û jixwe ya dikim jî eve. Ne tenê di şerkeriyê de, di derbarê jiyanê her mijarî de helwesta ku ezê erê bikim eve. Ji bilî vê mijarê ne hûn ne jî ez divê em hevdu tengav nekin. Ger hûn bal bidinê, em jî li vir jiyan dikin û têkoşînekê dimeşînin. Di nava vê têkoşînê de hijdeh salên xwe temam dikim. Eşkere ye çiqas li ser karan serwerim û hemû firsendên heyî bi serkeftî bikar tînim. Lê belê hûn bi salane li cihên qet nabe dibêjin; “Em bi zorê li ber xwe didin.” Yên li Ewrûpa bêku tiştekê ser bixin, yekser dixwazin ji wir rizgar bibin. Rewşa yên li çiyê jî bi heman rengî ye. Vêca emê we li kur bicîh bikin? Yên tên cem me jî hewl nadin me fêm bikin. Hêza bi me re nîqaş jî bikin raber nakin. Vêca hûn çi ji me dixwazin? Nexwe helwestên we şaşin. Ya rast jî, şer li her derî berdewamkirine. Li Ewrûpa, zindanê û çiyê, ango li her derî çeperên me hene. Hûnê mafê vê bidinê.

Dev ji bê eleqeyî û lewaziya di hewldanan de berdin, hûnê bêjin;

“Cîhan bi serê min de dirûxe, di nava bêşermî û leneta hemû cîhanê de me, ji bo kêliyekê zûtir şeref û serfiraziya xwe rizgar bikim aresteyî kîjan karî bibim divê ber bi encamê ve bibim.” Helwesta rast eve. Vê helwestê serwer bikin. Heta ku ev helwest serwer bibe, soza artêşbûnê nayê dayîn. Soza milîtanê PKK’ê eve: “Soza min û wateya herî berz a li pey û bi vîna xwe ve çar bi çar milîtanê vî karî me. Ger ti qeza-bela neyê serê me û tenê bêhndana min ewle be, ya dimîne serkeftine.” Divê her kes ne kêmî vê bimîne, ne jî bi şêweyek berovajî bike û nebê xwedî vê gotina bike gav bavêje. Ancex dema me karî vê saz bikin, dijmin têk bibin.

Lê ger tişta em dikin ne li gorî pêwîstiyên têkoşînê bin, dê hemû destkeftiyên heyî jî ji dest biçin. Ger hûn pêwîstiya vî karî nekin, mirov naxwaze bihizire dê dawiya we jî çawa be. Hemû cîhan kiryarên li ser me tên ferzkirin ecêbmayî dinêre. Dikarin ji vê xirabtir jî bikin. Ger hûn heta hemû şaneyên xwe çavên xwe bigirin, rastiyan bincil bikin û xwe bixapînin, dê ev di hemû jiyana we de xirabiya herî mezin hûn li xwe bikine. Divê hûn ji rastiyan nerevin. Dibe ku we heta niha gelek şaşî kiribin. Lê hûn dikarin ji rastiyan nerevin û xwe jî wisa bidin efûkirin. Derfeta jiyînê jî zêde ye, hûn naçin nav şerek bê hêvî. Ji dijmin zêdetir derfeta we ya serkeftinê heye. Hûn rewşek şer û jiyan têkilhev bûyî, ango diyalektîka şer û jiyanê di astek bêhempa de hatî sazkirin û ji bilî vê ti çareyek din neyî dijîn.

Ger emê behsa yek hêviyê bikin, ew jî di hewldana hevbeş em li ser bingeha netewî û civakbûnê dimeşînin de veşartiye. Van tevan ji ber vê dibêjim: Ev tevger mezin bûye. Lê dîsa jî di nava vê tevgerê de kesên xwe zêde dixapînin hene. Kesên ji dijmin xetertir xwe ferz dikin hene. Kesên weke koleyan kar dikin lê nizanin xwedî li heq û huqûqa xwe derbikevin hene. Ger bixwazin pir rehet dikarin pêşî li neyêniyan bigirin û derfeta ber bi serkeftinên mezin ve çûnê jî hene. Lê tevî pêşketinên bi hewldanên pir mezin ve hatine sazkirin, li ber çavan karan ber bi xeternakiyê ve birin heye. Kesên pir xirab li ser vê dilîzin hene. Li derve û hundurê me bi şêweyek tirsnak kesên hesabên şaş dikin hene û ne tenê ez ji van berpirsim. Heta dawî beramber para xwe berpirsim. Ancex êdî hûn jî bizanin bibin xwedî berpirsyarî.

Elbet wextê wê ye hûn berpirsyariya xwe her roj û ji her karî re rast bersivdanê raber bikin. Ger hûn cuda tevbigerin, bi rastî jî hûnê îxanetê li jiyan, fedekarî û wêrekiya we ya nirx didimê bikin. Wê demê jî hûnê

xwe bi xwe vale derbixin. Ya rastî li vir ne xwe, hewl didim we biparêzim. Ji ber hûn beramberî xwe neheqiyek mezin, nebesiyek mezin û binkeftinek mezin dijîn, pir hewce dibînim we biparêzim. Hûn nikarin demek dirêj xwe xapandinê bidomînin.

Em ji miletek sereke ya di nava mirovatiyê de heqên wî yên teqez ji dest hatine girtin û ji bo van jî hewce şer bikin hatine. Em nikarin ji duaya pêk neyê re bêjin amîn. Pêwîste em weke milet, weke partî û artêş, elbet weke şerkeran di serkêşê yên hewce dike şer bikin de bin. Ma ji vê hêjatir û neçarî tiştek din dibe? Em li ser vî bingehî carek din peywiran zelal dikin û karên we plan dikin. Dibe ku, wateya vê pir mezine, gavên pratîkî yên li ser vî bingehî bên avêtin jî dê pir mezin bin. Bi qasî karên em dikin divê xiroşê bidin, divê em di nav hestek berpirsyariya mezin de jî tevbigerin. Bi qasî em xwedî feraset bin, ya girîng jî kêlî bi kêlî kirina meriyetê ye.

Dîroka şerê me, qonaxa pêşketina herî girîng dijî. Êdî bi ezmûna her yeke ji me re, em pêvajoyek ku bikare van karan tevan derbas bike dijîn. Ger em nekarin vî şerî bi temamî ser bixin, dê heyf be. Di vê qonaxê de windakirin, dê ancex encama hinek kêmasî û şaşiyên bê wate çêbe. Kar heta vir anîn, pergala koletiya sedî salan rawestandin, ya rastî derfeta azadiya ku hêjî gelek ji we di fêmkirinê de zehmetiyê dijî di sêniyê de danîna pêşberî we ye. Bi rastî jî azadî jiyanek di nirxa zêrîn de ye. Bi rêzdariyek mezin û rast nêzî vê bibin. Ji bo xwe gihandina wê em hewldanên hewce dike raber bikin. Çi ji bo hemû mirovatiyê, çi jî ji bo miletê me yê di bin mercên zehmet de dijî û herî zêde jî ji bo me, em şerê jiyanek watedar û serkeftî bimeşînin.

Şer, pêvajoya jiyana mirovekî ya herî xweşike. Her ku bi wê ve mijûl bibin dê hêz bidest bixin, her ku hêz bidest bixin hûnê wate bidin jiyanê. Diyalektîk û felsefeya jiyana me wisa ye. Ne ji bo jiyanek wisa ji şerkirinê mirov dûr disekine, ne jî di nav vî şerî de bi pêşxistina jiyanê re em dikarin xwe ji wate dayîna wê dûr bixin. Rastiya Rêbertiyê wisa ye. Ez çil carî jî xwe ji her hêlê ve vebêjim an jî biqîrim, vaye gotina herî xweşik bê kirin eve. Nabêjim dê şaşî û binkeftinên we çênebin. Lê ev jî di nav hinek pîvanên diyar de tên pejirandin û jixwe ew jî hatiye diyarkirin. Elbet ji bilî vê ger hinek bêxêrî çênebin û derfeta bêhngirtinê bidest bixin, misoger bi qasî ber bi serkeftinê ve biçe dê tevkariya we ji pêvajoyê re jî çêbe. Weke kes asta hûn nûnertiya wê dikin çi dibe bila be, dê serkeftinên we yên girîng çêbin.

Berovajî van xalên min destnîşan kirîn, bi zanebûn rewşek xefletê neyê jiyîn, eşkere ye dê carek din nebesiyên di vê astê de neyên jiyîn û qonaxa ku PKK xwe gihandiyê misoger qonaxa herî zêde nêzî serkeftinê ye. Hema bêje em hatine asta vê bi cîhanê bidin pejirandin. Hûn jî nûnerên vê yên herî eslî ne û ji bilî serkeftinê ne tiştek din ji xwe bipirsin, ne jî bipejirînin.

**Tebax 1997**

## XEBATA HERÎ HÊJA YA BI NAVÊ MIROVAHÎ BÊ KIRIN MEŞA AZADIYÊ YE

Ji **Îsmaîl Beşîkçî** pirsîne; "Xwesteka te çiye?" Wî jî bersiva; "Li çiyan meşek azad a gêrîla kirine." Wexta kesek herî baş pergal dahûrandî vê dike, meşa we ya azadiyê li qadên herî bi siûd, zêde naşibe raveya bêriyên ku bên xwestin. Divê hûn dahûrîna vê bikin.

Li gorî min jî di vê cîhanê de daxwaza jiyana herî hêja, nexasim li Kurdistanê meşa gêrîla ya azadiyê ye. Lê we ev meş aniye rewşek nayê nasîn. Em ji asta dilxweşiya meşa azadiyê bigirin heta azweriya serkeftinê, ji dewlemendiya armanc bigirin heta hemû şêwazên ku mirov ji pir aliyan ve xurt dike, şêwaza we ya xwe ferzkirinê pir eşkereye mirov ji kerba dixe. Kesî ji we re negot bê amadekarî beşdarî vê meşa azadiyê bibin. Kesî ji we re negot tevlî refên me bibin û nabêje biçin jî. Bi israr hewl didim li vir rastiyekê bilêv bikim. Hêza armanc, bawerî, azwerî, hiş û feraseta xebata me pir berze. Bi vê re her tim di rojevê de tê girtin û wisa tê jiyîn. Vêca li şêwaza tevlîbûna we dinêrim: Hûn weke kesên di civakê de tine bûyî hatine, mezinbûna armanca we, dewlemendiya şêwaz û azweriyên we yên serkeftinê nîne. Hûn pir xweperest û ferdperestin. Hema bêje ji rihê xwe aciz bûne. Hûn xwe bi zorê yan terkî mirinê dikin, an jî bi jiyana di nava pergalê de kêmtir ve sînordar dikin. Ev nêzîkbûnên xirabin û pir zehmete mirov wate bide van.

Meşa min jî, meşek gêrîla ye û herî zêde jî ji bo pêkana şêweya vê meşa bêhempa, em amadekariya mezin dikin. Tevî vê dîsa jî evqasî bi azwerî li pey vî karî ne. Em hêza tevlîbûna vê meşa azadiyê didin we tevan. Tevî ji hêla bîrdozî, rêxistinî û pratîkî ve hemû derfetan pêşkêşî we dikin, hêjî em di nava vî karî de ne û bi dildariyek mezin berdewam dikin. Tevî ku her ku diçe em ber bi şêwaza îdîa û serkeftinê ve diçin, vêca wateya ku hinek ji we didin vê meşê û encama ku vê meşê dixin navê binêrin. Xala ku sereke pêwîste hûn çareser bikin eve. Dema diçin an jî tên, dema destpê dikin an jî xilas dikin, tiştek bi kûranî fêmkirin hewce dike.

Îdîa û selmîna me jî ewe ku, ne tenê di rastiya şerê me de û bi armancên me yên rizgarî re girêdayî, di rastiya nav-netewî de jî nirxandinek ku her kes jidil dike heye. Em ber bi azadiyê ve difirin. Em

mezinbûn û hêza xwe ji vir digirin. Lê rewşa gelek ji we dinêrim: We ev meşa azadiyê bi wate, şêwaz û dildariyên pir cuda ve ava kiriye. Wisa jî dimeşin. Hûnê vê çawa rave bikin? Kî ji we re got dê meşa azadiyê wisa be? We xwe xapandiye, hûn tên xapandin û dixapînin.

Îdîa û selmîna me heye: Li vî welatî, bi navê vî miletî û mirovahiyê xebat û şerê hêja bê kirin, meşa azadiyê ye. Bêjin min; “Ha ji te re ev dewlet, bila ya te be”, yek rojê jî serkêşiya wê dewletê nakim. Lê dema bêjin; “Ji bo vê meşa azadiyê baş kar bike”, xwe bi azweriyek mezin ji karkirinê re amade dibînim. Tevî vê hêjî hinek di nava me de bi rihek pûçbûyî, dilşikestî, jihev ketî, hema bêje parçe parçe rehetî tenezilî tiştên biçûk dikin. Bi rihek tevlîhev ve, bêfihêt helwestên valederxistin û xirabkirina kar raber dikin. Ev hemû tiştên tên kirin ji encama ku dijmin ji bo me amade kirî re bûna bersive û dengvedana wê ye.

Hûn tam bûne bela jiyanê yan jî kirine bela jiyanê. Ev ne rastin. Ma hûn dixwazin bijîn, naxwazin? Gelo hûn pirsa çawa bijîn jixwe dikin an na? Di mijara çawa bijîn de hinek bersiv tên dayîn. Gelo we ev girt an na? Qet nebê di vê mijarê de hinekê zelal bibin. Kes bi tika û minet nabêje werin, vî karê me bikin. Wateya rêwîtiya azadiyê pir zelal û diyarkere. Wexta me bi komek biçûk dest bi kar kir jî weke me xwe selmandibû. Yek daneya bi qasî serê derziyê ya hêviya serkeftin û derfeta serkeftinê nebû. Lê dîsa jî em hêjî li wan kesayetan digerin. Vêca çi bi te hatiye? Em dixwazin vê lîstokê xirab bikin. Her ku diçe ronî dikin xirabûna di nava me de çiqas xwe dispêre dijmin, girêdana tinebûna paşverûtiya navxweyî, kêrî quruşekê nake, tine bûyî ya jiyanê, hewl didin bi sedemên wê re ronî bikin. Ev kesayetên we bê sedem çênebûne. Hûn bi şêweya em dikarin di vê meşê azadiyan bidest bixin de nabin bersiv û jixwe di cewhera lîstoka tê lîstin de jî hişmendiya; “Ev kar wisa nameşin” heye.

Dema em li plansaziya dijmin bi gelemperî ji bo çepgirî, milet û taybet jî ji bo me danî dinêrin, di nava me de bersiva hinek bi awayek objektîf didin bi şêweya; “Em bi her tiştê jiyanê ya sivik, bê armanc, berdoş, ketî û azadiyê nade razî ne. Em vê partiyê jî weke bela dibînin” pêş dikeve. Bi we re li hember êrîşên şoreşa dijber an jî şerê taybet zemîna burjuvaya biçûk an jî çîna burjuvaziya biçûk a rastî ne bi zanebûn, jixweber weke; “Ev ji vê belayê xilas bibin”, hewldanek heye. Nexasim wexta em li kesê vê dawiyê xwest rêbertiya vê bike û hewldanên ji bo hatîn meşandin dinêrin, mirov neçar dimîne bi hêrsek

pêşwazî bike. Dibêje; "Bi partiyê nabe, bi gêrîla nabe." De başe dê bi çi çêbe? Bi keda mezin a milyonan mirovên ji miletê me, bi evqas xwîna şehîdên me, bi jiyana ku êş û îşkenceyan ve hatî hunandin ve me berhemek saz kiriye. Heta dawî çav diberde wê, dixwaze wê desteser bike û bi wê bilîze. Em bipirsin gelo tu ji pîvan, qural û kesayeta partiyê û gêrîla re amade yî, dê bêje; "Na, ezê heta dawî xirab bikim, biçewsînim û serûbin bikim." Bersiva we eve. Vêca tu kiyî? Nexwe tu van tevan bi navê çi dikî? Cewhera lêpirsînê eve û divê hûn tev vê lêpirsînê bikin.

Di biryargeha şoreşgeran û şerê şoreşgeran de rewşek bi navê zorê nîne. Her tim dilxwaziyek mezin, kûrbûna fikrek mezin, dijwariya vînek mezin esase. Kesên wisa tên û bi yên wisa re rêwîtî destpê dike. Bi salane xalên ku me mijûl dikin tên ferzkirin. Bûna binyata wê tengbûna jiyana civakî ya paşketî û hemû qirêjiyên pergalê. Hinek jî dema bersivê ji daxwazên takekesî yên biçûk re nabînin, bi avahiyek partiyê ya mezin, quncik û bingeha wê dilîzin. Wexta em dipirsin; "Derdê te çiye?" Dibêjin; "Dixwazim li gorî xwe hinek tiştan bikim." Ev bîst û pênc salin planek bîrdozî, planek siyasî û planek rêxistinî ya vir heye. Avahî li ser vî bingehî tê bilindkirin. Lê ew dibêjin; "Ez dixwazim di nav avahiyê de avahiyê lê bikim. Dixwazim quncikek avahiyê hilweşînim." Ev çiye hûn dikin, kî azadiya vê daye we? Ma ev karê hûn dikin ne weke dize malê ye? De bersivê bidin. Xwe û derdora xwe lêpirsîn bikin û hinekê jî rêzdar bin.

Min dizker girtiye, bernadim, lê hûn hêjî nikarin hesabê keda xwe jî bipirsin. Dibêjin, tenê ez çewsandim, nizanim çi ji min kir. Ger hûn wisa ne, çi karê we li cem me heye? Hinekê bi mirov re heysiyet çêdibe. Ma dibe şervanên azadiyê gazincan bikin? Ma zimanê şervanên azadiyê wisa dibe? Ev bi gotina herî sivik bêşermiyek mezine. Ma azadî ne tiştek xweşike? Ma meşa azadiyê ne karê herî hêja ye? Ma avahiya azadiyê, ne avahiya ku mirov bikare baş di navê de bijî ye? Hûn çima van nizanin? Baldariya we li hember çiye? Serê we ji bo çi kar dike? Dijmin jî her kêlî li Şirnex û Amedê holik û avahiyên taybet ji bo we saz dike. Ger dixwazin biçin, li wir ji xwe re malekê bigirin, lê bi tinekirin û rûxandina vir ve vê tiştê nekin.

Êdî hûnê zimanê rêxistinê yê siyasî û bîrdoziya rêxistinê baxivin. Ger hest û dilê we hebe, hûnê bi wê hinek mezinbûnan raber bikin. Ger hûn raber nekin, bila ehda min be, ezê şerê herî dijwar beramberî we

bimeşînim. Ji ber em yeqîn dikin nûnertiya nirxên pir mezin dikin lewra vê dibêjim. Ezê misoger van nirxan nedim binpêkirin. Tenê bi hişmendiya di tengaviyê de ne vê sebrê raber dikim û ji bo hûn nebesiyên xwe bibînin van hêcetan rêz dikim. Tevî vê hûn di sînorên nerastbûnê de israr dikin. Eşkere dibêjim, ev kesayet ji bo me ji kesayetek kontra zêdetir xeternake. Em jî di derbarê vê kesayetê de meşandina her cure têkoşînê xwe azad bibînin. Li vir qet cih ji têgehên weke niyeta baş an jî niyeta xirab re nîne. Tevlî şoreşê bûyîn lê li gorî wê nebûn, ji sîxurên zanebûn xetertire. Tevlî şoreşê bûyîn û nepêşketin û neveguherîn jî xetere. Hûnê wisa bizanin.

Di rastiya me ya Rêbertiyê de şêwazek pejirandina jiyanê heye. Ji zaroktiyê ve zimanê wî, zimanê azadî û meşa gêrîla ya bêhempa ye. Bi qasî soza rast, gava rast jî her tim esase. Li vir gotinek şaş gotin, tevlîheviya hiş, newêrî, şaşiya mezin kirin û di şaşiyan de israrkirin tine ye. Li vir bêrêzî û nehezkirin tine ye. Di asta herî berz de nirx dayîna rêhevalê xwe heye. Me ev meş wisa destpê kir û wisa didomînin. Hûn nikarin vê berovajî bikin. Ger hûn şaş welidandibin, mezin kiribin û şaş dabin meşandin, hûnê bi xwe hesabê vê bidin. Me ji bo vê jî wextek zêde da we. Devjêberdin kesên weke we nêzî nêvenga biryargeha meşa azadiyê bikim, mirovên bêberpirs di badekên lîstoka zaroktî de, di çêkirina quncekekê de jî nêzî xebatên xwe nakim. Wexta min quncika xwe çêkir, min tenê cihê yên bi edeb, tiştên ku bidim fêr bibin destnîşan kiribû.

Van tevan ji bo vê dibêjim: "Hûn dibêjin; "Em dixwazin bên cem Rêbertî û hêz bigirin." Bes hûn çima qet bi qural û cewhera wî ve rast nayîn girêdan? Rehetî û ewleya ku ji bo xwe jî nadim, lê min dayî we, derfeta fêmkirin û xwe komkirinê çima nanirxînin? Her çendî dijmin bi qasî dixwaze kesayetên we texrîb kiribin fikrek dijmin a dijwar û bûyerek bandorker kesayetê ku qet rast nabe jî tîne ser rêya rast. Rastî û bûyerên ku li mirovan bikevin hema bêje radeyek mezin di rojeva we tevan de ye. Hem hûn dibêjin pir birçî ne, hem jî dilê we tiştekê ranake. Êdî divê hûn vê nexweşiyê derbas bikin.

Şerê taybet ê dijmin ku hûrûkûr bûyî her roj vê îdîa dike: Dijmin her tim dubare dibêje; "Şerê azadiyê tengaviyê dijî, vîna wî hatiye şikandin, ji hêla leşkerî ve têk çûye. Bermahiyên mayîn jî, divê bikevin nava mercên weke radestbûnê. Ne gengaze hûn azad bimînin, serfirazî û şerefa kesayeta we nîne." Her wiha îdîa dike hûn jovanin li çiyê ne. Dîsa

berê jî pisporên wan digot; "Ciwantiya we ji we hatiye dizîn." Belê ev gotinên wan rastin. Ne tenê ciwantiya we, mirovatiya we jî hatiye dizîn, welatek we jî nîne. Di derbarê we de bêhejmar hesaban dikin. Vêca bersiva hûn didin van çiye? Ev ne tenê îdîayên dijminin, di heman demê de rojane bi şerê taybet li ser we ferz dike. Ma rastî ne wisa ye? Me kîjan ciwantiya we ji we diziye? Min ji wan ciwantî û jiyana ku şerê taybet a dijmin dijî diziya. Niha hinekê jî hemû tengazariyên we çavkaniya xwe ji vir digire. Ev tişta min kirî, bi qasî agirê ku **Promete** ji Olîmposê dizî pîroze. Ji bo ciwantiya we îxaneta mezin û bêserfiraziya mezin nejî, min dizî û li cihekê veşart. Dê rojekê ev kesayeta we ya her tiştê wê ji dest hatî girtin, dibe ku rojekê li nêvengek azad, veguhere kesayetek ku mirovahî, welatê xwe û azadiya xwe hez dike. Min ji bo vê dizî, ji bo vê veşart. Hûnê vê jî fêm bikin.

Wexta em dibêjin bandora pergalê bi we re heye, em diyar dikin hûn hatine fêrkirin. Her tim dipirsim ev fêrbûnên çi û bandorên çine. Xalên ku dijmin li ser we ferz dike li holê ne. Dê çiyê vê li ser we bibandor be? Mirovek ji rêzê jî, nikare bêje ez fêr kirime. Ev dervî xwezayê ye, di xwezayê de rewşek cihe ye. Em nikarin hêcetên van bidin pêş. Îdîa ya dijmine û ger bersiva vê jî li ser wê bingehê be, rewşa we pir xeternake. Heta tirsnake. Me hemû şoreşgeriya xwe li ser bingeha bersiva ji van re bê dayîn da destpêkirin. Qaşo tevî hewce dikir hûn jî wisa bikin, li şûna vê bi ferzkirina sextekariyên xwe ve, hûn sucek pir mezin dikin.

Ez dixwazim bi mirovên berz re xebatê bimeşînim. Weke hûn jî dibînin ji vî karî re amade me. Hûn erk û raye ji me hêvî dikin. Li gorî hêza xwe bersivê didin van xwestekên we jî. Nabe ku di nêvenga me de peyvên weke; "Bandorên pergalê" bên bikaranîn. Ji mirovatiya xwe bigirin, heta di derbarê serbilindî û şerefa we de çi hebe êdî hemû jî li virin. Di nêvenga me de lenet li mirin, îşkence û heqaretê tê kirin. Tolhildêrek gund ê ji rêzê jî di firsenda destpêkê de li gorî quralên xwe kêra xwe li dijmin dide. Hûn gêrîla ne, cengawerên dagirtî û zelalin. Ma dibe mirov bandorên dijmin bijî û bibe zemîna wî? Di kêliya we dît de, hûnê kêra bîrdozî, kêra rêxistinê û kêra leşkerî li dijmin bidin. Tişta herî baş bê kirin, ma ne eve? Ger hûn nikarin vê jî bikin bêjin, ez ji we re rê bibînim. An jî ger hûn ketibin rewşên ji vê jî kembaxtir, ez we danim aliyekê. Divê hûn yek ji van herduyan misoger hilbijêrin. Bes hûn her carê herduyan têkilhev dikin û pêşkêşî min dikin.

Min deh saliya xwe de dev ji vê berda. Di serî de min şîrê dayîka xwe û piştî wê jî dev ji her tiştê ji min re hatî dayîn berda. Hûn tiştên ku we ji mêzeya dijmin aniye tevlîhev dikin û datînin pêşberî me. Bi we re axaftina zimanê rêxistinê û jîndarkirina quralên rêxistinê nîne. Yek weke serkêşê çeteyan derdikeve, yekîneyekê desteser dike û şêwaza jiyanek li gorî xwe dide rûniştandin. Kes jî nabêje; "Ez nikarim vê bipejirînim." Tişta beramberî vê dikin jî her tim gazincin.

Em di asta awarte de hêza çareserî didin we, lê mixabin qet wate nadin vê. Mînak, cendirme tê di ser gund de digire, her cure kiryarê disepîne, ew tenê feryadê dikin. Carina jî di nava me de serkêşê çeteyekê derdikeve her tişta dixwaze dike, beramberî vê jî gelek fermandarê me yên yekîneyê û qaşo rêveberiyên me yên sexte li her alî diqîrin û dibêjin; "Vî wisa kir." Nêzîkbûna mirovek ji rêzê yê civakê fêm dikin. Lê hûn şervanên azadiyê ne û tevî di destê we de her cure çek hene, em fêm nakin hûn çima vê dikin. Tişta ev bi rikek mezin li ser min ferz dikin, nêzîkbûna; "Ev kar tenê wisa dibe" ye. Hûn qet nikarin vê bi min bidin pejirandin. Hûn dikarin van ne bi min re, bi ehpab-çawîşên xwe re nîqaş bikin. Bi qasî hûnê nekarin vê mijarê li ser min ferz bikin, ez li pêş we me, nabim amûrê tiştek we. Ger hûn di vê mijarê de beramberî min şer jî bikin, dîsa hûnê winda bikin. Qet hewce nake hûn xwe bixapînin. Jixwe hemû meşen azadiyê yên di dîrokê de, vê rewşê weke lenetî dinirxîne û helak dibin.

Nîqaş bikin; "Em çima karên xwe rast nagirin dest?" Mînak wexta em li gelek qadan dinêrin, hûn dibînin nêvengek rêhevaltî ya biserûber tine ye. Vêca hûn çima sedema vê napirsin? Ma dibe mirov evqasî beramberî hev bi bertek be? Ev hemû bermahiyên dijminin. Weke din ma mirov quralên şer evqasî tîne rewşek ku neyên nasîn? Hûn çima van nîqaş nakin û bi pergalekê ve girê nadin? Hêza vê rêxistinê ya ferman didê me. Ma bi min re di van mijaran de bêçaretî, çewsandin û fikra ev kar çênabin heye? Ji roja destpêkê heta niha li her cihê ku em hene, ma feraset û vîn ne serwere? Çima li nêvengên hûn lê ne wisa çênabe? Hûnê bersiva van bidin.

Jixwe vê şervantiya xwe qet li gorî min çênekin. Êdî beramberî vê şervantiyê qet eleqeya min nîne. Hûn vale canê xwe didin û heyfa we ye. Di bin vê sekna we de axaftinên provakasyon û hinek fêlbazên cardin xwe bi pergalê bide pejirandin heye û we guhê xwe ji wan re vekiriye. Ji we re tê gotin; "Jiyana we hatiye dizîn." Weke ku bi qasî

quruşekê jiyana we heye, hûn jî dibêjin; "Gelo wisa ye?" Elbet îblîsên dijmin her tim bi mirovan lîstine. Îblîs, jiyana Adem a di buhiştê de jî xirab kirî ye. Di roja me de gelek kesên weke vî hene. Bi îblîsî û derewker her cure pirsan didin kirin. Ma mirov ji kesên wisa îblîs guhdar dike jîndarkirina kîjan rastiyê hêvî dike?

Mirov carina şopa wan dibîne, di wê koma yekemîn a Îsa de, di wê jiyana li manastirê ava kirîn de jî yekîtî û pîroziyek rih a mezin ku sedî salan berdewam kirî heye. Divê em şaşwaz nebin ku wan çawa li van deran jiyan kir. Em di serdema azadiyan de ne, em li çiyayên azadiyê ne, em di meşa azadiyê de û di şerê azadiyê de ne. Ancex daneyek ji vî rihî bi we re nîne. Ev di bin şopdariya îblîs a dijwar de, ji her tiştî re guhê xwe vedikin, her cure teşe digirin û hewl didin bibandor bin. Bêku yek kêliyê navberê bidinê bi me re şer dikin.

Êdî nizanim di van mijaran de çi ji we re bêjim. Ger min bizaniya hûn çi ji min dixwazin, ên ku nayên peydakirin ger qumaşê Hîndê û şekirê Şamê jî be, ezê peyda bikim û bînim. Ez mirovek ji her tiştî re amade me. Di camekana me de her tişt heye. Di maneya xweşikbûnê de kes naxwaze we feqîr bihêle. Bes hûn nizanin bixwazin jî. Me amadekariya van tevan kiriye, derfetên vê berhev kirine. Kes ji we re nabêje bêderfetiyê ava bikin. Ger karên we bi pereyan dibe pere, ger bi şekir û şerbetê dibe bi wê re, ger bi fikrên kûr an jî daxwaz û azweriyên berz ve dibe, hûn dikarin bi wan jî bimeşînin. Ango êdî ev hemû di camekana me de hene.

Ketina we ya nava cîhana azadiyan, dişibe hinek civatên hoveberên dema ketîn Roma hemû eser û avahiyên bêhempa û pîroz wêran kirîn. Ev rewşa we dişibe êrîşa we ya li dijî şaristaniyê. Di rastiya Kurd de, ne tenê hoveberî, ango pîvanên di asta paşverûtiya komînal de, her wiha koletiya ku hatî kûrkirin heye. Jixwe bi hevgihîna wan ve derfeta xwe gihandina şaristaniyê jî nîne. Ji ber şaristanî bi çeke, dê kesayetên bi vî rengî bi erdê re bike yek û kesî nêzî xwe nake. Wexta hûn bikevin nava cîhana azadiyên ku zêdetirîn weke firsendekê derketine holê, hûn serûbinkirinê dijîn û didin jiyîn. Ji ber wê nezantiya kûr zêr û teneke, heta jehr û şerbet têkil hev dikin.

Me hemû pêvajo bi hêzek têrkar ve amade kiribûn. Jiyan ji bo her kesî serfiraz bû, tije derfet û serkeftî bû. Hemû meş bi şan bûn, tije derfet û bi serkeftinê barkirî bûn. Heyf dibînim ku we çawa rihê van amadekariyan tevan sitand. Pir bi hêrsim ku ev hemû wisa hatin

xerckirin. Hemû pirsgirêka we çavkaniya xwe ji nêzîkbûnên we yên mafê xebatan nadiyê û herî zêde wate nedayîna xwe digire.

Dostek hatibû, nîqaşek me sê demjimêran pê re çêbû. Li gorî tê gotin, yek ji kesê cîhanê yê herî dewlemende. Di navbera silav û xatirê de xwe birayê min da nasîn. Digot dê heta dawî bi min re be û digot; “Rihê min wisa dibêje.” Navê wî jî nizanim. Lê gotina dawî got; “Ezê her tim wisa bimînim.” Yeqîn nakim polîtîkayek zirav dikir, rastî digot. Bandor bû û di kûraniya rihê wî de ya dihat jiyîn bilêv dikir. Dibe ku her tim navê me bi xêrê bibîr bîne û dost bimîne. Ev misogere û emê bibînin. Ango kesê cîhanê yê herî dewlemend jî be, encama hevdîtinek bi me re wisa ye. Hûn weke mirovên cîhanê yên herî hejar wisa nêz dibin, lê ew dewlemendê ku bi ti şêweyî ne hewceyî me girêdana wî ya wisa bi me ve ecêbe. Pêşniyar jî ji min re kirin. Dihizirîm ku çawa evqasî hestiyar dibe. Digot; “Divê ev jiyan wisa bidome, divê ev jiyan serwer bibe û emê ji bo vê jiyanê wisa bikin.” Hemû baldariyên berz bilêv kirin.

Dihizirim, hûn milîtanên ku herî zêde hejar, pêdiviya xwe bi me heyî û me dersên herî berfireh dane wan, çima beramberî xebatên me evqasî bê eleqe dimînin? Ew dostê me, dema got; “Xweziya malek min jî hebûya, xweziya”, bi rihî hat girêdan û çû. Dema min da diyarkirin ti nirxa heyberî nîne, zanî tê ew bi xwe hewceyî me bibe, mezinbûna bîrdoziya me, mezinbûna jiyana me dît, ket ferqê pêdiviyek wî ya kûr pê heye û wisa çû. Hûn jî bihizirin. Hûn bi heyberî û giyanweriya xwe ve çiqas hewceyî çi ne? Em her tiştê xwe didin we. Qîmet nedana vê, ji nankoriyê jî wêdetir di kûraniya lenetî û tevlîheviyê de xirikîne. Em jî dixwazin vê xirab bikin û dawî lê bînin. Di bin ferzkariyên dijmin de, di bin zehmetî û bêderfetiyan de van rewşên hûn dijîn tên fêmkirin. Lê niha derfeta azadiyê li ber çavên me ye. Êdî ev bidawîkirina lenetiyê ferz dike.

Baldariya dostek ji rêzê jî nedana raberkirin lenetî ye. Hinek weke zebaniyan, hinek weke decalan, xwe wisa li ser van rastiyên pîroz ferz dikin, hûn nikarin li hemberî van xwe biparêzin jî. Me Azraîlê li ser we jî rakir. Destê Azraîlê li ser jiyana we hatiye rakirin. De vêca hinekê zindî bibin! Hûn çima di bin bandora xwediyên vê nêzîkbûna zebanî, ji zordariyê jî wêdetir zordar de dimînin? Me destê dewlet, destê axa û destê zordarê li ser we rakir. Hinde hûn tirsonek hatine mezinkirin, her tim di bin gumanên dê çi ji web ikin de hûn bê ziman û bêçare mane.

Hinek zarok an jî jinên hatine tirsandin hene. Hûn jî her tim weke wan di keftûleftê de ne. Min di vê mijarê de jî rêhevaltiya xwe pêk anî û zextên li ser we rakirin. Ji we re dibêjim, netirsin.

Elbet şêweya din a bersiva we ji vê re cengaweriyek çavkorî ye. Ev jî şêweya berovajîkirina tirsê ye. Ti eleqeya wê wêrekiya we ya kor û êrîşa kor bi min re nîne. Şêwaza min a li hember tirsê ne eve. Ew jirêderxistinek xirabtire, hûnê wê jî nekin. Kes ji we ne şerkeriyek wisa korane, ne jî evqasî tirsê dixwaze. Herdu jî hewce nakin. Ya ji me re hewce baskê meşe û şêwaza jiyanê ya aqilmend, bi plan, di şêwaza şer û jiyana partiyê de bi dilxweşiyek mezin pejirandî û derfetên wê bidest xistî ye. Êdî vê bi wêrekî hemêz bikin. Dibêjim netirsin; binêrin, ez heme. Dema tiştek weke xofê bi ser we de bê, agahî bidin min, emê bi destê xwe der bikin. Cuda hûn çi dixwazin? Li cem me bersiva derbaskirina her cure xalên hûn gazincan jê dikin heye. Hema bêje cinan li we tevan daye. Me cin jî ji vir der kir. Hûn dibêjin zordar hene, we bi çavên xwe dibînin me zordarê mezin anî çi halî. Di nêvengên me de dijminê çors jî nîne. Ew jî li pişt çiyan hatiye derkirin. Lewra dev ji jiyana bi vê xofê berdin, bi xwe bawer bin, hêdî hêdî zindî bibin û hinekê jî hemû jêhatiyên xwe bixin tevgerê.

Cardin dibêjim, netirsin. Tiştên we berê dikir û dijiya şerim bûn. Lê me niha ew şermî jî ji holê rakir. Êdî pêvajoya rastbûnê mijara gotinê ye, hûn sererast dibin. Êdî ji paşeroja xwe şerim nekin. Ji ber we tobe kir û berê xwe daye sererastbûnê. Minafiqtiyê nekin, bese. Ango em naxwazin hûn oportonîzmê bijîn. Em ji we dixwazin hûn êdî ya berê gur nekin û bandorên dijmin nedin jiyîn. Wateya van tevan heye û van hemûyan ji bo vê dibêjim: Yên tên hene, dikarin di roja destpêkê de ji bo derdên xwe derman peyda bikin. Yên diçin hene, bi dermanan ve dagirtî ber bi her qadê ve diçin û bi dermanên ku rojane bidin ve, hemû kesên nexweş dikarin bigihin tenduristiyê. Bîrdozî dide hinekan, rêxistinê dide hinekan, ziman dide hinekan, çalekî dide hinekan. Ango dermanekê dide her kesî. Roja paştir ev kesên nexweş baş dibin û zindî dibin.

Berê evqasî misoger ne daxivîm û min israr jî nedikir. Misogerî û israra min tê fêmkirin û sedemên wê yên pir girîng hene. Hêjî hûn xalên ku destnîşan dikim fêm nakin, cardin hûnê pir zelal çi dixwazin bêjin. Hûnê bêjin; "Ez div an xalan de encamê dixwazim." Dibe ku bersivên cur be cur bên dayîn. Lê misoger hûnê bizanin çi dixwazin û dema we girt jî bêku bi wê bilîzin bersivê bixwazin. Negengaze bê fêmkirin hûn

çima xwedî li soza xwe dernakevin û bi bersivên tên dayîn ve xwe têr nabînin. Yeqîn dikim bersivê rast didim. Ger hûn bi van bersivan têr nabin, ezê bêjim nexwe hûn an sîxurin, an sererast nabin, an jî ne jidilin. Yan jî ezê bêjim van ala radestbûn û tinebûnê rakiriye û dixwazin ji min re jî bêjin; “Tu jî xwe tine bike.” Hinekê giraniya vê jî heye. Jixwe di encamê de bersiva ku we dayî perspektîfên dawî yên dijmin jî, bi şêweya; “Ev kar wisa nabe, ev kar ancex evqas dibe” ye.

Ez jî dibêjim na. Dizanim min çawa û ji kur ji sifirê destpê kiriye. Dibe ku hûn tine bibin, lê hêj ez tine nebûme. Berovajî, ez nû dixwazim dest bi jiyanê bikim. Jiyana ku çil salin ji min hatî sitandin bi karkirinê, yeqîn dikim min gihantiye destpêkirinek bi şeref û serfiraz. We kar nekiriye yan jî kar kiriye lê bidest nexistiye. We di her gava avêtî de têk çûne û darbe xwariye. Hûn nikarin têkçûna xwe, nejiyîna xwe yan jî windakirina jiyanê li ser min ferz bikin. Jixwe ya serkêşê çeteyan dixwest pêş bixe jî ev bû. Gotina wî ya weke; “De vêca wisa bijîn” û dengvedana vê ji ber vê bû. Provakatorê herî kevin jî digot; “Rêjeyek avaniyê ya zêde bi jiyana ku pêşkêş dikim dilxweşe.” Elbet ti eleqeya vê bi şer û serbilindiyê ve nîne. Vî provakatorî hesabên xwe li ser vê kiribû. Ji bo nirxên me afirandine ji me bidizin, her cure lîstok dikir. Min jî wê demê ji bo malekê bibînim, xwarinê bibînim û ewlekariya wan saz bikim her tişt dikir. Mixabin wan jî ev digot û ev dikirin.

Dema van tevan dibêjim, naxwazim bêjim hûn qet rast nabin. Ev alî bi we re sînordare. Hêj hûn pir bêçare ne, ev aliyê we zêdetire. Her wiha zanebûna we jî zêde pêş neketiye. Hûn ciwanin û dikarin vê bêçaretiyê derbas bikin.

### Di Şerê Şoreşgeran De Dilxwaziya Mezin û Dijwariya Vînê Esase

Jiyana herî hêsan jî birêxistinbûnê çêdibe. Hemû hêza min, ji jêhatiya min a birêxistinkirina mirovan pêk tê. Cewhera birêxistinkirinê, mirov ji bo karên rast qanekirine. Vaye hemû hêza me çavkaniya xwe ji vir digire. Hinde mirovên me anîne rewşek wisa, hemû nêzîkbûn di şêwaza jîjo de ne. Weke şêwaza xwe parastina jîjo her tim bi sitiriyên xwe bersivê dide. Mirovên me ji sedî salan ve div ê rewşê de ne. Min ev mirov li ser bingeha hinek rastiyan qane kirin. Min xwe bi wan kesên pir

bibertek û weke sitiriyan da pejirandin. Min bi nêrîna dev ji sitiriyan berdin, xiftanek din li ber xwe bike, em dikarin hîn zêdetir bi mirovî, nerim û feraset bin, qane kir mirovên me birêxistin bikim û hevgihînim. Binêrin, em bi we re jî dimeşin. Ev pêşketinek girînge. Ger yek peyv ji wêje, civaknasî û derûnî fêm kiriba, dê we girîngî û rastiya vê baştir fêm kiriba.

Hûn jî nexasim di nêvenga rêxistinê de dawî li jîjobûnên xwe bînin. Hewce nake weke sitiriyan derdora xwe re biçin. Hûn hatine bidestxistin, ango êdî ne di nêvenga wehşî ya sedî salan de ne. Di vê mijarê de dikare hîn zêdetir tişt bên vegotin. Lê ya rastî ev karê wêjevana ye. Çermê hêştira ku di meşa çolê de neçare xwe li hember germahiya rojê biparêze pir sitûre. Lepên şerên li nav daristanên wehşî pir dijwarin. Hinek mercan hûn jî anîne wê rewşê. Lê niha ev nêveng hatine derbaskirin. Nêvenga me, nêvenga rêhevaltiyê ye. Êdî dev ji wan zirxên we berê girtî berdin. Wê li dijî dijmin bikar bînin, hem jî hîn zêdetir nû bikin wisa biparêzin. Ev pirsgirêkên we hene û ger hûn van pirsgirêkên xwe çareser nekin, negengaze sererast bibin. Ne raste ku hûn bêçaretiya jîjoyekê bi sitiriyekê bibersivînin. Dev ji kesayeta jîjo berdin.

Mirovê zanyar ê herî baldar jî dibêje; “Yek tişta dixwazim heye, ew jî li çiyan meşek gêrîla ya azad pêkanîne.” Ev tê çi wateyê? Nexwe jiyana herî zêde bê xwestin eve. Ango xwarin naxwaze, Ewrûpa, bajar, malbata xwe yan jî civaka xwe naxwaze. Tişta dixwaze meşek gêrîla ya azade. Mirovek zanyar gotina herî rast kiriye. Panzdeh salin di zindanê de maye, bi dehî caran û heta di bin gefa cezayê sedî salan de vê axaftinê dike. Her wiha ew bi xwe jî ne Kurde. Ya herî xweşik çawa dixwaze? Mixabin a hûn jî dikin, meşa azadiyê ye, meşa qereçiya ye, ne diyare. Ya rastî meça qereçiyan jî ya li çolterê bi zewqe. Girêdayî dahûrandina axaftina mirovê zanyar û jiyana qereçiyan dibêjim, teqez divê hûn vê şêwaza xwe sererast bikin.

Em neçarin vê esîlbûna **Mazlûm**’an a di yek hûcreyî de bihizirin. Mînak, li hember axaftinên dijmin ên weke; “Ma çi dibe, xwestek û dilxwaziyek xwe ji bo me bêje, emê pêk bînin”, **Kemal Pîr**’an bersivê didin û dibêjin; “Emê ti carî bersivê nedin ti daxwazên we.” Hûn nikarin van bidin aliyekê, ji ber ev pîrozin. Hûn nikarin daxwazên şerê herî eslî ya nirxên me yên herî cewherî çewt û tevlîhev bikin. Ev hemû hêcetên vê ne: Nesererastbûn, bêçaretî, bêferasetî, bêhêvî, kirêtî, binkeftin, bêrihî û lîstok hewce nakin. Ya ji bo we hewce, ya ku mafê her kesî ye

beramberî serbilindî û kedê ya bê xwestin bi temamî armanca mezin a pê ve bê girêdane. Bi vê armanca mezin ve werin girêdan. Êdî divê hûn dev ji kesayeta bê vîn hatiye hiştin û ne aram berdin. Pêdiviya we heye xwe bigihînin kesayeta serkeftî. Divê hûn dev ji bêçaretî û acizbûnê berdin, xwe bigihînin hêza çareserî û dijwariyê. Ne bi bêfêhmatî, bi têgihiştinek berz ve werin girêdan. Pêdivî û pêwîstiyên di yek çirkeyê de bên fêmkirin hene, xwedî li wan derbikevin. Ger îro hûn bêkêr hiştine, ji dîrokê re bihêlin. Ger îro we tengav û teng dike, hêviya xwe ya di derbarê pêşerojê de dijwar bikin. Ev hemû jî çareserî ne.

Wê dîrok raveya îro bike, dê hêviya pêşerojê jî weke bifirî te bilind bike. Em ne di nava bêçaretî yan jî bêderfetiyan de ne. Bal bidinê, em selmîna vê ya bêhempa ne. Dev ji wê hemû civaka sexte, jiyana sexte hûn jê hatine û bêku ji jin û mêrtiyê bitirsin berdin. Xwe ji zewaca bi hêmanên jiyanê yên herî hêja re amade bikin. Dê ev jî we ji hemû girêdan û tengaviyên we yên sexte rizgar bike. Ti hewceya yek ji van jî nîne. Dê her tişt ji nû ve bi kedê were bidestxistin. Jixwe hûn kedkarin. Lê xwe ji girêdana bi nirxên ku keda we dide windakirin rizgar bikin û bi nirxên baş bi we bide serxistin ve werin girêdan. Jixwe ev jî sosyalîzm bi xwe ye.

Dixwazim van hêcetan tevan ji bo vê bi baldariyek mezin vebêjim: Qet hewce nake xalên weke rewşa dijminê me ya siyasî, aborî û leşkerî wisa ye; bi şerê xwe ya taybet ve wisa êrîşî me dike bên ravekirin. Hûn van pir baş dizanin. Madem dijminê we wisa ye, ger hûn li dijî zehmetiyên jiyanê û ya herî girîng jî li hember şêweyên herî ketî yên koletiya ku nefretê jê dikin bi hêrsin û dixwazin ji vê rizgar bibin, hûn çima derfetên wê yên perwerdê, ked û şerkirinê nanirxînin û nagihin armancên xwe? Hêrsa me ya esasî li hember vê ye. Hûn çima di vir de muhafezekarin, çima di nava tengezariyê de dimînin? Hûn çima pirî caran dikevin rewşên ku bi we û derdora we dide windakirin? Hûn çima destwerdan û hewldanên pir rehet dikarin bikin nakin?

Ti raveya van nîne û hewceyî van jî nake. Di heman demê de bangî we dikim heta dawî bi xwe bawer bin, li hember jiyanê rêzdar bin, weke ji nû ve dayîk bibin silav bidin jiyanê, her çendî bostek jî be wê hewaya axên azad û xweşik ên welatê me bikişînin hinavê xwe. Derfetên ku em vî şerê dimeşînin ser bixin zêde bûne. Çima hûn bi vê re yekbûnek rast pêk nayînin, bi israr fikra; "Ev kar çênabin, şaşî çarenûsin, dev ji

şaşiyan nayê berdan" dijîn? Hemû hêrsa me li dijî vê ye û li vir jî hewl didim vê çareser bikim.

Divê bi qasî êdî newêrin wisa derbikevin pêşberî me û hêcetên vê negerin nebesiyên xwe derbas bikin. Ma dibe ji bo we tiştek ji vê baştir bê hizirîn? Nêzîkbûnên dervî vê radestbûn, xirabkirin û jirêderxistine. Ev jî ne karê we ye. Jirêderxistinê re bûna zemîn jî ne karê we ye. Dîsa berovajî her cure armanc û rêxistinbûna wê ketin jî ne peywira we ye. Peywira we li dijî van derketine. Ne ji van re bûna zemîne, ev zemîn paqijkirine, ne bûna amûre, rihê kesan van dike derxistine. Ev pir zelale. Hûn ji bo van hene.

Hûn mirovên PKK'yîbûn û ARGK'bûnê dixwazine. Peywira we jî li ser vî bingehî ye. Hûnê çima kesên li ser bingeha dijbertiya vê bidin jiyîn? Hûnê çima li hember van pirsgirêkan di nav nebesiyek cidî de bin? Misoger ev nayê parastin. Êdî bi salane bi çalekî û fêlbaziyên xwe ve rewş anîne qonaxek wisa, dibêjin; "Li dijmin nede, li xayînî nede, vêca gêrîla wisa rawestîne û bijî." Ev tiştek tirsnake. Ya hûn vedixwin jehre, ango bence, em dibêjin ger hûn vexwin dê we bikuje. Hûn jî dibêjin; "Ez fêr bûme, çawa nikarim dev ji cixareyê berdim, nikarim dev ji van jî berdim." Rewşa we hinekê wan esrarkêşan bibîr dixe. Ji tasfiyekariyê re bûna zemîn û ketina bin bandora wî de bi vî rengî ye. Ev helwesta we hem şaşe, hem jî pir xeternake.

Ne vale ye van xalên ku destnîşan dikim evqasî bi hêcetan diyar dikim. Nirxên me yên berz hene û dijmin jî di navê de kes ne xwedî wê hêzê ye we bixe nava vê rewşê. Êdî ti îblîs ne xwedî vê fêlbaziyê ye. Netirsin. Netirsîn, ne wêrekiya çors û wêrekiya kore. Behsa wêrekiya bi aqil, wêrekiya tije estetîk û xweşikbûnê dikim. Êdî van hêjayî xwe bibînin û hêdî hêdî xweşik bibin. Ji ber hûn pir dixwazin bên hezkirin û ez jî rêya hezkirinê ya rast şanî we dikim. Rêya hezkirinê ya rast eve. Vê berovajî nekin. Bi şêweyên îblîsî yan jî dijminatî hezkirin nayê bidestxistin. Nemirin jî; derfeta jiyanê ji her demê zêdetire. Serbilind û xweşik li xwedî meşa azadiyê derbikevin. Tişta herî xweşik meşa li çiyayên azadiyê ye.

Hûn îdîa dikin jin bare. Tam berovajî, bi jina azad re jiyîn, nirxa cîhanê ya herî xweşik an jî tiştek ji wê hêjatir nîne ku jinek kole azadiya xwe li çiyan bidest bixe. Ti aliyê vê bibe pirsgirêk û giranî nîne. Hûn weke zilam li vir di nava xwe xapandin û jirêderketinek cidî de ne. Hema bêje hemû fermandarên me dixwazin vê li ser min ferz bikin. Ez

mirovek her roj jiyanê diceribînim û ezmûnan re derbas dikim. Ezê çawa bi derewên we bawer bikim? Çil salin ceribandinê dikim. Hûnê çawa şaşiyan li ser min ferz bikin?

Êdî min mijara bi çi re, çawa tê jiyîn dahûrandiye. Min şer jî wisa dahûrand. Min dahûrandiye ku şer bi çi tê serxistin. Lê hûn vê jî dervî şer dihêlin. Hinek şervanan diçewsînin, ber bi şaşiyan ve diherikînin, dûr dixin û li ser vê jî fermandariyên sexte ferz dikin, bi asta milîtanî û wêrekiya PKK'ê dilîzin. Ev ji dervî şer mayîne. Hûn jî niha bi hemû hêza xwe ve hewl didin vê bi min bidin pejirandin. Ez mirovek, ceribandî, ezmûn kirî û şerê çawa dahûrandî me. Niha ger van fermandaran bigirim, dê çi baxivin? Di vê mijarê de nikarin bi qasî zarokekê jî deng derbixin. Bersiva wan a bi yek peyvê jî dê nebe. Yan bila ev tiştekê nekin û ji me dûr bisekinin, an jî bi fêmkirina rastî û nirxan ve derbikevin pêşberî me. Raveya herî cewherî ya artêşbûnê jî eve.

Ji bo jiyanê û ji bo şer jî tiştên herî xweşik hatine cem hev. Ti wateya berovajîkirina vê nîne. Vaye lîstoka we eve. Bi vî rengî hûn dixwazin min tevlî rastiya xwe ya dervî jiyanê û dervî şer bikin û teqez min tine bikine. Mixabin ew kesên destpêkê xwe xurt didîtin wexta xwestin min bixin bin venêrînê, ji bo min digotin; “Civa hat.” Ango dema digotin civa tişta behsê dikirin ev bû: Ger hûn bixwazin bigirin, nepêkane bê girtin. Dayîka min jî ji bo kesên xwestin min venêrînin ev got. Ma hûnê bi vî halê xwe ve min venêrînin û bixapînin? Yek ji van jî nepêkane.

Piştî ez evqasî xurt bûme, îblîs jî be nikare evqasî pêşberî min xwe biparêze û bêje têk çûye. Xweziya generalek Komara Tirkiyê hebûya û baxiviya, wê zilam teqez radest bibûya. Lê rewşa we jî pir ecêbe. Bi israrim, ezê van helwestan efû nekim. Van tevan ne bi navê xwe, bi navê lehengên mezin dibêjim: Misoger emê bîranîna egîdên bêhempa li ber xwe dane binpê nekin. Wê berxwedaniya bêhempa ya **Mazlum**'an, **Egîd**'an, **Zîlan**'an û **Kemal**'an bînin ber çavên xwe. Hejmara wan hezarî, deh hezarî derbas bû û her yek ji van jî bi rastî jî şahadetên ku pêwîste bibin abîde ne. Her wiha yên li ber xwe didin hene. Li gel vê hêviyên miletek pir mazlum hene. Ev hemû bêhempa ne. Hûn leşkerên vane. Leşkerên van bêhempa dibin. Ev her tim wisa ye. Mafê ti kesî nîne bi ti hêcetê reftarên xwe yên nehêjayî nirxên me raber bikin. Her wiha kes nikare kêmbûnek feraseta ku bêje fêm nekiriye raber bike.

Hinek encamên pir balkêş ên ji van tevan bên derxistin hene.

Dixwazim bidim diyarkirin ew vîna ku dijmin dibêje şikestiye, neşikestiye, kesên bi vîn dilîzin û ji van hewldanan re dibin amûr di nava hewldanek vale de ne û di rêya şaş de ne. Dixwazim bidim diyarkirin li vir şer û vîna şervan çiqas saxleme û dev ji şikestinê berdin, hîn zêdetir bi lêdanê bûye pola. Encama ku ji bo we ji vir bê derxistin, bûna leşkerê naşke, yê vîna neşikestiye. Artêşbûna rasteqîn û gava yekem avêtina nav gêrîla wisa ye.

Hûn soz didin. Ez dixwazim misoger wate bidim ev soz di vê çarçoveyê de ye û wisa bibim hêza bersivdanê. Dixwazim bidim diyarkirin bi qasî pê neyê lîstin dijware, bi qasî neyê fêmkirin ne tevlîheve û pir zelale. Kesên feraseta wan teng û kêm bi hêza ferasetek berz ve bi qasî nehilweşe û xirab nebe bi şêweyek zelal dixwazim dijwar bikim. Di vê manê de dixwazim bêjim xwedî li peywirên xwe derdikevim û dîsa feraseta min a peywirê pir zelale. Dixwazim li ser vî bingehî rêhevaltiya peywirê di vê çarçoveyê de raber bikim. Plansaziyên şênber jî, karên hûn rehetî dikari bikine. Di derbarê şer û jiyana çawa de zêde naxwazim bersivan bidim. Ev karên pir berfireh hatine destnîşankirinin. Ji bo hinek din kûranî û yên kêm mayîn bên zelalkirin van destnîşan dikim. Ji bo em pêvajo bi serkeftî bikin hêcetên xwe rêz dikim. Hûnê girêdana bi sozê bi qasî ti şêweyî ji rê dernexin ji bo zelalkirin û xurtkirinê, nexasim kesên ku dixwazin ji nû ve bi karên fermandeya partiyê ve bên girêdan, ji bo ji neyêniyan re bibin hêza çareserî û hem jî dê tiştên nû çawa bigirin û bixin meriyetê de nîşan bikim, xalên nû û hinek din kûrtir ronî dikim.

Li ser vî bingehî şer pêşî di ferasetê de tê serxistin. Ger asta rihî, asta feraset ne di radeya serxistina şerekî de be, negengaze yek rabe pratîkek saxlem pêk bîne. Lewra em pêşî dixwazin şer di feraset û rihê we de ser bixin. Ya dimîne pratîke, jixwe hêza we têra xwe ji bo vê heye. Dibe ku ji ber bêderfetiyan windahî jî çêbin. Ez nabêjim dê teqez her tişt bê serxistin. Lê kesê di vê helwestê de israr dike, ger qeza û belayek cidî nebe, dê hêsan winda neke, bikare bi vê berpirsyarî bike. Dixwazim bêjim soza we ya serkeftinê jî ancex bi vê pêk tê û cewhera hemû şêwaza we jî eve.

**6 Kanûn 1997**

## KESAYETA QADRO RÊXISTINBÛNA GEL A LÊHÛRBÛYÎ YE

Heta ku rastiya me ya li nav partiyê rast neyê têgihiştin û em nebin raveya wê ya pêdiviyên wê yên rêxistinî, negengaze mirov bibe xwedî pratîkek hevgirtî. Wexta em hewl didin şerê rizgariya netewî li her eniyê bi hemû rêbazan ve bimeşînin, weke hêza jêneveger pêşengiya partiyê û rêxistina wê ya esasî, nexasim hêza wê ya rêveberî di hemû xebatan de xwedî rolek jêneveger a diyarkere. Heta di pêvajoyên têkoşînê yên wisa şerê xetê tê de kûr dibê jî ya esasî feraseta rêxistinê û aliyê wê jî yê herî girîng dê xwe di şêwaza wê ya xebatê de bide der.

Xeta giştî partiya me ya siyasî û leşkerî di rêjeyek mezin de hem berzbûn bidest xistiye, hem jî serkeftin saz kiriye. Nîqaşên me meşandin ne li ser vî bingehî ne. Dîsa di wateya gelemperî de têkoşîn dayîn ne pirsgirêkek cidî ye. Mirov nikare bêje ji hêla PKK’ê ve pirsgirêka derfetan jî heye. Her kesê dixwaze xwedî derfetên her cure xebatê ye. Pirsgirêk çavkaniya xwe ji vir nagire. Cewhera pirsgirêkên di nava PKK’ê de, ji destpêkê heta roja me her ku diçe bi şêweyek hûrûkûr nepêkhatina polîtîka qadrobûnê û şêwaza xebata wê ya rêxistinî ye û di vir de jî her tim pirsgirêkên kesayetî derxistina pêşe. Astek rêveberî di nava xwe de yan li hember jor yan jî li hember jêr bêku xurt beramber erkên xwe serwer be her tim gazincan dike û helwestên tawandar dike nîşan dide. Bêguman ev jî weke pirsgirêka herî bingehîn derdikeve pêşberî me. Nexasim di vê pêvajoya em dijîn de, têkoşîna me ya navxweyî ku ya pêşî ye ji vê hêlê ve ye.

Demek dirêje em bi ser biryargehên welat de diçin. Ya ku navenda partî jî hewl dide çareser bike, ev rastiya qadro ya nebes û hema bêje weke xalek berxwedêrek dijber nikare xwe ji vê rewşê rizgar bike ye. Êdî pirsgirêk ji bûna pirsgirêka perwerdeyê derbas dikin. Di vir de çiqas xeta têkoşînê ve girêdayî ye yan na, weke şêwaza pratîkî pir balkêş derdikeve holê. Kesê cîhana xwe ya hundurîn nedahûrandî, nediyare di asta niyet û biryarê de çiqas cewherî beşdarî têkoşînê dibe û çiqas baweriya xwe bi serkeftinê heye, vê zelal nake, heta bêku di ferqê de be dibe ku ji bo hinek daxwazên xwe yên kesî beşdarî têkoşînê bûye yan jî di encama hinek bandorên bi duruşmeyên giştî beşdar bûye gelek hêman, di encama nexasim baweriyek paşketî û şêwazek ferdperest de

mezin dibin, ew xisletên kesayetî yên ku ji civakê girtine, wexta li feraset û rastiya balkêş ên qadro ku aîdê kesayeta lehengiya partiya me ne dikevin yekser nasnameya xwe dide der û kesayeta çîna wî ya rasteqîn derdikeve holê. Kurtasî rastiya partiya me ya qadro û rêxistinê, çi nû yan jî kevin dibe, dîsa çi li nav welat an jî dervî welat dibe, li kuderê dibe bila be, weke raveya lêhûrbûna kes di politikaya partiyê de û raveya wê jî ya hîn zêdetir lêhûrbûyî di nava xeta wê ya leşkerî de çiqas dixwaze cîh bigire hemûyê nîşan dide.

Mixabin ew xisleta paşketî ku ya gelemperiya civakê ye, kesayeta rastiya xwe zêde înkar dike û ne di ferqê de ye çiqas wate dide vê rastiya xwe, rastiyeke ji dijmin zêdetir me tengav dike. Tişta em li vir beramber tên, bi zanebûn kirine wêdetir, rastiyek pir bi êşe. Ji ber ev kesayet wate nade rastiya xwe ya netewî û çînayetî, di nava wê de nahele û di sînorên bişaftinê mayînê de israrkirin, weke heyî xwe li ser rastiya bîrdozî û polîtîk û weke şêweya herî balkêş wî baş derdixe holê rastiya rêxistinê ferz dike. Ji ber nabe xwedî ferasetek rêxistin û rêveberiyê, wate nade kesayeta hem netewî, hem jî çînayetî, ger wate bide jî hewcedariyên wê bi xwe re serwer nake, divê weke rastiyek xwe dide dest bê dîtin. Ger kesek nikare xeta rêxistinê ji jêr heta jor di hemû xebatan de serwer bike û hewldana vê jî bi hostatiyek mezin bimeşîne, partîparêziya wî kesî bigumane yan jî li ser bingeha jirêderxistinek oportonîste. Ti eleqeya vê jî bi niyeta baş û hewldanên çors ve jî nîne.

Hemû mamoste dibêjin ku şoreşgeriya herî çetîn rêxistinbûne. Zêde nakeve çav, lê xebata herî zêde encam digire hewce dike bi şêweyek rikdar bê meşandin, bêguman avakirina kesayeta rêxistinê ye. Ya rastî xisleta şoreşê ya herî diyarker jî misoger girêdayî kesayeta rêxistinê ye. **Lenîn,** bi xwe yekser vê dibêje. Tişta bi me re jî qet neyî, ev kesayeta rêxistinê ye. Heta dijberiya rêxistinê li cem me hema bêje di radeya herî bilind de ye. Elbet sedema nepêşketina kesayeta rêxistinparêz jî, ji bo şoreşê xeteriya herî mezine. Dikare bê gotin, niha xala partiyê ya herî lewaz, ji kesayeta rêxistinê re nebûna bersive. Hewldanên me yên bi vî rengî ji aliyên kesên herî niyetbaş û xwe partiyî didin diyarkirin ve, bi nêzîkbûnên ji gelek aliyan ve jirêderketî zehmetiyê ava dike.

Me hemû hewldana xwe ji bo derbaskirina vê kir. Di salên dawî de, ji destpêka têkoşînê heta roja me, pir eşkere ye hewldana me ya herî mezin avakirina qadro û hewldana perwerdekirina qadro ye. Nexasim di van salên dawî de tam bûye rewşek hesabxwestinê yan jî ji hesabê jî

wêdetir, bûye pirsgirêkek herî giran em neçarin her tim li ser rawestin. Ger em vê avaniya qadro bi vî halî ve bihêlin, em ji parçekirina rêxistinê bigirin heta nêzîkbûnên dijminatî yên ji şoreşê re, hem ji binpêkirina derfetên heyî bigirin heta pêşkêşkirina dijmin, dê rê ji gelek encaman re veke. Ji niyet jî wêdetir, bi binyata kesayetên xwe yên heyî ve, qadro heta dawî ji vê rastiyê re vekirîne. Ger tevdîrên me girtîn nebin, bi rastî jî dê ev kesayet di encama van qelsiyên xwe de binkeftinê bi xwe re bînin.

Ger bal bidin ser xebatên salên dawî û dahûrîn bên şopandin wê bê dîtin, nepêkanîna rêxistinbûna partîbûnê, li welat di nava xebatên şer de bi şêweyek zêde tê jiyîn. Dîsa li dervî welat, nexasim nav xebatên li Ewrûpa, ya her tim vale tê hiştin û heqê wê naye dayîn jî, kesayet û şêwaza rêxistinî ya partiyê ye. Kesayeta nebes her tim xwe li vir vedişêre, xwe bi yek kesî dike. Çi di ferqê de bin, çi nebin, takekesbûn di rastiyê de şêwazek çînayetî ye. Di karên partiyê de nepêkanîna hevbeşiyê, kêmasî çi dibin bila be, li şûna vê bi rêxistinê re derbas bike û xurt bibe, vê weke firsendekê dibîne her tim di bin yek kesî mayînê de nêzîkbûna wî ya çînayetî heye. Bi vê nêzîkbûnê dixwaze rêya erzan û dibe ku ne di ferqê de jî, li ser ked û hewldanan xwe bigihîne hêzek raye. Dixwaze vê jî bîne rewşek şerê desthilatî. Dema nagihe vê jî, tekbûnê hîn zêdetir kûr dike, ti quralên rêxistinê pêk nayîne, dîsîplîna rêxistinê berçav nagire, yan dixeyîde, ya bi rêbazên çors ve diçewsîne, yan jî kar jixweber dihêle terkî her cure sosretê dike û bi vî rengî jî darbeya xwe ya çînayetî li xala herî jiyanî ya partiyê dixe û ev jî lewazbûnê ava dike. Dîsa ji bo xweperestiya xwe rêya yekane vê dibîne û her tim dixwaze xwe wisa bide jiyîn.

Wateya vê ya çînayetî, misoger anarşîzma burjuvaziya biçûk a înkarger û dîsa bi vê re nava hevkariyê de nêzîkbûna malbata feodali ye. Kesayetê nekariye dervî vê derbikeve, rastiya netewî û siyasî tênegihiştî, hebûna xwe bi wê têr nekirî, neçare takekes be. Di takekesbûnê de nepêkanîna esasên kargeriya rêxistinê, pêk bîne jî di axaftinê de pêk tîne û her tim xirabkirina esasên kargeriyê heye. Di nava me de ev rewş hat radeyek wisa, hema bêje yên di asta herî jor de jî di vê mijarê de lihev dikin. Weke gelek caran bilêv dikim, hewce dike mirov ji bo vê pêvajoyê jî vebêje, derket holê li ber çavan yên zêde bi hev re nakokin, herî zêde ew bi rêbazên xwe hevdu xwedî dikin. Ne ji ber ku nakokiyên wan cuda ne, ji ber xweperestiya wan hevdu teng dike yan jî

xweperestiya her yekê li pêş yê din astengiyê çêdike. Ango di cewher de heman tiştin.

Jixwe sedema herî girîng a tevlîheviya di civaka me ferdperestî û xweperestine. Ev ferdperestiyên di radeyek zêde de, ango hêj negihiştîn pîvanên kapîtalîzmê jî ewqas paşverû ne. Dibe ku hûn vê ferq nekin, lê hemû liv û tevgerên we, we didin dest. Her çendî hûn di nava nêzîkbûnên hestiyar ên jidil de bin bila be yan jî çiqas bertek nêz dibin bila be, yek wateya van reftarên we heye, ew jî nepêkanîna rastiya PKK'ê ya rêxistinî ye. Ev rewş li nav gêrîla jî zêde tê jiyîn û ev ne tiştek neyê zanîne. Ji bo kesek di vê rewşê de fermandarbûn, girêdayî şêwaza çand û pêşketinê, vê ji xwe re firsendek ku êdî nayê dîtin dibîne. Şerim nake her cure mafî bixwaze, li dijî hema her tiştê rêxistinê derbikeve, ji bo paşatiya rojekê hewce bike dê hebûnên herî hêja bavêje nav agir. Em jî bi hemû keda xwe ve hewl didin pêşî li vê bigirin.

Di dahûrînan de esasî ev jî hatine destgirtin. Di hinekan de ev balkêşe. Lê di serî de Biryargeha Navendî, em tundî bi ser hemû Biryargehên li welat de jî çûn. Bêguman li wir, ji ber çekên di destê wan de yan jî bi bandora hoveber a qadên çolterê hinek din zêdetir dervî rêxistinê dimînin. Lê dema vê dikin jî bi qasî nekarin xwe veşêrin zêdetir di bin venêrînê de ne. Xebatên me ji vê hêlê ve jî tên meşandin.

Em dikarin xebatên Ewrûpa jî weke mînak binirxînin. Di dahûrînên dawî de em dikarin vê bibînin. Ger em rewşên hûn dijîn hîn şênbertir bigirin dest, çi hêmana rêvebirina navendê ya beriya niha, biryara siyasî ya xwestin dawî pêş bixin û çi jî cudabûna xebatên bîroyek giraniya xwe karê venêrînê dike û bîroya pratîkên rêxistinî bi kûranî nefêmkirin û di encama em nexistina meriyetê de, derfeta xebatên bêhempa nehatina nirxandin, sedema van kesayetan pêk nehatiye. Di derbarê her qadê de bûna xwedî xebatê nehatiye astengkirin, ev siûd ji her kesî re hatiye dayîn. Em ji lojîstîkê bigirin, heta operasyonên dijmin her tim pêş dixe, li welat zehmetî tên jiyîn. Lê ev ji bo Ewrûpa jî îdîakirin, nexasim behsa kêmbûna derfetan kirin, qet negengaze. Lê bal bidinê, ji jor heta ber bi jêr ve ji rêxistinbûnê revek heye û nepêkanîna hewcedariyên wê heye.

Qinyata min ti eleqeya vê zêde bi perwerdeyê re jî nîne. Ji ber derfetên herî baş ên xwe perwerdekirinê li wir hene. Kesê ku kûranî girêdayî xetê, nabe ku nekare xwe perwerde bike. Weke pirî caran hatî gotin pirsgirêk, ne nebesiya perwerdeyê ye. Nebesiya perwerdeyê jî, girêdayî bê îdîabûna di mijara kesayet de ye. Kesê îdîaya wî heyî, ti carî

dev ji xwe perwerdekirinê bernade û pir xwedî dane ye. Qadroyên li Ewrûpa, bi qasî dixwazin dikarin pîvanên rêxistinî yên rast bidest bixin. Lê qet naxwazin behsa van jî bikin. Di pratîka hemû qadroyên pêşeng de tişta xwe dide der, xwe di ferdperestiyê de fetisandine. Heta li ser bingeha dijbertiya hev jî bin, aliyê esasî, her kes dixwaze bi tenê bimîne. Dibêje; "Bila xebatek hebe, ew jî ya min be." Bes xalek pir xeter a li vir nehatî ferqkirin heye. Nepeniya vî karî jî partîbûne û kî çiqas beşdar dike. Feraseta; "Bila xebat hebe, ew jî ya min be", di rastiyê de xwe li hember partîbûnê girtine û ev jî jirêderketinek herî bingehîne ku bê jiyîn.

Bi takekes an jî asoyên xwe, bendewarî û sînorên daxwazên xwe ve bi ser xebatan de çûyîn, ger xebat li ser vî bingehî be pejirandin, ne wisa be protestokirin, xwe xeyîdandin û dana aliyekê, şêwaza herî oportînîstî ya li hember rêxistinê tê pêşxistine. Rewşa giranî hûn dijîn jî wisa ye. Em li vir behsa hewldana niyeta baş nakin. Tişta em behsê dikin xwe nêzî hewldan û kesayetek saxlem a rêxistinê nekirine. Li cihek weke Kurdistanê, ya rastî mirovê herî zorê dibin yek ên keda herî cewherî yekbûna wan sazkirin nabe bê paşçavkirin. Dibe ku şêwaza mezinbûna we pir pêşketî be, dibe ku êdî hûn xwedî dane jî bin. Lê belê ger hûn vê zêde bi mirovên herî paşketî yên li dijî rêxistinê re jî parve nekin, ya dibe hûnê bibin xwedî helwestên bi ferdperestiya polîtîkayên parçe bike-birêve bibe re bi ferzkarî tê meşandin û pêşxistin.

Hûn neçarin bizanin şoreşgeriya herî mezin şoreşgeriya rêxistinê ye û cewhera vê jî yekbûna kesên ku zehmete bibin yek sazkirine û şoreşgeriya girêdayî vê hêz bide ye. Di navbera we de ev jî nîne. Yên hewce ya hûn bi wan re bibin yek nabin, her çendî di navbera we de nakokî û bertek jî hebin, ji bo pirsgirêkên rêxistinê, nexasim xebatên polîtîk ên girîng serkeftî bên meşandin, hûn li hember ya esasî eleqe jî raber nakin. Dixwazim vê bêjim, her yek ji we ne partiyîyek baş û rêxistingerên başin. Berovajî, hûn nêzî hilweşînê ne û ev jî rewşek pir xetere.

Şêwaza rêxistinê, şêwaza ez dikime. Em mirovên xwe bêku bêjin malbat, êl û binemal, mezhep, hema ji her cihî digirin, perwerde dikin û hewl didin bikin yek. Bal bidinê, ji sedî nod xebatên min ji bo vê ye û fêmkirina vê jî nezehmete. Sedema vê jî eve: Dijmin binyata civakî wêrankirinê ve vîn û mejiyê mirov parçe kiriye, heta dijberî hevdu pir xeternak ava kiriye. Di vir de ferdperestiyek mezin, heta takekesiyek ber

bi înkarê ve diçe heye û ji ber ev jî serdestiya dijmin a teqez ava dike, xelekek zêde balkêş dixe derxistiye holê. Dibe ku hûn kûranî ferq nakin, lê ya bi we re xwe dide der ev rastiya xwe heta li nava rêxistinê dide ravekirine.

### Kesayeta PKK'ê Kesayeta Ku Hemû Nakokiyên Gel Di Dil Û Mejiyê Xwe De Bi Sentez Dike

Çawa ku Barzanî û Talabanî xwe nadin ber yekîtiya netewî, di nava partiyê de jî xwe nedana ber kesayeta rêxistinî jî encama vê çanda civakî ye. Divê li vir niyeta baş neyê gerîn. Rastiya civakî vê pirsgirêkê ava dike. Miletê me bi yekîtî rabûye ser lingan, ji şivanê serê çiyê heta profesorê wî, dikare bê gotin yekîtiyek her kesî xwezî lê tîne hatiye avakirin. Lê em pêkhatinek wisa ya dervî me danin aliyekê, gelo hûn dikarin yekîtiya rêxistinî ya di nava partiyê de pêk bînin? Ger nikarin pêk bînin, zemîna vê jî şêwaza çêbûna we ye. Ger komek ehbap-çawişên we hebin, hûnê pir baş bi wan re lihev bikin, bes bila alîgirê we bin. Lê em yekbûna milyonan saz dikin. Heta yên herî xeternak û bi zorê yekbûnê pêk tînin jî tînin cem hev.

Xebata herî encamgir, xebata rêxistinê ye. Ew nebe misoger tiştek nayê serxistin. Mînak ji bo avakirina çavkaniyên hêzê, elementan tînin cem hev. Bombeya hidrojen a xwedî enerjiya herî xurte bi hevgihîna elementan ve saz dibe. Encama vê hevgihînê jî hêz çêdibe. Em jî endamên partiya me yên bi zorê yekbûnê pêk bînin, bihev digihînin û hewl didin hêzê derbixin holê. Mixabin hûn, li hember yekbûnê şer dikin. Bi ehbap-çawişî û her tim avakirina aliyekê ve, hemû hewldanên me yên yekbûnê bi pratîka xwe vale derdixin. Aliyê we yê xeter di vir de ye. Her çendî hûn pêşve jî biçin, çiqas derfet ji we re bê dayîn, rewşa ku ji bo bûna hêz hûn li ser van saz dikin, keyfî û takekesî ye, ev jî berovajî rola partiya me ya dîrokî ye.

Dibe ku pirsgirêkên we yên kesî hebin, dibe ku mafê we ya jiyana takekesî jî hebe. Bi rastî jî mafê we ye hûn xwe bijîn. Nexasim li cihek weke Ewrûpa xweperestiya her kes di hemû şaneyên xwe de dijî, çavlêkirina jiyanek bi vî rengî ecêb nabînim. Jixwe, jiyana di nava PKK'ê de ne wisa ye. Di şêwazek tam xwe gihandina jiyanek hevbeş de ye. Dibe ku vê heta dawî hûn tengav kiribin. Dibe ku firseta em nadin

kes xisleta xwe jiyînê ya herî xwezayî rihê we sitandibe. Dibe ku mafê kes a bi şêweya xweperestî jiyînê jî hebe. Van tevan fêm dikim. Ev gelek caran hatin rexnekirin jî. Nîqaşa gelo mafê kes ê jiyînê heye yan nîne jî pir hatin meşandin. Van tevan dipejirînim. Lê xwesteka we ya ku van bipejirînim berovajî rêxistinê ye. Ango bi qasî em rêxistinbûnek li ser bingeha miletekî ne.

Kesayeta qadro, ya rastî rêxistinbûna lêhûrbûyî ya milete. Êdî di vir de kes tenê nîne. Şêwaza min a herî mezin, gelparêzek herî zêde lêhûrbûyî me. Ji ber raveya wê ya bîrdozî û rêxistinî me, ev aliyê me pir caran tê gotin û dibe ku aliyê me yê herî xurt be. PKK bi xwe wisa ye. Hûn nikarin PKK’ê cuda li gorî xwe pênase bikin. Kesayetê ku hemû nakokiyên di nava milet de, di dil û mejiyê xwe de sentez dike, kesayetê PKK’ê yê birêxistinkirî ye. Vaye hûn jî xwe nêzî vê nakin û bertek raber dikin. Hûn bi PKK’ê re ne di nava girêdanek sereke de ne, ne di nava girêdanek eniyê de ne. Lewra cudabûna sempatizan û eniyê, dibe ku ji derdê gelek ji we re bibe derman û ez vê jî ecêb nabînim.

Ger hêza we vê têkoşînê ranake, karê dijminan nekin. Nebin weke kesên direvin û dixwazin me tengaz vikin. Ger hûn dihizirin hêza we têra rastiya rêxistinê ya mezin nake, bi giranî weke sempatîzanek rewşenbîr bijîn. Lê bi rastî ger girêdanek we ya jidil hebe, em dikarin ji pirsgirêkên hinekan re çareserî jî bibînin. Heta ger hûn hîn pêşdetir biçin û bêjin; “Ezê bibim milîtanê partiyê, heta ezê bibim rayedarek di asta herî bilind de, lê ezê ti hewcedariya vê ya rêxistinî jî pêk neyînim”, ev helwesta we li hember kesayeta partî ya rêxistinî şereke. Herdu bi hev re nabe. Yan hûnê xwe bigihînin pêdiviyên qadroyên esasî, yan jî hûnê raye û berpirsyariyê rast bikar bînin. Ger hûn zêde nabin qadroyên esasî, nexwe weke dostekê, sempatîzanekê emê mafê jiyana takekesî bidin û hûn jî teşe bidin xwe. Zêde rêyek din nahizirim.

Niha hewl didim di asta sereke de karên PKK’ê bimeşînim. Tevî dixwazim bi perwerdeyek mezin ve hema hema her kesî bikim qadro, hêj em negihiştine serkeftina em dixwazin. Dixwazim bêjim ku di vê mijarê de zehmetiyê jî dijîm. Divê hûn van tevan fêm bikin. Misoger bawer dikim ku, mafê we yê jiyana takekesî heye. Lê bawer dikim ku, ji bo PKK’ê, ji bo milet jî karê rêxistinê hewce ye. Ez bi we re herduyan jî dibînim û hewce dike herdu jî rast bên fêmkirin û ji hev cudakirin. We heta niha hewl da herduyan bi hev re bimeşînin. Ancex dê cudabûnek wisa pêş bikeve û neçare jî bê pêşxistin.

Ji kesek ku binyata kesayeta wî nayê rêxistinbûnê yan jî paşverû û ne di ferqa karên rêxistinê de ye, peywira qadro û milîtanî tê dayîn. Elbet ew jî li ser û çavên xwe dide. Bes her carê jî tê gotin dê pêş bikevin û ezmûnan bidest bixin. Bi vî rengî pirsgirêk, weke xweperestiya her kes dijî derdikeve pêşberî me. Ev jî dibe. Ji bo hûn wisa dikin, we bi tawana herî giran ve jî mehkum nakim. Ji ber we di nava PKK'ê de kesayeta rêxistinî ya pir kêm kes dikarin pêk bînin û we kesayeta polîtîk ne jiya jî em we mehkum nakin. Lê divê bê zanîn negengaze em pêdiviyek wisa jî paşçav bikin û şerkertiya herî mezin a di roja me de jî, şerkertiya li gorî quralên rêxistinê ye. Nexasim ger di vê civakê de rêxistinparêzên xurt hebûna, wê demê dê serkeftinên me jî qat bi qat ji rewşa heyî berztir bûna. Ev ji bo hemû qadan derbasdare. Pirsgirêka herî bingehîn a gelek qadên me, di meriyetê de rêxistinparêzên rast tine ne.

Rêxistinparêziya rast kesayeta bihêze. Hinde vîn û zanebûna van kesayetan dijwar û hevgirtî ye, dikare weke lehengên rasteqîn ên şer bên nirxandin. Bi we re jî her cure helwestên weke xweperestiya xwe ya kevnar jiyan dihesibîne, qet dev ji tekbûnê bernade, hewl nade yekbûnê bi ya zehmet re saz bike, li şûna vê ehbap-çawişiyê saz dike, pêwendiyên bersivê dide hest û hişmendiya we û li gorî fermiyetê ne guncav pêş dikevin. Heta ev dikarin we têr bikin. Lê di nava rêxistinê de ev helwest xeterin. Ger van xalên me destnîşan kirî bikarin serkeftî pêk bînin dê pêşketin jî rû bidin. Na ger berovajî vê hûn bêjin; "Her tişt pir başe, her kes pir xweşike, her tişt pir di cîh de ye" û xebatê rawestînin ev pir xetere. Jixwe ya dijmin jî li bende ma ne tasfiyegerî ye? Yek bi zorê ji aliyê dijmin ve tê kirin, ya din jî ji ber kesayetên tevlî rêxistinê nabin jixweber tê kirin. Ancex di encamê de herdu jî diçin heman derî.

Vê nirxandina giştî tenê ji bo asta bîroyên navendî nabêjim. Gelek qadroyên me yên li qadan ku mirov dikare bêje pisporin, divê pergala xwe ya xebatê li gorî pîvanên lêhûrbûna partî ya giştî ber çavan re derbas bikin. Min ji destpêkê heta roja me hewl da pir bi îdîa bim. Bêku rastiya we zêde berçav bigirim erk da we, hêvî da we. Heta min hûn xistin nava ezmûnek pir zehmet û bi êş û we pir jî zehmetî jiya. Li gorî min êdî ji ber pêvajoyê hewce nake ev rêbaz û ev feraset bi rikdarî bê domandin. Ger ya hûn dixwazin liberalîzme dikarin bijîn û ev ne tiştek pir xetere jî. Yeqîn dikim çep û rastê kêleka rizgariya netewî jî ji quncekekê ve hinek tişt kirin mirov ji xayîntiyek herî ketî xilas dike. Bi vî rengî dibe ku jêhatiyên we di wateya takekesî de rê ji hinek

tevkariyên girîng re jî veke. Her wiha hûnê vê paşverûtî, ketîbûn û sekna xwe ya bi hêrs jî derbas bikin. Yeqîn dikim dê rê vebin û hinek din ên we nekirine pêk bînin. Bi vî rengî dikarin karê we jî hêsan bikin. Di derbarê pêvajoyê de pêşbîniya min a hinek xalan wisa ye.

Ber bi Kongreya 6. a partiya me ve û bi her biryargehê me re li qadên me yên xebatê lidarxistina konferansên salê re, mirov dikare di derbarê rastiya rêxistinî de van nirxandinan bike. Hewl didim van bi xetê giştî ve ji we re jî vebêjim. Di pêvajoya pey vê de em dikarin ber bi konferansekê ve biçin. Hûn di astek wisa de ne, pir rehet dikarin asta konferansbûna di gelemperiya welat de bidest bixin. Hem perwerdeyên berfireh we dîtin, hem xebatên din, berfirehiya rojeva konferansek wisa destnîşan dike. Lê nabe peywirên pratîkî jî bên paşçavkirin. Ne tengkirina peywiran an jî dervî peywiran mayîn, berovajî dikarin peywirdariyên hîn watedar pêk bînin. Biryarên ku biryargeha navendî girtîn hene. Elbet mirov dikare navendê jî bihesibîne û tevî rexneyên me kirine mafê wan heye biryarê bigirin. Em neçarim li hember biryarên navenda xwe rêzdar bim.

Ji vir û şûn de bersiva rexneyên me, bêguman divê ji bo pêşxistina asta biryara navendî be. Bi feraseta rêveberiyek awarte ve, min hewl da ji bo we tevan hêzek rêveberî saz bikim. Mirov nikare bêje qet feydeya vê çênebû, ya rastî pir pêşveçûyî bû. Ancex xala herî zêde me rexne kirî di rewşa navendbûnê de li ser bingeha van rexneyan ji bo hinek din xurt bikin, emê li hember biryar girtin û derfeta pêkana vê saziyê rêzdar bin. Qet nebê divê ji bo kesên di vî karî de bi îdîa ne, siûdekê bidim û alîkar bim. Bi rayeyên yekser girêdayî min ve tevgerîn we û gelek navendên me jî tengav dike. Ev ber bi fedekariyek zêde ve şandin bi qasî xeternake, ferasetên van zêde xeternak ên weke jiyana girêdayî dogmatîzmê jî hene. Mînak feraseta tasfiyekariya di gêrîla de dibe asta herî jor, Rêbertî kirina Xweda û nebî ye. Lê belê şerê berxwedaniya wî ya ku jiyana xwe tê de feda kirî, ji aliyê herî jiyanî ve valederxistinê jî şerim nake. Xulase di mercên herî zehmet de Rêbertî weke çavkaniya hêza herî mezin dîtin û paşê jî ew çewtkirin heye. Ev di heman demê de rastiya ku gelek ji wan dijî ye.

Mixabin ji ber qadro bi salan di nava pergalê de jiyan kir, feraseta wan a baweriyê seqete. Ev dişibe feraseta gundiyekê ya Xweda û nebî yan jî baweriya li hember axayê eşîrekê tê raberkirin. Ji bo min jî raberkirina nêzîkbûnên wisa nayê pejirandin. Di bingeha feraseta

baweriya min de, xebata rêxistina rast heye. Ev nebe, dixwazim bêjim baweriya heyî jî zerarê dide. Hewl didim vê derbas bikim. Ya rastî min di vê mijarê de bawerî da we. Salên dirêj jî bi vê baweriyê jiyîna we, ne xirabe. Lê divê êdî hêdî hêdî hûn jî bikarin girêdayî hêza xwe ya cewherî li ser lingên xwe bimeşin. Dîsa dikarin bi min bawer bin, ezê dîsa pişgiriyê bidim we, ancex êdî divê hûn wateyek kûr bidin û vê xirab bikar neyînin. Ji kûranî wate dayîn, tê wateya pîvanbûn û bizane çawa bersivê bide ye. Ger ev çêbe dê feraseta rêzdariyek rast pêş bikeve. Xwezayî di hundurê we de çi hebe, jêhatiyên we çibin hemû derbikevin holê. Bêguman ev hîn zêdetir dikare rolek jiyanî bilîze.

Kurtasî şêwaza bi rastiya Rêbertiyê ve girêdanbûnê, jêhatiyên we yên girîng hîn zêdetir derxistina holê yan jî ger jêhatiyên we hebin jî ser wan negirtine. Bi vî rengî rê vedikim ku hûn weke heyî xwe bidin der. Ancex ev, nayê wê wateyê ku rola Rêbertiyê hewce nake. Wê dîsa Rêbertî hewce be. Em di gorê de jî bin, emê dîsa jî rola xwe bilîzin. Lê ne bi ferdperestî, rola rasteqîn a kes û rola qadro ya weke kesayeta rêber rast derxistina holê jî, herî kêm bi qasî rêbertî girînge. Vaye pêvajo, pêvajoyek wisa ye. We vedixwînim hûn pêvajoyek wisa bidest bixin. Emê dîsa weke rêber rola xwe bilîzin. Rola ku hewce dike hûn jî bilîzin, pîvan, çarçove, şêwaz û tempoya wê ya rasteqîn diyare. Li ser vî bingehî êdî divê hûn rewşên hema bêje zaroktiyê rave dikin û êdî nayên sebirkirin çareser bikin, çareseriya herî baş di nava xwe de pêk bînin. Bi vî rengî çiqas tiştên hûn pêşkêş bikin hebin ji wê re derî vekirin û bi wê xwe meşandin hem pir dereng maye, hem jî weke peywirek nayê taloqkirin li pêş we radiweste.

Di roniya van nirxandinan de, gelek nêzîkbûnên we yên bersivê nadin rêxistinê diyar dikim û we bi we re rûbirû dihêlim. We bi rastiya rêxistinê re rûbibû dihêlim. Van tevan tenê ji bo komek kesên navê wan derbas dibe nabêjim. Hemû qadroyên jêr jî di navê de, hemû qadroyên me bi rastiya rêxistinê re rûbirû hiştin û di vê mijarê de pêşxistina nûbûnekê ji bo me heta dawî girînge. Êdî kar hatine vê qonaxê. Mînak, kesek ku kar û barê wî tenê xwarin û vexwarin jî rapor ji min re dinivîse û dibêje; "Vî kesî ser çavên min bavêje." Çûye şer, li wir jî kêrî tiştekê nehatiye û seqet bûye. Bi salan, bi gelek bendewariyên bêserûber ve jiya ye û her ku bêhna wî teng dibe xwe li ser her kesê derdikeve pêşberî wî ferz dike. Yek kesê tawanbar nekirî nemaye û herî dawî jî tê xwe li min dide. Bêguman vê mijarê ti carî sivik nagirim dest. Ev kesayet kî bin û li

kur bin bila be, dixwazin ez dev ji PKK'ê berdim û dawî li têkoşînê bînim. Gelo ne seqet bûya dê çibûya? Xwe sipartina van û wisa jiyîn ne raste. Ya herî rast wateya wê bi kûranî zanîn û wisa jiyîne. Ancex bêku bi nêvengê re zêde ahengê bijî, xwe dispêre vê rewşa xwe, di nava şepirzetiyê de jiyîn dibe kedxwariya kedê.

Wexta em van xalan tevan berçav digirin, divê hûn bizanin feraseta rêxistinê ya rast û şêwaza xebatê, çeka me ya herî başe. Pêwîste em van jî her dayîm di hemû xebatên xwe de ji bo serkeftin û bidestxistinê bikar bînin. Xala herî bingehîn ezê jêvenegerim jî eve. Hûn li ser min çi ferz dikin bikin, çiqas bi ser min de bên werin, ancex a ji bo me jênevegere, ji rastiya rêxistinî û rêveberiya vê ya rast tawîz dayînê ji me nexwazin. Ger hûn di van helwestên xwe de israr bikin, ezê dijwar bi we re şer bikim û heta dawî jî vî şerî bimeşînim. Ti carî vê ji hişê xwe dernexin.

Bi vê mebestê carek din yeqîn dikim hûnê li ser bingeha rastiyan yekbûnê saz bikin, pir rehet hemû pirsgirêkan çareser bikin û serkeftinê dixwazim.

**16 Sibat 1998**

## DI PKK'Ê DE ŞERTÊ YEKANE BI DIJMIN RE SERÎ KÊŞANE

Armanca me ya herî bingehîn bêku em bîn xapandin, bixapînin û ne jidil, hemû xisletên kesayetek peywirdariyê bidestxistin û ji bo vê şerê perwerdeya ku hewce ye serkeftî dana meşandine. Weke di şerên din de çêdibe, hûn di şerê perwerdeyê de jî xwe dixapînin, ji cewher dûr, berovajî teşe, xwe danasînek zêde ne bibandor ve vale derdixin û dikevin nava kêmasiyek giran. Lê di rastiyê de pêvajoya ku tê jiyîn pir bê rehme. Nexasim ji hêla min ve rojev hem pir girînge, hem jî pir zehmete. Tevî vê wexta em hewldana mezin a bûna milîtanê partî yê rasteqîn didin, hûn nikarin di vê mijarê de azweriya fêrbûnê jidil raber bikin. Ev nêzîkbûn jî dibe ku bêrêzî û kêmasiya herî cidî hûn li beramberî xwe bikin û carek din siûda milîtanbûnê ya mezin ji dest berdane.

Ev pir eşkere ye: Gavavêtina nava vê têkoşînê, heta mirina xwe biryara şerekê dayîn û misoger di jiyanê de şêwaza azadiyê esasgirtine. Ger hewldanên we yên her rojê bi qasî biryardariya şer di kesayeta we de derfeta jiyanê jî pêk bîne, hûn dikarin bi vê xwe bidest bixin. Elbet ev jî, bidestxistina kesayeta partî û gele. Hîn şênbertir jî, bi qasî dijminê xwe re şerkirine, jiyan jî azadkirine. Hûnê lêpirsîna vê xwe bi xwe bikin. Hûnê ji pirsên; "Ez çime, di kîjan asta pêşketinê de me û dikarim çiqas serkeftî bim?" re bersivê bidin. Evqasî bi rihê binkeftî nêzî jiyanê bûyîn, tevî evqasî bê îdîabûn, bêçaretî û nehilberîneriya we li holê ye, hûn çawa şerim nakin bi vê kesayetê xwe bihejînin û ji vê aciz nabin? Bi vê sedemê mînakên hûn dijîn, didin diyarkirin ku hûnê windahiyên pir xeternak re rûbirû bimînin. Şaşwazim hûn çawa hêjî diwêrin jiyanek wisa bijîn, tevî windahiyên bi êş we jiyane, bêku ders ji van derbixin û bitirsin dikarin wisa rehet xwe bihejînin. Ev wisa nabe.

We dinasim, ez ne xerîbê şêwaza jiyana hûn dijî me. Di rastiyê de bi we re xerîbiyek li hember hemû nirxên mirovî yên bingehîn heye. Dîsa kesayetek we ya dijmin heta dawî bê îdîa pêş xistî heye. Rewşek we ya ser wê jî pir sivik dinixumîne, ti naveroka wê nîne, derewan derbas nake, nabêjim felsefeya jiyanê, bê hişî û xwe bi tiştên vale ve têr dibîne heye. Asta ku dijmin bi we re ava kirî wisa ye. Hêjî çi wateya vê heye hûn vê astê diparêzin? Heta ku hûn vê qirêjiya du-sê qat li ser xwe ne

avêjin, hûnê çawa xwe bidin jiyîn? Di serê we de fikrek hilberîner a ji rêzê jî nîne. Vîna we ne xwedî bidestxistin û dijwariyê ye. Di mijara jiyana xwe de jî hûn zêde ne cidî ne. Çeka we ya herî mezin, bi xeflet û cehaletê ve di jiyanê de bûna bela serê heve. Hûn nexweşiyên di civakê de bi şêweyek jidil di nava partiyê de jî didin der û nexweşiyan derbasî nava me jî dikin. Êdî divê hûn ji vê re bêjin rawestin.

Elbet hûn di astek bilind de bê perwerde ne. We zêde dev ji xwe berdaye û li hember jiyanê bê eleqe ne. Hêjî vê rewşa bi êş dijîn. Gelo hûnê bikarin di navbera me de vê rewşa xwe derbas bikin? Ger hûn derbas nekin, ev partî nikare we bide jiyîn. Ez her roj xwe radikimdatînim û dipîvim. Bes hûrûkûr diponijim ezê çawa bikarim we bi vî halî ve rakim. Barê cîhanê radikim, lê rakirina vê paşverûtiya we jî nayê pejirandin. Ev rehetî, li hember nirxên herî bingehîn evqasî reftarên we yên ji rêzê çawa pêş dikevin? Şêwaza we ya bi ser peywirek girîng de çûyînê, çawa dikare evqasî bi şaşî û bê îdîa be? Hedefa we çiye, hûn dixwazin bigihin kur? Mirov çawa dikare xwe evqasî şêlo bihêle? We çawa belengaziyek wisa kiriye xislet? Van pirsan ji xwe bikin û xwe pênase bikin. Dê kî we bigire û dê feydeya we li kî were? Çiqas feydeya we ji we re dibe? Her ku rewşa we wisa be, hûnê çawa di derbarê van nirxan de xwedî biryar bin? Ev pir girîngin. Nexasim ji bo qadroyekê, pirsgirêka kesayetî teqez divê bên çareserkirine. Hûn bi salan wisa hatine fêrkirin. Bes ev fêrbûnên xirabin.

Ez tevî van pêkanê xwe, hêjî xwe tam na ecibînim. Ji bo hîn zêdetir bi bandor bim, ser xwe de diçim. Tevî temenê xwe û hemû zehmetiyan, şerê min ê dijwarkirinê bêhempa ye. Serbilindiya kesayet wisa ye. Tevî li holê ye hûn zêde ne bibandorin û ne serkeftî ne, hûn çawa xwe dipejirînin? Di vê xalê de seyr dimînim. Li ser rêxistinê rawestîn, ger li pêş we karek hebe li ser vê rawestîn, dibe ku ji bo we çare be. Seknek wisa nîvçe, şêwazek îşkence li xwe kirinê ye. Qet nebê bêjin em nikarin bikin. Ma heta mijarek baş neyê fêmkirin, di derheqê wê de xalên pêwîste bên kirin zelal nebin mirov dikare wisa bisekine? Niha rewşa we wisa ye. Mirov nikare vê rewşa we bi bêbiryarbûnê ve jî rave bike.

Vaye ev rewşên di demên dawî de di nav refên me de derdikevin holê, zehmete mirov fêm bike, pê yeqîn bike û kesayetan dinêre, hûn dikarin xwe bi rastiya wan û di wê eynikê de jî bibînin. Mînak dema me ev kesayetê beq ê dawî (Şemdîn Sakik) nirxand, derdikeve holê ku tam bûnewerek sosrete. Yeqîn dikim, niha di lêpirsînê de wer dihizire ku di

hevdîtinên siyasî de ye. Ancex ji milyonê yek jî ev siûda wî nîne. Li wir dihizire ku zilamek mezine. Wê xwe bi xapandinek ku dixwaze hinek karan bi ferasetek siyasî ve bike heta gorê biçe. Harbûn, xeflet û ketîbûn di vir de ye. Aliyê vê yê bi êş jî eve ku, divê hûn jî xwe di vê eynê de bibînin. Pirsên weke; "Ez di polîtîkayê de çime, çawa li ser lingan dimînim?" Ji xwe bikin, ne zehmete hûn rewşa xwe zelal nekin. Ji aliyekê ve dihizire ku hêze, ji aliyê din ve jî hêj têgeha dijmin jî ronî nekiriye. Ya rastî neku vê jî nizane, kesayeta wî wisa teşe girtiye.

Elbet li vir xisletek we jî ya ku pêwîste hûn pir baldar nêz bibin heye. Em kesayetên bi vî rengî bi dijmin re didin şerkirin. Li wir du dijmin bi hev re şer dikin. Di nava nehevsengiyek hêzek metirsîdar de, emê rezaletek ku bi dawiyek metirsîdar ve encam bibe û sefaletekê bi wan bidin jiyîn. Di rêbaza me de ev heye. Ger sax jî bimîne yê herî kirête, bi hovane biçe jî yê herî xirabe. Ev herdu serî weke şivek di nava pîsiyê de ye û rewşek nikare xwe jê xilas bike.

Divê hûn ji vê mînakê bizanin ku bi vê sekna xwe ve jiyîn, berxwedêrî û têkoşîna bi dijmin re serkeftin çênabe, encamek wisa bigirin. Hûn bi vê şêwaza xwe polîtîka û gêrîlatiyê jî bikin çênabe. Pir eşkere derket holê ev bi vî şêwazî çênabe. Ne min ev ava kiriye, min tenê eşkere kir. Min lîstokek, qirêjek û balonek derxist holê. Hûn jî neçarin zelal bikin di kîjan asta vê de cîh digirin. Qet nebê ger dê bê jiyîn, mirîn jî pêk were, bila wateyek wê hebe. Ger ev nebe hûn pir xeterin. Hûnê paşê ber bi dawiyek tirsnak ve biçin û emê jî ji bo we bêjin ketine û xirabin. Dibe ku em peyvek hêjayî we jî nebînin. Ji ber li hember vê rastiyê ger mirov nehizire, bihizire jî lê beramberî neheje seyrek mezin û ketîbûnek mezine.

Kî ji we re got gêrîlatiyek wisa bikin? Kî ji we re got wisa polîtîka bikin, wisa bijîn an jî bi vî halê xwe ve xwe tiştek bihesibînin? Kî ji we re got wisa fermandariyê bikin? Min ne gotiye. Qaşo we bi xwe ji xwe re got; "Mirov wisa dibe fermandar, polîtîka wisa tê kirin, mirov wisa rêxistinê nas nake, mirov wisa bi partiyê dilîze. Wisa tê jiyîn." Vaye encam jî wisa ye. Vêca de vê çareser bikin. Bi sedan ên wisa hene. Dê siberojê heman tişt bên serê piraniya we. Ev ji bo mirinên ne di cîh de jî derbasdare. Kî ji we re dibêje wisa bimirin? Hûn ji ber xwe derdixin. Vêca bêku tiştekê bikin, qaşo niha jî di nava gêrîla de yan jî bi navê partiyê dijî û têdikoşe. Kî ji we re dibêje dikarin wisa têbikoşin? Cahiltî, xeflet, reftarên ku ti carî terbiye nabin û hinekê jî mejiyê we yê

pêşneketî heye. Di encamê de belayên ku nehatî serê ti miletî û dîsa hêsan neyê serê ti kesî û dawiya di dîroka Kurd de ya xirab rewşên wisa ne.

Ji nû ve zayîn, bi şêweyek zayîna ji dayîkê balkêştir zayîna jiyanê hewce dike. Ger ev nebe, halê we li holê ye. Çeka we ya herî mezin hûn dibêjin; "Ez baş digirîm." Wexta hinekê jî bi ser we de têm, hûn dibêjin; "Hestên min jî hene." Êdî divê hûn li gorî rastiyan tevbigerin. Çi têkiliya van gotinên we bi leşkertî û siyasetê re heye? Vêca hûn çawa dikarin bi vê xefletê ve bikevin nava qada ku bi rastiyek mezin a leşkertî û şoreşê ve tê meşandin? Ya dimîne jî hûn min dixin dewsa Xweda. Hûn çima xwe dispêrin hestên wisa, van derewan û van koraniyan? Li şûna vê xwe bispêrin kesayeta xwe, rêzdariya xwe û rastiya zanebûn tê binavkirin. Ger hinek hestên we yên rêzdar hene, wate bidin wan. Li ser vî bingehî vê rezalete, belengaziyê li ser xwe bavêjin. Wexta mirov li halê we dinêre xemgîn dibe. Mirov dibêje çi ji van hatiye, çi hatiye serê van. Ma milîtanê şoreşger qet wisa dibe? Ma milîtanê şoreşger wisa dimire?

Ez hêjî bi derfetên pir kêm ve dimeşim. Ne mirinek hêsan, ne jî jiyanek hêsan heye. Meşek li ser pira siratê hewce dike û ev jî watedare. Qet nebê em hêjî dijmin mijûl dikin û derfetê jiyanekê diafirînin. Niha hûn ji vê jî encamên berovajî derdixin. Elbet li vir bê îdîayek kûr heye û dibe ku hûn qet ne di ferqê de bin, lê kesayetek we ya pir xirab têk çûyî heye. Ev kesayet nikare nîqaşek rast bike, nikare biryarek rast bide, nikare rast xwedî li rêveberiyek rêxistinê derbikeve, nikare bi ser şaşiyekê de biçe û karê ku teqez divê bê kirin jî nabîne. Bal bidinê: Kombûna sekna we ya di nav rêxistinê de ji bilî van kêmasiyan ne tiştek dine. Kesayetên ketî yên dikarin her tiştî bikin hene û mirov hinek ji van ditirse. Vaye radest bûye, li xwe mukir hatiye, xayîntiyê dike. Yeqîn dikim li hember van mirovên durist û bihêrs hene. Ger wisa ye, nexwe heqê hêrsa xwe bidin, li gorî hêrsa xwe zanebûn û hêza vî karê pêwîste bê kirin derbixin holê. Ev kar bi cureyek din çênabin.

Van tevan ji bo vê vedibêjim: Madem hûn tevlî refên me bûn, nexwe vî karî ji bingeh ve fêm bikin. Misoger zehmetiyên we ji yên min ne zêdetirin. Ez derfetên fêrbûnê yên min ji bo xwe nedane didim we. Hûn ciwanin, di vî temenê ciwan de enerjî dibişkive. Nexwe ev çi kesayeta cemidî û ziwa ye? We ev xislet ji nêvengên lê mezin bûne, tolaz, beredayî û ti nirxên berz nade girtine. Vê ji ser xwe bavêjin. Ger silala we bihêz bûya, evqasî li hember hêzên îmhager helwestên ketî raber

nedikirin. Nexwe, hûnê nefretê ji saziyên ku hûn jê hatine bikin. Ji ber ti nirxa saxlem nedane we. Bi van şîroveyan behsa dê û bavê we nakim. Elbet ew jî her yek bêçare ne. Li hember vê saziyê, kevneşopiya kujer a vê saziyê, ango çi tiştê we bêhiş dike, ziwa dike û li hember nirxên bingehîn we bêçare dihêle rawestin. Ev pir eşkere ye. Bes hêj hûn berê xwe jî nadin wir. Ez li vir li hember xwe jî hêrs dibim û ji xwe dipirsim ez çima hêjî bi van kesayetan re dimeşim. Bi zorê xwe digirim, dibêjim nabe kesên wisa hevalên min bin. Di mijara ezê çawa xwe biparêzim de, bi zorê xwe digirim.

Ji ber vê min bi we re sebir kir: Ji ber dijmin bi we dilîze, lê hûn ne di ferqa vê de ne. Mane keçên sivik ji lîstokê wêdetir tiştek ji destên wan nayê hene, rewşa we jî di wateya siyasî de hinekê dişibe wan. Ancex kesayeta we jî çar bi çar ji vê re dibe zemîn. Paşê jî hûn li ser bingeha dîlaweriyê xwe dixin dewsa zilaman. Pîvana zilambûnê, rast wate dayîna karekê, mirov hêsan bin nekeve û bêku mirov hêsan bimire ji cihekê ber bi cihekê ve pêşve biçe. Heta ev nebe hûn çawa dikarin behsa namûs û serfirazî bikin? Hûn bi serûber nikarin du gotinan bikin. Kar û barê we serê min jî tevlîhevkirine. Hûn dixwazin bi vî halê xwe yê mirî, ziwa dike û nêzîkbûnên xwe yên têr nakê ve bi min bilîzin. Wexta em bi ser we de jî tên, dikevin rewşên reben an jî ya herî xeternak hûn dibêjin; "Tu Xwedayî yan jî tu despotê herî mezinî." Kesayetên we her tim van herdu gotinan dibêje. Weke bi Xwedê ve bê girêdan girêdanbûn, lê dema hêviya xwe nabîne jî min dixe dewsa despotek pir mezin.

Hûn çima weke mirovan nêz nabin? Çima hûn weke kesên şervanek kedê, parvekerê kedê û nirxan, bi feraset û pîvanên diyarker ve dixwaze bi hev re kar bike tevlî xebatan nabin? Ji ber hûn netebitîne. Ji ber hûn nizanin keda sosyalîst çiye û dê mirov çawa bi wê re yekbûnê saz bike. Hûn ji vê re girtî ne. Ango yan dê hinek we bi feodali yan jî kapîtalîstî mêtîne, yan jî hûnê wisa li yekê bikin. Di bingeha çanda we de ev heye. Fermandariya we jî wisa ye. Derdikeve holê ku kî despote û kî hawara xwe digihîne xweda.

Hûn çima bi kedê hinek tişt ava nakin, heta çima xwedî li keda xwe dernakevin? Mînak zilam bîst salin qaşo di bin navê partiyê de ciwantiya xwe feda kiriye, bes mirov lê dinêre, di du rojan de direve yan jî xwe davêje erdê. Ma we deh-bîst salên xwe neda vî karî? Ev çawa çêdibe hûn di rojekê de ji xwe direvin? Aliyek vê ya metirsîdar heye, li hember xwe

bêrêziyek pir mezin heye. Ev sal, salên te bûn, ev can, canê te bû. Tu bi dil û mejiyê xwe ve meşiya. Vaye di vir de sosretiyek heye. Vî zilamî xwe nas nekiriye, ji xwe direve. Ev ne trajediyek mezin, harbûnek mezine? Vêca emê çi ji van kesayetan re bêjin? Çima mirov evqasî ji xwe direve? Çima mirov evqasî nefretê ji xwe dike, çima evqasî dijminatiya xwe dike?

Ji bîr nekin hûn jî di nava van de ne. Nexwe hûnê bibînin di vê xalê de şaşiyek mezin heye û hûnê bêjin; "Bêrêzî heye, divê xwe birêkûpêk bikim." Beriya her tiştî hûnê dev ji vê hunera girî berdin. Girî jî ev şêwazên reftarên we ne. Girî, ne tenê rondikên çavane. Rondik tenê ji çavan diherikin. Her weke din giriyên ji zimanan diherikin, ji rûyan tê xwendin, ji mejî û hemû reftarên we diherikin hene. Giriya bi rondikên çavan ewqas ne xetere. Wexta hûn mafê karekê nadinê, li ser seknek saxlem serwer nabin dibe girî. Zelal nebûna xwedî hêza biryarê nalîne.

Hûn xapandine; bi navê mirov û zilaman nav li we kirine, tenê ew heye. Lê di naverokê de tiştek nîne. Lewma min ev di temenê xwe yê zû de ferq kir û ti carî ev kesayet ne eciband, ji vê kesayetê reviyam. Hêjî wisa me. Rastiyek we ya bûna xwedî kesayetek pir xeternak mijara gotinê ye. Her ku min bi fikar û gumanan li vê kesayetê nêrî hewl da xwe ji nû ve ava bikim. Ez bim, ezê vê kesayetê bixim bin mêrkutê, rojê çil caran lê bidim, bixim mirov. Nexwe vê kesayetê napejirînim. Li şûna ji ber halê xwe xembar bin, xwe bikin mirov. Hûn ne kesayetên sîxurin, kesayetên bi rastî jî bêjin ez ji vî karî re amade me xwe danîne holê ne. Ger hûn sîxur bûna, dê min gotiba niyetxirabin, lewma xwe vedişêre. Lê hinde rewşa we xirabe, di rewşek ji sîxurekî xirabtir de ne. Lewma hûn nikarin mafê jiyanê bikar bînin. Rastiya hûnê nekarin bi vî halî ti mafê jiyanê bikar bînin, cewhera rastiya di nava PKK'ê de ye. Di rastiya PKK'ê de şertê sereke, di vê manê de xwe dana ber dijminê xwe ye. Bal bidinê: Ne şertê ezê şer bikim û bimirime. Ne şertê ezê têkoşînek ji rêzê bimeşînim û bijîme. Şertê ezê xwe bidim ber dijmine û dijmin têk bibime. Ger hûn nekarin xwe bigihînin vî şertî, ne gengaze ku cidî jî bên girtin.

### Rêbertî Yekbûna Gel û Hemû Nirxane

Mijûlbûna me ya herî bingehîn xwe dahûrandin û dijminê herî xeter binxistine. Heta hûn vê pêk neyînin, hûn nikarin serê xwe jî rakin. Êdî

ne gengaze hûn weke berê durûtî û derewan jî bikin. Yan hûnê bin bixin, an hûnê bin bixin. Rêyek vê ya din, çep û rastê vê nîne. Mînak Komara Tirk li Enqereyê vê nîqaşê dimeşîne: “Gelo em van radest bigirin an na? Ma ji bo qadro û milîtanên PKK'ê ev rêbazên me rastin an na?” Van pirsan dikin. Şemdîn girtine cem xwe her carê lêpirsîn dikin û dipirsin; “Gelo şaş bû me ev girt, an na?” Her wiha dibêjin; “Hîn jî yên weke wî hene. Gelo ev şêwaza me ji bo wan başe yan jî xirabe?” Baweriya xwe bi vê xisleta radestbûnê ya di kesayeta we de tînin û hewl didin polîtîkayan ava bikin.

Vêca hûn çiqas rastiya dijmin dinasin? Dijminek wisa ye, radestbûna ji lewaziyên xwe re ferz dike. Nîqaş dikin û dibêjin; “Gelo em dev ji wan berdin, li wir rêxistina xwe mijûl bikin baştire. An jî em bînin Enqereyê ji bo dersek be em ceza bidin wan?” Biryara herî xirab ku dijminek di derheqê we de bide eve. Jixwe tiştên din jî tên gotin. Hinek zêdetir behsa meyla me dikin û dibêjin; “Dibe ku tiştên cuda jî çêbin. Ev hatine wê astê herî kêm bi qasî me dikarin binkeftinê jî, serxistinê jî baş binirxînin. Her wiha baş dizanin tê çi wateyê.” Nîqaşek wisa heta dawî xeternak berdewam dimeşe û teqez divê em jî di vê mijarê de zelal bin.

Dibistana partiyê, dibistanek şere. Dibistana siyasetê ye û teqez hinek pîvanên wê hene. Me heta niha hûn tengav nekirin. Dibe ku şaş be, lê yeqîn dikim bi rêbazên hişk û li erzê we dayînê fêrbûn çênabe. Neçarî û pêwîstiyên fêrbûnê wisa ne û hûnê jî van têbigihin. Ger hûn fêm nekin, dê weke min gotî rû bide. Ma ev encamek başe? Gelo başe we weke kontrayekê di nava me de bigirin, an jî we beramber cîhanê ceza bikin baştire? Yek jî nebaşe. Herdu jî xirabin. Bes şêwaza we ji herduyan ber bi yekê ve dibe. Mayîna we jî, çûna we jî bela ye. Divê hûn vê rewşê derbas bikin.

Tiştên ez dibêjim pir eşkere ne. An jî ger baweriya we bi vê nakokiyê nayê, weke din, ger hûn bêjin; “Ya rastî tiştek bi navê dijmin nîne, em hatin xapandin” û di rewşek radestbûna teqez de bin û bi dijmin re heman şêweyî bin, divê hûn vê jî pir eşkere bêjin. Nexwe hûnê li naverastê hedef bin. Wê ji mirov re bêjin; “Nexwe tu çima evqasî li hember zehmetiyan li ber xwe didî?” Diyare bi we re şêlobûnek pir xeternak heye. Bi salane ev rewşa şêlobûnê hûn anîne rewşek neyên nasîn. Vê şêlobûnê derbas bikin! Ango ev rewşa we, ezê nebêjim weke cilê peritî, dişibe binyatek tije elem. Van eleman jê bikin û bavêjin. Bila êş û jan bide, qet nebê bila aliyên we yên mayî bila bi tenduristî bimînin.

Elbet hûnê bêjin; "Çi eleqeya van tevan bi min re heye?" Êdî naxwazim bibim hevalê kesên tolaz û têrê nakin. Jixwe nabim jî, ji ber pîvanê siyasetê em hinekê we îdare dikin. Ji ber dijmin li ser we dilîze û dixwaze di kesayeta we de min parçe bike. Beramberî vê ez jî nikarim bi êrîşên xizmetê ji dijmin re bike bi ser we de bêm. Bi salane min li ser esasê taktîkî ev kesayeta weke beqan îdare kir. Wî jî dixwest weke we li gorî xwe şerkertî, fermandarî û siyasetê bike. Me dizaniya ku rewşa wî ne başe. Em pir kesên wisa dinasin. Di qonax û şêweya em dixwazin de, bêku bihêlin zerarê bide me, bê bandor hiştin hem mafê me hem jî peywira me ye. Ev ji bo we jî derbasdare. Ger meşên we yên bi zerar û berbelav hebin, ezê we jî îdare bikim. Em nikarin destê xwe têkil kesayetek qirêj bikin. Ew ji dijmin hatiye, lewma bila biçe dijmin.

Nexwe di nava PKK'ê de pîvan pir hesasin. Ger hûn van fêr nebin, dê we jî bişînin wir. Ango kesayetek bi şaşî, kesayetek qirêj dê xirab ji refên me biçe. Ger hûn şiyar nêz nebin, wê yên baş jî bi xirabiyên xwe re bibin. Dibe ku hûn kesên pir baş jî bin, ancex ger hûn şiyar nêz nebin, wê xisletên dijminatî yên van kesayetên neyênî bandora neyênî li we jî bikin. Lewma qet derfeta we nîne hûn bêjin min eleqedar nake. Di tevlîbûna we de ev hemû neçare bi şêweya kesayeta rêxistinê ya hesas bersivekê bibîne. Ger nebîne, nexwe hûnê min mijûl bikin, lê xwe jî bixapînin. Dîsa partî kesên ku bi israr pîvanên xwe xirab dikin û xwe negihînin pîvanên xwe napejirîne.

PKK amûra şer û hêza pêşengên têkoşînê yên teqez bi hinek rêgezan dimeşe û wan di kesayeta xwe de bi yekbûnekê avakirî ve dimeşê ye. Vê amûrê baş binasin. Şaşiya we ya herî mezin, nenaskirina vê amûrê û cihê xwe ya di nava vê amûrê de rast destnîşan nekirine. Vê şaşiyê derbas bikin. Qaşo ew şerkeriya hûn li çiyan nexasim paşketî didin meşandin, bi xwe re fermandariyek wisa ava kiriye. Ev ji bo miletekê karesata mezine. Ger hinek tevdîrên me girtî nebûna, hemû dane didan diyarkirin ku wê encamên pir xirab derketiban holê. Camêr dibêje; "Ji Serhedê heta Dêrsimê, ji wir jî ji Torosan heta Başûr yekser li hemû eniyan geriyam. Min li rûyê hemû gêrîlayan nêrî. Min dît ku, rûyê hemûyan dibêje em vî şerî ranakin, nikarin bimeşînin heye. Piştî ku min di sala 95'an de li rûyê van nêrî, di derbarê bi van gêrîlayan re, bi van kesayetan re ev şer nayê serxistin de biryara min misoger bû." Vaye qaşo yê herî aqilmend dibêje; "Ez teoriya van a nabe ava bikim û weke daneyekê pêşkêşî dijminê xwe bikim." Heman wisa ye.

Ancex di vê xalê de mijarek ku çareser nekirî hebû, ew jî hewldanên min ên hûn qet cidî nagirine. Ev ji destpêkê heta roja me hewldanên ku van karan li gorî xwe dimeşînê ye. Êdî hûn ji vê re dibêjin hewldanên Rêbertiyê ne, berxwedaniya kesekê yan jî ya partiyekê ye, şerê miletekî ye, çawa binav dikin bikin, lê rastiyek heye hinek hewldanên me yên xweseriya xwe hene. Dibe ku di rûyê we de binkeftin diyar bibe, lê ev bi me re nîne.

Rastiya Rêbertiyê, di encamê de yekbûna milyonan gelî û hemû nirxane. Dibe ku hûn parçeyek artêşê ya windakirina qonaxekê bin. Lê ev nayê wê wateyê ku hemû artêş wisa ye û artêşa ku yekbûna bi Rêbertiyê re jî saz kiriye dê winda bike. Weke ku ji ber nêzîkbûna çors nekarî vê binirxîne, şaşî li ser şaşiyê kir, xeletî li ser xeletiyê dike. Jixwe kesayeta bê bingeh ji van re vekiriye. Vaye encam jî, şoqek wisa ye. Çi kir? Heta henaseya xwe ya dawî di hemû kesayetên Kurd de ev rewş wisa ye. Wexta ben dixin stuyê wî jî nizane çi hatiye serê wî. Wexta fîşeka dawî jî lê dikeve, nizane çawa miriye. Ev rewşên xirabin û bi êşin.

Ji bo nekevim vê rewşê min ev şêwaz ava kir. Hem ji vê şêwaza mirinê ditirsim, hem jî dibêjim wisa nabe û di encamê de şêwaza Rêbertiyek cuda pêş dikeve. Di şêwaza we de ev nîne. Tim ji xwe re dibêjim wê ev mirin jî, ev jiyan jî min wisa nebîne. Kurtasî wê dijmin negihe mirina min jî, jiyana min jî. Ger bikarim pêk bînim, ezê jiyanê jî, mirinê jî li ser vî bingehî weke min hilbijartî hemêz bikim. Hemû hewldanên me ji bo vê ne. Ev babet neku ne girînge. Ji ber her tişt di vir de veşartiye. Vîna tevahî miletekê wisa di sêdarê de hatiye xeniqandin. Pir trajik fîşek li we dikevin. Emê çawa vê rewşê asayî bibînin û bipejirînin? Ne ez vê ava dikim, ev rastiyeke. Dibe ku hûn tirsnakiya vê nahesin. Lê belê ev rastiyek ku hêjî nahêle ez birazime. Ez nabêjim hûnê dijwar ji mirinên wisa birevin, hûnê wisa bikin mirinên wisa çênebin. Bes ev jî bi xefletê nabe, bi xwe gihandina şêwazek bêhempa ve dibe. Hêza hûn ji me digirin wêran kirinê ve nabe. Ancex bi kesayeta rasteqîn a hûn ji me bigirin ve dibe.

Di bin navê Rêbertî wêrekî û hêz da de, ev hêz îsrafkirin, berovajî keda me ye. Hûnê hîn zêdetir xwe bi xisletên kesayeta milîtanî ve biçek bikin û bêjin; "Ez hêsan namirim, hêsan jî najîm. Nikarim bê serkeftin rawestim." Hînkeriya perwerdeya me ya herî bingehîn eve. Dîsa ger hûn bêjin me fêm nekiriye, emê cidî nêzî yek gotina we, yek nêzîkbûna we

nebin û ji me jî rêzdarî hêvî nekin. Ji ber êdî divê hûn di kesayeta xwe de vî dijminî û vê heqaretê xwedî nekin. Her wiha ev we mezin jî nake. Ya dimîne radestbûne, rewşa ku civak di navê de dijî pejirandine. Ger hûn xwe ji bo pariyek nan feda bikin, hûnê nekarin wê jî bibînin. Alternatîfa vê nîne. Ji ber wê dibêjim; Yan hûnê bin bixin, an jî bin bixin. Yan hûnê wisa bin, an hûnê wisa bin. Alternatîfek vî karî ya cuda nîne. Vaye tiştên ên din bi navê alternatîfê ceribandin, ji bilî îxanet û radestbûna herî ketî ne tiştek dine.

Tevî van, gelo hûnê bikarin tirsên bi kesayeta xwe re bavêjin? Hûnê bikarin xwe ji kesayetên tirsnak rizgar bikin? Hûnê bikarin qalibên vê kesayeta ku bi salan hatiye hunandin bişkînin? Ji bo şikandina vê gelo vîn û azwerî pêş ketine? Em dixwazin ên bi aqil birêve bibin. Heta niha her cara hûn hatine cem me, me sozên herî berz û bersivên herî balkêş dane we. Lê belê me bersivek saxlem jî ji we negirt. Ji aliyê din ve jî di derbarê hûn çiqas mirovin de kompleksên we yên ecêb hene. Bi kesayeta sexte ve hûn xwe weke dînan mirov dihesibînin. Ev nabe. Ger ez weke axayekî kulmek tund li we nadim, ma hûnê min bêhêz bibînin? Ev ne nêzîkbûnên rastin. Ev ne hêjayî otorîteya siyasî ya nûjen û hêza nûjene.

Siyaset, hunera fêrkirinê ye. Berê ji fêrkirina hespan re siyaset dihat gotin. Paşê xwe gihandiye wateya siyaseta niha. Terbiya siyasî, dikare heta hînkirina seyîsên hespan jî bê şîrovekirin. Li gorî vê serdema vê derbas bûye. Şêwazek hînkirina feodalan heye. Mînak, rêbazên feodal li ser gundiyan didin pêkan tên zanîn. Jixwe hûn serdema navîn jî dizanin, di wê serdemê de sîtilan dikelandin mirov davêtin nava wan. Mirova davêtin nav agir, tazî li ser stiriyan digerandin, bi şelaqan li wan didan wisa stirî her derê wan re diçû û terbiye dikirin. Otorîteya feodalî wisa çêdibe.

Otorîteya faşîzmê jî hebû. Faşîstan mirov di firinan de şewitandin. Di sosyalîzmê de ev çênabin. Ya rastî sosyalîzma pêkhatî jî kiryarên wisa kirin, lê hilweşiya. Nexwe ev ne rêbazên guncavin. Rêbaza me, neçare rêbaza qanekirinê be. Lê belê hûn jî ji ber çanda we girtiye vê rêbazê weke şêwaza herî rehet bikarin kena xwe pê bikin şîrove dikin. Hûn dibêjin guhdar bikim jî dibe, nekim jî dibe. Pêwîstiyên wê pêk bînim jî dibe, nekim jî dibe." Ev rewşek pir xetere. Ma hûn dizanin, hûnê berdêla vê çawa bidin? Vaye hûnê wisa bi vê rewşa şaşwaz ve berdêla wê bidin. Naxwazim bibim tawanbarê vê encamê.

Tundiya vî şerî, ji hemû şeran kûrtire. Darezîn, lêpirsîn, suc û cezayê di nava wê de bi qasî hûn di ti dadgehî û şerî de nebînin dijware. Ger hûn vê tênegihin, hûnê di nava vê siyaseta me ya giştî de perîşan bibin. Wexta hewl bidin ji Komara Tirk rizgar bibin hûnê biçin cem PKK'ê, wexta bixwazin ji PKK'ê jî rizgar bibin hûnê biçin cem Komara Tirk. Di encamê de hûnê veguherin meşkek di navbera du tiştan de diçe û tê. Hûnê yek ji wir, yek ji vir darbe bixwin. Ma rêya sêyem heye? Qaşo hinek camêr dibêjin rêya sêyem heye. Rêyek wisa nîne. Vaye rêya vê kesayeta şaşwaz bûyî jî, qaşo rêya sêyeme. Parîk nanê xwe pê bide jiyîn nîne. Dibêje; "Ezê hemû Kurdan bikim yek." Yeqîn dikim niha jî ji MÎT'ê re dibêje; "Ezê Kurd û Tirkan bikim yek." Vaye ev kesayeta şaşwaze. Li ser sîtilê rûniştiye, wê di sîtilê de bê şewitandin, lê dîsa jî tiştên wisa dibêje. Elbet ev rewşên pir qebahetî ne. Divê mirov van rewşan nejî.

Her kes nikare bikeve meydana egîdan. Ji bo ez di vê meydanê de gotinek saxlem bêjim, ji deh saliya xwe ve, xwe perwerde dikim. Ji bo bikarim komên zarokên biçûk kom bikim, min di deh saliya xwe de neçîrtî dikir. Wexta çend peyvan hîn dibûm jî, min yekser fêrî wan dikir. Heta min bi duayan nimêj bi wan dida kirin. Ev hemû şêweya yekem a rêxistinkirinê ne. Min dixwest çareyekê bibînim. Lêgerîna min a wê demê jî hêj di bîra min de ye. Ji bo pêwendiya rêxistinekê, zarokekî min xwe li ser dîwaran re davet,  hewl dida zarok peyda bikim. Hemû kar û barê min li pey van zarokan bazdan bû. Ev lêgerîna teorik, ev rêxistin tev encama van hewldanên minin. Niha li we dinêrim, em xezîneyê bidin pêşiya we, serkeftinê di sêniya zêrîn de danin pêşberî we, dîsa hûn berê xwe nadinê. Bi van kesayetên we ve ne fermandar, ne milîtan, ne jî tiştek din çêdibe.

Rêbertiyek, milîtanek saxlem, tê wateya kesayetek ku ji zarokatiya xwe ve di nava lêgerînek dijwar de ye. Li çi digere? Li ya ji bo xwe hewce digere. Çiye ya ji bo wî hewce? Mînak azadî ye. Azadî çiye? Azadî, bi vîna xwe ya cewherî ve jiyîne. Ew vîn çiye, di civakê de dibe çi? Dibe vîna azadiya civakê. Ew çiye? Xebata aborî, siyasî û fikrî, xebata bûna hêza li ser beşek axê ye. Li hember çi? Li hember xwezayê, li hember hêza zordar. Azadî wisa tê ravekirin. Ger lêgerîna we ya azadiyê dijwar be, hûnê wê bidest bixin. Ma xêr ji kesayeta bê eleqe, ziwa, heta bela serê xwe tê? Rewşa we, weke biwêjek gundiyek me ya ji zû ve hatî bîra mine. Ji kurê xwe Îsmaîl re digot; "Kurê min Îsmaîl,

misoger xwe nede pêş, lê zêde li paş jî nemîne. Di navîn de ji xwe re cihekê bibîne." Di encamê de Îsmaîl ti carî nebû zilam. Pir ecêbe, felsefeya we jî wisa ye. Pêşeng wisa nabe, pênaseya pêşeng pir cuda ye. Kesê ku di xeta navîn de, nagihe ti cihî.

Hûn di nava şaşiyên pir berz de mezin bûne. Ne gengaze ku van qalibên we bikarim bi axaftinekê bişkînim. Hinde li kesayetê we dane hûn wisa bêxem û bêbertek hiştine. Ger hinek nirxên serkeftinê di sêniya zêrîn de jî pêşkêşî we bikin, hûnê dîsa berê xwe jî nedinê. Bi navê jiyanê hûn wisa fêr kirine. Dibêjim siyasetê bikin, hûn diçin karê Hemal Hiso dikin. Dibêjim xisletên bingehîn bidest bixin, hûn dibêjin; "Na, ne li gorî mine." Ehbap-çawişiyek, hinek hestên biçûk ên zêde wesfa xwe neyî, nirxek xwe ya bilind neyî û daneyên jiyana biçûk têra we dike. Hûn karên mezin ji bo xwe weke heqaretê dibînin, di cihê xwe de asê dimînin. Hûn bi van helwestên xwe nikarin di nava partiyê de gavekê bavêjin. We li çiyan xwe xistiye rewşek xirabtir. Hûn dibêjin; "Ma kî li van çiyan me dibîne?" Hestên her cure paşketî û bê hişî her aliyê we dorpêç kiriye. Heta ku dijmin tê we di xewde dikuje, hûn wisa dijîn. Hûn ne ji bo wisa bin, derkerine serê çiyan.

### Kesê Herî Bi Bandor Yê Tiştekê Dide Her Kesî Ye

Li cem me ya esasî baweriya bi mirove. Min baweriya xwe bi mirov anî û şaşî nekir. Min got nirxa herî mezin mirove û bi pîvanek rast dest bi vî karî kir. Heta her kesî digot; "Ger çek nebe, dost nebin, ma gengaze ev kar bê meşandin? Bingeha wî ya çînî jî, bingeha gel jî nîne." Vêca beramberî van tevan çeka min çibû? Di mirov de israr, di destpêkê de jî di xwe de israr çeka min a esasî bû. Di encamê de israra di mirov de destnîşan kir ku wê ev kar bimeşe.

Li gorî teoriya me, teoriya Lenînîst jî êdî dibe sosyalîzma çors. Ji ber li gorî teoriya şoreşa Lenînîst divê rewşa çînayetî ya objektif û sûbjektîf kamil bibe, daku şoreş çêbe. Elbet li gorî teoriya me ne objektîfek wisa ya çînî, ne jî astek zanebûnê hewce ye. Heta teoriya me, yek kes jî be, girêdayî vê teoriya dikare şoreşek mezin çêbê ye. Ango yek kes jî be, teoriya israra di mirov de ye û ev teorî bi min re hat piştrastkirin. Li welatê Lenînîzm derketî holê de hilweşînek çêbû, lê bi min re serkeftina herî girîng çêbû. Dema dibêjim bi min re, tenê behsa xwe nakim. Ev bi

min re hûn jî dan karkirin. Ango me israra di mirov de, mirov dana karkirin û mirov esasgirtin pêş xist. Me got teknîka herî mezin mirove, her tim perwerdeya li ser mirov kûr kir. Me hewl da mirov dahûrînin, mirov ji nû ve birêxistin bikin û di wateyekê de jî ji nû ve ava bikin. Di encamê de me dît ku, ev kar dikare pêş bikeve.

Nexwe, di vê şêwazê de mirov kirina cewhera her tiştî, heta yek mirov jî be li ser wî karkirin, ew kûranî dahûrandin û ew her roj ji nû ve birêxistinkirin, dikare rê ji şoreşek mezin re veke. Selmandina vê jî, ya bi me re pêk hatiye. Niha gelo ev qet bi mercên objektif ve ne girêdayî ye? Elbet girêdana xwe heye. Li gorî min di serdema navîn de jî be, di kesayetek wisa de israr dikariya li wir şoreşekê çêke. Ya diyarker ne şertên objektîfin, pêşketina di zanebûn û îradeyê de ye. Bi vê re, her yek ji we dikare bibe kesayetên serkeftinê. Heta her yek ji we dikare şoreşekê çêke. Li gorî teoriya me, maf, peywir û hêza her kesî heye şoreşê çêbike. Çawa? Wê xwe bide karkirin.

Di rastiya me ya civakî de ev hîn zêdetir girînge. Ji ber li gorî objektîfbûna vê civakê zêde dostên wê û zemînek civakî nîne. Çiyê wê heye? Mirovên wê yên weke we hene. Mirovên weke girtina dest, dahûrandin û ji nû ve avakirinê re pêwîstiya pêkanîna şoreşekê heye. Vaye dîrokê jî ev piştrast kir. Di dîrokê de mînakên vê pirin. Bes teoriya teng, materyalîzma çors a roja me hîn zêdetir pêşvebirinê ve, me ya di tevahî dîrokê de hatî kirin, carek din selmand. Ango me serkeftina îradeyê misoger kir. Hûn nikarin ji vê birevin. Ji ber ev bûyerek hatî selmandine û her wiha ji bo me rêya yekane ya jiyanê ye.

Di nêvenga me de bi dijwariya îradeyê re, hûnê fêrî kesayeta bin dixe bibin. Bi vî rengî hûnê bibin milîtanên partiya me yên saxlem. Hûnê di pêwendiyan de tengav nekin. Wê di pêwendiyên rojane de kes xwe ferz neke. Nexasim çi aliyên neyênî û qels bikin, hûnê wan di nava xwe de bigirin. Reftar, hest û fikrên xwe yên xêrê, watedar û xweşik jî çi hebin parve bikin. Xisletên xwe yên xav, nebes û zêde kêrî tiştekê nayên jî hûnê dernexin derve. Her hest, fikir û reftarên hûnê bidin der, teqez divê xwedî cewher û naverokek ku tiştekê bide yên kêleka we bin.

Rastiyek heye hûn weke sitiriyan hevre diçin û gelek ji we gotinên ne di cîh de rojevê berovajî dike. Nexasim ger yên xwedî însiyatîfa rêveberiyê rojekê xirab dest bi rojê bikin, wê keda sedan kesî vale derbixin û keda me jî vale derbixin. Her gotin û her gava wî, neçare di asta xizmeta ji avaniya giştî re be. Ger mirov bizane pêşketinan bişopîne

û çi hewce bike di asta herî jor de bersiva vê bide, ev cewhera rêveberiyê ye. Ger rêveber, ji her kesî re li ser bingeha pêşveçûnê, ji her kesî re li ser bingeha pêdiviyan ji bo hinek tiştan pire, ji bo hinek tişt navbeynkare, ew xizmetkar û rêveberek başe. Ya ji bilî vê şaşe û nayê pejirandin.

Di nêvenga me de rewşa gundiyekê yan jî karkerekî ya li hember patron ne mijara gotinê ye. Dîsa rewşek weke rêber hinek tiştan dibeje û endamên partiyê jî wisa vale vale gundar dikin nîne. Weke kesayeta herî girîng a fermandar, xwedî kesayetek herî çalek, kûr dihizire, biryardarek dijwar û hewldanim. Şervanên milîtan jî kesên pir balkêşin, herî zêde li ser lingane û bi şêweya cengawerî parve dikin. Hûnê şêwaza avanî û rêveberiyê bi kesayeta xwe re ava bikin. Ne her tiştî bavêjin ser rêber û weke gundiyan xwe ji vî karî dûr bixin, ne jî hûnê Rêbertî înkar bikin. Rêbertî mejiyê giştî ye, giştî dinêre, îrada giştî ye û ev pir hestiyare. Rêbertî ji bo her kesî vîn û ramane. Lê nayê wê wateyê ku evê nebe vîn û ramanê yên din jî. Berovajî, Rêbertî aliyê di vîn û ramanê kêm ê her kesî de yekbûnê çêdike. Ji bo hûn jî di vîn û ramanê xwe de aliyên kêm bi Rêbertiyê re parve bikin û yekbûnê çêbikin, di nava seferberiyek perwerdeya mezin de ne.

Di nêvenga me de her tişt bi vîn û zanebûn pêş tê. Li ser kesî di ti mijarê de ferzkirinek çênabe. Parvekirin û tevlîbûn çêdibe, lê ev jî bi dîsîplînek mezin tê meşandin. Li vir kesê herî bibandor, kesê tiştekê dide her kesî ye. Soza herî bibandor, soza ku ya her kesî ye. Raveya vê ya herî berz, xala ku her kes dibêje; "Tam a di dil û mejiyê de min de rave dike" ye. Kesê ku xisletek wî ya wisa nîne, ev ez jî bim, divê bêdeng be û yên baş kîne ew derbikevin pêş. Meşa fermandarî misoger di vê çarçovê de ye. Cewhera rêveberiyê jî, bûna dengê her kesî û ji bendewariyên her kesî re bûna bersive. Em di qonaxa rizgarî de ne. Bes piraniya we di radeyek mezin de li ser bingeha nezantî nêz dibe. Lê belê rastiyek jî heye, ev rewş bi lez tê derbaskirin. Yên bi aqil wê zêdetir vê li ser xetê bidin rûniştandin û tevkariyekê bikin.

Hûn jî dikarin weke rastiya biharê ya azad dike, vejîndar û zindî dike, çiqas aliyên we yên ji giyan ketine û cemidî hene zindî û ronî bikin. Bi rastî jî hûn dikarin bi xwe re biharbûnekê pêk bînin. Me ji destpêkê ve her tim li ser vî bingehî ser xist û hatin heta vir. Me rêhevaltiyên mezin û dibe bi qasî dîroka ti tevgerê de nehatî dîtin lehengiyên mezin bi vê ferasete pêk anîn. Di rewşa heyî de, em hêza bi

rastiyek mezin re jiyînê raber dikin. Dîrokê jî selmandiye ku, yê herî zêde têk naçe, yê herî zêde nêzî serkeftinê û herî xweşik jî ev meşe.

**18 Nîsan 1998**

## BI XIROŞEK MEZIN A AVAKIRINA DERFETA AZADIYÊ VE BIMEŞIN

Em hewl didin we bînin ser xeta rast. Divê hûn jî lêpirsîna xwe kûr bikin û bersiva vê pêş bixin. Rêzdariya me ya li hember mirov mezine, lê ev bê bersiv nabe. Dibe ku di hinek mercan de bêçaretî ji neçarî be û çibe encam ewe. Lê belê di nêvengek ku êdî bêçaretî lê ne çarenûseke de hêjî xwe erdê re xirikandin û bi zimandirêjî behsa vê kirin, bi yek gotinî ne hêjayî we ye. Lê belê di rastiyên hûn hûrûkûr dijîn de van dibînim. Her wiha ji vê rewşa we hêrs dibim. Mirov dikare girêdayî rewşa gelek qadan van destnîşan bike.

Hûn pêdiviyên xizmeta ji we re tê dayîn jî baş tênagihin. Yeqîn dikim xirabiya herî mezin mirovek li xwe bike, rastiya bêcidîbûn û bi israr hinek nexweşiyên xwe domandine. Hêrsa me ya herî mezin li hember vê nêzîkbûnê ye. Ger mirov li ser nexweşiyek weke weremê mirov xwe dide pêş bê sekinandin, wê bê dîtin fikara kesayetek ketî ya xwe domandinê ye. Ti wateya vê nîne. Hûnê kî bixapînin? Xwe bi xapandinê ve hûnê heta kur biçin? Bi gelemperî qasî li hember jiyanê, ger rojev bibe ewqas jî li hember şerê mezin xwe xapandin, xirabiya herî mezin mirov li xwe bike. Ketina xeta rast a herî mezin, di mijara çalik û qelîştekên rêyên we yên herî çetîn de hêza rêwîtiyê raber kirine de xwe perwerdekirin tevî her tiştî, pêdiviya wê jî bawer nekirin, qaşo di refên me de ye xwe dana nişandan, xalek hişê mirov ranakê ye.

Hinek ji we dibêjin; “Tehemûl û sebra Rêbertî bê sînore.” Raste, di rêzdariya me ya li hember mirov de, ev sebir û tehemûla me ya bêsînor hewce ye. Lê divê hinekê jî hûn li xwe binêrin. Weke kes li hember yek nêzîkbûna xwe ya bêrêz çi li hember dost, çi jî dijmin dibe tişta bikim, xwe ji vê rewşê rizgarkirine. Lê hûn bêrêziyê û bi her tiştî ve rewşa mirov bêzar dike weke şêwazek jiyanê ye ferz dikin. Ya rastî ya divê nebê eve. Di vê de israrkirin, weke ku dê bi vê tiştekê bidest bixin hizirîn, heta weke ku tiştek nayê bidestxistin jî jiyana serberedayî hiştin û di kesayeta xwe de tinekirin nayê ravekirin. Elbet ev jî rastiya mirovê tinebûyî rave dike. Bi rastî jî ger hûn hatine hinek tişt rizgar bikin, van helwestan wisa bêwate ferz nekin.

Doza me çiye, divê çawa bê jiyîn û şerê vê êdî xwedî binyatek tê fêmkirine. Ev anîna astek ku neyê fêmkirin, her tim bi astengiyan re

rûbirû anîn dikare çi rizgar bike? Hûnê vê kesayeta xwe ya bêxem, dijber, yan jî wan bi bertek pêşwazî dike bi çi rave bikin? Her cure heqareta di civakê de li ser vê kesayetê tê ferzkirin, her cure helwestên dervî jiyanê, tinebûn, birçîbûn, feqîrî, êş û eleme. Wexta hûn weke cihek çareseriyê jî beşdarî partiyê dibin, vêca hûn vê bi derfetên berz ên partiyê ve têkilhev dikin, şêweyekê, kesayetekê derdixin holê û wisa dihizirin ku dikarin bi vê bijîn. Ya rastî hewce dikir em di kêliya destpêkê de ji vê re bêjin raweste. Lê me heta roja îro sebir û tehemûl raber kir. Rêgeza yekemîn a egîdî, li gorî soza xwe bûna xwediyê reftarekê ye. Hûn di vê mijarê de hevgirtinek herî biçûk jî nîşan nadin. Yan pir digirîn, an jî pir bê edep nêz dibin. Kesayetên we yên rastiyan pêk nayînin, ji nişkê ve revê ji xwe re rê dibîne, ancex hêzek we jî ya biserûber têra wê nake, tenê roja hêza wî têrê dike dikare vê bike yên girêka kor hene.

Her wiha bi fêlbaziyê jî hûn nikarin xeta dozek mezin pêk bînin û bi wê xetê re bijîn. Mirovê ez dinasim hewl dide tiştekê fêm bike, ger fêm kiribe jî bi wê re dijî û ger rast be rêya wê esas digire. Niha wexta em van berçav digirin, di rastiya we de ne fêmkirina rastiyan heye, ne jî hewldanek xwe nêzîkirinê heye. Niha hûn vê tînin serê partiya me, ya rastî piranî rastiya hûn ferz dikin wisa ye. Giyanek we heye, hûn wê jî wisa bê wate dikin, ne diyare ji bo kî şer dike, elbet bi vî halê xwe ve jî firsendê dide dijmin, salane bi sextekariya vê re xwe dixapîne û dimeşînê de ne. Ji bo xwe gihandina kesayetek wesifdar û derfetên wê, hûn pirsan jî ji xwe nakin. Nêz nabin karekê fêm bikin, her tim dibêjin; "Cihek din ku ez biçimê jî nîne." Ger cihek hûn biçinê nîne, li gorî qanûnên cihê hûn lê ne, nêrîna cîhanî û rastiya şer tevbigerin. Ger hûn nikarin wê jî bikin, nexwe hûn tam bela ne.

Çil salan ji vê kesayetê reviyam. Wexta min qadek, partiyek ava kir, ne ji bo we bi vî halê we ve bipejirînim bû. Min ji bo ji vê birevim kar kir. Ji bo endamên me sererast bibin ne salekê, du salan, ev bîst salin sebir dikim. Hinek bi nêzîkbûnên bê esil ve qaşo li hember me rêzdarin û xizmetê dikin. Ji vî halê wan hêrs dibim. Carina dibêjim, ev çi hede tê li ber linge min digere.

Zarokek herî zêde hewceyî dayîka xwe û şîrê wê ye. Lê min, di temenê herî biçûk de ev xweş nedît. Ma hûn kîne? Ez kesek wisa me, min xizmeta dayîkê jî nepejirandiye. Bi yek şertî mirovan dipejirînim.

Ger wê cidî fêr bibe dibe. Ger ji bo vê jêhatiya we nîne, nêzî min nebin. Li cem min û cihê min, rê ji bê edeb û cahilan re nîne.

Hêjî mînaka **Kemal Pîr** di bîra min de ye. Piştî nîv demjimêrî ez guhdar kirim, dest bi meşek şoreşgerî ya bêhempa kir û jixwe tê zanîn heta henaseya xwe ya dawî çawa meşiya. Pîvana bingehîn a hevalbendiya me eve. Ez bi israr vê destnîşan dikim. Ger hûn ne xwedî vê pîvanê bin, sempatîzantiya vê jî heye, kesên bi pîvanên sempatîzanî jî bi me re dijîn hene. Wan heman şêweyî pêşketinek raber kiribûn. Niha jî berovajî vê li nava vî karî tije bûne. Qaşo dê hêz ji min bigirin. Qaşo dê xwe bidin jiyîn. Ev nêzîkbûnên herî gêj û cahilî ne. Ya rastî jî ev ne wisa be, me pir sebir kir. Bes hûn nirxa sebrê jî nizanin.

Dijmin ne tenê ji eniyê ve hûn kuştine, dijmin ne tenê dîroka we tine kiriye, dijmin ne tenê derfetê jiyana we ya heyberî bi erdê re kiriye yek. Dijmin hûn di kesayetê de jî tine kirine. Ji pîvanê mirovek asayî jî wêdetir kesayetek komkujiyê jî ji bo we pir dîtiye. Ango hûn anîne rewşek bê bertek, tije şaşî û bi qasî mirov bêje sîxurek objektîfe û we jî ev pejirandiye. Niha ez li hember vê hêrs dibim û bi zorê xwe digirim. Ev kesayet bi min re nabe. Ev kesayet ne bi rêbertiya min a pêncî salî re, bi deh saliya min re jî nabe. Ger hêza we heye, em mijûlbûna bi dijmin ve li aliyekê bihêlin, gelo hûnê bikarin bi nêvenga partiya me re hevnasînek rast bikin? Niha hûn heta dawî bi reftarên cahil, bêxêr û bê pîvan ve xwe ferz dikin. Her çendî hûn ji qadên herî ketî jî hatibin, wexta we gava yekem avêt nêvenga me hûnê ji xisletên we ji wan deran girtî re bêjin raweste.

Nêvenga me, cihê çêbûna mirove, cihê ji nû ve çêbûna mirov a bi rastiyan re ye. Vê ne ji bo xwe dibêjim. Yên herî zêde hûn hewceyî vê ne. Nexweşiya penceşêrê pir xetere, roj bi roj mirov dikuje. Lê belê nexweşiya we, ji nexweşiya penceşêrê xirabtire. Hûn tenê mirovekê jî nakujin, wexta şer dibe mijara gotinê, hûn kom bi kom mirovan jî bi xwe re dibin. Ger di mijara xeta şer de evqas seqetî hebin, tê wê wateyê ku hûn nexweşiyek ji penceşêrê jî xirabtir dijîn û ev jî rastiyeke. Penceşêra kes wî tenê dibe. Lê di nava siyasete de, nexasim di nêvenga artêşê de kesayetek bi nexweşiya penceşêrê her tiştî bi xwe re dibe.

Evqas nirx tên windakirin, lê hûn li hember vê qet nahejin. Her roj dema encam tên lê dinêrim: Camêr tenê ji bo beredayîna xwe, bêberpirsyariya xwe li cihekê bi sedan çek tevî dest dijmin ve berdaye, hêjî rêveberiyê dike. Emê çi ji vî ketî bikin? Ger hinekê bi hîsa destê

xwe mijûl bibe, tevî dikare gelek nirxan rizgar bike, ji bo tenê wî canê xwe yê pîs rizgar bike, ewqas nirxî ji dest dijmin ve diberde. Carina jî ji ber bê quralî, bê pergalî û bêberpirsyariya xwe hevalên herî hêja terkî mirinê dikin û hêjî rêveberin.

Mirov ji vî kesî ditirse. Berî her tiştî ev mirov bê terbiye ye, pir bê rêze û ecêb dimînim ji bo çi di vê partiyê de dimîne. Bi qasî misqalekê bi navê wijdan tiştek pê re nemaye. Di derbarê serfiraziya miletekî de tiştek pê re ne maye. Her kêlî weke kontrayekê êrîş dike û vêca vê jî li ser min ferz dikin. Ango hêj nizanin dê çawa li hember saziyekê baxivin. Ji netewên din, hinek dostên min ên ji rêzê hene. Yek li wan, yek jî edep û asta rêveber û milîtanên me dinêrim, di navbera wan de bi qasî çiyan cewazî heye. Di her axaftina yên me dikin de tawanek û bê edebiyek heye. Heta dema em asta mirovên ji eniya dijmin jî tên dinêrin, şaşwaz dimînin. Ev rewşek pir xirabe. Ango hûn divê bizanin vê rewşê derbas bikin.

Bi ser we de têm. Bersiva hûn didin jî girî ye, her tim ferzkirina şaşiyên xwe û kesayeta xwe ya bi nexweşî ye. Wexta destûra vê jî nadim, hûn xirabkariyê dikin û ji destê we bê, hûnê ber bi îxaneta herî mezin ve jî biçin. Çi feydeya van ji we re heye? Ezê di vê mijarê de ji we re bêjim, ger bi qasî misqalekê jî xwediyê dîrok bin, pirsgirêka we ya bûna mirovê miletekî û hemdem hebe, hûn neçarin hewcedariyên van fêr bibin. Ger hûn nikarin teşe bidin reftarek xwe ya herî biçûk û di mijarekê de hewce nabînin bihizirin, emê çi ji we bikin? Evder nêvenga partiyê ye, evder cihê hêviya miletekê ye, cihê ji nû ve vejîna miletekê ye. Bi qasî serê derziyê jî be, hûn çima vî derfetî fêm nakin? Hûn dibêjin; "Ez tolazim, dijmin ez anîme vî halî." Raste, bi rastî jî dijmin hûn xistine nava jiyanek pir ketî. Lê belê bersiva ku divê hûn jî bidin vê pêwîste bi helweste weke; "Qet nebê ez jî dijminê bi xwe re bikujim. Vê bê edebî û bê hişiya xwe derbas bikim. Pêşî xwe bikim mirov" be. Pêwîste encama yekemîn hûn ji rastiya xwe derbixin ev be.

Ketîbûna dijmin fêrî we kirî wisa ye: Xwe nêzî fêrbûnê nekin, rastiyan nebinin, dîsîplînê nas nekin, li hember mirov rêzdarî û hezkirinê pêş nexin. Ev ne rewşek ketîbûna ji rêzê ye. Mirov dikare rewşa mirovên ji rêzê û ketî heta radeyekê bi feraset pêşwazî bike. Ji ber ew ji ber zehmetiyan ketine wê rewşê. Vêca mirov dikare ewqas bi rastiyan lîstina we bi çi rave bike? Hûn jî bi hêcet dibêjin; "Dijmin wisa li min kiriye." Ew dijmine, dê bike. Madem we jî dijminê xwe nas kiriye,

nexwe rastiyan hemêz bikin. Madem we çare dît, nexwe çareyê hemêz bikin.

Ez hêjî bi xiroşek mezin a avakirina derfeta azadiyê ve dimeşim. Ev pêxwarina min a bingehîne. Me her tim ji xwe deh qatî zêdetir derfeta azadiyê da we. Me hûn gihandin çiyan, çek û yekîneyan. Bes vê carê jî we bi qasî neyê hişê dijmin jî ev derfet wêran kirin. Em jî di we re dibêjin, sedemên vê rave bikin. Bersiva we jî wisa ye; "Kesayeta min sefîle, dijmin ez û malbata min aniye vê rewşê. Ez jî bi vî şêweyî çêbûme û hatime mezinkirin." Kanî hûn mirovên serbilind bûn? Kanî heysiyetek we hebû? Kanî we soza partî, soza şoreşê dabû? Ma mirov evqasî vale daxive? Bi salane hûn di nava vê dozê de ne. Lê mixabin weke ku hişê we bi serûber tiştekê re naşixule, karê we jî her tim tehrîk dike û her tişt valederxistine.

Weke di mînaka dawî de jî hat dîtin, wisa xwe bi dijmin didin pejirandin, kêmek maye hemû xirabiyên cîhanê, her tişta ku dijmin dixwaze, tenê ji bo wî canê xwe yê pîs rizgar bike dipejirîne. Ger hûn vê kesayeta fermandarê sexte lêkolîn bikin, hûnê her tiştî li wir bibînin. Me ew kesayet li vir jî nas kir. Beriya biçe cem dijmin, me li vir dahûrand. Ez bi xwe pê re pir eşkere axivîm. Min got kesayeta te wisa ye. Lê rikbar bû û ya xwe kir. Niha dijmin jî ji wî şerim dike. Gel û hemû mirovatî ji wî şerim dike. Mixabin ew hêjî daxive. Kesayeta herî bi lenet cureya vî Kurdî ye. Ez vale vê teoriyê pêş naxim. Jixwe mînak jî pir balkêş li holê ne.

Çeka we dîtî, remza şoreşê bi xwe ve dikin û hinekê jî xwe bi namûs dîtine. Bi salan di bin navê fermandariya PKK'ê de wê kesayeta xwe ya kirêt vedişêrin û dijîn. Bes vekiriye dê ev zû-dereng biteqe. Vê şaşiya mezin, wisa ji demê re nehêlin û dirêj nekin, kêliyekê zûtir derbas bikin. Hûn nikarin bi min re dînîtî bilîzin û kesayeta xwe ya ketî bi min re bidin jiyîn. Êdî hinek tişt ji xwe re bikin guhar. Divê hûn biryarek misoger bidin. Gelo bi rastî jî hûn cengawer û milîtanên dozekê, xetekê û artêşekê ne? Bersiva vê pirse bidin û li gorî wê tevbigerin. Di vî karî de zorî nîne. Biryar bidin û bila ev biryar jî, biryarek ku hûn heta dawiya temenê xwe pê ve girêdayî bin. Bi biryara xwe nelîzin. We ev ji xwe re kiriye fêrbûnek. Ev tiştek seyre. Hûn hebûnek ecêbin. Li derdora xwe dinêrin û ger kesek tinebe yekser hemû rastiyên dizanin davêjin nava gelaşê. Ya dimîne kesayeta ketiyê şaşiyên xwe yên mezine.

Ev rewşên kesayetên we pir ecêbin, seknên we fêm nakim. Li cem me jiyan bi xwe zehmete. Li cem me hinem amûrên jiyanê hene. Li cem me amûrên bîrdozî û siyasî bingehin. Ev partî ne, rêxistine û zehmetî ne, bi van tê derbaskirin. Xala hêj min di deh saliya xwe de fêm kirî, hinek tişt tenê bi rêxistinbûnê dibin. Hûn hatine vî temenê xwe, lê hêjî nikarin vî amûrî bikar bînin. Wexta em behsa amûra rêxistinê dikin, gotina yekemîn hûn dikin; “Divê wê bişkînime.” Ji bo we bidin jiyîn, rêxistin çeka yekane ye. Niha di serê hemû karên ku milîtanên PKK’ê dikin de, şikandina çeka rêxistinê danîne pêşiya xwe. Ango wê li gorî quralên rêxistinê nejî.

Ev tiştek ecêbe. Misoger ev dişibin nêzîkbûnên dînekê. Dînek, her kêlî bi derfetên jiyanê re şer dike û jiyana xwe parçe parçe dike. Ya hûn jî dikin, di vê wateyê de tam dînîtiyek siyasî ye. Nepêkanîna quralên rêxistin û şer, nepêşxistina xîtabek rast û berovajî vê kirin pratîka we vedibêje. Hema hema di zanyariyên her kes dide me de ev rewş hene.

Yeqîn dikim hûn weke raveya kontrayên ku rastiya dijmine yên her tiştê wan ji dest hatî girtin, bi her tiştî ve ji tinebûnê re hatiye amadekirin, heta ji vê jî kembaxtir ketiye rêyekê, di nava malbata mirovahiyê de mîna wê nehatî dîtin xwedî rastiyek nexweşiya civakî ya giranin tevlî me bûne. Jixwe fermandar Zekî, ev selmand. Fermandar Zekî, pir baş vê îtîraf dike. Hûnê ji vê encaman derbixin. Cuda rêya vê nîne. Qaşo dê bi min re şer bike û min biqedîne! Ger camêr hinekê bi aqil be, nirxandinek wisa nake. Niha li kure? Dijmin jî bawer nake, ewê bikare bi min re şer bike. Dijmin heft salan da şerkirin, mixabin encam sifire. Niha jî tişta tê kirin keça min ji te re dibêjim, bûka min tu jî fêm bike. Ma bi Rêbertî re wisa tê şerkirin? Ger hûn wisa bidomînin, dê heyfa we be. Ji ber piraniya we ji wî zêdetir di rewşek şipirze de ne. Rêber hinek çareyan dibînin, hinek derfetan diafirînin, vale xwe weke Rêber binav nakin. Nexwe ne gengaz bû em bikarin rojekê jî xwe li ser vî bingehî bidin jiyîn.

Qaşo ji bo camêr bi min re şer bike kêmek maye tika ji dijmin bike û bêje; “Wext bide min.” Dijmin vî wextî nade. Dijmin binkeftina generalê xwe jî bi mirinê encam dike. Ma dibe ew we efû bike? Dibêje; “Bihêle ezê şer bikim.” Bes di şerkirinê de jî binkeftî ye. Ma kesê evqasî binkeftî kes dide jiyîn? Lê ev îdîaya we ye. Bêku tiştên bê serê wî bizane jiyîn û her wiha xwe pir bi aqil dîtin, tiştek tirsnake. Ger wêjevanek xurt hebûya, romana we binivîsiya! Ya rastî ez jî dixwazim

nirxandinên siyasî danim aliyekê û romana we binivîsim. Hûn bi feraseta jiyanê, feraseta şer, bi sekna di refên me û destê dijmin de, di rewşa kesayetên pir ecêb de ne. Di dîroka me de mînakên wisa pirin.

Ez mirov di mijara rêzdariya li hember mirov di radeya herî bilind de rave dikim û bi qasî misqalekê jî ji vê dûr nakevim. Li cem me her tişt azad û dilxwazî ye. Vêca tevî vê, hûn çima evqas lîstokên bê binî dijîn? Zora we çiye? Ma tawana me, weke bi sedî salan hatine rêvebirin, rêveberiyek û îşkence li ser we neferzkirine? Hûn vê jî weke kêmasiya me dibînin, bes ji bilî vê jî rêya we ya mirovbûnê nîne. Di berdêla berjewendiyek biçûk de, kesayetên we çil teqleyan davêje. Di terorek biçûk de, kesayetên we hemû hebûn û tinebûna xwe terkî dike. Yek carê hişk nêzî bibim, çi feyde ye, dê ev çi rizgar bike? Jixwe hûn ji pisîkekê zêdetir ditirsin. Vêca ez jî bitirsînim, emê jî ya dijmin dûbare bikin.

Lê hûn vê nêzîkbûna me weke bêçaretî dinirxînin. Ev nêzîkbûna me, ne encama belengaziya rastiya Rêbertiyê ye. Di rastiyê de ya bêçare rastiya we ye. Yê ku nikare hêza girêdana bi sondekê jî raber bike hûnin. Hûn nikarin rojekê tenê jî xwe tevlî rastiyek mezin bikin. Meziyeta herî mezin we di sînorên; “Zêde nikarim fêm bikim, zêde cidî jî nagirim” de girtiye. Ev rewşa we ya herî bişaftiye. Ne li gorî pêşveçûnek asayî ye. Ne li gorî şoreşê, ne jî li gorî şoreşa dijbere. Ya rastî zêde jîndarbûna vê jî nîne.

We hevsengiyek wisa girtiye. Xetek dijmin heye, hinekê jî we weke dînek kêm-zêde lêdan xwarî li wir derbiye girtiye. Weke din jî xeta me heye. Elbet ancex dikarin bi aqilek mezin tevlî rastiyên me bibin. We li gorî vê jî seknek diyar girtiye. Vaye bişaftin wisa ye. Niha jî dijmin li ser vê teoriyên weke; “Em çawa dikarin ên bişaftî bikişînin” dihilberîne. Xalek tirsnake, ya rastî navê vê timarxane ye, girtîgehe, zindane, weke kobay bikaranîne. Hûn ne di ferqa vê tirsnakiyê de ne û di vir de jî çeka we ya herî mezin cehalete. Hûn dibêjin; “Ez fêm nakim, nabihîzim.” Ev ne pêşveçûneke.

### Qutbûna Ji Rêxistinê Yekser Windakirine

Em zêde tiştekê ji we naxwazin. Hûn bi xwe hatin nêvenga me. Gava vê ya destpêkê, rastiya hûn beramberin bi navê partiyekê, bi navê artêşekê fêmkirine. Êdî gelek tiştên we yên cidiyetê dixwaze hene. Ya

girîng xwe qanekirine. Li hinekan dinêrim, du rastiyan nabînin. Kêmek maye li çavên min binêrin, min bixapînin û xwe jê xilas bikin. Kesayetên xwe yên ne eslî û tolaz bi hêza ji min girtine ve vedişêrin, wê bi şêweyek hîn xetertir li çep û rastê ferz bikin. We jî dît ev kar wisa nabin. Mane dijmin şêweyek mirinek wisa pêş xistiye! Dijmine wê bike, beramber vê bertek jî najîm. Ji ber karê dijmin, dijminatî ye. Bes hûn çima ji bo jiyana xwe ya hewce nakin? Vêca li şêwaza mirina xwe binêrin, bi rastî jî negengaze bê ravekirin.

Ji vê nefret dikim: Dibêjin; “Li zindanan destdirêjî li ser mafên mirovan heye, em li ber xwe didin, di rojiya mirinê de ne.” Di rastiyê de ew rojiya mirinê li ser vî bingehî nehat kirin. **Mazlum**‘an, **Kemal**’an, **Xeyrî**’yan bi yek armancî –bi armanca bîrdozî û siyasî- ew çalekî lidar xistin. **Xeyrî** got; “Ji bo ez dev ji partîbûnê berdim hûn van îşkenceyan li min dikin.” Her wiha ji bo dev ji partiyê bernede tevlî çalekiya mirinê bû. **Kemal** heman tişt got. Jixwe **Mazlum**, ev hîn kûrtir hîs kir. Ji bo têkoşîna bîrdozî ev çalekî hewce bû û ji bo wê xwe feda kir.

Vêca pêşketinên pey wê re binêrin. Ji bo ji qawîşekê biçin a din, li ser xwe bigerin û bi hev re baxivin tevlî çalekiya rojiya mirinê dibin. Wisa nabe! Dijmin jî ev qelsî dîtiye, weke pisîk bi mişk re bilîze, bi we dilîze. Hûn di girtîgehê de ne, pisîk jî her roj li wir bi we dilîze. Dibêje; “Ha ji te re mafek biçûk.” Mafê çiye? Hûn jî dibêjin; “Mafên me bidest xistine.” Mafê we bidest xistine çine? Ango evqas bêpîvanî heye.

Ev heman di gêrîla de jî wisa ye. Vê mînakê ji ber vê didim: Dijmin li wir jî weke pisîk bi mişkê bilîze, bi we dilîze. Li wir jî vê carê li hember rêxistinê mafên takekesî tên xwestin. Tê gotin; “Ez dixwazim keyfî bijîm. Fermandariyê jî li ser vî bingehî bikar bînim.” Dijminê xwe bibînin, niha dijmin li ser serê we ye. Dê siberojê wan mafên hûn behsê dikin bi we re bixe binê erdê. Niha hinek li dijî hemû rêxistinê radiwestin û dibêjin; “Ger a ez dixwazim çênebe, ez jî şer nakim.” Ya tu dixwazî çiye? Ya divê hûn bixwazin, mafê şer rast bikaranîne. Ji ber hûn di nava şer de ne, qural û hedefên şer hene. Hûn van datînin aliyekê û dibêjin; “Ezê çawa xwe bidim jiyankirin?” Ewder ne cihê hûn xwe bidin jiyîne. Hûn tenê dikarin li wir xwe bi şer bidin jiyîn. Tevî hûn di nava partiyê de ne, ti quralê partiyê pêk nayînin û bertek raber dikin. Hûn jiyanê jî li ser vî bingehî digirin dest. Kêliya hûn ji qural û rêhevaltiyê qût bûn, xwe azad hîs dikin û dibêjin; “Nezî min nebin, ger hûn nêzî min bibin ezê xirab bikim.” Dema azadî tê gotin ev tê bîra we. Vaye yê

herî aqilmend ji partiyê qût bû, çi bidest xist? Li van deran hûn jî pir di xeteriyê de ne.

Qutbûna ji rêxistinê yekser windakirine. Ji xetê qûtbûn, tê wateya wexta pirê re derbas bibe yekser ketin û gindirîna dolê ye. Xet pire. Wexta mirov ji pirê digindire bikeve kuderê, dema ji xetê qûtbû jî dê bikeve wir. Ev hemû hatine selmandin. Niha ya hûn jî li ser me ferz dikin eve. Vaye artêşa dînan hat! Yan hûn xwe li çep û rastê pirê dibalînin, an jî hewl didin xwe ji pirê bavêjin. Hemû tişta dikim, we sax ji pirê derbas bikim. Şev û roj karê dikim eve. Hinekê bi aqil bin. Li ser pirekê, ango di xetekê de rast bimeşin. Qaşo hişê wan nîne! Vêca yê hişê wî neyî dê çawa bibe mirov? Xwe sipartine hêza çors! Vêca hêza çors bi kî re heye? Ya rastî neku ji bo tu mirovî hêza çors bi te re ye, bi dijmin re ye. Hêza çors jî bi rêxistin û çeke dibe. Min gelek tişt di derbarê me demanceyek, kleşek çawa bidest xistiye vegot. Ev çek ji kur ketin destê we? Bavên we yên herî dewlemend jî, ma kleşek da we? Ma yek-du mehan hûn li çiyan gerandin? Hêza wan têra vê dike? Na.

Me ev çek weke bi serê derziyê bîrê bikulin bidest xistin û di bin fermana we de ne. Belê bi van çekan xwe hêz dibînin! Biçin cem eşqiya Hemîdo bipirsin, wî jî wisa çek bikar ne aniye. Me çek li ser vî bingehî bidest nexist. Hûn weke nîv kontrayan êrîşî çep û rastê dikin. Çiye, qaşo xwedî hêza çorse. Girêdayî hêza xwe ya çors dijî! Hûn ji her cure qural, edep û rêzdariya hevalbendiyê direvin. Ji we re dibêjim, vê nekin. Ger hûn hinekê li gorî terbiya bav û malbata xwe tevbigerin, dîsa jî hûn şaşiya nakin. Ya rastî ka wisa nameşin. Ger rêveberiya PKK'ê ya rojane nebe, dê wê hêza we ya çors di mejiyê we de biteqînin. Vaye ew kesayetê xwe dinepixand, xwe pir bihêz didît. Mişkek jî nakeve vê rewşê. Hinekê li hember rastiyan rêzdar bin.

Hûn ji bo fêrbûna hinek tiştan tên cem me. Ez di hemû çalekiyên xwe de şaşiya peyvê jî nakim. Ecêb dimînim ku hûn çawa dikarin vê nakokiyê wisa bigihînin astek xeternake. Hem jî vê bi navê me, bi navê partiyê dikin. Lê ji bîr nekin, hûn dîsa girêdayî me dijîn, hem jî bi quralên bingehên ên jiyanê ve û bi şêwaza me şer dikin wisa dijîn. Dema vê dikin jî çeka we ya herî mezin dînîtî ye. Ma ti berpirsyariya dînan heye? Wexta dîn di pirê re derbas dibe, misoger rast nameşe. Yan di kendala çepê de, yan jî di kendala rastê de dixwaze xwe bavêje. De vêca emê çawa rawestînin? Elbet dijberiya vê ya din jî wisa ye. Wexta hêza çors ne di dest de be, weke êşa weremê dinale! Ez li hember dîna jî

rêzdarim, lê ne li hember nexweşê weremê. Hûnê bizanin nikarin wisa di nava rêxistinê de bimînin. Ev hekareta li hember mirove. Hûn her tim digirîn. Giriyê şaş fêm nekin. Giriyên we, bêçaretî û neçartiya hûn dijîne.

Sedema herî bingehîn a îsyana min a yekemîn tê bîra min. Birayê min ê navîn xwedî lîstokek wisa bû: Hinekê sistahî û bêxîretî dikir, paşê jî dixwest xwe bi ser kerê bide siwarkirin. Rojekê dîsa qaşo nexweş ketibû. Ji bo wî siwar bikin me ker amade kir. Ez ji aliyekê ve, birayê din ji aliyekê ve me dixwest wî rakin. Ji bo kere siwar bibe, yek livdanek wî ya herî biçûk jî nebû. Dest û lingê xwe tam sist kiribûn û bi ser me de diberda. Me digot bi destê xwe vê kemberê bigire, lê wî ne digirt. Me heta Xelfetî wisa bir. Piştî wê wexta carê wisa dikir, vêca me bi keviran dida pey nizanim heta kuderê diçû. Çîroka îsyana destpêkê wisa ye. Ew roj ev roje li ser hember nêzîkbûnên wisa bi hêrsim.

Ya rastî ev rastiya we ya civakî ye. Di wateya siyasî de jî sekna we wisa ye. Camêr dev ji xwe berdaye, hinekê bi ser xwe ve bê dikare li ber xwe bide. Bes wisa fêr bûye û wê bi temamî kar xirab bike. Nepêkanîna quralan heye. Niha jî hûn vê lîstokê dilîzin. Qet quralan pêk nayînin. Ya ku we rake hêza rêxistinê ye, çeka rêxistinê ye, quralê rêxistinê ye û bîrdoziya rêxistinê ye. Ger hûn rast binirxînin, dê ev we bidin meşandin. Vaye amûr eve. Partî amûreke, dê we bigihîne armanca we. Dê ji bo we ji cihekê bibe ciheke din bê bikaranîn. Bes hûn nikarin vê amûrê baş bikar bînin. Paşê jî dibêjin; “Rêbertî were, bi vir ve bigire, miletê min were, tu jî ji vir ve bigire.” Vêca, hûn kîne û çi dikin? Dibêjin ku nexweşin. Êdî hûn vê weke fêlbaziya gundîtî, penceşêriya siyasî, penceşêriya leşkerî binav dikin, çi dibêjin bêjin, lê ev bi yek gotinî şerma herî mezine. Wisa ti raveya vê nîne.

Divê mirov li hember çeka xwe rêzdar be, bîrdozî û quralên rêxistina xwe bizane. Mirovê rêxistinê kargeriyên weke civîn lidarxistinê, nivîsandina raporan û ferman dayînê tevê dizane. Tiştên hûn li çiya dikin, bizin jî nakin. Bizin ji bo hêsan nebin nêçîra nêçîrvanan her tim di navbera zinarên saxlem de tevdigerin. Ya rastî ev hemû jî mijara wêjeyê ne. Ez li vir dahûrîna siyasî û leşkerî dikim. Lê divê mirov ji bo we romanek baş binivîse.

Bi rastî jî rewşek we ya wisa nexweşî nîne. Bi qasî dizanim mejiyê we kar dike, ji ber dane wê destnîşan dikin. Hûn ciwanin, wisa ji taqet jî neketine û halê we ya weremtî jî nîne. Nexwe ev hemû tiştên hûn

dikin lîstokin û bê edebî ye. Sebir û tehemûla li hemberî van jî heta radeyekê dibe. Dijmin hoveber dikuje. Qaşo fermandarê bi navûdeng jî çû. Bi qasî dixwaze dikare bêje; “Min xeta we pêk anî.” Dijmin dîsa jî rehmê pê nayîne. Dijmin generalê xwe, fermandarê xwe yê cendirmeyan efû nake. Sîxurên di nava xwe de efû nake. Dê wî çima efû bike?

Ji aliyê din ve jî li nûçeyên şerê xwe binêrin. Endamê me di xewê de hatiye kuştin. Dibe qey fermandarê me ji bo geştiyarî çûye Antalya. Dibe ku tengav bibe, lê jiyana geştiyarî û şer têkilhev kiriye. Dijmin jî dît, ew şopand. Dibe ku çend salan jî tengav kiribe, peyre jî terorek hoveber pêk anî. Mixabin ew, nizane çawa jî mir. Tenê bi hinek rehetiyê hatiye xapandin. Her zindî, xeteriya bi ser wî de tê ferq dike û li hember wê parastinekê pêş dixe. Bes ew hêza van a parastinê jî nîne. Qaşo dê li wir bijî! Dê çi bijî? Bi rastî jî vê felsefeya xwe ya jiyanê ber çavan re derbas bikin.

Ez cixareyekê jî ji bo xwe weke dijminekê dibînim. Êdî binêrin, cewaziya me di vir de ye. Ez dihizirim dûxana vê pêşiya min dike mij û li hember hêrs dibim. Bes hûn xwe dispêrin wê. Piraniya we ji ber vê bi bertekin. Ango wisa gelek fêrbûnên we hene. Em li vir rehetiyê weke xefkê dibînin. Jiyînek bi xeml û şemal weke tiştek jê nefret bikim dibînim. Tiştek bi qasî serê derziyê dikeve destê endamên me, yekser dibêjin; “Hinekê li vir bijîm. Hinekê zehmetî nedim xwe.” Vaye tiştên xwarinê hene, xewek jî heye. Piştî wê jî de were vî cenazeyi bibe û cîh çêbike! Her wiha ev rewş bi gelemperî jî derûniya şervan re lihev nake. Şerker li cihê rehetî lê heyî nabe. Rihê şerker, misoger xerîbê vê têgehê ye.

Di vê qonaxê de, ji min bigirin heta sempatîzanên me ji bo yek ji me rehetî nîne. Kesê hinekê dijminê xwe dinase dizane ku, dijminek dervî quralên şer ê hoveber heye. Her cure şerê qirêj ferz dike. Ev eşkere ye, hewce nake vê ji we re biselmînim. Encama ku hûn ji vê jî derbixin, divê hûn xwe di nava şerek dana jiyînê de bigirin. Hûnê bêjin; “Çi hewce bike, ezê kesayeta xwe ya cengawer bi wê biparêzim.” Ti aliyê vê yê neyê fêmkiirn nîne. Hûnê bêjin; “Tişta ku bi qasî serê derziyê dijmin paşve bixe çiye, ezê wê bikim.” Mixabin beramberî vê ya hûn dikin bi çekê lîstin, erdnîgarî lîstin û bi yekîneyê lîstine.

Qaşo xem ji cîhanê didize, li cîhanê dijîn. Lenet li vê jiyanê be! Ev çi jiyane? Kesek bi qasî min dildarê jiyanê nîne. Ger derfeta jiyanekê hebûya dê min jî bijiya. Hûn di bin rûpoşa; "Em girêdayî Rêbertiyê ne" de, dixwazin paşverûtiyên xwe bidin jiyîn. Ma em tenezilî jiyanên wisa dikin? Nirxên me didin jiyîn û li ser lingan digirin cuda ne. Jixwe em di xewnên xwe de jî bi vî dijminî re şer dikin. Tenê bi şêweyekê xewnan dibînim, ew jî ew jî pir tirsnak ketina bin venêrîna dijmine. Tam dijmin nehatiye, lê her tim xewnên dibînim dişibin hev. Her tim weke ger dijmin piştî nîv demjimêrî bê dê çi bibe? Xof ava dike û her tim di şêweya tirsnak de encam dibe. Li ser wî bingehî şiyar dibim, heta beriya şiyar bibim ji xwe re dibêjim; "Ev tişta dibînim xewne, ne gengaze wisa piştî nîv demjimêrî dijmin bikişînim ber xwe ve. Xewne, xewne" û bi rastî jî şiyar dibim. Ji ber tê fêmkirin ew xewne. Derûniyek wisa li ser me serwere.

Dijmin tê, dibe riban û dikeve çavên we, bes dîsa jî şiyar nabin. Vê jî bi wêrekiya we ji partiyê girtî, ya rastî wêrekiya çors ve girê didin. Ez di xewna xwe de jî dihizirim gelo dibe ku dijmin piştî nîv demjimêrî bê qiyametê radikim. Hûn ji vê jî encam dernaxin, qet ne di xema we de ye. Qaşo wêrekiyê ji min digirin! Hinek endamên tarîqatan hene, qaşo ev bi hêza ji kerameta şêx digirin dijîn. Wêrekiya we jî dişibe mûridiya wêrekiya ji kerameta şêx digire. Wêrekiya fêr dikim ne wisa ye. Hûn vê ji ber xwe derdixin. Ger wisa ne, nêzî şêwaz û çeka me nebin, ji ber hûnê lê bikevin. Jixwe hûn pir xirab jî dimirin. Ma ez berpirsê vê me? Na. Ji ber hûn naxwazin vî karî fêr bibin.

Hûn nikarin bi Rêbertiyê re bi qasî serê derziyê jî li hember her tiştê li dijî rêxistinê, xirab bikaranîna wêrekiyê yan jî xirab bikaranîna fîşekekê, heta pariyek nan jî valehiyekê bibînin. Vêca ev kiryarên we tên çi wateyê? Hûn ji kur fêrî van bûne? Hûn ji silala xwe fêr nebûn, ji ber bavê we jî derfeta wisa xwe dana jiyankirinê nade. Hûn kedxwariyê li ser me dikin. Belê ji ber canê we jî hêj nebûye metayek hêsan, xam û nehatiye pijandin, ezê nebêjim hûn vale difiroşin, davêjin nava agir. Ez ji vê re nabim amûr.

Van tevan ji bo vê dibêjim: Xwe bi sipartina min ve li ser vî bingehî partîbûn çênabe. Mirov li ser vî bingehî naçe şer. We naqewitînim, mirovek rêzdarim. Dibe ku hûn xwe veşêrin, bi salan xwe ferz bikin. Bes ên neheq hûnin. Paşê jî nebêjin; "Ezê wisa bi Rêbertiyê re şer bikim, wisa wî birûxînim." Ev jî axaftinên vale ne û

wê dawiyek we xeternak bîne. Ger li hember xwe rêzdar bin tiştekê rast hîn bibin, bes bêku berovajî bikin fêr bibin. Hûn pir sûbjektîfin. Rastî, ne yên di nava min de ne. Rastî, rastiya miletekî ye. Rastiyên objektîfin. Ango ne li gorî niyeta minin. Çiye rastiya wî? Ev rastiya rizgarî ye. Rastî partiya rizgarî, artêşa rizgarî û taktîka rizgarî ye. Emê tev fêrî wê bibin û tev jî girêdayî bimînin.

Her tim gotinên weke; "Li gorî min" nabe. Xala ku hûn dibêjin; "Li gorî min", hûnê winda bikin û bidin windakirin. Ev alfabeya vî karî ye. Hêjî em nikarin xwe ji vê sûbjektîvîzma xirabkar rizgar bikin. Ya rastî ev ne cehaletek çavreşiye jî, zêdetir li gorî dînîtî guncave, şêwaza kesayeta dînbûyî wisa ye. Li leşkerek dijmin û sekna wan a dibistanên şer dinêrim: Tevî ku armanca wî talan û wêrankirine, mirov xwe nagire heyran nemine. Dibintanê ne bi navê mirovatî, tevî ku li dijî gelê xwe, dijî gelan şer dide fêrkirin, hemû jî weke şûrane. Ma we dîtiye leşkerek dijmin, yek serbazê dijmin bi qasî misqalekê jî dev ji Kemalîzmê berdaye? Her wiha qey we dîtiye bi qasî misqalekî ji sekna dîsîplînê dûr ketiye? Misoger na.

Vêca hûnê evqasî qûtbûna xwe ya ji armanc, qûtbûna xwe ya ji kesayeta leşkerî ya di xeta armancên xwe de bi çi rave bikin? Tenê dikarin vê bi ketîbûnê rave bikin. Bi nêzîkbûnên; "Ez ketime, wisa li min hatiye kirin, wisa hatime fêrkirin" ve hûn dikarin rave bikin. Evqasî qûtbûna ji quralan, evqasî bê kesayetî cuda bi çi tê ravekirin? Bi leşkertî lîstin tê çi wateyê? Di leşkertiyê de bi quralan lîstin tê çi wateyê? Di heman demê hebûna camêr ne yek, hemû hebûna wî bi quralan lîstine. Bi taktîkê bingehîn ve dilîze, bi dilxweşî dilîze, hinek amadekariyên pratîkî yên neçar ji nedîtî ve tê! Vêca ev hemû çine? Niha ev ji hêla we ve xala herî zehmet bê ravekirine. We çima ev helwest raber kirin? Tenê yek raveya we heye, ev jî bê terbiyebûne.

Lê belê leşkertî bi terbiyê destpê dike. Siyaset koka xwe ji seyîsê tê. Seyîstî jî, hunera terbiyekirina hespane. Hûn li dijî terbiyê derdikevin, lê dibêjin; "Em siyasî ne." Leşkertî bi temamî dema hewce kir, xwe avêtina nava agire. Dîsîplînê bi kesayet ewqasî didin pêkan, paşê dikin leşker. Mixabin hûn, rastiyên herî bingehîn jî di carekê de davêjin aliyekê û belav dikin. Hem jî di bin navê fermandariyê de dikin! Zêde hewce nake ev bên ravekirin. Pirsgirêk ne eve jî. Pirsgirêk gelo hûnê xwe bikin kesayetek bi vîn û dîsîplîne yan na? Di vê mijarê de pêwîste hûn xwe jî, me jî qane bikin. Kesên ne wisa bin, divê di nava partiya me

de nemînin. Em dixwazin li ser vî bingehî nava partiya xwe jî, artêşê jî lez û bez zelal bikin.

Dibe ku hêj hêza vî gelî ya quralên xwe bi we bide pêkan derneketiye holê. Lê em şervanên azadiyê yên gel, ên li ser bingeha fedaî ne. Ji bo vê jî em peywirdarê pêşxistina quralên afirînerin. Em rêxistinek ji miletên hêzên wan heyî quraltir, zêdetir bi armanc û bi dîsîplîn dimeşine. Hûnê wisa fêm bikin. Hûn dibêjin; “Ez ji bo partîbûnê, heta artêşbûnê hatime.” Nexwe heta mirinê quralê vê fêr bibin. Li cem vê nabê bê gotin; “Ezê biçim, di rê de bimirim.” Di refên me de mirina erzan nîne. Yek jê quralek jî, qurala hêsan nemirinê ye. Şerkirinek ji rêzê nayê pejirandin. Esasî ya ji we tê xwestin, cengaweriyek bi qural û li ser bingeha esasên taktîkî ye û di şer de şêwaza serkeftî ye. Ya girîng hûn gihan şêwaza serkeftinê yan na? Misoger hûn ji vê bawerin?

Hêceta xwe gihandina vê jî nabe. Hûnê li vir peyvên weke; “Paşverûtiyên min hene. Ez hîlebazim. Ya rastî ez kesayetek pir lîstokan dikime” qet bikar neyînin. Dibe ku ev di jiyana we ya berê de hebin, lê hûnê niha jêkin û bavêjin. Ji bilî vê li vir encam nayê girtin. Li vir kes nikare parazvantiya cahîltiyê bike. Kes nikare bêje; “Fêr nabim.” Yê fêr nebe, qet nikare di nava we de bimîne. Yên qet ne xwendine jî tên, li vir bi qasî ewliyakî fêr dibin û diçin. Li vir mijarek weke nefêrbûnê ne mijara gotinê ye. Mirovê hoveberiya vî şerî hinekê bi berpirsyarî hîs dike, pir baş fêr dibe. Tiştên ku deh salan de fêr bibe, di sê mehan de fêr dibe. Di vê mijarê de ezmûnên min hene. Jiyan fêrî mirov dike, herî zêde jî şer fêrî mirov dike. Ger hûn nikarin ji pirtûkan fêr bibin, şerek îmhayê ya tirsnak heye, hûn çima ji wê fêr nabin?

Li vir xwe di nava tawanbariyek mezin de digirim. Hûn xwe dispêrin min vê sextekariyê didomînin. Ez jî dixwazim vê çareser bikin. Her tim pirsa çima xwe dispêrin min û wisa çêdibe ji xwe dikim. Kêmasiya min çiye? Na, lê dinêrim, zêdahiyên min hene. Ji xwe re dibêjim, niha ezê van zêdahiyên xwe çawa ji we bigirim? Zêdetir bi ezmûnim û min xwe baştir amade kiriye. Reîsê malbatek mezin çawa zarokên xwe û eşîretê diparêze, dibe ku we jî helwestên min wisa fêm dikin. Lê ev şaşe. Me wisa ji bo parastina yekîtiyek eşîrtî, yekîtiyek malbatî ev berpirsyarî negirtiye. Bes bi kesayetên xwe yên bi kevneşopiyan çêbûyî ve hûn dibêjin; “Ev bave, ev Xwedayê mine, ev xalê mine, nizanim ev çiyê mine.” Wisa jî wê kesayeta xwe ya kevnar

vedişêrin û didin jiyîn. Hinekê jî şaşî wisa tê kirin. Xwe dispêrin min, lê şaş dispêrin, encamên şaş tên derxistin.

Dema van tevan dibêjim, naxwazim bêjim her aliyê we xirabe. Hûn îxanetê li aliyên xwe yên herî rast, xweşik û baş jî dikin. Ya rastî jî hêrsa me hinekê jî li hember vê ye. Gelek aliyên we yên erênî hene, evqasî berovajî van nekevin. Hûn ji min zêdetir ji zehmetî û şer re amade ne. We biryar daye ku di carekê de jî xwe feda bikin. Ev pir girînge. Vêca hûn li ser evqas fedekariyê çima evqas şaşiyê ferz dikin? Aliyek me ya erênî heye, çima hûn vê jî wisa bi rêbazên nexweşî diqedînin? Hûn çima evqasî bi kuştinê nêzî xwe dibin? Hûn rastiyên xwe, xweşikbûnên xwe û başiyên xwe di bin lingê xwe de diperçiqînin. Ya herî xeter jî eve. Bi rastî jî mirov zehmetî dijî wate bide vê. Ma mirov, tevî xwe, çawa dikare xirabiyê li xwe bide? Çawa dikare evqasî aliyên xwe yên erênî tine bike? Hewl didim sedemên vê bibînim.

Elbet hûnê bêjin; "Aliyên xurt ên dijminê bi kesayeta me re, aliyên me yên rast, lê bêhêz îmha dike." Lê ev jî ne raste. Di nêvenga me de dijmin li kure? Hûnê bêjin di kesayeta me de ye. Êdî dijminê di mejî û dilê xwe de jî bavêjin û netirsin. Hûn ji bo vê hatin nêvenga me. Bihizirin, hûn ji tirsan hêjî nikarin dijminê bi kesayeta xwe re bavêjin. Bi lêdanê xweşikbûn û rastiyên xwe ve hûn dijmin serdest dikin. Xezeb jî di vir de ye. Ev jî lenetê bi xwe re tîne.

### Di PKK'ê De Berpirsyarî û Rastiyên Jiyanê Esase

Li hember xwe rêzdar bin, em tiştek din ji we naxwazin. Li rastiyên xwe, xweşikbûn û başiyên xwe xwedî derbikevin. Ji ber ku ev bi we re hene. Ma hûnê li hember vê jî bertek raber bikin? Belê wexta dibêjim xwedî li erêniyê derbikevin, hûn bertek raber dikin. Gelek kesên wisa hene. Ez jî dibêjim ev li we nayê, bes di vê qonaxê de xirabkarî û tehrîkê dikin.

Niha baştir fêm dibe, çima kes bi vî Kurdî ve mijûl nebûye. Ji ber negengaze kes mijûl bibe. Ez evqasî kûr dibim, ancex xwe nagirim ku nekevim rewşek hîn seyrtir. Naxwazim li Kurdên din jî binêrim. Lewma xayîn û hevkarên wî yên tirsnak wisa dibin, lewma we ji mêj ve dev ji xwe berdaye. Lewra hûn ji daxwaza dijmin zêdetir alîgirê dijmin

helwest raber dikin. Divê mirov vê çawa binirxîne? Cihu jî wextekê qewmek bi lenet bûn. Lê ew bi wê leneta xwe ve, bi şerkirinê îro bûn hêza cîhanê birêve dibin. Mixabin em di encama leneta xwe de, hinde bi xwe re şer dikin, em hatin di binê cîhanê de bicîh bûn. Em hatin rewşek ku herî zêde hatî jibîrkirin, herî zêde bê nasname, herî zêde hatî înkarkirin û herî zêde kirêt bûyî.

Ya rastî di vê qonaxê de her tişt vê bi mirov dide gotin: Berde, jêvegere! Ya rastî dijmin vê dide gotin: “ Ya ku her kesî ji mêj ve devjê berdayî, tu çima ewqasî behsê dikî?” Jixwe zimanê we jî yê axaftinê wisa ye. Hûn dibêjin; “Bihêle, dev ji me berde.” Misoger ziman wisa ye. Dibe ku eşkere di gotinên xwe de bilêv nakin, lê şêweya sekna we vê dibêje. Ya rastî wexta me dest bi vî karî kirî, min bi gelek kesayetan re amajeya vê dîtibû. Wexta min yek-du rastî vedigotin, hemûyan rûyê xwe ba didan û digotin; “Devjê berde, em ji mêj ve tine bûne.” Gundiyekê jî kerek şanî da û got; “Begê min, ma tu vî kerî dibînî? Ev çiqasî fêm bike, ezê jî ewqasî ji te fêm bikim.” Hêjî ev bûyer di bîra min de ye.

Ger em dev ji we berdin, hûnê biçin kur? Niha rewş xeter bûye. Cihê hûn biçinê jî nîne. Tam jî di vê xalê de medya Komara Tirk tê bîra min, dibêjin; “Apo di rewşek tengav de ye, hişê wî tevlîhev bûye.” Di rastiyê de ne wisa me. Xwedî binyatek hişê herî saxlem û dilek herî saxlemim. Lê di mijara kesayetên wan bi xwe mezin kirîn de, wexta vê dibêjin hinekê jî mafdarin. Kesayetên hiş tevlîhev dikin, provakatoran digot; “Vî zilamî hûn dizîne.” Hemû çîrok ên me dizîne cardin bigirin û xeta vê jî pir pêk anîn. Ma herî dawî kiryarên ku fermandar Zekî kirîn jî ne ev bûn? Wê kesayeta ji pergalê hatiye sitandin ji gêrîla bigire, cardin pêşkêşî dijmin bike. Tişta dike hema wisa ye. Yên din jî digot; “Zarokno, ji bîrdozî û rêxistinê bidizin û xwe bijîn.”

Hûn çawa dijîn? We li çiyan û Ewrûpa jiyan kir. Lê belê rewşa we li holê ye. Hûn mirovên qewmê lenetî yên di rêza yekemîn ên karê herî qirêj de dane karkirinin. Ya rastî li vir ti rica û minet nîne. Lê dile mirov bi rewşa we dêşe. Yek ji we ji vir biqewitînim, bêjim hûn kêrî vir nayên, dê çiqas heyf be. Niha tişta bi êş, gel jî vê kesayetê napejirîne, jixwe dijmin bi hovîtî dikuje. Dile min bi miriyên we dêşe. Ya rastî ev jî bêçaretiya mine.

Di hesabxwestinek min bi dayîka min re de, min got; “Zarokên wisa newelidînin. Ma mirov wisa li zarokekî dike? Dayîka çi, bavê çi? Ji we

jî, ji xwe jî şerim dikim." Jixwe min ji ber vê sedemê şer bi xwe re da destpêkirin. Niha ji bo wê li hember hemû sedemên hûn welidandine kerbê dijîm. Wexta van dibêjim, dijmin jî dibêje; "Ji Kurdan nefret dike." Ji Kurdan nefret nakim. Ji Kurdan xebata herî mezin ez dimeşînim. Lê ti aliyê vê rewşê jî nayê parastin. Di vê rewşê de jiyîn, li gorî dijmin jiyîne. Dijmin her cure birçîbûn, her cure jiyana dervî mirovî li ser we ferz kiriye. Niha jî hûn vê li ser me ferz dikin û vê jî azadî binav dikin. Ev ne azadî ye. Paşê jî hûn navê vê rewşa xwe dikin bêçaretî. Ti wateya parastina bêçaretiyê nîne.

Kêmek maye hûn bêjin; "Dev ji me berde, em weke guran hevdu bixwin." Ev jî ne hewce ye. Nepêkanîna rêxistinê wisa ye. Ger hûn bikarin hinekê aqilê xwe bikar bînin, hûnê fêm bikin em çi dixwazin. Nefêmkirina axaftinê, weke xwestekên dijmin bûyîn, ango windakirin, bêberhemî û ji tiştekê re nebûna çare ye. Rêya rizgariya ji vê rewşê jî bîrdoziya rizgarî ye, rêxistin û çalekiya wê ye. Ma mirov ji vê direve? Ger bi vê rastiya we re lihev bikim, ezê bi dijmin re lihev bikim. Niha jî hûn vê li ser min ferz dikin. Nabê, ezê bi vê re lihev nekim. Di vê mijarê de qet pêdiviya min nîne ku biselmînim berxwedêrek bêhempa me. Divê hûn vê bizanin. Hûn ji kur ve û çawa lê binêrin bila be, bi yek van xisletan re lihev nakim. Di vê mijarê de nirxek ku xwe bigihînimê, bigirîm û eleqedar bibim nas nakim.

Ez dixwazim mafê xwe yê jiyanê rast bikar bînim. Di vê manê de hezar carî bijî ji dayîka min re ku ez welidandime. Lê belê ezê mafê xwe yê jiyanê, bi destê xwe azad bikar bînim. Ezê li dijî qanûnên xwezayê dernekevim. Ez li gorî qanûnên xwezayê yên biyolojik çêbûme, lê ezê mafê xwe yê azad jiyînê weke mirov bikar bînim. Rastî jî eve. Bi rastî jî hûn nikarin bi qasî misqalekê jî min ji vê rastiyê dûr bixin. Yê din jî, ji dijmin maye. Ez li hember her cure nêzîkbûnên dijmin ên yekser-neyekser, hestiyar, fikrî, çalekî û pratîkî, kesek ku xwe pir baş rêxistinkirî me. Li hember her cure ferzkariyên dijmin ên li her qadê, pir baş amade me. Rastî eve.

Ya rastî hewce dikir mirov vê rastiya we bi Shakespeare bide nivîsandin. Dema hevalekî me ez nirxandîm, digot; "Hûn rastiyê pir bêhempa tehrîk dikin. Dibe ku heyranê we yê herî mezin Shakespeare bûya." Pir başe, xwezî wisa bûya! Li hember rastiyên we ne tehrîkbûn, divê mirov dîn bibe. Li gorî we ez nikarim we sererast bikim. Nikarim we tevlî rêya rast bikim. Îdîaya we eve. Lê weke hûn jî dibînin, qet

niyeta min nîne li hember we bin bikevim. Niyeta min nîne we zorê jî bidim şerkirin. Di şêwaza me de bi zorê dana şerkirin nîne. Lê derfeta weke ku şer dike û weke ku jiyan jî dike nîne. Qet van nêzîkbûnan erê nakim. Tenê dijmin dikare van helwestên we erê bike. Biçin, bila dijmin we bi qasî dixwazin erê bike, bila we bikuje. Jixwe dixwazim li vir wijdana xwe jî rizgar bikim. Ji ber ez xwedî wijdanek mezinim. Ezê qinyatek wijdanek wisa bicîh bikim, ev miriyên we yan jî şêwazên we yên jiyanê dê nikarin min tine bikin. Ev şer hinekê jî wisa ye. Ango pirsgirêka şer a wijdanê û pirsgirêka şer a dil jî wisa çareser dikim.

Hûn dixwazin bi şêwaza xwe ve min bikin bêwijdanek mezin. Li hember her şaşiyê îmhayek. Bi gelemperî zimanê dîktatoran yan jî ne dîktator fermandaran wisa ye, bes dê wisa nebe. Emê zimanê nebiyan esas bigirin. Lê ev, nayê wê wateyê ku we erzan rizgar kiriye. Ger hûn mirov bin, hûnê parazvantiya vê nekin. Hûn nikarin şêwaza dijminê di nava xwe de yekser an jî neyekser, jiyana wî biparêzin. Hûn dikarin li cihek din van biparêzin, lê li cem min nabe. Li cem min nebûna çi hebe, hebûna çi hebe, wan fêr bibin. Nexwe newin cem min. Ez kesek wisa me, min xwe li gorî şerê bi dijmin re eyar kiriye. Kesek xeta wî diyar, lêdana wî diyar, şêwaza wî diyar û tempoya wî diyarim. Gelo hûn hatine bi vê re bibin yek, an jî vale derbixin? Êdî cudabûna vê zelal bikin.

Yek ji hêcetên we yên herî mezin jî eve: Hûn dibêjin; “Bi qasî dixwazî bêje, em xirab bûne, axaftin jî, şer jî feyde li me nake.” Na, min çareya wê jî peyda kiriye û nikarin li hember bisekinin. Dibe ku em di wateya çors de li meydanên şer serkfetinê bidest naxin, lê ev şer di encamê de şerê derûnî ye. Şerê dijmin esasî ji hêla derûnî ve tê meşandin. Lê şerê me ji yê derûnî jî pir tirsnake. Dijmin kesayetên we bi şerê derûnî tehrîk dike û li ser me ferz dike, ancex rêbazên me yên şerê derûnî hîn zêdetir dijwarin. Divê hûn van bizanin.

Derdê min ne we bizdînim, ne jî bidim revandine. Her wiha derdê min ne we weke berxekê bi PKK’ê re bikim yeke. Vaye ne jî wisa dibe. Ne jî em çi bikin, emê bêjin emê îdare bikin, xilas bû çû. Na, bi van ve nabe. Ji ber em van rêbazan li ser we ferz nakin, van xalên ku dixwazim bidim derbaskirin paşçav nekin. Heta piranî hûn dibêjin; “Hêza vî kesî nagihê me, me nabîne. Ev kes çi ji çiyan fêm dike, dê rewşên li nava me çawa fêm bike.” Lê rastî ne wisa ne.

Pênaseyek siyasetê ya din jî yan hemû mirovan digirin aliyê xwe, yan jî li beramberî xwe dike hedef dizane bijî ye. Xeta şer jî, ev bi

şêweyek tundtir dana meşandine. Belê me ev hemû kirine yek û em dimeşînin. Devjêberdin hûn wisa xwe li çep û rast veşêrin, hûnê xwe yan li wî refî yan jî vî refî di nava şerek tund de bibînin. Di navberê de mayîn, dibe ku mirina herî xirab bîne serê we. Ango xeta navîn nîne. Xeta navîn, rêya xirab mirinê ye. Hêvîdarim hinekê hişê we tê serê we û vê bîrdozî û paşverûtiya ferdperestiyê diberdin. Divê xwe di vê mijarê de qane bikim, yeqîn dikim hûn wisa ne. Ger hûn ne wisa bin, ez naxwazim zêde kûraniya xwe şanî we bikim. Ancex ger hewce kir dikarim biselmînim ku çiqas hêza min a hukumkirinê heye.

Pirsgirêk ne eve jî. Li naverastê tiştek bi navê bêhêzî û bêçaretiyê nîne. Di radeya kesekî de di asta herî kêm de jî be min xwe gihandiye. Karbidestim, rayedarim, berpirsyarim, biwijdanim, bihêrsim û xwedî derfetim. Hûn jî, qet nebe wexta destpê dikin girêdayî soza we dayî bin. Sîxurtiyek yekser an jî neyekser kirin mafê we ye, ancex ger hûn bixwazin bikin, wê jî li gorî quralên wê bikin. Ango hewce nake hûn sîxurtiyan jî têkilhev bikin. An jî hewce nake sîxurtiya pergalê û sîxurtiya şoreşê wisa tevlîhev bikin. Cudahiyê hinekê rast bikin. Dîsa bi qasî fêlbaziya xwe sîxurtiya pergalê bikin. Bes wisa bi çavên me re kirinê, jixweber kesayetek sîxurtiya wisa li ser me ferz nekin. Wateya vê eve: Evqasî rastiyên rêxistinê û rastiyên şer nepêkanîn, heta berovajî vê kirin, ne tenê sîxurtî ye, kontratiye jî. Sîxurtî pileyeke, kontratî jî piştî wî pileya duyeme. Ango ji wê xetertire. Ya we ji sîxurtiyê jî wêdetir, nîv kontratiyê bibîr dixe.

Di salên 1980'î, heta despêka salên 1990'î de ez wisa ne daxivîm. Di demên dawî de wisa daxivim. Ji ber rastiyên eşkere bûyîn hene. Emê li hember vê jî bin nekevin. Di demên dawî de, serfermandarê paya bilind ê dijmin di kesayeta we de binkeftinê li ser me ferz dike. Her roj di nûçeyan de weke sernûçe dibêjin; “Bi rastî jî PKK dihilweşe gelo, dawiya wê hatiye?” Ev tiştek ecêbe. Tirkiye rabûye ser piyan. Dixwaze fêm bike gelo PKK dihilweşe, dawiya wê hatiye yan jî tiştek din heye. Vê jî xwe dispêrin we dikin. Dibêjn; “Li çiyan ji hev belav dibin, li Ewrûpa wisa ketine bin venêrînê. Rêbertî jî tam di nava bêçaretiyê de ye.” Dixwazin rewşa we wisa şîrove bikin. Bes herî zêde jî girêdayî îtîraf, nêrîn û hukmên wî ketî di derheqê we de dayîn van dibêjin.

Ji bo min jî tiştek din dibêjin; “Tirsnake, ne weke xwiya dike ye, neyên xapandin.” Qaşo îtîrafkar jî dixwaze di derheqê min de zanyarî bide dijmin. Lê ji bo we dibêje; “Hemû weke berxane, hûn kevçiyek

hingiv bixin devê wan, yek kesê nekarin weke min bînin ser vê rêyê nîne." Di îtîrafên wî de hemû hene. Serfermandar jî dibêje; "Başe, ev ne şervanên wisa mirov ji wan bitirsine." Ji bo min jî dibêje; "Temenê wî jî çiqas biçe çend salin." Ango ji min xilasbûna xwe jî di qanûnên xwezayê de dibîne.

Ji bo we biryar daye hûn şervanin van vedibêjim. Ger dijminek dikare di derheqê we de bêje; "Ev zarok-marokin, bi aresteyek biçûk ve em dikarin hemûyan bînin rê", wê demê divê hûn rûnin û bihizirin. Yeqîn dikim herî kêm bi qasî vê li gorî daxwazin dijmin şer nakin. Biryarek we ya ji bo binkeftinek temamî jî nîne. Di derbarê binxistinê de jî soza ku we dayî xwe heye. Vêca eşkere bikin hûnê bi çi biselmînin ku dijmin xwe dixapîne. Hûn xwe dispêrin min û dibêjin; "Tu Xweda yî, tu dikarî bikî." Ez têk naçim. Ev sonda min a min li hember xwe û dîrokî dayî ye. Ancex çi eleqeya vê bi we re heye? Çima hûn xwe dispêrin min û xwe serkeftî diyar dikin? Çima hûn xwe dispêrin min û weke ku şer dikin didin nîşan? Hûn bin ketine. Di derheqê we de biryara dijmin a binketinê derketiye. Di pêvajoyên dawî de yek ji encamên herî balkêş hûn ji nirxandinên di derbarê we de derketine derbixin eve. Yan bi rastî jî hûnê vê biryarê xirab bikin, an jî hûnê êdî xwe bi sipartina min ve, vê lîstokê berdewam nekin.

Van tevan ji kesê niyeta wan saxlem û di şer de bi israr re dibêjim. Lewra ji kesên siberojê birevê re nabêjim. Jixwe dê ew cihe bibin û biçin. Di nava we de yên heta dawî bi israr hene. Divê ew jî bi aqil bin, diyar bikin ku wê hukmê binkeftina di derheqê wan de hatiye dayîn çawa xirab bikin. Vê jî ne bi axaftinê yan jî wê şêwaza şerê seqet û di vê mijarê de dijmin har dike, hûn dikarin bi çalekiya xwe ve vê şanî wî dijminî bikin ku çiye-neçiye. Ger hûn bizanin vê jî pêşî bi kesayeta dizane vî şerî di dil û mejiyê xwe de bikolê ve bikin, dikare bê gotin hûn bin neketine. Yeqîn dikim ji nava we hinek naxwazin wisa bin bikevin. Heta yên dixwazin bin bixin hene. Nexwe em xwe bigihînin pêwîstiyên vê.

Ya rastî xala PKK dixwaze yekemîn bi we re serwer bike eve. PKK'ya têk naçe wisa ye. Weke 'curên PKK'yîyên din' gotinan nekin, min û xwe jî nexapînin. Ji aliyê din ve hûn dibêjin; "Derfetên PKK'ê hene." Derfetên çi? Ez her tim dibêjim: Wexta min di nava xwîn û xwêdanê de pembû diveçirand, tama min ji tasek dew û lalîkek savar derdixist, ji ti xwarina PKK'ê nagirim. Di nava PKK'ê de nirxên wisa

bên bikaranîn tine ne. Her tişt ji bo şere. Her tişt li ser bingeha xwe fedakirinek dijware. Her tişt ji bo li ser nirxan, nirx zêdekirine. Li her cihî xwe dana jiyîn dibe, lê di nava PKK'ê de nabe. Li cem me sedî sed xwe fedakirin heye. Li her cihî di berdêla mûçeyekî de kar tê kirin, lê di nava PKK'ê de ne wisa ye. Heta di PKK'ê de canê xwe jî dayîn têrê nake. Di PKK'ê serkeftin dayîn, rêya yekane ya rizgariyê ye. Rizgarî ji we jî, ji min jî vê dixwaze. Qanûna jiyana di nava PKK'ê de wisa ye.

Ferasetek wisa derketiye holê. Hûn dibêjin; "Emê girêdayî derfetên PKK'ê xwe bijîn." Bi qasî şerma mezin, şaşiya mezin jî eve. Pir eşkere ji we re dibêjim: Li ser vî bingehî di PKK'ê de jiyan dibe: Tespîtek mezin a dijmin tê kirin, tespîtek mezin a jiyanê tê kirin û li gorî wê tê jiyîn. Ji bilî vê hêcetên ji rêzê destnîşankirin, gotinên weke; "Derfetê wê hene, li gorî meylên min ên azadiyê ne, ezê xwe bi wê xurt bikim û bidim jiyîn" kirin, şaşiya herî mezine û şaşiya herî xeternake. Ji ber em vê amûrê pir baş dinasin. Sedî sed li gorî armancên xwe, li gorî dijminê xwe, her wiha sedî sed li gorî quralên şer û rastiya fedekariya xwe hûn nêz nebin, nezî me jî nebin. Ger hûn bêjin; "Wexta min wesfek bidest xist, ezê hinekê jî xwe bidim jiyîn" û wisa bijîn, ez ti carî vê napejirînim. Ger hûn wisa bikin, ezê ji jinan jî, ji zilaman jî hesab bixwazim. Ma hûn cengawerekî çawa dibînin? Gelo hûn afirînerê partiyekê, rêveberê partiyekê û wesiyeta evqas şehîdan çawa dinêrin? Girêdana min a bi sozê ve lêkolîn bikin, di nava tevahî jiyana min de ez çawa û bi çi ve girêdayî me lêkolîn bikin. Li vî welatî kesê herî bihêz kiye lêkolîn bikin û xwe jî li gorî vê ferz bikin.

Bi nêzîkbûn hûn çima wisa dikin, bi ser wan de diçim. Vêca hemû digirîn. Pîrejin jî evqasî nagirîn. Şûna hûnê bigirîn, bibin xwediyê tiştên rast. Ma ez niha rastiya Rêbertiyê înkar bikim? Ev gel her roj diqîre. Vêca fêr bibin mirov li hember rêberekî çawa li ser piyan dimîne. Hûn nikarin du gotinan bikin, bimeşin û helwest raber bikin. Hûn fermandarin. Hûn çima li gorî axaftinên serfermandar xwe bi rêkûpêk nakin? Li civakê karkerê li hember patron, gundiyê li hember axa, bazirganê erdê yê bazirganiya mirov dike çawa ye? Karên kirîn û firotinê çawa tên kirin? Van tevan lêkolîn bikin.

Li hember we berpirsyariya min heye. Wexta hûn sekna min a di hemû pêvajoyên vê şoreşê de lêkolîn bikin, hûnê yek nebesiya sekna min û yek deqê jî dervî armanc jiyîna min nebînin. Ji ber ez mirovê peywirê me. Hesabê xwe didim. Xwedî evqasî kedî me, kesek ku min

evqas sal derbas kirine. Çima jiyana min di sekna we ya rojekê de jî diyar nabe? Weke Hesoyê bi mêş, hûn dibêjin em nikarin, ancex ji bo fêrbûnek jiyana hêsan tişta ku hûn nekin nîne.

Tişta em dixwazin li vir dahûrînin, rastiyek dijmin di kesayeta we de hilweşandin û binxistine. Li cem vê jî li ser rastiyên ku bi qasî nan û avê ji we re hewce ne we bibiryardar bikin û bibin xwedî reftar. Ev hemû ji bo vê tên gotin û ev rastî ne. Ji ber nan û av jî piştî ev sekin pêk hat bidest dikeve. Heta henase girtin jî girêdayî vê seknê ye. Ji ber ger ev nebe, wê dijmin we bikuje û bipirçiqîne, bavêje.

Em dixwazin di PKK’ê de karan rast bimeşînin. Em piştî şerek evqas mezin dixwazin xwe bigihînin fermandar û şervanên saxlem. Êdî PKK li vî welatî ne tenê ya şer, di heman demê de biryargeha jiyanê ya yekane ye. Li vî welatî tenê dikare bi PKK’ê bê jiyîn. Êdî nanek peydakirin jî bi PKK’ê pêkane. Li cihek din nan jî nayê peydakirin. Êdî wate bidin armancên pîroz, pêdiviyên jêneveger, quralên pê nayên lîstin, terbiya wê û kurtasî hemû ziraviyên jiyana vê saziyê. Ji ber ev hewce ye. Ji bilî vê her tişt diçe ji dijmin re. Ne tenê ez vê dibêjim. Her kes dibêje.

Pêwîste vê jî misoger û ji kûranî bêjim, min jî nedixwest ji dayîk bibim. Min îdîaya xwe li ser dayîka xwe jî ferz kiribû. Dema wê behsa mafê xwe ya li ser ewladiyê kir, min jê re got; “Ma min ji te re got biwelidîne, ger bi vîna min bûya min ne dixwest li cîhanek wisa ji dayîk bibim. Tu berpirsê vê yî.” Heta hingê min got êdî em ji dayîk bûne, emê ji neçarî çar bi çar qanûnên jiyanê pêk bînin, xwe bigihînênê û ew roj ev roje qanûnên jiyanê esas digirim. Hûn ji dervî vîna xwe ji dayîk bûn, nexwe divê hûn wate bidin qanûnên jiyanê. Ji ber cudatir nayê jiyîn. Tişta li vir bi israr dixwazim ji we re bêjim, hevgihîna we ya bi mafê jiyanê re ye. Ez welidînên di nava Kurd de ketinek jiyanî û koletî ya ji mirinê kembaxtir û dijberiyek li hember hemû nirxên pîroz ên mirovahiyê dibînim û wisa dizanim. Ez tenê çûna ber bi vê ve asteng bikim, dibêjim qanûnên vê pêk bînin. Ji bilî vê tiştek ku zêde dikim nîne.

Em mirov ji dayîk bûne, divê weke mirovan jî bijîn. Hewce nake mirov vê ewqasî tengav bike. Ez jî dizanim, jiyan bi êşe. Di nava civakek weke me de zayîn, bi serê xwe di nava êş û eleman de nalîne, birçîbûne, îşkence ye, bêrêzî û bêhezkirinî ye, ji her cure nirxên heyberî û giyanwerî bêparbûne û kêlî bi kêlî li hemberî dijmin bindestî û tinebûne. Jiyana li ser me tê ferzkirin yeksanî vê ye, min jî ev zû fêm kir. Lê em ketin nava lêgerîna ku jiyanek din jî dibe. Me her ku çû ev lêgerîna xwe gihand asta

partîbûnê, artêşbûnê û şer. Niha jî derfetên jiyana azad derketine holê, zincîr hinekê hatine şikandin û mehkumbûn jî hinekê hatiye derbaskirin. Ji bo serkeftinek tam û jiyanek tam jî şer hewce dike. Emê mafê jiyana weke mirovan şer bidest bixin. Ev ji bo min çiqas hewce be, ji bo we jî ewqas hewce ye.

Rêzdariya li hember kes, rast bikaranîna mafê jiyana azad a kese. Li vir jî rêhevaltî ya pir hewce dayîna hevdu ye. Ew jî me da. Rêxistin, rêxistina we ye, derfetên rêxistinê derfetên we ne jî. Ancex ev nayê wateya diziyê. Hûn dibêjin; “Min xeyal jî nedikir, ez hatim nav rêxistinê, di yek rojê de bûm serkêş, di yek rojê de evqas mirov di bin fermana min de bi cîh bûn û min di rojekê de xwe bi kîsên pereyan re rûbirû dît.” Nabê ku ev derfet şaş bên bikaranîn. Wexta hûn di vê mijarê de şaşiyek herî biçûk jî bijîn, hûnê bibin zindîq û dizker. Ji ber min jî tevahiya rojê palehî dikir. Ancex li malê rojane ya ji min re dihat dayîn tasek dew, lalîkek savar bû û li xweşa min jî diçû. Ev jî di nava PKK’ê de nîne. Mînak, di PKK’ê de xewek têr û xwarinek tamxweş nîne. Ji ber her tişt di rastiya şer de dimeşe. Di vê rastiyê de ma xew dibe û rehetî dibe? Lê di PKK’ê de derfeta xwe gihandina mafê jiyana azad a pîroz heye û ev jî ya herî hêja ye. Ger hûn qîmet nedin nirxa vê, hûn nikarin yek demjimêrî li nav PKK’ê bimînin. We di rêya azadiyê de serê xwe daniye, nexwe vê binpê nekin. Ev tiştek raste.

Ji bo vê dibêjim: Li vî welatî, li her qadê hema bêje quralên jiyana PKK’ê bêhnteng tê dîtin û weke ku dê mirov ziwa bike tê destgirtin. Li ser derfetên PKK’ê daxwaze jiyana keyfî, xwe sipartina rayeya fermandarî û şervanên xwe îmhakirin, çeka xwe pêşkêşkirin û nêzîkbûnên weke xwe hinekê jî dana jiyîn tên raberkirin. Ev tawanên tirsnakin. Hema bêje we tevan ev kirine. Vêca em weke ku ev qet çênebûne bipejirînin, nexwe dê cezayê we pir giran be. Ger dihizirin wê PKK’ê wisa bijîn, hêz û rayeya PKK’ê wisa bikaranîn tawanek tirsnake. Weke ev çênebûne hema bêje çavê xwe digirim. Bi rastî jî ji bo wisa bikim sebrek mezin raber dikim. Ev sebir jî ji bo we nebînime. Nabe mirov wisa destdirêjî li ser mafê jiyana pîroz bike. Di nava xwe de şerê wijdanek mezin bidin û xwe efû bikin. Hêvîdarim hûnê xwe sererast bikin. Vêca ez bi ser we de bêm dê çi bibe? Vaye bi ser yekî de çûm. Binêrin, li cem dijmin di çi halî de ye? Di rewşek ji cirdan kembaxtir de ye. Li hember van nêzîkbûnên we çavên xwe digirim, lê ev jî niha ne çare ye.

Vê hîs bikin û di dil û mejiyê xwe de şerekê bimeşînin. Xwe bînin astek bên pejirandin. Kêliyekê zûtir xwe ji rewşên nayên pejirandin derbixin. Heta hûn mafê xwe ya jiyana pîroz, mafê xwe ya jiyana azad bidest bixin û heta bi serkeftina şer re ev pêk were, min ji xwe re bikar bînin. Bes hûn tenê dikarin vê ji bo bidestxistina derfêtên azadiyê bikin. Ev jî bi şervantiya serkeftî û di pîvanên partiyê de dibe. Ji bo bi artêşbûna wê ya her cure bîrdozî û rêxistinbûnê, dîsa her cure taktîk û heta stratejiyê ve girêdayî li gorî rastiyên wê jiyînê min bikar bînin. Hûn dikarin bê sînor sûd ji min werbigirin. Bes ev bi şêwazên şaş nabe. Bi şêwazên din xwarina pariyek nan jî herame. PKK eve. Rastiya **Mazlûm**’an, **Kemal**’an, **Xeyrî**’yan, **Zîlan**’an, **Egîd**’an, herî dawî **Fikrî**’yê leheng wisa ye. Emê çima van esas negirin?

Êdî mirinên li milîtan neyên jî paşketî dibînim. Kerba min li hember gêrîlayê di xewê de winda dike heye. Gêrîlayek wisa bikeve gorê de jî, wê dilê min ti carî wî efû neke. Dilê min bi kesê xwe ber bi rehetiyê ve berdide, di destê dijmin de perîşan dike naêşe û heta wî efû nakim. Hûnê min wisa binasin. Dibe ku ez jî siberojê bimirim, lê belê wê ji bo min bê gotin heta dawî weke hewce dikir şer kir û wisa mir. Divê hûn jî di vê çarçovê de mirina xwe bipejirînin.

Tê zanîn em çiqasî dildarê mezin ê jiyanê ne û ji bo jiyana azad bê ravekirin me şerek çiqas mezin meşandiye. Jixwe diyare em hêjî weke ciwanek mêrxas çawa li ser jiyanê radiwestin. Ez tevî vî temenê xwe, ger hêjî rêzdarim, hûnê zêdetir rêzdar bin. Ev di bingeha mirovbûnê de nirxên herî bingehîne. Dîsa ev ji bo derfetên jiyana azad ên herî kêm jî, rastiyên yekane yên hûn hemêz bikin girîng û jênevegerin. Jixwe we canê xwe avêtiye naverastê, niha jî hûn davêjin şoreşê. Di şoreşê de can, jixweber nayê bikaranîn. Heta dawî berpirsyariya jiyanê, wijdan û rastî esas tên girtin û vî canî jî dikin canê rasteqîn û canê azad. Jiyan jî ancex bi canê azad dibe.

**28 Nîsan 1998**

## PRATÎKA ŞOREŞGERÎ PRATÎKA GIRÊDAYÎ FELSEFEYA ŞOREŞGERÎ PÊŞ DIKEVÊ

Em li ser rewşên we yên ji dijmin girantir lêhûr dibin. Encama derketî holê, dê ev kesayet hîn zêdetir nekare xwe bide jiyîn. Hûn di tengezariyekê de ne. Wexta çalekiya şoreşgerî, şerê şoreşgerî dibe mijara gotinê, di derbarê rastiya we de bersiva yekem tê hişê mirov, hûn nûnertiya bê aramiyê dikin. Êdî hûn nûnertiya Kurdê ji dijmin jî, ji rastiya Rêbertiyê jî aciz dikin. Rewşa we evqasî tirsnake.

Êdî hûn derûniya di du navberan de mayînê, nefêmkirina axaftinan, nenaskirina quralan û bê aramiyê dijîn. Ev pir eşkere ye. Hûn bi vê tenê dikarin bêjin ku acizin. Lê hûn nikarin aramiyê jî bibînin, bi şêweya wek tê xwestin di jiyanê de jî cîh bigirin. Lewra hûn perwerdeyê, quralên şer û quralên jiyana azad jî pêk nayînin. Karê we zehmete. Elbet ev jî jêhatiyek mezin dixwaze. Şer lîstokvaniyek mezin dixwaze. Em ji lîstokên mantiq bigirin, heta hêza rihek mezin û hêza vînek mezin dixwaze. Elbet her demî mercên me zehmetin. Lê dihizirim, ya rastî mercên rehet zêde ji bo me ne hewce ne. Em di mercên rehet de ne şer, ne jî jiyanê fêr nabin. Lê dema zehmetiyê jî ferz dikin, hûn rewşek nikarin ji bin derbikevin dijîn.

Ya esasî hewce dikir we rastiya bi navê PKK'yîbûnê fêm kiriba. Heta we ev fêm nekirî, pêwîst bû tevlî ti karî nebin. Karê bingehîn hûn bikin, wateya cewhera rastiya PKK'ê fêmkirine. Divê teqez bersivek we ji vê re hebe. Nexwe ji bo di vî şerî de cîh bigirin, divê mirov dînek be. Ger hêza we ya fêmkirinê pêş nakeve yan jî bîrdoziya PKK'ê tênagihin, ez jî ji we re dibêjim tevlî vî şerî nebin. **Mazlûm** çima heta dawî li ber xwe da? Ji ber di astek bêhempa de li hember bîrdoziya PKK'ê baldar bû. Heman tişt ji bo hevalên hêja yên din jî derbasdare. Hevalê me **Egîd** jî, çima karî heta dawî rast bimeşe? Ji ber ji dil û can baweriya wî li hember xeta leşkerî ya partiyê hebû. Lê belê komek din jî hebû, ew kesayetên ketî, vale û xwe nepixandibûn.

Ango pirsgirêk ne hebûn û tinebûna derfetane. Pirsgirêk, hebûna kesayeta berovajî cewhera PKK'ê ketine. Ev kesayet tenê dikare li cem cendirmeyê Tirk û faşîstan aramiyê bibîne. Bê darvekirin jî, wexta leşker fermanê bide, bêje; "Serê xwe dirêj bike", di wê rastiyê de aramiyê dibîne. Ev jî kesayeta Kurd ê tinebûyî ye. Dema jiyan dike xwe nepixandiye, sextekar û kesayetek ji her cure nokeriyê re vekiriye, dema

di destê dijmin de jî, mirina xwe weke aramiyekê dibîne. Ji mirina di nava jiyana azad de jî pir ditirse û jê direve. Niha ev hemû zelal bûne. Ger me Kurdistan ava kiriba û bigota were tu serkêşiyê bike, dîsa aram nedibû û wê bireviya. Dê teqez îxanetê bike û biçe wê bifiroşe xerîbekî. Vaye kesayeta Kurdê azad nebûyî wisa ye. Niha li rêberên hevkar û xayîn binêrin: Ji bo şerê PKK'ê ya azadiyê tine bike, her tiştê xwe dixe meriyetê. Bes li cem generalek an jî serbazek dijmin, dûvê xwe dihejîne. Ev hemû di çapemeniyê de derketine holê û li ser ekranan hatiye dîtin. Li beramberî leşkerên dijmin dikenin. Cîhana wan di wir de ye, li cihek din cîhana wan nîne. Ev kesayetek xayînê ku dijmin bi xwe re derbas nekiriye.

Ger ê herî jor wisa ye, yê jêr jî elbet kesayeta Kurdê gêj, xulam û belengaze. Ango dema li metrepolên dijmin karê ber deriyan dît, aramiya herî mezin di wir de dijî. Felsefeya wî ewqase, tişta ji jiyanê jî fêm dike ewqase. Elbet ev jî bi koletiyê ve girêdayî ye, ji ber ancex evqas ji dest tê. Lewra li hember bîrdozî bê eleqe ye û lêgerînek wî bi navê jiyana azad çênabe. Wexta te karê ber deriya dayê, yek-du zarok û hevjîna wî jî çêbû, her tişt temame û bi vê cîhanê razî dibe. Ev rewş ji bo we jî derbasdare. Ger hûn karmendek biçûk ê burjuva bin, odeyek we biçûk hebe, hûnê hezar carî vê beramberî Kurdistana azad zêdetir hilbijêrin. Ji ber felsefeya we wisa ye, hûn dikarin aramiyê wisa bijîn.

Ger bîrdoziya azadiyê, mirov pir dijwar bide şerkirin dibe bîrdoziya azadiyê. PKK'ê jî gelek caran mînakên vê derxistiye holê. Bîrdoziya azadiyê mirov dike berxwedêr û heta lehengiyê radike raperînê. Ji bo vê dibêjim: Hûn hêjî hêza xwe ya mejî û hêza fikir bikar nayînin. Ji vê aciz dibin. Yeqîn dikim, jiyana hûn li hember eleqe raber dikin, hinekê kiryarên ehbap-çawişî, li nêvengên duxana cixareyê lê heyî bûyîn û hinekê jî kêfxweşî ye. Hûnê bi van rojane rizgar bikin.

Pratîk kirin, pirsgirêkek leşkerî ya mezin çareserkirin, heta hêmanên wê yên felsefî daketin û elbet ji wê jî wêdetir ji pirsa dikare artêşek çawa bê sazkirin re bûna bersive. Tiştên hûn dibêjin û dikin ne pratîke. Pratîka şoreşgerî, pratîka girêdayî fikre, şoreşgerî û felsefeya şoreşgerî pêş dikevê ye. We ev herdu jî qedexe kirine. Ya hûn dibêjin pratîke, di rastiyê de tiştên tine dikin, dide windakirin, bêqural, gêrêdana xwe bi rêgez û armanc ve qut kiriye û piranî şaş, heta mirov helak û tine dike ne. Ya we bi navê feraset pêş xistî jî, xalên fêrbûnên dijmin ferz kirî, dilketinên paşverû û xerîzeyên we ji hiş dibine. Ji bilî wê ew fikra

mezin, mirovatiya mezin û jiyana mezin a ku hûn zêde wate nadinê, pê nebawerin û we aciz dike, ji bo we watedar nîne. Ji ber hûn bawer nakin vê ser bixin, lewra teng dibin, heta ber bi xirabkirinê ve diçin.

Li seriyek cîhanê mirovatiya pêş dikeve, li seriyê din jî cîhana dijminê we heye. Cîhanek azadiyê ya li gorî me jî em bilêv dikin. Bes hûn di van mijaran de jî li ber xwe nadin, ev cîhana em bilêv dikin ne li gorî we ye. Hûn nikarin hêza pêkanîna herî kêm a pêdiviyên vê jî raber bikin. Elbet ev ji bo me jî ne guncave. Ji kurve lê bê nêrîn bila be, negengaze em van nêzîkbûnên we erê bikin. Çiqas dixwazin xwe ferz bikin, helwestên xapînok raber bikin, zêde nirxa van nîne. Tişta hûn dikin tenê, hevdu xapandine. Bêguman, ew jî tiştekê çênake û pêş naxe.

Heta şoreşa fikir a mezin pêk neyê, hûn ti demî nikarin pirsgirêkek leşkerî ya cidî çareser bikin. Jixwe diyare hûn nikarin gêrîlayekî jî vesaz bikin. Ji ber bi we re teoriya wê ya şer, hêza fikra leşkerî tine. Bi rêbazên ji bavan mayî ve hûn tevdigerin, hûn nikarin bi qasî eşqiya jî bin. Ji ber eşqiya li ber xwe dide û xwedî ezmûna jiyanî ye. Ew jî bi we re nîne.

Ji ber dijmin, gêrîlayê PKK’ê yê tengav bûyî, Kurdê hilweşiyayî, vale, xayîn û hevkar dibîne, pir rehet dikare di derheqê we de nirxandinên wisa bike. Sedemên bi israr dixwazim van çareser bikim hene. Kûraniya **Mazlûm** a bîrdozî bêhempa bû. Pir hez dikir di bîrdozî de kûr bibe, propagande bike û mirovan perwerde bike. Vaye PKK’yîbûnek rasteqîn wisa ye. Hevalê me **Egîd** her roj têbiniyên leşkerî digirt. Di vê mijarê de pirtûka wî hebû. Her roj dixwest pirsgirêkekê ronî bike û civîn lidar dixist. Kesayetek di xeta leşkerî de tevdigeriya. Niha li we dinêrim, piraniya we ser xwe çûye û berbelavin. Hûn her tim di navbera rastî û şaşiyan de digevizin, li cihê qet hewce nake darbe dixwin û firsendên heyî jî nanirxînin. Wexta zehmetî jî çêdibe direvin û van jî davêjin ser rêxistinê. Hûn bi nêzîkbûnên xwe ve ji gelek pirsgirêkên wisa re rê vedikin.

Divê em vê li vir çareser bikin. Biryarek beşdarbûnek rasteqîn a ji PKK’ê re, biryara rast pêkanîna pratîka PKK’ê ya leşkerî jî di navê de, dev ji acizbûnê berdin, heta ku jiyanek PKK’ê ya hûn bi qasî bêhn digirin pêdivî pê dibînin bê sazkirin, divê mirov li ser we raweste. Nexwe ev tê wê wateyê ku li naverastê şaşiyek mezin heye û dê zû-dereng ev jî we helak bike. Li gorî min hewce dikir ji mêj ve PKK’yîbûnek rasteqîn bi kesayeta we re pêş ketiba. Ya rastî bi qasî çiyan pirsgirêk hene. Mirov pirsgirêkan her tim nîqaş bike û xwe

bigihîne çareseriyên têrkar wê tengezarî derbas bike û aramî be. Bes di her mijarê de tengezariyên we hene. Ji ber hûn nikarin pirsgirêkên li pêş xwe çareser bikin. Ya rastî me pir wext da we. Zêde wext û derfet ji we re hat dayîn, lê we nekarî vê binirxînin.

Belê, li kêleka van astek fedekariya we jî heye. Hûn bi gelemperî di bin bandora PKK'ê de meşiyane û bi zehmetiyên pir mezin re jî rûbirû mane. Rewşa dibêjim hûn di navberê de mane eve. Hûn bi temamî ne xirabin. Ev şoreş jî tiştek wisa ye, ger hûn kêlî bi kêlî li ser pêwîstiyên xeta PKK'ê ne serwer bin, hûnê bên pirçiqandin. Hûnê karek li pêşiya xwe bi temamî fêm bikin û ji bo vê biguherin di heman kêliyê de jî hêza xwe danin holê. Ger hûn wisa nekin, di vî şerî de mirov tên pirçiqandin, helak dibin û binpê dibin. Êdî divê hûn bizanin xwe komî ser hev bikin. Zehmet jî be, biryardariyek PKK'ê ya kûr ku her tim we bimeşîne, di leşkerbûna PKK'ê û xeta bîrdoziya wê de, di asta fedekarî de, ango di her radeyê de hûn neçarin têkilhev bin. Wê demê ev kar dimeşin. PKK wisa dimeşe. Nexwe yek pirsgirêka we nayê çareserkirin. Ev esase. Ger hûn vê baş fêm bikin, em dikarin pirsgirêkên din jî çareser bikin. Ji ber ji bo em bikarin pirsgirêkên din nîqaş bikin, kesayetên saxlem û xwedî sozên xwe hewce dike.

Ger derfetên serkeftinê di sêniya zêrîn de jî pêşkêşî we bikim, ji ber kesayeta we nikare rake, hûnê wê li erdê bidin. Kesayetên we yên lewaz têra têgihiştina tiştên rast nake. Her wiha hûn nikarin xwe jêhatî bikin. Ev nayê wê wateyê ku hûn pir xirabin, niyeta we ne başe yan jî hewldana we nîne. Kurd jixwe hemale, dibe ku gelê Kurd di cîhanê de miletê ku herî zêde ked dide. Lê dîsa jî vê nekariya wî weke ji miletê cîhanê yê herî hejar rizgar bike. Ji bo hinek din kar dike, ji bo hinek din şer dike, mixabin nikare ji bo xwe kar bike. Hêj di kesayeta we de asta azadiyê nehatiye girtin. Mînak ez di vê mijarê de têr nabim.

Ketiyê Şemdîn di bin wêneyê Atatûrk û ala Tirk de, çar bi çar amade ye. Lê di rastiyê de ev çardeh salin me ti carî ew wisa amade nedît û nedikariya wisa tekmîl bide. Bela serê me bû. Çima li wir wisa radiweste û keyfa wî ji vê re tê? Li wir tam weke leşkerekî ye. Fermandar dibêje raweste, ew jî weke bejinziravan radiweste. Çima? Ji ber di rihê wî de nasnameya dijmin hatiye nivîsandin. Kesayeta wî tenê dikare li hemberî dijmin amade be, nikare di rastiya azadiyê de amade be. Jixwe li vir weke paşayan bû, we di wêneya dêwan de didît. Lê mixabin rojekê jî nezanî rêzdar nêz bibe. Ne ji bo niyet xirab bû,

kesayeta wî wisa hatibû avakirin. Me jî bi rik xwest pak bikin, bi rastî jî xwest nirxek mezin bidin wî, lê çênebû. Çû û li wir rehet bû. Yeqîn dikim, biçe sêdarê jî, dê kêfxweş be. Dê bêje heq kiriye û wisa xweşik jî serê xwe bide ber. Rewşek wisa pir seyr heye.

Derdikeve dibêje; "Pirsgirêka min bi Apo re ye." Lê di rastiyê de halê wî bikare bi min re şer jî bike nîne. Hinek dijminên me dixwazin di nava me de bilîzin û ji bo komployên xwe pêş bixin dê Şemdîn bikar bînin. Wê bêjin; "Zilamên Şemdîn gihan Apo. Zilamên Şemdîn Apo kuştin." Beriya niha digotin; "Zilamên Fatma û zilamên Şener." Niha jî dê bêjin; "Zilamên Şemdîn li pey Apo ne." Lê di rastiyê de tiştek wisa nîne. Kesên behsa wan dikin, kontrayên Komara Tirkiyê ne. Lê dîsa jî camêr dibêje; "Ez bi Apo re şer dikim." Ev şerê çiye? Tu li wir ne tiştekî, ne dîlekî jî, li wir celladî. Ger te li wir didin jiyîn, ev jî ji bo kuştina Kurde. Lê ew dibêje; "Ez bi Apo re şer dikim." Evqasî ketî ye. Dê bêje; "Min kuşt." Hinekê mînaka Hesoyê bi mêş wisa ye.

Li ser rêheval û miletê xwe dibe cinawir û ji vê kêfxweş dibe. Lê niha lir wir weke berxekê ye. Dijmin digot weke bilbila ye. Ev bûyerek kesayetî ye. Ango ji bo bijî, dê pir xirab Kurd qetil bike, dema hewce jî nekir û rewşek bikare celladiyê bike nemîne, wê xweşik jî bikujin.

Ev bi felsefe û çêbûna kesayet ve eleqedare. Çima gotinek rast fêm nekir? Vaye ji bo wê vedibêjim, divê hûn bibînin ev xisletên kesayetî çiqas bi we re hene û di dahûrandina vê kesayetê de hûn çiqas jê re bûn zemîn fêm bikin. Em heta dawî alîkarî dikin. Ger hûn bal bidinê, ew bi xwe revî. Ew bi xwe dibêje; "Dest nedin azadiya min." Hêjî di wê evîndariyê de ye. Vaye ew Kurdê nepixandî, xayîn û axa wisa ye. Yeqîn dikim vêca dê bêje ka ez hevdîtinek siyasî bikim. Lê di rastiyê de bi qasî tifa leşkerekî jî nirxa wî nîne. Lê xwe wisa dibîne. Ger hûn jî kesayetên xwe nedahûrînin, hûnê rojekê wisa derbikevin holê. Hem jî bêku qet fêm bikin. Dîroka Kurd hinekê jî wisa ye.

Li hember dijmin li ber xwe nedayîn û ne azadbûn dê we tevan an ber bi vê rewşê ve bibe, yan jî hûnê bên kuştin. Jixwe piraniya we, li cihên nayê payîn tên kuştin. Ma gêrîlayek mezin wisa tê kuştin? Elbet nayê kuştin. Bi van çekan û bi van derfetan dikare li wan çiyan destan bên nivîsandin. Lê ji bîr nekin, hûn li cihê qet nayê payîn winda dikin. Ev kes jî nehatiye dahûrandin. Vî kesî jî hêj xwe nas nekiriye. Ango dev ji pêkanîna gêrîla berdin, hêj nedahûrandiye çima û ji bo çi neçare bîjî. Hûn weke mecnûnan li wan çiyan digerin. Mirov bi vî halê we xemgîn

dibe. Dem bi dem yek ji wan jî derdikeve radest dibe. Dem bi dem ji ber şaşiya qural kom îmha dibin. Lê di herdu rewşan de jî kesayet, heman kesayete. Ger hûn nekarin vê rewşê derbas bikin, nexasim wexta hûn serî hildidin encama li benda we jî wisa ye.

Ger hûn dixwazin bijîn, li ber xwe bidin. Elbet berxwedanî jî têrê nake. Hûnê hêza mantiq a heta dawî çûyînê, hêza rêxistinê bigirin. Nêzîkbûna; "Ezê bikarim li hember PKK'ê li ber xwe bidim", fêrbûnên eşîretî ne, ew çande. Gotina herî zêde hûn bikar tînin; "Partî malbata mine." Partî ne malbata we ye, partî biryargehek şere. Partî, eniyek şerê mezin a derve û hundur, bi şêv û roj şerek dijwar lê tê meşandine. Bes li gorî we partî malbate. Niha jî em lê binêrin, ji sekna kurê malbatê, keça malbatê cudatir, seknek we cidî ya partî nîne. Dibe ku me hezar carî rave kir, şerê herî hûrûkûr û çetîn di nava partiyê de tê meşandin. Lê dîsa jî we fêm nekir.

Bi salan we dev ji xwe berda. Hûn şaş hatin mezinkirin, şaş hatin xwedîkirin, heta şaş ji dayîk bûne. Ev kar bi vê kesayetê ve nameşe. Min ji dayîka xwe re got; "Te şaş kir, ez welidandim. Tu tawanbarek mezinî. Ji ber tu nikarî tiştekê bidî zaroka xwe." Min hêj wê demê mînaka çîçikê dabû. Min ji dayîka xwe re got; "Wisa dayîktiyê neke, tu ne di ferqê de yî çi dikî" û wisa bêdeng kir. Piştî wî temenî jî min hemû hêza xwe kir yek, her tim hewl da xwe perwerde û mezin bikim. Hêjî vê dikim. Niha li we dinêrim, hûn weke zarokên belengazin. Hûn giriyane, şîr kirine devê we, hûn giriyane tiştek dane we. Niha jî hûn heman tiştî dikin. We partî kiriye dewsa dayîka xwe, weke bêjin; "De dayê, şîr bide min."

Ez jî weke damezînerê vî karî ji we re dibêjim ku, ev kar ne wisa ye, şîrek ku ji we re bê dayîn nîne, hûnê her tiştê xwe bi neynokê jê bikin û bigirin. Hûnê bi fikir û çalekiya xwe ve bistînin. Dema em vê dibêjin, vê carê jî hûn dibêjin; "Me ne dizaniya wisa ye." Ez jî dibêjim PKK wisa ye. Hûn dibêjin; "Berde, em weke dixwazin PKK'ê fêm bikin, weke dixwazin jî bijîn." Bingeha felsefeya van helwestên we wisa ye. Hûn digirîn, xirabiyê dikin. Hemû fermandarî û rêveberiyên we yên sexte, wisa derdikevin holê. Ji ber hûn wisa hatine mezinkirin, wisa hatine fêrkirin. Encam, a heyî jî xirabkirine. Ji hêla objektif ve, hûn weke xirabkar an jî reben û bêçareyane.

Ev çîrok pir girînge. Neku ji bo dayîka xwe xirab diyar bikim, beramber derketim. Bal bidinê, dîsa jî kurê wê yê herî baş ezim. Ji bo miletekê hewl didim karê herî baş bikim. Dayîkek tenê dikare bi vê

serbilind be. Dema dayîka min mirî jî wisa bû û ez jî fêm kiribûm. Ev pir girînge. Ev li hember şêwaza mezinkirinê, şêwaza jiyanê, şêwaza dayîktiyê û şêwaza malbatê serhildanek pir radîqale. Hem jî serhildanek bêku xwendin û nivîsandina wî hebe. Elbet piştî wê hemû jiyana min bû îsyangerî. Ji ber vê dibêjim: Dibe ku hêza we têra vê neke, lê rastiya PKK û Rêbertî tê binavkirin jî wisa ye.

**Bîrdoziya Sosyalîst**
**Bîrdoziya Berxwedaniya Herî Wesifdare**

Bi qasî texmîn dikim hûn li hember azadiyê baldarin û dixwazin azad bijîn. Bersiva xwe gihandina vê jî ev hewldan bêhempa pêşxistine. Mînak wexta pirtûk dixwînim, çavên min dêşin. Lê dîsa jî pir hez dikim yek-du hevokên fikrên baş bixwînim. Wexta pirtûkek weke bûyerek dîrokî ya girîng, fermandarekî çi kiriye, fermanek rast çawa hatiye dayîn, dewletek çawa hatiye damezirandin an jî çawa hilweşiya ye dixwînim, hestiyar dibim. Lê hûn ji vê direvin. Camêrê ji fêmkirina tiştekê direve, dikare çi saz bike?

Çil salin weke motorek propagandeyek mezin, ajîtatorek mezin û katibek mezinim. Her roj hewl didim we bidim axaftin. Ancex hûn miz mizê dikin, hem jî nikarin du gotinên serûber bikin. Dikarim ên îtalî weke mînak diyar bikim. Hinekê li wan temaşe bikin, weke bilbil daxivin. Yeqîn dikim ev xisleta wan, ji kevneşopiya Roma maye. Ji ber du dersan baş fêr dibin. Yek ji vê xîtabe, ya din jî mantiqe.

Di navbera şer û xîtab de çi pêwendî heye? Heta mirov nebe katibek baş, nabe fermandarek baş. Lê niha hêza xîtaba fermandarê me yê herî binavûdeng jî nîne. Kesê xîtaba xwe pêş nexist. Ji ber kesayetên wan belave û jiyana wan bê pergale. Hêjî piraniya we berê xwe jî nade wir. Hûn fermandarek mangeyekê jî bin, hûnê uslubê xwe biguherin. Vêca li artêşa Tirk û fermandarê mangê yê Tirk binêrin: Kêm jî be ew fêrî xîtabê bûne, weke şûrê daxivin. Tirk van karan baş dizanin. Ji ber artêşê bi wê rêve dibin. Lê hûn eleqe jî raber nakin. Lewma mirov di derbarê we de zêde hêvî najî. Bi qasî fêm dikim û tişta hûn li pey baz didin, kesayeta eşîrtî û malbatî ya têkil nav PKK'ê bûye. Hûn ji pergalê û dewletê qut bûne, lê hêjî weke çêlikek çuka per û baskê wê şikestî ne. Wexta marek, an jî zîvzîvek derdikeve pêşberî we, pir rehet dikare we

daqurtîne. Heta hûn ne weke kevokek an jî bazekî ne. Hêj baskên we yên fir bidin çênebûne. Hinekê rewşa we wisa ye.

Teqez divê hûn pêşveçûnekê saz bikin. Lê bêku bixapînin vê bikin. Kesayetek we pir tirsnak dixapîne heye. Ger hûn bi vî halê xwe ve serbest bimînin, hûnê birevin kur û bigihin kur ne diyare. Pir li ser hinek dilketinên we yên jiyanî rawestiyam. Ya rastî me tiştek qedexe nekir. Tenê em dixwazin we ber bi jiyana rast ve bikişînin. Em dixwazin hinekê hestên we terbiye bikin. Tiştek zêde em dixwazin nîne. Lê belê hûn li hember vê jî aciz dibin. Weke ku mafê jiyana we ji destê we hatiye girtin nêz dibin. Ev rewşek pir sefîle. Bi qasî pêkane em dixwazin jiyanê hinekê danin pêşiya we. Em dixwazin hinekê hest û ramanên we terbiye bikin û bêjin wisa tê jiyîn. Ancex hûn li hember vê zêde li ber xwe didin. Selmandina vê jî, wexta em hinekê we serbest dihêlin, dîsîplîna giştî hinekê sist dibe, ji jêr heta jor tev serûbin dibin. Heman weke texteya çêke-xirab bike.

Li gorî xeta me di derheqê xweşikbûna jiyanê de yek hevok, yek helbest nehatiye nivîsandin. Yên we nivîsandî tev jî gilî û gazincin. Di hemû raporan de gazinc serwere. Ji bo bêhna mirov teng bikin çi hewce dike tev nivîsandine. Kanî hûn bi salan şervanên azadiyê bûn, vêca çima we rêyek xweşikbûnê nedît? Mane ji bo jiyanek hîn bedewtir evqas şer tê kirin? Nexwe çima hûn evqasî acizin? Çima evqasî xirabkarin? Hûnê van pirsan tevan ji xwe bipirsin. Hûn di zindanên dijmin de weke berxan tên rehabîlîtekirin. Wexta karê ber deriyekê tê dayîn rehet dibin, di yek odeyê de bi bîst kesan re dijîn. Çiya, weke kelha milîtanên azadiyê ne, bes hûn çima li wir ne rehetin. Ancex ew çiyayên we lê jiyayî û jê hatîn, parçeyek xwezayê ku dewlemendên cîhanê ji bo wan dil didine. Hûn bi qasî geştiyarekê jî li hember wê jiyanê eleqe raber nakin. Nexwe hûnê ji bo çi şer bikin? Bi rastî jî mirov bi rewşa we dêşe û gelek tevlîheve.

Her wiha hûn di nava partiyê de ji rêxistinbûnê hêrs dibin. Jiyana birêxistinkirî niha ji bo we bûye dojehek. Di rastiyê de jiyana birêxistinkirî, ji bo me derfeta jiyana yekane ye. Di nava rêxistinê de sistbûnek biçûk çêbe, ez dizanim ku cihek kun bûye, xwîn jê dirije û rûviyên min derdikevin derve. Beramberî vê her derê we kun bûye. Ango hûn bêrêxistinî ne, lê ev rewş jî xweşa we diçe. Weke ku rûvî û medeya we bi êşan jan dide û dema ew derdikevin derve hûn rehet dibine. Bes ev jî rêya ber bi mirinê ve ye. Dibe ku wexta hûn derve bin, yek-du demjimêran we rehet bike, bes encam mirine.

Rastiya Kurd, hêj ji aliyê wêjeyî ve nehatiye dahûrandin. Yeqîn dikim ji bo we jiyan bi xwe belayek mezine. Bi destpêkirina jiyana we re, ango ji dayîkbûna we re şaşiyek mezin hatiye kirin. Jixwe ev jî di felsefeya jiyana min de pir bibandore. We felsefe lêkolîn kiriye. Lê belê li gorî min we bi navê felsefeyê yek hevoka rast negirtiye. Ya rastî pirsgirêka herî bingehîn, ji bo me jiyan bi xwe xeteriyek mezine. Ji dayîkbûn û pişta xwe dana jiyanê re, em rastî derd û çemên îşkenceyek mezin hatin. Her çendî dervî îradeya me jî be, em ji dayîk bûn. Wisa jidayîkbûn, wisa jiyîn û hatina fêrkirin ne di destê me de bû. Heta di mercên heyî de, tevî bêku em bixwazin, me mohra Kurdê bindest jiyan kir. Hinekan hûn anîn vê rewşê. Aliyek felsefeyê jî wisa ye.

Aliyê duyem jî, li vir felsefeya azadiyê destpê dike. Hûnê bêjin; "Ji dayîkbûn ne di destê me de ye, lê azad jiyîn di destê me de ye. Yan jî divê em azadbûnê biceribînin." Ev jî felsefeyeke. Ger hûn hevgirtî bin, ceribandina azadiyê, wê hêza lêkolînek kûr bide we. Ango hûnê li xwezayê û her pirtûkê binêrin, fêr bibin. Di encamê de hûnê bibin lêgerînvanek azadiyê yê ranaweste. Piştî lêgerînê jî kar tê, ji bo vê jî li ber xwe dide ku têbikoşe. Li pêş azadiyê jî astengî hene. Dewlet, paşverûtî, xayîntî, ketîbûn û mîna vê her tişt li pêş jiyana azad û jiyana xweşik astenge. Vêca hûnê bi ziman, çek û çi ji destê we tê li van astengiyan bidin. Hûnê bibînin ku, jiyana azad pêş dikeve. Felsefe û çalekiya wê wisa dibe. Ez bipirsim gelo di nava we de kesê qet ev cirabandî heye? Hûnê bêjin nîne.

Li hember jiyana azadî yan jî felsefeya mafê xwe yê jiyanê azad bikaranînê eleqeya we lewaze. Elbet çalekiya vê jî heye û hûn qet nizanin vê bikin. Dîsa jî dixwazin bijîn. Vaye di encamê de emperyalîzm, vî kesê Kurdê aciz û nexweş, milet, netewên mêtîngeh ên din, proleterya di civakê de wisa birêve dibe. Serî heta ber bi emperyalîzmê ve dirêj dibe. Lê belê rêya şervanê azadiyê jî, ber bi heta sosyalîzmê ve diçe. Bîrdoziya sosyalîst, di vê mijarê de bîrdoziya berxwedaniya herî wesifdare. Ger hûn lêkolîna xwe bidomînin, çalekiyê bidomînin, hûnê bibin şervanên gel ên mezin. Ger hûn hevgirtî bin, teqez hûnê xwe bigihînin wê astê.

Niha lê dinêrim, gelo hûn wisa dijîn? We temenê xwe çawa derbas kir? Eşkere bin û netirsin. Qet nebê niha li xwe mikur werin. Berê muminan her tim rica bi xwedê dikirin, digotin; "Ya Xweda, tu me efû bike." Ji bo vê heta berbangê zikir dikirin. Ez nabêjim heta sibehê zikir

bikin, lê di hinek mijaran de rast baxivin. Elbet bûna ewliya û derwêş ne karek hêsane. Di nava we de kesên ku heta doh nimêj dikir, rojî digirt, zikir dikir û li dergehan hene. Şev û roja vî karî, ji bo hinekê xwe terbiyekirinê ye. Ya em behsê dikin, terbiya sosyalîstî ye. Partî saziyeke, lê serkeftina hem zanist, hem jî vînê pêkanînê ye. Ger hûn dîsîplîna ku meleyê mizgeftekê raber dikin nekin, bangên 'hu' yên meclîsa zikir dikin jî bang nekin, hûnê çawa bibin leşker?

Elbet ev hemû li ser serê min giranî ne. Dîsa bandora eşîret û malbatî li ser we heye. Hûn xwedî feraseta; "Rêbertî bave, reîse, ji wê jî wêdetir xweda ye, her tiştî dike" ne. Ger hinek din jî hûn zêdegaviyê bikin, misoger hûnê min bixin dewsa xweda. Bes ji bo tenê hûn ji teoriya evdên kole yan jî feraseta wê re xiftanekê bibînin vê dikin. Wî Şemdînê ketî digot; "Ez dikarim we bi têgeha Xweda ve binirxînim." Ji ber wexta we ez anîm asta xwedayî, nexwe evdên wî yên cahil jî hene. Hûn xwe dixin dewsa wan evdên cahil. Min wê demê jî ev got. Elbet Şemdîn, wexta ez dixistim dewsa Xweda, xwe jî ji bo nebîtî amade dikir. Piştî ez derxistim asîmanan, dê ser rûyê erdê jî ji wî re bima. Ew pir fêlbaz bû, lê nekarî vê lîstokê bi min bide bawerkirin.

Feraseta we jî ya rêbertiyek wisa napejirînim. Ez ne tenê rêberim, şervanê kedê me. Cengawerê bîrdozî û şerkerê rêxistinê me. Lê cengawerek cidî me. Ne gengaze hûn min bixapînin. Hûn bigirîn û binalin jî, nikarin min ji cengaweriya rêxistinê vegerînin. Mînak feraseta we ya rêzgirtina kevnare jî wisa hêsan napejirînim. Hûn dibêjin; "Emê beramberî Rêbertiyê hinekê rêzdarî raber bikin, her tişt temame." Na! Ne hezkirina hûn fêr bûne, ne rêzgirtin, ne jî girêdana we min têr dike. Asta min pêş ketiye. Ger hûn van xalên min destnîşan kirî pêk neyînin, ezê vê bêjim: "Hûn dîsa xwe weke gundiyan dixapînin, bi hêza ji min digirin dixwazin bibin muxtarên biçûk." Jixwe fermandariya we jî weke muxtarane.

Hûn ji vê rewşa em pêş dixin aciz dibin û xirabkariyê dikin. Dikarin bikin, ancex lîstokvanê vî karî yê mezin tevdîra wê jî girtiye. Vaye li lîstokvanê herî mezin Şemdîn binêrin: Belê rêya xwe dît. Dema li bendê bûye hinekê qada azad û mêvanperweriyê jê re bikin, hinek qural ji bo wî destnîşan kirine. Wî jî gotinên weke; "Hûn azadiya min xirab dikin, nêzî min nebin, qada min fireh dibe, dê rola min bibe avakirina yekbûna hemû Kurdan." Ango weke beqan, balonê her ku diçe diwerime. Nediyare dê çawa biteqe. Dibe ku komandoyek wî bi serê derziyê jî

biteqîne. Dixwazim bêjim herî aqilmendê we wisa bû. Vêca hûnê bi vê rewşa xwe ve biçin kuderê? Asta herî jor bîrdoziya gundîtî xwe bigihînê evdere. Di destê leşkerek dijmin de bûna beqek. Jixwe niha dengê wî jî dernakeve, li wir ziwa bûye.

Wexta min di deh saliya xwe de biryara jiyanê da, pir tengav bûm. Vêca hûn dev ji tengavbûnê berdin, difikirin ku bêberpirsyariyek mezin bijîn. Hûn dibin xayînek, lê ne di ferqa vê jî de ne. Ev hemû trajediyeke. Heta ji trajedi jî wêdetir rewşek pir cuda ye. Naşibe rewşên li civakên din tên jiyîn jî. Lewra dibêjim, tawana herî mezin welidandina we ye. Tevî hûn najîn, xwe weke dijîn dibînin. Teqez hûnê vê rewşa xwe ber bi encamekê ve bibin. Ji bilî vê rewşa we xetere, her rojek wê karesate.

Tevî temenê jin û zilam jî sîh û çile, hêjî em bûyera jiyan û şerê ku teqez divê hûn fêm bikin li ser we ferz dikin. Ji ber heta ev nebê, her tişt herame, her tişt mirine û her tişt qirêje. Lewma we wisa digirim. Hûn nikarin bi vî halê xwe ve dest bi jiyanê bikin. Ji ber ji bo destpêkirina jiyanê, divê rast şerkirinek hebe. Hûn nikarin cixareyekê jî bikêşin. Pêwendiyên jin û zilam danin aliyekê, bi vî halê xwe ve hûn hêjayî ti pêwendiyê nabin. Her tişt herame. Hişê xwe bînin serê xwe. Ji ber we biryara jiyanê nedaye. Hûn ji şêwaza jiyanê ya dijminatî re dibin amûr. We îxanet li welatê xwe kiriye, nikarin şerê wê jî cidî bimeşînin. Ti serkeftina we nîne û her roj winda dikin. Di vê rewşê de çawa dikarim we biparêzim? Ezê çima mafê we yê jiyanê binasim?

Soza min dayî xwe, xwe di hinek mijarên nirxên bingehîn de nexapandin û nedana xapandine. Ne ez kesî dixapînim, ne kes dikare min bixapîne. Ya rastî ez evim. Niha jî hûn bi hemû hêza xwe ve hewl didin min bixapînin. Hûn dibêjin; "Emê pir şer bikin, lê bihêle em rojekê li gor dilê xwe bijîn." Na, ji hêla min ve pîvanên jiyanê rast hatine nirxandin. Ger hûn pêdiviyên vê tam pêk bînin, hingê hûnê ji jiyanê re bêjin erê. Ango hûnê li ser kevirê jiyanê yê xwe sere avêtinê biqevêzin û bijîn. Nexwe, heta ku fêm dikin, hûnê her tim wisa bimînin. Ser bixin, bila hemû welat û milet a we be. Şert eve. Hûnê gel ji welatê wî nedin revandin, nebin bela serê wî, ango hûnê gel nefiroşin. Hûnê weke mirovên guncav ên hemdem hinek tişt bidin vî gelî jî. Mînak, ger hûn zilam bin, hûnê jinê neçewsînin, ger jin bin, hûnê ne kirêt û paşverû bin. Ger hûn van ser bixin, weke dixwazin bijîn.

Heta hûn rastiyê hîn dibin, emê we wisa bigirin. Dijmin we vale dide jiyîn, weke xayînekê dide jiyîn. Deka binêrin, ma min dide jiyîn? Ev

hemû eşkere ne. Jiyana dijmin li ser we ferz dike, ne jiyane, îxanete. Li gorî quralan cezayê xayîn jî mirine. Vêca hûn dibêjin; "Min nedizanî ev jî wisa ye." Ger hûn nizanin hîn bibin. Ger hûn dibêjin; "Fêr dibim, lê hêza min têra pêkanê nake", mafê we yê jiyanê jî çênabe. Misoger divê hûn wisa nejîn. Ango navê azad nejiyînê mirine. Jixwe hûn her roj dimirin. Vaye felsefe wisa ye. Hûnê di hemû şaneyên xwe de fêrî vê felsefeyê bibin. Her wiha divê hûn şêwaza mirina rast peyda bikin. Mirina bêku zêde zerarê hem bide xwe, hem jî bide hinek din pir girînge. Divê hûn mafê xwe yê mirinê rast bikar bînin. Ger dixwazin bijîn, quralên wê jî hene. Van quralan ez destnîşan nakim, dijmin ev qural danîne. Dibêje; "Ezê yek kevirê çeqil jî nedim we." De başe, ger biryara dijmin nedana yek kevirê çeqile jî, hûnê li kur bijîn? Di vê mijarê de durist bin. Çûkek jî ji bo çêlika xwe li hêlînek dest lê nekeve digere. Mixabin di destê we de kevirek çeqil jî nîne. Hûnê di vê rewşê de çawa bijîn? Ev pirsên girîngin.

### Dê Serkeftin Bi Kesayetên Vediguherê Bê Bidestxistin

Dijmin hiş û rihê we dagir kiriye. Ma hûnê bi vê kesayetê hez bikin? Dijmin hûn fêrî kirine weke heywanan bijîn. Em nikarin mirovekê weke heywanan bidin jiyîn. Dê ev hîn xeternak be. Weke heywanek erîşkar, quralan nas nake û her roj di şer de hem cinsê xwe dixwe jiyîn nabe. Mînak, cinsê şêr jî zarokên xwe naxwe. Di nava heywanan de jî cinsek curê xwe yan jî zarokên xwe bixwe nîne. Lê ji bîr nekin, hûn her roj hemcinsê xwe dixwin. Ji ber hûn li gorî quralên jiyan û rêxistina civakê najîn, misoger hevdu dixwin. Bihizirin, heywan bixwe hemcinsê xwe diparêze. Yên xwe bi xwînê jî xwedî dikin, yeqîn dikim cinsek din dixwe. Ev rastiyên giyansûzin.

Dikare îdîayên min hîn zêdetir bên pêşxistin. Hûn neçarin destpêkirina jiyana rast bikin. Hemû tişta hûn dixwazin bêjin eve; "Bihêle, ger ezê bijîm divê ev weke hatime fêrkirin be. Ger qedehek jehir jî be weke şarabê vexwim û bimirim." Ma ev felsefe ye? Em nikarin vê felsefeyê erê bikin. Hûn şaş hatine fêrkirin. Me vexwarina cixareya we jî, bi mebesta beka hûnê bikarin li dijî jiyana bi jehir rawestin an na qedexe kir û hûn ceribandin. Her wiha ew biryara me hêjî zindî ye. Ew remzeke. Kêşana cixareya we, remza weke hûn qedeha tijî jehir weke şarap dibînine. Vêca ka em binêrin, gelo hûnê bikarin li ber

xwe bidin? Ji bo Kurd an jî mirovanên weke wî dest bi jiyanek rast bikin, pêwîste hewldanek evqas mezin bê kirin. Hûn dikarin ji min re bêjin; "Zêde hêza kesî têra jiyana te ya azadiyê nake." Em dikarin vê nîqaş bikin, ne li dijî nîqaşê me. Deka em nîqaşek di derbarê hêza kesî têra jiyanek li ser bingeha azadiyê nake û ev hewldanek vale ye bikin. Lê belê emê durist nîqaş bikin.

Bi rastî jî derfeta we ya jiyana azad heye yan na? Di encamê de ger hûn bêjin; "Misoger derfetê jiyana azad nîne, quralên rêxistinê mirov teng dikin, em nikarin artêşbûnê û partîbûnê pêk bînin û em nikarin vî şerî ser bixin. Ya asayî ya ji me re hatî pêşkêşkirine", misoger em ji kesên rewşê wisa dipejirînin re helwestek neyênî raber nakin. Bes em napejirînin ku kesayetên wisa jî weke minafiqan di refên me de bimînin. Mîna sedema hûn baş fêr nabin, li gorî minafiqtiyê destnîşan dike. Li vir jî minafiqtiyek heye. Ango axaftin cuda û cewher jî cuda ye. Pêwîste teqez ev zelalbûn çêbe.

Min vale negot evder meydanek şer a mezine. Bes hûn dixwazin vir veguherînin cihê kêfxweşiyê. Ev nabe. Pêwîste hûn hinekê li hember kedên me rêzdar bin. Ez her roj gefan li ser gefan digirim. Jiyana me ya li vir bi berxwedaniyek mezin derbas dibe. Lewra neçarim nirxa van bizanim. Dibe ku hûn nêvenga me ne ecibînin. Lê belê we çiya derbas kirin, jiyana li Ewrûpa, heta metrepolan li şûn xwe hişt û hatin. Hûn çima hatin, gelo hatine bi min bilîzin? Yeqîn dikim hûn pir baş dizanin, ev mirov, mirovek berxwedêre. Qet nebê diyare em bi navê çi, ji bo çi û çawa şer dikin. Nexwe hûnê axaftina me guhdar bikin. Nabêjim li hember min weke putan bin û perestî nêz bibin. Lê qet nebê hewl bidin fêr bibin. Ger hûnê bikarin xebatên me bimeşînin divê ev tam be. Na ger hûn nikarin efûya xwe bixwazin û biçin. Wê demê hûnê jî xwe bidin kêlekê. Her kes nabe cengawer.

Dema min dest bi vî karî kir kesî alîkariya min nekir. Kesî negot; "Baş fêr bibe, baş şer bike û baş birêxistin bibe." Min bi xwe ev hemû afirandin. Mînak, wexta destpêkê hatim Rojhilata Navîn, cihek ku serê xwe lê bicîh bikim tinebû. Devjêberdin em wisa bi ewle bin, odeyek, betaniyek û qet nebê tiştek ku nehêle mirov bicemide jî nebûn. Şeva min a destpêkê wisa derbas bû. Heta gava gundiyekê ez di bin navê bazirganiyê de pejirandim, ji bo min ew şev, şeva herî rehet bû. Ev bûyerek mezin bû. Merşikek li ser betonê raxistibûn. Min xwe li ser wê dirêj kiribû. Dikarim bêjim, heta sibehê xewa herî xweş min wê şevê

jiyabû. Wexta em li cem rêxistina Fîlîstînê, dema li ser sendelekî biçûk rûniştim, min digot qey li ser koltixek mezin rûniştime. Ango li ser sendeliyek hesîr û odeyek di nava tozê de ewqas rehet bûm.

Niha hûn li derdora mêzeyan, li ser sendeliyên xweşik rûdinin, lê dîsa jî nerehetin. Hûn çend betaniyan davêjin ser xwe, dîsa jî rehet ranazin. Ewlekariya we parastiye, xwarin jî ne xirabin. Ji hêla fikir ve jî, em fikrên herî xweşik didin we, tevî zemîna rêxistinê ya herî xurt didin we, dîsa jî rehet nabin. Nexwe wê ji te re bêjin tu nexweşî. Agahiya we nîne felsefeya jiyana me çiye. Hûn tine bûne. Nexwe divê mirov vê ji we re bêje: Hûn şaş tevlî PKK'ê bûne, ew weke malbata xwe dîtiye, lê PKK ne wisa ye. PKK şaş fêrî we kirine.

Vêca, ma ez berpirsê van tevame? Na. Ji ber karê ku ti milîtanî yan jî rêberî nekirî, heta niha min kirî ji we re vegot. Lê tawana nefêmkirina vê jî pirsgirêka we ye. Weke hûn jî dibînin karê me pir berfirehe û karek cidî ye. Hebûn û tinebûna derfet zêde ne girînge. Dema dixwazin min di paya herî bilind de pêşwazî bikin jî, ez aciz dibim. Acizbûna di vê xalê de ye. Li şûna ji hinek din alîkariyê hêvî bikim, berovajî wexta dibêjin pişgirî heye şik dibim û min tengav dike. Lewra tişta xwe pê ve girê didim, sînorê jiyanek pir dilnizme. Mînak her tim ji xwarinê bi goşt acizim. Ew savara em fêr bûne, ji bo min xwarina herî başe. Ev felsefeya mine.

Yeqîn dikim camêrek vî aliyê me dizane, qaşo hewl dide me li gorî xwe dahûrîne, digot; "Ez jî pir savarê dixwim." Dibe ku kena xwe jî dikir an jî dixwest felsefeya jiyana min û sînorên jiyana min a dilnizm dahûrîne. Wexta em derfetan re rûbirû tên xwe winda nakin. Ji ber ger em wisa bikin, ne diyare wê kar li kur rawestin. Niha li we dinêrim, hinek biçekê ber dilê we bikeve, hûn ser xwe diçin. Rayeyek dikeve destê we, hûn bi wê derdor dişkînin. Bi van kesayeta hûn nabin mirov. Ne sererast dibin, ne jî sererast dikin. Hûn dikarin van tevan dilnizm li nêvenga me fêr bibin. Divê hûn fêr bibin mercên rehet çawa pêşwazî bikin. Mîna vê gelek xalên din hene. Em her tim dixwazin destnîşan bikin, bes bi qasî dibînim hûn xurt fêr nabin.

Piranî şoreşgeriyek xwe dispêre raye derdikeve holê. Raye rehetiyê tîne û ji bo vê jî li hember raye eleqe heye. Mînak dê bîroyek wî hebe, bêxîret rûne her carê telefona xwe derbixe fermanan bide yan jî tekmîl bigire, qaşo yek-du fermanên ne cidî bide. Di rewşa heyî de feraseta rêveberî û fermandarî gihaye vê rewşê. Misoger ti eleqeya vê bi me re

nîne û ev jirêderxistine. Qet rewşek min a wisa nîne. Rojane şêwaza min a hilberîna çareserî, lêhûrbûn, rastî danasîn, ango şêwaza min a rêvebirinê binêrin, di ji sedî heştî radeyê de bi şêwaza we re berovajî ye. Pir ecêbe, hûn çawa evqas berovajî bi navê min ferz dikin? Vêca hûn qet natirsin jî. Jixwe ev jî pirsgirêkek girînge. Çima natirsin? Bêtirsiya we, dibe ku ji ber rêbaza em pêk tinine. Ez nabêjim, ji min bitirsin, ji rastiyan bitirsin. Heta di vê mijarê de xwe jî tawanbar dibînim. Ma ev çima li kesayeta min nanêrin û ji rastiyên ku pêwîste jê bitirsin natirsin? Gelo ez tawanbarim? Van ji xwe re dibêjim.

Rastî pir dijwarin, divê hûn ji rastiyan bitirsin. Hûn li min dinêrin û dibêjin; “Em bi baweriya li hember Rêbertî dijîn ve qet natirsin.” Vaye ev jî felsefeya xweda ye. Tenê bi baweriya li hember Rêbertî ve, tirs nayê derbaskirin. Ev helwestek şaşe. Misoger di vê xalê de gotin nayînin ser xwe. Rêbertî bi xwe ji rastiyan pir ditirse. Ji rastiya siyasî, rastiya dijmin û rastiya rêxistinê pir ditirse. Rêbertî bi eleqe, bertek û hêrsên xwe ve bêhempa ye. Lê bi we re ne hêrsbûn, ne bertek, ne tol, ne jî eleqeyek kûr heye. Dibêjin ku van tevan jî xwe bi sipartina Rêbertiyê ve dikin. Tam durûtî ye, tam xwe xapandinek tê jiyîn. Yekser dev ji vê berdin. Ya tê xwestin, wêrekiyek wisa wêrekiye, ne jî fedekariyek wisa fedekarî ye. Ger rûyek madalyon ê sexte wêrekî ye, rûyê din jî li cihên hewce nake tirs û lihevketine.

Weke hûn dibînin tiştên balkêş hûn fêr bibin hene, lê durist fêr bibin. Fêrbûna li vir, weke dibistanên pergalê ne tenê daneyên zanyarî ne. Fêrbûna li vir, li ser bingeha veguhertinê ye. Ango li cem me di bin duruşmeya; “Yan veguhertin, an veguhertinê” de fêrbûn çêdibe. Ya rastî karê fêrbûnê ji şer zehmetire û balkêştire. Ji ber şer bi xisletên ji vir bên girtin û veguhertina kesayet ve wê bê meşandin û serxistin. Hûn aciz dibin û dibêjin; “Ez şer dixwazim.” Jixwe ji qada me ya perwerdê sih hezar kes derketin. Lê mixabin yek ji wan jî ji pêwîstiyên şer re nebû bersiv. Divê hûn veguhertinek bi qasî bersivê bide pêdiviyên şer jî, jiyana partiyê jî saz bikin. Ez hijdeh salin hêjî fêr dibim û fêr dikim. Şaşiya peyvekê jî nakim. Lê hûn tenezil nakin tiştekê fêr bibin.

Wexta dijmin bi operasyona 14'ê Gulanê ve bi ser Biryarageha me ya Navendî de çû, min li leşkerekî nêrî: Dibêje; “Me jî ev tiştek didît, lê li holê tiştek nîne.” Ya rastî ew leşker jî belengazeke. Bes li rewşa yên me dinêre û wisa dibêje. Mînak dijmin hinekan digire û dibêje; “Ev belengazeke.” Paşê çaya xwe jî bi endamê me yê gêrîla re parve dike.

Endamê me jî weke berxan vedixwe. Jixwe vî endamê me yê gêrîla jî xwe ji mêj ve winda kiriye. Mînak ez bêm kuştin jî, şanek û navek min heye, mezinbûna min heye û wê derbikeve holê ezê hêsan nemirim. Lê belê elbet endamê me yê gêrîla belengazeke. Dibêje; "Min ne dizaniya dewleta me wisa ye." General jî bi derewî jî be dibêje; "Em sond didin betaniyê, nan, çayê û cihê xwe yê razanê bi van re parve bikin." Ango rewşa van a derûnî û lewazî baş girtine. Ev jî vê destnîşan dike: Hûn weke cengawerek mezin, we hêj wate nedaye xwe.

Hûn di dîrokê de jî dibînin, wexta koleyan û parazvanên Spartakîstan bêhempa şer kirine. Ji bo Romayî wan radest bigirin gelek sondan didin. Tenê yek tişt pirsî bûn, "Spartakûs kiye? Vê ji me re bêjin, emê we tevan efû bikin." Beramberî vê jî her kes dibêje; "Spartakûs ezim, Spartakûs ezim." Bi vî rengî ew radestî Romayiyan nekirin, nedan dest. Ji ber vê Roma pênc hezar kole çep û rastê rê çarmixê ve gire dan. Ew kole bûn, bes hemûyan jî lehengî li ber xwe da. Dema mirov dimire jî, pêwîste bi lehengî bimire. Bes ev jî bi axaftinê nabe. Ji bo vê amadekariyek baş hewce dike. Elbet em ne ji bo mirinê, li ser bingeha serkeftinê dimeşin. Em ne îsyangerên koleyane. Ev hemû girîngin. Li vir ne ji bo mirinê şer, ji bo serkeftinê quralên şer tên fêrkirin û ev jî pêkane. Hatiye dahûrandin ku, yê pêwîste winda bike dijmine.

Hemû nîqaşên me di vê manê de kêliya ku pêwîstî û kûraniya biryardariya jiyanê ronî dike, derdixe holê pêwîste şêwaza şerê ji bo wê hewce jî di şêwazek serkeftinê de be. Ev wisa ye, divê hûn vê cuda nenirxînin. Di vê manê de dikarin bi min û xwe jî bawer bikin. Bêhngirtin û dayîn jî ji bo vê şertê sereke ya hewce ye. Mînak hûnê bêjin; "Ger ez dikarim henase bigirim û bidim, ya hewce jî temame." Pêdiviyên ji bo ya hewce jî hûnê bêjin; "Heta her tiştî ser bixim, ezê fêr bibim." Ji bilî vê tiştekê ji me daxwaz nekin. Ger daxwazek we ya din çêbe, hûnê şaşiyê bikin.

Binêrin, rast li ser lingame, pir saxlemim û zindî me. Ji bo xebatek xwedî nirxek bilind xwe zindî dihêlim û zindî dibînim. Li hember aliyên di şer de paşketî û lewaz bertek raber dikim. Ji ber ev paşketin û lewazî ji bo min her tim weke xefkê ne. Li wir hemû hestên min îsyanê dikin. Kesayetek wisa çêbûyî mijara gotinê ye. Bal bidinê, vaye ev şêwaza hest ez wisa girtim û dam jiyîn. Vaye Rêbertî rastiyek wisa ye, Rêbertî wisa xwe bihêz kiriye. Rêbertiya hûn bêriyê dikin û pê ve girêdayî ne,

vaye xwe wisa da jiyîn. Teqez divê hûn fêr bibin Rêbertî çawa xwe li ser lingan digire û çawa mezin dike. Tişta herî zêde ji bo we hewce eve.

Ma dijmin niha ji bo me çi nahizire. Her cure senaryoyên nayê bîra mirovan amade dike. Jixwe em her roj şerekê dijîn. Rojane li hember me operasyona herî mezin şerê derûnî ya herî mezin tê meşandin. Hûn nikarin vê paşçav bikin. Hûn di nava vî şerî de ne. Ger hûn baldar nêz nebin, hûnê siberojê bibin qurbanê vî şerî. Dijmin yekser dixwaze qada me jî tine bike. Berpirsên vir, her roj me tengav dikin. Em ji Ewrûpa bigirin heta Rojhilata Navîn, ji Rusya bigirin heta Kurdistanê li her cihî qadên me yên xebatê tên tengkirin. Ez jî bi zor û bela hewl didim temenê meşandina xebatên me yên li van qadan dirêj bikim. Yek dibêje; “Gundê me yê filan derî di bin gefan de ye.” Politikaya li vir, dirêjkirina temenê wî gundî ye. Dibêjin; “Dibistana li filan derî di xeteriyê de ye.” Politikaya me dirêjkirina wexta dibistanê ye.

Piraniya hevalên me jî dibêjin; “Ev qad ji bo min tenge, tam ne li gorî mine.” Em li pey çine, endamê me li pey çiye? Ya rastî ne di ferqa yên diqewimin de ye. Me çiya vekirin, me got dê hêzên me li wan deran cihên baş bigirin. Niha we ewder jî ji xwe re kirine zindan. Yên li Ewrûpa digirîn, dibêjin; “Hûnê kengê me ji vir bigirin?” Ya rastî yan ev cîhan bi xwe tenge, yan jî hûn ne li gorî vê cîhanê ne. Ji ber ev cîhan ji mêj ve ji destê we hatiye girtin.

Hûnê pirsgirêkê rast fêm bikin. Dijminê we, axên we yên dayîkê, azadiya we û cîhana we ji destê we girtiye. Cewhera rastiyê eve. Hûn çima her tim dibêjin; “Ev qas ji bo min tenge, ne li gorî mine.” Rewşa xwe rast binirxînin. Ne min ev ji destên we girtin û min hûn neşandin warên ku hûn dibêjin tengin. Min tenê bi navê jiyanek bê welat û bê azadî nabe qiyamet rakir. Elbet ji bo bidestxistina van jî, min got bêrêxistin, bêşer, bêtêkoşîn û bêquralî nabe, bi qasî qiyametekê ked da. Ev hemû tiştên em dibêjin rastin. Heta ev xalên ku divê hûn beriya navê xwe têbigihine. Ji ber şaş fêrî navê xwe jî bûne. Navê ew Mehmede, lê ti eleqeya we bi Muhammed re nîne. Navê we Elî ye, lê ti eleqeya we bi Îmam Elî re nîne. Navê we Huseyîne, lê ti eleqeya we bi Îmam Huseyîn re nîne. Navê kîjan ji we binêrim şaşiyek heye. Lewra divê mirov navan li we neke. Pêwîste mirov beriya navê we hinek tiştên din bide we û ez jî hewl didim wê bidim we.

Min di deh saliya xwe de ji dayîka xwe pirsî; “Ma tu dizanî bi welidandina min ve te ez çiqas xistime tengaviyê?” Niha hûn jî dişibin

wê rewşa min a berê. Heta rewşa we xirabtire. Di wî temenê xwe de qet nebê min hewl dida xwe bi rêkûpêk bikim. Hûn hesabê dayîka we bê pêşeroj welidandine ji min dipirsin. Hûn dibêjin; “Ma tu ne Rêberî? Wê tu ji bo me çare bibînî. Ma tu ne Xwedayî? Wê tu ser rûyê erdê ji bo evde xwe bikî cihê jiyanek rehet û bi şeref.” Ya rastî felsefeya we wisa ye. Dema vê jî nabînin hûn dikevin rewşa evden xayîn û dibêjin; “Ezê jî îxanetê bikim.” Bi rastî jî rewşa we seyre. Ango hawarên we jî, îxanetên we jî bêwate ne. Kî ji we re got ez xwedayekim? Ev çavkaniya xwe ji ramanê we yên nebes digire. Felsefe û nêzîkbûnên we şaşin. Hûn nikarin cîhanê pênase bikin. Paşê jî dibêjin; “Ezê xirab bikim û dîn bibim.”

Jixwe rewşa piraniya we weke nexweşane. Hemû nêzîkbûnên we yên weke nepêkanîna quralan, xwe negihandina xîtabek rast û nebûna xwedî helwestek dijwar tên vê wateyê. Nesiyasîbûn û neleşkerbûn nexweşiya herî kûre. Nexweşiya herî xeternak jî eve. Rewşa nexweşên li nav cîhan, li ber vê rewşa we tişteke. Wexta li rûyê we dinêrim, negengaze ku vê nexweşiya we nebînim. Lê ya girîng, tenduristiya we baş kirin û sererastkirine. Em pergalek tedawî û veguhertinê li ser we pêk tînin. Hûnê li hember vê bertek raber nekin û li ber xwe bidin. Ji ber hûn vê dixwazin. Ger baweriya we bi min û hostatiya min heye –yeqîn dikim me ew selmandiye-, hûnê li hember rêbazên tedawiya em pêk tînin li ber xwe bidin. Em di vê xalê de ji xweda zêdetir xwedî hêza guhertin û veguhertinê ne. Di mijara avakirina mirovê nû de, hûnê bawer bikin ku em ji xweda zêdetir bihêzin.

Yan veguhertin, an veguhertin. An di şer de kesayeta serkeftinê, yan jî kesayeta serkeftinê! Em dibêjin bila kesayeta binketî, sererast nabe, kesayetên kirêt ên pê re nayê jiyîn û bi azadiyê re nabe yek bimire. Duruşmeya me eve û dê ev werin pêkan. Ger hûn berovajî van xalên min destnîşan kirîn bikin, rêbazên min jî herî kêm bi qasî bikare bersivê bide van berovajiyan bihêze. Piştî ku me bi hewldanên xwe yên kesî li cîhanê evqas cîh ji xwe re vekir û gelek dewlet jî li gorî xwe eyar kir, ma emê bi lîstokên we bîn xapandin? Di nava we de kesê xwe herî bi aqil dibîne, xwe li kur dît? Me ew weke darek herdu serê wê jî qirêj kir destê dijmin. Rewşa hostayê we yê herî baş jî wisa ye.

Hûnê pir bi aqil, pir bi dîsîplîn û bi feraset bin. Lê em nikarin van bi zorê li ser we ferz bikin. Keyfa min ji vê re nayê. Dizanim, ger wisa bikim hûnê weke putan pêşberî me rawestin, lê belê kêliya paş xwe

zivirîm jî hûnê xwe bavêjin erdê. Ji bo Kurdan rêbaza perwerdê ya herî bibandor, rêbaza min dîtiye. Ji ber ti kesî Kurd evqasî ber bi veguhertinê ve nekêşa ye û ev jî hatiye selmandin. Ger hûn weke tolazên herî mezin jî derbikevin pêşberî min, misoger ezê we biguherim, qet tawîzan nadim. Ger hûn birevin jî, derfeta rizgarbûna we nîne. Di encama tawanên we kirîn de, wê dijmin pêncî carî we darve bike. Eniya dijmin wisa ye. Ger hûn biçin welatek emperyalist jî, dê ew jî sedî sed sîxurtiyê li ser we ferz bike û ew jî xirabe. Min derdora nêzîkbûnên we yên weke keyfiyet, fermandariya sexte, raye, çewsandin, pêşxistina xerckirinê û ferdperestî jî teng kiriye. Zilamên wisa dikin hatine çil saliya xwe, bes di halek nikarin li ser piyan bisekinin de ne. Di nava yên di navenda me de jî gelek fermandarên sexte hene û her roj em dahûrîna yekê dikin.

Tê gotin rêya aqil yeke. Em nexwazin jî ev jiyan li ser me hatiye ferzkirin. Nexwe divê em jî vê li ser bingeha azadiyê bikar bînin. Ez dîsa jî li ser we tiştekê ferz nakim. Tişta dixwazim, ger hûn ji xwe bawerin, heta hûn vê jiyanê fetih û xweşik dikin nîqaş bikin. Heta hûn dikarin kar bimeşînin vê bidomînin. Milîtanê em perwerde dikin, divê bikare bêje; "Min tam dersa milîtanî girt. Biçim kur bila be, bi kîjan peywirî re rûbirû bêm bila be, ezê rihê dijmin bistînim. Ez li kur bim, li wir serkeftin heye." Ev milîtan bêçare namîne. Ez ji bilî vê napejirînim ku PKK û milîtanên PKK'ê cuda bijîn. Dijmin jî vê dixwaze. Hema hema hemû cîhan dixwaze. PKK'ya ku bi me dide serxistin, a ez destnîşan dikime. Dev ji vê PKK'yîbûnê nayê berdan. Heta mirov dev ji can, mal û yar diberde, lê dev ji vê PKK'ê bernade. Ji ber hemû cewher û xweşikbûna jiyanê, bi vî şêwazê PKK'ê pêkane. Bal bidinê ya herî zêde hêjayî me jî eve.

Ez nabêjim, ez we bi temamî bigihînim cewhera xwe, hemû heqîqet di vir de ye. Ancex ez nûnertiya cewhera PKK'ê û Rêbertiyê dikim. Dikare bê gotin Rêbertî nûnerek ne xirabe. Ev jî ji bo we hêze û perwerdekare. Dema hûn hevgihîna xwe bi vê re pêk bînin, hûnê hemû lewazî û paşverûtiyên xwe yên bîrdozî derbas bikin. Wê hemû jêhatiyên we yên erênî derbikevin holê û fêrbûnên we yên xirab bên derbaskirin. Wê xisletên saxlem ên ji bo we di şer û jiyana azad de hewce, bikevin dewsa fêrbûnên we yên xirab û aliyên we yên qels. Ger ev rewş jî bê sazkirin, hûnê ji min hezar qatî zêdetir asta milîtanî bidest bixin. Ev jî ya herî hêja ye. Bi vê milîtaniyê, di şer de serkeftin û di jiyanê de jî azadî misogere.

**10 Gulan 1998**